KESKESOR
edebiyat

Abdurrahman Durre

Şerha Dîwana Ehmedê Xanî

Felsefe û Jiyana Wî

Abdurrahman Durre

ŞERHA DÎWANA EHMEDÊ XANÎ

FELSEFE Û JIYANA WÎ

KESKESOR

KESKESOR: 1
ŞERHA DÎWANA EHMEDÊ XANÎ
FELSEFE Û JIYANA WÎ
Abdurrahman Durre

Berg: Genco Demirer
Çapa Yekem: Stenbol, 2002
Çap: Berdan Matbaacılık

© Avesta, 2002
Ev kitêb bi alîkariya
Enstîtuya Kurdî ya Parîsê hatiye çapkirin

AVESTA BASIN YAYIN
REKLAM TANITIM MÜZİK DAĞITIM LTD. ŞTİ
Meşrutiyet Caddesi
136 / 4
BEYOĞLU / İSTANBUL
Tel-Faks: (0212) 251 44 80
(0212) 251 71 39

Ekinciler Caddesi
Nurlan Apt. Giriş Katı No: 2
OFİS / DİYARBAKIR
Tel-Faks: (0412) 222 64 91

ISBN: 975-93030-0-0

Mûqeddîme (Pêşek)

Feylesofê Namidar, **Eflaton** (Platon / 427-347 b.m.) dibêje: ku «şî'r reng û rewşekî wehy û îlhama îlahîye, ji mebde' û mîsalekî rûhanîye, siroştî û wicdanîye.»

Ku ew jî yanê: «şî'r nerx û rûmetekî hunerîyê herî bi qîmet û giranbihaye, bi taybetî şî'ra 'erûzî, ku walatir û balatirê hemî cûrên wî hunerê wala û balaye»;

Şî'r û helbesteyên Xani jî, Gewherên bê hembtayên wî hunerê hêjane, durrên yektayên wê derya bê payan û bê ser û pa ne. Ku ew jî yanê : « Ehmedê Xanî, pîrê neteweyê wêjeya kurdî ye, seyda û mamostayê wî ye ».

Ji wan dem û dewranên geş û xweş û cuwanên ku me di bihişta war û zozanên Kurdistanê da borandin; Dema şagirtî û feqitî û talibîtîya me (xwendin û tehsîla me ya destpêkî û navînî û bilind) di wan medrese û zanîngehên wê yên pîroz da (15-16 sal), dema mamostatî û seydatîya me ya ji wan pîrozegahên 'ezîz ra. (ku ewî jî, 10-11 salan dewam kir).

Hêj ji wan dem û dewranên 'eziz û pîroz da, pirûsk û çirûskên meyl û mehebbet û şewq û zewqa edebî, qabilîyyet û îst'idada rist û înşada şî'rî û kelejenî ya xîtabî, di tînet û siroşta min da dixuyan û diçirûsîn -bi bîr û bawerîya û de'w doza netewî ra- dikeliyan û diteyîsîn; 'eleqe û peywendîyên min bi edebîyyata 'erebî û farisî û klasîkiya kurdî ra, roj bi roj keltir û geştir dibûn, pêşvetir diçûn, ku : « Belgeyên edebîyên wek **mû'elleqatê seb'e** û **meqamatê Herîrî** û **Dîwana Îbnû-l Faridê** û **kullîyatên Şêx Se'dî Şîrazî** û **dîwana Mewlana Camî** û **Hafizê Şîrazî**, **Dîwana Melayê Cizîrî** û **Mewlana Xalidê Şehrezûrî, Mem-û-Zîna Xanî, Yûsûf û Zelîxa, Leyla û Mecnûn** û yên wekî wan » bibûn dersên bingehîyên edebîyên medrasa min; bibûn duruf û nîşan û sembola wî ya taybetî.

Di vî esnayê da (di wê navberê da) çend perçe ji gufte û helbestêyen Xanî yên xezelî û felsefî bi destê min ketin, pirr diqqet û bala min kişandin; ku ez bi salan bi pey wan -bi pey Dîwana Xanî ya ku min navê wî bihîstibû- ketim, li her der û warî, li her gund û bajarî, lê gerîyam; lê sed mixabin ! Ku Dîwana Xanî, ji alîyek da wekî teyrê 'Enqa bû (îsmekî bê mûsemma bû), ji alîyek din da jî, -wekî teyrê Tawûs, li gelek deran gelek perrên wî yên rengîn û pîroz weşîya bûn û mabûn. Ku min wan perrikên wî yên pîroz, ji medreseyên herêmên Kurdistanê yên cûr be cûr, ji mela û mûderris û hozan û wêjevanên kurd -yek bi yek- berhev kirin û civandin û mûhafeze kirin. Hetta -wek ku Adem pêxember ji cennetê avêtin- me jî, ji bihişta Kurdistanê avêtin û jê dûr xistin; -di sala 1993an da-, em mecbûrê îltîca (penaberî) ya bal Ewrûpayê va bûn, ku di wan çend salên dawîyên wê jiyana bi taybeti da, me wan durr û gewherên giranbihayên wî kana **Xanî**, ji qirêjayî û leke û kêmasiyên îhmal û xeta û tevlihevbûyîn û şaşîyan pak û paqij kirin, teshîh û durust kirin, tertîb û tenzîm kirin, ku -bi temamî nebe jî- pirrê qesîdeyên wî, hatin civandin û jê **Dîwana Xanî** mûteşekil bû; me şerh û şirûve û îzaha wan jî kir, ku ji wî jî, ev berhema bi navê « **Şerha Dîwna Xanî, felsefe û jiyana wî** » peyda bû; naveroka wî 'îberetê ji van mesele û xal û mijaran e :

1- şerh û rave û şirova Dîwana Xanî, beyan û îşaretên bal cîhetên **Xanî** yên edebî û millî û felsefî û tesewwûfî.

2- hinek ji cîhet û xal û nuqteyên girîngên kurd û Kurdistanê yên kevn û nû, ûrf û adet û nerx û qîmet û rewş û rûmetên wan ên tarîxî û netewî û hunerî, bîr û baweriyên wan ên olî û felsefî.

3- lîstok û pîlan û dekk û dolabên dijmin û dagirgerên Kurdistanê, texrîbat û tehrîfatên wan.

4- tehlîl û şirovekirinên îlmî û felsefî ji hinek pirsegirêk û meseleyên girift ên olî ra -wek mesela **Qeder** û **Wehy** û **Îsra** û **Mî'rac** û **Mû'cîze** û **Xarîqe** û **Xêr** û **sewab** û **'îqabên ûxrewî**, **Hîcab** û **Cîhad** û tiştên wekî wan-.

Ku -wek mifteyên 'îlmî û felsefî- mirov dikare : bi wan îzah û tehlîlan, kilîtên derîyên dadayîyên pirr meseleyên mûxleqq û mûbhem ên dinên jî veke û sirr û razên wan bibişkêve.

5- felsefa Wehdetî-l wûcûd û Wehdetî-şşûhûd dê, ku bi dirêjayî li ser wî hatîye sekinandin; bîr û baweriya **Xanî** û **Melayê** Cizîrî û mûtesewwûfên wek **Hellac** û **Îbnu-l Farid** û **Mûhyyîddînê 'Erebî** û **Ceylî** -derheq wî da-, hatine beyan kirin.

6- -bi kurtî be jî- gelek felsefe û ekolên felsefîyên şerqî û xerbî, dîn û mezheb û bîr û baweriyên sensikrîtî, -bi taybetî yên Mezopotamyayî û Kurdistanî -wek **Hîndûîzm** û **Bûdîzm** û **Tawîzm** û **Jenîzm** û **Konfuçyuîzm** û **Şîntoîzm** û **Platonîzm** û **neoplatonîzm** û **mîtraîzm** û **Alawîzm** û **kakaîzm** û **Êzdîzm** û **Manaîzm** û dînê **Zerdeşt** û dînên Arîyanîyên din.

7- çend belge û numûne û mînakên tarîxî û edebî.

Ez bawer im ku bi vê berhemê, şopekî nûh hatibe vekirin, we yan -bi hindikayî be jî- teşwîqa bal şopekî nûh va, teşwîqa bal vekirina şopekî nûh va hatibe kirin.

Temennî û niyaza min ewe ku ji ber û fêkiyên baxçeyê wî yê rengîn, pesend û daxwaz bên niqandin, têkilê nepesend û ne'ecibandîyên wî ne bin, pêpes nekin û ne herçiqînin, kêmasî û nûqsaniyên me bibexsînin ! Ku mûkemmelîyyeta mûtleqq, pesendîtî û xweşewîstîya her tiştî ji her kesî ra ne mumkîne, her kes bi angorî xwe, bi angorî mezaq û meşreb û bîr û bawerîyên xwe difekire û, di vê û dixwaze -divê ku wilo be jî-!.

Em, ji her tenqîd û rexneyan ra jî vekirî û amade ne, bê tirs û bê endîşe ne, ji her teswîb û teqdîran ra jî minnetdar û mûtteşekir hene.

Bi dildarî û rêzdarîyên derûnî, silav û sipas!.

A. Durre

ABDURRAHMAN DURRE

Di sala qirkirina Geliyê Zîlan de (1930), li navçeya Milazgira Mûşê,
li gundê Kêranlixê hatiye dinê. 15 salan di medresên Kurdistanê de xwendiye.
Li dora 10-12 salan jî seydatî kiriye.
Ji bilî zimanê kurdî, zimanên erebî, tirkî û farisî dizane.
Di edebiyat û rêzimana erebî, farisî û kurdî de zanyar e.
Ji sala 1962'an heta sala 1975'an miftîtî kiriye.
Demekê li Lîbyayê mutercimiya erebî û tirkî kiriye.
Bi erebî, kurdî, farisî û tirkî deh berhemên wî yên çapkirî û neçapkirî hene.
Di rojnama Welat û kovara Rewşenê de nivîsên wî çap bûne,
endamê saziya sazûmankarên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ye.
Niha li Ewrûpa penaber e.

Dîrok û ziman û wêjeya her gel û milletan, qedr û qîmet û nerx û rûmetên wan ên giran biha û bingehîn e, belge û nam û namûsên wan ên netewîn e.

Pêşiyan jî gotine ku: *"Mirov namûsa xwe teslîmê tu kesî nake, li hêvî ya tu kesî na hêle"*, divê ku her kes bi xwe, bi her çare û îmkanên xwe, li nerx û namûs û rûmetên xwe xwedî derê, biparêz e û mûhafeze bike.

Ku ev berhem jî, ked û ber û fêkîyekî wî bîr û bawarî ya netewî ya pîroz e.

Ji dayîka xwe ya Kurdistanê ya dilsoz û pîroz ra, -bi sipas û rêz û daxwaziyên derûnî, bi şehnazî û serfirazîyên netewî- 'erz û pêşkêş dikim.

A. Durre

بسم الله الرحمن الرحيم

Bi navê Xwedayê dilovan û dilovîn

Destpêk

Dara tûba ya bihişta Kurdistanê

Dibêjin ku: "di Bihiştê da (di Cennetê da), darekî pirr bi xêr û bêr, bi bereket û pîroz heye, ku navê wê **Tûba** ye. Bi her alî da pej û şax daye, bi her şax û çiqil û çepelên wê yên pîroz va, fêkîyên cûr be cûrên lezîz û giranbiha hene, ku herkesên bihiştî, di her demî da dikarin her fêkîyên dilê wan bibijê û bixwaze, ji şaxên wê dara pîroz da biçinin, para xwe jê hilînin".

Dema ku mirov, li şexsîyyeta Xanî mêze dike, bi hêsayî dikare bibêje: Ku **Xanî** jî "dara Tûba ya Bihişta Kurdistanê ye, pirr şaxên wê yên pîroz û bi xêr û bêr jî hene, ku ne bi tenê gelê Kurdistanê, belkî hemû gelên cîhanê, dikarin ji wan fêkîyên wî yên ezîz û lezîz îstîfade bikin (fayde bibînin). Ku ji nav wan şaxên wî yên pîroz, me **çar şax** bi tenê niqandîye, bi qasî qewweta xwe çiq û pejên wan hejandîye, jê da hinek fêkîyên giranbiha weşandîye:

1. şaxa şî'r û edebiyatê (wêjeyê).
2. şaxa millîyet û welatparêzîyê.
3. şaxa tesewwuf û qederê.
4. şaxa felsefe û wehdetil-wucûdê.

Eger bi bêhemdî û nezanî, toz û lekeyek ji me da gihîştibe damen ên pakên wan bakûre yên bakîre û tahîre, temennî û nîyaza me

ewe ku mamostayê mamostayan, şagirt û suxteyê xwe yê mubtedî û nezan bibexşîne (1).

Ehmed ê Xanî (1650/51 - 1707/9 m.)

Kurê Îlyas ê kurê Rostem Begê ye, ji eşîra "Xanî" ye (2), li bajarê Bazîdê, di sala 1650/51'an da, hatîye dunyayê, di sala 1706/7an we yan di (1079)'da jî, li wir wefat kirîye. Mezelê wî yê pîroz (merqeda wî ya mubarek) li rojhilata qeleya Îshaq paşa, li Bazîda xirabe, zîyaretgaha xelkê ye. Bavê wî yê rehmetî, ji herêma Hekkarî yê bi koçberî hatîye Bazîdê, li wê bi cîh bûye.

Tarîxa bûyîna Ehmedê Xanî qet'îye. Ku Xanî bi mûnasebeta 'erzkirina rewşa xwe, di dawîya Memo-Zîna xwe da, îşaretê balê va kirîye û wiha gotîye :

Xettê Te ye sernuwuşt û sermeşq
Sî sale xetê xeta diket meşq
Lewra ku dema ji xeybê fek bû
Tarîxê hezar û şêst û yek bû

Yanê : Ey Xweda! Xettê Te ye ku Te ji ezel da ji me ra kiriye sernivişt û sermeşq û pêşkêşê me kiriye, eva sî sal e, ku Xanî ewî sernivişt û sermeşqê bi çewtî û bi şaşî meşq kiriye û dike; çima jî sî sale ? ji ber ku dema Xanî ji xeybê (ji 'alema ne dîyarbûyî) fek bû (vebû, xelasbû), hate 'alema şehadetê (ji dîya xwe bû), di wê demê da, tarîx (tarîxa hîcrî), 1061 bû (ku ew jî beranberê 1650/51'ê tarîxa mîladî ye), îsal jî, Xanî bûye çil û çar salî, ji çil û çar salan jî, ku çarde salên

---

(1) **Damen:** pês, **Bakûre**: Seretayîyê fêkîyan, meyve û fêkîyên taze û nuh.
Bakîre: Destlêneketî, wek keçên bakîre. **Tahîre**: Pak û paqij

(2) Gundekî bi navê *"Bayê"* nêzîkê bajarê Hekkarî yê heye, ku hemû malbatên wî gundî, ji eşîra "Xanî" ne, qederekî ji Xanîyan jî, li der û dorê *Xoşabê* û *Wanê* û *Şemdînan* û *Şirnex* û Gever û *Cizîrê* û *Zaxoyê* û hinek derên başûrê Kurdistan'ê dinên jî, hene. Îhtimale ku bav û kalê "Ehmedê Xanî" ji wî gundê Bayê bin jî; Li herêma Cûlemêrgê (Hekkariyê) deşta "Xanê" jî heye, dibe ku, munasebeta wî û eşîra Xanî jî bihevra hebe. Dîrokvanê mezin *"Mûhemmed Emîn Zekî"*, di berhema xwe ya bi navê *"Xulasetû tarîxil Kurd we Kurdistan"*ê, (rûpela191) da, dibêje: Ku *"Xanî"*, yek ji eşîrên Kurdaye, nêzîkê 180 malbatên wî hene, eşîra *Ertoşî* jî, yek ji eşîrên pirr mezinê wê herêmê ye, nêzîkê 7000 malbatên wî hene, eşîra *Pinyaşîyan* jî, yek ji eşîrên wê ye, nêzîkê 1200 malbatê wî heye: Ew jî evî îfade dike: Ku *"Xanî"*, eşîrekî bi serê xwe ye, ne ku qebîle û millekî ji hinek eşîrên dine, çawan ku hinek kesan wilo gotine, îdia kirine, ku *Xanî* qebîlekî ji wan eşîrane, û bi vî awayî jî xwe ji *Xaniyan* hesibandine, digel ku ne ji *Xanîyane* jî, Pêximber (es) jî gotîye :

ليس منا من انتسب الى غير نسبه — من انتسب الى غير نسبه فليتبوّ مقعده في النار

"Yê ku xwe bi bal xeyrî neseba xwe va întîsab bike, ew ne ji meye, bila ew cihê xwe di agir da hazir bike. (Buxarî: Cild 9, rûpel 1427)"

zarotîya wî derê, dimîne sî sal. Ku Xanî di vî sî salî da, wî xettê semivîşt a ezelî çewt meşq dike, we yan Xanî, xetê xetayê (xetê şaşîtî û gûnehan, û nivîsara çewt) meşq dike, xetayan dike, gûnhean kare.

Lê tarîxa wefata "Xanî", bi qet'î ne kifşe ye, di wî xusûsîda di dest me da, tu wesîqe û belgekî tarîxî tuneye; ev qeder heye ku mamosta **"Elaeddîn Seccadî"** di kitêba xwe ya bi navê *"El Edeb ul Kurdî"* da, dibêje: "ku li ser pişta kitêbekî, ev îbareyê 'erebî (طار خاني الى ربه *tare **Xanî** îla rebbîhî = Xanî firîyaye bal rebbê xwe*), hatîye dîtin, ku ji boy kifşkirina tarîxa wefata Xanî hatîye rokirin û nivîsandin. Bi angorî hesabê ebcedê jî (3), ew dibe (1119)ê tarîxa hîcrî (4), ew jî, beranberê (1706/7)ê tarîxa mîladîye". Bi angorî wê belgeyê (ku di dest me da ji wî belgeyê bêtir jî tu belge û wesîqekî din jî tuneye). Xanî di vê dunya fanî da, pêncî û heyşt (58) salan jîyaye (*Rehmeta Xwedê li ser ruh û canê wî yê pak û pîroz be*).(5)

Derbareyê ku gelo ka "**Xanî**" di çend salîya xwe da, dest bi xwendinê kirîye, li kîjan medereseyê, li bal kî, li kê derê, xwendîye, ji bo temamkirina xwendina xwe, çûye kîjan medreseyan, li çend herêm û çend bajarên Kurdistanê gerîyaye, ji kî, li kêderê, di çi tarîxê da îcazetname standîye, li kê derê ders daya, di çi salî da dest bi nivîsarîyê kirîye, berê çi nivîsîye? derheq wan hemû xusûsan da, tu belge û tu wesîqeyên qet'î, tunene.

Lê, bi devkî wiha rîwayet dikin, dibêjin, ku **Xanî,** ji medresa **Mûradîyye ya** Bazîdê, dest bi xwendinê kirîye, ji boyî temamkirina xwendina xwe, çûye Exlat û Bidlîs û Ûrfa (Rûha) û Cizîra Botan, çûye Sûrîya û Misrê û Stenbolê jî, piştî temamkirina tehsîla xwe ziviriye Bazîdê, li wê derê ders daye û dest bi nivîskarîyê kirîye. Ku mesnedê raveker û wergerker û şirovekerên (şarih û mutercim û mufessirên) Memo-Zînê û nivîskarên jiyana Xanî jî, ev riwayet û gotinên bi devkîne; di destê tu kesî ji wan da jî, belge û wesîqekî qet'î nîne. Lê merif dikare bibêje: Ku bêguman

---

(3) *Hesabê ebcedê*: hesabekî bi taybetîye, bi angorî tîpên elîfbêya Erebîye, di şîir û lexez û tarîxan da, tê bikaranîn. (Ji kerema xwe ! li şerha dîwana Xanî, rûpela (157) mêze bikin).

(4) Belkî dibe: (1121) ê hîcrî, ku ew jî beraberê (1709)' ê Mîladî ye, ji ber ku herfa (B), di kelîma (Rebbîhî)' yê da, bi şedde ye, du (B) ye, ne yek e, ku bi wî îtibarê, tarîxa wefata Xanî ku bi cumleyê (tare Xanî îlla Rebbîhî) hatîye îfadekirin, dibe (1121), neku dibe (1119) e. Bi rastî, ez heyret dikim! Ku çawan mamosta Seccadî û Dr. Mûstafa Resûl û yên wekî wan, ji wî heqîqetê xafil bûne.
(Tare= 210, Xanî = 661, îla = 41, Rbbh = 209, = (1121 H. = 1709 M.); **A. Durre**

(5) El Edebul Kurdî, rûpel 190 - Seccadî

Xanî çûye Cizîra Botan, pirr jî lê maye. Belge û wesîqa wî jî, Memo-Zîn bi xwe ye. Lewra Xanî di Mem-Zîna xwe da, coxrafya bajarê Cizîrê, navên cîh û mekanên wî, seyrangehên wî, bi terzekî pirr deqîq û rast, teswîr û beyan dike. Ev jî dide nîşandayîn ku Xanî bizzat li wan deran geriya ye û dîtiye.

"Westanî" û "Nergizî" û "Seqlan"
"Derwaze" û "Omerî" û "Meydan"
Van seyregehan tu lê dikî geşt
Ez mame, ji bo me ra der û deşt

Hinek ji mamostayên, ku Memo-Zîn tercume û şerh û şirove kirine, gotine ku **"Xanî"**, ji çardesalîya xwe da, dest bi nivîsandinê kirîye (bûye nivîskar), Memo -Zîna xwe jî di salekî da (1694/95 z.) nivîsîye, hinekên din jî gotine : ku di sê (3) salan da qedandîye, hinekan jî gotine : di sî (30) salan da qedandîye. Ku ev hemû jî texmîn û îddiayên bê mesned in, mehsûlên bê diqqetî û çewt fêmkirinên wan muhterema ne, bi taybetî, ewên îddî'a dikin ku **"Xanî"** di salekî da Memo-Zîn qedandiye, delîl a xwe jî bi vî helbesta **Xanî** :

Înaye nîzam û întîzamê
kêşaye cefa ji boyî 'amê

anîne û gotine : kelîma عامی "'amê" bi me'na "salekî" ye, ku bi rastî jî ew bê diqqetî û xeletîyekî gelek mezine; lewra kelîma " عامی = 'amê" di wê helbestê da, ne bi me'na salekî ye, belkî bi me'na ûmûmê xelkê ye, bi me'na hemî kesa ne, ku xulasa me'na wê helbestê, digel helbesta di pey wî ra, wiha ye : **Xanî,** ji boy ûmûmê xelkê, ji boy hemî kesan, zehmet û cefa kişandîye; Memo-Zîn tenzîm kirîye, çêkirîye ku gelên bîyanî nebêjin: Kurd bê zanîn û bê çand û kulturin; bê hîm û bingehin (bingehê wan ê zanîn û kulturê tune),

Da xelqê nebêjtin, ku Ekrad
bê me'rîfetin, bê esl û binyad

çawan, ku di vê beyta dîwana Xanî da jî :

Ezim serxweş ji wê camê, ezim riswa di nêv 'amê
Ezim e'nqa ketim damê, bi zulfa ser li xal danê

kelîma "عامی = 'Amê", bi me'na "'ûmûmê xelkê" ye. Bi ma'na hemû însana û hemû kesane.

Ewên ku wiha îddîa dikin û dibêjin ku **Xanî** di çardesalîya xwe

da bûye nivîskar, Memo-Zîna xwe jî, di sê (3) salan da, yan jî di sî (30) salan da qedandîye û delîla xwe jî, bi vî tînin: ku **Xanî**, di dawîya Memo-Zîna xwe da wiha gotîye:

Xettê teye sernuwuşt û sermeşq
Sî sale xetê xeta diket meşq
Lewra ku dema ji xeybê fek bû
Tarîxê hezar û şêst û yek bû
Îsalî gihişte çil û çaran
Wî pêşîrewê gunahîkaran

Ew jî çewt û şaşin, me'na van helbestan jî çewt fêm kirine, çewt şirove kirine.

Ji boy ku mesele rind zelal bibe! Divê ku -wek kurtepêşekekî- em çend nuqte û xalan îşaret bikin! Ku di binê ronahîya wan da, bi hêsayî bikarîbin : bighîjin me'na û meqseda heqîqî :

1- Bi angorî dînê Îslamê: "însan heta ku balix nebe, heta zarok be, ne mukellefe, ji kir û karên xwe ne mes'ûle, gunehkar jî nabe; ku hedd û tuxûbê normal jî, ji balix bûyînê ra (ji hukme mêrîtî û hukme jinîtiyê ra) çardesal e".

2- Bawerîya Xanî ya bi "qeder"ê, nêzîkê fikr û bawerîya mezhebê "Cebrîye"ye, ku xulasa wî jî eve: "hertişt bi angorê teqdîra îlahî ya ezelî, teheqquq dike; însan di hemû kir û karên xwe da, mecbûr û mûzterre; ne bi îxtîyarî û îrada xwe ye."

3- Di gel ku fikra Xanî nêzîkê bal mezhebê cebrîye va ye jî, lê -bi zahîrî be jî- Xanî ji daîra bawerîya mezhebê sunnî (Eşe'rî û matûrîdî), naxwaze ku derkeve; ji mesûliyetê jî nareve.

4- Xanî, di fesla (di beşa) dawîya Mem û Zîn a xwe da, bi terz û ûslûbekî temsîlî (bi ûslûba hempeyvîn û guft û goya bi Neyy û Qelemê ra), însan wekî qelema di destê katibê da, dide nîşan û teswîr dike; lê dîsan jî ewî mes'ûl dibîne.

5- Xanî, di dawîya dawî da, berê xwe dide **Xwedê** û jê wiha daxwaz û niyaz dike, dibêje: "Ya rebbî ! Tu dizanî ku Xanî yê jar û belengaz, wekî qelema di destê katibê da ye, ne bi kêf û îrade û îxtîyariya xwe ye, tu tişt bi destê wî nîne, belkî mûqeyyed û girêdayê bi hukm û fermana Te ya ezelî va ye" :

Yareb, Tu dizanî Xanî yê jar
Teşbîhê bi xameya giriftar
Qelbê wî di dest Te da ye Elheqq !
Destê wî di dest xwe nîne mûtleq

û dewam dike, dibêje: Ya Rebî ! Ez qesem bi zatê Te dikim! Ku meqseda Xanî, ji sipîyî û reşayîyê Tu yî, nîyyeta wî Tu yî, her tiştên wî bi Te ye, ji bo Te ye, lê Xanî gelek ji sehîfeyên 'emelên xwe (rûpelên deftera kir û karên xwe) jî, bi hubra qebahet û gunehan rûreş kiriye (gelek xeta û guneh kiriye), sernuwuşt û sermeşq (program û te'lîm name) xetê Te ne (ji nivîsên qelema qudreta Te ne), Te nivîsîne ku em li ber wan meşq bikin, bi `angorî wan binivîsin, lê ev sî (30) sale ku Xanî, ewî xetê (ewî sermeşqê), çewt û xeta meşq dike, wekî wî nanivîse, muxalifê wî hereket dike. We yan, ew sî sale ku Xanî, neqş û xetên xeta û gunahan, meşq dike (xeta û çewtîyan dike); Çirra sî sale, (ne kêm û zêde ye) ? Lewra ku dema Xanî ji xeybê fek bû (dema ku ji 'alema nexuyabûyînê, qetîya, vebû, eşkere bû, ji dîya xwe bû), di wê demê da, tarîxa hîcrî, hezar û şêst û yek bû -1061 h- (1650-51'ê mîladî), îsal jî Xanî yê ku pêşîrewê gunehkara ye, gihiştîye çil û çar salan, (temenê wî bûye çil û çar sal) ku ji çil û çaran, çarde salên zarotîyê (ku însan di wan salên zarotîyê da ne mûkellef e) derkevin, dimîne: sî (30) sal.

Wellah ! Ji sefîlî û siyahî
Wî qesd û xered Tu yî îlahî !
Emma bi murekkeba qebaîh
Rû reş kirin gelek sefaîh

Xettê Te ye sernuwuşt û sermeşq
Sî sale xetê xeta diket meşq

Lewra ku dema ji xeybê fek bû
Tarîxê hezar û şêst û yek bû
Îsalî gihişte çil û çaran
Wî pêşîrewê gunahîkaran

Xanî, bi van helbeste yan, di gel yên di pêşîya wan da, rewşa xwe û sernuwuşt û sermeşqa îlahî, rewşa gunehkarîtî û mûkellefîyet û mesûllîyeta xwe ya sî (30) salî, beyan û teswîr dike, teleb û nîyaz dike ku Xwedê qebahet û gunehên wî bibexşîne! Ku meqseda Xanî ya heqîqî ewe; lê di zumnê beyana vî meqseda heqîqî û esasî da, sala bûyîna wî ya ji dayîkê û tarîxa qedandina Mem û Zînê (1694/95m) jî îfade bûye, hatîye îşaretkirin.

Belê, tarîxa destpêka nîvîsandina Mem û Zînê û destpêka nivîskarîya Xanî, ne bi serîlhî û vekirî, ne jî bi zumnî û sergirtî, ji wan dernayê, bi tu awayî jê nayê fêmkirin.

Lê mee'lesef! wilo dixuyê, ku mamostayên 'ezîz û hêja, (şarih û mutercimên Memo-Zînê), ji bê diqqetî û negîlhîştina me'na û naveroka heqîqî ya van helbesteyan, meqseda Xanî çewt û şaş fêm kirine, ku wan texmîn û îddîayên xwe yên çewt û şaş jî kirine; çewt şirovekirine; çewt nerxandine, qenc tevlihev kirine, baş gevizandine!.

Ku çewtîya herî mezin jî, ya wan muhteremane ku "sî"(30), bi "sê"(3) îltibas kirine, gotine *"sê sale xetê xeta diket meşq"*, ji ber ku ewan bi wî çewtîyê, helbesteyan bi temamî, ji meqsed û mecrayên wanên heqîqî û rast, dûrxistine û guhêztine, bê naverok û bê me'na hiştine; ku bi wî tehrîfa wana çewt û şaş, îrtîbata di navbera wan da, girêdana wana terkîbî û me'newî bi hevra jî, bi temamî ji ortê radibe, lawaz û nepijîyayî dimînin.

Mîrasa Xanî

Herwekî hemû mûtefekir û zanîyarên cihanê, Xanî jî mîrasekî 'îlmî û edebîyê pirr bi rûmet û hêja di pey xwe ra hêştîye :

1- Ferhenga 'erebî û kurdî (Nûbihara Piçûkan)

2- Eqîda Îmanê (Bawerîname)

3- Mem û Zîn (Dasîtana evîndarî û gelperwerî û welatparêziyê, xezîne ya edebîyat û çand û folklor û kelepûra gelê kurd.)

Ku ev hersê eser û berhemên giranbiha jî, mewzûn in û hatine çapkirin û belavkirin, di medreseyên Kurdistanê da, tên xwendin, li bal gelê kurd. Gelek bi rûmet û pîroz in.

4- Şerîeta îslamê ku bi zimanê kurdî hatîye nivîsandin (bi angorê bihîstina min, ew şerîeta bi zimanê kurdî ku ji alî **Xelîfe Yûsifê Celalî** (1885-1965) da, bi navê (tuhfetul 'Amîlîn)ê hatiye çapkirin û belavkirin, ew berhem a "Xanî" ye, navê wî yê eslî (tuhfetul 'Ewam) bûye, ku ewî zatê muhterem, navê wî guhestîye, li ser navê xwe çap kirîye û belav kirîye.(6)

Eger ev bihîstina me rast be, yanê: Eser, ya Xanî be, Xelîfe Yûsifê rehmetî ! Wek ya xwe, dabe nîşan; eger ku wilo be, Xelîfê rehmetî ne qencî û qencîyekî pirr mezin, bi hev ra kirîye, *"Xwedê bibexşîne û jê razî be"*.

---

(6) Hem ji boy tehqîqa vê meseleyê, hem jî, ji boyî şandina sûretên nivîsarê li ser kevirên dîwarê mescîda Xanî ya xirabeya nêzîkê qela Îshaq paşa, min telefunê Stenbolê kir, ji mele Mûsa yê Celalî, tehqîqa meseleyê xwest ku ewî hevalê hêja bersîva min wiha da, got Seyda! Melakî hevale me, li Bazîdê heye. Ezê bi wî ra biaxifim, ewê tehqîq bike û ji we ra faks bişîne, ku piştî çendekî, di vê tarîxê da (29.07.1998), wî melayê hêja faksekî wiha ji min ra şand:

Lê eger ku ewî zatê muhterem, xwestîye ku li dû şopa Xanî here; îlhama xwe ji wî girtî be, wekî wî bi zimanê kurdî, ewî eserê hêja te'lîf kirî be û ji gelê xwe ra pêşkêş kirîye, ji xwe ew xizmet û qencî û xêrekî herî mezin û hêja û pîroze ku ewî zatî kirîye.

5- Dîwana helbestan (ku di cara yekemîn da, Xwedê berhevkirin û teshîhkirin û şerhkirin û çapkirina wî nerx û rûmeta bê hemta û hêja, kirîye nesîbê me). (*Xwedê me ji feyz û bereketa wî fazilê kamil mehrûm neke. Amîn..!*)

6- Wek xewnê şevan tê bîra min ku li bal Bavê min ê rehmetî ! **Yûsif-Zelîxakî**, bi destnivîsekî pirr qenc û xweşik hebû. bavê min digot ku ya **Xanî** ye", lê mee'lesef! Sed mixabin! ku ji tirsa deselatên kemalîstên har û barbar, ewî esera pirr bi qîmet û rûmet di koşeyên banê xanî da, di binê xwelîyê da vedişart. Ku belgên wî yên pîroz haşifîn û rizîyan, parçeyên wan hatin şewitandin û îmhakirin.

Ku bi angorî vî bîrhatina min, eserê **Xanî** yê şeşemîn jî, **Yûsif Zelîxa** ye; lê gelek jî dîrokvan û lêkolînvanên hêja jî gotine ku ew Yûsif Zuleyxa ya kurdî, eserê **Selîmê** kurê **Suleymane** ku ew hemdemê **şerefxanê Bidlîsî**, dengbêj û şairê **mîrşerefê** mîrê

(Muhterem hocam! Evvela selam eder ellerinden öperim Cenabı Haktan sıhatler dilerim, sormuş olduşunuz suallerin cevapları şöyledir:
1- Halife Yusuf'un kitabının, Ahmedê Xanî'nin kitabı olup, olmadığı hakındaki konuyu, oğlu şeyh Muhammed'den sordum, ondan aldığım cevap şudur: Rahmetli pederim, kitabı daha hat iken, ismini 'Kifayettül Avam' koymuştu. Sonra kitabını baskıya verirken adını 'Tuhfetul Amilin' olarak değiştirdi. Muamelat ile ilgili bazı ilaveler yaptıktan sonra ikinci kez Ankara da 'İrşadul 'Îbad' olarak baskısını yaptı.
Velhasıl: Ondan aldışğımız bu malumata göre: Elimizde bulunan 'Kurdi' diye de adlandırılan 'İrşadul Îbad' kitabı bizzat Halife Yusuf'un kitabıdır, ayrıca şafii mezhebinin fıkhında 'Tuhfetul Amilin, Îrşadul Îbad' Hadis ile ilgili olarak da 'Tuhfetüz Zakirin' Hutbe, Takriz, Tuhfetus Sibyan gibi eserlerde yazmıştır. Nihayet 1965 yılında 80 yaşında iken, fani dünyadan göç etmiştir, vefat etmiştir.
2-Xanı babanın eski camisinin duvar taşlarındaki yazılarda söyledir:

Mehza esera xeyrê, ne di hatî ji dest Ehmed	محضا أثرا خيرى نَدْهاتي ژدست أحمد
Tewfîqê Xuda ya wî da Padîşehê Emced	توفيقِ خودايا وي دا پادشهى أمجد
Gulbangî ji xeybê hat, ev renge ku bu tarîx	گلبانگى ژ غيبى هات أف رنگه كو بو تاريخ
"Me'bûdî înayet kir û çê bûyî ev me'bed"	«معبودى عنايت كر و چى بوي أف معبد»
Hatifî, an duxtî mara nagîhan dersamî'e	هاتف آن دختى مارا ناگيهان در سامعه
Cami'ê tarîxê lefzê 'esselatû camî'e	جامعِ تاريخ لفظِ الصّلاة جامعة
(Esselatû Camîetun)	«الصّلاة جامعةٌ»

Ku di misra'a dawîya helbesta ewwel da (me'bûdê înayet kir û çêbûyî ev ma'bed) û di cumleyê (Esselatu Camîetûn)'a helbesta dudîyanda, bi angorê hesabê ebcedê, tarîxa mescîda Xanî hatîye şifrekirin, ku (1117)' yê tarîxa Hîcrîye, ew jî beraberê (1705) ê tarîxa Mîladîye). Di metnê faxê da, di wan herdu şîiran da jî, hinek xeta û çewtî hebûn. Lê me teshîh kir û rastîya wan nivîsî.

Hîzan bûye (qirna 16-17 m.)

7-Hinek ji lêkolînvanan jî gotine: ku destana **Leyla û Mecnûn** a **Xanî** jî hebû ye. Wek ku **Harîsê Bidlîsî** jî destana (**Leyla û Mecnûn**) ê nivîsîye. M. Rodînko jî, tercem û çap kirîye.(7)

Di dema Xanî da rewşa Kurdistanê :

Di dema jiyana Xanî da (dawiya qirna şanzda=16, destpêka qirna huvda=17), Kurdistan di rewşek pirr tevlihev û şêlû da bû, bi peymana **Qesra şirînê** (1639 m) di navbera barbarên **Osmanîyan** û **Sefewûyên** şîî'yên Îranê da, hatibû parçekirin û parve bibû. Piştî wê peymana mel'ûn, hemî mîrnişîn û begnişîn ên kurdan, ji alîyekî da, bi Osmanî û Sefewîyên dagîrker û xûnxwar ra, ji alîyekî din da jî, -bi fîtne û fesadî û hîle û dek û dolabên wan cenaweran- bi hev ra, di ceng û cîdal û şerr û şoriş û cerd û talanên bê însaf û hov û dijwar da bûn.

Kurdistan, di navbera wan hov û haran da, -bi destê 'ewan û fesad û bêhiş û kûtxwaran-, bibû wek gola xwûnê, bi pêl û lem û şapolên civakî û sîyasî, dikelîya û ser û bin dibû.

Xannişîna Kurdistanê ya dîrokîya mezin, (Xannişîna Bidlîsê), ji alî yê barbarên Osmanîyan da, bi destê Melîk Ehmed Paşa (walîyê eyaleta Wanê, zavayê sultan Muradê çaremîn), di (1066 hj = 1665/6 m.) da, hatibû îstîla kirin û yaxma kirin(8) ku bi vî awayî jî, fikr û xebat û daxwaz û emel û hêvîyên **Emîr Şerefxan** (..1533 m) ê bapîrê **Ebdal Xan**, (ku di dema xwe da -derbareyê yekbûyîn û hevgirtina mîr û xanên Kurdistanê da- damezirandina Kurdistanekî hevgirtî û aza da fikirî bû teşebis kiribû) bê xwedî mabûn.

Kela **Demdemê** (**Dimdimê**), (ku yek ji destanên tarîxîyê qehremanîya Kurd û Kurdistanê ya namîdar û nemir bû) jî, ji alîyê şîî'yên Îranê da, hatî bû îstîla kirin, bi cenawerî û hovîtîyekî nedîtî

(7) Bi angorî agahdarîya Prof. Qanadê Kurdo, di pirtûka xweya bi navê tarîxa Edebîyata Kurdî (rûpel 122): "Harisê Bidlisî: Di sala (1756 m) da, hatîye dunê, lê tarîxa wefata wî, nekifşeye."
Bi angorî A. Jaba û M.B. Rodînko (Rûdenkoy), ji bilî destana Yûsuf Zelêxayê, destana Harisê Bidlîsî ya Leyla û Mecnûnê jî heye, destana Yûsuf Zelêxayê jî, di qirna (17-18 an da), di medreseyên Kurdistanê da, yek jî kitêbên dersê bûye. Hem jî dibêjin, ku Yûsuf Zelêxa ya Harisê Bidlîsî, kopya Yûsiuf Zelêxa ya Selîmê Sulêmane.
Ku Merif dikare wiha jî bifekire û bibêje: 'Dibe ku ew, kopya Yûsif Zelêxa ya Xanî be jî, çawan ku îhtîmal e 'îrşadul îbad'a Xelîfe Yûsifê Bazîdî jî, kopya û teqlîda şerîe'ta Xanî be".
(8) Ku ewî hovê barbar, 72 eserên (te'lîf û destnivîsên) 'Ebdalxanê Nebîyê Şerefxan, digel çar hezar kitêbên îlmî û felsefî û edebîyên din, yaxma û îmha kir, xezîna Xan 'Ebdal jî, ku barê heft (7) deveyan bû, talan kir û bir. Ku ji xwe di dîroka Osmanîyan da, ewî seyê harr, pirr hovîtiyên wilo kirîye, karê wî tim barbarîtî bûye.

hatîbû wêran kirin (1071 H.). **Serok Emîrxanê Çengzêrîn (Yekdest)** û leşkerên wî hemû, bi qehremanî şehîd bibûn (ku Xanî, di wî tarîxê da, deh (10) salî bû).

Xîyanet û fesadî û 'ewanîtî jî, bi hemû rewş û cûrên xwe, di rewacê da bûn; pirrên beg û mîr û axa û deselatên Kurdistanê, bibûn alet û lîstokên destê neyarên hov û har; mîrnişîn û xannişîn û begnişînên kurdan, yek bi yek ji alîyê wan xûnxwaran da xirab dibûn, ji nûve çêdibûn, dihatin guhestin, dihatin wêrankirin. Ku bi kurtî: Kurdistan bibû wêranistan, xûnrêjistan, hovistan. jenosîdistan. Lê digel van keşmekeş û texrîbat û tevlihev bûyînan jî, di nav beglik û mîrlik û deselatên Kurdistanê da: aborî (ekonomî) û hunermendî, gelek pêşve çûbûn, sermaye û pol û pere, kom bibû, (bi taybetî di **Cizîra Botan** da, ku di wê demê da serbixwe û aza bû).

Ji xwe **Cizîra Botan,** di qirna Xanî da, di qirna berîya Xanî da jî, yek ji navendên mezinên hereketa pêşveçûyîna millî (netewî) û edebî (wêjeyî) û aborî û civakî û rêzanî û bazirganî û hunermendîya kurd û Kurdistanê bû, medarê îftîxar û şahnazîya wan bû, merkeza medrese û zanîngeha edebî û şî'rî û helbestevanîya nuh bû, ku hîmê wî medreseya hunermendî, ji aliyê **Elîyê Herîrî** (1425 - 1490 m.) û **Feqîyê Teyran** (1590-1660 m.) û **Melayê Cizîrî** (1570-1640 m.) da hatibû avêtin (hatîbû danîn) armanc û daxwaza wî Medresê jî ev bû ku "**Cizîra Botan**" bigeıîne merkeza yekbûyîn û yekîtîya zimanê edebî û şî'rî ya kurdî; yanê: Lehca kurmancîya "**Botan**", bibe zimanê edebî (wêjeyî), zimanê şî'rî ji boyî hemû Kurd û Kurdistanê ra.

Melayê Cizîrî, taybetîyên medresa farisî ya **Hafizê Şîrazî** (1320-1389 m.), bi zimanê kurdî (Kurmancî ya Botan) dihûna, bi rewşa Botanî dîyar dikir, gelek hunermendîyên edebî û wêjevanîyên giranbiha û hêja, gelek nerx û qîymetên nadîde û taze û nû jî, lê zêdekiri bû, ku bi wî karê xwe yê mezin û giring jî, karîbûye nav û dengê xwe, ji herêma **Botan** bigihîne hemû herêmên Kurdistanê û bi şahnazî û serbilindî bibêje:

Gula baxê Îremê Botan im
Şebçiraxê sebê Kurdistan im (9)

Di cîhekî dinê dîwana xwe da (ew diwana wî ya ku belge û ayatên wêjeya klasîkîya Kurdî ya bê hemta ye) jî, wiha dibêje:

(9) **Îrem** : Navê bajarê qewmê **'Ad** e, ku di dema xwe da pirr bajarekî xweş û şên bûye, wekî bihîşta ser rûyê zemîn bûye ; bi angorî hinek efsaneyan jî: Îrem -li herêma **Ehqafê,-** (di navbera Suudî û Yemenê da ye) cenneta ser rûyê zemîna qewmê Ad bûye.

Ger lu'lu' ê mensûrê ji nezmê tu dixwazî
Wer şi'rê (Melê) bin, Te bi şîrazê çi hacet?!

Yanê : Eger tu êncîyên liblibî û reşandî, dixwazî, were helbestên "**Mela**" bibîne (li cemal û kemala wan mêze bike), çi îhtîyacîya Te bi bajarê - **Şîrazê** û edebîyata **Se'dîyê Şîrazî** (1189-1291m) û **Hafizê Şîrazî** (...-1389), heye (durr û êncîyên **Mela** û edebîyata wî, besî Te ye.)

Ku bi rastî jî, di warê sene't û hunermendîya wêjeyî (edebî) da, di şiir û helbestên kilasîkî da, kêm kes xwe digihînin **Melayê Cizîrî**, ew şahê textê wî hunerê edebî ye.

Lê ev jî rastîyekî dîrokîye, ku ew medrese û ekola **Cizîra Botan**, bi diyarbûyîna edîb û şaîr û mûtefekkîrekî wek **Ehmedê Xanî**, gihîşîye zirweya (kilawa) herî bilind, hereketa wêjeya netewî, fikra millî ya damezîrandina dewletekî kurdistanî yê serbixwe û aza, ji wî pîrê millî da, dest pê kirîye. Ev jî rastîyekî din e, ku tixûb û hudûdê dewletekî kurdistanî ya hevgirtî û serbixwe û aza, sedsalan berîya **Xanî**, di **Şerefnam**a rêzan û dîrokvanê mezin "**Emîr şereffedînê Bidlîsî**" da hatîye kifşekirin, Xerîta wî hatîye kişandin : *"ku di wê demê da hêj li tu derê cîhanê jî, dewletekî qewmî û millî tune bûye, belkî dewletên herêmî, bi şeklê împaratorîtî û beklîktî û xanîtî û mîrîtiya malbatîtî hebûne, ji ber ku dewletên millî di Europayê da, piştî şorişa Fransa (1789) peyda bûne".*

Belê, pîrê wêjeya netewî ya kurdistanê, hunermendê şareza "**Ehmedê Xanî**", di wê dema pirr bi pêl û lem û şapolên cûr be cûrên sîyasî û civakî û çandîyên Kurdistanê da, dema ku fîtne û fesadî û keşmekeş û ceng û cîdal û cerd û talan û texrîbatên dijminan û bê îttîfaqî û dijhevîtîyên beg û mîr û xan û ferman bi destên kurdan gihîştibûn hedd û tuxûbên dawîyê, di wî dem û wextê tevlîhev û şêlû da, xameya 'ezm û îrade û bîr û bawerîya xwe ya netewî (millî) hildide û dest bi nivîsandin û amedekirina reçeta nexweşî û kul û derd û êş û elem û çîk û janên dilê xwe yê ku bi birîna kurd û Kurdistanê birîndar bibû, dike û wî reçeta xwe ya pîroz (destana Mem û Zînê) dinivîse, wek nerxekî tarîxîyê pîroz, ji gelê xwe ra pêşkêş dike, ku bi rastî jî **Mem û Zîna Xanî**, ne bi tenê destanekî edebî û hunerî ye, belkî ***"rehber û fihrista nerxên kurdîye, felsefe û jîne, îşq û ewîne, nalîn û girîne, deng û benge, rewş û ahenge, govend û dîlane, geşt û seyrane, sersal û Newroze, cejn û pîroze"*** ku :

Memo : remz û nîşana gelê kurd ê dilbirîne ;

Zînê: Kurdistana rengîn û xemgîne. **Îşq** û agirê dilê wan: îşqa welat û agir û pêtên azadîya wî ne;

Beko: Fesad û 'ewanin, **Tacdîn û Çeko** jî, cengvan û nijdevanin, şorişker û şorişvanin.

Bade û mey: Azadî û serxwebûna welate.

Saqî: Ferman bi dest û deselate. Yanê bi kurtî: "destana Mem û Zînê, dîroka kurd û Kurdistanê ya zindî ye, şanoya wî ya nivîsîye. Arşîv û xezîna kelepûr û çanda wî ye. Reçeta derd û dermanê wî ye, wek Kurdistanê zengîn û rengîne. Gulîstana gul û beybûnên dilên bengîne, hêsirên çavên **Xanî** û kêsirên dilê wî ne", ku wiha rêtîye û rotîye, wiha hûnaye û gotîye :

Saqî bide min şerabê gulgûn
Bê dengê def û sedayê Qanûn
Da şehne û muhtesîb nebînîn
Şahî bi civin çu xem nemînin
Teşbîhê neyê bikim terennum
Tûtî sifet, ez bikim tekellum
Şerha xemê dil bikim fesane
Zînê û Memê bikim behane
Nexmê wî ji perdeyê derînim
Zînê û Memê ji nû vejînim
Derman bikim ez, ewan dewakim
Wan bê mededan ji nû ve rakim
Ev renge bikim ji nû serefraz
Da bêne temaşeyê nezerbaz ([10])

Û "*çîroka xem û derd û kulên dilê Xanî yê xemgîn e*", ku ew xem û keder û keserên dilê wî jî, eve ku, "*gelo! çira herkes, her millet, xweyî dewlet*

---

(10)

Gulgûn: Gulreng, rengsor
Qanûn: Aletekî sazbendîyê ye
Şehne: Panok, parêzvan,
Muhtesib: Yê ku hesab dibîne, polês, zebtî
Çu: Tu, qet, yek
Terennum: Dengbêjiya xweşik, xweşdengî
Tûtî: Perendekî ye, ku teqlîda dengên merifan dike, cûrekî ji papaxana ye
Tekellum: Axiftin
Şerh: Îzah, beyan, rave
Fesane: Fisane, hikaye, çîrok
Behane: Bihane, sebeb, wesîle
Perde: Aheng û dengê sazbendiyê, ahenga mûsîqîyê
Jînim: Bijînim, sax bikim
Bêmeded: Bêhewar, bê îmdad
Evrenge: Bi vî rengî, bi vî terzî, wiha
Serefraz: Serbilind
Nezerbaz: Temaşevan, mêzekerê bi kêf û xweşî

û seltenete, hurr û aza ye, lê belê gelê kurd hêj ne aza ye", hêj di xew da maye û razaye?" Ku Xanî ji wî bêtaliî'tîye jî, pirr heyret dike, 'ecêb dimîne, bi tu awayî ewî hezim nake û pirsa sebeb û hîkmetê wî, wiha dike û dilûvîne :

Ez mame di hîkmeta Xwedê da ;
"Kurmancê di dewleta dunê da
Aya bi çi wechî mane meh'rûm ?
Bil cumle ji bo çi bûne meh'kûm ?"

Yanê : Ez di vî sirr û hîkmetê Xwedê da şaş mame, ku gelo ka sebebê wî çîye **Kurmanc** (**Kurd**), di dewlet û selteneta dunyayê da, meh'rûm û bê par mane (dewleta wan tune) gelo ji boy çî ye Ku meh'kûm û bindest mane ? Digel ku her mîr û her camêrekî wan, di camêrî û comerdîya xwe da, wek '**Hatemê Taî** ne, her mêr û mêrxasekî wan jî, di cesareta xwe da, wekî **Rostemê Zal** in:

Her mîrekî wan bi bezlê Hatem
Her mêrekî wan bi rezmê Rostem
Hindî ji cesaretê xeyûrin
Ew çendî ji minnetê nefûr in
Ev Xîret û ev ûlûwwê hîmmet
Bo manî'ê hemlê barê minnet
Lew pêkve hemîşe bê tifaqin.
Daîm bi temmerud û şiqaq in (11)

Yanê : Her mîr û xanekî Kurdan, di merdîtîya xwe da, wekî **Hatemê Taî** ne (ku meşhûrê bi sexawet û comerdîtîyê bûye), her mêr û mêrxasekî wan jî, di jîrîtî û mêrxasîtîya xwe da, wek **Rostemê kurê Zal** in, bi qasî ku ji cesaret û mêrxasîtîya xwe da, bi xîretin, ew qas jî, (bi angorê wî jî), ji minnethildanê, nefret dikin (ji tu kesî ra tu minnet û paxavê nakin, serê xwe ji kesî ra, bi taybetî ji hevra danaynin).

Ku ev xîret û ev bilind himmetîya wan bûye manîyê hildana wan

(11)
Bezl: Dayîn û baxşîş
Rezim: Jêhatîbûyîn, Hêz û quwwet
Hindî: Bı qasê, bi qederê
Cesaret: Bê tirsîtî. jêhatîbûn
Xeyyûr in: Pırr bi xîret in
Evçendî: Evqas jî, bi qasê wî jî
Xîret: xîret, namûs
Ûlû: Bilindayî
Ûluwwê hîmmet: Hîmmetbilındîtî, alî cenabîtî
Hîmmet: 'Ezm û îrade û xwastin û vayîna bi dil û can
Manî: Dıjdar.
Hemil: Hıldan, hılgırtin, hilgirtına baran.
Nefûr in: Pırr bı nefret ın
Lewra: Ji boy ku
Pêkve: Bi tevayî, hemû bı hev ra
Hemîşe: Daîma, her dem
Temmerud: îsyankırın, serhıldaniya lı ber hev
Şiqaq: Parçebûyîn, îxtîlaf.

ji barên minnetê ra (minneta tu kesî hilnagirin, serê xwe ji hevdû ra danaynin). ([12])

Xanî piştî vê tesbît û teşxîsa pisporî û balkêş, , bi terzekî felsefîyê pirr kûr û dûr, pirr ma'nîdar û bilind, evê heqîqet û rastîyê jî teşxîs û tesbît dike, ji kezeba xwe dinale û dibêje ku: "Xûy û qerekterên siroştî û nijadîyê Kurdan, hîmmet bilindîtî û mêrîtî û şêrîtîya wan, bûye wesîle û sebebê ne neîttîfaq bûyîn û ne li peyhev çûyîna wan".

Xanî, sebebê ne azadîya wan û tunebûyîna dewleta wan jî, ewî dibîne û bi dilekî şewitî, wiha dibêje :

Ger dê hebûya me îttîhadek (*)
Vêkra bikira me înqiyadek
Rom û Ereb û Ecem temamî
Hemyan ji me ra dikir xulamî
Tekmîlê dikir me dîn û dewlet
Tehsîlî dikir me îlm û hîkmet

Bi wî awayî jî, hem Mamostatî û pîrîtîya xwe ji şî'r û fikra netewî (millî) ya kurdî ra dîyar dike, di rûpelên dîroka kurd û Kurdistanê da neqş û nîgar dike, hem jî derd û kulên xwe dirêje, coş û xuraşên derya dilê xwe wiha teswîr dike û dibêje :

Da zennebirin ku em xem û şîn
Em beste dehan û di xuroşîn

Ev jî heqîqet û taybetîyekî pirr bi qîmet û bi rûmet e, pirr bilind û bala ye, ku ew pîrê wêjeya netewîya kurdî, ew aşiqê azadîya Kurdistanê, bi her qedehên meya azadiyê razî nabe, bi her cûrên durr û yaqûtên wê xezîneya pîroz jî qayîl nabe, belkî, xwe

(12) Dr. **Friche** û Muh. **Rawlog**, -dı rûpela 79 an, ji pirtûka xwe ya ku Muduriyyeta Mûhaceratê Ûmûmî ya Dewleta Osmanî, ewî bi navê "Kurtler" ê di tarîxa 1916an da tercume kiriye û li Stenbolê hatiye çap kirin-, dibêjin ku: "Bir millet devlet olduktan sonra, dağılıp derebeyliklere ve aşiretlere dönüşürse, bir daha kendini toparlayamaz ve devlet olamaz. Örneği Kürtler." = (Milletekî ku bûbe dewlet û dı pey ra bela bûbe û ziviribe bal sîstema mîrnîşîn û xannîşîn û eşîretan va, ew millet îdî nikare bibe dewlet. Wekî gelê Kurd.)
Ev dîtin û fikra van herdû pisporan, wekî şirove û şerh û îzaha wî teşxîs û bîr û baweriya Xanî ye. Ev jî rastîyeke din e ku kurd û cuhû dı pirr tiştên tarîxî da wek hev in; (ji xwe dı Îbrahîm **Pêxember** da digihîjin hev jî) **cuhû** jî, berê dewlet bûn, ji hev belav bûn bi hezar salan wilo belav bûyî û perîşan man, di dû ra xwe topî ser hev kirin û bûn dewlet. Baweriya min ev e ku wê gelê Kurd jî wilo be. Ji xwe rewşa Kurdan di van salên dawî da wek rewşa cuhûyan ê 40-50 salên berê ye.

(*) **Îttîhad :** Yekbûyîn **Înqîyad :** Serîndanî û îtae'tkirin

berdide derya dîroka gelê xwe ya kûr û dûr û bê payan, ji nav durr û gewherên wî yên giranbiha û hêja, ya herî bi qîmet û bi rûmet hildibijêre û diniqîne, ku ew jî, azadîya dema **Pêşdadîyan** (**Gûtîyan**) e, ji wî demê jî, azadî ya dema padîşah û hukumdarê wanê herî mezin (**Cem-Cemşîd**) ji Kurdistana xwe ra dixwaze û Dihebîne, qedeha bezma wê meyê hiltîne, ewî laîq û munasib dibîne û wî mesaja dîrokî dide gelê xwe, ewî dema zêrîn di bîra wan tîne (ku bi wî awayî jî, zindîtî û dînamîktiya xwe ya eqlî û fikrî jî dinerxîne) û wiha dibêje :

Saqî tu ji boy Xwedê kerem ke
Yek qurçekî mey di camî "Cem" ke
Da camê bi mey cîhan numa bit
Herçî me îradeye xuya bit
Bextê me ji bo me ra bibit yar
Carek bibîtin ji xwabê hîşyar
Rabit ji me jî Cîhanpenahek
Peyda bibitin me padişahek
Ger dê hebûya me padişahek
Laîq bidîya xwedî kulahek
Te'yîn bibûya ji bo wî textek
Zahir vedibû ji bo me bextek
Xalib ne dibû li ser me ev Rûm
Ne-d bûne xirabe yê di dest bûm
Mehkûmê Elîyye û Sea'lîk
Mexlûb û mutî ê Tirk û Tacîk
Ma qey ji ezel Xwedê wisa kir
Ev Rûm û Ecem li ser me rakir?
Herçî bire şîrê destê hîmmet
Zebt kir ji xwe ra bi mêrî dewlet
Lewra ku cîhan wekî 'erûs e
Wî hukmê di destê şîrê rûse (13)

---

(13)
Elîyye: Sefewîyên Elewî,
Sealik = Rût û cıbirr (tirk)
Erûs: Bûk
Şûrê rûs: şûrê tazî, ji kalan kişandî.
Xwedî kulah: Xweyî tac û kulahê seltenet û padişahiyê
Xwab: Xew
Bûm: Perendeyekî bê yûme, di xirabeyan da dijî, ku jêra dibêjin: Kundê Kor
Şîr: Şûr
Destê Hîmmet: Destê ezm û îradeya ji dil û can
Wekî erûse: Wekî bûka xemilandiye
Hukmê wî: Hukmranî û bi dest xistina selteneta wî
Bi şûrê rûse: Bi şûrê ji kalan kişandiyê tazî ye (bi ceng û şerê çekdariye)

Rehber û rêzanê mezin "Xanî", di vê helbesta xwe ya pirr bi rûmet û ma'nîdara dawî da, **"wî hukmê bi destê şûrê rus e"** bi şarezatî û pisporîtiyekî herî dûrbîn û balkêş, pêçîya xwe dide ser bijkokekî gelek hessas û girîng, deng bi zengilê banga azadîyê dixe û rîya rast a azadîyê, rêya gihîştina bal dewletekî kurdistanî yê netewî va, nîşan dide, û dibêje ku ew bi şûrê tazî ye. (bi şûrê ji kalan kişandî ye, bi ceng û şerrê çekdariye), ku çara heqîqî û rêya rastî jî ewe, ji wî bêtir jî tu çare tune ye :

Gelek heta nehêje, naghêje serxwebûnê
Heta ku lê nerêje : barût û lav û xûnê
Dunya hemî bibêje, dijmin dibe li şûnê
Dem ku xwîn birêje dê seh bikin çi denge.

A. Durre

Lê ev jî rastîyekî dine, ku çekdarî bi tenê jî ne kafîye, divê ku sîyaset û rêzanî jî hebe, yanê bi kurtî, divê ku *"şûr û qelem bi hev ra bin"*.

Di huẓûra me'newî ya wî qehṛemanê netewî, şêr û pilingê azadî û serfiraziyê, feylesof û zanîyar û mûtefekkîr û mûtesewwif û hozan û rêzanê mezin da. Ez serê xwe datînim, ji hemû kesên aşîtîniyaz û azadîxwaz ra, -bi taybetî ji gelê Kurd û Kurdistanê ra-, serxwebûn û serfirazîtîyê dixwazim, selam û sipas û evîndarîyên xwe yên derûnî pêşkêşê we dikim !

Xanî û Sene'tê edebî (Hunerê wêjeyî)

Sen'et û hunerê edebî û wêjeyî îbaretê *"ji hunermendîya xweşpeyvandin û qenc îfadekirina meram û arzû û xwest û wîst û fikr û bîr û bawerîyên xwe, bi terz û ûslûbekî xweş û delal û zelal û di cîh da"* ye, bi gotinekî din: *"Peyvandin û îfadekirina spehî û qenc û xweş û di cîhê xwe da"* ye. Ku di zimanê xelkê da ew wiha tê teswîrkirin: *"Tu dibê qeyê ku ji dev û lêvên wî, hingiv û şekir dibarin, jê êncî û durr û yaqût û mircan dirijin."* Ku ev teswîr û te'rîfa xelkê ji wêje û wêjevanîtiyê ra, te'rîf û teswîrekî gelekî wecîz û xweşik û manîdar e. Bi rastî; dema ku *Xanî* jî diaxife, merif dibêje qeyê ku ji dev û lêvên wî yên mubarek da , ji xama wî ya pîroz da, hingiv û şekir, durr û gewher dibarin û dirrijin, ku ji wî barana pîroz da jî, gul û kulîlkên kesk û sor û zer hêşîn dibin, wek Ala kesk û sor û zer rengîn dibin, wek misk û 'enberê bîn didin, ji zewqa edebî ya edîban ra jî heyat û jîn didin !.

Xanî di şî'r û helbesteyên xwe da, hemî cins û cûrên neqş û nemûşên sen'et û hunerê edebî û wêjeyî (*wek cînas û tîbaq û tewrîye û beraetul îstîhlal û husnul metl'e û husnul meqt'e û yên din*)([14]) bi kar aniye, ala wî hunerê edebî li banê gerdûnê bi terzekî herî bala û wala kişandiyeû bi wî rewşa alî hûnaye û ji me ra pêşkêş kiriye ku di *Memo-Zîna* xwe da jî wiha gotiye :

Ger dê hebûya me jî xwedanek
'Alî kerem û letîf e danek
Îlm û huner û kemal û îz'an
şî'r û xezel û kitab û dîwan
Ew cinsê biba li ba wî me'mûl
Ew neqdê biba li nik wî me'qbûl
Dê min 'elema kelamê mewzûn
'Alî bikira li banê gerdûn

---

(14) **Cînas: Tecnîs:** dı fennî hunerê edebî da· Ewe ku du kelîme, du bêje, dı lefzê xwe da yek bın, lê dı me'na û naveroka xwe da, ji hev cuda û muxtelıf bın, wekî peyva "*kun, kun*"dı vî helbesteya, ku *Xanî* derheq *Neyê* da gotıye :
"*Bend û weselê di mın sera bun*
Ewwel te kirin bi emrê "kun", kun"
Yanê Te bi fermana xwe ya "kun = bila bibe"! Hemû ben û weseleyên di mın, ji serî heta binî "qul kırine". Ku "*kun*"a ewwel bi me'na "*bila bibe*" ye, ya duwwemîn jî bı me'na "*qul*"e, lefzê wan wekî hevın, lê mana wan muxtelıfin. Ku ev cûrê cînasê jî. "*cînasa tamme*", pirr cûrên wî yên din, (wek cînasa naqis û cînasa murrekeb) jî hene.
Tîbaq, Tezad jî: Bi hev ra anîna du tiştên dıjê hevin, wek roj û şev û sibeh û êvar. di vî helbesta Xanî da:
"*Roj û şev û wext û subh û êvar*
Yeksan di numan li wan bi yek car"
Tewrîyye *jî:* ewe ku jı kelîmekî ra du me'na hebin, yekî nêzîk, yekî dûr, ku meqsed ew me'ne ya dûr be. Wek kelîma "*wasîl*"ê, di wî helbesta Xanî da·
"*Xaric mebe ! Ta bibî tu daxil*
Terkê meke ! Ta bibî tu "wasil"
Ku mana wî ya nêzîk "*yê gihîştî*"ye, me'na wî ya dûr jî **"Wasîlê kurê 'Eta'"** yê serokê mûtezîlîya ye, ku meqsed jî ew e
Beraetul îstîhlal: destpêkîtîya herî Espehî û rind ku şaîr, we yan nivîskar, di destpêkê da. bı terzekî wılo xweşik dest pê dike, ku mewzû û meqsed û naverok, jê tê fêmkırın.
Hûsnû-l Metle': destpêka rind û xweşik, ku ew jî ewe: di destpêka qesîdeyê da, helbesta serî pirr xweşik û çak û delal û balkêş be.Wek ku Xanî di serê Memo-Zîna xwe da gotîye:
"*Ey metle' ê husnê îşqîbazî*
Mehbûbê heqîqî û mecazî"
Ku di wî da, hem *Beraetul îstîhlal* heye, hem jî "*Husnul metle'* ", lewra hem ji wî tê fêmkirin ku mevzû û naveroka destana Memo-Zînê, îşq û mehebbeta heqîqî û mezazîye, hem jî helbestekî gelek xweşik û delal û çak û pak û balkêş û geş û xweşe.
Hûsnû-l Meqte' *jî:* Ewe ku helbesta dawîyê (beyta dawîya qesîdê), pırr xweşik û delal be Ew jî dîsan wekî vî helbesta dawîya Memo-Zîna Xanî:
"*Ewwel, ku Te da ji îşqê metle'*
Axir, bide wî Tu husnê meqte'"
Yanê . Ey Xweda! Te çawan di serî da, cîyê derketına nûra roja îşqê, destpêka îşqê, (*husnulmetle'*), daye Xanî, Tu dı dawîyê da jî, meqte'û axirîya qenc û rind bide wî; dawîya wî jî bi xêr û bêr ke, qenc û baş bîne.

Yanê bi kurtî : Ew dara tûbaya bihişta Kurdistanê, çawan ku bi şaxên xwe yên felsefî û fikrî û millî, mûmtaz û bijare ye, wisa jî di şaxa xwe ya edebî û wêjeyî da, di sene't û hunerê şî'r û helbestevanî da, di 'îlmê fesahet û belaxetê da, di fennê Meanî û Bedî'û Beyanê da jî, mûmtaz û bijare ye, belkî mûmtaztir û bijaretir e.(15)

Eger, gelê Îngilîz, bi *şekispîr* (Shakespeare - 1564-1616), gelê Rûs, bi *Dostovîskî* (Dostoievsky 1821-1881), gelê Îtalî, bi *Dante* (Dante Alighieri - 1265-1321), gelê E'rebî bi *Ebul Ela El-Me'errî* (973-1057), gelê Faris jî, bi *Fîrdewsî* (932-1020)yê, şahnazî û îftîxar bikin, heqqê gelê Kurd jî heye ku bi "*Xanî*", îftîxar û şahnazî bike, ku bi rastî jî, *Memo-Zîn* û dîwana *Xanî*, ji "*Romeo-Juliet*"a *şekispîr*, "*Komêdiya îlahî*" ya *Dante*, ji "*Xaniyê mirîyan û gunehkarî û îqab*" a *Dostovîskî*, ji *El-luzûmîyat û Seqtuzzend* a *Me'errî* û *Şahname* ya *Firdewsî* yê, ne kêmtirin, belkî di gelek sen'etê edebî û evîndarî û felsefî û exlaqî da, ji wan zêdetir û walatir û balatir in. Hem jî eger ku di cûmhûrîyyeta *Eflaton* (*Platoon*) da (ku ji giringtirînê Ûtopiyên klasîkî ye), di *El-Medînetul Fadîle* (bajarê herî qenctir û çêtir) ya *Farabî* yê da, Wêjeya siyasî *(Utopian Literature)*(16) hatiye tewzîh kirin, bê gumane ku di *Memozîna Xanî* da jî, ev cûrê wêjeyê, hatiye telxîs kirin. Wek ku *Xanî* çara azadî û deselatiyê, di îttîhad û înqiyadê da, ya dewlet û hukumranîtîyê jî, di quwwet û qudreta çekdarî û aborîyê da (di şûr û îhsanê da), dibîne û wiha teswîr û teqrîr dike :

Ger dê hebûya me jî xwedanek
'Alî kerem û letîf e danek
Îlm û huner û kemal û îz'an
Şî'r û xezel û kitab û dîwan
Ew cinsê biba li ba wî me'mûl
Ew neqdê biba li nik wî me'qbûl
Dê min 'elema kelamê mewzûn
'Alî bikira li banê gerdûn (17)

(15) **Me'anî** û **Bedî'û beyan:** Sê îlm û fennê fesahet û belaxetê ne. Di medreseyên Kurdistanê da jî pırr ehemmiyet didinê, bi hındikayî du salan tedrîsa wan dewam dike, kitêba herî mu'tebera derheq wan da ku dı medresan da dihate xwendin "*muxteserûl mea'nî*"bû, ku di wî kitêbê da jî, te'rîfa "*belaxetê*" wiha ye: "*qudret û şîyana beyankirina meramê dilê xwe, bi terzekî xweşik û zelalê, mûtabiqê xwesteya halê.*"

(16) **Ûtopian:** Eser û berhemên wêjeya sıyasî ne, ku hedef û armanca wan amadekirina pîlan û programa jiyanekî civakîyê qenctir û çêtire (wek cûmhûriyyeta Eflaton), ku ev nav (Ûtopia), ji terefî Sir Thomas More (1478-1535 m.) da, berê li cûmlhûriyyeta Platon hatiye navdayîn, paşê jî, ji hemû berhemên wêjeya siyasî ra hatiye gotin (bûye navê hemû berhemên wê cûrê.

Ji xwe *Xanî,* ji bil cûrê wêjeya karkeranî (Proletarîn Literature), ku di qirna bîstan da li Eurûpa diyar bûye), temasê hemû cûrên wêjeyê (wek wêjeya cîhanî = *Welt. Literature*), wêjeya felsefî= *Philosophy Literature*, wêjeya medresî= *Scholastik Literature*, temasê hemû cûreyên wêjeyê kiriye û ristiye, bi taybetî di wêjeya tesewwufê da rolekî pirr mezin lîstiye.

Xanî, wêjeya sîyasî *(Utopian Literature)* ya ku ji wesfê felsefa "*Cûmhûrîyyeta Eflaton* da, hatîye û maye, bi angorî bîr û bawerîya xwe şirove kirîye, şekil dayê, ro kirîye û hûnaye; kamilkirin û durustkirina dîn û dewletê, tehsîlkirina ´îlm û hîkmetê, bi hebûna dewlet û hukumranîtîyê va girêdide, dewlet û hukumranîtîyê jî, di quwwetê da, quwwetê jî di îttîfaq û îttîhad û îtaetê da dibîne û wiha dibêje :

Ger dê hebûya me ittihadek
Vêkra bikira me înqiyadek

Yanê : Eger ku xweyî û xwedanekî me yê alîcenab û letîfezan û pisporê ´îlm û huner û kemalê, hebûya, xweyî besîret û eqlê kamil ba; ev cûrên şî'r û helbestan li ba wî bi kêr bihatina, ev nerx û qîmetên hunerî li bal wî, Bi hatina pejirandin, dê minê ala hunerê şî'r û helbestan li banê felekê biçikanda, bilind û bala bikirna, û...

Rom û Ereb û Ecem temamî
Hemyan ji me ra dikir xulamî
Tekmîlî dikir me dîn û dewlet
Tehsîlî dikir me îlm û hîkmet
Her kî bire şîrî destê Hîmmet
Zebt kir ji xwe ra bi mêrî dewlet
Lewra ku cîhan wekî e'rûs e
Wê hukmê di destê şîrê rûs e
Hasil ku dinê bi şîr û îhsan
Tesxîrî dibit ji boyî însan ([18])

(17)

'Alî kerem: Alîcenab û bilınd comerdî, bılind bexş û 'eta
Letîfe dan: Zana û pisporê gotin û peyvên xweşik û çak û pak
Îz'an: Hiş û besîret û heq bilîstin, heqşinasî
Ev cins: Ev cûr ev cûre
Li ba wî: Li nik wî, li cem wî
Me'mûl: Bikarhatî, pê 'emel kirî, bi kêr
Neqd: Pere, zêr û zîv
'Elem: Ala, beyreq
Kelamê mewzûn: Gotin û xeberdanên bı wezn û qafîye hatine ristin, şî'r û helbest e.
Gerdûn: Felek, Asîman, çerxa felekê, qubbe yê xedra.

(18)

Ittihad: Yekbûyîn, yekîtî.
Vêkra: Bi hev ra, yekbiyekîra.
Înqîyad: Îtae't.
Şîr: Şûr.
Destê hîmmet: Destê 'ezm û îradeyê.
Bi mêrî: bi mêranî.
'Erûs: Bûk.
Rûs: Rût.
Şûrê rûs: Şûrê rûtê tazî, ji kalan derketî.

Ji xwe, di edebîyata tesseuffî da Xanî rolekî pirr bi rûmet û girîng lîstîye, ku di vî xusûsê da, di behsa *"Xanî û tesewwuf û wehdetilwucûd"* ê da, Me, gelek numûneyên giranbiha beyan kirine, îcaba tekrarkirina wan di vir da nake, lê wek numûneyekî balkêş û pîroz, em dixwazin ku dîsan jî xwe bi van çend helbestên dîwana wî, pîroz bikin :

Ey ayîneyê dil bi cemala Te mûcella
Sed sefhe bi yek zerre ji nûra Te mûtella
Însan Te ji bo alemê kubra kire nusxe
Lew mûdxeyekî jê Tu dikî 'Erşê mûella
Wehdet, bi heseb kesretê 'eyanê mezahir
Her so, bi Sifatan diketin keşfê tecella
Lew mûxtelefil qewl û 'emel bûne xelaîq
Kafir ji senem bûne bi navê Te tesella
Sirra xwe nîhanî Te ku da "Ehmedê Xanî"
Ez xeyrê berî şud, be Tu awerdî tewella (*)

Di 17-18' yê meha Hezîrana sala 1995'an da, li Stokholmê , textî payê Swêdê (Isveçê), wek endamekî Konferansa *"Şî'r û Helbestên kurdî"*, min konferansnameyekî pêşkêş kiribû. Bi mûnasebeta wî ya bi vî mewzûyê ra, ez dixwazim, ku ewî konferansnameyê, di vir da jî bi cih bikim :

(*) Ji kerema xwe di şerha dîwana Xanî da li îzaha van helbesteyan mêzebikin!

Şî'r û helbestên kurdî

17-18 Hezîran 1995

Stokholm

Roşenbîrên hêja, mêvanên ezîz !

Pîrê wêjeya netewîya kurd, *Ehmedê Xanî*, di destpêka şahesera xwe ya *Mem û Zîn'ê* da wiha dibêje :

Sernameyê name, namê "Ellah"
Bê namê wî, na temame wellah
Ey metle'ê husnê îşqîbazî
Meh'bûbê heqîqî û mecazî
Bê neqşê Te, neqşê xame xame
Bê namê Te, name na temame

Yanê : Sernivîs û destpêka her name yî, navê Xweda ye (divê ku her tişt bi navê Xweda bête destpêkirin) Ey Xweda yê ku Tu jê derê roja rindaya evîndariyê yî, Ey Mehbûbê heqîqî û mecazî ! bê navê Te, neqşê qelemê (tiştên ku qelem neqiş dike û dinivîse) xam e, nepijiyayî ye, bê navê Te, name jî ne temam e (noqsan dimîne).

Ez jî, bi navê Xweda destpêdikim: Bîsmîllah dibêjim û bi selam û sipas û evîndarîyên xwe yên derûnî û germ, bi îzn û musaeda we,wî konferansnama xwe, ji we ra 'erz û pêşkêş dikim:

Di tarîxa gelan da, wêje (edebiyat) nerxekî herî bi rûmet û giranbiha ye, wesîqe û belgeyekî herî mu'teber û girîng e, nerxê mezinayî û esaleta wana dîrokî ye, ku edebîyata kurdî jî -bi hemî cûrên xwe- nerxekî giranbiha yê gelê kurd e, pirr zengîn û rengîn e, medarê îftixar û şahnaziya me ye.

Hevalên hêja, roşenbîrên bi rêz! Di sene'tê edebî, (hunerê wêjeyî) da, cîhekî gelek bi rûmet û bilind, ji şî'r û helbesteyê ra heye, bi taybetî şî'r û helbest û kilamên kurdî ku di dîroka gelê Kurd da pirr rolên mezin lîstine, pirr xizmet û karên giranbiha û pîroz kirine..

Berîya ku em bikevin kûrayên mevzûyê, ez dixwazim, ku te'rîfa wêjeyê bi kurtî bikim:

Wêje : (*Edeb-Edebîyat*) : Sene't û hunerê xweş axiftin û qenc

peyvandinê ye, îfadekirina fikr û bîr û bawerî û daxwaz û niyaz û kîn û nefret û elem û îztirab û xweşî û nexweşiyan, bi terz û ûslûbekî delal û zelal û xweşik e. Ku xelk jî wî terzê peyvandin û îfadekirinê ra, wiha dibêje *"wilo xweş diaxife, tu dibê qeyê şekir û hingêv ji dev dibare; ji dev û lêvan durr û cewher dirijin."* Ku bi rastî jî, ev temsîl û teswîra xelkê, te'rîfekî herî wecîz û me'nîdare. Ji boyî huner û sene'tê wêjeyî û edebî ra. Ku merif dikare wiha jî bibêje: *"jiyana taybetîya her gelî, helwest û xwest û hiss û hewes û daxwaz û niyaz û hîvî û bîr û bawerî û têkilîyên wan ên civakî û malbatî û urf û adatên wan ên bi taybetî, hemû li ser hev, Kelepûr û kultura wî gelî ye; îfadekirina wan bi terz û ûslûbekî zelal û delal jî, wêje û edebîyata wî ye, ku ew jî beşa herî hêjaya kultura wî gelî ye."*

Wêjeya gelê Kurd jî, herwekî wêjeya hemû gelan, bi du beşane, bi du awayî tê mulaheze kirin :

1- Wêje û edebîyata zarayî (bi devkî)
2- Wêjeya nivîseyî (belgeyî)

Wêjeya bi devkî ya kurdî, wêjeyekî wilo zengîn û rengîn e. Ku bi hêsayî merif dikare bibêje: *"di nav wêje û edebîyata cîhanê da, li qora herî pêşîne; mirov hemtayê wî, kêm dibîne"* deryakî kûr û dûr û bê payane, xezîne û kana gewherane, ku her kesî, di her demî da, piş û parên xwe jê hildane; destê dost û dijminan, malxwo û mêvanan, talanker û cerdevanan, her demî têda bûne û têdane. Ku nedawî lê tê, ne jî xilasî dizane, timî tijî û bê payane...

Ji her gund û her bajar û herêmên Kurdistanê, di her dem û gavan da, bi sedan dengbêj û kilambêj rabûne, wî wejeyê zengîn û rengîn kirine û dikin, dê bikin jî !

Bi îzna we, emê ji vê derya bê payan, çend gewherên bi rûmet, çend nerxên hêja, ji we ra -wekî mînak û numûne- pêşkêş bikin:

1-
Keçikê ! dilê min kanîka devnemala
Bihar-bihar tijîye, payîz-payîz dimîne vala ....!
De tu were ramîsanek ji xala binçenê,
Ji taxima sîng û beran, li min keremke,
Destê min nede ber rûkê min evdalê,
Stûyê min xwar neke li dû hevala.... dû hevala...!
De tu ji mala Hecîyanî lê ! Tu keça beganî lê !
Xwezî ya tu bûka mala bavê min ba lê gewrê... ê... ê...!

2-
Lawiko! Bêbexto ! Bêqeraro !
Minê bihîstîye : Te di dû min ra dil guhestî!
Teyê di kavlê gunda da, ji xwe ra yarek girtî, jinkî xwestî
Eger ji min çêtir be, bila li can û bedenê te helal û xweş be !..
Eger ne çêtir be, ezê nifirkî li can û bedenê te bikim :
Belkî derd û nexweşîyekî wisa li te peyda be!
Ku goştê te bihelîne, bimînî komek hestî, komek hestî!
Di kavlê gunda da tu belengaz û bendewar bî!
Şerpeze û tengezar bî, dîsan bikevî bin vî destî..
bin vî destî! ....

3-
Qemerê! ez bi gorî! sibeye, tîpên gewr û rind û bedewan
hevdû girtine, diçin avê
Bejin bilinda xwe dane pêşiyê, bejin kurta xwe dane dawiyê,
Qemer û pozbilinda xwe dane navê... dane navê...

Minê, bala xwe didayê : qemera min wekî kewa gozela
ku sibê zû ji çiya û zozana radibe,
perr û baskê xwe dawdişîne
ji qiraviyê, ji xunavê.... ji xunavê .....

Kilam û stranên kurdî, bi angorî deman jî du cûr in :

1- Yên ku demekî dirêj dijîn û nayên ji bîr kirin,
2- Yên ku demekî kurt dijîn û têne ji bîr kirin.

Bi angorî naverokên xwe jî, bi pirr cûra ne, wek:
1- Kilamên dilan û evîndariyê (lîrik, lawik)
2- Kilamên şerran (li ser ceng û şeran)
3- Kilamên govend û dîlanan
4- Laje, lawîjok (yên dînî û efsanewî û çîrokî)
5- Beyt, Bêrîte, Bêlîte (yên Mele û Suxteyên medresan, sofî û derwêşan)
6- Mamîk û payîzok (yên ku dengbêj davên ber hev)
7- Beste (yên giran)
8- Yên çîrokî
9- Yên şîn û girînan
10- Yên pesn û halanan
11- Yên dijûnan û tinaz û henekan... yd.

Ku di parastin û zanîna dîrok û serhatiyên gelê Kurd da, evî beşê, (Beşa devkî) pirr rolekî mezin lîstiye; di vî derya kûr û bê binî û bê payan da, pirr gewher û nerxên dirokiyên Kurdistanê yên giranbiha veşartî hene.

Wêjeya nivîsî jî bi du cûrane :
1- Ya menzûm (bi wezn û qafîye)
2- Ya mensûr (bê wezn û qafîye)

Wêjeya menzûm (bi rist) jî, bi du cûra ne :
a - Cûra helbesteyên 'Erûzî, ku bi angorî qalibên 'îlmê 'Erûzê hatine ristin û rotin.
b - Cûra serbest.

Di wêjeya kilasîkî ya kurdî da, hemû cûrên şî'r û helbestan (*wek cûrên xezel û lîrik û medhîye û mersiyye û hîcwîyye û rexne û halan û navtêdan û netewî û dînî û tesewwufî û felsefî...*) jî, tim hebûne û hene jî.

Lê mirov dikare bibêje, ku cûra netewî (millî), ji *Ahmedê Xanî* da, dest pêkirîye, we yan ji wî da bûye wek beşekî cudaî û serbixwe, belê, bi rastî jî Ehmedê Xanî, di vê beşê da, hem pîre, hem jî şah û wezîre, ala edebîya kurdî ya netewî li banê gerdonê (felekê) çikandîye, di numayende û temaşegeha wêjevanîya cîhanê da, wêjeya netewî ya gelê Kurd, nîşan daye; 'erz û pêşkêş kirîye.

Ku Xanî, di destana Mem û Zîna xwe ya herî bi rûmet û hêja da, bi terz û ûslûbekî edebîyê herî bilind û wala, bi hunermendîyekî pirr bi qîmet û giranbiha, temasê doza azadîya Kurd û Kurdistanê kirîye, bi xûna dilê xwe yê ku bi hêsirên (fermişk û ronîkên) îşq û evîna Kurdistanê ra rijandîye, ewî nerxê edebî neqişandîye, li rûpelên tarîxê nivîsîye. Ku bê guman, mirov dikare bibêje; ew destana *Mem û Zîna Xanî*, destana îşq û evîna Kurd û Kurdistanê ye: **Memo**, gelê Kurde, **Zîn** Kurdistane, **Burca Belek**, nîşana azadî û serxwebûna wane, **Çeko** *û* **Tacdîn** jî, pêşmerge yên şoreşker û gêrîlla ne, **Bekoyê 'Ewan** jî, remza dagirker û caş û xaînên kurda ne.

Hem merif dikare evî jî bibêje : Ku Memo-Zîn, serkanî û çavkanî û fihrista çand û kelepûr û kultura kurdane, felsefa jîyan û bawerîya wane, reçete û dermanxaneya derd û kulên wane, ku ji rav û nêçîr û geşt û seyranên wan da, heta rewş û nîşan û ayîn û merasimên reqs û govend û şîn û şayî û çejn û sersal û newroza

wan, reng û deng û mûzîk û sazbendî û ahengî û hunermendîyên wan, bi kurtî; hem û urf û adet û en'eneyên wan, xwendegeh û medrese û tekîye û mizgeft û dêr û Laleş û ateşkedeyên wan, Hemî nerx û rûmetên wan, di xwe da girtîye û kom kirîye, bûye xezîne û kana wana bêpayan. *Xanî*, di wî pirtûka xwe ya pîroz da, îşaretê bal hemû mezheb û ekolên olî û felsefîyên wê demê jî kirîye, rexne û teqdîr û tewbîxên xwe jî bi ûslûbekî hunermendîyê herî şareza, bi cîh anîye, bîr û bawerîya xwe ya cudayî jî teswîr û îma û îşaret kirîye.

Ev jî rastîyekî din e, ku herwekî edebîyata erebî û farisî û osmanî, tesîra tesewwufê (sofîzmê) li ser edebîyata klasîkîya kurdî jî çêbûye, ku Xanî jî, di gelek helbesteyên xwe da, mufredat û naverokên tesewwufî, bi kar anîye, bi terzekî cudaî yê balkêş hûnaye, li dora felsefa tesewwûfîya *Wehdetîlwûcûdê* gerîyaye, çûye û hatîye. Lê pirr zelal û vekirî nêzîkê wî nebûye, belkî di kiras û qalibekî taybetî da, bî rewşa Wehdetîşşûhûdê nîşan daye, hespê xwe li der û dorên wî, bezandîye. Xwe berdaye gelek meydan û şax û deverên wî, wek ku di dîbaca Memo-Zîna xwe da, derbareyê Xwedê da wiha gotîye:

Fîlcumle, çi ewwel û çi axir
Elqisse, çi mu'min û çi kafir
Heryek ji Te ra we bûne mezher
Ew renge di wan Tu bûyî muzmer
Goya hemî cismekîn, Tu canî
Goya hemî şehrek in, Tu Xanî

Hemû kaînat û alemê, tecellîgaha hebûna **Xweda** nîşan daye, xaliq û mexlûq, (**Xweda** û bendeyên wî), bi bajar û avayan, bi cism û can teswîr û temsîl kirîye. Lê wekî wehdetulwucûdîyan ne gotîye. Ku "yek wucûdekî bi tenê heye, ew jî wucûd û hebûna Xwedê ye, ji bil wî tu tişt tuneye, hemû alem sîya wucûda Xwedê ye" û wekî *"Mela Ehmedê Cizîrî"*, zelal û vekirî nîne ku meselê wiha teswîr kirîye û gotîye:

Sirrê wehdet ji ezel girtîye hetta bi ebed
Wahidek ferde bi zatê xwe, we nîne çu eded

Yeke derya tu bîzan qencî, çi mewc û çi hebab
Bi heqîqet ku hemî ave, çi av û çi cemed

Ku bi rasatî jî, seydayê Mela Ehmedê Cizîrî, mesela "wehdetulwucûdê", pirr û pirr zelal û delal beyan kirîye, bi ûslûbekî edebîyê pirr manîdar û belîx û fesîh ristîye û gotîye:

Em têk huwîyyat in yeqîn, îsmin ji mesder muşteqîn
Nûra qedîm bû îşq û vîn, wan lêkî naz û cîlwe da

Eşya li pey hev welidîn, yek-yek ji weslê bedidîn
Hem mesderin, hem mewridîn, vê qulzemê ev reşhe da

Yek bû Elîf, yek sifre kir, çend şeklê dî lê zêde kir
Herdem peyapey sifre kir, bala bi bala zêde da

Lê ew jî heye ku *Xanî* di dîwana xwe da gelek vekirî û bêtirs nêzîkê bal felsefa "Wehdetulwucûdê" va dibe; wek ku dibêje :

Wehdet bi heseb kesretê e'yanê mezahir
Herso bi sifatan diketin keşfê tecella

Lew mûxtelefi-l qewl û 'emel bûne xelaîq
Kafir ji senem bûne bi navê Te tessela

Yanê : Piratiya tiştan li hemû deran, bi sifatên Xwedê yên cûr be cûr in. Ku ew jî -wek mûqteza û xestekên wan sifatan- di gotin û kir û karên **xweda** cûr be cûr û mûxtelif bûne, lewra her yek ji wan, tecellîya yek ji wan sifatên cûr be cûr in, ji wî ye jî ku hemû mexlûq bi gotin û kir û karên xwe jî, ji hev cudane, wek hevv nînin, heryek ji wan, mezherê yek ji sifetên yek zatekî ne. Ku wehdet jî, bi wî terzî ye, yek tiştek di pirr mezheran da tecellî bûye, wek sûretê rojê, ku di pirr neynikan da dixûyê.

Belê, em xwe pirr noqê vê derya kûrr nekin û *Mela û Xanî* di wî da bihêlin, bila ew têda ajberîyan (melevanîyan) bikin, bimînin, em herin bal hinek şaîrên din, qasek jî xwe bi suhbeta wan pîroz bikin. Wek Mela **Ebdûssemedê Hekarî** (...972..h.), ku di helbestekî xwe da wiha gotîye :

Dila şabe! Ku xweş dem hat, bihar e
Reşemmeh çû, terazin bûn dîyare

Kulîlk û gul bi ken derçûn ji xunçan
Sivik hat nêrgiza mest û xumare

Belazîz Lûle bûn, Beybûn bihîn dan
Gula min kanê? Sed carî heware ?

Wek **Tahir begê Caf** (1875-1917), ku bi lehceya xwe ya Soranîya şîrîn gotîye :

Mêşî xalet nafirî! Bes baweşînî ket be naz
Çûnke pabeste be şuhdê rûmetê zîba te wa

Yanê : Tu çuqas hewil bidî, çiqas pêda bikevî, ew mêşa xalê ser rûyê te, jê nafire û jê naçe. Bese ku tû wisan bi nazî û delalî baweşîn bikî. Lewra lingên wê mêşê (ew xala li ser rûyê te ku wekî mêşekî ye) di hingivê rûyê teyê xeşik û şîrîn da bend bûne, hatine girêdan ku tu çi jî bikî, ew jê nafire (nikare bifire) û naçe.

We di dawî da, em biçin zîyareta **Hacî Qadîrê Koyî**, guhên xwe bidin çend numûne yên giranbiha yên belaxeta wî, ku gelo ka ew çi dibêjê! çi durr û gewheran direje ?!

Xedengê diqqetê Hacî, qesîmê cewherê ferde
Ge çî wesfê demî, her ma dibin perdê mûe'mma da

Yanê : tûrên diqqet û fikra Hacî, *Cuz'ê layetecezza* (cewherêferd= atom) perçe dike, lê belê wesfê devê te, hêj jî di binê perda mûemma yê da maye. (dîqeta Hacî ne gîhîştîye sirr û hîkmetê wî mûemmayê û nikarîye ewî bipişkêve, ku yanê; ew ji cewherê ferd jî piçûktir e, pişkivandina wî zortir e.)

Le ber qafê firaqî da, wiha fersûde ye cismem
Le gel 'Enqa qerînem men, le îsmî bê musemma da

Yanê : Di pişta çiyayê firaqê da (ku wekî çîyayê qafe) leş û cesedê min bi wî avayî zeyîf û jar û lawaz bûye ku di xususa îsmê bê mûsemma da (navê bê navdêr da), ez bûme hemtayê teyrê Enqa, wek wî, navê min jî heye, cismê min tuneye.

Belê ! piştî *Xanî*, *Nalî* û *Hacî Qadirê Koyî* jî, di meydana wêjeya netewîya kurdî da, di klasîka kurdî da, şehsuwarên zor çeleng û aza bûne. Ku ala wêjeya netewîya kurdî, li banê gerdonê çikandine.

Ku Hacî di helbestekî xwe da, wiha pesnê xwe dide û dibêje: Dema di meydana şî'r û helbestevanîyê da, Hacî hespê xwe dajo, dibezine, *Nalî* wekî nalekî lingên hespan, *Kurdî* jî wekî toza meydanê, ji parra dimînin. (nagîhîjin hespê belexata Hacî) :

Be cî ma "Nalî" wek Nalî, be paşket Kurdî wek gerdî
Ku "Hacî", xarî da hespî, li meydanê suxendanî

Em jî dikarin bibêjin ku: Di meydana wêjeya klasîkî da, hespên gelek wêjevanên cîhanê, li dû "Xanî", "Hacî", "Cizîrî" û "Herîrî" westîyayî dimînin, nagihîjin toza meydana wan.

Lê sed mixabin! Ji bê kesîtî û ji bê xwedanîtîya me da, ev meta û qumaşên wan ên giranbiha, di sûka wêjevanî da, bê nerx û bê rûmet, di kuncikê îhmalê da, tozgirtine û mane.
Belê, ev heye ku zêr çuqas jeng û pas bigre jî, dîsan zêr e, ji qîmet û rûmet da nakeve. Roja ku bikeve destê zêrkerekî şareza, ewî cîla bike, dê rewneq bide û bighîje nerx û bihayê xwe yê heqîqî, bilind û serfiraz bibe.
Çawan ku Xanî jî îşaret kirîye û gotîye :

Gerdê hebûya me jî xwedanek
'Alî kerem û letîfe danek
Dê min 'elema kelamê mewzûn
'Alî bikira li banê gerdûn

Umîdwarim ku roşenbîr û zimanzan û zana û wêjevanên Kurd, jî vir pêda li vî gewher û qumaşên xwe yên bi rûmet û giranbiha xwedî derkevin, ruh û canê Ehmedê Xanî û Melayê Cizîrî û Nalî û Hacî û bi sedan şaîr û hozanên kurda yên din şa bikin, şî'r û emegê dayîka Kurdistanê, li xwe helal û zelal û noş û xweş bikin.

Silav û Sipas !
Abdurrahman Durre
17-18 Hazîran 1995
Stockholm

Di dawiya da wîda, em gûhê xwe bidin van çend helbeste yên *Durre* jî.

1- - - -

XANÎ Û TESEWWÛF (SÛFÎSM)

Xerîza dînî, meraq û îştîyaqa têgihîştin û zanîna mefhûmê Îlahî (**Xweda**yî) û mafewqê tebî'etê, jêder û destpêka 'Alem ê, sirrên wucûdê (kewn û kaînatê), yek ji qerekter û xusûsiyet û hest û meyl û daxwazîyên fîtrîyên beşerîyet û însanîyetê ye, xerîze û fîtretekî bingehîyê muşterek e, di navbera hemî cins û cûr û sinifên însanan da, ku tesewwuf jî yek ji dîyarde û tezahuratên wî xerîza dînî ye, di hemî dînan da cîh girtîye, di pirr rewş û qalibanra derbas bûye, bi pirr nav û nîşanan navdêr û nîşandêr bûye hetanî îro hatiye :

Tesewwûf: di lûxet da (di ferhengê da) bi m'ena bûyîna weke sofiyane, texelluqa bi rewş û exlaqên wane ku cemaeta sofîyan jî, wek nîşana derwêşî û belangazî û feqîrîtîyê, cill û lîbasên sûf (hirî) li xwe dikirin (verdigirtin)([1]), di istilah da (di zareveya ehlê tesewwufê da) jî, Tesewwuf: texelluqa bi exlaqên **Xweda**, terka masûwayê wî, fanîbûyîna ji xwe, baqî mayîna bi wucûda wîya ezelî û ebedîye, ku ew tekamula rûhî jî, bi angorê bawerîya "Hindûîzm" ê, bi Tenasûxa rûhan çêdibe, yanê; rûh, ji leş û bedenekî, di keve leş û bedenekî din û wilo pêda leş û bedenan diguhêze heta ku di dawîda digihîje "Brehman" (despêka mûtleq a qûwweta xellaqe = **Xweda**), pêra dibe yek. Yanê: digihîje meqam û merteba tekamula nihaîya herî bilind, dereca seadeta

(1) Hinek ji lêkolînvanan jî gotine: ku *sofî*, ji *-Sûfîye-* yê ye. Bi me'na safî û paqiş bûye ye. Hinekan jî gotine ku ji *'Sûfya'* Yûnanîya bi me'na 'hîkmet'e, hinekên din jî gotine ku ji *'seffa ewwel'*e ku cemaeta sofîyan di mizgeftanda, di seffa ewwel da cîh dikirtin (hewl didan ku di seffa ewwel da cîh bigrin), yan jî, ji *'Suffe'* yê ye ku navê sekûya camîya *pêximber* bûye, ku feqîr û belengaz lê di hewilîn. Lê ev hersî îhtimal jî, îhtimalên dûrin, muxalifên qaîdeyên luxetêne, îhtimala ku lêkolînvanên kevn û taze, li ser îttifaq kirine eve ku sofî, ji sûfa bi me'na 'hirî' ye.

rûhîya herî mezin (meqamê întilaqa Hîndûizmê, nîrvana Bûdîzmê), lê bi angorî tesewwûfa îslamê ew tekamula rûhî, ne bi tenasuxê ye, belkî bi îbadet û seyr û sulûk û disiplîn û cehd û xebatên mûayyenên Eqlî û nefsî û derûnîye,ji ber ku di baweriya îslamê da, eqîda tenasuxê şaş û batile.

Betale tenasux, mehale hulûl
Meke îttihada du tiştan qebûl

Eqîda îmanê, rûpel 28/Xanî

Bi te'rîf û te'bîrekî dinê kurt jî, Tessewwuf: Rewşdêran û rengdêrana bi rewş û rengê sofîyane.

Sofî jî, ew kese ku ji nefsa xwe çûye, bi **Xweda** baqî bûye (dev ji xwe berdaye, bi **Xweda** va maye, ji xwe wundaye bi **Xweda** xuyaye), ji tebîet û xûyên suflî û nebaş xwe xilaskirîye, gîhîştîye heqîqeta heqîqetan (rastîya rastîyan) ku **Xweda**'ye, mebde û destpêka hemû tiştaye. Sofî, ji tewbeyêda (ku merhela seretayîya seyr û sulûkêye) dest pêdike, di pirr merhele û meqamanra (wek meqamê were' û zuhd û teqwa û feqr û sebr û tewekulê) derbas dibe, heta ku di dawîda digîhîje meqamê Riza'ê (razîbûyînê), ku di wî meqamêda bi her tiştên ku ji **Xweda** da tên, razî dibe, mûtmeîn dibe, qelbê wî, paqij û pak û nûranî dibe.

Di wî esnayêda (di esnayê seyr û sulûka di van meqam û merheleyanda), pirr hal û halet, (pirr rewş û keyfîyet), (wek halê mûraqebe û mûhasebeya nefsê, halê îtmî'nan û qûrb û mehebbetê, halê xewf û rica yê, halê şewq û îns û mûşahedeyê), ji teref **Xweda** da, bi ser qelbê wî da nazil dibin, ku qelb, ji telleqî û qebûl kirina nûra Yeqînê ra mûste'îdd û amade dibe, digihîje sirrê me'rîfeta heqîqetê (sirrê wehdetîl wucûdê), ku di wî haletê zewqî û şûhûdîyê bi taybetîda, ji xwe fanî dibe, bi **Xweda** baqî dimîne, ku ew halet jî, ew hal û haletê îstixraqîye ku bi *Helacê Mensûr,* 'Ennel Heqq=Ez **Xweda** me' bi *Ebayezîdê Bestamî* jî(*), 'Subhanî = (Ez pak û mûnnezehê ji hemî qusûr û kêmasîya me) daye gotin. Ku di wî haletê şûhûdîyê wîcdanîda, qelb digîhîje

(*) Belkî jî Bistamî (....875 M.), kesê ewwele ku ji *'nîrvana'*yê (fena fîllahê) axifîye, Zûhda dînî (Tesewwûfê), deranîye bal dîtin û têgehîştina 'eqlî û felsefî ku gotîye: "Min Xwedê bi Xwedê naskirîye, masuwayê Xwedê jî, bi nûra Xwedê", *"Sûphanî, Sûphanî ! ma e'zeme şanî"* = "ez pirr pak û pîrozim, şanê min ecêb mezine".

me'rîfeta heqîqeta wucûdê, bi heqqî, îdraka wî heqîqetê dike. Ku ew heqîqet (ew wucûda mûtleq a heqîqî) jî, ji **Xweda** bêtir tu tiştekî din nîne, belkî ewe û heww...! wesselam! -

- Bi heqîqet ku yekin herdû, çi av û çi cemed -

(Mela)

Bi te'rîfekî fireh û 'amm jî, Tesewwuf: 'îttiqada bi îmkanîyyeta îttihada 'eqlê însan, bi mebde'ê esasîyê wucûdê ra (bawerîya bi mûmkînbûyîna yekbûyînîtîya hişê însan bi destpêka bingehîya hebûnê ra), rîyazet û temrîn û disîplînên nefsî û eqlî û exlaqî, îtiqad û bawerîyên ku girêdayên bi wî îttihadê va' ye ku ji wî îttihadê da jî, ji alîyekda terz û ûslûbekî nûh ji heyatê ra peyda dibe, ji alîyek dinda jî, rê û rêçek taze ji me'rîfetê ra çê dibe ku xweyê wê me'rîfetê bi wî me'rîfetê, ji însanên xeyrî xwe, munferîd dibe (bi taybetî û cudaî dibe).

Zahîre (dîyarde)'ya Tesewwufêya cewherî jî, ***îşraq*** e ku di wî haletê îşraqî da rûh, bi birrîn û qutbûyîna 'elaqe û peywendîyên xwe ji bedenê, îttîsal û girêdana xwe bi mewcûdekî kamil û bê nîhayet va, hîss û îdrak dike, dighîje wî şûûr û zewqa şûhûdî.

Di seyr û sulûkên tesewwûfê da jî, gelek meqam û mertebe û merhele hene, kû hemû mezhebên tesewwûfên şerqî û xerbî, li ser wan îttifaq kirine. (Wek merhela mêl û îştiyaqa bal kemalê, merhela sebr û tehemûlê, di pey wî ra, cehd û xebata di rê ya pakî û paqijayî da, di dû wî ra jî, derketin û çûyîna bi alîyê îttîhada bi kemalê ra... (Meqamê el fena û fîllah, wel beqa û bîllahê, meqamê Fanîbûyîna di zatê **Xweda** da, baqîmayîna bi **Xweda**...).

TESSEWUF Û FELSEFE

Her çuqas ku felsefa Eflatûn (Platon), bi taybetî "neoplatonîzm", (felsefa Eflatûnî ya nû), hîmê bingehiyê tesewwûfa xerbê (rojavayê) teşkîl dike û gelek rol û te'sîr û rêçik û şopên wî, di tesewwûfa şerqê da jî, dixuyên. Lê, bi hêsayî mirov dikare bibêje kû tesewwûfa îslamê, ji çavkaniyên îslamê, ji Zuhd û Teqwa îslamê (terka kêf û zewq û hewesên nefsanî, xweşî û geşî û xap-

xapînokên dûnyewî, perhîzkirin û dûrketina ji neqencî û gunehan) da, destpêkirîye, bi angorê şerîeta îslamî meşîyaye. Paşê, bi mûrûra zemanê (bi borîna demê) bîr û bawerî û adet û ayînên bîyanî, mezheb û meşrebên dînên din, şiqitîne navê, tê da bi cîh bûne, kû ji alîyek da ew bûne sebeb û wesîla tekamûlû pêşveçûyîna wî, ji alîyek din da jî, ew berraqî û zelalîya wîya seretayî, hêdî hêdî jê çûye, tevlihev û şêlû bûye, ji mecrayê xwe yê heqîqî derketiye ji armanca xwe şaş bûye, di destê naehl û sextekaran da, bûye lîstok û aletê îstismar û xapandinê.

DESTPÊKA TESSEWWÛFA ÎSLAMÊ

Bi hêsayî mirov dikare bibêje ku tesewwûfa îslamê di nav cemaata îslamê da, bi serê xwe peyda bûye, ji tesewwûfa(2) Ebû Bekr û

(2) **Ebû-Bekrê Siddîq**: Xelîfê yekemîn (...634.M.)
Ûmerê kurê Xettab: Xelîfê duvemîn (...644.M.)
'Ebdullahê kurê Ûmer: (....73.H. = 692 .M.) Ji Mekkê hîcretê Medînê kiriye, ziviriye Mekkê û lê wefat kiriye.
Hesenê Besrî: (....110.H. = 726.M.) li Medînê welidiye li Besrayê bûye seydayê serokê mû'teziliyan wasilê kurê 'Eta
Sûfyanê Sewrî: (....161.H. = 778.M.) Li Besrayê bûye Li Kufayê wefat kiriye.
Rabî'a 'Edewî: (.....135.H. = 752.M.) Li Besrayê bûye, di tesewufê da reform çêkirîye, di şûna tirs û xewfê da, mehebbet û hezkirina Xwedê esas girtiye.
Bûşrê Hafî: (.....227.H. = 841.M.) Ji xelkê Merve yê bûye, li Bexdayê jiyaye
Me'rufê Kerxî: (.....200.H. = 815.M.) Sofiyekî Bexdayê herî mezin bûye
Sirrîyê Seqetî: (....253.H. = 867.M.) Ji Bexdayê bûye, xalê Cuneydê Bexdadiye
EbûYezîdê Bistamî: (..261.H. = 875.M.) Ji bistama Xûrasanê bûye, navê wî Teyfûre, yek ji mutefekirînên wehdetûl-wûcûdê ye.
Cuneydê Bexdadî (.....297.H. = 910.M.) Xwarzîyê Sirrîyê Seqetiye, xelqê Bexdayê buye.
Huseyn kurê Mensûrê Hellac (...309.H. = 922.M.) Ji bajarê Beyda ya Îranê ye, li Bexdayê di rêya bîr û bawerîya xwe da hatiye dardakirin, mûtesewwûfekî gelek mezin bûye.
Ferîduddîn'ê 'Ettar (...1234.M.) Ji sofî û şaîrê îranê, xelqê Meşhedê bûye,
Ebul Hessen, Ûmer Essuhrewerdî (...632.H. = 1234 .M.), Ji mezinê sofîyên Bexdayê, pîrê pîran bûye.
Ûmer îbnû-l Farid (...1181.H. = 1235.M.), şair û mûtefekirekî Misrî ye, 'alim û mûtefekkirê wehdetûlwwûcûdê bûye, dîwana wî, meşhûre, li Qahîrê wefat kirîye.
Eşşeyxul Ekber Muhyîddîn îbnû Erebî (...638.H. = 1240.M.) Ji Endelûsê bûye, li şamê wefat kiriye, pîrê felsefa wehdetûlwwûcûdê ye.
Abdû-l Kerîmê Ceylî (...832.H. = 1428.M.). Ji Ceylana Îran ye, ew jî pîrê wehdetûlwwûcûdê bûye.
Mellayê Cizîrî (1574-1640.M.), Xelqê Cizîra Botane, şaî'r û edîbekmezinê Kurdane, dîwana wî pirr meşhûre, meşreba wî jî wehdetûlwwûcûd bûye, merqeda wî li Cizîra Botan meşhûre; zîyaretgeha gelê Kurde.
Ehmedê Xanî (1651-1709.M.) Pîrê wêje û edebîyata Kurdî ya netewiye, mûtesewwûf û mûtefekkirekî pirr mezin û hejaye, xelqê Hekarîyê, ji 'Eşîra Xanî ye, merqeda wî li bazîdê ziyaretgehe.

Omer û kurê wî yê Ebdullah da, dest pêkirîye bi alîyê tesewwûfa *Hesenê Besrî* û *Sufyanê Sewrî* û *Rabîa 'Edewî* da, ji wan da jî, bi alîyê tesewwûfa *Buşrê Hafî, Sirrîyê Seqetî, Me'rûfê Kerxî, Cuneydê Bexdadî, Eba Yezidê Bistamî* da, meşîyaye, di pey wan ra jî, bi aliyê tesewwûfa *Hellacê Mansûr, Muhyeddînê Erebî, Ferîduddînê Ettar, Suhrewerdî* û *îbnû-l Faridê* va, gav bi gav hatiye; tetewwur kirîye, merhele bi merhele pêş va çûye, ku di nav wan mûtesewwif û mûtefekirên hêja û bijare da, yên wekî Hellac, di rê ya bîr û bawerîya bi wehdetûlwûcûdê da şehîd bûne, Yên wekî *îbnû 'Erebî* û *îbnû-l Faridê* jî di felsefa wehdettû-lwûcûdê da, Ji mûtesewûf û mûtefekkirên Kurdan jî, yên wekî *Melayê Cizîrî*, di tesewwûf û felsefa wehdetulwwûcûdê da, di edebiyata tesewwûfî da, pirr bi nav û deng û meşhûr bûne. Bi taybetî, *Melayê Cizîrî* (Mele Ehmedê Cizîrî). Di dîwana xweya Kurdî da, ba xûsûs, di qesîda xweya bi navê *"Ellah Sehergaha Ezzel"* da, bi rewş û ûslûbekî gelek hunermendî û şarezayî behs û mijara wehdetulwwûcûdê tehlîl û îzah kirîye, pirr feylesofane û şaîrane şirove kiriye, hûnaye, kû mirov dikare bibêje ew qesîda wiya pirr bi rûmet û hêja, ji qesîde ya îbnû-l Faridê ya bi navê *"Nezmîssûlûk = Taîya Kubra"* kêmtir nîne, belkî bi gelek aweyan ji wî, vekirîtir û xweştîr û hijatire.

Mella, di qesîda xwe ya *"Sirrê Wehdet" û "Hêj di ber Qal û Belê da"* jî, wê felsefa wehdetî-lwucûdê, gelek xweş û hêja hûnaye, teswîr û beyan kirîye. (Xwedê, me ji feyz û bereketên wan bê par neke.)

ŞEXSÎYETA XANÎ

Xanî -herwekî hemû cîhet û aliyên xweyên pisporîyên din- di cîhet û aliyê xwe yê tesewwûfê da jî, şexsiyyeta xwe ya bi taybetî ya mûmtaz û hurr, dide nîşandayîn, xwe bi yek teriqet û mezheb û meşrebekî ve, bi yek ekol û rewiştekî felsefî û tesewwûfî ve, mûqeyyed û giridayî nabîne, ji tesewwûf û felsefa Hîndûîzmê, bigre heta felsefa Eflatûn (Platon 427-347 b.m.) ji tesewwûf û felsefa *Zerrdeşt* û *Manî* da, ji ya *Îsa* û Xirîstiyanî da, heta tesewwûf û felsefa Îslamê, mezheb û terîqên wî yên cûr becûr (wek terîqa neqşebendî û qadirî û şazilî, mezhebê selefî û sunnî û mû'tezîlî û qederî û cebrî), ji tesewwûf û felsefa Farabî (...950 m.) û *Îbnî Sîna* (980-1037) û *Îbnû Rûşd*'ê (1126-1198), heta tesewwûf û wehdetulwûcûda Îbnu-l Erebî û Îbnûl Faridê, di hemû meydanên fikrî û felsefî û tesewwûfî da, hespê xwe bezandîye, li dora wan

mûnawere kiriye (çûye û hatîye), bi angorê qaîda خذ ما صفى ودع ما كدر = tiştên safî û zelal bigre, dev ji tiştên ne safî û şêlû berde), ji her kesî, ji her Re'y û, her fikrî, tiştên qenc û xweş û rast girtîye, tevê dîtin û fikrên xweyên bi taybetî û giranbiha kiriye, bihevra vestiraye, ro kiriye, fikr û heqîqetên bi rûmet û hêjayên nûh û taze, jê deraniye û pêşkêş kirîye.

XANÎ Û MUTESEWWÛFÊN DIN

Ku dema mirov li Xanî û mutefekirên din mêzedike, wan dide ber hev, hem şekl û sîma û sûretên fikr û baweriyên wan mûtefekkiran, gotin û îbaret û naverokên wan, di Xanî û fikr û gotinên Xanî da dibîne, hemjî rastê hinek tiştên cûdaî jî tê. Ku ev jî (ev wekhevîtî û jihev cûdatî) şexsiyeta Xanî ya cûda û pispor û zana, tîne ber çawên mirov, bi hêsayî mirov ferq dike ku Xanî, ji aliyek da wek *îmamê Xezalî,* meşîyaye; felsefe û îlmê kelamê (îlmê 'Eqîda îslamê) bihev ra mezc û ro kirîye, meşandiye. Ji aliyek din da jî, wekî *îbnû Erebî* û *iîmû-l Faridê* meşiya ye, wehdetû-lwûcûdê (felsefê) û wehdetuşşûhûdê (tesewwûfê) gîhandiye hev, li hev kom kiriye, di qalibek da ro kirîye, ji aliyek dinda jî, wek *Hellac*, li rê û mesleka "fena fîllah"ê (fanîbûn û tûneyîbûna di zatê Xwedê da) çûye, seda *"Enel heqq"* a wî, ji nûve daye 'ekiskirin; wek şaîr û hûnermendekî şareza jî, li ser zimanê qehremanên destana xweya Memo û Zîn'ê, şekl û sûretên fikra xwe ya tesewwûfê, kişandîye û dîyar kirîye.

XANÎ Û ÎŞQ

Xanî, durif û nîşanên 'sofîyên heqîqî jî, di işq û evîndariyê da dibîne û dide nîşan, 'işq û evîndariyê jî, bi du cûran dibîne û dinerxîne :

1- 'îşq û evîn û wisala dûnyevî (evîndarî û gîhîştina heva di dûnyayê da, wek ya Sittî û Tajdîn).

2- 'îşq û evîn û wisala ebedî, wek ya Mem û Zîn ê ku Xanî bi rewş û bîr û baweriya xweya tesewwufî (sofîtî), tercîha wî cûrê 'îşq û evînê ('îşqa Mem û Zîn ê) ya ebedî û ûxrewî dike, li ser zimanê Mem ê, wiha dibêje:

Ez naçime hezreta çu mîran (3)
Ez nabime bendehê esîran
Ev mîr û wezîrîya mecazî
Ev şu'bede û xeyalî bazî
Bil cûmle betal û bê beqane
Bê aqîbetin, hemî fenane
Mîrê kû mirin hebit ne mîre
Me'zûlî hebit ewî esîre
Em çûne hûzûra mîrê mîran
Wî hakimê hakim û feqîran
Şahînşehê mîr û padîşahan
Bexşendeyê tûhmetê gûnahan
Ê çêkirî neynika cemalê
Tê ra xwe nûma bi zûlf û xalê
Fanosê beden kirî mûtella
Tê da ji me ra gerî tecella
Ew mîrê hekîmê zûl-celale
Bê ezl û texeyyûr û zewale

Yanê: Hemû padîşah û mîrên dunyayê, wek dîl û hêsîrane, ne mîr û padîşahê heqîqîne, hemû seltenet û kêf û zewqên wanên dûnyewî jî, wek lîstok û xewn û xiyalin, hemû batil û fanîne, mîrê ku bimre, -ji meqamê selteneta xwe bê ezilkirin- ew ne mîrê bi rastiye, mîrê mecaziye, Ez mîrê wilo naxwazim, ez îro çûme hûzûra mîrê mîran, padîşahê padîşahan, fermandêrê hakim û feqîran, ew mîr û padîşahê kû neynika spehîtî û bedewîtiyê çêkirîye, xwe bi bisk û xalan di wî neynikê da daye nîşan û kifşe kiriye, fanosa beden û heykelên rind û bedewan, bi zêrcîla kirîye, xwe tê da nîşanê me daye. Ez wî mîrî dixwazim, ku ew mîr û padîşahekî hekîm û zanaye, bi quwwet û qûdrete, bê ezilkirin û bê guhestin û bê zewale.

---

(3) **Şû'bede, şu'beze:** sêrbazî û çavbendî
Xîyalîbazî: xiyal lîstin, ne heqîqî, xiyalî
Mûtella: zêravkirî, bi zêr neqişandî, mûzehheb
Gerî Tecella: diyarbû, xûya gerîya, xwe nîşanda
Texeyyûr: gûherandin, muxeyerrbûn
Bexşende: efûker
Tûhmet: îttiham kirina bi gunehan, suc û qebehet
Tê ra xwe nûmaye: di eynika cemalê da, xwe bi wasita bisk û xalên rind û bedewan diyar kirîye.

Lê bi rewş û bîr û baweriya xwe ya felsefî û tesewwûfî bi hevra, we yan bi rewşa xwe ya felsefî bi tenê jî, herdû cûrên îşq û evînê, (îşqa heqîqî û mecazî) wek hev di hesibîne, di navbera wan da ferq û cûdaîtîyekî mezin nabîne û dibêje:

Ger şêxên û ger mella û mîrin
Derwêş û xenîne, yan feqîrin

Kes nîne, ne talibê cemalê
Kes nîne ne raxibê wîsalê

Hin, raxibê husnê la yezalin
Hin, talibê qalibê betalin

Lakin hemîyan, yeqîn yeke dost (4)
Ferqa ku heye, ji mûxze ta post

Yanê : çi şêx û mella bin, çi mîr û paşa bin, çi dewletî û feqîrbin, tu kesê kû daxwazker û talibê rindayî û spehîtîyê nebe tune; hemû kes, hemû cûrên însanan rindayî û cemalê divên, jê hez dikin, hemî jî, dixwazin ku bighîjin yar û meqsed û mirazên xwe, hinek kes ji wan, rindaya ebedî û daîmî divên, hinekê din jî, heykel û qalibê betal dixwazin. Lê ji hemûyanra jî yek dostek bi tenê heye, ji ber ku di navbera dosta heqîqî û mecazî da, pirr ferq û cûdaîtîyekî mezin tune, ferq û cûdaîtîya ku di navbera wan da heye, wekî ferq û cûdaîya di navbera çerm û mejû da ye. (Ku çerm û mêjû bi hevra, parçeyên yek wucûdekin, wûcûd, ne bê çerm û post dibe, ne jî bê mêjû, lê mêjû, jî post bi qîmettir û bi rûmettire.

Bi kurtî: Dosta Heqiqî wekî 'Eql û mejû û rûhe, ya mecazî jî wekî beden û heykele (Yanê **Xweda**, rûhê me'nevîyê beden û heykelê 'Alemê ye)

Goya hemî cîsmekin Tu canî — Goya hemî şehrekin Tu xanî
(Xanî)

Goya hemî bexşekin Tu kanî — Goya hemî nexşekin Tu "manî"
(Durre)

(4) **Yeqîn:** bê guman bê şik û şubhe
Mûxz: mejû, mêjî, mêjû
Post: çerm
Hemîyan yeke dost: dost û yara hemiyan, çi heqîqî be çi mecazî be, yeke, tiştek bi tenê ye. Ku di vir da jî, îşaretkirina bal felsefa wehdetû-l wûcûdê dixuyê.

Xanî, piştî ku îşq û evînê, bi neynika **xweda**nûmayî, bi roja pirr bi ronayî, dişebihîne, rîya herî nêzîk ji boy gêhîştina bal me´şûq û mirazê va jî, wî rîya îşq û evînê dibîne, tewsîye dike ku merif ji wî rîya kurt û hêja derneyê, xafil û şaş nebe û wiha dibêje :

Îşq ayîne yê Xûda nûmaye (5)
Xurşidê sifet, xudan zîyaye
Xafil nebe îşqê filheqîqe
Ey rehrewê eqrebitterîqe !
Xweş cewhere cinsê kîmîyaye
Qedrê wî bizan, giran bihaye

Yanê: ey ew kesê kû tu dixwazî li rêya herî kurt herî, bi wî bigîhîjî yar û mirazê xwe, tû xafîl nebe û şaş nebe ku di heqîqet da, rêya herî kurt û nêzîk ji wî ra, rêya işqê ye. Ji ber ku îşq gewherekî gelek bi rûmet û giranbihaye, ji cûrê kîmyayê ye (zêrîne) qedr û qîmetê wî rind bizane, dev jê bernede ! ku rê ya kurt û nêzîk jî ewe, eynika Xwedênîşan û roja pirr bi ronahî jî, ewe. (îşq û evîne)

TERÎQA XANÎ

Bi vî awayî jî, Xanî di nav wan hemû cûrên mezhebû terîqên tesewwûfên ku di dema wî da hebûne, tercîha terîqa *Mem û Zîn* ê dike. Ku terîqa îşq û evînê ye. Bi îşq û evîna Mem û Zîn'ê, bi pêt û şewatên nav û dilê wan jî, îşq û evîn û derd û kul û hesretên nav û dilê xwe dirrêje û dibêje, îşaret dike kû terîqa wî bi xwe jî, teriqa îşq û evî nê ye, ya *Mem* û *Zîn'*ê ye :

Sazê dilê kul be zêr û bem bit (6)
Sazendeyê îşqê, Zîn û Mem bit
Şerha xemê dil bikim fesane
Zîn'ê û Mem'ê bikim behane
Nexmê, we ji perdeyê derînim
Zîn'ê û Mem'ê ji nû ve jînim

(5) **Xweda nûma:** Xweda nîşander
Filheqîqe: di heqîqet da, di rastiyê da
Rehrew: Rêwî, salik
Eqrebbuterîqe: Rêya nêziktir, rêya herî kurt û nêzîk

(6) **Zêr û bem:** Du meqam û du sedayên sazbendî û mûzîqêne. Zêr, ya bilinde. Bem jî, ya nivze, hem jî, zêr û bem, navê du destgah û du aletên mûsîqîyêne jî. Lê di vir da meqsed: ew herdû meqamên mûsîqîne ku bi hevra tên.

Xanî, bi ûslûb û terzekî mûtewazî, pîrîtî û şêxîtiya xwe jî, li ser zimanê Zîn ê îma dike, kesên dinên jî, da'wetê bal wê terîqetêva dike û dibêje:

Şêxê we ku ez, bi dil murîdim (7)
Ew rûh û rewane, ez qedîdim

Her çendî li ba we navî Mem bû
Lê padîşehek 'Elî hîmem bû

Qelbê wîye wadîya mûqeddes
Rûhê wî bi nûrê heq, mûqebbes

Heywanîyyeta me, bûye zail
Rûhaniyeta me, bûye kamil

Cismê me, eger diçîte çalê
Rûhê di me, dê bigên wîsalê

DU KÊL BI KEWIREKÎ

Meselekî Kurdan heye: dibêjin ku «du kêlan bi kevirekî werdigerîne» Xanî jî, di gelek meselanda wilo dike: du kêlan -hinek caran jî, çend kêlan- bi kevirekî werdigerîne, ku di wir da jî, hem îşaretê bal terîqa xwe dike, ku îşq û evîn e, hem jî îşaretê bal şêx û pîrê xwe (ku di zahirda Mem û Zîn e, di heqîqetda ew bi xwe ye), dike û xwe ji xwe ra kafî dibîne, hem jî, îmayê bal şirovekirina fikr û bawerîya ku dibêje: "mirov, bê pîr û şêxekî nabe, bi tenê nikare tesewwûfê bimeşîne" dike, zumnen dide zanîn ku tesewwûf kir û karekî, bîr û baweriyekî ferdîye, mirov

---

Nexme: awazê xweş, newa û seda, stran û surûd
Fesane: hikaye, çîrok
Behane: bahane, wesîle, ho
Jinûvejînin: ji nûh bijînim, sax bikim
We: wilokî, bi wî terzî
Perde: aheng, hewa; perda saz û kemançê, hicab û niqab

(7) **Qedîd:** goştê hişk bûyî, ku di wir da meqsed jê bedena însane
'Alî hîmem: Hîmmetbilind, himem, cem'a hîmmetê ye kû bi me'na 'Ezm û îrade û dildarî û merdîtiye
Wadî: newal,
Mûqeddes: pîroz,
Wadiya Mûqeddes: newala pîroz, mebestê li newala Tûrî Sîna ye, ew newala ku Mûsa pêxember di wê da dengê Xweda bîhîstiye, se'h kiriye.
Mûqebbes: nûranî bûye, qebesekî, pêtekî ji pertewa wî nûrî gîhîştiyê
Çal: kort û çalik, ku di wir da, bi me'na gor û mezele
Heywanîyet: cîhet û teref û rewşên heywanî û maddî
Bigên: Bighîjin
Rûhanîyyet: yên rûhanî û derûnî, ma'nevî
Wîsal: gîhîştin, gîhîştina mehbûbê

bi tenê dikare wê jiyana xwe ya bi taybetî û rûhanî, bi meşîne; mejbûriyet û îhtiyaca bi bal şêxekî va jî, nîne.

Ji xwe rewşa Xanî, di hemû mesele û mijarên xilafî û neîttifaqî da wisaye: Berê, temasê fikr û mezheb û dîtinên cûr be cûr dike, teref û aliyên wanên musbet û menfî bi ûslûb û terzekî nerm, di hinek ciyanda jî, bi îma û îşaret beyan dike, paşêjî, di zumnê wîda, yan bi îma û îşaret, weyan jî vekirî û raste rast, fikr û baweriya xwe beyan dike, mora tercîha xwe lê dide. Ku di vê meselê da jî wilo kirî ye: Ji aliyek da, li ser zimanê Zîn ê dibêje ku meqsed û mirazê mirov, bê xilweta hass di gel şêxekî kamil (bê tenêmayîna xûsusî di gel pîrekî Gîlhîştî), hasil nabe.

Zanî ku nebû mûradê hasil
Bê xîlwetê xassê şêxê kamil

Di dîwana xwe da jî dibêje ku azadîya min ji qeyd û bendan, vebûna dilê min, kinbûyîna rîya wisalê (gîhîştina bal meqsedê) ji boy min ra, bi dîtina neqşekî ji neqşê neqşebendan, we yan bidîtin û suhbeta şêxekî ji şêxên neqşebendîyan, muyesser bû, hêsa bû:

Medî neqşek ji neqşê neqşebendan (8)
Vebû qeydên di min yek yek ji zendan

Kûşada dil ji bo min ra muyyeser
Nebû bê suhbeta sûretlewendan

Li min kurt bû Rêya Ke'ba wîsalê
Ji nûra tel'eta balabulendan

Me-j Ahoyan, Hoyan xwestin û emma
Dilê min ma di gel mişkîn kemendan

Heçî pêlek di îşqê da 'emmel kir
Dibîtin 'aqîbet şadan û xendan

Ku mirof ji zahirê wî, teşwîqa bal terîqeta neqşebendî û întisaba bal şêxekî ji şêxên wê terîqetê, fêm dike, jê dertîne ku îhtîyacîya bal şêxekî va heye, întisaba wî şerte.

(8) - Medî şêxek ji şêxê neqşebendan - (n)
Ji kerema xwe di sehîfa 276-279an da, li şerh û îzaha vê qesîdeyê mêze bikin.

Lê ji aliyek din da jî, mirof ku bi dîqqet û kûr bala xwe didê, dibîne kû Xanî, mesela mecbûriyeta bal şêxekî va, bi suhbet û hevalîya qencan şirove dike, mûwafiqê mealê vî emrê îlahî (we di gel kesên sadiq bin ١١٩/التوبة. «وكونوا مع الصادقين») digerîne ku bi wî awayê jî meseleyê ji qirêjayî û gemarîya çewtî û şaşî û xûrafeyan dişo, ji lîl û hezeka şirk û pûtperestiyê dertîne, bi aliyê heqîqet û rastîyê va (tewhîda îslamî) va, dikşîne, pak û paqij pêşkêş dike di dawîyê da jî tercîha xwe ya ji terîqa îşq û evînê ra dinerxîne, dibêje: herçî kesê ku qederekî di îşqê da kar û 'emel dike, ew kes di dawî da dil şad û devbiken dibe, dighîje meqsed û mirazê xwe.

Heçî pêlek di îşqê da 'emel kir
Dibîtin 'aqîbet şadan û xendan

Ku bi wî awayê jî, bi kevirekî çend kêlan bi hev ra werdigerîne: Hem terîqeta xwe,- ku terîqa îşqê û Neqqaşê îşq û evînêye - hem şêxitiya xwe ji wê terîqetê ra, hem şîrovekirina îhtiyacî û mecbûriyeta bal şêxekî va, bi suhbet û hevalîya baş û qencan ra, zana û pisporan ra, hem jî, ji nav hemû terîqetên di dema xwe da, 'elaqe û peywendî û temayula xwe ji *Terîqeta Neqşebendî* ra, îma û îşaret dike û dibêje :(9)

Medî şêxek ji şêxê neqşebendan
Vebû qeydê di min yek yek ji zendan

Kuşada dil ji bo min ra mûyesser
Nebû bê suhbeta sûret lewendan

(9) Ev jî rastiyekî waqiîye, ku di binê perda terîqet û şêxitiyê da, pirr çewtî û şaşitî û xûrafeyên cilq û gemar, ketine nav îslamê, tewhîda heqîqiya îslamî, bi wan lekedar û zengarî bûye; Di şûna tewhîda heqiqî da, pûtperestiya dema cahiliyyetê, bi hemû cûrên xwe cîh girtiye û tên xûyanê. Pirr tiştên mûxalifê îslam'ê û dijê naverok û armanca wîya pîroz, bi navê îslamê, di bin perda dîn û terîqetê da, ketine nav alema îslam'ê -wek ku essas û hîmê dînên- di nav xelqê da, belav bûne û cîh girtine.

Bi kurtî; şêxitî û terîqet bûne bela serê alema îslamê, bi taybetî jî, bûne bela serê gelê Kurd û Kurdistan'ê, ku dijmin û neyarên azadiya Kurdistan'ê û gelê wîyê mezlûm, bi wasita wan bawerîyên çewt û nerast, wan terîqet û pîr û şêxên sextekar, bi salane ku gelê Kurd dîl û hêsîr kirine Kurdistanê jî yaxme û talan kirine û dikin jî. Ku hêjî gelê Kurd, ji wî teniya bi don, ji wî çilq û miqrob û Rîşa pûç (ji wî qanser'ê) xilas nebûne.

Lê ev rastî jî heye ku di nav pîr û şêxên terîqetan da, pirr şexsîyetên qenc û pak û temîz jî, hebûne, ji doza Kurd û Kurdistan'ê ra jî xebitîne, di rê ya wî doza pîroz da gelek ji wan jî, şehîd bûne, (rûhên wanên pak û ezîz şa bin, rihmeta Xwedê li wan bin).

— ÇIMA TERÎQA NEQŞEBENDÎ —

Çima ?

Ji ber ku her çiqas di nav hemî terîqetên tesewwufê da, terîqeta herî sade û mûtabiqê şerîeta îslamê, terîqeta *Ebûl Hessen ê Şazilî* (593-656 H.) ye, (kû *Îbnul Etaullah'ê Îskenderî* (658-709 H.), di berhema xwe ya bi navê "*El Hîkemûl 'Etaîyye*" da, esasên wê terîqetê beyan kirîye), lê ew terîqeta şazilî, wek terîqeta neqşebendî (şahê neqşebendî, Bahaeddînê Neqşebendî... 1385 m.), di Kurdistanê da, belav nebûye û rewac nedîtîye.

Ku hîmê wî terîqa neqşebendî jî, li ser zuhd û teqwayê, terka masûwayê, hatî danîn. Çawan ku, şaîrê wan jî gotîye:

Der terîqê neqşebendî, lazim ayed çarî terk
Terkê Dunya, terkê Ûqba, terkê hestî, terkê Terk.

Yanê, di terîqa neqşebendî da,lazime ku merif çar tiştan terk bike, mûlaheze neke:

1. Terka dunyayê, 2. Terka ûqbayê (axiretê), 3. Terka hebûnê, 4. Terka terkê.

Yanê divê ku mirof terka terkê jî bike, mûlaheze neke ku va ji boy Xwedê terka van tiştan kirîye, belkî mûlaheza rîza ya Xwedê bi tenê bike, ku riza ya wî jî, di rîayetkirina qanûnên wîyên *tekwîmî* û *teşrîî* da ye, di kir û karên ku saadeta beşerîyetê tê da hene, di cehd û xebatê da ye, ne di tembelî û pintîtî û belegazî yê da ye.

Xanî, di berhema xweya bi navê "Nûbihar'a piçûkan" da jî, gotîye:

Şêxîtî û sofîtî û kiramet
Îlm û xwendin û 'Emmel

Bi vê munasebetê, ez dixwazim li ser wê bawerîya ku dibêje: "kesê şêxê wî tûnebe, şeytan şêxê wî ye", şirovekirin û têbinîyekî herî enteresan û xerîb îşaret bikim: "Kesên ku şêxên wan tunene, şeytan wan dixapîne, lê belê, kesên ku şexên wan hene, şêxên wan, wan dixapînin, îhtiyacî bal şeytan va namîne, yanê: şêx, ji şêytan jî, şèytantirin, kesên ku şêxê wan hebin şeytan têkilê wan nabin, ji ber ku şêx wezîfa şeytanan, ji şeytanan çêtir pêktînên, ji wan zêdetir dikarin mirovan bixapînin. Bi kurtî, yanê: Tiştên ku şêx dikin, şeytan wan tiştan, ne fêm dikin, ne jî dikarin bikin. Ku bi rastî jî, ev şirovekirin derbareyê şêx û pîrên sextekar û xayîn da, gelek di cîhê xwe da ye, têbînî û zîrektiyekî pirr giranbihaye. (Xwedê, ji xweyê vê şirovekirinê razî be!).

Yanê şêxîtî, 'îlm û îrfane, sofîtî jî, xwendin û zanîna însane, kiramet jî kir û kar û pratîka wane. Ku bi rastî jî, ew te'rîf û teşhîseki gelek wecîz û me'nîdar û di cê xwe daye.

XANÎ Û QEDER -([10])

Xanî, di wî mesela girift û hessas da, wek mûtesewwûfekî îslamî, ji çerçewa mezhebê *Sunnî* nexwestîye, ku derê, lê wek feylesofekî mutesewwûf, ji wê çerçewê derdikeve, di çerçewekî felsefî û fireh û însanî da, bîr û baweriyên xwe, bi terzekî taybetî û cûdayî teswîr û beyan dike û dibêje:

Ey dil meçe bê çiraxê canî,
Zulmate Tu korî, Rê nizanî
Lewra tû nûmûnedarê zatî,
Ayîneyê sûretê sifatî
Zînharî! meçe li dû teserra,
Da can ne ketin ji te teberra
Çûna Te bi bîte Xariciyyet,
Terka Te bi bîte Rafiziyyet
Xaric mebe, ta bi bî tû daxil,
Terkê meke, ta bi bî tû wasil
Refdê meke tû bi dil be sûnnî
"Ma balûke, weyhek! Ente minnî"

Yanê: "Ey dil! bê çira rûh û can, Tû bi cîhek da neçe ! her der zûlmat û tarîtîye, çavên te jî, korin, Tû Rê jî nizanî. Hem jî Tu

(10) **Mesela Qeza û Qeder'ê**, di hemû dîn û felsefan da, cîh girtiye û bûye medar û sebebê pirr îxtilaf û keşmekeş û mûnaqeşeyan, pirr mezheb û meşreb û bîr û baweriyên cûr be cûr jê peyda bûne; ku pirr hadîse û şerr û ceng û cîdal jî, ji rûyên wan da çê bûne; piştî zuhûra îslam'ê, di 'Esra Seadetê da (dema jiyana pîroza Hz. Muhammed'da), pêşî li îxtilaf û mûnaqeşeyên derheq qederê da, hatibû girtin, lê di pey wefata pêxember ra, ew agirê nîv vemırî û veşartî, dîsa hil bû, bi taybetî, jı aliyên kesên ku dijê îslamê bûn, ew agir ji nû ve hat geşkirın, ku Bîd'etên (fikr û bîr û baweriyên ku di dema pêxmber da tûnebûn) cûr be cûr, peyda bûn; Bîd'eta seretayî, bîd'eta *Qederîyye* bû, ku ji alî *Me'bed*'ê kurê Xalid'ê el Cuhenî (....80 H. = ...695 M.)da, hate îcad kirin, înkara qederê dikir û digot: Qeder tûne, însan di hemû kir û kar û biryar û qerarên xwe da, hurr û serbeste, bi îrade û îxtiyariya xwe karên xwe dimeşîne. Serokê mu'tezîle, *Wasilê kurê E'ta* (699-746) jî, mezhebê *Mu'tezîle* li ser hîmê hurriyeta îrada însan dadımezirîne, dev ji fikra seydayê xwe (Hesen'ê Besrî) berdide, terka meclîsa wî dike. Ku *î'tizal* jî bi m'ena dev jêberdan û terkkirine, navê *Mu'tezîle* jî, ji wîda tê, bi me'na ew cemaata ku li ser mezhebê î'tizalêne, terka fikra Hesen'ê Besrî kirine.

numûnedar û tecellîgaha zatê **Xweda** yî, Neynika sifatên wiyî, pirr bi diqqet be! li dû kêf û zewqê neçe, ku can ji Te ne xeyîde, xwe ji te dûr neke. Ji ber ku rewşa çûyîna Te li pey hewes û kêf û zewqê, dibe wek rewşa wan kesên ku li himber Hz. 'Elî derketin. Rewşa terk kirina Te jî, dibe wek rewşa rafiziyên ku xîlafeta Ebû Bekr û Omer redd dikin; Ji Rê ya rast jî, derneyê ku Tû Wasil bî (bigîhîjî meqseda xwe), we yan ku Tu bibî wek *Wasilê kurê 'Eta*, hey hewar!! ji boy xatirê Xwedê be! rewşa te çiye, tû çi difekirî? diqqet bike, ha jê hebe! Tû ji meyî".

Ku Xanî, di vir da hem fikra xwe ya mezhebê Sunnî diyar dike, hem jî bi "tewrîye"([11]), temayula xweya bi aliyê Wasilê kurê E'ta da, îma dike. Ku dibêje: "Terkê meke ta bibî Tu Wasil", di dawî da jî ku dibêje "Ma balûke weyhek Ente minnî = rewş û fikra te çiye, Tu ji meyî" îmayê bal teredduda dilê xwe dike, ku bi wî îmaê jî hurriyeta xwe ya fikrî û şexsiyeta xwe ya cûdaî, îma dike.

Dijê wê bîd'eta *qederiyê* jî, bîd'eta cebrîye. (fatalisme) derketiye, ku ew jî dibêje: Însan di hemû kar û kir û rewş û rewiştên xwe da, ne bi îrade û îxtiyarî û kêfa xwe ye, mecbûr û mûzterre; bi angorî qedera ezelî (qedera Xwedê) di meşe û fermanên wê qederê bi cîh tîne. Damezroxê wê Bid'et jî, *Cehm*'ê (...128 H. = ...745 M.) kurê Sefwane. Ku ji bilî mesela qederê, ew û *mu'teziliyan* wek hevin.

Di navbera wan herdû fikrên îfratî û tefrîtî (herdû fikrên tûjên dijên hev) da, fikra weseta Mezhebê Sunnî ye. Ku ew mezheb hem qederê, hem jî îxtıyarî û îrada însan bi hevra qebûl dike, dibêje: "Teqdîr ji Xwedê ye, kesp û tedbîr jî, jı mirovan da ye." Ji wî mezhebê ra jî du mill û du şax hene: şaxa Eş'erî ku ji terefê *Ebûl Hesen Alî-El Eş'erî* (... 936 M.)da, şaxa Matûrîdî jî, ji alıyê *Ebû Mensûr Mûhemmed El-Matûrîdî, Essemerqendî* (....944 M.)'da, hatıne damezrandin. Ku ew herdû şax jî, di nav ekserê alema îslamê da zêde rewac dîtine, belav bûne.

Lê ev jî rastiyekî îlmiye ku mezhebê *Mu'tezîle*, ji mezhebê Sunnî (Eşerî û Maturîdî) felsefîtir û nêziktirê bal 'Eql û Mentiqê va ye. Di dema selteneta 'Ebbasî da jî, mezhebê dewletê yê mîrî (resmî) bûye. Ku dı gelek meselan da temayûla Xanî jî, bi bal wî mezhebê va dixûyê.

(11) *Tewrîye*: Di lûxet da, bi m'ena xefkirin û veşartine, di hûnerê wêjevanî da jî, eve ku jı bêjekî ra du me'na hebin: yekê dûr, yekê nêzik, ku ji wê bêjeyê. m'ena wiya dûr, bête qestkirin; Wek kû dı vir da: "terkê meke ta bibî tû Wasil" ji kelîma Wasilê, "Wasil"ê kurê 'Eta (serokê mezhebê Mu'tezîle), bite qestkirin, ku me'na viya dûre, me'na wiya nêzik jî: "kesê gîhîştî" ye, ku bi an gorê wî hunerê Tewriye yê: me'na helbestê, wiha dibe: "ey dil tu terka can neke, ku tu bibî wek Wasil'ê kurê 'Eta'yê ku terka fikr û meclîsa *Hesen'ê Besrî* kir, ku jî wî me'na yê ra jî, du te'wîl, du me'ne heye:

1) - Ta ku tu bibî wek Wasıl'ê kurê *Eta* ku ji heqîqetê dûrketiye

2) - Ta ku tu bibî wek Wasil'ê kurê Eta yê ku gihîştiye heqîqetê.

Ku dema ev me'na dûwemîn, bête qestkirin, ew jî, dibe tewrîyekî din. Ku bi herdû tewrîyan bi hevra, temayula Xanî ji mezhebê cebrîye ra, tê îma kirin.

TEMAYULA XANÎ

Xanî, di cîhek din da jî, bi ûslûbekî temsîliyê herî balkêş û hêja, (bi mûhawere û hevpeyîvîna di navbera xwe û Ney û Qelemê da), li dor *Qederê* û mesela hurriyet û ne hurriyeta însan di kir û karên xwe da, diçe û tê, minawre dike, ku hem fikra alimên Kurdistanê (fikra mezhebê Sunnî) rencîde nake, hem jî, îşaretê bal tercîh û mêla xwe bi bal mezhebê **"Cebriyye"** va, dike, wek mûtesewwûfekî feylesof, bi zimanê halê **Neyy û Qelemê** wiha dibêje:

Bezma terebê, bi min Te xweş kir
Dîwanê gunah bi min Te reşkir

Her çendî ku zahirî hey im ez
Sazende Tûyî, wekî Ney im ez

Ma Ney bi xwe, tiştekî dibêjit?
Xame bi xwe, reşhekî dirêjit?

Katib qelemê diket sîyahkar
Sazende ye, Ney ji dest bi hawar

Neyy û qelm û kitab û nîşan
Tîr û hedef û keman û kîşan

Bezma terebê: meclisa kêf û zewq û şayîyê.
Dîwanê gunah: kitêb û defter û dosya gunahan
Ney: Nay, billûr.
Ma: qeyê, qey
Xame: qelem, pênûs, pênivîs.
Reşhekî: dilopekî, şilayîyekî.
Siyahkar: kareres, yê kû karê wî reşkirin e.
Keman: Kevan.
Kîşan: (Cem'a kîşê ye), bi me'na: kîskê tîran, kiskê kû tîran dixinê.
Mehkûm û 'Eleyhîbûn: Hukm bi ser wan da hat, ew kesên ku mehkûm dibin.
Bi teqdîr: Bi emr û fermana Xwedê (bi qedera ezelî)
El Heqq: Bi rastî, di heqîqet da.
Testîr: Rêz kirin, nivîsandin.
Mutleq: Bi her awayî.
Serqelem kir: Serê qelemê der heq wî da lêxist, nivîsa wîya seretayî nivîsî.
Reqem kir: Nivîsî.
Hemîşe: Daîma, her tim.
Me'zûr: Xweyî uzr û bihaneyan.
Serqedembû: Li ser linga bû, li ser lingên xwe sekinî.
'Elem: Al, ala (beyreq).
Peyweste: Hemîşe, daîma.
Sanî: Çêker, çêkrox, xaliq.
Bi xwe: Bi zatê xwe, bi xwe - bi xwe.
Hadî: Rênîşan, rênîşander.
Mûdîll: Gumrahkher, ewê ku rê li ber mirovan winda dike.
Cuz'î ixtiyarî: Îradekî piçûçik.
Pelîd: Cilq û pîs û xebîs.
Lutfêheq: Lutf û îhsana Xweda.
Mededkar: Yê kû karê wî,hatina îmdad û hewariya mirova ye.
Xîyali zîll: Xîyal û zîll (Shadow Play): Cûrekî ji lîstikên temsîli yên kêf û şahiyê ye: Ku hinek robot û heykelên ji çerm, di piştperdekî tenik û sipî da, bi darikan di reqisînin, pêra distirên, li saz dixin. Pişta perdê rohnî dikin, pêşiya wî jî tarî dikin ku temaşevan dema li perdê mêze dikin, resm û sûretên wan robot û heykelan, li ser perdê wek sînemayê dibinîn, pê kêfxweş dibin, dikenin, wextên xwe diborînin. Ku ev lîstok, berê li Çîn'ê îcad bûye, ji Çîn'ê jî derbasê welatên 'Ereban, ji wir jî, derbasê Europa, ji Europa jî derbasê Amerîka bûye.

Mehkûm û 'eleyhî bûn bi teqdîr
Hêj îsmê gûneh nebû bi teswîr

Di dawî da, *Xanî* rewşa halê xwe yê ku wek halê *Neyy û Qelemê* dibîne, bi niyaz û îhtiram, ji **Xweda** ra wiha 'erz dike û dibêje:

Ya Reb! Tu dizanî Xanî yê jar
teşbîhê bi xame ya giriftar

Qelbê wî di dest Te da ye el-Heqq
destê wî, di dest wî nîne mutleq

Gava ku li wî Te serqelem kir
herçî Te îrade kir reqem kir

Amir Tu yî, ew bi emrê me'mûr
me'mûrê di bin hemîşe me'zûr

Ger dayî ye wî Te, îxtîyarek
ew jî wî sipare Te, bi carek

Peyweste di dest Te, serqedem bû
ew ger 'Elem û eger qelem bû

XANÎ Û CUZ-Î ÎXTÎYARÎ

Xanî, 'alemê (kaînatê) bi wî lîstoka meşhûrê bi navê "*xîyalizzil*"ê dişebihîne û teswîr dike, Hîdayet û delaletê (rênasî û gumrahiyê) jî, ji **Xweda** da dibîne, dibêje: kû çîkroxê alemê (Xaliqê alemê) bi xwe, hem hadîye (Rê nîşandare), hem jî mûdîlle (gumrahkere).

(«فإن الله يضل من يشاء ويهدي من يشاء»)

Yanê : Heqîqet ewe ku Xwedê kî bixwaze, ji rêya heqq dertîne, kî jî bixwaze, tîne ser rêya heqq (Fatir, ayet.8).

Lê, Cuz'ê îxtiyarî û Nefsa pîs û pelîd(Cilq û gemar) jî, daye me. Ku bi wasita wî Nefsa pîs û pelîd, Ewî Cuz'ê îxtiyarî jî, ji destê me girtiye; Di destê me da ew ma ye ku lutf û îhsana Wî di îmdad û hewara me were; ji Wî bêtir jî, tu çare û îmkan di dest me da nema ye.

'Alem ku wekî xîyal-î zîll e
Sanî' bi xwe, hadî û mûdîll e

.....
.....

Lê daye me cuz'ê îxtiyarî
Nesfa me pelid û hîlekarî

Ew jî birî ye ji dest me naçar
Em mane û lutfê heqq mededkar

(11-Li haşîya rûpela pêşîn mêze bikin!)

REÇETA XANÎ

Piştî wî teşxîsê, Xanî wek mûtefekkirekî doxtor û rêzan, wek mûrşîd û mûtesewwûfekî pispor û dilovan, çara wî bê çaretiyê, dermanê wî derdê giran, wiha dibîne, reçeta wî wiha dinivîse:

Bes! qencê ji bo me 'amîyan ra
her ew bes e! bo me 'asîyan ra

J-ewell ve, xwedê bi heqq bi nas în
her çendî qesûr û kêm û kas în
Paşê bi dilê xwe, jê bi tirsin
dînê xwe ji 'Aliman bi pirsin

Çawa ku di bêjin em wisa bin
hetta ku ji rû dunê fena bin

Bala xwe bi dîne lutfê Barî
belkî me bi bexşînit ji narî

Netîce : mirov dikare bibêje kû Xanî, derheq qeder û teqdîra ezelî û 'îlmê îlahî da, bi taybetî, derbareyê mesela *ceza û îqabê* da, wek mûttekellimînên Sunnî ('Alimên 'Eqîda îslamê yên Sunnî), nafekire,([12]) wek wan nabîne û şirove nake; belkî îptalkirina ceza û îqabê difekire; ji Xwedê wilo daxwaz dike û di beje : Ku laîq û mûnasibê şefqet û Rehmet û 'Ezemeta Te û Zat ê Te yê şahane jî ewe. Ji ber ku Te hertişt çêkirine. Hertişt mexlûq û şûûnên Te ne.

(12) Mûtekellîmînên sûnnî (Eş'erî û Matûrîdî), dibêjin ku teqdir û qedera Xwedê di 'îlmê ezel da çibe, ew dibe, her tişt bi angorî wî qedera ezelî dimeşe. Mesela: Xwedê di ezel da teqdîr kiribe, 'îlmê wî gihîştibê: "Ku wê filan kes, di filan demî da, filan kar û tiştî bike" ew kes, -bivê-nevê-, dê mûtleqa ewî karî, di wî demê da, bi îrade û îxtiyarî ya xwe bike. Ku ew teqdîra ezelî bi cîh bê; Lê ji ber ku wî karî, bi îxtıyarî û bi kêfa xwe dike, mesûliyet û sewab û îqaba wî karî jî, aîdê wî kesîye.

Mulk û Melek û felek bi carek
bil cumle Te çêkirin, tebarek!

Fil cumle: çi ewwel û çi axir
Elqisse: çi mu'min û çi kafir

Her yek ji te ra we bûne mezher
Ew renge: di wan Tu bûyî muzmer

Goya hemî cismekin, Tu Canî
Goya hemî şehrekin, tu Xanî
Meqsud û miradê dil, Tu şa yî
Emma! Tu tudîll û men teşa yî

Xulase : Dıbêjın ku însan di kir û karên xwe da, ne bi temamî hurr û serbeste, ne jî bı temamî mecbûr û beste; Cuz-î îxtiyarî di destê wî da heye, bi îrade û kêfa xwe ye.

Ku bi rastî, ev dîtın û şırovekirinekî gelek mûbhem û girifte (net nîne) û tezad (dıjhevîtî) tê da heye.

Mezhebê Qederîyye(*) û *Mu'tezîle* jî, dibêjın: Însan di hemû kar û kırın xwe da, bi temamî, bi her awayî hurr û serbeste, bi qudret û îradeye, Mezhebê Cebrıyye jî dibêje: Her tışt bi angorî qedera ezelî dimeşe; însan ne bi îrade û bi kêfa xwe ye, mecbûr û mûzterre.

Zanîn û bîr û bawerîya mina şexsî jî eve ku Qeder heye, lê ne bi wî me'nayê ye ku Xwedê di ezel da, di îlmê ezelî da teqdîr kıriye: "wê fılan kes, di fılan demê da, filan karî bıke, yan jî neke" belkî qeder, bi me'na miqdare, bi me'na pîlan û pîvan û qanûnên mezbût û durıst e. («إنّا كل شيء خلقناه بقدر» = Bê şikk û şuphe Me her tişt bi miqdar û pîvanekî mezbût û durıst çêkıriye. (Elqemer/ayet.49)

(«وكل شيء عنده بمقدار» = Her tışt li ba Wî (li ba Xwedê) bi mîqdar û pîvan û qanûnekî kıfşeye. (Re'd, ayet 8)

Teqdîr jî, bi me'na çêkirin û tertîbkırın û tenzîmkirina bi pîlan û pîvan û qanûnên mezbût û rast û durıst e.

Qedera însan jî, ew xîlqeta wî ya bi taybetiye ku bi 'eql û hişşê xwe, bı îrede û îxtiyarıya xwe ya hurr û serbest, dikare kar û barên xwe bike, qerar û biryarên xwe bıde, tercîh û daxwazên xwe kifşe bike. *Teqdîr* jî navê çêkirin û tenzîmkırina bi pîvan e. («وخلق كل شيء فقدّره تقديرا») Xwedê, her tışt çêkıriye û bı pîvan û qanûn û nîzamekî mezbût û kifşe. Ewî tertîb û tenzîm kiriye. (Furqan/Ayet.2)

«والشمس والقمر حسبانًا ذلك تقدير العزيز الحكيم» .. Roj û Hîv jî, bi hesab û pîvan, bi qanûn û nîzamekî mû'eyyen çêkırıye. Ku ew jî teqdîra wî Xweda yê pirr bi hêz û pîroz û zanaye. En'amş Ayet.96)

Bi kurtî: *Qedera însan*. ew xilqeta wî ya bi taybetî, ew îstî'dada wî ya xasse; qedera hemû Efrad û cûrên kaînatê jî, ew xılqet û qabîliyetên wan ên bi taybetîne; ew qanûnên wan ên fîtrî ne, ku bı zımanê Qur'an'ê, navê wan "Sunnetellah"in, bi zimanê îlmê jî, navên wan "*qanûnên tebiî*"ne. Bı qeneata min, *Qederîyye* û *Mu'tezîle* jî, di hımberê qedera bi wî me'nayê da nînin û înkarîya wî nakin; belkî, li himberê qedera bi wî me'na û wî şırovakirina borî ya Eşerî û Maturîdîyan e.

(*) Qeder, qedr: Qûdret, şî û îqtîdar, qûdreta însan li ser îktîsaba kir û karan

Qederîye: Mezhebê wan kesane ku dibêjin; însan di kir û karên xwe da, xweyî qûdret û îqtidare, xweyî îrade û îxtîyare ku mezhebê *Cebrîyye* jî bi 'eksa wî ye. Dibêje ku însan girêdayê bi qederê va ye, mecbûr û mûzterre.

Herçî Te bivê bibî delal ê
Pabende dikî bi Zulf û Xal ê

Herçî ku Tu bînî ser Hîdayet
Vê ra bi kirî yekî înayet

Hazir wî dibî meqamê me'lûm
Ger xadime wî di gêrî mexdûm

-Bê Secde- Te ey cenabê Me'bûd!
Adem kirî qiblegah û mescûd

Îblisê feqîrê bê cînayet
Hindî Te hebû di gel înayet

Her rojî dikir hezarî taet
Lewra ku Te da wî, îstitae't

Wî Secde nebir li xeyrî Me'bûd
Gêra Te ji ber derê xwe merdûd

Elqisse: ji hikmeta Te agah
Ferdek me ne dî, tebareke llah !
..... (13)
.....

---

(13) **Mulk û Melek:** Alema berçavî û, neberçavî (alema şehadet û xeybê)
Felek: Çerxa felek'ê, ciyê ku geroke, seyyare, tê da digerin.
Bicarek: Bi tevayî.
Tebarek: Tu pirr mûbarek û pîrozî.
Filcûmle: Bi hev ra.
Mezher: Xûyange.
Tu Xanî: Tu xanî û avayî û şênikayî yê wî bajarî yî, we yan Tu xan û êwirgeha wîyî
Mûrad: Miraz.
Tu şayî: Tu şahî, padîşahî.
Emma Tu, tûddillû menteşayî: Lakin Tu kî bixwazî dibî delaletê, ewî gumrah dikî.
Delal, delalet: Gumrahî, derketina ji Rê.
Pabende: Nig girêdayî, aşîq û meftûn.
Hazir: Filhal, hima.
Meqamê me'lûm: Cih û merteba kêfşe.
Xadim: Xizmetkar.
Mexdûm: Ew kesê kû xizmetkarê wî heye.
Ey cenabê me'bûd: Ey zatê pereste, ey zatê Xweda.
Mescûd: Ewê kû merif jêra secde dibe (secde dike).
Îblîs: şeytan
Bê cînayet: Bê guneh û bê xeta.
Hindî: Dema ku, çiqas ku.
Înayet: Mêl û îltifat, îmdad û alîkarî.
Ji xeyrê m'ebûd: Ji bilî yê pereste (ji bilî Xwedê), ji kesek din ra secde nebir.
Gêra: Te ew gerand.
Merdûd: Avêtî, redkirî.
Elqisse: Xûlase, bi kurtî
Tebarekellah: Xweda ji kêmasîyan mûnezzeh û pîroz e.
Re'fet: şefqat, merhemet
Celal: Azemet, Mezinahî
Ewe: Ewa, ew tişta
şehane: Zatê Te yê şahane

Haşa ji kemal û re'feta Te
Dûre ji celal û rehmata Te

Kufr û gunehan bikî behane
Laîq nebitin ewe şehane

Ger kafir û wer gunahî karin
Bil cumle ji Te ûmîdî warin

Kes nîne ji kafir û usatan
Mezher nebitin ji boy sıfatan

Yane: "Ya Rebbî! Te hertişt çêkirine, her tişt bi Te ne, ji Te ne, pêçiya Te di hemî kir û karan da heye; her tişt bi teqdîr û emr û fermana Te ye, Tu kî bixwazî Ezîz dikî (wekî Adem), kî jî bixwazî rezîl dikî, (wekî Îblîsê belengaz û reben) ku bê xeta û bê gunah Te ewî ji dergeh û dîwanê xwe avêt; kafir û musulman, gunehkar û îtaetkar, hemî mezherên sifatên (nav û nîşanên) Te ne. Me'na wî jî ewe ku her tişt bi destê te ye, bi 'îlm Te ye, bi teqdîra Te ye û wilo ye jî, madem ku wiloye jî ev çi ceza û îqabin, ev çi curm û ceremene? Ev çî sûc û gunahin? Eger Tu Kufr û gûnehan, bigerinî wesîle û behena ezab û îqab û ceza yê, bi rastî, ew ne laîqê 'ezamet û celala Te ne, ne mûnasibê meqamê mezinatîya Te ya şehane ye. Tu pirr pîroz û pakî! (merif tu tiştekî ji Te û ji kir û karên Te fêm nake, wesselam!)

(Ku bi rastî, merif ji Xanî jî, tiştek fêm nake! Ew jî, geh cebrîye, geh sunnîye, geh feylesofe, geh sofiye, geh wûcûdîye, geh şûhûdîye.... Ne dûre ku ji "*Xanî*"*ya* di vê misraeda: "goya hemî şehrekin, Tu Xanî", bi îma û tewriye qesta Zatê xwe kirîye û gotîye: Ya Rebbi! Tu *Xanî* yê wî bajarîyî ! Yanê Tu, di *Xanî* yê wî bajarî da tecellî bûyî. Ku bi wî tewrîye û îmaye jî, şîrovekirina *Enelhaqq* a *Hellac*,bi mezherîyyeta wî ya ji **Xweda** ra, îma dike û di bêje ku me'n a Enelheqqa Hellac, ew mezheriyyeta wî ya ji Heqq ra ye.-Ku ji xwe tesewwuf jî: texelluqa, bi exlaqên îlahiye. Ku bi wî jî, pisporîtîya xwe ya di şirova felsefa Wahdetil wucûdê da, nîşan dide. Ku ew ji yane: "çawan haliqe, wisan jî, mexlûqê wîye.")

Derbareyê *Qederê* da, me di sala "1966-69 m." da, rîsalekî bi navê "**Kader ve alınyazısı**" yê, bi zimanê Tirkî nivîsî û firsata çap kirina

wî ne dît. Bi vî munasebetê, bi îzn û destûra we, ez ê çend rûpel û paragrafên ji orjînala wî ya tirkî, di vir da derc û errz bikin:

[Kader, ölçü, miktar düzen ve kural anlamlarına gelip, herşeyin ilahi bir ölçüye, değişmez bir kural ve düzene tabi olmasıdır.

Takdir ise: bir şeyin hadd ve mikdarının açıklaması, belli bir ölçü ve düzene göre yapılmasıdır.

Başka bir tabirle: "Kader, zerresinden seyyaresine, canlısından, cansızlarına kadar bütün kainatın, varlıkların ve yaratıkların, ram oldukları ve tabi bulundukları, sabit ve değişmez, ölçü kanun ve kuralların genel adıdır; Müsbet ilmin dilinde "Tabiat kanunu" denilen değişmez münasebetlerin ve herşeyin kendisine hass kabiliyet, istidat ve yaradılışının, ölçülerinin dinsel bir ifadesi ve simgesidir; Takdir ise, herşeyin belli bir ölçü ile, kendisine hass özellik, kabiliyet, yetenek ve istidatlarıyla yaratılmış olmasının, dinsel açıklamasıdır".

«إنّا كل شيء خلقناه بقدر» *şüphesiz ki biz herşeyi, bir takdir (mazbut bir ölçü) ile yarattık. (El-Qemer/Ayet.49)*

Kısacası, insanın kaderi: insanın akıl ve mantıkını kulanarak, kendi özgür iradesi ile, karar verme, yapabilme ve davranma yeteneği ve özelliğidir ki bu yetenek ve kabiliyete sahip olma özelliği, ona ezelde, ilm-i ezelide, tahsis edilmiş, yaradılışında takdir edilmiştir.

Şunu da belirtelim ki, herhangi bir işin yapılabilmesinde, tahakuk etirmesinde, ilk adım ve en önemli etken, insanın o işe karşı olan niyet, istek ve arzusudur. Ki Allah in meşiyyeti (istek ve arzusu) da, kulunun bu isteği doğrultusunda tahakuk eder; başka bir tabirle: Allah in kulli iradesi, kullarının cüzi iradesine bağlı olup, ona göre tahakuk eder. Ve bu da Allah'ın değişmez kanun (Sünnetullah) larından, birisidir.

«إنّما الأعمال بالنّيات وإنّ لكل امرئ ما نوى»/ زبدة البخاري صفحة ٩. *şüphesizki ameller, (insanların yaptikları, yapmak istedikleri işler) insanların niyetleriyledir. Yani, işler ve ameller, kişilerin niyet ve istekleri doğrultusunda olur. Kim, neyi diler ve arzularsa - onun tahakuku için gereken şartlarıda yerine getirirse - Allah da o kişiye, o şeyi diler ve o iş de oluverir (Zubdetul Buhari/sayfa.9). Başka bir tabirle: Herhangi birşeyin tahakuku ve oluşması için ilk*

şart ve ilk adım, insanın kalben o şeye karşı olan temayülü (isteği) dür. Ki Allah'ın isteği de, kulunun bu arzusu istikametinde olur, ona karşı çıkmaz, bilakis, onunla beraber olur; Ancak kulun bu niyet ve temayülü, kuru bir niyette kalmaması gerekir, o niyetlediği şeyin tahakküküne gerekli olan herşeye baş vurması lazımdır.

Yani kısacası, çabalaması ve çalışması gerekmektedir. Birde o niyetlediği şeyin mümkün olması, tabii kanunlara (Sunnetüllaha) ters düşmemesi ve muhalif olmaması gerekir. Ki bundan sonra Allah'ın meşiyeti ve kulli iradesi, kulunun o niyeti ve cüz-i ihtiyarisi istikametinde tecelli eder. Yoksa kuru bir niyet ve dilemekle hiç birşey olmaz; Zaten, içten olan samimi niyet, yukarda sıraladığımız tüm şartları beraberinde getirir.

Konuya açıklık getirmek maksadıyla, tefsiri Menar in (cilt.9, sayfa.406) da, şu ayeti kerime

«ولو شئنا لرفعناه بها ولكنه أخلد الى الأرض واتبع هواه». *"Eğer biz dileseydik, onu (Bel'am-i Bauri), o ayetlerle yükseltirdik, fakat o, yere saplandı (süfli aleme yöneldi) ve heveslerinin peşine düştü. (Bizde, onun dilemesinin istikametinde diledik, onu alçaltık) (El-E'raf/ayet.176)" ile ilgili arapça açıklamasının orjinalini, vermekte yarar görüyorum :*

«ولو شئنا لرفعناه بها ولكنه أخلد الى الأرض واتبع هواه»: أي انه أراد لنفسه الشغل المنافي للرفعة بأنّ أخلد الى المتَع الجسدية الأرضية وقد مضت سنة الله في خلق نوع الانسان بأن يكون مختاراً في عمله المستعد له في أصل فطرته ليكون الجزاء بجنسه. وإنّ لكل امرئ ما نوى.

«ولو شئنا لرفعناه بها»: يدُلّ على أن كل شيء يقع بمشيئته تعالى ولكن مشيئتَه تجري في العالم بمقتضى مشيئته وتقديره (ومنها انّه لكل امرئ ما نوى وانه مختار في الترجيح). تفسير المنّار المجلد ٩، صفحة ٤٠٦.

ÖNEMLİ BİR NOKTA

Ayrıca, Cenab-i Hak, iyilik kötülük, saadet ve şakavet yollarından birisinin seçme yeteneği ve kabiliyyeti, insanın tinetinde ve yaradılışında eşit ve müsavi bir şekilde dengelemiştir; çok hassas bir manevi terazi ile ölçmüştür; ki insan kendi hür iradesinin ağırlığını hangi tarafa koyarsa o taraf ağır basar ve tahakuk eder, Allah'ın meşiyeti de o yönde teceli eder.

«وهديناه النجدين» (البلد/١٠) *Allah, onu (insanı) iki yola hidayet etti (yöneltti). (El-Beled/ayet.10)*

«فألهمها فجورها وتقواها قد أفلح من زكّاها وقد خاب من دسّاها» (الشمس/٨-٩-١٠)

"Sonra ona (nefse-ruha) kötülük ve ondan sakınıp iyi olmak duygusunu birlikte ilham edene yemin ederimki: Nefsini kötülüklerden arındıran, kurtuluşa ermiş, onu kötülüklere daldıranda, ziyan etmiştir.(Eş-şems/ayet.8)"

«إنّ الله لا يغيّر ما بقوم حتى يغيّروا ما بأنفسهم» (الرعد/١١). *Bir toplum kendilerini (kendilerine verilenleri) deşiştirmedikçe, Allah onlardakini (onlarda bulunan nimetleri) deşiştirmez. (Er Ra'd-ayet.11) Yani kısacası: Allah kullarının arzu istek ve iradesine göre, onlara muamele yapar.*

السعيد سعيد في بطن أمه والشقيّ شقيّ في بطن أمه. *Said (Saadete ermiş kimse) anasının karnında said dir. (saadete kavuşmuştur).*

şaki (haydut, günahkar, her türlü kötülükleri yapabilen) de, anansının karnında şakidir. Yani: insanın yaratılışında hem saadet, hem de şekavet yeteneği ve kabiliyeti mevcuttur; insan o iki yönlü yetenek ve kabiliyetiyle, isterse said, isterse de şaki olur.

Bu kısa izahtan sonra, Kaderin, değişmez bir ilahi kanun ve nizam (sunetullah) olduğu, mütekelliminlerin ihtilafları da, kaderin özünde olmayıp, yorum ve anlayışlarından kaynaklandığı, insanların hür ve serbest bir iradeye sahip olarak yaratılmış olduğu ve bundan dolayıda sorumlu bulunduğu gerçeği ortaya çıkmış oluyor.

EN BÜYÜK PROBLEM

Kader bahsinde karşılaşılan en büyük problem de, bu olsa gerek: "Eğer Allah, gelecekte ne olacağını, şu adamın bu yolu, bu adamın da şu yolu tutacağını biliyorsa, o adam, muhakkak ve ister istemez o yolu tutacak demektir. Çünkü Allah bildiğinden yanılmaz"

Evvela şunu vurgulayalım ki Allah'ın geleceği bilmesi, geleceğin Allah için açık bir kitaptan ibaret olduğunu ve onun ezeli ilminin ayinesinde görünmekte olduğunu ifade eder. İnsan için herşeye olan mesafe ve zaman tahdidi, Allah için bir hiçtir. İnsanın bilgisi, malumatı, mesafe ve zamanla tahdit edilmiştir; Fakat o sonsuz varlık olan Allah için, sonsuz mesafe bir tek nokta gibidir; Geçmiş ve gelecek bütün zamanlar, şimdiki zaman gibidir. Bir insan gözünün önünde olan şeyleri, nasıl görüyor ise, Allah da, ezelden ebede olan herşeyi öyle görür ve bilir; insan bir şeyi kendi özgür iradesiyle yaptığı zaman (ki bu zaman tahdidi insana göredir), Allah onu öylece bilir. Buda cebri (insanın işlerinde mecbûr olmasını) iktiza etmez ve hiç bir süretle cebirle ilgisi yoktur. Zaten Allah'ın hükmü ile, bir adamın doğru yola, bir başkasınında eğri ve sapık yola girdiği, gireceği akidesi, Kur'an da yoktur. Kur'an herkesin bileceği yolda gitmekte özgür ve serbest olduğunu vurgular.]

Ku xûlasa wî ya, bi kurdî jî eve:

"Qeder, navê wan hemû nîzam û qanûn û pîvanane ku kaînat bi wan dimeşe, bi wan tenzîm bûye, bi wan qanûn û pîvanên mezbût û sabit, tê îdarekirin. Ku bi zimanê 'îlmî, navê wan *"qanûnên tebiîne"*, bi zimanê dînî jî, navê wan *"qeder û sunetullah"* e; *Teqdîr* jî, navê çêkirin û tertipkirina alem û kainatê bi wan qanûn û pîvanane. *Qedera însan* jî, ew xilqeta wî ya bi taybetiye ku dikare bi îrade û îxtiyariya xwe ya hurr û serbest, kar û barên xwe bike, qirar û biryarên xwe bide.

'Îlmê **Xweda** yê ezelî jî, bê mesafe û bê zeman û bê ewwel û bê axir re. Ji ezzel heta ebed, , bi yek carekî, di yek anekî da, xwe bi hemû tiştan va girtiye. 'Îlmê **Xweda**, 'eqlekî mûtleq û kullî ye. Bi angori me'lûmatên cuz-î nîne, di yek anekî daîmî û sermedî da, hertişt di xweda girtiye, an û teh'dîd, bi angorî me ne, bi angorî ilmê **Xweda**, *deymûmiyyet* û *sermediyyet* (her hebûn û herheyîn) heye.

Em di karin vê mesela deqîq û kûr û dûr û girift, bi vê mînakê, qederekî bidin rohnîkirin û nezîkê bal fehm û îdrakê ve bikin: "*Di cîhek da, li ser zemînekî ku nîvê wî sipîye, nîvê wi yê din jî reşe, zincîlekî (zincîrekî) bi xelekên cûr be cûr dirêjkirîbe, Mûriyêkî (Muristangekî) piçûçik û hûrik, ji xelekek wê zincîlê da dest pêdike, lê digere, lê mêze dike û dimeşe, derbasê xelekek din dibe, li wî xelekê jî wisa digere û dimeşe û diçe bal xelekekî din û dewam dike; Dema di cîhê reşê wî zemînî da ye, xwe di tarîtî û şevê da dibîne. Dema ku dikeve cîhê sipî, xwe di ronahî û rojê da hiss dike û dibîne. Ku bi angorî wî mûriyê, her xelekên wî zincîlê mesafeyeke, her perçekî ji wan demên ku di gera wan xelekanda diborîne jî zemaneke; ku yê borî mazîye, yê ku hêj nehatiye musteqbele, nuqta ku têdaye jî, zemanê hale; Lê ku mirovek jî, li ser dîharê wî cîhê hebe, li wî cîh û li wî zemîn û wî zincîl û wî mûriyê bi hevra, di yek anek da, mêzebike, ew mirov, ewan tev bi hevra di yek anek da, bi yek dîtinek bibîne. Bi angorî wî mirovî mesafe û mazî û musteqbel tune; dîtina wî di yek anek da, xwe bi wan tevan va bi hev ra digire. Ku jê ra dewamiyet heye. Yanê, di yek anek da, ewan bı dewamî dibîne. Lê bi angorî mûriyê wilo nîne, jê ra mesafe û zeman û mekan heye.*"

Di teşbîhê da çewtî û şaşitî tunebe, 'îlm û dîtina **Xweda** jî, ji tiştan ra wilo ye; **Xweda** ji dîharê zirwa ezel û qidemê da (bê destpêkî û herhebûniyê da), bi Dûrbîn û *Radar* a 'îlm û dîtina xwe ya taybetî, li hemî alem û kaînatê, li hemî kar û hemî tiştan, bi hev ra, di yek demek da, mêze dike, ezel û ebedê, bi hev ra dibîne û dizane; dîtin û 'îlm û zanîna wî, herwekî Zatê wî û Sifatên wî yên din, bê mesafe û bê zeman û bê mekanin; di neynika 'îlm û zanîna **Xweda** da, *mazî* û *mûsteqbel* û *hal*, wekî hevin, di yek anekî daîmî da dixûyên yek tiştekin, yek nuqte kin.

Çawan ku Melayê Cizîrî jî gotiye :

Di qîdem da, Ezel û 'Eynî Ebed, herdû yekin
Sermediyyet we dixwazit, ne ezzel bit, ne ebed

"Di qedîmîtiyê da ezel (zemanê destpêka herî pêşîn ku di pêşiya wî da tu an û zeman tune, ew pêşiya hemî pêşiyane = Ezelûl azale=ezela ezelane), 'eynî ebedê (zemanê herî dawiyê) ye, herdu yek tiştekin, wekî hevin, ferq di navbera wande tune. Ji ber ku Sermediyyet (herhebûnî) wisa dixwaze ku ne ezel hebe, ne jî ebed, belkî deymûmiyyet (herdewamîtî) hebe.

Hal û Musteqbel û Mazî di Xweda têkî yek in
Subhê mewcûde bi 'Eynê xwe di Êvarê Hudûs

"Di *'îlmê Xwedê* da, zemanê niha û yê borî û yê ku hêj tê, tev bihev ra yek tiştekin (yek anek daîmîne); Sibeha Hudûsê (alema nûh peydabûyî) bi 'Eynî xwe di Êvara wî da mewcûde. Di yek demek da, di wî î'lmê ezelîda cîh girtiye û heye."

KULLÎ Û CUZ-Î

Di îlmê mentiqa kilasîkî da, qaîdekî wiha heye: "Tiştên kullî, di *zumnê* (di nava) tiştên cuz-î da; di zumnê cuzîyatên (efradên) wan kulliyan da, tehaqqûq dikin û tên wucûdê. Wek Însanê kullî ku hebûna wî ya xaricî (ji 'eqlê der) û berçavî tune. Belkî ew însana kullî, di zumnê efradên însanên muşexxes û berçav da, dixûyê û tecelî dike. Dîsa jî di teşbîhê da xeta tunebe, 'Îlmê **Xweda** yê kullî û daîmî jî, di *zumnê* cuz'îyatan da, tecelî dike û dixûyê. Lê ev xûyan û dîtin jî, bi angorî dîtin û zanîna me ye; dîtin û zanîna **Xweda**, wek zatê **Xweda**, hem daîmî û sermedîye, hem jî 'eqlê mucerrede, ne hisse, ne bi hissiyata ne, ne perçe perçe û cuz' î ye. Çawan ku *Mella yê Cîzîrî* jî gotîye: *"Sermediyyet, we dixwazit, ne ezel bit, ne ebed"*(*)

'Îlm û zanîna me, perçe-perçe û demdemî ye, bi hissîyata ne (bi dîtin û bihîstin û bîhnkirin û tam kirin û lemskirinê ye) û piştî hebûn û bûyîna tiştane, bi sebeb û wesîleyane. Lê 'îlm û zanîna Xwedê, wilo nîne. Ne cuz-îye, ne jî piştî bûyîna tiştên nebûyîye. Belkî kullîye, bi hemî tiştan va, bi sebeb û musebbeban va, bi wesîle û netîceyan va, bi hevra, di yek carekî da ye; Di ezel da xwe bi hertiştî va girtî ye. Kir û karên mirofan ji tiştan ra bi îxtîyarîya wan, di gel sebeb û musebbebên hemî tiştan, bi hevra di ezelda zanîye. Zanîye ku wê însan bi îxtîyarîya xwe, di filan demî da, wan kir û karên xwe yên bi îxtîyarî bike. Ji ber ku Ewî (**Xweda**) însan bi wî qabîlîyyeta wî ya bi taybetî çêkirîye.Di ezel da ewî siroşt û qabîlîyeta bi taybetî, da ye wî û bexşê wî kirîye. Ku ew jî qedera wî ye. Mûzterrîyyet û mecbûrîyyeta wî îqtîza nake.

(*) Ehlên felsefê (feylesof) dibêjin ku "'Îlmê **Xweda**, xwe bi kullîyatan va (bi tiştên kullî va) digre. Yanê : îlm û zanîna xweda bi hemî tiştan, di yek carekî da ye, bi yek rewşekîye, bi tu awayî, ne wekî yê me ye, 'Eqlekî kullîy e, zanîna bi her tiştî -wek heqîqet û taybetîyên wî-, bi yek carekîye,ezelî û sermedîye, zanîna bi sebeb û musebbeban, bi wesîle û netîceyan bi hevra ye. Ezelî û ebedîye, kullî û giştîye.

Belkî tam bi 'eksa wî, ew dixe lazimê xwe ku însan hurr û serbest be, bi kêf û îxtîyatîyarîya xwe be û wilo ye jî. Ku lewra siroşt û xîlqeta wî, we ye. Xwe girtina îlm û zanîna **Xweda** bi wî xilqeta wî ya îxtîyarî va, dayîna wî xilqeta îxtîyarî ji însanan ra, însanan mecbûrê kirin û nekirinê nake. Ji ber ku kirina însanan ji tiştan ra bi îxtîyarî ye, ew îxtîyarîya wî jî qedera wî ya bi taybetî ya ezelî ye. Ew siroşta wî ya îxtîyarî jî ku qedera wî ya ezelî ye, bi 'îlmê **Xweda** ra, di 'îlmê **Xweda** da, ezelî û herheyî ye; **Xweda** di ezel da zanîye ku dê însan wek wî siroşta xwe ya bi îxtîyarî, kir û karên xwe, di dem û zemanên wan da bîke.

Xulase: Zanîna **Xweda** bi kir û karên me yên bi îxtiyarî ya me, me mecbûrê kirinê na ke. Belkî wî kirina me ya bi îxtîyarî (wî taybetî û siroşt û qabîlîyyeta ku di ezelde daye me, kirîye qedera me) wî qedera me, wî rewşa siroştî ya ezelî, tesdîq û tescîl kirîye. Tesdîqkirina tiştekî bi îxtîyarî jî, ne îcbare, belkî tescîlkirina wî ya bi rewşa wî ya taybetîye. Ku ew jî yek *ji Sunnetullah* û *adetullahên* **Xweda** ye (yek ji qanûn û adetên xalîq û faîlê mûtleq û mûxtare.)

(الفتح/٢٣) «ولن تجد لسنة الله تبديلا» Bê guman,Tu rastê guhestina qanunên **Xweda,** nayê (Qanunên **Xweda** yên tekwînî, nayên guhestin) û yek ji wan qanunan jî ewe ku îrada **Xweda** ya kullî ya ezelî, giredayê bi îrada cuzz î ya însanan va ye. Ku ev qanuna **Xweda** jî, wek hemî qanûnên wî yên din, nayê guhestin û guherandin.

(الفاطر/٤٣) «فلن تجد لسنت الله تبديلا ولن تجد لسنت الله تحويلا» We tucaran, Tu rastê tebdîl û teh'wîla qanûnên **Xweda** (yên tekwînî) nayê. (Qanûnên wî, bi tu awayî nayên guhestin û guherandin).

Ji xwe bi angorî felsefa wehdetu-l wucûdê, zeman û mekan û mesafe jî daxil, her tişt cîlva wucûda mûtleq a îlahîne, sî ya wucûda wî ne; ji bil wucûda Xwda ya ezelî û ebedî, di heqîqet da tu tişt nîne; her tişt Te'eyyûnat û tecellîyatên wîne; îrade û îxtiyariya cuz î ya însan jî tecelliya îrade û meşiyyeta wiya kulliye; zanîna însana cuz-î jî, tecellî û tecellîgaha 'îlmi wî yê kullîye.

NETÎCE

Madem **Xweda** ferman kiriye ku însan mûkellef û mes'ûle, **Xweda** teklîfa malayûtaq (tiştên ku nayên quwweta mirov û ne mûmkîne

bênkirin) jî nake. Bi hêsayî mirov dikare bibêje ku însan di hemû hereket û kir û karên xwe da, xweyî îrade û îxtiyarîya hurr û serbeste. Bi wê xilqetê hatiye xulqkirin ku ew xîlqeta wî ya bi taybetî û xass, hem qedera wî te'yîn dike, hem jî sebebê hilgirtin û qebûlkirina wî ji emanetê teklîfê ra ye,

«إنّا عرضنا الأمانة على السموات والأرض والجبال فأبين أن يحملنها وأشفقن منها وحملها الانسان أنّه كان ظلوماً جهولا» (الأحزاب/٧٢).

"Bê guman, me emanetê xwe (teklîfatên xwe) ji asîmanan ra, ji 'Erdê ra, ji çiyan ra 'erz kir (nîşanda û teklîf kir), ewan xwe ji hilgirtina wî, ji parra dan, jê vecniqîn (lê) însan, ewî Emanetê hilgirt (û qebûlkir). Ji ber ku ew (însan) pirr zalim û cahil bûye" ew jî, vî dixe lazimê xwe ku Însan dikare bibe adil û zana jî, ew jî dide nîşan kû însan qabil û mûqtedire, dikare barê emanetê **Xweda** jî hilgire. Ku lewra jî Xwedê, ji nav hemî mexlûqên Xwe, ji hilgirtina wî barî ra, ewî niqandîye û xelîfe yê (canişînê) xwe yê ser rûyê zemîn gerandîye. Kirîye wek neynikekî pak û paqij ji tecellîya xweya pak û pîroz ra.

Ku ji xwe armanca xilqetê jî ew e :

«كنتً كنزاً مخفيًا فخلقت الخلق ليعرفوني» أي فخلقتً الخلق ليكون مرآتاً أشاهد فيها جمالي. (اشارات الاعجاز، صحيفة ٤، بديع الزمان، سعيد الكردي)

Yanê: ez wekî xezînekî veşartî bûm, min xwest ku ez bêm naskirin, min mexlûqan çêkir ku ew min nas bikin (yanê min xelq -wek neynikekî paqij- çekir, ku ez têda cemala xwe bibînim(*))

GOTINA DAWÎ :

Însan jî wek hemû alemê, ji 'edemê ye (ji tunetîyî ye), wucûda heqîqî, bi tenê ji Xwedê ra heye, menşe' û jêderê hemî tiştên nerind û neqenc jî, 'edem û tunetîye (wek fuhûş û zulmê ku ji tunetîya mermehemet û şefqetê ne), hemî tiştên rind û qenc jî, ji hebûnê ne (wek 'edalet û îffetê ku ji wucûd û hebûna merhemet û namûs û heysîyetê ne) ku bi angorî vê heqîqetê jî hemû tiştên neqenc û menfî, ji me da ne, ji esl û bunyadê me da ne. Ku 'edem û tûnetîye. Tiştên qenc û rind jî, ji **Xweda** da ne, ji hebûnê da ne (ku wucûda heqqa mûtleq û herheyiye.).

(*) *işaratul i'caz, rûpel-4, Bedîuûzzeman Seîdê Kurdî*
Mû'cemû el Mûstelehat el-Sofîyye- rûpel 116-117, el Kaşanî.

ما أصابك من حسنة فمن الله وما أصابك من سيئة فمن نفسك». (النساء/٧٩).

Hemû tiştên rind ku digîhîjin Te, ji **Xwedê** da ne, hemû tiştên pîs û nerind jî ku digîhîjin Te, ew ji nefsa te da ne (ji esl û bunyadê Te da ne ku 'edeme), sirr û hîkmetêri teklîfên Îlahî jî eve ku merif bi wasita wan teklîfan ji qirêjayî û kêmasî û nivzaya nasûtî (maddî) pak û bilindê bal pakî û pîrozîya lahûtî (Îlahî) va dibe, ji qirêjaya 'Edemê nêzîkê bal paqijaya wucûdê va dibe. Ku tesewwûfa heqîqî jî ew tekamule, xaye û hedefa hemî dînan jî ewe, tekamula herî mezin û bilind jî, Qist û 'edalete.

«ولقد أرسلنا رسلنا بالبيّنات وأنْزلنا معهم الكتاب والميزان ليقوم الناس بالقسط» (الحديد/٢٥).

Bêguman, Me Pêximberên Xwe, bi delîl û belge şandine, Me, bi wan ra kitêb û mêzîn (qanûn û nîzam) jî nazil kiriye. Ku însan bi qistê (Bi 'Edl û 'Edaletê) payîdar bibin. (Hedîd./25)

«ربّنا لا تؤاخذنا إنْ نسينا أو أخطأنا» البقرة/٢٨٦ Ey Xweyî û **xwedanê** me! Eger -ku me yan xwe ji bîrkir, we yan jî xeta kirin- Tu bi pêsîra me negre, Me nekşîne hesabê (me bi fezl û îhsana Xwe bibexşîne) (Beqere/ Ayet.286)

XANÎ Û FELSEFE

Xanî, di navbera Re'y û dîtin û bîr û bawerîyên felsefî û î'tîqadîyên cûr be cûr da, hespê xwe dibezîne û diçe û tê, lê wek mûtesewwûfekî Îslamî, naxwaze ku ji daîra fikra Îslam û fehma Qur'anê derkeve; Re'y û fikrên mûwafiq, tercîh dike û dibijêre, yên ku dij û mûxalif jî dibîne, yan te'wîl û şirove dike, yan jî bi şarezatîyekî tabeytî di qalibekî nuh da ro dike, bi ûslûbekî cudayî îfade dike; di navbera wan û Qur'anê da aşitî çê dike.

Xanî, (bi şeklîbe jî) ji daîra mezhebê Sunnî jî dernayê -wek ku derbareyê çêbûyîn û peydabûyîna 'Alemê da-, wekî wan dibêje: 'ku Xwedê her tiştî, hemû Kaînatê, ji 'Edemê (ji tunetîyê) çê kirîye, bê Heyûla îcad kirîye' :

Gava ji 'Edem Xwedê kir îcad
Ev kewn û mekan ji nûve bunyad
.....
.....
Her yek ji 'Edem te kirne peyda
Îbda'ê kirin Te bê Heyûla

lê Xanî wek mutekellimînên Sunnî, înkarîya Heyûlayê (cewherê ferd, madda bingehîya seratayî) jî, nake, belkî wek **Farabî** yê (... 950 m.) û **Ebû Yûsufê Kîndî** (796-873 m.), di fekire ku Heyûla jî, ji terefê **Xweda** da hatîye îcad kirin (ji wucûda mutleqqa îllahî da, ji îrada wî ya ezelî da peyda bû ye), ji Heyûlayê jî, Kaînat tertîb û tenzîm bû ye, ku hinek feylesofên din

jî, wiha gotine: "Nefsa kullî, Wahidê mûtleq heyûla û sûretê Heyûlayê, rêj kirîye (ji feyza xwe rêtîye), ji Heyûlayê jî cisim çê bûne" çawan ku Xanî jî, di vî nîv misra a xwe da : "**Ev kewn û mekan ji nûve bunyad**" bi kelîma "kewn" û "bunyad"ê, îmayê bal Heyûla û sûretê Heyûlayê va dike

- ji ber ku "bunyad"di vir da, bi me'na hîm ê bingehîyê wucûdêye, "kewn" jî: peydabûna Heyûlayê ji tehwîla *'Eqlê ewwel* bal *Rûhê kullî* va ye. (ji tehwîla quwwetê bal madde yê va ye.) ku ew tehwîl jî, sûretê seretaîyê Heyûlayê ye (Cismê mutleqqe); hemû cism jî, tezahura sûret û formên Heyûlayê ne, ku madda seretayî ya wan nayê guhestin belkî şekl û sûret têne guhestin.

Xanî, li ser zimanê Memê jî ku dibêje:

Nîne eceb er bibim hûlûlî
Min maye ji sûretê Heyûlî (1)

1-**Heyûla (Hyle)**: Navê madda seratayî ye ku, mewcûdekî mucerredê ji sûretê ye, ji tehwîla "'Eqlê ewwel" bal "*Rûhê kullî*" va, peyda bûye; ew tehwîl jî, sûretê wî yê seratayî ye, cismê mutleqqe ku hemû cism û hemû mewcûdat jî, hem sûretin, hem jî madde ne. Yanê bi kurtî: hemû kewn û Kaînat ji Heyûlayê da, Heyûla jî, ji tehwîla "'Eqlê ewwel" bal "Rûhê kullî" da, 'Eqlê ewel jî, ji *mebde yê Feyyaz* (wucûda mutleqqa Ezelî=Zatê Xweda) da, peyda bûne. Madda esasî yek tişteke, yek cewhereke; nayê guhestin, sûret û form tên guherandin.

Heyûla, qabil û mûsteîddê ji her sûret û her forman ra ye, ku hemû tiştên heyî, tezahura sûret û formên Heyûlayê ne. Bi gotinekî din: Heyûla ji tezahura Qudreta îlahî ye, ji îrada wî ye; ji tehwîla 'Eqlê ewwel bal Rûhê kullî va ye ku 'Eqlê ewwel jî, ji tecellîya seretayî ya Zatê Xweda da (jî me'lûmîyyeta Zatê wî ji Zatî Wî ra), peyda bûye

Hûlûl ji: Ev e ku tiştek bi keve nav tiştekî din û pêra bi ve yek, wek ava Gulê, ku di nav Gulê da winda ye û pêra bûye yek.

Mezhebê Hûlûlî jî: bi du cûran e. Yekê wî, (wek wehdetîl wucûda Hindûîzma Hindistanê) felsefîye, di bêje ku: "Xwedê di hemî Alemê da, di zerreyên Kaînatê da ye, di her tiştî da bi terzekî wilo bi cîh bûye ku mirov ji her tiştî ra (bi angorê cîhetê wî yê lahûtî) dikare bi bêje ku Xweda ye" cûrekî dinê mezhebê Hûlûlî jî di bêje ku: "hinek însan bûne Xweda (Xwedan e), Xwedê ketîye bedena wan, wek peyrewên *Ebdullah* ê kurê *Sebe'* ê yehûdî (Serokê firqa Sebeîyye) ku di bêjin: Hz. 'Eli, Xweda ye, hem wekî Batînîyyûnên Fatimî jî ku dibêjin: Xelîfeyê Fatimî El-Hakîmû bî emrîllah (985-1021 m.) Xwedaye, nemirîye, çû ye asîmanan; Batinîyên **Axa Xanî** jî, di bêjin ku "Elî şah Axahan" (1742-1798 m.) Xwedaye û gelek firqe yên din" ku her yek ji wan, ji kesekkî ra dibêjin Xweda ye.Hemû jî batilın

Hûlûl a Sereyanî jî, îbaretê ji hûlûla sûretê Heyûlayê di Heyûlayê da ye û Hulûla Erezên nefsanî, di nefsêda ye. Ku Xanî evî hûlûla sereyanî, we yan jî, Hûlûla felsefî qest dike û bi kurtî wiha di bêje: "ne ecêb û xerîbe ku eger ez bibim hûlûlî (eger fikra hûlûlî qebûl bikim), bibêjim ku: Îşq û derdê Îşqê ketîye hemû zerreyên bedena min, sûretê min ji min çûye, cewherê min ê heyûlayî bi tenê maye, di cîyê sûretê da, Îşq û derdê Îşqê ketîye cewher û Heyûla min" (bi angorî felsefa Antîk: Heyûla madda bê sûrete ku di gel sûretê di be cism) ku Xanî jî dibeje: ji cismê min sûret çûye, Heyûla bi tenê maye ku di şûna sûretê da îşq û derdê îşqê ketîye heyûla min (ketîye madda min a bingehî), tê da hûlûl kirîye, bedana min, ji madda Heyûlaî yû Îşqê muteşekkil û musewwer bûye."

Yek nuqte, nihîn ji derdê xalî ..... Hêja tu dibê çira di nalî
Ev Hal û Mehell û cism û cewher ..... Îşqê ji xwe ra kirin musexxer

Heyûla û sûretê Heyûlayê, bi serîhî (vekirî) îfade dike û hemfikrîtîya xwe, ji *Farabî* û *Kindî* û feylesofên wek wan ra nîşan dide; ji xwe dema ku fikra Xanî ya hurr û aza wek hespekî kihêl ê rehwan·û beza, şah radibe, serî jê distîne di wî demê da ew, Xanî -wek feylesofekî mûtefekkir- di gelek meydan û mecalên fireh da di gerîne; ku ew çelenk suwarê şareza, geh hespê xwe, bi Eflaton (Platon- 427-347 b.m) û Arîsto (Aristoteles 384-322 b.m) ra, geh bi Plotînê Misrî(204-270 m.) ra, geh bi Farabî (...950 m.) û Îbnû Sîna (980-1037 m.) û Îbnî Ruşd (1126-1198 m.) ê ra, geh jî bi Xezalî (... 1111 m.) û Îbnîl Farid (1181-1235 m.) û Îbnî Erebî (... 1240 m.) û Mela yê Cizîrî (1574-1640 m.) ra, di meşine, caran jî, bi serê xwe fikr û dîtinên cudayî keşif dike û di niqîne, bi tu mezheb û meşrebekî mûe'yyen û xass va mûqeyyed û girêdayî namîne; hetta di hinek caran da, ew hespê wî yê serkêş, ewî bi alîyê dînên xeyrî Îslamî va, bi taybetî dînên kevnên Kurdîstanê (wek Mît'raîy û Êzdîtî û Zerdeştî yê) va, dikişîne ku felsefe û bawerîyên wan bi îhtîram û pîrozî di nerxîne, wek ku di van helbesteyên xwe da :

Salarê mewakîbê kewakîb . . . . . Serdarê tewalî û xewarîb
Sultanê serîrê Textê Rabi' . . . . .Wexta we ku bû ji şerqê tali'
Tarîtî, bi Ruhnî yê ku ra kir . . . Xem, şubhetê zulmetê fena kir (2)

bi teşbîh û teswîr û ûslûbekî wilo bilind û balkêş nêzîkê bal derketina rojê û ronahîyêva dibe ku di Alema xîyalê da, di binê perda wî ûslûba pîroz û şeffaf da, mirov bi hêsayî dikare wîne û sûretê mûbedekî (mûbezekî='alim û abidekî) Zerdeştî bibîne ku ji qîblegaha rojhilatê da bi îhtram û îştîyaqekî derûnî, berê xwe daye *Yezdanê* mubarek, tesewwur û mûlahaza Wî dike.

Ku yanê: Xanî bi wan te'bîr û teswîrên xwe yên belîxane û şahane, -zêdetirê ji dîyarkirina quwwet û qudreta sen'et û hunerê edebî (wêjevanî)- îhtîram û pîrozîtîya xwe ji Zerdeştî û Yezdanî yên (Êzdîyên) Kurdîstanê ra, ji Mîtraîyên (Rojperestên) Cîhanê ra dîyar dike.

---

(2)
Salar: Serleşker
Mewakîb (C.Mewkîb): Tîpên Leşkerên merasimê
Kewakîb (c.Kewkeb): Stêrkên asîmanan.
Serdar: Serok
Tewalî' (c.talî'): Hilhatî, tiştên ku hiltên.
Xewarîb (c.Xarîb):Tiştên çûn ava, çûn avok.
Serîr: Text.
Textê Rabi': Textê felek û asîmanê çaran (asîmanê çaremîn ku di bêjn roj di felek û asîmanê çaranda ye)
Wexta: Dema
Wekubu: Wisaku bû
Ji şerqê: ji rojhilatê
Tali': Hilbûyî, derketî
Xem: Der û keder
Şubhetê: Mislê, wekî
Zulmetê: Tarîtîyê

Hem jî Roj, sembola nûrê ye, nûr jî, yek ji nav û nîşanên Xwedê ye. (Tecellîya **Xweda** bi îsmê wî yê "*Ez-zahir*"e) ku lewra jî, *Kesên Mûtesewwûf,* pirr rûmetê didin Rojê, mûqeddes û pîroz dizanin. Ne dûre ku Xanî jî, ji wî teqdîs û îhtirama sofîyan ra îhtiram bike, wek mûtesewwûfekî Mutefekkir, ew jî teqdîs û pîrozîya xwe nîşan bide.

Ji xwe yek ji taybetî yên Xanî yên bijare û balkêş jî eve ku di zumnê (di nava) îfadekirina tiştekî da, tiştekî din, we yan çend tiştên din, îma û îşaret dike (wek vî metelok a *Kurdî* ku dibêje: bi kevirekî çend kêlan bi hevra werdigerîne). Her wekî ku dema liser zimanê "DAYÎN"ê, pirsa sebebê heyret û huzna "STTÎ" û "ZÎN"ê dike û dibêje:

Bêjin ku mûqeddîme çi renge
Ev Hîrete yan xîyalî benge
Hûn bo çi hezînin ey metaya
Nînin çu netîce bê Qedaya(3)

Hem îşaretê bal mentiqa klasîkî ya Aristo va dike, helbesteyên xwe, ji mufredatên wî di hûne. Hem jî, îmayê bal fikra mezhebê îcabîye (Determinisme) va dike (ku ew mezhebê îcabîye jî wek mezhebê cebrîye, înkarîya îrade û îxtîyarîya însan dike, lê mezhebê cebrîye dibije ku her tişt bi angorê Qedera ezelî teheqquq dike, însan di kir û karên xwe da, ne bi ixtîyarîya xwe ye. **Îcabîyûn** jî dibêjin ku: "kir û karên însan jî daxil, her tişt, her bûyîn û bûyer, bi angorê zîncîla Qanûnên sebeb û mûsebbeban, mûqeddîme û netîcan (bi angorê qanûnên tebîî) teheqquq dike."

Xanî ku dibêje: (Nînin çu netîce bê qedaya) hem îşaretê bal qanûna îllîyet û sebebîyyetê va, hem jî îmayê bal mentiqa

---

(3)

Mûqeddîme: Pêşek, ku di îlmê mentiqê da navê Sûxra û kûbraya (pêşeka mezin û piçûka) Qîyasê ye ku ji wan da netîcekî der tê, wek "eva însane, hemû însan jî, di fekirin. Ku vî netîcê dide: ev jî di fekire"
Hîyret: Mûhayyerbûyîn, şaşmayîn.
Beng : Benc, heşşaş.
Xîyalî Beng: Sewsbûyîn û gêjbûyîna ji heşşaşê ku haletekî wek xewnê û xîyalê ye.
Metaya (c:Metîyye) : Lê suware (wek deve û hesp û mehîn û canû yên nûzîn) ku di vir da, bi meneya canûyên nûzîn in, meqsed jê "Sîttî û Zîn" in. Îhtimalekî pirr qewî jî eve ku Metaya, "Metzaya" be, bi mena keçên Metan (Qîzmet) we yan "Matmaya" be, bi me'na ewên ku mat û muheyyer mane, ku ji boy zerûreta qafîya şiirê, bû ye "Metaya"
Netice: zuwe, zaye tiştê ku ji sebeb û pêşekan der tê, peyda dibe.
Qedaya (c.Qedîyye): Pêşek, mûqeddîme, pêşek a piçûk û mezina qîyasa mentîqê.

dîyalektîkî (dîyalektîka maddî) va dike. Gerçî dîyalektîk bi şekl û mefhûmê Marksîstî ya îro, di dema Xanî da tune bûye, lê belê, bi me'na cedel û munaqeşe kirina ji boy gîhîştina bal heqîqet û rastîyê va, bi me'na fikr û dîtîna dîyalektîkî der heq madde û tetewwur a madde û Alemê da, pirr tarîxî û kevne ku pêşîya wî heta bawerîyên kevnên Hindistanê û Antîka Yûnan va diçe; wek felsefe û nezerîyekî felsefî, ji qirna pêncan berîya Mîladê da, ji fikra "DEMOKRISTOS" derheq cewherê ferd û Heyûlayê da, destpêkirîye û hatîye, bi dîyalektîka maddîya Markisî gihîştîye merhela xwe ya îro.

Xanî di vê helbesta xwe da:

Mewcûdê kirin bi hev mûeyyen
Ezdadê kirin bi zidd mûbeyyen

jî, ku dibêje: "**Xweda** tiştên heyî bi hev dîyar kirine, tiştên zidd û dijên hev jî, bi dij û ziddên wan beyan kirîye" hem qanûna dîyalektîya "mucadela ziddan bi hev ra" îfade kirîye, hem jî felsefa dînê Zerdeşt (ku hîmê wî li ser mucadela di navbera Tarîtî û Ronahîtîyê da, Xêr û Şer ê da, hatîye damezrandin) îma û îşaret dike.

Eger "Qeder", bi qanûnên tebîî (siroştî), we yan qanûnên tebîî, bi "Qeder" ê, bi "Sunnetîllah" ê, bên tefsîr kirin(bên şîrove kirin), herdû mezheb (Îcabîye û Cebrîye) nêzîkê bal hev dibin, di gihîjîn hev; di navbera wan da ev ferq bi tenê dimîne. Ku mezhebê îcabîye meteryalîste, mezhebê cebrîyye jî îdîalîste. Lê di hewsela Xanî ya fireh da, cîhên her tiştî bi angorî wî heye, dê cîhên van jî hebe (û heye jî, ku îşaretê bal wan va jî dike)

Xanî, ku di dîwana xwe da jî dibêje:

Ey wahidê Pinhan ku ji Zatê tene peyda
Ev Kewn û Mekan Erd û Sema, kumbedê xedra

îma û îşaretê bal gelek dîtin û fikrên felsefî va dike:

1- Fikr û dîtina Eflotînê îskenderî (Plotîn -204-270m.) ku dibêje: "wahidê mutleq, meb'de û jêderê her tiştê ye, Ûqnûmê (bingehê) seretayî û ezelîye, kewn (Bûyîn) jî, ji wî da feyz bûye (rêj bûye, rijiyaye, peyda bûye)"

2- Fikr û dîtin a mezhebê sudûrîye: "ku dibêje cismê mûtleq û kewn (bûyîn) form û sûretê madda seretayî ye, madda setretayî jî, ji tehwîla 'Eqlê ewwel bal Rûhê kullî va peyda bûye, 'Eqlê ewwel jî ji **Xweda** sadir bûye.

3- Fikra Mûhyîddînê Erebî (... 1240m.) ku "Kewn tecellîya Zatê Îllahîye (ji wucûda mûtleq a ezelî ye), her tişt ji wî ye, bi wî ye" ku felsefa wehdetîl-wucûdî jî, îbaretê ji wî ye, Xanî jî li der û dorê wî, di çe û tê, hespê fikra xwe bi *Mûhyeddin ê Erebî* ra di bezîne, lê wek wî û Mela yê Cizîrî, cesûr û vekirî nîne, raste rast nêzîkê balêve nebûye û îzah nekirîye. Belkî îma û îşaret kirîye; xwestîye ku kesên zana ji îma û îşaretên wî, tiştan fêm bikin û derînin.

Qelbê Xanî sedefa gewherê îrfane welê
Metnî xwanek ku ne bit sahibê me'na çi bi ket

Yanê dilê Xanî sedef û kan a Durr û gewherên "'îlm û îrfan"ê ye lê ku metin xwanekî zana tu nebe wê xweyê me'nayê çi bi ket! (divê metinzanekî ku ji wî xezîneyê dûrr û gewheran derîne, sirr û mûemmayên wî bi pişkivîne hebe).

— Wehdetil-wucûd û Wehdetiş-şuhûd —

Felsefa Wehdeti-l Wucûdê (Pantheism=yekhebûn) hebûnek bi tenê), **Xweda** û kewn û kaînatê yek tiştekî dibîne; bawerî yê bi yekhebûyînî ya wan tîne (Kaînatê sîya hebûna **Xweda** dibîne) ku ew dîtin û bawerîya felsefî jî, bi du awayan, bi du cûran înkîşaf kirîye:

Cûrekî wî meteryalîst û maddepereste, li ser nav û hesabê madde yê, înkarîya hebûna **Xweda** dike, dibêje ku "ji maddeyê bêtir tu tişt tuneye, madde bi tenê heye, **Xweda** jî di maddeyê da ye; hemû tişt, hemû mewcûdat li ser hev **Xweda** ye, ji xeyrî wî **Xweda** tune ye "ku ev cûrê wehdetil-wucûdê, di sed sala 18. da, li Fransayê fikra hinek feylesufên wek Denîs DIDEROT (1713-1784m.) û Henrî BARON (1729-1784m.) bûye.

Cûrekî wî yê din jî, îdealîst û **xweda**mebest e, (mewzû'û behsa me jî ewe). Ku ev cûrê Wehdetil-wucûdê, li ser nav û hesabê wucûda mûtleqqa îlahî,her tiştî tune di hesibîne; Wucûd û hebûna her tiştî tecellî û sîya wî hebûna pîroz û ezelî dibîne, înkarîya hebûna heqîqî ya her tiştê dike, dibêje ku: "ji xeyrî **Xweda** (Ji bilî

Xwedê) wucûda heqîqî ji tu tiştî ra tune; her tişt (hemû kaînat) tecellî û sîya Wî wucûda mûtleqa îlahî ye, ku Ew wucûda pîroz jî, 'Eynê Zatê Wî ye"

Wucûd a Wî 'eyne ji boy Zatê Wî
Ne ewwel, ne axir, ne zidde Ewî

(Nehcu-l Enam, Rûpel 3)

Yanê xulase: "Kewn û kaînat hemî, tezahura (xûyabûyîna) Wucûd a heqîqî ya Zatê îlahî ye, cîlwe û tecellîya Wî ye. (Ewe û Hew!)

Ku Wehdetîl-wucûd, bi vî me'nayê di Hindûîzma Hindê da, di felsefa wî ya exlaqî da jî cîhgirtî ye (Wîdant Rûpel: 41-43)

Di Alema Îslamê da jî ev felsefe (Wehdetîl-wucûd), fikr û bawerîya mutesewwûf û mutefekkirin wek *Hellac* (...922m.) û *Îbnû Erebî* (...1240m) û *Îbnûl Farid* (1181- 1235m.) û *Ebdulkerîmê Ceylî* (... 1428m.) û *Melayê Cizîrî* (1574-1640m.) û yên wekî wan bûye.

Wehdetî-ş̧ûhûd jî: Bi me'na ş̧ûhûd û dîtina tiştekî bi tenê ye, muşahede û dîtina Wahid ê mûtleq, bi çavê 'eql û besîretê ye, wek ku şairê gotîye:

وفي كل شيء له آيةٌ تدلُّ على أنّهُ واحدٌ (Yanê: belge û ayetên ku yekîtiya wî nîşan didin, di hemî tiştan da hene),

Di nusxekî (deqqekî) din da jî, ev şîir wiha ye :

وفي كل شيء له آيةٌ تدلُّ على أنّهُ ظلّه (Yanê: belge û nîşana wî ya ku her tişt sîya wî ne (Tecelîya wucûda wî ne), di hemî tiştan da heye),

Ku ev nusxe jî, Wehdetîl-wucûdê bi kurtî teswîr dike.

Ji xwe ferqa di navbera wehdetîl wucûd û wehdetîş ş̧ûhûdê da jî ev e: ku bi angorê wehdetîl wucûdê: "her tişt sîya hebûna **Xweda** ye; bi angorê wehdetîş ş̧ûhûdê jî: Wucûd a mûtleq, wahidê ferd di her tiştê da tê dîtin û dîyare. Bi gotinekî din: "wehtetîl wucûd fikr û felsefeye, wehdetîş ş̧ûhûd jî zewq û mûşahedeye, pratîk û tecrîbeye, haletekî zewqî û ş̧ûhûdî yê wiloye ku xweyê wî haletê, ji wucûda **Xwedê** bêtir tu tiştî nabîne; ne wucûda xwe dibîne, ne jî ya Alemê, belkî wucûda Heqq bi tenê dibîne; di gîhîje meqamê baqîmayîna bi **Xwedê** ku Hellacê Mensur di wî meqamê da gotîye - Enel Heqq=ez Heqq im, ez **Xweda** me-" ku fikr û armanca

mutesewwûfên wek Eba Yezîdê Bîstamî (...875m) û Cuneydê Bexdadî jî ew bûye (wehdetîş şûhûd bûye).

Mirov dikarebibêje ku fikr û bawerîya Xanî jî: mezc û terkîba wehdetîl wucûd û wehdetîş şûhûda felsefî û tesewwûfî bi hev ra, bi tewhîda îslamî ra, westiran û rokirina wan di qalibekî wehdetî yê bi taybetî da ye; wek Eflotînê îskenderî ku di navbera felsefa mîsalî ya Eflatonê Yûnanî û bawerî yên dînî da yekitî û aşîtî çê kirîye, hîmê felsefa Platonîya nûh (neoplatonism) danî ye.

Yanê: Xanî wehdetîl wucûda felfesî û wehdetîş şûhûda tesewwûfî, bi hev ra bi tewhîda heqîqî ra mezc dike, di yek qalib û yek reng û rewşekî mûşterek da ro dike û di nerxîne; di nav bera fikra Îbnû Erebî û Hellac û Eba Yezîdê Bîstamî da, fikra Xezalî (... 1111m) û Îbnûl Ruşd (1126-1198) û Farabî (...-950m) û Plotonê misrî, û Platonê Yûnanî da diçe û tê; wehdetîl wucûd û wehdetîş şûhûd û tesewwûf û felsefeyê, bi hev ra di meşîne; ji navbera fikr û bawerîyên cûr be cûr, nuqte û xalên mûşterek di niqîne; tiştek nûh jê dertîne û pêşkêş dike.

Çawan -dema ku ronahîya Rojê di madda zelalî ya 'Ewran da tehlîl dibe, di şeklê 'Elemû-ssema û keskesorê da rengîn di xuyê- wilo wehtetî-l wucûd jî, di şûşa billora fikra Xanî da tê tehlîl kirin, bi rengê felsefe û tewhîd û wehdetîş şuhûd û tesewwûfê bi hev ra, -wek ala kesk û sor û zer- rengîn û zengîn ci be, dixemile û di çirûse.

Ji xwe fikra Xanî, di her mewzû' û mijarê da wilo regîn û zengîn e; bi taybetî û cudaî ye, girift û mûemma ye. Ku ji xwe felsefa wedetîl wucûdê jî wisa ye, xulasa wî jî wiha ye: "yek wucûdekî mûtleqê ezelîyê bi tenê heye ku ew jî wucûda **Xweda** ye; bê mîsal û bê hemta ye, ji Wî pê da tu tişt tune ye, her tişt ji Wî da ye, hemû cûren kaînatê tecellîya Zatê Wî ne, esma û sifatên Wî ne (nav û nîşanên Wî ne) **Xweda**, li her derî, di hemû tiştan da veşartî û pinhan e, eşkera û 'îyane, xaîb û hazir e, lê bê hûlûl û bê îttîha de, bê cîh û bê mekan e, destpêk û dawîya her tişta ne, Ewî her tişt di **xweda** gitîye, her tişt di Wi da ye, bi Wî ye û ji Wî ye, Ewe, hew ! " ku *Qur'an* jî, ewî wiha telxîs dike :

«هو الأول والآخر والظاهر والباطن وهو بكل شيء عليم» "Ew, destpêk û dawî ye, eşkera û veşartîye, Ew bi her tiştî pirr baş di zane û zanîye" (El-Hedîd/Ayet 3)

«ألا إنّه بكل شيء محيط» "Bê guman, Ewî bi her tîştî îhate kirîye, dor li her tiştî girtîye (her tişt di Wî da ye)". (Fûssîlet/Ayet 54)

Xanî di her firsetîda (geh bi cesaret û bi germî, geh jî bi îhtîyatî û bi nermî) temas û îma û îşaretê cîhetên mehrem û namehremên wê felsefa Wehtetîl Wucûdê dike û dinirxîne, hespê xwe di meydanên wî yên cûr be cûrên fireh û bi dirrik û xweşik da di bezîne. Wek ku divan helbesteyên xwe da :

Ey wahidê bê şerîk û yekta
Wey wacidê bê nezîr û hemta
Ey baqîyê bê zewalê daîm
Wey hadîyê bê fenayê qaîm
Mulk û melek û felek bi carek
Bil cumle Te çêkirin tebarek
Fil cumle: çi ewwel û çi axir
El qisse: çi mû'mîn çi kafir
Her yek ji Te ra we bûne mezher
Ew renge di wan Tu bûyî mûzmer
Bê husnê Te nîne wan wûcûdek
bê nûrê Te nîne wan numûdek

.....

Ayîne Te çêkirin mûkerrer
Husna xwe di wan Te kir mûsewwer

.....

Hikmet ewe batinîy û zahir
Qudret ewe xaîbîy û hazir
Nînin Te teheyyuz û temekkun
Emma we di wan dikî tewettun
Goya hemî cîsmekin Tu canî
Goya hemî şehrekin Tu Xanî (*)

(*) **Ey, wey, hey, lo:** tîpên nîda û bangkrinê ne./ **Wahid:** Yekemîn (zatê Xweda digel sifatên Wî ku Ehed jî, zatê Wî yê bi tenê ye, bê mûlaheza sifatane)./ **Wacid:** Darayî, tewana, dewletî./ **Bênezîr:** Bê hemta, bê mîsal./ **Bêşerîk:** Bê hembeş, bê heval, bê hember./ **Bêhemta:** Bê heval, tayê bi tenê, bê şerîk./ **Baqî:** Mayî, bê zewal, daîm, herheyî./ **Qaîm:** Li ser xwe mayî, bi xwe heyî, sabit./ **Hadî:** Rêber, rênîşander./ **Bêfena:** bê tunebûn, bê fanî bûn./ **Mulk:** Darayî, mulk û mal, alema berçav./ **Melek:** Firişte, alema xeyb./ **Felek:** çerxa felekê, gerdûn./ **Bicarek:** hemû li ser hev, bi yek carî./ **Tebarek:** Pîroz û mûbareke./ **Bilcumle :** Tev bi hev ra, hemû li ser hev./ **Filcumle :** Xulase, bi kurtayî./ **Ewwil û axir:**

Rewşa mezherrîyeta (xuyangehîtîya) kewn û kaînatê, ji wî wucûda mutleqq û pîroz ra, keyfîyeta mûzmerîyyeta (têveşarîtîya) wî yekê bi tenêyê bê zewal û bê heval, di hemû alemê da, bi rewş û keyfîyeta beden û can û kîyanê bedenê, bi rewşa bajar û xan û manê bajarê, şebihandîye; wî pîrozê bêhemta wekî rûh û canê bedena kaînatê, wekî xan û manê bajarê alemê teswîr kirîye û nerxandîye; nîhanîtî û 'îyanîtî û xaîbîtî û hazirîtîya wî, rewşa êwirbûyîn û bicîhbûyîna wî ya bê cîh û war û mekan jî, bi hikmet û qudretê îfade kirîye û gotîye: "ya rebbî! hîkmet ewe ku Tu hem batinî, hem zahirî, qutret jî ewe ku Tu hem xaîbî, hem jî hazirî,Tu di cîh û warek da jî nînî; lê Tu diwan da wilo bi cîh jî bûyî ku herwekî ew cism û bedenin, Tu canê wanî, ew şehr û bajar in, Tu xan û manê wanî" (ku heta derecekî ew sirr û hikmet û mûemma, bi felsefa wehdetîl wucûdê, nêzîk ê bal fehm û îdrakê va dibe).

Melayê Cizîrî jî, teşbîha wî wucûda mutleqq a ezelî, bi derya yê, teşbîha 'alem û kainatê jî, bi pêl û lem û peqik û cemeda avê, teşbîha peywendî û mûnasêbtên di navbera xaliq û mexlûqêda jî, bi mûnasebet û peywendîyên di navbera av û cemed û derya û pêl û lemên deryayê da, kirîye û wiha gotîye:

Yeke derya Tu bizan qencê çi mewc û çi hûbab
Bi heqîqet ku yek in her dû çi av û çi cemed.

Ku bi rastî jî, ev teşbîh û temsîla "Mela", pirr teşbîh û temsîlekî me'nîdar û hêjaye, kûr û dûr û di cîhê xwe daye. Ku bi wî, hem mahîyeta felsefa wehdetîl wucûdê, hem jî ferqa di navbera wî û Hûlûl û îttîhadê da, bi hêsayî û qenc û baş tê îdrak kirin û diyar dibe. Ku bi angorê felsefa wehdetîl wucûdê: "ji wucûda mûtleqq a îlahî bêtir, di heqîqet da tu tiştek tune ye û mewcûd nîne, bi tenê ew heye, hemû masîwayê wî 'eksa wî wucûd a pîrozin.

---

yê pêşî û dawî./ **El Qisse:** Wel hasil, netîce./ **Mû'mîn û Kafir:** Bawerker û nebawerker./ **We bû ne:** Wilo bûne./ **Mezher:** Xuyangeh./ **Ew Renge:** Ev reng, bi vî terzî, wihakî./ **Mûzmer:** Ketînavê, tê da, hatî veşartin./ **Nûr:** Ronahî (tecellî û xûyabuyîna Xweda bi navê xweyê E-Zzahir)./ **Numûdek:** Xuyanek, berçavokek, dîyarbûyînek./ **Hikmet Eve:** Zanîna heqîqî û sirr û hikmek eve ku tu hem batinî, hem jî zahirî./ **Batinî:** Weşatîyî, nihînî./ **Zahirî:** Dîyarî, eşkerayî./ **Qudret:** Tewanayî. Yanê: Qudret û Îqtîdar eve ku Tu hem xaîbî, hem jî hazir û nazirî./ **Teheyyuz:** Bi cîhbûyîn, êwirandina di cîhekî da./ **Temmekun:** bi cîhbûyîna di mekanekî da./ **Tecezzî:** Perçebûyîn./ **Tewettun:** Êwirîn, êwirbûyîn, bi cîh û war bûyîn./ **Goya:** Tu dibê qey? Her wekî ku, qaşo./ **Cisim:** Cuse, beden./ **Can:** Rûh û kîyan./ **şehr:** Bajar./ **Xanî:** Mal û avayî./ **Ayîne:** Eynik, neynik./ **Mûkerrer:** tekrarbûyî, pirr û pirr./ **Husna xwe:** Bedewtî û rindîtî û spehîtîya Xwe./ **Mûsewwer:** Teswîrbûyî: Teswîrhatî, bi şekl û sûretbûyî.

Hûlûl jî eve kû "tiştekî mewcûd (Heyî) bi keve nav mewcûdekî din û pêra bi ve yek."

Îttîhad jî, ewe ku "du tiştên mewcûd, weyan çend tiştên mewcûd bikevin nav hev û bi hevra bivin yek, ji wan tiştek dinê çê be. "Wek ku oksîjen û hidrojen dikevin nav hev, bi hevra dibin yek û ji wan av çê dibe, Hem wekî av û ax ku dikevin nav hev, bi hevra dibin yek û ji wan çamûr peyda dibe. Ku yanê bi kurtî: Di *hûlûl* û *îttîhad* ê da, du tiştên heyî mewzû û behsin; lê di wehdetîl wucûdê da, yekîtî û yekbitenêtî mewzû û behs e. Ku bi tu awa û bi tu mûnasebetî peywendî û mûnasebeta Hûlûlê, bi felsefa wehdetîl wucûdêra, bi tewhîda Îslamêra tune; Lê ew *îttihada* ku di îstilaha sofîyan da, îbaretê ji meqam û merteba
(الفناء فى الله والبقاء بالله) Fanî bûyîna di **Xweda** da, baqî mayîna bi wî wucûda wî ye, (îttihad, bi wî me'na yê), mertebekî pîrozê herî bilind û mezin e, derecekî tesewwûfî yê zewqî û şûhûdîye, ku *Ebdurrezaq ê Kaşanî* (.....1329m.) di Îstîlahat-û ssofîyye ya xwe da wiha te'rîf û teswîra wî kirîye û gotîye:

«هو شهود الوجود الحق الواحد المطلق – الذي الكل به موجود – بالحق فيتحد به الكل من حيث كون كل شيء موجوداً به معدوماً بنفسه لا من حيث أنّ له وجوداً خاصاً اتّحد به فإنه محال».

"Ew (Îttîhad) şuhû da wucûda wahidê heqqê mûtleqq (ku her tişt bi wî wûcûdê mewcûdin), bi wî heqqê ye. Ku yekîtî ya tiştan bi wîra bi vî me'na yêye: ew heqqê mûtleq bi tenê heye, ne bi vî me'na yêye ku ji tiştan ra jî, wucûdekî bi taybetî û xass heye. Ku tişt bi wî wucûda xwe ya bi taybetî û xass, bi wî heqqê mûtleqqê bi tenê ra dibin yek; Ji ber kû ew mehale, (ne mûmkîne) lewra yek wucûdek bi tenê heye, ew jî ew wucûda mûtleqqa heqqe hew!"

Xanî jî di behsa vefata Memo û Zînê da, azadîbûyîna rûhê wan ji qefesa cismanî, yekbûyîna wana di 'alema rûhanîda, gîhîştina wan zerreyan bal Afîtaba wucûda mûtleqa zatê sûbhanî va, bi ûslûba bîr û bawerîya wehdetîl wucûdê - wek feylesofekî pispor- bi devê wê felsefê di axive, teswîra wî îttihada taybetî, wiha dike û dibêje:

Wan terkê kirin serayê fanî
Ew çûne cîhanê cawîdanî
.....
Fil cumle ji merkeza turabê
Ew zerre gîhane afîtabê
Qet'a ne bi îttsal û tehlîl
mehza ne bi înfîsal û tehwîl
Wan rê ku birin bi canibê zat
Baqî gerîyan bi zatê zerrat.(**)

Yanê: ku perçeyên wucûdê, ji navenda 'alema maddî, bê îttîsal û bê înfîsal û bê tehlîl û bê tehwîl û bê hûlûl û bê îttîhad, bi alîyê zatê îllahî va çûn; gîhîştin roja ehedîyettê, ew zerrat û perçe bi wucûda wî zatê sermedî (herheyî) baqî man, bi hebûna wî heyî bûn, herheyî man. Wek hebûna cemedê ku bi avê ye, bi wî heye, di heddê zatê xwe da tuneye.

(**) **Fil Cumle:** Xulase, welhasil./ **Ji merkeza Turabbê:** Ji navenda xwelîyê, ji 'alema maddî, 'alemâ dunyewî./ **Zerre:** Perçeyên herî hûrik û piçûçik, Heyûla, Atom./ **Afîtab:** Roj (ku meqsed jê di vir da wucûda wahidê mûtleq, zatê Xweda ye). **Gîhane:** Gîhîştine, wesilîne./ **Qet'a:** Bêguman, tu car./ **Îttîsal:** Bi hevagirtin, gîhîştina hev./ **Tehlîl:** Daxistina di cîhekîda, hûlûl dêrana tiştekî di tiştekî din da, di mekanekî da./ **Mehda, Mehza:** Bi tenê, ew bi tenê, feqet./ **Înfîsal:** Ji hev qetandin, ji hev cudabûyîn./ **Tehwîl:** gerandina tiştekî bal tiştekî din va, gerandina bal haletekî dinê va./ **Bi Canibê Zat:** Bi alîyê zatê Xweda va./ **Baqî gerîyan:** Baqî man, her heyî man, manû man.

Sultanê aşiqan, qehremanê wehdetîl wucûdê û wehdetî-şşûhûdê, **Îbnû Farid** (Ûmerê kurê Farid-1181-1235m) jî, di vê bareyê da wiha dibêje:

وها أنا أَبْدي في اتحاديٌّ مَبْدَئي
وأُنْهي انتهائي في تواضع رِفْعَتي

"Ha jê hebin! Ku ez di îttihada xwe da, mebde ê xwe (destpêka xwe) diyar dikim û di nivzaya bilinda ya xwe da (di nivzaya fanîbûyîna xwe ya di bilindaya bakîmayîna xwe ya bi wî da), dawî li dawîhatina xwe tînim".

Yanê: Mebde û muntehayê min ewe û hew!, Ew heye, ji wî bêtir tu tişt tuneye; Îttihada min a bi wî ra ji, fanîbûyîn û baqîmayîna min a bi wî ye.

Melayê Cizîrî, di cîhek dinda jî dibêje kû "zatê aşiqê" (hebûna wî ya maddî), di navbera wî û me'şûqa wî da hîcab û perde ye. Hetta ku ew perde ranebe 'aşiq û maşûq nagihîjin hev, di vê ku 'aşiq, di îşqê da fanî bibe, heta ku bighîje maşûqa xwe, pê baqî bimîne; ji ber ku heta aşiq fanî nebe, naghîje maşûqê ku ne gihîje maşûqê jî, baqî nabe :

Aşiq û ma'şûqê da wasil bi yek bin bê hîcab
Mehwî bû bizzatê Aşiq, lew di 'îşqê perde bû
Lew di 'îşqêda fena bû, da bibit baqî bi dost
Aşiqê fanî nebû wasil heta baqî nebû

Xanî jî, di vê bareyê da wiha dibêje :

Fanî nebitin fenayê mûtleqq,
Nabînitin ew beqayê mûtleq.
Fanîtî ji bo wî ra beqa ye,
Baqîtî ji bo wî ra fenaye.
Emma ne bi îttîsal û îlhaq,
Belkî ne bi înfisal û îtlaq.

Yanê : heta kû ji talibê heqîqetê ra fanîbûyîn a mûtleq çê nebe ew nagehîje beqaa bil heqq(baqîmayîna bi Xwedê) û ewî nabîne, heta fanî nebe baqî nabe, fanîtîya wî wesîla baqîtîya wî ye, baqîmayîna wî jî bi fanîbûyîna wî ye. Lê ew baqîmayîna wî, ne bi îttîsal û îlhaqq e (ne bi pêvagirtin û pêvadayîn e), ne jî bi înfîsal û îtlaq e . Belkî bi terz û awakî dinê cûdayî û taybetî ye.

Ku ew meqamê Rebbanî, ew haletê zewqî û şûhûdî, meqamekî wilo taybetî yê bilind û walaye, ku bêje û kelîme, ji îfadekîrin û îzahkirina wî kurt û acîz dimînin. Ew haletê taybetî û zewqî û şûhudî, mûnezzeh û paqijê ji me'na *hûlûl* û *îttîhad* ê, *îttîsal* û *înfisal* ê, *îtlaq* û *îlhaqq* ê ye jî; ku bi kurtî, îzah û beyana wî, îdraka mahîyet û heqîqeta wî meqam û haletê pîroz ne mumkîne, ne di quwweta mirov da ye, bi kelîman nayê îfadekirin, belkî bi hinek teşbîh û temsîlan merif dikare îfade bike. Wek ku *Îbnul Farid* ê, di Qesîdeya xwe ya Xemrîyye da, îşq û mehebbeta heqîqetê (îdraka wûcûda heqqa mûtleqq), bi xemr û meyê teşbîh kirîye, wiha teswîr û îfade kirîye û gotîye :

1 شَرِبْنا على ذكـر الحبيب مُدامة سَكِرْنا بها من قبل أن يُخْلَقَ الكَرْمُ

2 لها البدرُ كأسٌ وهي شمسٌ يُديرُها هـلالٌ وكَمْ يَبْدو إذا مُزِجَتْ نَجْـمُ

3 صَفاءٌ ولا ماءٌ ولُطْفٌ ولا هَـواً ونـورٌ ولا نـارٌ وروحٌ ولا جِسمُ

4 وهامَتْ بها روحي بحيثُ تمازجَا اتـ حـاداً ولا جُـرْم تَخلّله جِـرْمُ

5 فخَمْـرٌ ولا كَـرْمٌ وآدمُ لِي أبٌ وكـرمٌ ولا خـمـرٌ ولِي أُمُّهـا أُمُّ

6 وقد وقـع التّفـريقُ والكلُّ واحـدٌ فأرْواحُنـا خَمْـرٌ وأشْبَاحُنا كَـرْمُ

7 على نفسـه فليبكِ مَنْ ضَاع عُمْرُهُ وليـسَ لهُ فيها نَصِيبٌ ولا سَـهْمُ

1- Me li ser behs û bîranîna mehbûbê, mey û badekî wilo (xerîb û enteresan) vexwarîye ku em ji berî ya çêbûyîna rezzên trîyên wê meyê da, bi wî meyê mest û serxweş bûne.

2- Ew bade ya ku Bedir (hîva çardehşevî , hîva tamm. Ku kinayetê ji Alemê ye), qedeha wî ye, ew bi xwe jî, roj e (roj a heqqe, roja ehedîyyeta mûtleqe), hîlal, hîva nû (Eql û şûûr a deqîqa însanê kamilê ku wekî hîva nû bi nûra roja ehedîyyetê nûranî bûye) jî, ewî mey û badeyê digerîne, belav dike, ku dema ew mey mezzc jî bibe (dema ku Lahût û Nasût, rûh û beden dikevin nav hev), di wê demê da, pirr Stêrkên (pirr beqlolkên wekî sitêrkan), pirr stêrkên hîdayetê, dîyar dibin. (ku Hz. Mûhemmed jî, derheqq hevalên xwe da wiha gotîye : أصحابي كالنجوم بأيّهم اقتديتم اهتديتم

"Hevalên min wekî sitêrkanin, hûn bi kîjanê ji wan îqtîda bikin, li pey kîjan ji wan herin, hûn tên hidayetê, tên ser rêya heqq û rast."

3- Safitî ye, lê av nîye, letîfîtî ye, lê hewa nîye, ronahîtî ye, lê agir nîye, rûh û can e, lê cûsse û beden nîye.

4- We Rûhê min, bi terzekî wilo bi wî meyê mest û şeyda bûye ku ketine nav hev û bihevra bûne yek tiştek. Lê belê, ne wekî ku cismekî dikeve nav cismekî û bi hev ra dibin yek. (belkî bi terzekî cûdaîyê wilo ku te'rîf û teswîra wî bi bêjeyan, ne mumkine).

5- We di heqîqet da Xemr û Mey heye, rezz tune ye, (masûwa yê wî tune ye), di gel ku Adem jî, bavê me ye. (ku madem bavê meye û heye, lazime ku em jî hebin) Rezz heye, mey tune ye, di gel ku dîya wî meyê, dîya me ye jî (jêder û mesderê wî yê bingehî, yê me ye jî). Yanê: du cîhetê wî hene: yek eve ku ew heye, masûvayê wî tuneye, yek jî eve ku li ber çavan, masûwayê wî heye û dixûyê, lê ew naxûyê, di gel ku dîya wî (mesderê wî yê bingehî), heye û dîya meye jî, (em jî ji wî mesderê bingehîne). Ku madem dîya wî heye û dîya meye jî, bê guman ku ew jî heye (her çukas ku li ber çavan naxuyê jî).

6- Ku netîce: hemî yek tiştek bûn, ji hev qetîyane, ku rûhên me bade û meye, bedenên me jî rezz û tirîyên wî mey û bade yê ne. (Rûh, heyata bedenê ye, ew meya heqîqetê jî, rûhê 'alemê ye, mey di engûrê da veşarî û carî ye, ew rûhê pîroz jî di hemî 'alemê da, sarî û carî ye diyarî û veşarî ye).

7- Ewê ku temenê wî zayî bûye û nesîb û para wî di wê meyê da nebûye (jê bê pare), bila ew li ser nefsa xwe bigirî, şîna xwe bike, (ku ji zewqa wî meya pîroz, bê nesîb û bê par maye).

Xanî jî, wê meya me'rîfetê wiha teswîr û beyan kiriye û gotîye :

Em 'aşiq eger çî meyperestin — *Emma ji meya "Elest"î mestin*
Ew mey ne wekî meya Te, tal e — *Ew mey ji cemala zûl celal e*
Ew hûbbê Hebîbê Pakî Zat e — *Qînwanê Hedîqeyê Sifat e*

Yanê: gerçî em 'aşîq meyperestin, lê em ji meya "Elest" mestin ku ew meya pîroz ne ji cûrên meya reng al û tahle, belkî ji meya bezma Elest e (ew bezmû meclisa me'newî ya ku **xweda** tê da ji rûhan ra gotîye "Elestû bî rebbîkum" = Ma qey ez rebbê we nînim? rûhan jî, bersîva wî wiha dane û gotine: belê! tu Rebbê meyî), meya 'îşq û mehebbet a cemala zatê zûl celal e (zatê ku xweyê celal û 'ezemetê ye), ew meya gûşîyên tirîyên baxû baxçeyê sifatên wî zatê bê hemta û bê mîsal e, Em cema'eta 'aşiqan mestê wê xemr û meyê ne, wî şerab û badeyê ne, talibên wî me'rîfet û îrfanê ne, mezherê sirr û hîkmetê vê fermanê ne:

«وما يزال عبدي يتقرّب إليَّ بالنوافل حتى أحبه فإذا أحببته كنت سمعه الذي يسمع به وبصره الذي يبصر به ويده التي يبطش بها ورجله التي يمشي بها». صحيح البخاري، مجلد ٨، صفحة ١٠٥، باب التواضع.

"'Ebdê min, (bendeyê min), bi îbadet û perîstên zêde, hêdî hêdî nîzikê bal min dibe, hetta ku Ez ji wî hezz dikim, dema ku min jê hez jî kir, Ez dibim gûhê wî yê ku pê dibîhîze, çevê wî yê ku pê mêze dike, (dibîne), destê wî yê ku pê diberize (pê kar dike) û lingê wî yê ku pê dimeş e... (El bûxarî-babû ttewazuî-8/105)"

Hasilikelam: Di vê behs û mijarê da pirr tişt hatine gotin, pirr teswîr û temsîl hatine kirin lê di dîtin û bawerîya Min da, tu kesî wekî *Melayê Cizîrî* û *Îbnûl Farid* ê, bi cesaret û wekirî, geş û xweş mesleyê, teswîr û teqrîr nekirîye. Ez cûmle: Îbnûl Farid, di *Nezmî ssûlûk* a xwe da, xwe bi wî heqqê mûtleq ra yek tiştek dîye, xwe di şûna wî da hesibandîye, bi zimanê wî axivîye û wiha gotîye:

فلا حيَّ إلاّ عن حياتي حياتُه وطوعُ مُرادي كلَّ نفسٍ مُريدة

ولا قائلٌ إلاّ بِلفظي مُحَدِّثٌ ولا ناظرٌ إلاّ بناظر مُقلَتي

ولا مُنْصِت إلاّ بَسَمْعيَ سامعٌ ولا باطِشٌ إلا بِأَذْلي وشِدَّتي

ولا ناطقٌ غَيري ولا ناظرٌ ولا سِميعٌ سواي من جميعِ الخَليقة

وألْسِنةُ الأكوان إنْ كنتَ واعياً شُهودٌ بِتَوْحيدي بِحَالٍ فَصيحَة

"Tu candar tune kû jîna wî ji jîna min nebe. (jîna hemî candaran ji jîna min e), vayîna hemî kesên ku divên, bi angorî vayîna min e. (Îrada wan bi îrada min e), yên ku di axivin jî,bi gotinên min di axibin, yên ku mêze jî dikin, bi çavên min, mêze dikin, yên ku guhdarî jî dikin, bi guhên min dibihîzin, yên ku diberizin (hucûm û hêriş dikin) jî, bi kuwwet û şidetta min diberizin, di nav hemû mexlûqatan da, ji xeyrî min, tu kesê ku bi axive û mêze bike û bibîhîze tune ye (her Ez bi tenê heme, Ez her tiştî dikim, her tişt bi mine, ji mine), eger ku tu qenç bala xwe bidê û baş fêm bikî, tu dibînî ku hemî zimanên hemî kaînatê, şahidiyê bi tewhîda min didin (şahidê vîqasîne ku di heqîqetta ez bi tenê heme,)

Îbnu-l Farid, di qesîda xwe ya *Cîmîyye* da jî, dibêje ku "di meydana ceng û şerrê di navbera çavên belek û Rûhan da, Ez ew kuştîyê bê guneh û bê xetame".

ما بَينَ مُعْتَرَكِ الأحداق والمُهَجِ أنا القَتيلُ بِلا إثْم ولا حَرَج

Melayê cizîrî jî, di qesîda xwe ya bi navê *"Ellah Seher gaha Ezel"* da, wiha dibêje: Bêguman em hemî, Hûwîyyetin (belgeyên Hebûnê ne), ew navin jı mesderekî (ji rader û jêderekî) çiqq bûne (di heddê zatê xwe tune ne), wek wehm û xîyalin, bi her awayî, ji her awayî da, em ne tiştin (tune ne), wek 'eksa di nav neynikê da ne. (Sûret û sî ne, tecellîya mesder û jêderekî Herheyîne.)

Em tev Hûwwîyatin yeqîn, îsmin ji mesder mûşteqîn
Mewhûm û la şey' mûtleqîn, 'Eksîn di nêv ayîne da

Ferqa di navbera wehdetîlwûcûdû wehdetîşşûhûdê da :

Wehdetîşşûhûd, pratîk û tecrîbe ye, îdrak û besîrete (dîtina bi çavê dile), haletekî zewqî û şûhûdîye, tune bûyîna ji wûcûda fanî, baqîmayîna bi wûcûda her heyîya ezelî û ebedîye.

Wehdetîlwûcûd jî, fikr û felsefeye, îlm û hîkmete, bawerîya bi yek wûcûdekî mûtleqqê her heyî ye, ku her tişt ji wî ye, bi wî ye, jî wî bêtir tu tişt nîye.

Ku bi angorî felsefa Wehdatîlwûcûdê:

1- Wûcûdekî mûtleqê bi tenê heye, ezelî û ebedî û sermedîye (her hebû yî û her heyî ye) ku ew jî wûcûda pîroz a zatê îlahîye û 'eynî wî ye. Çawan ku Xanî jî di **Nehcil Enam** a xwe da gotiye:

Wûcûda wî, 'eyn e ji boy zatê wî
Ne ewwel, ne axir, ne zidd e Ewî

2- Alem: sî û tecelîya wî ya dụwemîne, diyarbûyîna wî wûcûda heqq di sûretên mûmkînatan da ye. Ku hemî cûrên mûmkînatan jî, nav û nîşanên wî wûcûda mûtleqạ ezelî ne, sûretên wan ên me'qûle di ilmê **Xweda**yê ezelîda veşartîne. Ku ji wan suretên wanên me'qûle ra, *E'yanên sabîte* (Tiştên ku di 'îlmê **Xweda** da bi cîh bûne), *Hûrûfên 'alîye* (Tîpên bilind), *şûûnên zatîye* (rewşên wî zatê heqq) tên gotin. Ku ew sûretên tiştan, di *Xeybil xûyûb ê* da (di veşartîyê veşartîyan da), di *kenza mexfî* da (di xizna veşartî da ku zatî îlaĥîyye ye), veşartîne (wek veşartina darê, di dendikê da).

Dîyar bûyîna wî wûcûda mûtleqq di sûretên mevcûdatan da, navê wî yê "Nûr"e, tecelîya wî ya bi navê wîyê *"Ezzahir"*e, ku ew navê wîyê ezzahir jî, mezher û meclayê navê wîyê *"Elbatîn"*e

«هو الأول والآخر والظاهر والباطن»

Yanê: Ew, ewwil û axir û zahir û batin e (Elhedîd/3).

3- Bi gotinekî din: 'alem sûretê tecellîya **Xweda** ye, **Xweda** jî, hûwîyyet û rûhê 'alemê ye, hemû kewn û kaînat, hemî 'alem pêl û lem û şapol û sîhol û cemed û qeşa ya wî derya ya bê binî û bê paya ne, nav û nîşanên wî ne (esma' û sifatên wî ne), ne 'eynî wî ne, ne jî xeyrê wî ne.

4- Ewwelê tecelîyatan (tecellîya seratayî), 'îlmû zanîna zatê **Xweda** bi zatê **xweda** ye, îşq û evîna zatê wî ji hûsn û cemala zatê wî ra ye, ku ew sifetê alîmîyyetê, tenezûlla wî ya, ji merteba Ehediyyet ê bal merteba wahîdîyyetê va ye. (yanê: daketina ji merteba zatê mûtleqqê bê mûlaheza sifatan, bal merteba zatê di gel mûlaheza sifata ne)

5- Ji wî zanînê (ji zanîna zatê wî bi zatê wî) da, 'Eqlêewwel çêbûye ku ew 'Eqlê ewwil, mexlûqê wî yê ewwil e, jê ra Rûhê kûll, Nefsa kûllî, 'Erş, Lewh, û Qelem... jî, tê gotin

Melayê cizîrî û *Xanî* û gelek mûtesewwûfên dinên wekî wan, ji wî mexlûkê ewwel ra *"Heqqîqeta Mûhemmedîye* jî, gotine"

(Îbnûl 'Erebî, kîtap el mesaîl. R. 9-10-Heyderabad 1948.)

6- Bi tecelliya wî ya dûwemîn jî, sûretên mûmkînatan (sûretên cûrên 'alemê) Xûya bûne, 'alem çêbûye; (ku hemî ew sûretên 'alemê, nav û nîşanên wî ne, **Xweda** di neynika wan navû nîşanên xwe da, tecelli kirîye, xûya bûye)

7- 'Îşq û evîna zatê Heqq ji hûsn û cemala wî zatê Heqq ra di ezel da (Aşiqbûyîna zatê **xweda** ji hûsnû cemala ezelîya zatê xwe da ra), sebeb û wesîla xelqa alemê ye, (**Xweda** 'alemê ji boy naskirina xwe çêkirîye.) çawan ku di vî Hedîsa Qudsî da jî gotîye:

«كنت كنزاً مخفياً فخلقت الخلق ليعرفونى أي فخلقت الخلق ليكون مرآتا أشاهد فيها جمالي». أشارات الاعجاز / ٤ ، بديع الزمان

"Ez xezînekî veşartî bûm, min xwest ku Ez bême nas kirin, ji wî sedemî ji, min xelq (mexlûqat) çêkir ku ew min nas bikin".

Ku Mûhyîddîn ê Erebî, ewî Hedîsa Qutsî, wiha rave û şirove dike, dibêje: ku yanê: min xelq çêkir ku ew bibe wek neynik (eynik) û ez di wî da, cemala xwe bibînim (tê da temaşa cemala xwe bikim) Bedîûzzeman Seîdê Norsî (Mele Seîdê Kurdî) jî, ewî tefsîr û şirova Mûhyîddînê Erebî, teswîb û tesdîq dike (îşaratûl î'caz-R. 4- Beddî'ûzzeman, Se'îdê Kurdî).

Bi Kurtî:

1- Yek tiştek bi tenê heye ku ew jî wûcûda mûtleqa Heqq e.

2- 'Alem hemî, sîya wî wûcûdû hebûna Heqq e, navû nîşanên wîne.

3- Navû nîşanên wî jî, ne eynê zatê wîne, ne jî xeyrî wîne.

4- Tecellîya wî ya yekemîn (Seretayî), zanîna zatê wî bi zatê wî ye, ku ji wî da jî mexlûqê wî yê ewwel ('Eqlê ewwel...) peyda bûye (çê bû ye).

5- Gelek navên din jî, ji wî mexlûqê wî yê ewwel ra hene (wek 'Eqlê kull, 'Eqlê kullî, rûhê kull, nefsa kûllîye, Erş û Lewh û Qelem...)

6- Tecellîya wî ya duwwemîn jî, zûhûra sûretên alemê ye ku hemî cûrên 'alemê jî, nav û nîşanên wîne.

7- Îşqa ezelî (evîndarîya zatê ezelî ji hûsnû cemala wî zatê ezelî ra), wesîle û sebebê xelqa alemê ye, sirr û hîkmetê xelqa alemê jî, me'rîfet û naskirina wî zatê pîroze.

Ku Xanî di *Mem û Zîn* a xwe da, di *Dîvana* xwe da, geh bi serîhî, geh jî bi îma û îşaret, temasê wan hemî xalan kirîye. Lê wekî Îbnûl Farid (1181-1235 z.) û Melayê Cizîrî (1574-1640 z.) zelal û vekirî nîne, belkî bi îma û îşaretan îktifa tîne, zêdetirê ji Wehdettîl Wûcûd ê, bi alîyê Wehdett î şşûhûd ê va diçe. Lê ji boy ku Wehdetîl Wûcûd nezerîyye û piratîka Wehdetî şşûhûdê ye û heta ku nezerîyye jî, qenç neyê fêmkirin û zanîn, tecrîbe û piratîk çê nabe. Ji wî sebebî da, Xanî li ser Wehdetîl Wûcûdê wekî mûqeddîme (pêşek) diskine; Wekî wesîle lê mêze dike. Giranîya xwe, pirr dide ser Wehdetî şşûhûdê. Lê îhmala Wehdetîl Wûcûdê jî nake; di her firset û her mûnasebetê da, temasê cîhet û noqteyên wî yên mûhîm dike, lê xwe pirr bernade nav reh û çik û pejên wî yên talî, belkî di hinek caran da ewan jî, îma û îşaret dike.

Yanê bi kurtî: Xanî, nezerîya Wehdetîl Wûcûdê di gel piratîka Wehdetî şşûhûdê, di pota (di zêrheldanga) tewhîdê da di helîne, bi terz û awakî xusûsî, ro dike, di neqişîne û di xemilîne, bi şekl û rewşekî cûdaî pêşkêş tîne. Ku merif dikare bibêje: şopekî nûh, rêçekî taze vedike û di nerxîne.

Ji kerema xwe werin! Em bihev ra bala xwe bidin wî zêrker û

hûnermendê pispor ku ka bi çi awayî, bi çi rewş û rengî, Ewî me'denê giranbaha dihelîne û ro dike, di neqişîne û pêşkêş dike, çi rê û rêçikên hêja, çi şopên nûh vedike û nîşan dide:

Berîya her tiştî, divê: em evî qenç bizanibin ku bi zahirîbe jî, *Xanî* na xwaze ku ji fikra mezhebê Sunnî dûr bikeve; lê wekî fêylesufekî hûrr û aza, bi tu fikrî va jî girêdayî namîne. Belkî hespê xwe di her meydanan da dibezîne; ji hemî ekol û mezhebên "îlmî û felsefî, cîhetên wanên ku bi fikra wî ya Qur'anî ra dij nakevin di niqqîne, piş û para xwe jê hiltîne. Cîhetên wanên din jî, -hetta ku dikare- şirove dike û li hev tîne. Mirov dikare bibêje ku rê û şopa wî ya nûh jî ewe.

Ev jî rastîyekî dine: ku di navbera 'alîmên 'Eqîda îslamê û Ehlê Wehdetîlwûcûd ê da, di vê xûsûsê da: "ku yek wûcûdekî ezlî û ebedîyê bi tenê heye, ew jî wûcûda heqqa wahidê mûtleqqe û 'eynê zatê wî ye" tu îxtilaf tûne. Lê di keyfîyeta xelq û îcada alemê da, di navbera fikr û bîr û bawerîyên wan da îxtîlaf heye: Alimên felsefa wehdetîl wucûdê, dibêjin ku her tişt, hemî 'alem, ji wucûda mûtleqqa zatê **xweda** da peyda bûye. Sîya wî wucûda mûtleqqa ezelîye, ku di heqîqet da, ji wî bêtir jî tu tişt mewcûd nîye. Ehlê kelamê (Ehlê 'Eqîda îslamê) jî, dibêjin: ku xwedê 'alemê ji tûnetîyê çêkirîye, ji 'edemê anîye wûcûdê. Alem heye, ne sî û cîlwe ye. Lê ne baqîye, belkî mûweqqet û fanîye.

Ku *Xanî* - wekî pisporekî şareza - bi terzekî wilo cûdaî nîzîkê bal meselê va dibe ku ne bîr û bawerîya Ehlê Kelam ê rencîde dike, ne jî, ji îşaret û îmakirina bal tercîh û temayûla xwe ya ji Wehdetîl Wûcûd ê ra, ji parra dimîne. Belkî her dûyan, bi hev ra di qalibekî da ro dike, bi hev ra dimeşîne, bi rewşekî cûdaî di nerxîne û wiha dibêje:

Ey! Wahidê bê şerîk û yekta — *wey! Wacidê bê nezîr û hemta*
Ey! Baqî yê bê zewal û daîm — *wey! Hadîyê bê fenayê qaîm*
Mûlk û Melek û Felek, bi carek — *bîl cûmle Te çêkirin, tebarek!*
Lewh û Qelem û Sewabit û 'Errş — *heywan û nebat û Me'eden û Ferrş*
Zahîr kirin ev qeder Senayî' — *peyda kirin ev qeder bedayî'* (*)

(*) **Bê şerîk:** bê hembeş, bê heval./ **Qaîm:** payîdar, bi xwe heyî./ **Yekta:** takî bi tenê, yekê bi tenê./ **Bilcûmle:** hemî, tev bi hev ra./ **Wacid:** tewana, mûqtedir, bi şî./ **Tebarek:** pîroze, (tebarekellah: **Xweda** pîroze). **Bê nezîr:** bê mînak, bê mîsal, bê heval./ **Sewabit:** yên di cîhên xwe da sekinandî,Stêrkên ne gerroke./ **Baqî:** her heyî, her mayî./ **Nebat:** gîha, tiştên ku hêşîn dibin/ **Bê zewal:** bê wundabûn./ **Ferrş:** tiştê raxistî, zemîn./ **Hadî:** rêber, rênîşander./ **Senayî':** tiştên ku hatine çêkirin./ **Bê fena:** bê fanî bûn, bê tûnebûn./ **Bedayî:** tiştên espehî û xweşik/ **Lewh:** texte, texteyê nivîsarê./ **Qelem:** Xame, pênivîs, (bi mena mecazî jî), îlm, îlmê ***Xwedaye*** ezelî./ **'Erşş:** Ban, text, textê Seltenetê, textê Padîşahan, textê kamîranî û hûkûmdarîtîya ***'Xweda***, ku hemî kaînate./ **Tewrîye:** hûnerekî edebîye (wêjeîye), ku ew jî eve: ji kelîmekî ra dû me'na hene, yekî dûr, yekî nîzik, ku meqsed û mebest, ew me'na wî ya dûre, wek kelîma 'Erş ê ku me'na wî ya dûr, 'Eql û mexlûqê ewwile.

Ku ji zahirê ûslûba wan helbesteyan, ji zahirê me'na û mef'hûmên kelîme û bêjeyên wan, fikra mezhebê Sûnnî tê fêmkirin. Lê bi tewrîye, di wan da îşaretê bal felsefa Wehdetîl Wûcûd û Wehdetî şşûhûdê va ji heye. Ji ber ku di îstîlaha ehlê tesewwûf û Wehdetîl Wûcûdê da, **Lewh** û **Qelem** û **'Erş** û **'Eqlê ewwel**, yek tiştekên ku ew jî mexlûqê **Xweda** yê Ewwele, ji tecelîya wî ya seretayî peyda bûye.

Zahir jî, navê **Xweda** ye, "bi me'na ew wûcûda heqqa ku di sûretên kaînatê da dîyar bûye" ye. **Peyda** jî, bi me'na peyda bûyîn û dîyar bûyîna tiştekî ji tiştekî dine -wek peyda bûyîna Cemed ê ji Av ê-, Ku bi vî îtîbarê, bi vê şirove kirinê, xûlasa me'na wan wiha ye: "Ey ew yekê heqqê mûtleqê bê mînak û bê hemta, bê haval û bê mîsal û bê zewal! hemî tiştên maddî û me'nevî, berçav û neberçav Te çêkirine. (Ji tecelîya Tene) Te, ev hemî tiştên bê mîsal û xweşik, ji wê wûcûda xwe ya mûtleqqa bê hemta deranîne. Bi navê xwe yê *Ezzahir* dîyar kirine. (Te ewan hemîyan, ji xezîna mexfîya zatê xwe deranîne, ji xwe ra kirine nav û nîşan, tê da temaşa Cemala zatê xwe dikî) ku felsefa Wehdetîl Wûcûdê jî, bi Kurtî ewe.

Xanî, fikr û dîtina Wehdetîl Wûcûdê — ya ku dibêje alem ji **Xweda** da, (ji wucûda wîya heqq da) peyda bûye, tecellî û tezahira wî wûcûda heqqe — di dîwana xwe da, wiha îma û îşaret dike û dibêje:

Ey wahidê pinhan ku ji zatê Te ne peyda,
Ev kewn û mekan, erd û sema kûnbedê xedra.

Her yek bi wûcûda xwe, wûcûda Te dixwazin,
Bil cûmle xirîdarê cemala Te ne Heqqa.

Yanê: Ey Ew yekê bi Tenê yê veşartî yê ku ev kaînatû hebûn, mekan û erd û asîman, kumbeta hêşîn û gerdûn, hemî tişt, ji hebûna Te peyda bûne, ji hebûna Te çê bûne, ji tûnetîyê bûne heyî! Her yek ji wan bi hebûna xwe, hebûna Te dixwazin (Hebûna wan, nîşanê hebûna Te ne, Tecellîya Esma û Sifatên Te ne), Tev bihev ra muşterîyê rindayîtî û bedewîtîya Te ne, -wek ku hebûna wan ji hebûna Te ye-. Cemala wan jî, ji cemala Te ye. Xulase: hertişt ji Te ne, bi Te ne, sîya wucûda we ne, di heddê zatê **xweda** tune ne.

Xanî, di Mem û Zîn a xwe da jî, dîtin û bîr û bawerîya xwe ya derhaqqê mexlûqê ewwel û 'eqlê ewwel da, -wek wehdetîlwûcûdîyanteswîr û teqrîr dike û wiha dıbêje:

Herçî wekûbû ne bê reqem bû,
Lew ewwelê Ma xeleq qelem bû.

Ev ewwel û rûh û 'Eqlê ewwel,
Hersîne bi ewwelî mûewwel.

Emma, meke wan ji hev Tû tefrîq,
Ev renge ewan bigêre tewfîq.

Bê: şey'ekî wahîd in bi carek,
Te'dad û te'eddûd, î'tîbarek. (*)

Yanê: Herçî tiştên ku bûye, bê reqem û bê duruf ne bûye, Xwedê her tiştî, derece bi derece çêkirîye. Ku Seretayîyê wan qelem bûye, jê ra Rûh, Rûhê kull û 'Eqlê ewwel jî, tê gotin. Ku di heqîqet da yek tiştekin; Ferqa wan î'tibarî ye, angoreî ye (bi angorî ku zanîn pê dibe, qelem e. Bi angorî ku jeder û wesîla heyat û jîyanê ye, Rûhe. bi angorî ku difekire, îdrak dike, Eqlê Ewwel e...)

Herçî: Hertiştê/ **Wekubû:** Weku çêbû, ku wisa çêbû./ **Ne bê reqem bû:** Bê hejmar û bê numre ne bû./ *Lew*: Lewra./ **Ewwelê maxeleq:** Seretayê tiştên, ku Xwedê çêkir./ **Qelem:** Xame, pênûs, pênivîs./ **Hersîne:** Hersî tiştin./ **Ku bi ewwelî:** Ku biseretayîtî. **Mûewwel:** Şirovebûyî, şirovebûyak (Yanê: Ji hersîyanra jî ewwel tê gotin, ji berku hersî jî, yek tiştekin, ferqa di navbera wanda, îtibarîye)./ **Emma:** Feqet, welê./ **Tefrîq:** Ji hev qetandin./ **Ev renge:** Bi vî rengî, bi vî terzî./ **Tewfîq:** Li hev anîn./ **Bê:** Bibêje./ **Şey-ekî wahidin:** Yek tiştekin,tiştekî bitenê ne./ **Bi carek:** Li ser hev, bi tevayî./ **Te'dad:** Hejmartin,Hejmardin./ **Teeddud:** Jimare û bi jimarebûyîn, bi jimar û pirrbûyîn./ **Î'tibarek:** Angorîyek, tiştekî î'tibarî, tiştek ne heqîqî (Yanê: çendîtî û çend tiştbûyîna wan, tiştekî î'tibarîye, bi angorîye,nisbîye, ne heqîqîye, ji ber ku hersî ji navê yek tiştekîne, ji yek tiştekira tên gotin).

Wek me di pêşîyêda jî îşaret kir, *Mûhyîddîn ê 'Erebî* dibêje: Ji wî mexlûqê ewwel ra "'*Eqlê Ewwel, Rûhê Kûllî, Rûhê Rûhan, Îlîm, 'Erş... û Heqîqeta Mûhemmedî* jî tê gotin, ku Xanî jî, heqîqeta Mûhemmedî, wiha tewsîr û beyan dike:

Ewwel beriqî ji hûsnê sermed,
Nûrek bûye me'neya Mûhemmed.

Ew nurê bi emrê 'Alîmûlxeyb,
Bû menşey ê feyzê 'Alema Xeyb.

Erwahê ji me'neya peyamber,
Çê bûn, - mesela "nebat û şekker" -

Bû eslê esilê cûmle nefsan,
Nefsa sûeda û nefsa nehsan.

Yanê: berîya her tiştî, ji husn û cemala zatê Ezelî û Ebedî û Herheyî, nûrekî biriqî, şemal da, ku ew nûr, bû me'na *Mûhemmed, bû heqîqeta Mûhemmedî*, di dû ra, ew nûr bi fermana zanayê *xeybê* (bi fermana Xweda yê ku tiştên veşartî dizan e) bû jêderê feyza (rêj û herikandina) 'alema xeybê ('alema ne li ber çav, Alema Rûhanî), hertişt ji wî heqîqeta Mûhemmedî — Wek ku şekir ji qamîşê şekir çê dibe — peyda bûn ,bi vî awayî jî ew nûr bû bunyad û hîmê esasî yê hemî nefsên bextîyar û nebextîyar (hemî kesan).

Yanê: Her nefs û her tişt ji wî heqîqeta Mûhemmedî peyda bûn û çê bûn.

Ku *Mela Ehmedê Bateyî* (1414-1495m.) jî di mewlûda xwe ya kûrmancî da -di wê bareyê da- wiha dibêje:

Girtî yek qebzek ji nûra xwe, Xweda,
Gote wî "kûnî hebîbî Ehmeda"

Yanê: Xwedê qemçekî ji nûra xwe girt û jêra got:

-"Tu bibe ew hezkirîyê minê ku navê wî "Ehmed" e

Melayê Cizirî (1574- 1640 m.) jî, wiha îşaretê bal vî heqîqeta Mûhemmedîyye va, dike û dibêje:

Îsmê Te ye mektûbê di dîwana qîdem da,
Herfek qelemê 'ilmê, bi teqwîmê reqem da.

Eşkal û xetên daîreyê nûqte yê 'ilm in,
Ev neqş û mîsalên di xîyalatê Edem da.

Mîm, metleê şemsa ehed, ayîn e sifet kir.
Lami' ji 'Ereb, birqê li Fexxarê Ecem da.

Yanê: "Navê te di dîwan û deftera qedîma ezel da hatîye nivîsandin, qelema 'îlm ezel tîp û herfekî bi teqwîm û xîlpetekî mûkemmel reqem da, nivîsî.

Ev neqş û nemûşên ku di xîyal û sîberên tunetîyê dane (di heqîqet da tunene, wekî xîyalin), şekl û çixêz û noqteyên daîra 'îlmê ezelîne, tecellîyên wî ne.

"MÎM" (heqîqeta Mûhemmedî), metle'ê şemşa Ehed (tecellîya Roja yekê mûtleq, tecellîya xwe da) wek neynikê 'ekiskir (bû meclayê seretayê wê tecellayê) ku şû'le û pertewa wî, ji 'Ereb û 'Erebîstanê da hilbû, li qafik û cêrikên 'Ecem û 'Ecemîstanê da, nûra hîdayet û 'îlm û îfranê da wan".

Hellacê Mensûr (...922 m.) jî, dibêje ku: ji Hz. Mûhemmed (a.s) ra, du sûretên ji hev cûda hene:

1- Nûrekî qedîm û ezelî ye, berya hemû kaînatê bûye, hemû mexlûqat jî Wî peyda bûne. Her çiqas ku di zemanekî mehdûd û kifşe da, Adem peyxember bavê Wî ye jî, lê di hebûna Xwe da, Adem jî, ji Wî ye. Çawan ku Hz. Mûhemmed jî gotîye: "Ez pêxember bûm, ku Adem hêj di nava av û çamûrê da bû."

«كنتُ نبياً وآدمُ بين الماء والطين»

2-Ew sûretê Wî yê ku her wekî her tiştên hadis, di demekî mehdûd û kifşe da hatîye wucûdê (çê bûye) û wezîfa xwe ya pêxemberîtîyê pêk anîye.

Ku Xanî jî naveroka vê hedîsê, wiha îşaret dike:

Pêxemberê cem'ê cûz' û kûl bû,
Adem bi xwe hê jî av û gil bû.

Yanê dema ku Hz. Mûhemmed pêxemberê hemû kes û hemû cemaet û milletan bû, di wê demê da, Adem pêxember hêj di nav av û çamûrê da bû (hêj tune bû, hêj çênebi bû, av û ax bû).

"Ku di qena'eta min da ev bîr û bawerî ya *heqîqeta Mûhemmedî,* îfrat û fantazîyekî tesewwufî ye, tu peywendîyên wî, bi bawerîya Dinê Îslamî va nîne, ji fikra teslîsa *Hindûîzmê* û *Xiristîyanîyê* da, şiqitîye nav tesewwufa Îslamî; Her çiqas ku mûtesewwûfên wekî *Îbnû Erebî* û *Xanî*, ewî di qalibekî felsefîda ro dikin, bi rewşekî tewhîdî pêşkêş dikin jî. Lê di bawerîya min da: Dîsan jî bi tewhîda Îslamê ra nameşe. Ji ber ku di bawerîya Xiristîyanan da jî, di cîhê *Heqîqeta Mûhemmedî* da, Heqîqeta mesîhî (Îsewî) mewzû û behs e -Li ser teqdîra ku sehîh û sabit be - mena vî hedîsê jî: («كنتُ نبياً وآدمُ بين الماء والطين» = Dema ku ez pêxamber bûm hêj Adem di nav av û axê da bû.) Eve : "ku pêxemberîtî ya min, ji ezel da bi teqdîra **Xweda** hatîye teqdîrkirin, hêj ku Adem tûnebû, Ez pêxember bûm (yanê pêxemberîtî tiştekî wehbîye (ji **Xweda** da ye, tiştekî bexşîye), ne bi destên mîrove, ne bi te'lîm û teh'sîlê ye. Çawan ku mûnkirên Nûbûwwetê jî wilo îddî'a dikin û dibêjin: Mûhemmed, ji yên wekî *Behîra* yê Rahîb, ders û te'lîm girtîye, hîn bûye û de'wa pêxemberîtîyê kirîye. Ku ew hedîs bivî menayê, dibe redd û bersîva wî îddîaya mûnkîran."

Ji xwe, *Heqîqeta Mûhemmedî* bi tû awayî jî, ji wî hedîsê dernayê, - bi tayîbetî, ew teferrûat û şax û xax û perên ku jê berdidin- bi tû awayî bi mentiqa tewhîda Îslamî ra jî li hev nayê. îfrat û fantazîyên tesewwûfî ne, bîr û bawerîyên şexsî ne, medh û senayên dilxazî ne. Peywendîyên wan bi felsefa wehdetûl wûcûdê va jî, nîne.

Xanî, derbareyê ku her tişt, hemû alem, tecellîya wûcûda mûtleqa Îlahî ne, nav û nîşanên Wî ne, di heqîqet da yek in, yek tiştek bi tenê heye, hejmar û çenditî û pirrbûyînî (te'dad û te'eddûd) jî, nisbî û î'îtibarî ne, ji Melayê Cizirî û Îbnil Faridê, ji para namîne û wiha dibêje :

Rûhê min û sirra di rûxê yarê bi hev ra,
Roja ezelî bûne bidil hemdem û hemraz.
Xanî Te xelet zanî ku ew her ji xwe yek bûn,
Xellaqê, te'eddûd bi mezahir kire î'caz.

Yanê: rûhê min û sirr û razên ku di rûyê yarê da ne (di heqîqeta zatê Îlahî da ne). Ji roja ezelda bi dil û can bûne heval û hemraz û sirdarên hev; Ey Xanî! Te xelet û şaş zanîye, ku tu dibêjî: "Di ezelda ruhê min û sirra di rûyê yarêda bûne hemdem û hemrazên hev". Ji ber ku ew ji xwe, her yek bûn, yek tiştekîn, ne ku du tiştin, heta ku bibin heval û sirdarên hev jî. Xaliq ê ezel (çikroxê herheyî), teedduda bi mezahiran (çendîtî û pirrxuyabûyîna bi angori xûyangehan), î'caz kirîye, wek mu'cîze û xarîqe çêkirîye; Yek tiştekî di pirr neynikanda nîşan daye ku mirov dibêje qeyê? pirr tişt heye, digel kû di heqîqet da, yek tiştekî bi tenê heye. ji wî pêda, ji xeyrê wî, tu tişt tuneye. Ku medarê heyret û î'cazê jî, ev noqteye.

Heyret û 'ecze ! Serencamê di babê nezerê
Key be Xaliq nezerê qasirê mexlûqê resed

Yanê, di dawîya dawî da, mirov di nêrîn û tefekkûra vê meselê da, mûheyyer û 'aciz dimîne. Dê bi çi awayî fikra kurta mexlûqan, bighîje Xaliqê (dê mexlûq bi wî fikra xweya qasir, çawan mahîyeta wê Xaliqê bê payan, bizane), ev bi tu awayê ne mumkine.

Ku, **Îbn u-lFarid** ê evî heqîqetê vekirîtir îfade kirîye û wiha gotîye:

(ومازلتُ إيّاها وإيّاي لم تزلْ ولافرق بل ذاتي لذاتي أحبّتِ)

Yanê: Ez her ew bû me, ew jî her ez im, tu ferq, tu ji hevcudayîtî di navbera me da tune. Belkî zatê min ji zatê min hezkirî ye (ji ber kû em yek tiştekin, yek heqîqetekin).

Melayê Cizîrî jî wiha dinitîrîne û dibêje :

Husn û mehebbet zatek in
Me'şûq û aşik latekin,
Lê sûret û miratekin
Her yek di me'nayê xwe da
Ger dîlber û wer aşiqin
Arif di vîda sadiqin
Ayîne yê nûr a heqin
Cîh-cîh di wan da şû'le da

Aşiq ewe, dîlber ewe
Zahir ewe, mezher ewe
Rûh û beden, gewher ewe
Di her şahidek dûrdane da

Yanê: rindayî û evîndarî tiştek in, aşiq û me'şûq jî yek tiştek in, yek perestek in, heryek bi angorî me'na xwe, sûretê yek neynikek in, kesên zana di vî gotina xwe da, rastgo ne ku dibêjin:

"Ew neynika nûra heqq in, wî nûra heqq di wan da, cîh-cîh, şu'le daye", 'Aşiq jî ew e, dîlber jî ew e, zahir jî ew e, xûyangeh jî ew e, rûh û beden jî ew e, gewherê di her mehbûbên wekî libikên durran da jî ew e, ew her tişte. Wesselam...!

Xanî 'îşqê jî wiha teswîr dike û dibê je:

Zahirkirina cemalê îşqe
Sabitkirina kemalê îşqe
Îşq, ayîneyê Xweda nûmaye
Xurşîdê sifet Xwedan zîyaye

Yanê îşq, hem sebebê diyarkirina rindîtî û bedewîtîyê ye, hem jî îsbatkirina kamilbûyînê (mûkemmelîtîyê) jî, bi 'îşqê ye. Îşq neynika **Xweda** xuyaî ye, mînanî roja xwedan ronahî ye.(Eynika Zatê bê misale, roja Xwedan pertew û cemale).

Xanî di serê dîwana xwe da jî, 'îşqê wiha dinerxîne:

Neqqaşê ezel roja ser lewheyê rengîn da,
Pergarê didestan bû ser sefhe ku tezyîn da.

Tezhîbê zerefşan kir, ser lewhê kitêba îşq,
Resma ezelî kêşa, neqşê xwe newalîn da.
Dîbace ku înşa kir, fihriste ku îmla kir,
Cildek ji 'enasir best, nefxek di sûfalîn da.

Yanê: dema ku nîgarendeyê ezel (**Xwedayê** her heyî) sernivîsa xwe ya rengîn, da (mexlûqê Xwe yê ewwel çêkir), -ku di îstilaha ehlê tesewwufê da, ji wî mexlûqê seretayî ra, *'eqlê ewwil* û *rûh* û *qelem* jî tê gotin.- Di wî dema ku qelem, -wekî pergala destê hostan- di destê qûdreta Wî da bû, ewî bi wî qelemê, rûpela serî (rûpela ewwil) neqişand û mûzeyyen kir.

Di 'eynî wî demî da, *Ewî neqaşê ezel* serlewha (pêşeka) kitêba îşq û evînê jî, bi ava zêr nivîsî û resm û fotoxrafên mahîyyetên tiştan- ku sûretên wan di xezîna 'îlm û zatê Wî yê ezelî da veşartîne.- *Kêşa* (ji wî xezîna veşartî deranî), neqş û nemûşên xwe (neqşê alemê), nû da anîn û dîyarkir:

Ku berê, dîbaca (pêşeka) wî kitêba alemê, -madda seretaî (Heyûla)-, *înşa kir* (xûliqand) û di xilqet û siroşta wî da, di îsti'dad û qabilîyyeta wî da, fihrist û proja 'alemê bi cîh kir, nivîsî. (wek dendikê hêjîrê, kû proja dara hêjîrê, -bi hemî teferrûat û reh û çiqil û pej û belg û berên wê- têda derc bûye û hatîye nivîsandin), di pey ra, cildek (beşek) ji enasiran (ji maddeyên bingehî=av û ax û agir û hewa), *best* (girêda), bedena însanî ya maddî, parçeyê wî yê *Naşûtî*, ji wan 'enasiran amade kir; *nefxek* (pufek), ji rûhê xwe yê *Lahûtî*, da wî sûfalînê (da wî çamûra hişkbûyî = bedena însanîya maddî) ku ew sûfalîn, bû Adem û Însanê ewwel.

Yanê xûlase: Dema ku ji teccellîya **Xweda** ya seretayî (tecellîya zatê Wî ji zatê Wî ra), mexlûqê Wî yê ewwel (ku 'eqlê ewwele), çê bû. Di wê demê da Xwedê, serlewhe û pêşeka kitêba îşqê jî, bi ava zêr nivîsî. Yanê: îşq jî di wî demê da bû (ji ber ku tecellîya

---

Neqqaş: Neqişker, nîgarende/ **Neqqaşê ezel: Xweda** yê ku di ezelda, di "îlmê xweyê ezelîda, sûretên cûrên alêmê neqişandîye./ **Serlewhe:** Nivîsara seretayî (başlık)./ **Rengîn:** Reng reng, xweşik, letîf./ **Pergar:** pergal, alêtê neqişandinê./ **Sersefhe:** Ser rûpelê kaxiz, nivîsara seretayîya ser kaxiz, nivîsa seretayî./ **Tezyîn:** Xemilandin, muzeyyenkirin./ **Tezhîb:** Zêravkirin (altın yaldızlı işleme)./ **Kîtaba 'îşqê:** Kitêba evînê./ **Resma ezelî:** Sûretê mahîyyetên tiştan, ku di "îlmê ezelîda ne./ **Newalîn (c.newal):** Baxşîş, dayîn, dayîna bi comerdî./ **Nû anîn:** Nû îcadkirin, nû peydakirin./ **Nefxek:** Pufek, yek pufkirinek./ **Sefalîn, sûfalîn:** Çamûra hişk bûyî, ku mebestê *Adem* û zarên wî ne.

seretayî ya zatê **Xweda** ji zatê **Xweda** ra, îbaretê ji gihîştina 'îlm û zanîna zatê Wî yê pîroz ji zatê Wî ra ye û îşq û evîndarîya zatê Wî ji hûsn û cemala zatê Wî ra ye). Ji wîye jî ku pirrên ji mûtesewwûf û mûtefekkiran dibêjin:

"'Îşq menşe'û sebebê xilqetê ye".

Têbînî:

Meqsed, ji *serlewheya rengîn* (serlewheya alema rengîn), ewwilê tecellîya Îlahî ye, ku tecellîya zatê wî ji zatê wîra ye. Yanê: me'lûmîyyet û mehbûbîyyeta zatê wî ji zatê wîra ye.

Meqsed ji ser *sefheyê* jî, mexlûqê wîyê ewwile ('eqlê ewwel, rûhê kull,...) ku ji wî tecellîya ewwel (seretayî) peyda bûye. *Alem* jî : tecellîya duwemîn e, ji 'eqlê ewwilda xuya bûye.

Bi te'bîrekî din: *'eqlê ewwel*, ji nûra cemala zatê Îlahî çê bûye, jêra bûye wek neynik, ji wî neynikê da jî, tecellîya **Xweda** ya duwemîn (alem) dîyar bûye. Ku yanê: Alem, sûretê Heqq e. Heqq jî, huwwîyet û rûhê alemêye, wucûda mûtleqqa ezelî û ebedî û sermedîye. Ku di sûretên mûmkînatan da xûyayîye. Xûyabûyînên (tecellîyatên) wî wucûda wahid bi sûretên mûmkînatan jî, ehkam û rewşên navê wîyê *"Ez-Zahir"*e, ku ev navê wîyê "Zahir" jî, mecla û neynika navê Wî yê *"El-Batin"*e. *"Nûr"* jî, navê tecellîya wî wucûda pîroz bi navê wî yê "Zahir"e, yanê: ew wucûda heqqa ku di hemî sûretên kaînatê da dîyare, navdêrê bi navê *"Nûr"*e, bi î'tibar ku tecellî û zuhûre.

- Durre -

— PIRSEGIRÊKA GIRIFT —

Di felsefa wehdetîlwûcûdê da problem û pirsegirêka herî girift, mesela sewab û îqabê, xêr û gûnehan, kufr û îmanê (bawerî û nebawerîyê) û Cennet û Cehennemê ye. Ji ber ku madem her tişt bi Wî ye, ji Wî ye. Ka ferq di navbera bawerker û nebawerkeran da, di navbera bawerî û nebawarîye da, xêr û gûnehan da çî ye? Çira hinek dozexîne, hinek jî bihiştî ne ?

Ku '**Ebdûlkerîmê Ceylî** (...1428 m.) di navbera wan da, tu ferq û cudaîyekî nabîne û gotîye:

العاصي والمطيع أمام الحق سواء فكما أن المطيع مظهر لاسمه الهادي كذلك العاصي مظهر لاسمه المضل «فإنّ الله يضل من يشاء ويهدي من يشاء» (سورة الفاطر/٨).(*)

Yanê: Îsyankar û îtaetkar li himber Heqq (li bal **Xweda**) wekhev in. Çawan ku kesên mûtî' û bêguneh, mezherê navê Wî yê "*Hadî*" ne, wisan jî, kesên gunehkar û '*asî* jî, mezherê navê Wî yê "*Mûdîll*"in. (**)

Xanî jî, bi terz û ûslûbekî mûdellel û mûeddeb nêzîkê bal meselê va dibe û wiha dibêje:

(*) *Ettesewwûf El îslamî, berhema Zeki Mûbarek, cildê yekemîn, beşa behsa Mûhyîddînê 'Erebî.*

(**) **Hadî**: Hidayetker, rê nîşander./ **Mûdîll**: Gûmrahker.

Herçî Te ji bo me kir îrade
Yek zerre me lê nekir zîyade.

Haşa ji kemal û re'feta Te !
Dûre ji celal û rehmeta Te.

Kufr û gûnehan bikî bihane,
Laîq nebîtin ewe şehane.

Yek rûne linik Te kufr û îman,
Yek sûne linik Te xûld û nîran.

Qehra xwe eger bikî Tu zahir,
Cennet li me dê bibîte agir.

Ger kafir û ger gûnahîkarin,
Bî-l cûmle ji Te ûmîdîwarin.

Kes nîne ji kafir û ûssatan,
Mezher nebîtin ji boy sifatan

Kafir bûyîn em bi îsmê Qehhar,
Xeffare, ku em kirin gûnehkar.

Yanê, Ey **Xweda**! Te ji boy me çi îrade kirîye û vaye, me bi qasî zerrekî, tiştekî li wî kêm û zêde nekirîye û nikarin bikin jî. Haşa ji kemal û şefqeta Te! Ji xweşevîstî û rehmeta Te, sezawar û laîqê vî zatê Te yê şahane jî nîne!, Ku tu kufr û înkarî û gunehkarîyê, bixî bihane û wesîle ji 'ezab û îqabê ra; ji ber ku bawerî û nebawerî, bihişt û dozax, sewab û îqab li nik Te wekî hevin, ferq di navbera wan da tune. Hemî ji tecellîyatên Te ne. Kafir û

Zîyade	: Zêde	**Qehr**	: Dijberî, rik, nehezkirin, zorberî
Re'fet	: Şefqet, dilovanî		
Celal	: Ezemet, mezinayî	**Dê bi bîte**	: Bê guman wê bibe
Kufur	: Kafirî, nebawerî, înkar	**Bî-l cumle**	: Bi tevayî, hemî
Behane	: Bihane, sebeb, ho, wesîle	**Umîdwar**	: Hêvîdar, bi umîd
Ewe	: Ewa	**Ûssat** (c. asî)	: Berbir, îsyankar
Şehane, şahane	: Padîşahîtî, wek ku tu padîşahî	**Mezher**	: Xuyange, dîyargeh
		Sifat (c. sifet)	: Rengdêr, nav û nîşan
Yekrûne	: Wek hevin, yeksûne	**Qehhar**	: Ewê ku qehra wî pirr zêde û zore
Xûld	: Jîyana bihiştê ya ebedî,		
Bihişt	: Cennet	**Xeffar**	: Eirr bexşende, gunah bexş
Nîran (c. nar)	: Agir, dozex		

gunehkar jî, ji rehmeta Te bê ûmîd nînin. Ew jî bi ûmîd û hêvîdarin. Lewra ew jî, mezherên sifatên Te ne; Kafir bi tecellîya navê Te yê *Qehhar* bûne kafir, navê Te yê *Xeffar* jî, dixwaze gunehkar hebin, Ku Tu wan bixefirînî, bibexşînî.

Ku **Melayê Cizirî** (1574- 1640m.) jî, -di pirr cihên dîwane xwe da, bi taybetî di qesîdeya xweya meşhûrê bi destpêka ***"Ellah Sehergaha Ezel"*** da, -ku derbareyê felsefa wehdetûlwûcûdê da, bi şarezatî û pisporîtîyekî feylesofane û şa'îraneye herî bilind û hêja hûnaye-, 'îşq û cemalê, bi ezelîtîyê (bi herheyîtîyê) dinerxîne, şemaldayîna mûm û cemala îşqê jî, bi tecellîya Zatê Wî yê herheyî li zatê Wî, (tecellîya Zatê **Xweda** ji Zatê **Xweda** ra) îfade dike û wiha dibêje:

Ellah Sehergeha Ezel, Yelmûmê 'îşqê şû'le da.
Nûra cemala Lemyezel, zatê tecellaya xwe da.

Zatê tecella bû li Zat, bê îsm û asar û sîfat,
Sirra Hûrûfên Alîyat, xef bû di sitr û perde da.(*)

Yanê ey **Xweda**! Di dema şefeqa ezel da Yelmûma (meş'ela) îşqê şu'le û şemal da, we yan jî, "Xwedê di ezel da meş'ela îşqê şu'le da û hilkir". (Çoleçira 'îşqê vêxist): Nûra Cemala herheyî li Zatê pîroz tecellîya xwe da (Nûra rindayî û spehîtiya Zatê Wî yê herheyî li Zatê Wî yê pîroz ronahî da, Zatê Wî bû me'lûmê Zatê Wî). Bi te'bîrekî din: Ew Zatê Ehed, li Wî Zatê Ehedê Mûtleq , bê nav û nîşan diyar bû ku hêj sirr û razên tîpên bilind, (sûretên mahîyetên tiştan yên di 'îlmê **Xweda** da) jî, di binê perda xeybê da, di "'îlm û Zatê **Xweda** yê ezelî da veşartî bû, dîyar nebibû" **Mela**, wiha dewam dike û dibêje: Ew zatê pîroz (ew meş'ele û darçira 'îşqê), wucûd û hebûna Mûtleq bû, hêj derya comerdî û sexaweta Wî, coş nebibû pêl û lem neda bû, hêj yek ji nav û nîşan û mûnasebet û rewşên Wî, dîyar nebibûn (Ew wûcûda pîroza mûtleq bi tenê hebû), ku hûsn û cemala wî zatê pîroz, hezkirin û evîndarîyê xwest û nûra Wî ya qedîm bû 'îşq û evîn, di yek Zatekî da (di Zatê Wî yê pîroz da) li hev kom bûn û civîyan, yekî li yekî (li hevdû) nazî û delalî dan (li hev nazî û delî kirin).

(*) Di îstîlaha ehlê tesewwufê da: **hûrûfên alîyat**, *navên wan sûret û projeyên mahîyyetên mewcûdatane, ku di îlmê Xuday ê ezelîdane(wek dara ku sûret û piroja wî, di dendikê wî da veşartîye).*

Zatê Mûqeddes bû wûcûd, coşiş neda bû Behrê Cûd,
Wesf û îzafat û qûyûd, yek jê tecellayê neda.

Hûsn û cemalê xwest evîn, vêk ra di yek zatî civîn,
Nûra qedîm bû işq û vîn, wan lêkî naz û îşwe da.

Mela pêda diçe û dibêje ku Xwedê wî îşqa ji nûra cemala bê zewal û wî husn û cemala bê mîsal, gîhandhev û kir meş'ele û şemal, xwe jî kir perwane û perperoka wî meş'ele û şemalê:

'Îşqa ji nûra layezal, hûsn û cemala bêmîsal,
Eysandî Yelmûm û şemal, dîsa xwe lê perwane da.

We *Mela* wiha xulase dike û dibê je: Aşiq jî Ew e, maşûq ji Ew e, zahir jî Ew e, mezher jî Ew e, rûh û beden û gewherê di her mehbûbên wekî libên durran da jî Ew e. Ew ew derya ye ku herdû 'alem kef û pêl û lem û beqlok û şapol û cemed û seholê Wî ne, ku daîma jê cezr û medd tên,(jê paşve kişîn û pêjva dirêjbûyîn tên), li sehra yê jî, (li çol û deştê jî) seywana Wî vedaye. (Seh'ra jî sî û seywana Wî ye) :

Aşiq Ew e, dîlber Ew e, Zahir Ew e, mezher Ew e,
Rûh û beden, gewher Ew e, di her şahidek dûrdane da.

Behra dû 'alem lê zebed, mewc û hûbabin, hin cemed,
Peyweste têtin, cezr û med, seywan li sehrayê veda.

Mela, hûsn û mehebbetê, rindayî û hezkirinê jî, her hebûyî dinerxîne û dibêje, ku Heqq (**Xweda**), di ezel da aşiqê zatê Xwe bûye. Îhtîyacîya Wî, bi rindayî û bedewîtîya tiştekî din tunebûye.

Hûsn û mehebbet her hebû, Heqq aşiqê zatê xwe bû,
Mûhtacê hûsnek dî nebû, neql û rîwayet pê we da.

Ku bi vî awayî jî, fikra Mela û felsefa mîsalîya Eflaton (Platoîzm)(*) dimînin hev (dişebihin hev), derheq îşqê da, ku ji xwe dema bi lêgerîn û lêkolînekî bingehî, merif nêzîkê bal meselê va dibe, bi hêsayî dibîne ku Feylesof û zanyarên Îslamê, yên wekî *Ebû Yûsûfê Kîndî* (796-873 m), *Îbnî Sîna* (980-1037m) û *Îbnû Rûşd* (1126-1198m);

(*) Platonîzm : Felsefa Eflaton (427–347 b.m.), felsefekî rûhanîyê mûtleq û mîsalî ye. Ku Eflaton navê wî danîye, "Nezerîya mîsalan" (nezerîya Numûneyan), misal jî li nik Eflaton, mahîyyet û heqîqeta bê madde ye, Qaîmê bi zatê xwe ye (quwwet û rûhê mûcerrede). Xûlasa wê felsefeyê eve: ku madde, mezher û tezahura wan heqîqetên

Mûtesewwûf û mûtefekkirên wekî *Îbnû-Erebî* (...1240 m) û *Îbnûl Farid* (1181-1235 m) û *Melayê Cizirî* (1570/74-1640 m) gelek fikr û bawerîyên xwe yên felsefî, ji felsefa Antîk a Yûnanî, ji *Neoplatonîzm* a medresa *Îskenderîyyeyê* girtine û ji hev îstifade kirine, felsefa Yûnanî jî, ji felsefa dînê *Zerdeşt* û felsefe û dinên Sensikrîtî yên Mezpotamya û Hindistan ê, îstifade kirîye û pêş va çûye; ku bi kurtî: Hemî felsefe û bîr û bawerîyan, ji hevdû îlham girtine û pêşva çûne.

Tesewwûf û wehdet û-lwûcûda Îslamî jî, ji vî qaîde û rewişta siroştî derneketine û dûr nemane, ji felsefa Yûnanî ya, heta Hîndûîzma, Hindistanîya, ji gelek delav û çem û kanîya av vexwarine, ji gelek kanan gewher deranîne, ji gelek mekanan jî, gul û guppik û Stirî û dirrik tev hev anîne.

Ku *Xanî* jî, xwe berdide nav wî gûlistana rengîn û wî cewheristana zengîn, bi şarezatî û pisporî gewher û polikan ji hev diqetîne, gûl û guppikan ji stirî û dirrikan dûr dixîne û bi kûlîlkên fikrû bawerîyên xwe yên geş û taze ra, rengîn û xweşbîn digerîne, derpêş û pêşkêş tîne. Ku van durr û gewheran wiha dirêje û dibêje:

Ey Wahidê Pînhan, ku ji zatê Tene peyda,
Ev kewn û mekan, erd û sema, kûmbedê xedra.

Rûhê min û sirra di rûxê yarê bi hevra,
Roja ezelî bûne bi dil, hem dem û hem raz.

* * *

Xanî te xelet zanî ku ew her ji xwe yek bûn
Xellaqê teeddûd bi mezahir kirî î'caz

Bê hûsna Te, nîne wan wûcûdek,
Bê nûra Te, nîne wan nûmûdek.

Ayînê Te çêkirin mûkerrer,
Hûsna xwe di wan Te kirmûsewwer,

---

mîsalîne, ji wî bêtir madde tu tiştek nîne (yanê: ew mîsal û numûne heqîqetin, ji xeyrê wan tu tişt ne heqîqetin). Li nik Eflaton, cemal (xweşiktî û rindayî) jî, mîsalekî mûtleqê ezelî û ebedî ye. Ku rûhê însan, ewî ji jîyanekî berîya jiyana xwe ya serzemîn da yad dike, aşiqê wîye, ewî dixwaze, bi her awayî li wî digere. Ku hezkirina dûnyewî û 'îşqa maddî jî, tezahûra wî îşqa rûhîya ezelî û ebedî ji wî cemala ezelî ra ye.
Divê ku aşiq ji vî mehebbeta cesedî û maddî, bilindê bal wî mehebbeta rûhî va be; bal hezkirina wî cemala mîsalî ya ku ji pîrozî û qencîyê ye (ji mebdeê qenc û pîroze) bibe.

Goya hemî cîsmekin tû canî
Goya hemî şehrekin tû Xanî

* * *

We di dawîda: Xanî, felsefa wehdetilwûcûdê bi temsîl û teswîrekî pirr di cihê xwe da, bi yek beytekî me'nîdar wiha xûlasa dike û dibêje:

'Alem ku wekî Xiyalî Zîll e,
Sanî' bi xwe Hadîy û Mûdîll e.

Ku hem wûcûd û hebûna 'alemê bi wî lîstoka meşhûrê bi navê "Xîyalî Zîll"ê dişehibîne, îşaret dike ku, ji 'alemê ra wucûd û hebûna heqîqî tune, belkî hemû alem, sîya wûcuda mûtleq a ezelî û ebedî û sermedîye, lem û pêlên wî derya bê payan û bê binî ye. Hem jî îşaretê bal mealê vê ayetê dike: «فإنّ الله يضلّ من يشاء ويهدي من يشاء» Yanê: bê gûman Xwedê kî bixwaze tûne hidayetê, Rêya rast nîşanê wî dide, kî jî bixwaze, dibe delaletê, gûmrah dike (Fatir-8).

Ku bi wî terzî jî, hem fikra mûtefekkirên wek *Ebdûlkerîmê Ceylî*, ji pişkaftina mûemmayê ra îma dike. Hem -*"ser dide, sirr nade"*,- mehremîyetê jî, rencîde nake, xwe li bal naehl û nezanan navno û navşor nake, bi qelemşorîtî û pisporîtî û hunermenditîyekî herî bilind û şareza, di binê koşeyên perdê ra, rûyê heqîqetê jî, nîşanê mehrem û baqil û zanayan dide ku *"Yê dizane dizane, yê nizane baqê nîskane."*(**)

Lê bi angorî wî fikra Ebdulkerîmê Ceylî ku dibêje:

العاصي والمطيع أمام الحق سواء *"Kesên gûnehkar û bêgûneh, li pêşber Xweda wekhev in"* - ku temayûla Xanî jî, bi alîyê wî fikrê da dixûyê- ev sûal tê ber hişê merif: Ku madem "kesên gûnehkar û bêgûneh li nik Xwedê wekî hevin", fayde û me'na ferman û qedexeyên dînî çî ye? Ku di felsefa Wehdetulwucûdê da pirsegirêka herî muşkul û girift jî ew e. Lê ku merif kûr û dûr bi fekire û mulahaze bike, vê rastî yê dibîne: ku hemî qanûnên teşrî'î, ji boy rîayet û mûhafezekirina nîzama qanûnên tekwînî ne

(**) *Dibêjin ku mirovekî jina xwe bi yarê wê ra di nav zevîya nîskan da, di rewşekî xirab da dibîne, Jinik baqekî nîskan diçine dide destê xwe û hewar dike, ber bi gûnd dibeze, gûndî, tên pêşîyê, dibêjin:* Çi bûye, xêre? Jinik, dibêje : "Mêrê min, ji boy vê baqa nîskan bi pey min ketîye, ku min bukuje". Mêrê jinikê, li ser wê gotinê, ji şerm û 'ara xwe nikare heqîqetê bibêje, serê xwe dihejîne û dibêje: "Yê dizane dizane, yê nizane baqê nîskane".

(ku bizimanê 'îlmê mûsbet, jê ra *"qanûnên tebî'î"*, bi zimanê Qur'anê jî, *"Sûnnetûllah"*tê gotin). Di mûhafezekirina wî nîzama tebî'î û sîroştî da jî, seadeta (xweş jîyanî û bextîyarîya) beşerî heye. Ku, mûqtezayê rehmet û şefqet û lutfa **Xweda** ji însanan ra jî ewe û di wî da ye.

Mûeyyîdeyên ferman û qedexeyan (ceza û mûkafatan) jî wesîle û sebebên dîqqet û îtînakirina bi teheqqûqa (pêkanîna) hûkmê wan e. Însan jî, bi cîhetê tebîetê xwe yê *Nasûtî* û maddî, mûhtacê wane. Lê bi cîhetê xwe yê *lahûtî* û rûhanî, ne mûhtacê bal wan emr û nehyan va ye, ne jî mûhtacê bal mûeyyîdeyên wan va ye. Ku lewra jî di alema axretê da teklîf û mûeyyîde jî tunene, sebeb û mûsebbeb jî radibin; mûsebbibê hemû sebeban "**Xweda**", bê zincîla esbab û mûsebbebatan, bi rehmet û şefqet û ezemet û celal û kemala Xwe ya bê payan û bê hedd û hesab, tecellî dike; Mû'amele û mûhaseba bi mexlûqên xwe ra jî wilo dike. Ku Ebdulkerîmê Ceylî jî bi angorê wî rewş û taybetîyê, wî fikr û gotina xwe ya borî, awaz û texennî kirîye. Xanî jî ewî wiha nîyaz û temennî kirîye û gotîye:

Haşa ji kemal û re'feta Te,
Dûre ji celal û rehmeta Te.

Kûfr û gûnehan bikî bihane
Laîq nebitin eve şehane.

"Ku ji xwe, ji mexfîret û rehmet û şefqetê bêtir jî, tû tişt laîq û sezawarê wî padişahê mûtleq nîne. Yanê bi kurtî: Însan -çi dibe bila bibe-, bi cîhetê xwe yê maddî û cismanî, me'mûr û mûkellefe, bi cîhetê xweyê me'newî û rûhanî jî, mûşerref e, laîqê wîsal û gîhiştina bal wî wûcûda mûtleq û bê payane ku di wî meqam û meclisa *lahûtîya* pîrozda, di wê meclîsa rastîyê da li nik wî Melîk ê mûktedir, (li nik padîşahê tewana) (Qemer-55), ebedî bijî û bextiyar bibe, bi wî wucûda pîroz ra, her heyî û baqî bimîne."

Netîce:

1- helal û heram, sewab û îqab, xêr û şer, qencî û xirabî, tiştên îtibarî û îzafîne (nisbî û angoreîne), bi nisbet zeman û mekanan, bi angorî bîr û bawerîyên însanan, yên zana û nezanan tên

guhestin (wek xwarina goştê heywanan, bi nisbet bal Bûdîst û Xiristîyan û Musulmanan, hem jî wek gûl û stirîyan bi nisbet bal ker û bulbulan...)

2- heqîqetên 'alema lahûtî, tiştên 'alema ûxrewî û rûhanî, bi tu awayî, li yên 'alema maddî û cismanî, nayên qiyaskirin, bi pîvanên wan, nayên pîvandin, belkî, bî hinek mînak û mîsalan tên teswîrkirin û temsilkirin. Wek temsîl û teswîra bihiştê, bi bax û baxçe û av û delavan, ya dozexê jî, bi agir û şewat û pêt û alavan.

3- Dîtin û fêmkirin û bîr û bawerîya ekserê 'amî û dîndaran, yên mûtefekkîr û zanîyaran ne wek hevin, ji hev cûdane.

4- Bilindaya me'newî, bi qîyas û mêzîn û pîvanên maddî, nayên qîyaskirin û pîvan.

Mûtefekkir û zana, bi çavên 'eql û mejîyên xwe, tiştên me'newî dibînin û dipîvin, 'eql û hişên exlebê 'amîyan jî, di çavên wandaye, bê temsîl û minakên maddî, nikarin derka heqîqetên mucerred û me'newî bikin.

5- Çawan ku bilindaya me'newî, ji bilindaya maddî bi rûmettir û mezintir û bilindtir û pîroztire, wilo jî, têgehîştin û îdraka wî jî, zortir û zehmettire, herkes nagîjê, nikare bê mînak û mîsal îdraka wan bike, bighîje wî merteba alî (wek mî'raca Pêxember, ku îdrak û şûhûdekî wehdetîl-wucûdîyê herî bilind û alî ye, ji 'eql û besîreta Mûhemmed (as) ra, di yek anek da hemû esrarên kewnê, temessul kirîye, jêra xûya bûye, ku sirrê Î'cazê jî diwirda veşartî ye).(*)

Hem jî wek bilindêrana **Xweda** ji Îsa pêxember ra (ey Îsa, ezê Te bimirînim û bilindê bal Xwe bikim (Alî Ûmran-55). Yanê: Tu endîşe meke, Ezê te ji şerr û qomployên dijminan mûhafeze bikim, bi mirinekî normal te wefat bikim û bilindê bal Xwe va bikim. Ku meqsed ji wî bilindêranê jî, bilindêranîya me'newîye, bilindkirina derece û merteba wîye, ne ku bilindkirin û hilvekişandina bi jor va, bi alî asîmanan va ye, çawan ku ekserê mûfessiran jî, wilo fêmkirine û gotine: ku Xwedê , Îsa pêxember rakirîye asîmanan bal Xwe, Îsa pêxember hêjî saxe, dijî, dê di axirîya zemanêda ji nûve nazilê erdê bi be... ku ev fikr û bawerîyen, gelek çewt û şaşin. Ji ber ku Xwedê ji cîh û mekanan mûnezzeh û berîye, -asîman jî daxil- hertişt, hemû kaînat tecellîya wucûda wîya mûtleqqa sermedîye, text û 'erşê seltenet û hukumranîya wîye, li her derî, di her demê da hazir û nazire, batin û zahir e, li asîmanan jî na êwire, hetta ku Îsa jî li asîmanan, li bal Wî bisêwire.

** Ji kerema xwe li îşarettul i'caza Bedîûzzeman R. 30.31.32.70.71.106.107 û li berhema Mûhemmed Hûseyn Heykel "Hayat û Mûhemmed" R.165.çapa 19 da mêze bikin.*

6- Di 'alemê da tû tişt bê me'ne û bê feyde nîne, sirr û hîkmetên her tiştî hene.

7- Armanca hemû qanûnên teşrî'î , tekamûl û bextîyarî ya însane, ne ceza û 'îqabên wane.

Ku -di bin ronahîya van xalan da-, mirof qenc bifikire û mêze bike, dibîne ku di felsefa wehdetul wucûdê da, hem pirr pirsegirêk û mû'emma hene, hem jî pirr pirsegirêk û mûemma bi wî têne fêmkirin û pişkaftin. Wek pirsegirêka ku **Xweda**, hem bê mekan û bê zeman e, hem jî li her der û mekanî, li her dem û anî hazir û nazir e. Ku bi angorî felsefa wehdetilwucûdê : Zeman û mekan, valatî û tijîtî jî daxil, her tişt sî û tecellîya wûcûd û hebûna mûtleqa ezelî û ebedî (hebûn û wucûda Heqq, wucûda **Xweda**) ye, ji bil wî tû tişt jî nîye; zeman û mekan, valatî û tijîtî jî daxil hemû masûwayên wî (ji xeyrî Xwedê hertişt) di heddê zatê **xweda** tûnene, belkî, bi hebûna Wî (bi wûcûda Wî) hene, ku bi vî awayê jî ne mûmkîne, ew bikeve tu zeman û tu mekanî. Lewra bi nisbet **Xweda,** mekan û zeman tunene, hetta ku Ew bi keve wan, mekan û zeman jî -wek hemû tişt û hemû hebûnan-, sîya tecellîya wîne, Ku bi vî î'tibarî jî Ew li her cîh û mekanî, li her dem û zemanî jî hazir û nazire.

Ku ev jî delîlekî 'eqlî û mentiqîyê herî bi quwwet û hêjaye, ji boy hêjatî û giranbahatîya felsefa wehdetîl wucûdê ra.

Xwedê me ji feyz û bereketa mûtefekkirên wî felsefe û hîkmeta giranbaiha û hêja, -wekî bê hiş û gêja- mehrûm û bê par neke!(**)

Amîn! welhemdûlillahî Rebbil âlemîn (والحمد لله ربّ العالمين)

Wehdetê mûtleq Mela, Nûre di qelban cela,
Zore di vê meselê Ehlê dilan şubhe ma.

- Melayê Cizîrî -

(**) *Çi tiştekî pirr xerîb û hezîn e, ku alimekî wek Îbn û Teymîyye yê, mûtesewwûf û mûtefekkirekî wek Îbnî 'Erebî yê, Îbni-l Hecerê Heytemî jî, Îbn ûl Teymîye yê, bi gotin û galegalên pirr giran îttiham kirine ku bi rastî, ew jî pirsegirêk û mûemmakî din e.Mirof dikare bibejê ku belkî Îbn ûl Hecer, negihiştîye dereca îlm û îrfana Îbn û Teymîye yê, fikra mezhebê wî yê tewhîdê hezim nekirîye. Lê bi rastî, ez nizanim ku 'alim û fazil û kamilekî wek Îbnî 'Erebî yê û van galegal û îttihamên giran derheq wîda rewa dîtîye?. Heyret..., heyret!...*

Em evqas dikarin bibêjin ku Xweda teqsîratên me û wan bibexşîne, selam û rehmeta wî li ser me û kîyanên wan tevan be, rûhên wan bi se'adeta ebedî şa be...! Wesselam.

DÎWANA
EHMEDÊ XANÎ

بسم الله الرحمن الرحيم

Bi navê Xwedayê dilovan û dilovîn

NEQQAŞÊ EZEL

Neqqaşê ezel roja serlewheyê rengîn da
Pergalê di destan bû, ser sefhe ku tezyîn da

Tezhîbê zerefşan kir serlewhê kitaba îşq
Resma ezelî kêşa, neqşê xwe newalîn da
(nû anîn da)

Dîbace ku înşa kir, fihrîste ku îmla kir
Cildek ji 'enasir best, nefxek di sûfalîn da

Etfalê melek hatin, westane debistanê
"La îlme lena" gotin, "Ebced" bi xwe telqîn da

Wan sade ruxan meşqê îşqê ku temenna kir
Xettatê ji husnîl-xet sermeşqekî zêrrîn da

Ma secde tenê min bir ber sûretê mehbûban
Îblîsê nebir secde, lew maye di nefrîn da

Ez çûme derê dêrê min dîtî ku rûhullah
Tekrarî musewwer bû hetta di nîhalîn da

Wan cumle "Enel-heqq" got, min "Wahidê mûtleq" got
Saqî bi xwe ez girtim camek meyê noşîn da

Min noşî û serxwş bûm filhalî muşewweş bûm
Ez çar û neh û şeş bûm min tekye bi balîn da

(Îro ku me ber pê kir)
Herçî ku me ber pê kir, hindî me nezer lê kir
Min seyrek li yêkê kir, lew mame di lewlîn da
(lewra me dil û dîn da)

Min dî heme yek pertew sarî di mezahîr da
Mumkin heme jê pirr nûr, emma ne di temkîn da

Ew bû ku Zelîxayê îdînî di Yûsif da
Mecnûnê di Leylayê, Ferhadê di şirîn da

Mîsbahê ebed min dî îrohe di qendîlê
Genca ezelî merkûz min dî di gil û tîn da

Cana ji cemala Te ez dê çi bibim sabir
Şeyxan û Ûlu-l 'Ezman canê xwe di kalîn da

Me'zûr e eger sofî bit munkirê mehbûban
Kor dê çi tesewwûr ket sirra ku di dûrbîn da

Şahid bî tu ey zahid, mehbûbî perestim ez
Bê şahid û mey nabim, şêxê me ew ayîn da

Canî ji te ey Xanî! Cana ku bixwazîtin
Xa nuqte li bin danî, fîl-halî di hêlîn da

*****

EY WAHIDÊ PÎNHAN

Ey wahidê pînhan ku ji zatê Te ne peyda,
Ev kewn û mekan, erd û sema kûnbedê xedra.

Erwah û ûkûl, Enfûs û 'Eraz û Cewahîr
Halîn û mûsewwer, ne Mehell û ne Heyûla

Lewh û Qelem û Kursî û 'Erş, Encum û Eflak
Hem agir û hem ax û hewa,cumleyê eşya

Sed qafîle mewcûd û peyapey, mûtewatir
Her lehze ji Sehra yê 'edem tên bi temenna

Hin, neqdê fenayê diguhorin bi beqayê
Hin,neqdê wucûda xwe dikin bê bedel îfna

Her yek bi wucûda xwe wucûda Te dixwazin
Bil cumle xirîdarê cemala Te ne heqqa

Lew şuphet ê pîra bi hewes talibê Yûsif
Dor hatîye 'Xanî' kelefa rîsê di desta

Ew jî bi meta ê xwe qumaşê Te di xwazit
"Sûbhaneke! len tu'yîse mîn rewhîke 'eb'da"

*****

'ERŞÊ MÛELLA

Ey ayîne ê dil bi Cemala Te mûcella
Sed sefhe bi yek zerre ji nûra Te mûtella

Însan, Te ji bo alemê Kubra kire nusxe
Lew mûdxeyekî jê Tu dikî 'Erşê mûella

Wehdet bi heseb kisretê e'yanê mezahir
Her so bi sifatan diketin keşfê tecella

Lew mûxtelefîl-qewl û 'emel bûne xelaîq
Kafîr, ji senem bûne bi navê Te tesella

Sirra xwe nîhanî ku Te da Ehmedê Xanî
Ez xeyrê berî şud, be To awerdî tewella

*****

SERWA ME

Serwa me bi sed reng û hezar îşwe û meş hat
'Aşiq kirin Îhya, li reqîban ku nexweş hat

Sunbul kemilandin, Gul û lale xemilandin
Reyhan şetilandin, li gulan taze Binefş hat

Ten derve nebû qet, nedida bextê kuşadek
Rû da me şukur! Ke'be yê tali' me du şeş hat

Pêdane firengî û nîlo, hatine romî
Şukrane, nîhane ji Ereb hem ji Hebeş hat

Reştozê xwe Nûbar e. meger koşe dixwazin
Tîra koşeyî da te, hedef girt û bi keş hat

Yan hat û bi nava dilî ket, qet nediwesta
Lewra ku ji ber qewsê me dî zêde bi weş hat

Xanî! Bese bê arî, çi ra zêdeyê salan
Îsal e ji xwe tali' û bextê nebireş hat

*****

PERÎYA HORÎ SIRIŞT
(AFERÎN)

Îşweyek da me seher wê perîya horî sirişt
Şefeqê berq û cemalê dil û can suht û perişt
(berişt)

Me nizanî ku melek, yane beşer, yane çi bû
(ya perî bû)
Yedê beyda wekî Mûsa yê li qetlê vedimişt

Ke'betûllaha cemalê me dikir çîne tewaf
Xeyberî hatine min xal û xet û çember û qişt

Îlmê Esma me jiber kir di debistanê Sifat
Talibê Zatê me, lew min şemirand baxê Bihişt

Ademê kamil ezim, bûyî me mescûdê melek
Mûddeî ger nebitin secde bi min, ha serê xişt!

Xanîya dê hebitin bê huneran laf û guzaf
Aferîn ber te! Ku ev şîwe ji bo kes Te nehişt

*****

MÎRÊ MECLÎS

Mîrê meclis ne kenît, Mûtribê goya çi bi ket
Xunçe xendan nebitin,Bulbulê şeyda çi bi ket

Neynika husnê butan, lazime sahib nezerek
Kesê bîna ku nebit, dîlberê zîba çi biket

Bê kerem naçîte tîpa 'edûwan merdê şecî'
Tîxê ahen çîte bê destê tewana çi biket

Talibê îlm û kemalê nebitin qabilê feyz
Hîkmet û terbîyyeyê alimê dana çi biket

Qelbê "Xanî" sedefa gewherê îrfane welê
Metnîxwanek ku nebit, sahibê me'na çi biket

*****

TEXTÊ DÎLBERÎ

Îro li textê dîlberî, ya Rebb! Çi şîrîn esmer e ?
Jê nabitin min dil birrî, ew dîlber e, yan dilber e ?

Dil gorîya canane ew, hem dîn û hem îmane ew
Hem lutfû hem îhsane ew, hem law û hem gerden zere

Kakul ji ber tacê bi zerr, ta ta wekî perr têne der
Ser eskerê tîpa Teter, serdar e yane serwer e

Ya Rebb! 'Hebîna reng feleq, horî teteq dagirt şefeq
Ya belg û netrik, ya wereq, ya qişt e,yaha çenbere

Ew turre, ya keyso ne ew, Zencî ne, ya Hîndû ne ew
Şutrî ne, ya şeb'bo ne ew, ya toxê şahê Sencer e

Ebrû ne yan cotek hîlal, Hindû ne yan nîşan û xal
Keysû ne yan Hezret Bîlal, meşxûlê Ellah ekber e

Çav in gello ? Ya serxweş in, ya kafir in ya dilreş in
Bêmar in ew ya nexweş in, yan nêrgiz e, cadûkher e ?

Ruxsar e, ya Rebb ! Ya qemer, guftar e ya Rebb ! Ya guher
Ew qend e ya Rebb ! Ya şeker,ew şuhd e yane xebere

Ew rûn e yan gulbergê al, alal e, yan dêma bi xal
Qendîlê Nûra Zulcelal, mir'at e yana mezher e

Dêm, şûşe nûra heqq di nav, dev xunçe ya şîrîn gulav
Rux, sorgula rengîn xunav, xal misk e,nîşan Enber e

Lêv in gello? Ya qûtê can, yaqûte,ya qûtê rewan
Ya qutîya durca diran, yan hewza ava kewser e

Ya Rebb xetê reyhanî ye ser sûretê Qur'an'î ye ?
Yan xatema sultanî ye, mir'at e, yane menzer e

Xal in gello ya fulful in, ew arid in yan sorgul in
Em aşiqin, yan bulbul in,zîkrê wî werda ehmer e

Ew gerdena şubhê şemal, ser çeşmeya ava zelal
Qarûreya xemra helal, ya şîşe ye, yan mermer e

Ya Rebb ! Qeda zîba ye ev, yan Ke'be ya Îsa ye ev
Yan Mescîdul-eqsa ye ev, yan sidre, yana 'er'er e

Ya Rebb! Dilê dîwane ye, yan alimê ferzane ye
Yan bulbulê wêrane ye, yan Ûd e,yana mîcmer e

Ew Xanî yê dildade ye, meşreb ji rengê bade ye
Derdê wî, yarek sade ye, lew her zeîf û rengzer e.

*****

EY DILA
(SAQÎYÊ MEHWEŞ)

Ey dila ger te divêten bibî daîm mesrûr
Di terebxaneyê dunya wexwe ava engûr

Perdeyê xefletê xewxayê cîhanê bidirîn
Ji meqamî kî bihîştî ji sedayê Tenbûr

Zemzema zemzemeya rahê Huseynî ji Hîcaz
Vexwenit, Ke'be yê dil, ta bite beytîl me'mûr

Perdeyê zulmetê eşxalê cihanê bi dirrîn
Ji nezergahê cemalê Tu hîcabê bike dûr

Menzerê dîde yê canê Te munewwer nebitin
Nexlê "Mazaxe" ne kêşî Tu ji xal û xetê hûr

Gunehan ger nebûwa lezzet û zewqek haşa!
Faîlê ism ne dibû, tarik û taîb me'cûr.

Mey û me'şûq û hewesbazîyê dunyayê zuhûr
Ne bûwana, ne dibû îsmekî Allah ê Xefûr

Min guneh tê bi gunahan ku di nêv baxê cîhan
Semerî xweştir ewin, bûn bi heramî meşhûr

Hinkî dewrê felekê saxirê meh dewrî diket
Meh û salan digirit her we ji 'ûmrê me qusûr

Rabe ey saqiyê mehweş tu ji rexma felekê
Bide min badeyê le'lî tu cama fexfûr

şêxê cam er nefesî hemdemî dil ket bi mûrad
Li mîradê dilê murde dibîtin keşfê qubûr

Ye'nî: ew xane yê gil nabite qabil qet'a
Ne bi çeşmê dilê nazir, ne bi rûyê menzûr

Îşqî bazî du terîqe,çi heqîqet çi mecaz
şem'ê can dê bi qejîtin,çi bi nar û çi bi nûr

Şebê zûlmatê bi îmkanê dibit subhî nûma
Afîtabê Ehedîyyet ji feleq tête zuhûr

Ser û mal û dilû canê me fidayê Te bitin
Bike qelbê me tu saqî ji şeraba xwe tehûr

Da bikem keşfê meqamatê ûlûwwê derecat
Ya bikem keşfê keramatê ji dara Mensûr

Zahîda! Ger Te divêtin tu xwedê nasî bikî
Were ber saye yê şîmşadî qedan,qet meçe dûr

Bi ziyadî were qeydê şecerê wadîyê quds
Ku bizanî bi bihê sît ê „enellah"ê ji Tûr

Ez lema şîfîte û walihê mehbûba ne em
Ku di nêv ayîneyê cebhetê wan min dîye nûr

Her dema netrikê xilxal binê: her têne xuroş
Her dem Turre ji ber tayî qeseb tête sudûr

Ya ne kakul ji kenarê kulehê kec bi derîn
Ya xetê mişkîn bi der têt ji kenarê Kaafûr

Kafirê Îşqem eger ez ne demê îmanê her
Ya bi mîhrabê brûyan ne birim secde ji dûr

Waî'za ! Guh bide min da bibihê neqlê sehîh
Mûshefa çehre yê xûbane kitêba mastûr

Defterê îşqê neda dest te mû'ellim ji ezel
Me'neya ayetê husnê li te lew ma mesitûr

Bê tekelluf duxwerim sondê bi Qur'an a şerîf !
"Xanîy"a sûretê canane bi min sûretê Nûr

*****

SAZÊ XWEŞ AWAZ

Seydê pencahê serê zulfa şeha şehbazim Ez
Mestê cama îşweya şehnazê nazik nazim Ez

Remz û î'cazê di xûban bê îbaret medh dikem
Murşidê kamil Ez im Îrohe, sahib raz im ez

Vê heyata heyretê çi-b kem beqa nîne ji bo
Lew şehîdê xemzeya wê dîlberâ tennaz im ez

Derdîmendek min divêtin, hem nefes bit Xanî ya !
Ger me hemdestek hebîtin, sazê xweşawaz im ez

*****

HER DINALIM

Her di nalim şev û rojan, meger ez Eyyûb im ez
Hêstiran her vedimalim, meger ez Ye'qûb im ez

Bigirin dest ji me bêrûn, kul û derdan ku yek in
Wer bi pêçin bi cefayê xwe, ku ez mektûbim ez

Hindekî xem hene daîm li min ew vêk dikevin
Ez nizanim ku bi çav wan çi qewî mehbûb im ez

Xem telebkarê me ye, em xo telebkarê dîyar
Weh tilismê telebim ez, talib û metlûbim ez

'Eceb îqbalî ji bo min nihe "Xanî" ! Ku li bal
Padîşahê xem û derdan, wehe ez merxûbim ez

*****

EY MÛTRIBÊ DEMSAZ

Hêdî li Brîşim bide ey mûtribê demsaz
Sed dil bi devin, beste û her yek bi dused naz

Ey badê seba pirr nehejîn turreyê dildar
Ûşşaqê bi nalîne ji murxûleyê şehnaz

Saqî! Bi gerrîn badeyê engûrê bi tenbûr
Cana! Bide min boseyekî her we bi dil xwaz

Rûhê min û sirra di ruxê yarê bi yek ra
Roja ezelî bûne bi dil hem dem û hem raz

Xanî te xelet zanî ku ew her ji xwe yek bûn
Xellaqê, teeddud bi mezahir kire î'caz

*****

DILÊ ŞEYDA

Dîsan dilê şeyda ji nû, da îxtîyar perwazî kir
Seydek dîye ber daye dû, meyl û firra şehbazî kir

Meyla wî mehza hîkmet e, seyda wî 'Enqa sîret e
Teyrê wî bala hîmmet e, lewra teleb efrazî kir

'Enqa bi dest kes nakevit, damek divê ew dakevit
Nabit ku xafil rakevit, yê qesdê seyda bazî kir

Seyyadiya min bû 'ebes, daîm li min teng bû qefes
Rahet nebûm ez yek nefes, min lew bi efxan sazî kir

Saz û semaya suhbetê, govend û çerxa de'wetê
Fikrîme şekl û qametê, bîr têne mi-b awazî kir

Şeklê mecazî çendek e, seyda heqîqî werdek e
Teyxûnê qeyda lê veke behrê, me ber endazî kir

Zincîr dibê teyxûn bitin, cendek li pêşber xûn bitin
şunqar ne dê mecnûn bitin, Uskûf ji çavan bazî kir

Şunqar e çav teyxûn e dil, berdane dû çavên bi kil
Xanî! Ewan gêra xecil, lewra mecaz axazî kir

*****

BAXÊ SORGULAN

Ez çûme baxê sorgolan Wextê sehergahî bixef
Min dî sedayê bulbulan Dagirtibûn her çar terf

Sewta hezar û qumrîyan, dengê rubab û muxennîyan
Teşbîhê bezma bengîyan, hevdengê hevbûn çeng û def

Manendê mest û serxweşan, ez çûme bezma mehweşan
Ebrû keman û çavreşan, cerg û dilê min kir hedef

Peygan di cerg û dîl birî, ten bûye sendûqa berî
"Seddeq" ji husna wî perî, hêja li min bû, kerb û gef

Hêja li min bû kerb û kîn, zahir xezeb, batin kenîn
Lê xemzeyek da min nihîn, 'eqlê me dîsan kir telef

Dîsan hebîba çav belek, îhsan di gel min kir gelek
Lewra dîgel zûlfên xelek aloz me tînin qişt û lef

Xemrîy û qişt û zulf û xal, hemyan li ser ruxsarê al
Dîger hêbûn ceng û cîdal, lêk alîyan bûn sef bi sef

Sef sef medî wê kirye ceng, hindek hebeş hindek fireng
Vêk raperandin wek xedeng, dîger hebûn wan laf û leff
(geff)
Diger hebûn de'wa û şerr, derbû li min tîpa Teter
Jêk rakirin qelb û cîger rêhtin ji dil xwîna bikef

Rêhtin gelek xûna dilan şehmarê zulfê sermilan
Bê rehm û mesta qatilan, meyxwar ji fincana sedef

Wan meyxuran ebter kirin, bê quwwet û rengzer kirin
"Wellah" ji dil kher-kher kirin, "Xanî" bi sed ah û esef
(Xanî bese! Ah û esef)

*****

ŞEHÎDÊ KERBELA

Leyse fî qelbî sîwake ya hebîbî kulle hal
Her demem xem hem demem şud der firaqet mah û sal

Ger benım kanım dilersen,çoktan olmuştur helal
Mest û ser xwoşem ji îşqê, mın nema 'eql û kemal

Ente fikrî fî fûadî, Ente rûhî fîl cesed
Leşkerê xemhayê To,mulkê dilem wêranî kerd

Dade geldim aşk elinden, isterim senden meded
Wan Tetaran kirne talan can û dîn û mulk û mal

Tale xemmî, zade hemmî, şa'e sirrî fîl mela
Teşneyê cama wîsalim çûn şehîdê Kerbela

Yoksa sen dîvane oldun, nêce halin ? Ey dila!
Yan ji nû ve îşveyek da min hebîna çav xezal

Bîttû mehcûren hebîbî! Leste mînnî alîmen
Murdem ez derdê fîraqet, xafilî Ez halê men

Can û dilden arzi kıldım halımı canane ben
Erzî hala min Tu xafil, qet ne pîrsî 'erzî hal

Hel lena mîn nî'metîl weslî hebîbî mîn nesîb
Ûfîtadem ber deret bê çare, sergerde,xerîb

Derd-i men çok olduğunden ona yoktur hêç tebîb
Ey tebîbê mın dewayê derdê "Xanî" her wîsal

*****

DILA !

Dila ! Qet nîne mehbûbek, ji te cuz'ek nebit lalî
Dilarama! Ne mec'zûbek heye, sirra te jê xalî

Eger sirra di qelban e, we ger Nûra di wechan e
Bi min yek reng û yek ta ne, di gel yek bûn li wî alî

Ji xeybê ew bi yek hatin, hemî cotin ne tek hatin
Wekî çavêt belek hatin, bi hev ket şaî yû talî

Eger çist e eger Nûr e, eger nêzîk eger dûr e
Birîna aşiqan kûre, ji ser tîra kurrê Zalî

Ji ser tîra mucewher bû, çi awir bû, çi xencer bû
Ji bo min ra muqedder bû, dema puf kirne Selsalî

We ger selsal û fennar im, tijî nûrim tijî narim
Di batin şubhê xunkar im, bi zahir ketme vî şalî

Bi zahir şalê xweh zîba, gellek etles gellek dîba
Gellek sîm û gellek şîba, me havêtin, cîger nalî

Cîger nalî me havêtin, hemî yek yek hilavêtin
Gello kî bit ku navêt in, hebînek çar û deh salî

Meger hermin divê dîlber, du sed îlman bikim ezber
Ji xilxalan dibit ebter, Mela meqsûde xilxalî

Mela meqsûdê min xal e, ne mulk û menzel û mal e
Ne îlm ê qal e, Ê hal e, me hasil kir bi ebdalî

Me hasil kir bi xizanî, bi muştaqî, bi heyranî
Wekî genca di wêranî, me peyda kir bi remmalî

Bi remmalî me peyda kir, dilê xemgîn me pê şa kir
Neqîyyîl-xed û îbra kir, wekî zêrra du sed salî

Neqîyyû-l xedd tîlaya nin, berat û emr û ferman in
Bi tuxra û bi nîşan in, di dest ûşşaqê delalî

*****

'ENQAYÊ BEQA

Beydayê fena gerçi benım rehguzerımdır
Enqayê beqa hîmmetê hemrahê perımdır

Wehm eylemezem sehmê bela, qewsê felekden
Atılse, çu destımde tewekkul sîperımdır

Ben baxê Cîhan içre 'eceb nexlê belayem
Başımda bela berg û meşeqqet semerımdır

Saqî bana îmdadi kılıp, fatıhê bab ol
Meyxane terîqimde ki evvel seferımdır.

Ben aşiqê dîdarî ne hacet xemê diwar
Cennet dexi ber perde yê qet'ê nezerımdır

Perwane yê perr soxîte yê şem'ê qedîmim
Nîranê cehennem şererê bal û perrımdır

Alam û cefasîle xweşim ben rehê îşkin
Xanî! Bana bu yolde, qedem çeşmê serımdır

*****

ME DÎ NEQŞEK

Me dî neqşek ji neqşê Neqşebendan
Vebû qeydê di min yek yek ji zendan

Kuşada dil ji bo min ra mûyesser
Ne bû bê suhbeta sûret lewendan

Li min kurt bû rîya Ke'ba wîsalê
Bi nûra tel'eta bala bulendan

Rezîl û ser xweşim wellahî wa'îz !
Li min zayî' meke wan we'z û pendan

Me sed hêvî heye dîsa ji seyyad
Me aza ke ji qeydê qeyd û bendan

Ji ahoyan me hoyan xwestin emma
Dilê min ma di gel mişkîn kemendan

Dilê Xanî eger çi genc û xane
Belê qet kes ne got Xanî bi çendan

*****

DILO RABE
(HILO !)

Dilo rabe xwe kêf xweş ke biçîn seyra gulistanê
Bese, carek tu xwe bi weş ke ! Hilo ! Da biçne seyranê

Gulîstan weh ku sorgul tê, çimen misla ku sunbul tê
Hezar bulbul bi xulxul tê, di fesla mahê nîsanê

Di fesla çardeyê nîsan, me dî bû dîlberek dîsan
Be dil meş'el çira îsan, me can da şubhê perwanê

Me can da dîlberek sade, letîf û şox û begzade
Ji qeydan kir me azade, nîhan xwendîme dîwanê

Nihanî xelwetek da min, ji le'lan şerbetek da min
Bidin guh! şîretek da min, girim bende di fermanê

Ji fermanê kî haziq bit, û naxwazî munafiq bit
Divê her dem muwafiq bit, wekî şêxê di Sen'anê

Wekî şêxê dê hazir bit, li fermanê ku nazir bit
Bi emrê dostê kafir bit, bi sojit suhfê Qur'anê

Disojim suhfê mektûbe, bi emrê yar û mehbûbe
Dema dil dim bi metlûbe, didim ez dîn û îmanê

Eger dîlber mecazî bit, ji rengê libsê xazî bit
Bila sofî ne razî bit, bi mîne ew di hirmanê

Binê! Sofî qewî dîne, wekî xuffaşê miskîne
Li nik wî roj tureng nîne, xwe naspêrit direxşanê

Dilê wî kor e e'ma ye, ji weslê dûrî da maye
Li ber wî derge dadaye, nehîşte bête dîwanê

Ez im serxweş ji wê camê, ez im ruswa di nêv âmê
Ez im Enqa ketim damê, bi zulfa ser li xal danê

Bi zulfa hate serxalan, bi nefşa tîtik û alan
Dil û canê me ebdalan di bit dîsa di talanê

Di talanê ku sed ser çûn, hezaran genc û gewher çûn
Dilê sed pare ker-ker çûn, Tu "Xanî" beske efkanê !

*****

HERO SEDCAR

Hero sedcar ji ûlfa wê, di bim keyfê li meyxanê
Vebîr min têt ku zulfa wê, dinalim Ez ji hicranê

Di nalim lew gelî yaran ji çahvan xûn diçit baran
Ji sehma 'eqreb û maran wekî ew têne lêkdanê

Wekî ew têne ser balan bibînin nuqte û xalan
Binefş û xunçe û alan, di ser da mahê tabanê

Di ser da ew meha enwer, ji reyhan sunbulan da ser
Kirim sewda û hem ebter, ji min dil bir bi talanê

Ji min dil bir evê carê ku min dî qameta yarê
Wekî selwa li cobarê vemeşya hate eywanê

Vemeşya ya sifet horî ji rengê sorgula jorî
Ruhê şirîn dikim gorî ji bo xalê û nîşanê

*****

"Nîşanên sûretê re'na, didin ku-l miskê sed te'na"
"Ji Xanî lêne pirr me'na wekî Ayatê Qur'anê"

— **Durre** —

SUBHEKÎ ZÛ

Ez çûme derê meykedeyê subhekî zû,
min dî yekî esmer

Qamet bi mesel şubhê çinarê bû, du keysû
manendê du Ejder

Çînçîn dixuşîn zulfê li ser gulşenê ruxsar,
reh şubhetê şehmar

Kher - kher dimeşîn biskê li ser qewsê du ebrû,
manendê du şehperr

Mayîm mutereqqib, meger ew mezherê î'caz,
carek bi dused naz

Halê me tefehhus ket û bêjit ku esîro!
Ez bo te me xemxwer

Min got Te di wextê seherê ev çiye da min,
ey serwîqeda min!

Go ma tu nizanî çiye min da te feqîro!
E'teytûke kewser

Hetta veke lewhê sedef û xameyê yaqût,
nêzîkê bi Lahût

Min seyrê kirin Sidre û Tûba qedê dil co,
nînin çu beraber

Hindî melek û horî, perî bêne temaşa,
haşa we ku haşa!

Kengê dibin ew laîqê nezzareyê ebrû
ey dil me ke bawer!

Barî ji derê meykedeyê min me ke bê par
ey seyyîdê mûxtar!

Saqî ku Tû yî „eşhedû bîllahî"di îro
"Xanî" bûye meyxwer

*****

HINAREK

Ji le'lên di yarê E. min mey vexwara
Bi dil dê bi bexşî Bedexşan, Buxara

Mûdamî di destê xeman da zebûnem
Mûdamî dixum mey, bikim da mûdara

Dema kir me xedra ewê gul'îzarê
Dibin bê tekelluf dilê min xîda ra

Hinarî ji bo min der axoşê pirr durr
Hinarek di taze, hebîna dil ara

Ne yara te îro nezer da te "Xanî" !
Ne yaran te mane, ne rahet, ne yara

*****

EY DIRÎXA !

Ey dirîxa! Ma me tenha ez ji şemsa xawerê
Xan û man têk bûne zulmet, paşî wê dêm enwerê

Paşî lêvên wê venaxum mûtleq ava Kewserê
Min nevê dunya bi carek, piştî wê sîmîn berê

Ger bizanim ez di heşrê da nebînim dîlberê
Cennetê dê pê çi kem! Pê wer bi kem xakisterê

Sed texabun! Çu ji bal min ew hebîna çav belek
Ah û efxanê ji min daîm di çûn çerxa felek

Hem ji ber feryadê min 'aciz dibûn îns û melek
Mam di qeyda dax û derdan paşî wê zulfîn xelek

Hîcreta yarê bihatim şubhê findê şu'ledar
Ketme sêla îştîyaqê, jihtiraqê bûme nar

Ez wucûdek bê wucûd im, suhtim têkve bûm xubar
Min nevê dunya bi carek piştî wê çavî xummar

Ger di hîna ez wefat kim, bête ser min Ezraîl
Mujdeya xuldê bidet min hem di wê geh Cibraîl

Xidr û Îlyas hem bibîtin her ji boy min re delîl
Dê bibêjim min nevêtin xuld û kewser, Selsebîl

Çerxê kec reftarî waweyla! Ku ez talan kirim
Ser bi gerdan bûm û lêkin zêde sergerdan kirim

Bê dil û şuxl û hewes carek ku bê iz'an kirin
Zêde wê bê murwetê ev reng ku ez talan kirim

Zînîhar! Ey dosîtan wextê dikim ez hîcretê
Van du mîsraan kîtabet kin li belgê kaxetê

Da di dest min da senet bit ew di hîyna Hezretê
Wesfê halê min bibêjin ew di wextê wesletê

Xanîya ta key bibêjî ev sual û ev cewab!
Ew ji wî sadir bûye ey bê edeb, ey bê hîcab!

Ew qedaya barîye, razî bibe ey mal xirab!
Belkî bîtin mûcibê narê ji bo te ew xitab

*****

EY DIL

Ey dil eger bi neqdê can, cinsê giran bihayê zulf
Bigrî, bizan dê ku mecan! Cewherê can fedayê zulf

Xunçeyê tengî hewsele, dil ji rikan bi girt debî
Subhîgehan ku seh di ket lexlexe yê hewayê zulf

Meşqê diket wek kutuban Rûyê Nigar û Husnê xet
Bende hezar û tiflê dil, hatine ber Melayê zulf

Aşiqê bê ceger meger sebrê ji can û dil di ket
Manî yê gencê meqsede. Heybetê ejdehayê zulf

Herserê mû bi sazekî, cilwe diket bi nazekî
Aşiqê îşqîbazekî, bendî diket belayê zulf

Rom û fireng û hîndîyan, xal û nîşan û xemrîyan
Xencer û şîr û misrîyan, ceng e liber lîwayê zulf

Tac û tomar û bin perran, le'l û guhar û gewheran
Serxoş û dîn û ebteran, reqse digel semayê zulf

Law û rewal û rêspîyan, mîr û wezîr û cindîyan
Serxoş û mest û bengîyan, derde ji macerayê zulf

şêx û mirîd û salikan, şah û feqîr û malikan
Cust û çeleng û çapikan dilket û bende payê zulf

Ef'a û mar û ejder e, Misk û Zebad û 'Enber e
Nefxe yê rûhî perwer e, raîheyê hewayê zulf

Bê meyy û bê dewayekî, bê deff û çenk û nayekî
Dîn diketin Melaye kî, cezbe yê dil rubayê zulf

Mîr û mela û mahîran, çendî belîx û şaîran
"Xanî" û hindî haziran, dade ! ji ber belayê zulf
(derde, ji destê tayê zulf)

*****

AXÎRET FIROŞÎN

Da zenn ne birîn ku em xemûşîn
Em beste dehan û dil xurûşîn
Genca me di dil, guher tijîne
Her çendî îyan xezef firoşîn

Şahîn û bi xef, bi libsî dîba
Zahir ji xwe em pelasî poşîn
Mucmer sifete me cism û can, ûd
Dil aeteşe,daîma bi coşîn

Meyxane bihişte, Hûre Saqî
Kewser Mey e,lew Me bade noşîn
Bê hûdene lafê lew ku Xanî
Dunya kirr û axîret firoşîn

*****

ZAHIDÊ XELWET NIŞÎN

Zahidê xelwet nişîn pabestê kerdarê xwe ye
Tacirê rehlet guzîn derbendê dînarê xwe ye

Aşiqê dîlber hebîn dil dayê dildarê xwe ye
Vî zemanî herkesek bê şubhe xemxwarê xwe ye

Bê emel tu-j kes meke hîvî eta û himmetê
Bê xered nakeşîtin qet kes ji bo kes zehmetê

Kes nehîn qet hilgirit barê te ew bê ucretê
Gerçî Îsa bit ku wî fikra ker û barê xwe ye

Hoşîyar bî! dane kî ûmrê xwe bê hasil telef
Lew ku naket fayde mal û genc û ewlad û xelef

Maceraya "Xidr" û dîwarî yetîmê bû selef
Vî zemanî herkesek mi'marê dîwarê xwe ye

Ca nezerke îbretê, pêla ku waqi' bit sewaş
Ger ne bîtin îltifat û mûçe û debr û meaş

Cundîyê rimbazê faris nadetin canê belaş
Saeta serbazîyê hîvî ji serdarê xwe ye

Xanî ya zayi' me ke weqtê xwe ey nadan! ebes
Bê teleb nabî ji weslê behremend ey bul-hewes!

Sanî'ê Mûtleq ku nînit îhtiyacek wî bi kes
Lutf û îhsana Wî jî derheq telebkarê xwe ye

*****

EY SEYYÎDÊ ALEM!

Ey Seyyîdê 'alem senedê Nûra hîdayet
Serdarê şefî'an ku tu derrozê qîyamet
Hêvî dikin em pirr ji te ey sedrê rîsalet
Mehrûmê nekî me tu ji dîwana şefaet

Qed kane lekel-fedl û lekel-cûd û kesîra
Ûrsîlte îlel-xelqî beşîren we nezîra

Taha tu resûlê melîkê mulkê kerîm î
Teşrîfê bi ne'leynê xwe ser 'Erşê ezîm î
Der behrê cemalê tu tenê durra yetîm î
Ehsentirê ez Yûsifî, Siddîq û Helîm î

Ey ne'tê te ez ferşê heta 'Erşê şehîra
Ûrsîlte îlel-xelqî beşiren we nezîra

*****

Nûra ku ji şemsa ezelî dabû zuhûrê
Cîlva ewwelî bû tu, ku jê hatî sudûrê
'Alem hemî ronî bû ku paşê ji wî Nûrê
Berqek ji tecella wî bû. Mûsa dî li Tûrê

Adem tune bû hêj, tu hebû "celle qedîra"
Ûrsîlte îlel-xelqî beşîren we Nezîra (*)

(*) Ev şeşka dawî, ne ji gufteyên Xanî ye, ji gufteyên Durre ye, fantezîyekî şi'rî ye (mebnî yê li ser bîr û bawerîyek e tesewwûfî ye).

MEDHÎYYE Û MERSÎYYE
(PESINAME Û ŞÎNNAME)

(Der bareyê Mûhemmed begê BAZÎDÊ da)

Kanê Mûhemmed beg gelo ? Ka Padîşahê Serhedan ?
Îro ji dil bigrîn dilo ! Ka Padîşahê Serhedan ?

Îro bi bînin îbretê, axa û xelqê hêşetê
Kanê xwedanê xîretê,ka Padîşahê Serhedan ?

Mîrê di nêv mîran bi nav, eşheb suwarê rim zirav
Bala bilindê perr belav,ka Padîşahê Serhedan ?

Kî dî we reng zatek şerîf,erkan û 'ezmanek letîf
'Alem didest wî bû zeîf, ka Padîşahê Serhedan ?

Koma Dimil bû sê hezar,sed Mîrekan vêkra du car
Jêk rakirin, kir tar û mar, ka Padîşahê Serhedan ?

Senceq ji ser qemmê birrî, Bidlîsîya wan jê kirî
Xanê Dimil ker bû, çirrî,ka padişahê Serhedan ?

Kanê 'ezîzê Misrîyan,kanê 'edûwwê Wanîyan
Kan hevrikê Mehmûdîyan, ka Padîşahê Serhedan ?

Kanê emîrê namîdar, serhed nişînê xundekar
Paşan ji bo pêşkêş hinar, ka Padîşahê serhedan ?

Kanê emîrê zî funûn, ka aqilê teb'et cunûn
Alem li ber wî bûn zebûn,ka padîşahê Serhedan ?

Çend mîr û hakim rakirin, çend xan û sultan da kirin
Kom û heşem ber Ba kirin, ka padişahê Serhedan ?

Ew hakimê pirr nav û deng, hem teb'etê Teymûrê leng
De'wa dikir biçiye Frenk, ka Padîşahê Serhedan ?

Pêla ku wî dîwan di girt, xelqê edeb erkan di girt
Heybet ji wan dîwan di girt, ka Padîşahê Serhedan ?

Wextê bi ser hespê diket,şeş caniban rev pê di ket
Heybet bi ser xelqê di ket, ka Padîşahê Serhedan ?

Daîm 'edalet pêşe bû, xayet deqîq endîşe bû
Nazik tebîet şîşe bû,ka Padîşahê Serhadan ?

Dîwan û 'edl û dadîgîr, îz'an pirr û roşen zemîr
Hetta xweşîn nakin ji bîr, ka Padîşahê Serhedan ?

Dîwan û eywan şanişîn, ew sedr û hewzê nazenîn
Man şubhê firdewsê berîn, ka Padîşahê Serhedan ?

Ferşên di dîba û herîr,îstebreqên wî bê nezîr
Bê îxtîyar mayîn ji bîr, ka Padîşahê Serhedan ?

Ev xalîyên ermûşê qezz,wernagirin kes şubhê xezz
Xalî bûyîn meydan û rez, ka Padîşahê Serhedan ?

Rez bû mîsala cennetê,eywan ji sun'a qudretê
Kes nîne tê ket suhbetê, ka padîşahê Serhedan ?

Elmas û le'l û gewheran,Tomar û tac û bin perran
Hedd nîne bêxme defteran,ka Padîşahê Serhedan ?

Ew şehnişîn û hewz û av,nêçîrgehê pirr seyd û rav
Nabit bibêjim ez bi nav, ka Padîşahê Serhedan ?

Şahînşehê gerden firaz,aza kirin Teyhûn û qaz
Terxan kirin Teyxûn û Baz, ka Padîşahê Serhedan ?

Mîrê Me wa nabit suwar, têr bûye ew naçit şikar
Teyxûn û Terlan man li xwar, ka Padîşahê serhedan ?

Serdarîya koma gelek naket suwarê çav belek
Çavet sipî bin ey Felek ! Ka Padîşahê Serhedan ?

Taq û Rewaq û menzeran, koşk û kelat û xeyberan
Wan cumle nîşan heyderan, ka Padîşahê Serhedan ?

Ew cumle,wî îcad kirin,her çend qewî bunyad kirin
Çerxê hejand, berbad kirin, ka Padîşahê Serhedan ?

Xwahê Kelatan bê zefer,dijmin ji ber wî bê meferr
Wê çûye nêva ax û ber, ka Padîşahê Serhedan ?

Dunya di borîtin bi dor, 'ûmrê 'ezîz nadin bi zor
Dewlet di bên: Naçîte gor, ka Padîşahê Serhedan ?

Yareb hebit ocax qedîm ! 'Emmên di wî xweş bin emîm
Bilxasse ew durra yetîm, ka Padîşahê Serhedan ?

Durdaneyê gewher sedef,ew ma ji wî neslê xelef
Ya Reb nekî wan zû telef ! ka Padîşahê Serhedan ?

Xanî ! Tu jî destan hilîn,Her çend ku zêde dil kulîn
Îro ji mîrê seîlîn ! Ka Padîşahê Serhedan ?

*****

Em jî di bên -Xanî mîsal- kanê hemû dost û heval
Ka tac û text û mulk û mal, ka Padîşahê Serhedan ?

Ka mîrek û xan û xwedan, ka çadir û konên vedan
Zozanê Qardox û Medan, ka Padîşahê Serhedan ?

Kanê welat, kanê welat,ser kanîya avul heyat
Ka Xizrê azadî ne hat, ka Padîşahê Serhedan ?

— Durre —

ŞERHA DÎWANA
EHMEDÊ XANÎ

NEQQAŞÊ EZEL

Neqqaşê ezel roja serlewheyê rengîn da
Pergalê di destan bû, ser sefhe ku tezyîn da
Tezhîbê zerefşan kir serlewhê kitaba îşq
Resma ezelî kêşa, neqşê xwe newalîn da
(nû anîn da)
Dîbace ku înşa kir, fihrîste ku îmla kir
Cildek ji enasir best, nefxek di sufalîn da
Etfalê melek hatin, westane debistanê
"La îlme lena"gotin, "Ebced" bi xwe telqîn da

ME'NA BÊJEYAN :

Neqiş: neqişandin, neqşandina rengîn (birşeyi çeşitli renklerle boyamak)
Neqqaş: nîgarende, neqişkerê mahir (çok güzel nakış yapan, ressam)
Ezel: dema ku destpêka wî tuneye, her heye (ibtidası ve başlangıcı olmayan zaman, her zaman var olan)
Neqqaşê ezel: ew Xwedayê ku di ezelda hemû alemê neqişandîye (tüm kainatı nakşeden ezeli ve ebedi olan Allah)
Serlewhe: Ser rûpel, nivîsara seretayî ya ku li serê lewhê tê nivîsandin (serlevha, yazıda başlık)
Rengîn: (renkli, süslü)
Da: (verdi, icat etti)
Pergal: pergar, aletê ku pê neqş û nîgarî tê kirin (pergel, daire çizmeye mahsus alet)
Tezyîn: xemilandin (süslemek, bezenmek)
Sersefhe: Sersehîfe, nivîsara seretayî (kağıdın bir tarafı üzerinde yazılan serlevha)
Tezhîb: zêravkirin, neqişandina bi ava zêr (altınla süslemek)
Zerefşan: zêrrweşîn (altın saçan, altın yaldızlı)
Kîtap: pirtûk
'Îşq: evîn (şiddetli muhabbet)
Resim: sûret, (fotograf)

Ezelî: tiştê herheyî (ezeli, ezele dair, ezele mensub ve mutaallik)
Kêşa: kişand (çekti)
Newal: dayîn, bexşîş (bahşiş)
Newalîn: Tiştê ku peywendîyê wî bi dayînê va heye, hedîye û bexşîş (bahşiş ve bahşişle ilgili, bedava, karşılıksız, bağış)
Nûanîn da: nû da anîn, ji nû va peyda kir (yeni icad etti)
Neqşê xwe newalîn da: neqşê xwe bexşîş kir, bê pere da, (nakşını karşılıksız verdi, bağışladı)
Dîbace: destpêk, pêşgotin, pêşek (mukaddime, önsöz)
Înşa kir: ji nû çêkir (vucuda getirdi, peyda etti)
Îmla kir: nivîsî, da nivîsîn (yeni yazdı, dikte etti)
Cîldek: beşek (bir cilt)
'Enasir: (c.ûnsûr) bineret, maddeyên bingehî: ax û av û hewa û agir (birşeyin meydana gelmesine sebep olan temel maddeler, unsurlar: toprak, su, hava ve ateş)
Nefxek: pufek (bir üflemek, bir üfürük)
Sûfalîn, sefalîn: çamûr û herî ya hişkbûyî, pijîyayî, cêrik û dîzikên ji çamûrê (çamurdan yapılan çanak çömlekler gibi şeyler)
Etfalê melek: firişteyên weki zarokan ku bê gûneh û paqijin (çocuklar gibi masum melekler)
Westane debistanê: çûn debistanê, ketin medresê (okula gittiler, yerleştiler)
La îlme lena: ji boy me zanîn tûne, em tiştek nizanin (bizim için bilgi yoktur, bilmiyoruz)
Ebced: Elîfbê, Elîfba (alfabe)
Bixwe: bi alîyê xwe da, bi xwe, bizzat (kendine, kendiliğinden, özelliği ile)
Telqîn: bi cîh kirina di hişş da, di berr ra avêtin (zihinde yerleştirmek, fikir aşılamak)
Ebced bi xwe telqîn da: ebcetê bi serê xwe, bi xwe bi xwe ders û telqîna zanînê da. (Ebcet onlara kendiliğinden öğrenmeyî telkin etti)

KURTE PÊŞEK:

Bi angorî tesewwûfa îslamê, bi taybetî, bi angorê felsefa wehdetî-l wûcûdê, tecellîya Xweda ya ewwel, tecellî ya zatê wî ji zatê wîra ye (îlm û zanîna zatê wî bi zatê wî, evîndarîya zatê wî ji hûsn û

cemala zatê wî ra ye). Ku ji wî tecellîya wîya ewwil jî, mexlûqê wîyê ewwil, 'Eqlê ewwil, peyda bû ye (ku ji wî mexlûqê ewwel ra Rûh, Rûhê kullî, qelem, lewh, 'Erş, heqîqeta Mûhemmedî ye jî, tê gotin).

Tecellîya Xweda ya duwemîn jî: tecellîya wîya di şekl û sûretên mûmkînatan da (cûrên alemê da) ye. Ku ew tecellî, navê wî yê "Nûr"e, sûretên mûmkînatan jî, navê wî yê "Ezzahir"e, sîya wî ya duwemîne, wucûda wîya heqqe di sûretên alemê da xûya bû ye. Sûretên mahîyetên tiştan (ku di îstilaha tesewwûfê da ji wan ra "Hûrûfên alîyyat = Tîpên bilind" tê gotin) jî, di zatê Xweda da, di îlmê wî yê ezelî da, veşartîne. (Wek dara xurmê ku di dendikê xurmê da bi cîh bûye û veşartî ye) yanê: sûret û proje û programa hemû cûrên Alemê, hemû kewn û kaînatê, di zatê wî yê ehedîyye da veşartîne, ku jê ra, **şûûnên zatîyye yên di xeybî-l xûyûbê**da (di veşartîyê veşartîyan da) tête gotin.

Derece û mertebe yên Wucûdê jî, (6) şeş in:

1- Merteba Zatê Ehed: (Zatê ku yekê bi tenê ye, bê mûlaheze û îtîbara her tiştî ye ku ji xeyrê Xwedê tu kes bi mahiyyeta wî nizane), Alimên Wehdetul-Wucûdê, jê ra Wucûda Mûtleq, (hebûna bê çend û çilo, bê qeyd û şert) dibêjin.

2- Merteba Zatê Wahid: (Zatê Îlahî digel mûlaheza Esma û sifat û nav û nîşanên Wî.)

3- Merteba Erwahên Mûcerrede: (Rûhên ku ji madde û cesed û bedenê rût in.)

4- Merteba Nefsên xebatkar: Me'mûr û wezîfedar (ku jê ra alema mîsal, 'alema melekût, 'alema xeybê jî tê gotin.)

5- Merteba 'Alema Mulk û şehadetê: (tiştên maddî û diyar û berçav)

6- Merteba El-Kewn-il Camî': (Bûyîn û hebûna ku di xwe da her tiştî girtiye, Merteba însanê kamil ku numûne û neynika hemî wan cûrên mertebe yên borî ye). Hemî cûrên alem jî, nav û nîşanên wê Wucada Mûtleqa Ezelî û Ebedî û Sermedî ne, siya wî hebûna mûtleqa Îlahî ne, tezahurat û tecelliyatên Wî ne.

ME'NA HEMÎ:

Piştî vî kurte pêşekê, em dikarin me'na hemiya van helbesteyên pîrê edebiyat û tesewwûfê, wiha beyan û îzah bikin:

"Neqqaşê Ezel" (nîgarendayê ezelî, Xweda yê Teala) dema ku serlewhe û sernivîsa alema wucûdê ya rengîn, da (dema ku di ezel da tecellî kir, 'îlmê Zatê Wî gihîşt Zatê Wî= Zatê Wî bû me'lûmê Zatê Wî), dema ku bi pergala destê Qudret û Meşiyyeta xwe, mexlûqê xwe yê ewwel ('eqlê ewwelê ku ser lewhe yê wûcûdê ye), neqişand û nitirand, di wê dem û ana ezelî da, di dema wê tecelliya xwe ya seretayî da, serlewhe ya kitêba îşq û evînê jî bi xetê zêrrîn nivîsî. Yanê: Di dema tecelliya Wî ya seretayî da, (dema ku Zatê Wî bû me'lûmê Zatê Wî) di wê dema pîroz da, îşq û evîna Zatê Wî ji husn û cemala Zatê Wî ra hebû ku ji wî îşq û evînê (ji wî zanîna digel wî îşq û evînê) da, mexlûqê Wî yê seretayî ku eqlê ewwel e, peyda bû, hate wucûdê.
(Bi kurttî: ew mexlûqê wî yê ewwil û hemû cûrên dinên mertebeyên wucûdê ku di pey wî ra ne, ji zanîna zatê wî bi zatê wî, -ji 'îşq û evîna zatê wî ji husn û cemala zatê wî ra- peyda bûne, ji wî çêbûne. Bi yek kelîmekî: îlm û îşq, menşe û jêderê wucûd û hebûna hemî alem û hemî kewn û kaînatê ne).
Xweda, resm û sûretên mahîyetên tiştan, ji xezîne û arşîva îlm û zatê xwe kişand (projeya wana ezelî, ji wî xezîne û arşîva pîroz deranî), wan neqş û nemûşên espehî û xweşik,bala û wala, bê pol û bê pere, bê kar û bê menfî'et, bi vî awayî, bi vî tertîb û tenzîmê çêkir: Berê dîbaca wî kitêba wucûdê ya ku eserê îlm û îşqê ye, çêkir, (madda ewelîn, Atom û Heyûla yê çêkir), di fitret û xilqeta wan da proja hemî 'Alemê -wek proja dara hêjîrê di dendikê dara hêjîrê da- bi cîhkir, ji Atom û Heyûla yê da jî, çar maddeyên bingehî (ax û av û hewa û agir)wekî cildekî wî kitêba alema wucûdê, girêda û amade kir, ji wan çar madde yên bingehî jî, bedena însanî ya **Nasûtî** -wek sûfalîn- da çêkirin, ji Rûhê xwe yê **lahûtî,** pûf kirê (rûhê jîn û heyatê dayê), bi can kir û ji firişteyan ra (rûhên mûcerredên ku mezher û mûmessilên qûwwet û qanûnên tebîet û kewnê ne) bi zimanê hal, ferman kir û got: hûn jî însan ra serê xwe daynin, jê ra herin sejdê, xizmet û îtaet bikin ku ewan, berê î'tîraz kirin, lê di pey ra heqîqet dîtin û gotin «سبحانك لا علم لنا الاّ ما علّمتنا» Tu pak û pîrozî, şanê Te bilinde, ji bilî tiştên ku Te bi me daye zanîn em tu tiştî nizanin /(Elbeqere / 32.)/ Ku bi kurttî yanê: Dema Xweda di ezel da tecellî kir: bi pergala qûwwet û qûdret û meşîyyeta xwe ya ezelî, serlewhê wucûdê neqişand, di wê demê da îşq û evîn jî hebû ku Xanî, bi

wî ûslûba teşbîhî û temsîlî ya xwe ya belîx û hekîm, evê heqîqetê îfade dike; menşe û jêderê wucûda Alemê, îlmê Xweda yê ezelî û îşq û evîna ezelî dide nîşan ku Mela yê Cizîrî jî ewê heqîqetê wekirîtir îfade dike û waha dibêje:

Allah sehergaha ezel yelmûmê îşqê şu 'le da
Nûra cemala lemyezel, zatê tecella ya xwe da
Zatê tecella bû li zat, bê îsm û asar û sifat
Sirra hurûfên alîyat, xef bû di sitr û perde da

Zatê Muqaddes bû wucûd, coşiş neda bû behrê cûd
Wesf û îzafat û quyûd, yek jê tecellayê neda

(* Ji kerema xwe ! li rupel 100 mêze bikin)

******

Wan sade ruxan meşqê îşqê ku temenna kir
Xettatê ji husnil-Xet sermeşqekî zêrrîn da
Ma secde tenê min bir ber sûretê mehbûban?
Îblîsê nebir secde, lew maye di nifrîn da

ME'NA BÊJEYAN:
Sade: Safî (saf, temiz, karışık olmayan, parlak)
Rux: Rû, dêm (yüz)
Sade ruxan: Ewên ku rûyên wan wekî yên zarokan bê mû ne, hilû ne. (Yüzleri çocuk yüzü gibi sade, tüysüz ve parlak olanlar)
Meşq: Numûna nivîsarê ya ku li ber wî -wekî wî- dinivîsînin. (Yazı örneği, öğretici yazı, uzun uzun yazmak, temrin yazısı)
Meşqê îşqê: Numûna xet û nivîsa îşqê (aşkı öğreten ve aşılayan örnek)
Temenna: Daxwaz, niyaz (dilek ve istek)
Xettat: Nivîskar, nivîsende yê ku pirr xweş dinivîse ku di vir da meqsed jê Xweda ye (çok güzel yazı yazan hat sanatkarı ki burada Allah kast ediliyor.)
Ji husni-l Xet: Ji xet û nivîsara rind û espehî (güzel hatdan)
Sermeşq: Nivîsara numûne ku didin suxte û şagirtan ji boy ku li

ber wî binivîsîn û hînê nivîsara xweşik bibin. (talebelerin öğrenmesi için yazılan örnek yazı)
Zêrrîn: Bi zêrr neqişandî, espehî û xweşik (altın yaldızlı, çok güzel ve kıymetli)
Sermeşqeki zêrrîn: Numûna xetekî avzêrrkirî ku di vir da meqsed jê sûretê însan e (sûretê Adem û benî Adem e) (Altın yaldızlı çok güzel bir örnek ki burada ondan maksad insan ve beni Adem suretidir)
Ma: Qeyê? (acaba)
Ma secde tenê min bir: Ma qey min bi tenê secde bir? (acaba yalnız ben mi secde ettim)
Ber sûretê mehbûban: Li ber sûretê hezkiriyan. (sevilenlerin yüzlerine karşı)
Îblîs: Ehremen (şeytan)
Lew maye: Lewra ku maye (onun içindir ki kalmış)
Di nifrîn da: Di nifirr û nefret û le'netê da (beddua, nefret ve lanette)

ME'NA HEMÎ:

Wan firişteyên weke zarokên rû sade ku daxwaz û temenna ya meşqa îşqê kirin, neqqaş û nîgarendeyê ezelî (Xweda) ji xetên pirr espehî û rind numûnekî zêrrîn (sûretê Adem) ji wan ra wek numûneya îşq û evînê pêşkêş kir û emr û fermana wan kir ku ji wî numûneya husn û cemalê ra serê xwe daynin û secde bibin. (ji ber ku ew numûne, neqş û nemûşê tecelliya îrade û îşqa Wî ya Îlahî ye, ku -bi sirrê Wehdetu-l wûcûdê- secde birina ji wî sûretê ra, di heqîqet da ji Wî wucûda ezelîya mûtleqa heqq ra ye) ku me jî ewî sirrê fêm kirîye û ji sûretên mehbûb û bedew û rindan ra secde birîye; lê belê, ne me bi tenê fêm kirîye û jê ra secde birîye belkî -ji xeyrî Îblîs- herkesî ewî heqîqetê fêm kirîye û zanîye, bi tenê Îblîs fêm nekirîye, we yan ji kîn û înada xwe nexwestîye ku fêm bike, ji wî sedemê jî, mel'ûn û merdûd bûye, îlel ebed di le'net û nefretê da maye.
Di belgeyên dînî da (wekî Ayeta 34/ Sûretê Beqere) ev heye: "ku Xweda emrê melaîketan bi secdebirina ji Adem ra kirîye, melaîketan jî secde birîne, lê bi tenê Îblîs jê ra secde nebirîye ji ber wî jî merdûd û mel'ûn bûye" ku me'ne û şirovekirina van

belgeyên dînî jî bi angorî fêm û mentiqa îlm û felsefê ev e: "Rûh û quwwetên tebîî yên qencî û xeyr û cemal û kemal û pîrozîyê, ji xizmet û tekamula însan û însanîyetê ra serê xwe danîne û ram bûne, yên ne qencî û şerr û fesad û înadê jî, li hember derketine nexwestine ku jê ra mûtî' û amade bibin ku bi zimanê Dînan, ji wan quwwet û rûhên tebîî û kewnî yên qenc û pîroz ra **melaîket** û firişte tên gotin, ji quwwet û rûhên dij û şerrûd û mixennet û pîs ra jî, **Ehremen** û **şeytan** û **îblîs** tête gotin, bi zimanê felsefa maddî jî, ji wan ra q**anûnên tebî'î û fîtrî**, bi zimanê Qur'anê jî ji wan qanûnên tebîî ra "**Sünnetellah**" tête gotin. Bi angorî felsefa "**Meşaîyye**" (*) jî, firişte û melaîket îbaretê ji mahîyyetên mûcerred in, bi angorî felsefa "**Îşraqiyye**" jî, ji wan ra **"Ûqûl"** tête gotin.

Ku Xanî jî di van helbesteyên xwe da îma û îşaretê bal wan belgeyên Dînî dike, bi fêm û mentiqa Wehdetîl-Wucûdê û Wehdettî-ş şûhûdê, dihûne û dibêje:

Ma secde tenê min bir ber sûretê mehbûban
Îblîsê nebir secde lew maye di nifrîn da

*****

Ez çûme derê dêrê min dîtî ku Rûhûllah
Tekrarî mûsewwer bû hetta di nihalîn da

ME'NA BÊJEYAN

Dêr: Îbadetxaneya xiristîyanan (kilise, manastır)

Rûhûllah: Rûhê Xwedê, rûhê emr û fermana wîya tekwînî ku dema ji tiştekî ra bibêje çêbe, hima ew çêdibe (kun = çêbe, fe yekun = çêdibe) Yanê: Ew emrê Xweda yê ku heyat û jîyanê dibexşîne, wek ku Îsa Pêxember jî, bi wî emr û fermanê, bê bav xuliqandîye ku lewra jî, jê ra **Rûhûllah** û **Kelîmetûllah** tê gotin. (Bedi'ûzzeman Seîdê Kurdî diyorki; Ruh, alemê emirden gelmiş bir qanuni zi-şuurdir ki, kudreti ezeli, ona vücudi harici vermiştir ve ma'kul kanunların kardeşidir.)

(*) Meşşaîyye: (Peripateticim) Navê felsefa Arîsto ye ku Aristo di haletê meşşê da, ewî felsefa xwe ders daye. (Meşîya ye û dersa feqî û suxteyên xwe li ser pîyan daye) ku lewra jî navê felsefa wî bûye felsefa Meşşaîyye, yanê felsefa ku peywendî yê wî bi meşê ra heye.

Rûhûllah: Rûhê Xwedê, Îsa (Alah'ın emri ile meydana gelen İsa Peygamberin adıdır.)
Tekrar: Li pey hev, carek li pey carek (bir daha, ardıardına)
Mûsewwer: Xweyî sûret, xweyî wîne (suretlenmiş, görünmüş olan)
Nihalîn: (Cem'a "nihal"ê ye,) bi me'na çiqil û şitlên daran, we yan cem'a "nihalî"yê ye ku bi me'na tebsî û mefrûşat û seccade ye, mebestê tebsîyên ku keşîşên dêran di dema ayînan da îstî'mal dikin, bi kar tînin. (Fidanlar, tebsi ve mefruşatlar, özellikle papazların ayinlerde kullandıkları bakır, gümüş ve altın işlemeli tepsiler.)

ME'NA HEMÎ:
Ez çûme ber derê dêra filleyan (dêra Îsewîyan), min dît ku Ruhê Xweda tekrar dîyar bûye, di her tiştan da, hetta di nihalînan da dixûyê û eşkera bûye, ku meqsed: Teswîr û xûyanbûyêna wî wûcûda mûtleqa pîroza Îlahî di hemî cûrên alemê da ye; bi taybetî di sûretê însanî da ku numûneya wî ya bi taybetî û cudaî jî, sûretê **Îsa** Pêxember e. Ji ber ku ew jî, wekî Adem Pêxember yek ji xarîqeyên wucûdê ye, Rûhûllah û Kelîmetûllaha pîroz e.

******

Wan cumle "Enel-Heqq" got, min "Wahidê Mûtleq" got
Saqî bi xwe ez girtim camek meyê noşîn da

ME'NA BÊJEYAN:
Wan cumle: Ewan tevan, hemîyan (onların hepsi)
Enel-heqq: Ez ewê heqq im, ez Xweda yê heqq bi xwe me (ben hakkın ta kendisiyim)
Wahidê Mûtleq: Yekê bi her awahî bi tenê, yekê bê qeyd û bê bend û bê çûn û bê çend. (Xweda yê bi tenê) (her bakımdan bir ve tek olan Allah Teala)
Saqî: Meygerr, (içecek veren, içki sunan)
Bi xwe: Bi zatîhî, bi xwe bi tenê, bi alîyê xwe va, bi bal xwe va (kendisi, kendisine)
Meya noşîn: Badeya xweş guwar û şîrîn, badeya me'rîfet û heqîqetê, îşq û mehebbetê. (tatlı ve lezzetli olan şarap, aşk ve muhabbet badesi)

ME'NA HEMÎ:
Wan hemî kes û hemî tiştên ku mezher û dîyargehên tecellîya Xweda ne, bi zimanê halê xwe, -wek Hellacê Mensûr- "Enel-heqq" gotin, lê min (Xanî) Wahidê Mûtleq (yekê ku bi her awahî yekê bi tenê ye) got, ku liser vî gotina min, saqîyê meya heqîqetê ez bi alî xwe va girtim û birim, qedehekî ji wê meya me'rîfeta heqîqetê da min.

******

Min noşî û serxweş bûm, filhalî muşewweş bûm
Ez çar û neh û şeş bûm, min tekye bi balîn da

ME'NA BÊJEYAN:
Min noşî: Min vexwar (ben içtim)
Fil-hal: Hima di wî demê da (hemen o anda)
Muşewweş: Tevlihev, sews û şewş (karmakarışık)
Ez çar û neh û şeş bûm: Bi angorê hesabê **Ebcedê** me'na wî ev e: Ez li hev tewîyam, ez du tew bûm, tewişîm û ketim xwarê ku min pala xwe da balînê, (balîfê) bi angorî hesabê ebcedê, 4 = d (د), 9 = th (ط) 6 = w (و), ku li ser hev dibe: d.t.w., (دطو) bi me'na li hev dutewbûyîn û tewandin e. Hesabê ebcedê; hesabekî bi taybetî ye û bi angorî elîfba ya erebî ye ku jê ra hem hesabê Ebcedê, hem jî hesabê "Cumel" û "Cefrê" tê gotin, ku "Cumel" bı me'na komên cumle ya ne, îşaretê bal wan heyşt cumleyan: **(Ebced, Hewwez, Hûttîy, Kelemen, Seefes, Qereşet, Sexiz, dazixî)** va ye, "Cefr" jî, bi me'na çerm û postê berxika ye ku ew 29 pêtekên elîfbaya erebî, hem di van heyşt kelîman da kom bûne, hem jî ew di zemanê pêşîn da, li ser postên berxikan hatibûne nivîsandin, ku lewra jî navî wî hesabê, hem bûye hesabê **Cumel**'ê (hesabê koma herfan), hem jî bûye hesabê **Cefr**'ê (hesabê herfên ku li ser postê berxan hatine nivîsandin). Bi angorî vî tertîbê jî, ji her tîp û herfekî ra reqem û hejmarekî bi taybetî heye, ku di vî cetwelî da hatîye beyankirin:

Cedwela hesabê Ebcedê:

400 =	ت	60 =	س	8 =	ح	1 =	أ
500 =	ث	70 =	ع	9 =	ط	2 =	ب
600 =	خ	80 =	ف	10 =	ي	3 =	ج
700 =	ذ	90 =	ص	20 =	ك	4 =	د
800 =	ض	100 =	ق	30 =	ل	5 =	هـ
900 =	ظ	200 =	ر	40 =	م	6 =	و
1000 =	غ	300 =	ش	50 =	ن	7 =	ز

Ev hesabê Ebcedê, di helbeste û tarîx û lexezan da tê bi kar anîn, çawan ku Xanî jî, di vê helbesta xwe da ewî hesabî bi kar anîye.Lê dibe jî ku meqseda Xanî, ji çar û neh û şeşan, 4 'Enasir (çar maddeyên bingehî = ax, av, hewa û agır), neh felek û şeş cîhet bin jî, ku bi angorî vê îhtimalê jî, me'na wî ev e: "Dema ku min wî badeyê vexwar ez ji hebûna xwe ya nasûtî (maddî û însanî) di derya hebûna Mûtleqa lahûtî (Îlahî) ya pîroz da, wek perçekî cemedê helîyam û pêra bûme yek, bûm hemî alem û hemî hebûn, ku hebûn jî bi kurtî, îbaretê ji 4 'Enasir û 9 Felek û 6 cîheta ne. Yanê: ez bûm hemî tişt, bûm hemî kewn û kaînat. (Ji ber ku însan nusxe û numûneyekî herî camî' û me'nîdar e ji boy kitêba alemê ra, dema ku bi ava me'newîya meya me'rîfeta heqîqetê, ji gemarrî û qirêjayên maddî bête şûştin, pak û paqij bibe, dibe wekî neynikekî şeffaf ji tecellîya Nûra Wucûda Mûtleqa pîroz ra, ku însan bi wî rewşa xwe ya bi taybetî, di vî haletê îstîxraqî da, hem dikare wekî Hellac bibêje: "Enel-Heqq" hem jî dikare wekî Xanî bibêje: "Ez çar û neh û şeş bûm" min pala xwe da balîna Wucûda Mûtleqa sermedî û Semedî, ku ez bi wî bûm her tişt, bi wî baqî mam, bi wî bûm hemî kewn û kaînat. Çawan ku Îbnîl-Faridê jî gotîye:

وما زلت إيّاها وأيّاي لم تزل
ولا فرق بل ذاتي لذاتي أحبّتِ

"Ez her ew bûm ew jî her ez im, ferq di navbera me da tune, belkî zatê min ji zatê min hezkirîye

Ez çar û neh û şeş bûm: Ez du tew bûm (Ben "d.t.w" (دطو) oldum, ben büküldüm ve yatağa dayandım)

Tekye: Palvedan (dayanmak)
Balîn: Balîf, Behlîf ku divir da meqsed ji balînê, Wucûda mûtleqa Îlahî ye, Zatê Xweda ye. (yastık, dayanak, zati ilahi)

*****

Herçî ku me ber pê kir, hindî me nezer lê kir
Min seyrek li yêkê kir, lew mame di lewlîn da
(lewra me dil û dîn da)
Min dî heme yek pertew sarî di mezahir da
Mumkin heme jê pirr nûr, emma ne di temkîn da

ME'NA BÊJEYAN:
Herçî: Her çi tişt (her ne var, her şey)
Hindî: Çiqas, her çi ku heye, di çi demî da dibe (her an için ne varsa)
Nezer lê kir: Lê mêze kir, temaşa wî kir (ona bakinca, onu temaşa edince)
Seyrek: Temaşeyek (bir temaşa, bir bakış)
Li yêkê: Li yekî (bir taneye)
Lew: Lewra (çünkü, onun için)
Lewlîn: (c.lewlî) muşewweşbûyîn, mestbûyîn û serxweşbûyîn (sersemleşmek, mest ve serhoş olmak)
Lolîn: (c. lolî) Can sivikbûyîn û neşedar bûn (sevinçten dolayı çevik olma hali)
Me dil û dîn da: Me dilê xwe û dînê xwe da (gönlümüzü ve mukaddesatımızı verdik)
Heme: Hemî, tev li ser hev (hepsini, hep beraber)
Pertew: Pêt û şemal (Işın, şua)
Sarî: Têda dikişe, têda sereyan dike (sereyan eden)
Mezahir: (c.mezher) Xuyangeh, dîyargeh (bir şeyin göründüğü yer, tecelligâh)
Mumkin: Tiştê ku dibe bibe, dibe nebe jî, bibê – nebê, ji xeyrî Xweda her tişt. (Mümkün olan, Allah'tan maadası, Allah'tan başka herşey)
Emma: Lê, feqet (ama, lakin)
Temkîn: Di cîh da bûyîn, cîhgirtinî, sabitbûyîn û bingehîbûyîn. (yerinde sabitleşmiş ve yerleşmiş olmak)

ME'NA HEMÎ:
Herçî tiştên me berê xwe dayê, çiqas tiştên me lê mêze kir, me dît ku em li yek tiştekî mêze dikin, li yek tiştekî seyr û temaşa dikin, ku lewra jî em di lewlînê da man, (em ketin haletê heyret û îstîxraqê, sews û mest bûn) weyan, lewra jî me dil û dînî xwe (her tiştê xwe) li wî da, ji ber ku ji wî bêtir tu tişt tuneye, her tişt ew e û ew heye, divê ku her tiştên mirov jî li wî be û di rêya wî da feda bibe. Min dît ku hemî tişt yek pertew û şemalekî ne, di pirr xuyangehan da dixuyên, hemî mûmkînat (hemî tiştên heyî), ji wî pertewî da pirr nûr bûne, (wucûda xwe ji nûra wî girtine) lê ne di temkînê da ne (ne di bingehîtî û sabitbûyînê da ne, ne bingehî û sabit in, mûweqqet û dem-demî ne). Bi kurtî; her tişt mezher û tecellîgahên yek pertewekî ne, rengên yek tavekî ne, dengên yek avekî ne, pêl û lemên yek deryakî ne, bi wî ne, ji wî ne, li wî ne, bi xwe fanî ne, bi wî heyî ne, lê ne sabit û bingehî ne.

Sirrê wehdet ji ezel girtîye hetta bi ebed
Wahidek ferd e bi zatê xwe we nîne çu eded

Yeke derya tu bizan qencê çi mewc û çi hubab
Bi heqîqet ku hemî av e, çi av û çi cemed

- Mela -

******

Ew bû ku Zelêxayê îdînî di Yûsûf da
Mecnûnê di Leylayê, Ferhadê di Şîrîn da

ME'NA BÊJEYAN:
Zelêxa, Zelîxa, Zuleyxa: Ezîzeya Misrê ku bûye aşiqê Yûsûf Pêxember, çêroka wan di Qur'anê da heye. (Yusuf Peygambere aşık olan ve Kur'an da hikayesi geçen meşhur Mısır azizesi)
Yûsûf: Kurrê Ye'qûb pêxemberê cuhûyan ku qisseta wî, bi dirêjayî di Qur'anê da, di sûretê Yusuf da dibore (Yusuf Peygamber)
Îdînî: Dît, dîtibû (görmüştü)
Mecnûn: Bi me'na dîn û şît e, navê Qeysê kurrê Mûlewwihê 'Amirî ye, ku bûye aşiqê dotmama xwe ya Leylayê û helbesteyên dilsoz li ser wê ristîye. (Leylaya aşık olan meşhur Mecnun)

Ferhad: Aşiqê Şirînê ku dibêjin şirîn, jina Kesrayê duwemîn bûye, Ferhad jî yek ji mirovên Sera ya Kisra bûye ku ew jî bûye 'aşiqê Şirînê, çîroka wan jî meşhûr e, di wêjeya Kurdî û Farisî da cîhekî wanê bı taybetî û girîng heye.

ME'NA HEMÎ:
Ew pertew û ew nûr bû ku Zelîxayê di Yûsûf da, Mecnûn di Leylayê da, Ferhad di Şirînê da ewî pertewê dîtibûn, bûbûn 'aşiqên wan.

*****

Mîsbahê ebed min dî îrohe di qendîlê
Genca ezelî merkûz min dî di gil û tîn da

ME'NA BÊJEYAN:
Mîsbah: Çira (fener, lamba)
Mîsbahê ebed: Çira nûra herheyî (daima var olan ebedi varlışın feneri)
Îrohe: Îro, îro ye (bugün)
Qendîl: Çiradang, çiraxdan (lambalık)
Genc: Xizne, kenz (hazine, define)
Genca ezelî: Xizna herheyî, xezîna wucûda mûtleqa herheyî ya Îlahî (evveli olmayan hazine)
Merkûz: Bi cîhbûyî, xiznekirîbûyî (saklanılmış ve gizlenmiş olan)
Gil: Çamûr, av û ax (çamur, su ile toprak)
Tîn: Heraret, agir û hewa (hararet, ateş – hava birleşimi)

ME'NA HEMÎ:
Min çira pertewa nûra herheyî (çira lahûtî), îro di qendîla bedena Nasûtîya însan da dît, min ev jî dît ku xizna ezelî di gil û tîn da cîh girtîye (di van çar maddeyên bingehî da- di av û ax û hewa û agirda) bi cîh bûye, di nav wan da ye, ku ji wan jî numûneya heyatê ya herî kamil çêbûye, ku ew numûne jî qendîla heykelê însanî ye, mezher û neynika wî tecellîya Îlahî ye.
Ku Qur'anê jî di Sûretê Nûr, di Ayeta 35 da evî heqîqetê wiha teswîr û temsîl kirîye û gotîye:

الله نور السموات والأرض مثل نوره كمشكاة فيها مصباح المصباح في زجاجة الزجاجة كأنها كوكب دريّ يوقد من شجرة مباركة زيتونة لا شرقية ولا غربية يكاد زيتها يضيء ولو لم تمسسه نار نور على نور يهدى الله لنوره من يشاء ويضرب الله الأمثال للناس والله بكل شيء عليم.

("Xewda Nûra asîmanan û erdê ye (Nûra alema jêr û jor e – alema maddî û me'newî ye), rewş û mîsala wê Nûrê jî wekî qendîlekî ku çirakî têda ye, çira jî di şûşekî billor da ye ku tu dibêjî qeyê ew şûşe jî, stêrkekî ji durra ne, ew çira, ji donê darekî zeytûnê yê di navbera şerq û xerbê da vêketîye, donekî wilo şeffaf û hessas e ku hêj agir nêzîkî wî nabe pêdikeve û şu'le dide, nûr li ser nûrê ye. Xwedê kî bixwaze hidayetê bal nûra xwe ve dike, Xweda ji însanan ra mînakan beyan dike, û Xweda zana yê bi hemû tişta ye."

Ku **Mûhyyîddînê Erebî** tefsîr û şirova vî Ayetê wiha dike, dibêje: (Nûr, yek ji nav û nîşanên Xweda ye, bi me'na ewê ku bi xwe dixuyê û dîyar dibe, ku her tişt jî bi wî dixuyên û dîyar dibin, bı gotinekî din: Nûr, tecellîya Xweda bi navê Wî yê "Ez-Zahir"e, Nûra asîmanên rûhan û 'erdê cesed û bedena ne ku di sûretên hemû bûyînan da dîyar e, ew wucûd û hebûna mûtleq e ku hemû mewcûdat, her tişt bi wî çêbûne, ji wî peyda bûne, tecellî û tezahura wî ne.

"**Mişkat**" jî, îşaretê bal cesedê însan va ye, ku bi xwe tarî ye lê bi nûra rûh ronî bûye. "**Mîsbah**" jî, îşaretê bal qelb û dil va ye, **dar a zeytûnê** ya ku ne şerqî û ne xerbî ye jî, "Nefsa Qudsî" ye ku di navbera rojava 'alema cesedan û rojhilata 'alema rûhan da ye **Zeyt** û **donê** wî dara pîroz jî, îşaretê bal letaîf û qabilîyyet û îstî'dadên wî yên siroştî û fîtrî yên pîroz û mukemmel in.)

Ku bi angorê vê şirovekirina Mûhyyîddînê Erebî, xûlasa tefsîra wî Ayetê wiha ye: "Xweda Nûra asîmanên rûhan û zemînê cesed û bedena ye (yê alema xeyb û şehadetê ye).

Rewşa xuyabûn û dîyarbûyina Wî di wan mezahiran da (ku ew mezahir jî bi Wî xuya bûne) jî, wekî rewşa qendîlekî ye, ku ronahî û şemala rûhê wan, ji nefsa wana qudsî û pîroz da, daye qelb û dilê wan; qabilîyyet û îstî'dadên wî nefsa pak û pîroz, ji tecellî û teleqqî ya me'arîf û letaîfên Rebbanî ra jî, wilo tam û mûkemmel e ku hindik dimîne bê pêt û agirê rûh vêkeve, wekî stêrkekî durrî (Nûranî) şemal bide... Ew jî mînak û mîsala Nûra Xweda ye, ne ku heqîqeta wî ya pîroz û wala ye. Ku **Xanî** jî di vê helbesta xwe da:

"Misbahê ebed min dî îrohe di qendîlê
Genca ezelî merkuz min dî di gil û tîn da"

Bi kurtî, îşaretê bal wî Ayeta pîroz û wan tefsîr û şirovekirinên Îbnî Erebîyê va dike, ku xulasa me'na wî jî ev e: "Min ewî çira ebedî (tecellîya Xweda ya herheyî) îro di qendîlê da (di bedena nasûtîya însan da), dît, hem min evî jî dît ku, xizna ezelî (rûhê heyat û jîyana herheyî, "Rûhûllah"), di xwelî û çamûr û heraretê da ye, di her çar 'enasirên bingehî da ye, di wan da bi cîh bûye, têda hatiye veşartin.
Ku bi kurtî: Her tişt cilve û tecellî û tezahura wî wucûd û hebûna mûtleqa ezelî û ebedî ye, hemî 'alem, hemî kaînat pêl û leṃ û şapolên wî derya bê payan û bê binî ye.

******

Cana ji Cemala Te ez dê çi bibim sabir
Şeyxan û Ûlul-Ezman canê xwe dikalîn da

ME'NA BÊJEYAN:
Cana: Ey canê min, ey mehbûba min a ku tu wekî ruh û canê min î (canım sevgilim)
Cemal: Rindîtî û sipehîtî (güzellik, yüz güzelliği)
Çi bibim: Çawa bibim, bi çi awahî bibim (nasıl olaẏım)
Sabır: Sebirkher (sabreden)
Şeyxan: (c.şeyx) Pîr (büyükler, pirler)
Ûlû-l 'ezm: Xweyên 'ezm û îrade ya tam (azm ve kat'i karar sahipleri)
Ûlû-l 'îrfan: Xweyên îdrak û têgihîştinên durust û kamil (anlayış ve tecrübe sahibi olanlar)
Kalîn: Kale kal û nale nal, feryad û fîzar (melemek, inlemek, feryad ve fizar etmek)

ME'NA HEMÎ:
Ey yara min a ku tu can û jîyaṇa min î! Ezê çilo ji cemala te sebir bikim, bi çi awahî ji kul û derdên evîna bedewî ya te ya bê hemta û bê mîsal nekalim û nezarim, digel ku canên hemî pîrên kamil û

fazil, hemî ehlên 'îlm û 'îrfan û 'ezm û îradeya tam, ji hesreta dîdara cemala te di nalîn û kalin û feryad û fîzara derd û kulên te da ne.

Wek bulbulê dil derd û kulê, sîne fîgar in
Daynin ku li kîjan gulê, xwîn jê de dibarın
'Ezman, digirî halê me, 'ewran li me reş girt,
Şemdan vemirî, salê me çûn, şev reş û tar in
Şêl dane hinavên me, ku der bûne bi xwînê
Pêl dane ji çavên me, birîn kûr û xedar in
Eywah ! Feleka çepgerr û pişt qomik û bê bext
Werkir keleka bextê me, bê pişt û hewar in
Wek Yusifê Ken'anê li zîndana firaqê
Çav mane li karwanê Cîhanê bi fîzar in

(Durre - 29.01.1999)

Şêldane: Bi şûjinê, bi derzîya gir dirûtine

*****

Me'zûr e eger sofî bit mûnkirê mehbûban
Kor dê çi tesewwur ket sirra ku di dûrbînda

ME'NA BÊJEYAN:

Me'zûr e: Xweyî uzr e, bihana lêborîna wî heye (özrü geçerli olan, af edilmeyi hak edendir)
Sofî: Sofîyê şêxan, murîdê wan, derwêşên belengaz û bê îz'an (tarikat üyesi derviş)
Bit: Bibe (olsa)
Munkir: Înkarkher, dij (inkar eden)
Mehbûb: (yar, sevgili)
Bit munkirê mehbûban: Bibe munkirê îşqa mehbûban înkarîya wan bike (mahbupların aşkını inkar edecek olsa)
Tesewwur: Anîna şekl û sûretê tiştekî di hişda, fêmkirin û têgihîştina wî (bir şeyi zihinde şekillendirmek, tasarlamak)
Sirr: Raz, tişta xef, hîkmet (gizli nesne)
Dûrbîn: Dûr dîtin, dûrdîtok, aletê dûr dîtinê (uzağı görmek, uzağı yakın gösteren alet)

ME'NA HEMÎ:
Eger ku sofîyê zahirperest, derwêşê bê hiş û bê mentiq û mest, înkarîyâ mehbûban, ya bedew û rindan, ya îşq û mehebbeta wan bike, qebûl neke ew me'zûr e, lewra ew kor e, nikare heqîqetê bibîne, besîret û îdraka wî ya qelbî û me'newî, tesewwura wî ya dûrbînî tuneye, ew nikare sirrên ku di dûrbînîtî û dûrbînê da ne bibîne û tesewwura wan bike. (nikare pertewa nûra Cemala Îlahî ya ku di mehbûban da dixûyê û di wan da tecellî kirîye) bibîne û bigihîje wî îlm û îrfana kûr û dûr ku lewra hem bê hiş û gêj e hem jî kerê guhdirêj e, çawan ku Melayê Cizîrî jî dibêje:

Camid çikin bi husnê ku wan nezer li xwar e
Xerteb'et in di ebleh, çi nêrgiz û çi kerbeş

Kor e, xwe nasipêrit carek bi dest delîlan
Ebleh çiket tewafê, ew nabînit berê reş

Yanê; yên serhişk û bê îdrak û bê besîret, dê bi rindîtî û bedewîtîyê çibikin (jê fêm nakin). Meqam û merteba bedewîtî û rindayê derece û meqamekî bilind e, nêrîn û dîtina serhişk û bê hişan jî, li jêr e, nivz e. (li 'alema maddîya suflî ye) Ji ber ku ew tebîetker in, li ba kerê jî ferqa di navbera kulîlka nêrgiz û kerbeşê (Stirîblloqê) da tuneye, hetta Stirîblloq li ba wan meqbûltir e, hem kor e hem jî xwe nasipêre kesên ku wî îrşad bike, eblehe jî, ji tewafa Ke'bê fêm nake, kevirê reş (Hecerul-Eswedê) jî nabîne. (caşikê keran e wesselam!)

*****

Şahid bî tu ey zahid! Mehbûbî perest im ez
Bê şahid û mey nabim, şêxê me ev ayîn da

ME'NA BÊJEYAN:
Şahid: (tanık)
Şahid: Ew mehbûba ku daîma li pêş çava ye, di hiş û qelbê mirov da ye. (her zaman hazır ve nazır olan akıl ve kalbten çıkmayan sevgili)

Şêxê me: Pîr û murşidê me yê kamil (kamil olan pirimiz)
Ayîn: Qanûn û nîzam, rê û rêzik (usul ve adab)

ME'NA HEMÎ:
Ey zahid û sofî û derwêşê serhişk û bêhiş tu şahid be ku ez mehbûbperest im (ez ji bedew û rinda heqîqî ya ku di sûretên hemû rind û bedewan da tecellî kirîye û dixûyê îbadet dikim), serê xwe ji cemala wî ya bê hem ta û bê mîsal ra datînim, ez tu demî, tu wextî bê mehbûb û bê mey (bê badeya îşqa husn û cemala wê û me'rîfeta zatê wê) nabim û bê wî nikarin bijîm. Ji ber ku hebûn û jîyana min, her tiştê min -her wekî hemî 'alemê- girêdayê bi wî va ye, ji wî ye, li wî ye. Ew tîp û herf e, ez xal û noqte me, ew nûr e, ez perde me, ew heye, ez tune me. Şêx û murşidê me jî, evî ayîn û te'lîm û rê û rêzikê daye me, wesselam...!

******

Canî ji te ey Xanî cana ku bi xwazîtin
Xa noqte li bin danî fil-halî di hêlîn da

ME'NA BÊJEYAN:
Canî: Canekî, rûhekî (bir can, bir ruh)
Cana: Ey mehbûba canê min, canê canan (ey canım sevgilim)
Xa: Tîp û pêteka "X" (خ)ya Xanî yê (Xanî kelimesindeki olan -X- (خ) harfi)
Noqte li bin danî: Ku noqta wî li binî ye (yanê, herfa ewwila di kelîma **Xanî** yê da ku noqta wî li binî ye) ku dibe "Cîm" (ج), bi wî awahî Xanî jî, dibe "Canî": Ku ew jî bi me'na can û rûhek e. (Xani kelimesindeki olan "X" harfinin noktası alta geldiğinde "Cani" olur ki o da bir can ve bir ruh anlamına gelir)
Hêlîn: (Kuş yuvası, ruhun yuvası olan beden.)

ME'NA HEMÎ:
Ey Xanî! Eger canê canan (mehbûba te), can û rûhekî ji te bixwaze, Xanî ya ku noqta -X- ya wî, li binî wî danîye di hêlîna

bedena te da veşartîye, tu ewî canî, ewî teyrikê pîrozê rebbanî, ji wî hêlîn û wî kanî, ji wî qefesa cismanî, derhal derxe û pêşkêşê wê bike! (canê xwe bide wê). **Xanî** bi vî te'bîr û teswîra lexezwarî, îşaretê bal me'nakî felsefîyê herî deqîq û kûr û dûr dike ku îzaha wî wiha ye: "Çawan ku ferqa di navbera tîp û pêteka (Xê = خ) û (Cîmê = ج) da, bi guhestina cîyê noqteya wan e, ji wî bêtir tu ferq û cudaîyekî din, di navbera wan da tuneye, (pêteka –Xê-, herfa ewwilê kelîma "Xak"ê ye, îşaretê bal 'alema Xakî û maddî va ye, pêteka "Cîm"ê jî, herfa ewwilê bêjeya "Canê" ye ku ew jî, bi me'na rûh e û mebestê alema rûhanî û me'newî ye), ferqa di navbera can û canan da (di navbera aşiq û me'şûqê da, Xaliq û mexlûqê da) jî, wilo ye. (Bi guhestina yek noqte û yek reşîtîyekî ye), Ji ber ku wucûd û hebûn, di heddê zatê xwe da yek tiştek e, ew jî ew wucûda mûtleqa ezelî û ebedî ye, ew wucûda pîroz, dema ku di sûretên maddî da (di sûretên kewnî da) dîyar bibe, reşî û noqte û nîşana Xakî (maddî) dikişîne ser xwe û di binê wê perda piçûçika maddî da -ku di hukmê tunetîyê da ye-, di çirûse û dibiriqe, ku ew di wî demê da bi navê "**Masûwa**" yê, bi navê alema şehadet û xelq û îmkanê, navdêr dibe û tecellî dike, lê dema ku ew perdê (ew reşî ya maddî) bi pişt va bête kişandin, bikeve binê wî wucûda mûtleqa pîroz û ji para bikeve, di wê demê da, ew wucûda mûtleqa pîroz bi navê "Ehed û Semed û Mûtleq", bi navê alema "Ceberûr", 'alema "Esma û Sifatên Îlahî", navdêr dibe, bi çavên 'eql û besîretê ew şemal û ew cemala wî ya lahûtî ya bê payan û bê çend û bê çûn û çilo, dîyar dibe, tê dîtin û îdrak kirin; yanê bi kurtî: Di neynika wî wucûda mûtleqqa pîroz da her du sûretên wî (sûretê wî yê nasûtî û lahûtî) bi hev ra dîyar dibin û dixuyên ku di heqîqet da (bi ferq û cudaîya yek noqteyekî piçûçik), yek tiştek in; dudutî û pirrîtî, nisbî û angoreî ye (her wekî ku cemed tezahura avê ye, av û cemed yek tiştek in, cudaîya wan ji hev ferezî û angorî ye) çawan ku Melayê Cizîrî jî bi serîhî û vekirî gotîye:

Aşiq û me'şûqê El-Heqq herdû mîr'atê yek in
Lew di eslê cem'î da eslê qedîm ayîne bû

Nuqte yê îlm û sewadê herf û neqşê alemê
Ser didin me'nayekî, eslê sewadê nuqte bû.

Îbnu-l Farid jî wiha dibêje:

وما زلت إيّاها وأيّاي لم تزل
ولا فرق بل ذاتي لذاتي أحبّتِ

"Ew her ez im, ez jî her ew im, tu ferq û cudaîyek di navbera me da tuneye, em yek tiştek in, wilo yek in ku zatê min ji zatê min hez kirîye. (aşiq jî ez im, me'şûq jî ez im, em yek tiştek in, yek tiştek bi tenê heye ew jî ew e wesselam!)".

Ya Rebbî! Tu me ji feyz û bereketa van fazil û kamilan, ji Rehmet û şefqet û înayeta xwe ya ezelî mehrûm û bê par nekî, me û gelê Kurdistanê yê mezlûm, ji zulm û zor û bêdadî û bindestîyê riha û aza bikî. Amîn...!!

*****

EY WAHIDÊ PÎNHAN

Ey wahidê pînhan ku ji zatê Te ne peyda.
Ev kewn û mekan, erd û sema kûnbedê xedra.

Erwah û ûkûl, Enfûs û E'raz û Cewahîr
Halîn û mûsewwer, ne Mehell û ne Heyûla
Lewh û Qelem û Kursî û 'Erş, Encum û Eflak
Hem agir û hem ax û hewa,cumleyê eşya
Sed qafîle mewcûd û peyapey,mutewatir
Her lehze ji Sehra yê edem tên bi temenna
Hin, neqdê fenayê diguhorin bi beqayê
Hin, neqdê wucûda xwe dikin bê bedel îfna
Her yek bi wucûda xwe wucûda Te dixwazin
Bil cumle xirîdarê cemala Te ne heqqa
Lew şuphet ê pîra bi hewes talibê Yûsif
Dor hatîye 'Xanî' kelefa rîsê di desta
Ew jî bi meta ê xwe qumaşê Te di xwazit
Sûbhaneke len tu'yîse mîn rewhîke eb'da

ME'NA BÊJEYAN:

Wahid: Yekê bi tenê, Zatê Xweda digel sifatên Wî ku Ehed jî, Zatê bi tenê yê bê îtîbara sifatan e. (Bir ve tek olan)

Pînhan: Veşartî, xef (gizli)

Peyda: Jêderbûyî, hasil bûyî, hatîye wucûdê (mevcut,var olan, oluşan)

Kewn: Bûyîn, (tehwîla quwwetê bal madde yê va) ku ew tehwîl, sûretê Heyûla yê seretaî ye. (oluş, kuvvetin maddeye dönüşmesi ki o dönüşme Heyula'nın ilk suretidir.)

Mekan: Cî û War, Heyûlaya ku mekanê sûretê ye (yer, suretin yeri olan Heyula)

'Erd û Sema: Zemîn û 'Asîman (yer ile gök)

Kunbed: Qubbe, (kumbet)

Xedra: Hêşîn (mavi)

Kunbedê Xedra: Kunbeta hêşîn, Gerdûn, Asîman (Mavi kumbet olan gök)

Erwah: (c. Rûh): Can. (Ruhlar,canlar)

'Ûqûl: (c. 'eql) hişş. (akıllar)
Nufûs: (c. nefs) Xwe. (kendi, öz,nefisler)
E'raz: (c. 'erez) tiştên kû bi xwe qaîm nînin. (başkasıyla var olan,husula gelebilen)
Cewahir: (c.Cewher) tiştê kû bi xwe qaîmin. (Cevherler, kendi kendine varlığı olan, arazın zıddı)
Hal: Rewş û Halet û Keyfîyet.
Mûsewwer: Bi sûretbûyî, bi şekilbûyî (suretlendirilmiş olan)
Mehel: Cî û War (yer ve mekan)
Heyûla (hyle)**:** Madda bingehî, madda seretaî ya ku bê sûret dîyar nabe (cevheri ferd,cüz'i layetecezza)
Lewh: Texte, texteyê nivîsarê (yazı tahtası)
Qelem: Xame, pê nivîs (kalem)
Kursî: Rûniştek (oturak, koltuk, mecazi manada saltanat kudret ve mülk)
'Erş: Text, textê Padîşahîtîyê û deselatîyê. (di îstilaha tesewwûfê da: **'Erş û Kursî û Lewh û Qelem...** navên mexlûqê Xwedêyê seretaîye ku 'eqlê ewwele, 'eqlê ewwel jî, ji tecellîya Xweda ya seretayî peyda bû ye, tecelîya Wî ya seretayî jî gihîştina îlmê Zatê Wî bi Zatê Wî ye; îşq û mehebbeta Zatê Wî ji Zatê Wî ra ye) (Allah'ın Arşı, saltanat ve hükümranlık ve ilk mahluku olan aklı evvel)
Encum : (c. necm):Stêrk (yıldızlar)
Eflak (c.felek) : Cî yên kû stêrk û gerroke tê da di gerin (yıldız ve seyyarelerin yörüngeleri, felekler)
Cumle: Hemû, hemî (hepsi birlikte)
Eşya: (c. şey'): Tişt
Qafîle: karwan(kafileler)
Mewcûd: Heyî (var oaln)
Peyapey: Li pey hev (biribiri ardına)
Mutewatir: Zincîrane (yaygın ve biribiri ardınca peyda olan)
Lehze: An, demeka pirr hindik (çok kısa bir zaman birimi)
Sehra: Deşta mezin (çöl)
Edem: tunnetî, neyînî (yokluk, yok olma hali)
Temenna: Minnetdarî, sipasî, îhtiram (eli alnına götürerek selamlama işareti yapma, minnetdar olma)
Hin: Hinek, (bir kısım)
Neqd: Pol û pere, nerx, dirav (para, akçe)

Fena: tuneyî,tunetî (yokluk yok olma)
Diguhorin: Diguherin, diguhêzin (değiştiriyorlar, takas ediyorlar)
Beqa, biqa: Her mayîn, her hebûnî (devamlı var olmak)
Wucûda xwe: Hebûna xwe (kendi varlığını)
Bê bedel: Badîhewa, bê biha (bedeva, bedelsız, karşılıksız)
Îfna: Tune kirin (yok etmek)
Bilcumle: Bi tevayî (toptan,hepsi)
Xirîdar: Kirînker, muşterî (alıcı)
Cemal: Rindayî, bedewî, xweşiktî (güzellik,parlaklık)
Heqqa: Elheqq, bê guman (gerçek olan)
Şubhet: Mîna, wek (benzer, gibi)
Bi hewes: Bi xwestek (hevesli, istekli)
Talib: Xwestekar (istekli)
Kelef: Qevdezîk, giloka rîsê badayî (yün ipliği yumağı)
Kelefa rîs: Perçe yê giloka rîs (iplik yumaşı)
Yûsûf: Yûsif Pêxemberê kurê Yakûb Pêxemberê kurê Îshak Pêxemberê cuhûyan. Dibêjin; dema ku ji boy firotanê, Yûsif Pêxember li Misrê derdixin bazara koleyan, pîrekî Misrî gloka rîsê xwe hildide destê xwe û tê ku bi wî giloka rîsê xwe Yûsif Pêxember ji xwe ra bikire. Ku di çavê wê pîrê da, ew perçe yê gloka rîsê wê, biha yê Yûsuf Pêxember bû ye.
Meta': Kel û pel, sermaye, mal û pere (ticaret malı,eşya,mal ve mülk)
Sûbhaneke: Tu Pak û Paqij û Pîrozî (Münezzeh ve kusursuzsun)
Lentû'yîse: Tu bê hêvî û bê par nakî (ümitsiz ve paysız etmiorsun)
Min rewhîke: Ji fezl û kerema xwe, ji dilovanî ya xwe (fazlından ve kereminden)
Ebda: Tu bendeyî, tu kesî (hiç bir kulu)yanê: Tu munezzeh û Pîroz î, Tu tu 'ebdekî xwe ji fezl û kerema xwe mehrûm û bê par nakî, dora kî kû were Tu ewî nî'metê tecellîya xwe ya Pîroz didî wî, di wî da tecellî dikî û têda dîyar dibî, ewî digerînî dîyargeha wî Cemala xwe ya Pîroz. Her wekî ku dema dora Xanî jî hat, Te ewî fezl û îhsana xwe pê ra kir, Tu di wî da tecellî bûyî, ew jî bû tecellîgaha wî Cemala Te ya Pîroz, bi wî muşerref û bextîyar û pîroz bû.

ME'NA HEMÎ:

Ey ew yekê bi tenê yê (eşkera û veşartî) kû ev kewn û mekan û erd û asîman (alema jêr û jor,) kumbeta hêşîn û bê payan,hemî rûh û can,hemî eql û nefs û gewher û erezên wan, (bi kurtî: Hemî alem û hebûn, her tişt), rewş û hal û keyfîyetin, mezahir û mîsalin hatine teswîr kirin,(bi şekl û sûret bûne) Kû di heddê Zatê xwe da, tunene, ne cî ne, ne madde ne, belkî tezahurat û tecellîyatên Zatê Te ne,nav û nîşan û esma û sifatên We ne, Lewh û Qelem û Erş û Kursî û stêrk û Felek û agir û ax û av û hewa jî, (bi kurtî: hemî eşya), bi sedan Qafîle û karwanin,li pey hev zincîl bûne û di her lehze û her anîda ji deşta tunebûnê, bi îhtîram û temenna tên,kû hinek ji wan, nerxên xweyên tunetîyê, bi hebûnê di guherin. (Ji tunetîyê tên hebûnê) hinekên din jî,nerx û sermayeyên hebûna xwe, bi tunetîyê di guhezin û îfna dikin. (tune dibin), her yek ji wan bi hebûna xwe, hebûna Te dixwazin, hemî jî, muşterî yên Cemala Te ne. Lewra ku dema dora Xanî jî,(wek wî pîre jina Misrîya pirr bi hewesa kû bi Giloka rîsê xwe, talibê kirîna Yusif Pêxember bû) hatîye, ewî jî, kelefa rîsê xwe daye destê xwe, bi wî sermaye û meta ê xwe, qumaşê Te ji xwe ra di xwaze, kû Tû jî, pirr pak û pîroz î.

Tu kesî, ji feyza xwe, ji fezl û kerema xwe, mehrûm û bê par nakî. (Te Xanî jî bê par nekirîye, ji nî'metê tecellîya cemala xwe, Te parawî jî daye)

- 'ERŞÊ MÛELLA -

Ey ayîne yê dil bi Cemala Te mûcella
Sed sefhe bi yek zerre ji nûra Te mûtella
Însan, Te ji bo alemê Kubra kire nûsxe
Lew mudxeyekî jê Tu dikî Erşê mûella
Wehdet bi heseb kisretê e'yanê mezahir
Her so bi sifatan diketin keşfê tecella
Lew muxtelefîl-qewl û emel bûne xelaîq
Kafîr, ji senem bûne bi navê Te tesella
Sirra xwe nîhanî ku Te da Ehmedê Xanî
Ez xeyrê berî şud, be Ti awerdî tewella
.....

Ey ayîne ê dil bi Cemala Te mûcella
Sed sefhe bi yek zerre ji nûra Te mûtella
Însan, Te ji bo alemê Kubra kire nûsxe
Lew mudxeyekî jê Tu dikî Erşê mûella

MENA BÊJEYAN:
Ayîne yê dil: 'Eynik û neynika dil (gönül aynası)
Mûcella: muşt û mal, cilakirî, (parlak,cılalı)
Sed sefhe: Sed rûpel û lewhe,pırr rûpel (yüzlerce sayfa)
Mûtella: Zêrkeş, avzêrkirî, xweşikbûyî, (yaldızlanmış olan)
Alemê Kubra: 'Alema herî mezin (en büyük alem,kainat)
Nûsxe: Sûret û numûne (yazılı şey, yazılı bir şeyden çıkarılan örnek)
Mûdxe ye kî : Cûme kî, perçekî goşt (bir çiğnem et, et parçası)
'Erşê Mûella: Textê bilind (Yüce ve yüksek arş, taht serir) ku meqsed ji wî cûma goşt qelb û dilê însane. Lewra di hedîsekî qudsîda, Xwedê wiha gotîye: 'Erd û Asîmanê min, nikare min di xwe da bi cîh bike, di xwe da bigire, lê dilê 'ebdê minê bawerker, min di xwe da digire û bi cîh dike. (Mû'cem el Mûstelehatî-s Sofîyye, sh.127)

ME'NA HEMÎ:
Ey ew Xweda yê kû neynika dil û can, bi rindîtî û espehîtîya Te hatîye cîla kirin, pirr rûpel û sehîfe, bi yek zerrekî ji nûra Te avzêr

bûne û neqişîne (Bi wî cîlaya me'newî ya nûra Cemala Te, pirr sefhe û rûpel berraq û nûranî, bûne). Te însan ji kitêba kaînatê ra kirîye wekî nusxeyekî (hemî alemê tê da bi cîh kirîye), ji vî ye jî ku Te yek cûmekî goşt (qelb û dilê însan), kirî ye text û 'erşê xwe (kirî ye tecellîgaha xwe).

Erwahê mûqaddes şebê qedra Te di xwazin
Nûra Te ye nûsbahê di qendîlê herem da

- Mela -

(Rûhên pîroz, şeva leyletulqedra wisala Te dixwazin; nûra Te ye ku wekî fenera di Qendîla herêma pîrozda ye).

Tenha ne li min lamî'ê husna Te şefeq da
'Alem hemî wî husn û cemalê di xwe da girt

- Mela -

(Ne ku li min bi tenê şu'la rindaya Te şefeq daye (tecellî bûye) Belkî ewê husn û cemala Te, hemî alemê di xwe da girt (hemî alem ji Wî behremend bûye)

Me'na yê îşqê bêm çîye, lew min bi çeşmê dil dîye
'Eksa cemalek safîye, lamî' di mir'ata me da

- Mela -

(Werin ! ez ji we ra bêjim ku me'na 'îşqê çîye ? Ji ber ku min ewî, bi çavê dilê xwe dîye: Ku ew 'eks û şemala cemalekî safîye, şû'la wî di neynika me da dîyar bûye).

******

Wehdet bi heseb kisretê 'eyanê mezahir
Her so bi sifatan diketin keşfê tecella

ME'NA BÊJEYAN:
Wehdet: Yekîtî, yek bi tenêtî (birlik yalnızlık, ortaşı olmamak)
Bi heseb: Bi angorî, bi wî terzî, bi awa yî ku (göre, ona göre)

Kisret: Pirrîtî, pirrayîtî (çokluk ve bolluk)
'Eyan: (c. eyn) xwe, zat, heqîqet (eşyanın hakikat ve mahiyetleri, kendisi)
Mezahir: Xûyange, dîyargeh (bir şeyin göründüğü, ızhar olunduğu yer, Cenabi Hakkın tecellisine mazhar olan şey).
Her so: Her alî, her lay (her taraf)
Sifat (c.sifet): reng û rewş (sıfatlar, vasıflar)
Diketin keşf: Derdixin meydanê, eşkera dikin (ortaya çıkarırlar)
Tecella: Xûyabûyîn, (tecelli,görünme, ilahi kudretın meydana çıkması).

ME'NA HEMÎ:
Wehdet bi vî terz û awayî ye ku hemî e'yan (hertişt) xuyangehên sîfatane, nav û nîşanên yekî bitenê ne; kesret û pirrîtîya wan mezahirê sîfatan li her alîyan, tecellîya wan sîfatan kifş dikin (eşkere nîşan didin)
Yanê: her tişt, hemî kaînat mezherê sîfatên yekê bitenê ne; her yek her tiştek, mezherê yek sîfatekî ji sîfatên **Xweda** ne (neynikên tecellîya roja wehdetê ne), ewî nîşan didin (bûne nav û nîşanên wî); di her yekî ji wan da, sîfetekî ji sîfatên **Xwedê** tecellî kirîye, ku lewra jî mexlûqat mûxtelif bûne, cûr-be-cûr çê bûne..

*****

Lew mûxtelîfî-l qewl û 'emel bûne xelaîq
Kafir ji senem bûne bi navê Te tesella

ME'NA BÊJEYAN:
Lew: Lewra (o sebebten, ondan dolayı)
Mûxtelîf: Ne wek hev, cûr be cûr (ayrı ayrı, değişik)
Qewl: Gotin, bawerî (söz, itikat)
'Emel: Kir û kar (iş, çalışma, iş işleme)
Mûxtelîfî-l qewl û 'emel: Yên kû gotin û kirinên wan ji hev cuda cudane (söz ile yaptıkları çeşitli ve deşişik olan)
Xelaîq: (c.xelîqe) Çêbûnek, aferînok, aferînende (yaratıklar, mahlukat)
Senem: Pût (put ve heykel)
Tesella: Tesellî, pê bêhin derketin, pê kêf xweş bûyîn (avunma, ferahlanma, teselli olma)

ME'NA HEMÎ:
Ji wî mezherîyyeta ji sifatên Te yên cûrbecûr da ye jî ku mexlûqat di kir û karên xwe da, di bîr û bawerê yên xwe da, ji hev cuda-cuda ne, cûr-becûr in, kafir jî bi navê Te, ji pûtê xwe da bi tesellî ne (pê kêf xweşin).
Yanê: Her kes, her tişt mezher û xûyangehê yek ji sifatên Te ne, kesên îtaetkar mezherên sifetê **Hadî û Mûhdî** ne, kesên asî û gunehkar jî, mezher û xûyangehê Sifetê '**Mûdîll**' (gumrahker) in, kafirên pûtperest jî, ji pûtên xwe bi navê Te tesellî bûne, (di pûtên xwe da Te dîtine ku bi wî tesellî bûne). (العاصى والمطيع أمام الحق سواء)(*)

*****

Sirra xwe nîhanî ku Te da 'Ehmedê Xanî'
Ez xeyrê berî şud, be To awerdî tewella

ME'NA BÊJEYAN:
Sirr: Raz, penamegî (gizli olan, sır)
Nîhanî: Bi dizî, xef (gizlice)
Ez xeyrê: Ji masîwayê Te, ji bêtirî Te (başkasından)
Berî şud: Xilas bû, pak û paqij bû (kurtuldu, arındı)
Be To: Bi Te (sana, seninle)
Awerdî: Anî (getirdi)
Tewella: Î'tîmad, sipartin (dayanmak, güvenmek)

ME'NA HEMÎ:
Dema kû Te bi dizî, sirra xwe pêşkêşî Ehmedê Xanî kir, ew ji xeyrî Te (ji masîwayê Te) berî bû, tewekkul û îtîmada xwe da ser Te, yanê:dema kû Te bi dizî sirrê wehdetulwucûdê (sirrê ku kaînat hemî tecellîya wucûda mûtleqa îlahîye, masîwayê wî tune û fanîye) da Ehmedê Xanî, ji wî sirrî, Te ewî agahdar kir, ew ji masîwayê Te, ji xeyrê Te xilas bûye û xwe sipartîye Te.
ومن يتوكّل على الله فهوَ حسبه (We kî ku tewekkula xwe bide ser Xwedê, (xwe bi temamî bispêre Wî) Ew besê wî ye. (Telaq / 3)

*****

(*) Ji kerema xwe ! li rûpela 98 an, behsa felsefa wehdetî-l wucûdê mêze bikin !

- SERWA ME -

Serwa me bi sed reng û hezar îşwe û meş hat
'Aşiq kirin Îhya li reqîban ku nexweş hat

Sunbul kemilandin, Gul û lale xemilandin
Reyhan şetilandin, li gulan taze binefş hat

Ten derve nebû qet, nedida bextê kuşadek
Rû da me şukur! Ke'be yê tali' me du şeş hat

Pê dane firengî û nîlo, hatine romî
(Peydane)
Şukrane, nîhane ji ereb hem ji hebeş hat

Reştozê xwe Nûbar e meger koşe dixwazin
Tîra koşeyî da te, hedef girt û bi keş hat
Yan hat û bi nava dilî ket, qet nediwesta
Lewra ku ji ber qewsê me dî zêde bi weş hat
Xanî! Bese bê arî çi ra zêdeyê salan
Îsal e ji xwe tali' û bextê nebireş hat
.....
Serwa me bi sed reng û hezar îşwe û meş hat
Aşiq kirin Îhya li reqîban ku nexweş hat

ME'NA BÊJEYAN:
Serw: Navê darekî xweşike, ku bejn û balên mehbûban pê tê şebihandin (selvi aşacı, sevgilinin boyu, posu)
Îşwe, Eşwe: Naz û delalî, lence, lare (güzellerin çekici naz ve edası, gönül çekici tavır)
Ehya (c.heyy): Yên sax (canlılar, diri olanlar)
Îhya: Saxkirin (diriltmek, canlandırmak)
Reqîban: (c. Reqîb) Hawçav, çavlêbûyî, hempa, hempayîxwaz (rekabet eden)

ME'NA HEMÎ:
Yar û mehbûba mina bejin serwî (selwî) bi sed reng û rewşan, bi hezar cîlwe û nazî yan meşîya û hat ku Evîndarên xwe sax kirin, (bi wan nazî û delalîyên xwe, rûh û can da wan) ku ew li hempa û çavnebar û çavlêyan ne xweş hat, pê aciz bûn û hesûdî kirin.

******

Sunbul kemilandin, Gul û lale xemilandin
Reyhan şetilandin li rexan taze binefş hat

ME'NA BÊJEYAN:
Şetilandin, Şitilandin: Sitil kirin, şitlî wî danîn, wek şitlû fîdanên daran çikandin (fidanlar diktiler, reyhanları fide gibi diktiler)
Rexan (Rex): Teref, kenar, derûdor (yanlar, taraflar)
Binefş: (menekşe)

ME'NA HEMÎ:
Yara min, bisk û zulf û kakulên xweyên wekî sunbulan, dêmên xweyê wekî lale û gulan, kemilandin û xemilandin, reyhan şitilandin û nitirandin ku li rexên wan, binefşokê taze hatin, li rexê wî pozê wê yê pîjîn ku wekî şitlê rihanê ye, çavên wê yên ku wekî hercaîl û binefşokê ne, hatin. Yanê: Bisk û qiştên wê yarê wekî sunbula ne, dêm û dev û lêvên wê, wekî lale û sorgulane, pozê wê, wekî şitlê rihanê ye, li rexên wî jî binefşokên çavên wê ne (çavên wê jî wekî binefşokane).

******

Ten derve nebû qet, ne dida bextê kuşadek
Rû da me, şukur! Ke'be yê tali' me duşeş hat

ME'NA BÊJEYAN:
Ten: Beden, wucûd. (beden, insan bedeninin dış yüzü)
Derve nebû: Derneket derva. (dışarı çıkmadı)
Qet: Qet'a, bi tu awayî. (asla, hiçbir zaman)
Kuşadek: Kêfxwesî û zeferû vebûnek (bir açılış, bir ferahlık)
Rû da me: Qiymet da me, berî da me, îltîfatkir. (yüz verdi)
Ke'be: kapên çargoşe yên lîstika şeşûbêşê. (tavla zarı)
Duşeş: Şeş û şeş, du caran şeş. (iki altılık, tavla oyununda iki defa altı gelmesi)

ME'NA HEMÎ:
Bedena wê yara min qet derneket derva, qet dîyar nebû. Lê şukur ji Xwedê ra! vê carê rûyê xwe nîşanê me da, ku kapên tali û bextê me duşeş hat. Bext û tali ê me vê carê rind hat, ku me rûyê yarê dît, em pê bextîyar bûn.

******

Pê dane firengan û nîlo, hatine romî
(peydane)
Şukrane, nihane ji ereb hem ji hebeş hat

ME'NA BÊJEYAN:
Pêdane: Bi serdane, pêda hatine. (yukarıdan aşağıya sarkmışlar)
Peydane: Li peyin. (arkasındalar, rahat bırakmıyorlar, takip ediyorlar)
Firengan (fireng): Gel û kesên fireng, (Ewrûpaî), tiştên firengî. (avrupalılar, avrupa malı)
Nîlo: Hêşîn, kesên çavhêşên. (mavi gökrengi, mavi gözlü)
Romî: Tirk, (Roma reş; tirkên osmanî), eşya û tiştên wan. (halk dilinde Türk, Türk ve Rum malı)
Şukrane: Şukr û sipase, sipas kirine. (şükran ve minnettarlık)
Nîhane: Veşartîye, bi dizî (gizlice, gizli)

ME'NA HEMÎ:
Serpoş û şar û temezî û gulikû şirrikû xemlû xîşrên (ku ji mal û raçendeyên Firengên Romên e, we yan wek Rengên wanîn)bi ser Rûyê wê serwî bala minda hatine. Ez şukrû sipas dikim ku rûyê wê bi dizî, ji binê perda zulf û biskên wê yên wek 'erebên Hebeşî yên reş, hat der û dîyar bû, ku carekbe jî, dîtina wî bû nesîbê me.
(Yanê: Her çiqas ku Rûyê wê yara mina heqîqî ku Kurdistan e, ji binê perda Reşa dagirkerî û deselatîya Erebên Rûreş, derketîye (ku di dema Xanî da Kurdistan di binê deselatîya Osmanîyên turanî û şîeyên Îranî da bû). Lê vê demê jî di binê deselatîya çavhêşînên Sefewîyên îranî û roma reş (tirkên Osmanî) da ye. Vê carê jî ew wekî gurên har ketine pey wê. Ku di bawerîya min da Xanî, bi zumnî (sergirtî), vê me'na yê jî îfade û îşaret kirîye. Herwekî adetê xwe yê di pirr Cîhan da, ku "bi kevirekî du kêlan bihevra verdigerîne").

******

Reştozê xwe Nûbare meger koşe dixwazin
Tîra koşeyî da te, hedef girt û bi keş hat
(ku şehî)

ME'NA BÊJEYAN:
Reştoz: Tebîet reş, xilqet reş ku mebestê ebrûyên reşên wekî kevana ne. (siyah yaradışlı kaş)

Nûbar: Cûrekî ji kevanane ku çend tîran bi hewra davêjin. (birkaç oku birlikte atan bir cins yay)
Meger: Herhal, di be ku. (meğer, ancak, şu kadar ki)
Koşe: Terefû koşeyên tiştan, qunc (köşe). (köşeden atılan ok, göz köşesinden atılan ok, göz altından bakış)
Date: Li te da, berda te. (sana attığı ok)
Hedef: Armanc (hedef)
Hedef girt: Armanca xwe girt (hedef tuttu)
Keş: Zih kişandin, binçeng. (yayı çekmek, kol altı, yan köşe)
Bi keş: Bi kişandin, bi zih. (gerilme ile)
Hat: (geldi)
Bi keş hat: Bi aliyê bin çengêda hat. (kol altı tarafına yöneldi)

ME'NA HEMÎ:
Wisa duxyê ku kevanên xwe, ji cûrên kevanên nubar in, koşeyan dixwazin, ku ji wan kevananda tîrên koşeyî (awirên koşexwazên ku ji koşeyên çavan da tên) li te dane û te ji xwera hedef gerandine, bi keşû zîh tên. (we yan ew bi alîyê binçengandan tên, li bin çengan dikevin).

*****

Yan hat û bi nêva dilî ket, qet ne di westa
Lewra ku ji ber qewsê me dî, zêde biweş hat

ME'NA BÊJEYAN:
Nêva: Nava. (içine, ortasına)
Qet: Bi tu awayî. (asla, hiçbir zaman)
Ne di westa: Ne di westîya, ne di sikinî (durmaz ve yorulmazdı)
Qews: Kevan. (yay)
Zêde biweş: Pirr bi quwwet. (çok kuvvetli)

ME'NA HEMÎ:
We yan ew tîra yarê hat û li nava dilê min ket, qet ne diwestîya û ne disekinî. Lewra me dît ku ew tîr ji kevanê pirr bi weş û quwwet hat, kevan jî ku bi weş be, bi quwwet be, bê guman tîra wî jî bi weş û quwwet dibe; naskine û naweste.

*****

Xanî bese bê arî çira zêde yê salan
Îsale ji xwe talî û bextê ne bireş hat

ME'NA BÊJEYAN:
Bê arî: Bê şermî, bê fedîtî. (utanmazlık)
Bê arî: Tu bê arû bê şermî, qet şerm û fedî nakî. (utanmazın birisin)
Bextê ne bi reş: Bextê nereş, yanê: bextê qenc û xweş. (kara olmayan baht, iyi ve güzel baht)

ME'NA HEMÎ:
Xanî! Ewqas bê arî û bê şermî bese! We yan bese tu ewqas bê şerm û bê fedî bî ! ku tu dibêjî: şukur, îsal yarê Rû daye me û tali û bextê me qenc û baş hat. Tu jî dizanî ku wekî hemî salan îsal jî, tali û bextê me reş e, ne qenc û xweş e. Ferqa îsal û salên din tuneye. Ev çiye ku tu dibêjî: Bextê me îsal nereş e. Bese van bê arîyan bi ke!, şerm û fedî ye !

- AFERÎN BO TE -

Îşweyek da me seher wê periya horî sirişt
Şefeqê berq û cemalê dil û can suht û perişt
(berişt)
Me nizanî ku melek, yane beşer, yane çi bû
(ya perî bû)
Yedê beyda wekî Mûsayê li qetlê vedimişt

Ke'betûllaha cemalê me dikir çîne tewaf

Xeyberî hatine min xal û xet û çember û qişt
Îlmê esma me jiber kir di debistanê sifat
Talibê Zatê me, lew min şemirand baxê Bihişt

Ademê kamil ezim, bûyî me mescûdê melek
Mûdde'î ger nebitin secde bi min ha serê xişt

Xaniya dê hebitin bê huneran laf û guzaf
Aferîn ber te! Ku ev şîwe ji bo kes te nehişt
.....

Îşweyek da me seher wê periya horî sirişt
Şefeqê berq û cemalê dil û can suht û perişt
(berişt)

ME'NA BÊJEYAN:
Îşwe: Nazî,cilwe, rewşa dilkeş. (naz ve eda, gönül çekici tavır)
Perî: Mexlûqekî nedîtî û beden letif û xweşik e. (cisimleri latif olan efsanevi bir yaratık)
Horî: Çav belek, xweşikên çav belekên bihiştê. (ahu gözlü cennet güzelleri)
Sirişt: Tebî'et, xilqet. (yaradılış)
Berq: Biriqandin, çirûsk. (parlamak, pertev)
Cemal: Şemal, rindayî. (parlaklık)
Perişt: Pijand. (pişirdi)
Berişt: Perçe perçe kir. (parçaladı)

ME'NA HEMÎ:
Wê periya çav beleka bedew û xweşika horî mîsal, di dema

berbanga sibê da nazî û îşwekî li min da ku pertew û çirûska cemala wê, dil û canê min şewitand û pijand û kewand.

******

Me nizanî ku melek, yane beşer, yane çi bû
(ya perî bû)
Yedê beyda wekî Mûsayê li qetlê vedimişt

ME'NA BÊJEYAN:
Yane: Yan na. (veya, yahut)
Beşer: Merif, mirov, insan. (ademi)
Yane çi bû: Yan çi tişt bû. (yoksa neydi)
Yedê beyda: Destê sipî. (beyaz ve nurani el)
Wekî Musayê: Destê wê yê ku wekî destê Mûsa pêxember nûranî û bi mu'cîze bû. (Musa peygamberin elleri gibi nurani ve mucizeli ellerini.)
Li qetlê: Ji kuştinê ra. (öldürmek için)
Vedimişt: Paqij dikir, vedimalî. (temizler ve silerlerdi)

ME'NA HEMÎ:
Nizanim gelo ew çi bû, firîşte bû, însan bû, horî bû, perî bû çi bû? Ku destên xwe yên nûranî û sipî yên wekî destê Mûsa pêxember, li qetlê, li kuştinê (ji boy kuştinê ra) vedimişt û amade dikir.

******

Ke'betûllaha cemalê me dikir çîne tewaf
Xeyberî hatine min xal û xet û çember û qişt

ME'NA BÊJEYAN:
Ke'betûllah: Ke'ba Xwedê, mala Xwedê. (Allah'ın evi)
Cemal: Rindîtî, bedewîtî, xweşiktî. (güzellik, çekicilik)
Me dikir: Me dixwest. me diva. (isterdik)
Çîne tewaf: Biçîne tewafa wî, biçin li dora wî bigerin û ewî ramûsin. (tavafına gidelim)
Xeyber: Navê buhorr gehekî asê ye li Pakistanê, li ser rêya

Kabûlê, ku di zemanê borî da buhorrgeha cengawerên Hindiyan bû, hem jî navê **qela Xeyberê** ya cuhûyan e ku Hz. 'Elî fetih kiriye. (Pakistan da Kabil yolu üzerinde zor bir geçittir, bir de Hz. Ali'nin fethettiği meşhur yahudi kalesinin adıdır)
Xeyberî: Cengawerê wekî Hz.Elî û wek cengawerên buhorrgeya xeyberê. (Hayberi fetheden Hz. Ali ve Hayber geçidinden geçen cengaverler gibi olan)
Xeyberî: Kurkê xeyberê. (Hayber kürkü)
Çember: Toqe, biskên kêrr û çember (toqa, çember)
Qişt: Tuncik tiştinê piçûçik û xweşik, cûrekî xişrê piçûçik û xweşik. (perçem ve kaküller ve bir nevi küçücük ziynet eşyasır da)

ME'NA HEMÎ:
Me arzû dikir ku em biçin tewafa cemala rûyê wê ya ku wekî mala Xwedê pîroz e, lê xal û xet û çember û qiştên wê, wekî cengawerên xeyberîyan û wekî şêrê 'Elî, pêşî li min girtin û nehîştin ez wî kar û wezife yê pêk bînim.

******

Îlmê esma me jiber kir di debistanê sifat
Talibê Zatê me, lew min şemirand baxê Bihişt

ME'NA BÊJEYAN:
Îlmê esma: Zanîna navan, zanîna me'na navên Xweda, ku hemî cûrên hemî kaînat û alemê ne. (Alah Teala'nın isimlerinin bilgisini)
Esma: (c.isim) Nav û nîşanên tiştan. (eşyanın isim ve belirticileri)
Debistan: Zanînge (okul)
Sifat: (c.sifet) Wesif, rengdêr. (sıfatlar)
Talibê Zatê me: Xwestekherê Zatê wî bi xwe me. (zatın özünün talıbiyim)
Lew: Lewra (çünkü)
Min şemirand: Min terk kir, min dev jê berda. (boş verdim)
Baxê Bihişt: (Cennet bahçeleri)

ME'NA HEMÎ:
Me di medreseya sifatên Îlahî da, me'na nav û nîşanên Zatê Wî yê pîroz jiber kirin, yanê: Me bi eseran mûessirê, bi şûûnan zî şanê, bi mexlûqan Xaliqê naskir û zanî. Ez talibê Zatê wî me, min terka hemî **masûwa**yê Wî kirîye, hetta ku min ji cennetê jî, dev berdaye, min ewî jî terk kiriye û şemirandiye, ez her ewî zatê pîroz bi tenê divêm û dixwazim hew!

******

Ademê kamil ezim, bûyî me mescûdê melek
Mûdde'î ger nebitin secde bi min ha serê xişt

ME'NA BÊJEYAN:
Ademê kamil: Merifê gihîştî. (kamil insan)
Mescûdê melek: Ewê ku firişte jê ra çûne secdê. (meleklerin kendisine secdeye kapıldıkları kimse)
Mûdde'î: Înadkar, mûnkîr, Îblîsê ku secde ji Adem re nebir û got: "Ez ji wî çêtirim, lewra ez ji agirim Adem jî, ji ax û çamûrê ye". (İnatçı, Adem'e secde etmeyen İblis)
Ha : Aha, aha jê ra (işte)
Serê xişt: Serê tûj, wek serê tîr û şîş û nişteran. (sivri aletin ucu)
Xişt: Tuj, nişter, kelpîç. (sivri)

ME'NA HEMÎ:
Ez Ademê kamilim, mirofê gihîştî me, tecellîgaha Xweda me, sîya hebûna Wî me. Ez ew Ademim ku melaîketan jê re secde birin. Eger munkirê xebîs û Îblîsê pîs, serê xwe ji min ra daneyne û secde nebe, ha eva ji wî ra serê nişterê! (wek ku dibêjin: "serê kêrê û zikê zebeş, kîjan kevirê mezine bila ew serê xwe lêbixe, ew ji heftê û heft bavê xwe da bê minnet e!")

******

Xaniya dê hebitin bê huneran laf û guzaf
Aferîn ber te! Ku ev şîwe ji bo kes te nehişt

ME'NA BÊJEYAN:
Dê hebitin: Dê bê guman hebin. (şüphesiz ki olacaklar)
Bê huneran: Kesên bê huner. (hünersiz ve kabiliyetsiz kimseler)
Laf û guzaf: Gotin û galegalên bê hûde û berredayî. (boş ve beyhude laflar ve lakırdılar)
Şîwe: Terz, rewş. (tarz, söyleyiş)

ME'NA HEMÎ:
Ey Xanî! Ev tiştekî bê guman û bê şekk û şubheye ku ji mirofên bê qabilîyet û bê huner ra dê pirr laf û guzaf û gotinên berredayî hebin, aferin ji te bê hunerî ra jî! Ku te vî rewşê ji tu kesî ra nehîştîye! Tu di wî rewşê da ji herkesî derbas bûyî!
Em jî dibêjin ku, ey Xanî, ey pîrê wêjevanî! Sed aferîn ji te ra, sed hezar rehmet li can û kîyanê te yê pak û pîroz be! Ku te di meydana wêjevanîyê da, rol û hunerek pirr girîng û mezin lîstiye, te ji me ra rê û rêçika wêjeya netewî, bi terzekî wilo vekiriye ku em di wî rê û rêçika te ya pîroz da dikarin hespê wêjevanîya Kurdistanî, di meydana wêjeya Cîhanî da, bi bezînin û îştîrakê her cûrên mûsabeqeyên wêjeyî bikin! Hem dîsa jî, sed aferîn ji te seyda û pîrê kamil ra be! Ku te sen'et û hunerê îşq û evîna netewî jî, wilo dersa me daye û bi me daye zanîn ku em suxteyên te, di vê meydanê da jî, dikarin ala ser bilindîtî û serfirazîtîyê hildin ser millê xwe û bi şahnazî û îftîxar wiha bibêjin:

"Hunerê îşqê te da me huner amûzê Cîhan!
Derê meyxanê gîha me ku ji mizgeft û kenişt."

- Durre -

Tekrar û tekrar! Em dibêjin ku sed aferîn ji te ra! hezar rehmet li ser can û kiyanê we yê pîroz u mubarek be!

- MÎRÊ MECLÎS -

Mîrê meclis ne kenît, Mûtribê goya çi bi ket
Xunçe xendan nebitin, Bulbulê şeyda çi bi ket

Neynika husnê butan, lazime sahib nezerek
Kesê bîna ku nebit, dîlberê zîba çi biket

Bê kerem naçîte tîpa 'edûwan merdê şecî'
Tîxê ahen çîte, bê destê tewana çi biket

Talibê îlm û kemalê nebitin qabilê feyz
Hîkmeta terbîyeya alimê dana çi biket

Qelbê "Xanî" sedefa gewherê îrfanê we lê
Metnixwanek ku nebit, sahibê me'na çi biket

.....

Mîrê meclis ne kenît, Mûtribê goya çi bi ket
Xunçe xendan nebitin, Bulbulê şeyda çi bi ket

ME'NE BÊJEYAN:
Mîr: fermandar, axa. (emir, bey)
Meclis: Cîyê civînê. (toplantı yeri,oturma yeri)
Nekenît: Ne kene. (gülmezse)
Mutribê goya: Dengbêjê xweş xwan. (keyf ve neşe veren şarkıcı)
Çi bi ket: Çi bike. (ne yapsın)
Xendan: Dev bi ken. (gülen)
Şeyda: Aşiqê dîwane. (tutkun divane aşık)

ME'NA HEMÎ:
Eger ku mîrê meclisê,mezinê dîwanê, ne kene û bal xweş nebe, dê dengbêjê dengxweş çi bike, eger ku gula nû pişkivî jî, bi ken û geş nebe dê bulbulê şeyda çi bi ket? Divê ku Mîrê civakê, bal xweş be, gul jî gula geş be, hetta ku meclis û bulbul jî, bi neş'e û kêfxweş be.

******

Neynika husnê butan, lazime sahib nezerek
Kesê bîna kû nebit, dîlberê zîba çi bi ket

ME'NA BÊJEYAN:
Neynik: Eynik. (ayna)
Husun: Rindayî, bedewîtî. (güzellik)
Butan: (c.but) Put, senem, xweşikên kû wekî pût û seneman tên perestin. (putlar gibi tapılan güzeller)
Lazime: Divê (gerekli)
Sahib nezerek: Xweyê bîr û dîtinek. (görüş ve düşüncesi kuvvetli ve isabetli olan)
Bîna: Bîner, dîtok, yê kû dibîne. (gören)
Zîba: Espehî, rind û bedew. (güzel ve çekici)

ME'NA HEMÎ:
Ji neynika bedewîtîya rind û bedewan ra kesê xweyê dîtinekî baş lazime. Ew kesê ku kor be û çavê wî ne bîne, dê dîlbera rind û bedew çi bike ?

******

Bê kerem naçîte tîpa 'edûwan merdê şecî'
Tîxê ahen çîte, bê destê tewana çi biket

ME'NA BÊJEYAN:
Bê kerem: Bê bexşîş û îkram. (bağışsız ve ikramsız)
Naçîte: Naçe, hêrîş nake. (gitmez,saldırmaz)
Tîpa edûwan: Koma dijminan. (düşman toplumu)
Merdê şecî': Mirofê jîr. (kahraman,cesur)
Tîx: Şûr (kılıç)
Ahen çîte: Di hesin da diçe, hesin dibirre. (demiri biçer, keser)
Tewana: Muqtedir, jîr (güçlü, kuvvetli)

ME'NA HEMÎ:
Mirovê jîr û jêhatî, bê baxşîş û bê îkram naçin ser koma dijminan, hêrîşê nabin ser kozika wan, şûrê hesinbirr jî, dê bê destê tewana (destê bi quwwet) çi bike (Ku di destekî bi quwwet da nebe bi kêrî tiştek nayê)

******

Talibê îlm û kemalê nebitin qabilê feyz
Hikmet û terbîyeya alimê dana çi biket

ME'NA BÊJEYAN:
Talib: Xwestkar, arzûmend. (taleb eden, istiyen)
Qabil: Amade, bi kêr hatî (elverişli)
Feyz: Bi serda rêtin, bereket. (bereket, kutsallık, akış, ilim ve irfan akışı)
Hîkmet: Zanîyarî, felsefe. (hakikatı bilmek, eşyanın ahvalından, harici ve batını keyfiyetlerinden bahseden felsefe, doğru ve gerçekçi bilim)
Terbîye: Perwerdî (terbiye etmek, eğitmek)
Alimê dana: Seyda yê zana (bilgili hoca)

ME'NA HEMÎ:
Eger kû talibê îlm û kemalê, ji boy feyz û bereketa îlm û kemalê ra qabil nebe; dê hîkmet û terbîyeya alimê zana, çi bike (divê ku qabilîyyet têda hebe ku nesîbê xwe, jê hilde)

******

Qelbê 'Xanî' sedefa gewherê îrfane we lê
Metnîxwanek ku nebit, sahibê me'na çi biket

ME'NA BÊJEYAN:
Sedef: Qutîka durr û gewheran (inci kabuğu)
'Îrfan: Têgehîştin,zanîn (bilmek, anlayış, akıl olgunluğu)
We lê: We lakin (ancak)
Metin: Nivîsar (yazı, bir yazının tamamı)
Xwan: Xwenda (okuyan)
Sahibê me'na: Xweyê me'nayê (mana sahibi)

ME'NA HEMÎ:
Dilê Xanî qutîka gewherê îlm û îrfanê ye. Lê belê, ku metin xwanekî tunebe, dê xweyê me'nayê çi bike. (divê kû metinxwanên me'na şinas hebin ku ji sahibê me'nayê, tiştan fêhm bikin û hîn bibin).
Bi rastî: Di xiznexana Xanî da, di qutîya sedefa îlm û îrfana wî da(bîr û bawerîya wîya Felsefî û tesewwûfî û millî û dînî û edebî

û wêjevanî da) pirr durr û gewherên granbiha hene, ku di her gav û her demê da, di her cîh û her war û her bazarê da, bi qîymet û bi rûmet û pîroz û bilind û walane. Lê mixabin! Telebkar û xirîdarên wan pirr kêm hene, ji ber ku bê sahib û bê xwedîne, bê reklam û veşartîne. Çewan kû di Mem û Zîna xwe ya nemir da, ew bixwe jî wiha dibêje û di lûvîne:

Ger dê hebûya me jî Xwedanek
'Alî kerem û letîfe danek
Dê min 'elema kelamê mewzûn
'Alî bikira li banê gerdûn
Çi bikim ku qewî kesade bazar
Nînin ji qumaşê ra xirîdar

Ku me'elsef! Di îroda jî, rewş hêj betertir û xirabtire, pirr rewşenbîrên Kurdan, bi taybetî yên ku di Debistanên kemalîstên Tirkan da xwendine û asîmîle bûne, ji çand û kultura Kurdan bi temamî dûr ketine û hellîyane, nezan û belengazin, xwe zana û rewşenbîr dibînin, miskîn û recûxwazin xwe dewlemend û zengîn di hesibînin. Ku di heqîqet da rewşenbîr nînin, belkî şêlû û tarî nin. Ha û gumanên wan, ji gencîne û xezîneya 'Alimên wekî Xanî jî, tunînin; 'eyb û ara wana herî mezin jî eve ku nezanin lê, nizanin ku nezanin, nexweşin. Lê nexweşîya xwe jî nizanin; bi zimanê dijmin di axivin, wekî wan dilivin. Dibên kû em wêjevan in, lê ji wêjevanên wekî Xanî jî, tû tiştî fêhm nakin û nizanin, dibên ku em pêşverû û sosyalîst in, lê bi rastî di pirr tiştên xwe da paşverû û kemalîst in. Tu dibê qeyê Melayê Cezîrî, ewî rewşa wana qirêj, bi çavên serê xwe dîtîye, ku van helbesteyên xwe derheq wan da gotîye:

Camid çi kin bi husnê, ku wan nezer li xware
Xer teb'etin, di ebleh, çi nergiz û çi kerbeş

Korin, xwe nasipêrin carek bi dest delîlan
Ebleh çike-j tewafê ew nabînit berê reş

Bîzê dikin ji qencan, ji remz û naz û xencan
Qedrê gulan çi zanin, kerbeş divê kerê reş (*)

(*) Nêrîn û dîtina mirovên bê fêhm û hişk, li jêre û nivze, li ba wan ferq di navbera kulîlka nergizê û strîbilloqên keran da, tune. Ew hem korin, hem jî xwe naspêrin rehberên bîna. Dê ew kesên ebleh bi tewafê çi bikin? Ew kevirê reş (heceruleswedê) nabînin; bîzê wan ji tiştên qenc û raz û nazan diçe, dilê wan jê di qelibe, îkrah dikin. Dê ew çi lo qedr û qîymetên gulan bizanin? Bê guman ew nizanin, ji ber ku kerê bext reşin, stirîbelloqan divên, gulan navên.

Temennîya me eve: ku belkî Xwedê hişek bide wan, ji xew hîşyar bin ! We yan, kişek bi de wan, di axa sar bin !

Wesselam... !

- TEXTÊ DÎLBERÎ -

Îro li textê dîlberî, ya Rebb! Çi şîrîn esmer e?
Jê nabitin min dil birrî, ew dîlber e, yan dilber e?

Dil gorîya canane ev, hem dîn û hem îmane ev
Hem lutfû hem îhsane ev, hem law û hem gerden zere

Kakul ji ber tacê bi zerr, ta ta wekî perr têne der
Ser 'eskerê tîpa teter, serdar e yane serwer e

Zulf in gelo pirr pêç û xem, ya sunbula baxê Îrem
Zencîr e, ya serta qedem reşmar e, yana ejder e

Ya Rebb hebîna reng feleq, horî teteq dagirt şefeq
Ya belg û netrik, ya wereq, ya qişt e, yana çenbere

Ew turre, ya keyso ne ew, zencî ne, ya hîndû ne ew
Şutrî ne, ya şeb'bo ne ew, ya toxê Şahê Sencer e

Ebrû ne yan cotek hîlal, Hîndû ne yan nîşan û xal
Keysû ne yan Hezret Bîlal, meşxûlê Ellah ekber e

Çav in gello? Ya serxweş in, ya kafir in ya dilreş in
Bêmar in ew ya nexweş in, yan nêrgiz a cadûkher e

Ruxsar e, ya Rebb! Ya qemer, guftar e ya Rebb! Ya guher
Ew qend e ya Rebb! Ya şeker, ew şuhd e yane xebere

Ew rûn e yan gulbergê al, alal e, yan dêma bi xal
Qendîlê Nûra Zulcelal, mir'at e yana mezher e

Dêm şûşe nûra heqq di nav, dev xunçe ya şirîn gulav
Rux sorgula rengîn xunav, xal misk e, nîşan 'Enber e

Lêv in gello? Yaqûtê can, yaqûte, ya qûtê rewan
Ya qutîya durca diran, yan hewza ava kewser e

Ya Rebb xetê reyhanî ye ser sûretê Qur'an'î ye
Yan xatema sultanî ye, mir'at e, yane menzer e

Xal in gello ya fulful in, ew arid in yan sorgul in
Em aşiqin, yan bulbul in, zîkrê wî werda ehmer e

Ew gerdena şubhê şemal, ser çeşmeya ava zelal
Qarûreya xemra helal, ya şîşe ye, yan mermer e

Ya Rebb! Qeda zîba ye ev, yan Ke'be ya Îsa ye ev
Yan Mescîdu-l Eqsa ye ev, yan sidre, yana 'Er'er e

Ya Rebb! Dilê dîwane ye, yan alimê ferzane ye
Yan bulbulê wêrane ye, yan ûd e, yana mîcmer e

Ew Xanî yê dildade ye, meşreb ji rengê bade ye
Derdê wî, yarek sade ye, lew her zeîf û rengzer e.

.....

Îro li textê dîlberî, ya Rebb! Çi şîrîn esmer e?
Jê nabitin min dil birrî, ew dîlber e, yan dilber e?

ME'NA BÊJAYAN:
Textê dîlberî: Textê xweşiktî û şox û şengîtîyê. (dilberlik ve güzellik tahtı)
Çi şirîn esmere: Çi esmerekî şîrîn e. (ne tatlı bir esmerdir)
Dil birrî: Dil jê birrandin. (gönül koparmak)
Dilber : Dil kevir. (taş yürekli)

ME'NA HEMÎ:
Ya Rebbî! Îro li textê dîlberîtîyê çi esmerekî xweşik rûnîştî ye, ku dil birrînîya ji wê, ne mûmkîne (ne mumkine ku merif dilê xwe jê bibirre). Ez nizanim gello ew dîlber e, yan bê merhemetekî dil ber e (dil kevire) ?
Di fenn û hunerê wêjevanî da, ji vî cûrrê îfade û axaftinê ra, **Tecahîla arifê:** (xwe li nezanîtî dayîna kesê zana) tê gotin.

******

Dil gorîya canane ev, hem dîn û hem îmane ev
Hem lutfû hem îhsane ev, hem law û hem gerden zere

ME'NA BÊJEYAN:
Dilgorî: Dil bi qurban. (gönülün kendisisne feda ve kurban olacak olan)

Canan: Ruhan. Ji mehbûban ra jî, canan tê gotin, ji ber ku yan mehbûb wekî koma canan e, wek pirr canan bi qîymet û rûmet e, we yan jî, mehbûb canê canan e, ruhê ruhan e, çawan ku jîyana bedenan bi ruhan e, wilo jîyana ruhan jî, bi mehbûbê ye, yanê: Mehbûb, ruhê ruha ye. (ruhlar ve canlar, canların canı olan mahbublar)
Dîn: Ol, ayîn, kîş
Law: Xweşik û cuwan (genç ve güzel)
Gerden zer: Gerden zêrîn, weyan gerden zerîn û şê. (altın gerdanlı yada sarışın gerdanlı)

ME'NA HEMÎ:
Gello ew dilgorîya ruh û canane ku hem dîn û hem îmane, hem lutf û îhsane, hem jî gerden bi zêrr û şê û zerî ya xweşik û cuwan e... (we yan sirr û hîkmetê Xweda ne) ?

******

Kakul ji ber tacê bi zerr, ta ta wekî perr têne der
Ser eskerê tîpa teter, serdar e yane serwer e

ME'NA BÊJEYAN:
Kakul: Tûncik, qişt. (perçem)
Tacê bi zerr: Taca bi zêr, taca zêrîna serê padîşahan û dîlberan. (altın tac)
Ta-ta: Ta bi ta, libo-libo. (tane tane)
Wekî perr: Wekî perrê teyrê tawûs. (tavus kuşu tüyü gibi)
Seresker: Serleşker. (komutan)
Tîpa teter: Koma nijdevanên leşkerên tataran ku meqsed jê zulf û kakul in

ME'NA HEMÎ:
Ez nizanim gelo ew tûncika wê ya ku wekî perrên teyrê tawis in û ta bi ta ji binê taca zêrr derdikevin, we yan ew serleşkerê tîpên tatara ne, yan serdarê leşkera ne, yan jî serokê wan e ?

******

Zulf in gelo pirr pêç û xem, ya sunbula baxê Îrem
Zencîr e, ya serta qedem reşmar e, yana ejder e

ME'NA BÊJEYAN:
Zulf: Bisk, lûle yê porrê ser dêman. (zülf)
Pirr pêç: Pirr li hev piçikandî, li hev badayî. (çok birbirine geçmîş ve bükülmüş)
Xemm: Xwar, kovel, çingir. (eğri büğrü, kıvırcık)
Sunbul: Cûrekî gulane. (sümbül)
Baxê Îrem: Bax û bostanê bajarê **qewmê 'Ad** ku wekî bihîşta ser rûyê zemîn me'mûr û geş û xweş bûye. (Ad kavminin cennet gibi olan başkentleri ki Ehqaf bölgesinde imiş)
Reş mar: Marê reş. (kara yılan)
Ejder: Ejdîha, ew marê efsanewîyê ku dibêjin ji devê wî agir davêje. (ağzından lav fışkıran efsanevi yılan, ejderha)

ME'NA HEMÎ:
Gello ev zulfên pirr lihevbadayî û bi kurîşkin, yan sunbulên baxên Îremê ne ? Zincîrin, we yan reş marin, ji serî da hetta lingan xwe bi bejna dîldarê da berdane, we yan ejderha ne ?

******

Ya Rebb hebîna reng feleq, horî teteq dagirt şefeq
Ya belg û netrik, ya wereq, ya qişt e, yana çenbere

ME'NA BÊJEYAN:
Hebîn: Yara ku tê perestin û hebandin. (beğenilen ve tapılan sevgili)
Feleq: Şefeq, pişkavtina şefeqê, kifşe bûna beyanîyê. (şafak, şafak söküğü, sabah aydınlığı)
Horî: Çav belekên bihîştê. (Cennet horileri, güzel gözlüleri)
Teteq: Perde. (örtü, perde)
Da: Daçeka berjêrdaxistinê ye, berjêr anînîyê ye.
Dagirt: Ser girt, bi ser da berjêr kir, avêt ser. (kapattı, örttü)
Şefeq: Beyanî, berbanga sibê, dêm û rûyên wekî şefeqê (tan vakti ve şafak gibi yüz)

Belg: Pel, pellik, (bir süs eşyası,takı)
Netrik: Mangoleyê lerzane, pellikên ku weki hîlala ne û dilerizin, Xişrekî (xişlekî) jina ne. (kadınların alnına takılan bir mücevher, bir nevi süs eşyası)
Wereq: Gela, pellik û polikên ku xişrê serê jina ne. (kadınların taktıkları yaprağa benzeyen ziynet parası, bir nevi madeni ince süs eşyası)
Qişt: Tûncik, perçem, tiştikên hûrik û piçûçikên xweşikên ku xişr û zînetên jina nin. (kakül, küçücük)
Çenber: Toq, toqe, toxe. (toka)

Bi vê minasebetê, ez dixwazim divir da navên hinek **xeml û xişrên jinên Kurdan** beyan bikim:
(Wek: Kurtik û Soxme û Êlek û Êdek û şar û Temezî û Qemt û Qemtik û Kofî û Gulik û Tac û Ferayî û Serpoş û Cênîk û Belg û Gela û Pellik û Pûlî û Pûllik û Morî û Morîk û Bilqok û Guppik û şirrik û Me'denî û Coqe û Toq û Tox û Derzîk û Qişt û Nîk û Çengel û Çenber û Netrik û Teyrik, (xişrekî wekî teyrikê "koterr"e ku ew teyrikê koterr jî, perrendeyekî wekî kewê xweşike lê ji kewê piçûktir e) **Telisim, Tilsim** (perçekî xişrê zîvîn e ku bi ser da dixûnin, afsûn dikin û dibêjin ku cinn û şeytanan, ji mirovan dûr dixe, -ku ew jî bawerîyeki efsa newî ye, di nav xelkê da wilo bi cîh bûye)- û **Baz** (ku ew jî, xişrekî bi şiklê teyrê bazî ye,) û **Guhar** û **Bazin** û **Xilxal** û **Gerdanî û Milwanke** û **Benda heyderî**, (ku bi taybetî, jinên qebîla heyderan bi kar tînin), û **Sorab** (ku ew jî şirrikekî lerzane ye) û y.d...

ME'NA HEMÎ:
Gello ya Rebbî! Ewê hezkirîya mina reng şefeqa ku wekî horîyên cennetê ye, perde kişandîye ser rûyê xwe,we yan belg û netrik û wereq û qişt û çenberên wê ne ku li ser rûyê wê bûne wekî perde, rûyê wê girtine ?

*****

Ew turre, ya keyso ne ew, zencî ne, ya hîndû ne ew
Şutrî ne, ya şeb'bo ne ew, ya toxê Şahê Sencer e

ME'NA BÊJEYAN:
Turre: Tûncik, tuxra. (cûrekî ji morên bi taybetîyên padîşaha ne)
Keyso: Kezî, gulî. (örme saç)
Zencî: Zengî,yê wekî zencîyan reş. (zenci gibi)
Hîndû: Wekî hindîyan, wekî xelqê Hindistanê. (hindliler gibi siyah)
Şutrî û şeb'bo: Du cûrên kulîlka ne (iki tür çiçek)
Şutrî: Kêlkêle, zencîreya pellikên hilalî, şirrik, gulilkekî bi şirrik e. (saçaklı bir çiçek ve ona benzer bir takıdır)
Şeb'bo (Şevbîhn): Kulîlkekî ye ku bi şev di pişkive û bîhna xweş jê tê. (gece açılan bir nevi hoş kokulu çiçektir)
Tox: Toqe, guppik. (toka)
Şahê sencer: Ehmed Sencer şah: (1086?-1157 m.), Paşayê Selcûqîyên Îranî, lawê melik şahê lawê Alpaslan. (Selçuklu Ahmet Sencer şah)

ME'NA HEMÎ:
Gello ew tuncik û perçem e, yan gulî û khezî ye, yan jî kêlkêle û zencî û hindî ye, yan jî gul û guppik û kulîlkin, weyan jî toqeya ala Şahê Sencer e ?

******

Ebrû ne yan cotek hîlal, Hindû ne yan nîşan û xal
Keysû ne yan Hezret Bîlal, meşxûlê Ellah ekber e

ME'NA BÊJEYAN:
Cotek hilal: Du ferên hîva nû. (bir çift hilal)
Hazret Bîlal: Bîlalî hebeşîyê ku bangvanê Hz. Mûhemmed bûye. (Hz.Muhammedin meşhur müezzini Bilalî Hebeşi)
Meşxûlê Ellah ekbere: Bi Ellah û ekberê ra (bi azanê ra) meşxûl e, Bangvan e. (Allah u ekber diye başlayan ezanla meşguldur, müezzindir)

ME'NA HEMÎ:
Gello ev Birû ne, yan cotekî hilal in? Hindî ne, yan nîşan û xal in ? Evana jî, kezî ne, yan Hz. Bîlalê Hebeşî ye ku meşxûlê bi ezana Mûhemmedî ye?

******

Çav in gelo? Ya serxweş in, ya kafir in ya dilreş in
Bêmar in ew ya nexweş in, yan nêrgiz û cadûkher e
(yan nêrgiz û yan 'enbere)

ME'NA BÊJEYAN:
Gelo: Aya, eceba. (acaba)
Dil reş: Bê merhemet,bê bawerî. (gönlü kararmış,inançsız)
Bêmar, Bîmar: Bê wec,bê kêf,nexweş. (hasta)
Nêrgiz: Kulîlka nêrgizê. (nergiz çiçegî)
Cadûkher: Sêrbaz. (sihirbaz)
Enber: Maddekî xweş bîhn e, di hundirê hinek masîyan da çê dibe (güzel kokulu bir maddedir, ada balığı ve kasalotun bağırsaklarında oluşur)

ME'NA HEMÎ:
Gelo ev çavin, yan serxweş in, yan gawir û dilreş in, yan mest û nexweş in, yan jî, nêrgiz û Enber in,yan jî sêrbaz û cadûker in, ku bi rastî, dimînin hemîyan jî, di liv û hereketên xwe da, wekî serxweşa ne, di zulm û bê dadî yên xweyên ku li evîndaran dikin, wekî gawirê dilreş û bê merhemet in,di hereket û livên xwe yên nermik û hêdî hêdî da jî, wekî nexweşa ne, bi xweşiktîya xwe jî, wekî kulîlka nêrgizê ne, wekî misk û enberê ne, ku ez jî şaş bûme û mame, nizanim gelo ka ew kîjan ji wan in, belkî ew hemî ne jî ku em pê nizanin.

******

Ruxsar e ya Rebb! Ya qemer, guftar e ya Rebb! Ya guher
Ew qend e ya Rebb! Ya şeker,ew şuhd e yane xebere

ME'NA BÊJEYAN:
Ruxsar: Rû, dêm. (yanak,çehre)
Qemer: Hîv, heyîv, hîva çarde şevî. (ay)
Guftar: Peyv,gotin û xeber. (söz)

Guher: Gewher, cewher. (cevher)
Qend: Qendê şekir, ava qamîşê şekir ku diqerrise, dibe wekî bûzê. (şeker kamışının donmuş suyu)
Xeber: Bêje,peyv,gotin. (söz, konuşmak)
şuhd: Gezo, hingivê şana. (petektekî bal)

ME'NA HEMÎ:
Ey Xweda! Ez nizanim gelo ev rûyê yarê ye, yan hîva çarde şevî ye, ev gotinên wê ne yan, gewher in? Ev qendê şeker in, yan gotin û xeberin, ez jî nizanim, tê da şaş bûme û mame!

******

Ew rû ne yan gulbergê al, al-al e, yan dêma bi xal
Qendîlê Nûra Zulcelal, mir'at e yana mezher e

ME'NA BÊJEYAN:
Gulberg: Belgê gulê. (gül yaprağı)
Al: Sor. (kırmızı)
Gulbergê al: Belgê gulan yên sor. (kırmızı gül yaprağı)
Al-al: Gulekî belgsor û bîhn xweş e. (hoş kokulu kırmızı yapraklı bir gül)
Dêm: Rû, çehre, sûret. (yüz, çehre)
Bi xal: Bi nîşan (hallı ve nişanlı)
Qendîl: Çira, fener, (kandil, lamba)
Nûra zul-Celal: Nûra xweyê meznayê, Nûra Xweda yê mezin. (azamet ve celal sahibi olan Allah'ın nuru)
Mir'at: Eynik, neynik. (ayna)
Mezher: Numayenge, kifşege, xuyange. (bir şeyin göründüğü, izhar olduğu yer)

ME'NAHEMÎ:
Gelo ew rûyê mehbûbê ye,yan belgê gula sor e? Gula alal e, yan dêmê bi xal e? Çira û qendîl e, yan pertewa nûra Xweda yê zul-celal e? Neynik e gelo, yan xuyange û tecellîgah e? (yan jî ew hemî ne?)

******

Dêm şûşe nûra heqq di nav, dev xunçe ya şirîn gulav
Rux sorgula rengîn xunav, xal misk e, nîşan Enber e

ME'NA BÊJEYAN:
Nûra heq: Ronahîya heqq, Nûra Xweda. (Allahın nuru)
Di nav: Di navê da. (içinde)
Xunçe: Gula nû pişkivî, guppika ku gul tê da ye. (gunçe)
Gulav: Ava gulê. (gül suyu)
Rux: Rû. (yüz)
Rengîn: Reng bi reng. (renkli)
Xunav: Avî, şebnem. (çığ)

ME'NA HEMÎ:
Dêmên wê, şûşe ya ku nûra Xwedê di nav da ye, devê wê jî, xunçekî şirîn gulav e, rû yê wê jî, sorgula reng xunav e, xalên wê jî misk e, Nîşanên wê jî, Enber e?

******

Lêv in gelo? Yaqûtê can, yaqûte,ya qûtê rewan
Ya qutîya durca diran, yan hewza ava kewser e

ME'NA BÊJEYAN:
Yaqûtê can: Yaqûtê cuwan, yan jî, qût û xurekê can. (canlı yakut, veya canın kutu ve gıdası)
Rewan: Can, herrikî, kişîyayî, ruh û canê ku dikişe. (akıcı, can)
Yaqûtê rewan: Yaqûtê herrikî û seyyal. Ku ji mey û badeyê ra tê gotin, ji ber ku mey, wekî yaqûtê seyyale, rehn û ron û sor e. (akıcı yakut ki badeye de denir)
Qutî: Qutîk, sandiq. (kutu)
Qutîya durca diran: Sandiqa ku qutîka dirana ne. (dişlerin kutusu)
Durc: Qutîk, çente, qutîka mucewheran. (mucevherat ve makyaj kutusu)
Durca diran: Qutîk û sandiqa diranên wekî gewheran. (mücevher gibi dişlerin kutusu)

Kewser: Ava kewserê ya bihîştê. (cennet ırmaklarının kaynağı, kevser suyu)
Hewz: Pingarr, Ava ne herrikî. (havuz)

ME'NA HEMÎ:
Ez nizanim gelo ? Ev lêvin, yan qût û xurekê canin, yaqûtê heqîqî ne, yan qûtê ruhan in, we yan jî, yaqûtê seyyalin (mey û bade ne) Ev jî qutîya gewherên dirana ye gelo? Yan hewza ava Kewserê ye, we yan jî, devê yar û dîlberê ye?

******

Ya Rebb xetê reyhanî ye ser sûretê Qur'anî ye
Yan xatema sultanî ye, mir'at e, yane menzer e

ME'NA BÊJEYAN:
Xetê reyhanî: Cûrekî nivisarê gellekî zerîf û xweşik e. (güzel ve zarif bir yazı türü)
Sûretê Qur'anî: Parçeyê Qur'an'ê ku Qur'an hemî, sed û çarde (114) perçe ye, ku ji her Perçekî wan ra **"Sûret"** tê gotin. (Kur'an suresi, ki K. Kerim 114 sureye bölünmüştür)
Xatema sultanî: Mora padîşahîtîyê. (Padişah ve sultan mührü)
Mir'at: Neynik. (ayna)
Menzer: Temaşegah. (manzara)

ME'NA HEMÎ:
Gelo ev xetê reyhanîy e ku li ser dêmên wekî sûretê Qur'anê ne, we yan mora sultanî ye. Yan jî ew neynik û menzerekî herî balkêş û 'alî ye?

******

Xal in gelo ya fulful in, ew arid in yan sorgul in
Em aşiqin, yan bulbul in, zîkrê wî werda ehmer e

ME'NA BÊJEYAN:
Fulful: Îsota reş. (kara biber)
Arid, Ariz: Rû, sûret. (yanak)

Zîkir: Behs û bîranîn. (anmak, hatırlamak)
Werd: Gul, kulîlk. (gül)
Ehmer: Sor. (kırmızı)

ME'NA HEMÎ:
Gelo ev xal in, yan fulful in, ev dêm û sûret in, yan sorgul in, gelo em jî, 'aşiq in, yan bulbul in ku derdê wan sorgul in, li ser wan bi fîxan û xulxul in ?

******

Ew gerdena şubhê şemal, ser çeşmeya ava zelal
Qarûreya xemra helal, ya şîşe ye, yan mermer e

ME'NA BÊJEYAN:
Gerden: Qirik. (gerdan)
Şubhê Şemal: Wekî pêt û şû'le û pertew û ronahîyê. (ışık gibi)
Ser çeşme: Ser kanî. (pınar başı, kaynak)
Qarûre: Surahî, firaq û aman ên kristal. (cam mamulu, şişe, sürahi)
Xemr: Bade û mey. (şarab,rakı)
Xemra helal: Meya ne qedexe. (îşq û evîn) (yasaklanmamış içki,aşk)

ME'NA HEMÎ:
Gelo ew gerdenạ wek şu'le û şemale, we yan ser kanîya ava zelale? Yan jî, surahîya meya helal e? Şûşe û cam e, yan mermerê xam e ?

******

Ya Rebb! Qeda zîba ye ev, yan Ke'be ya Îsa ye ev
Yan Mescîdul-eqsa ye ev, yan sidre, yana 'er'er e

ME'NA BÊJEYAN:
Qed: Bejn û bal. (kamet, endam)
Zîba: Rind û bedew û xweşik. (güzel)

Ke'be: Çargoşek, Rûgeh, Qiblegeha musulmanan, mala Xwedê ya ku di nav mizgefta Mekke yê da ye, hecî li dora wî digerrin û tewaf dikin, di koşê wîyê alîyê Yemenê da, Hecerul-eswed (Kevirê reş) heye. Ku ji Ke'be yê ra, **beytûllah, beytûl-me'mûr, beytûl-'etîq** jî, tê götin, bi mecazî, ji hemî qiblegah û pîrozgehan ra jî, tê gotin. (Allah'ın evi, Ka'be)
Ke'be ya Îsa: Kiblegaha Îsa pêxember, (Qudsa şerif). (İsa peygamberin Ka'besi olan Kudüs)
Mescîdul-eqsa: Mizgefta herî dûr, ku navê mizgefta Qudsê ya kevn û pîroz e, me'bed û perestgeha pêxemberan bû ye, jê ra "**Eqsa**" ya bi me'na **"herî dûr"** gotine, ji boy ku ji **Mekke** û mizgefta Mekke yê, gellek dûr bûye. (Mekke camisinden çok uzakta, Kuduste bulunan çok eskiden gelen peygamberlerin mabedi olan meşhur Kudus camisi)
Sidre: Cûrekî dara ne (bir tür ağaçtır)
Er'er: Ew jî cûrekî dara ne, ji beşa senewberîya ne (o da bir tür ağaçtır)

ME'NA HEMÎ:

Ev bejn û bala espehî û zîba ye,yan ew Qiblegaha Îsa ye, yan jî mizgefta Eqsa ye, we yan jî dara Er'erê û sidretûl-mûnteha ye? (**Sidretûl-mûnteha** : Sidra ku tuxûbê dawîya tebeqeyên asîmana ye, nuqta nîhaîya gihîştina me'rîfet û zanîna însana ye, xet û çixêz û fasîla di navbera kevanê **îmkan** û **wucûbê** da ye.)

Hebîna min sipîndara li wara, serwî bala ye,
Kulîlka derbihara, ber zinara, dev newala ye

Bi dev Îsa ye, dest Mûsa ye, qed, Tûba ye, xedd, zîba
Şehê xûba ye, mî'raca dila ye, sidrê wala ye

Memik fincan e, sîng zozan e, paxil bezm û meyxane
Meya azadî jê dane li dil, 'Erşê Te'ala ye

Cemala Rebbê pîroz e, ku lê da cejn û newroz e
Şemala agir û koze, li can berq û tecella ye

Ji wî berq û birûskê da, Mela dil Tûrî Sîna ye
Ji nûra wê pirûskê da, şukur! Ney destevala ye(*)

- Durre -

(*) Biha dîn û dil û can e li wî ew nerxe, erzan e
Mela, bê dîn û îmane ku hê jê destevalaye (d.)

******

Ya Rebb! Dilê dîwane ye, yan alimê ferzane ye
Yan bulbulê wêrane ye, yan 'Ûd e, yana mîcmer e

ME'NA BÊJEYAN:
Dîwane: Dîn, şît. (deli)
'Alim: Zana. (bilgin)
Ferzane: Feylesof, zanîyar. (bilgili,filozof)
Wêrane: Xirabe, kambax. (harabe,viran)
Ûd: Êzing, darên şewatê, darên buxûrê, bîhna xweş. (odun, tütsü)
Mîcmer: Agirdang, cîyê cemrê, cîyê perreng û koza agir. (mangal, çinde tütsü yapılan bakır ve bronzdan yapılan alet)

ME'NA HEMÎ:
Ya Rebbî! Ev dilê meyê dîwane ye, yan feylesofekî zane ye, yan jî bulbulekî mal xirab û wêrane ye, yan Êzingê şewatê ye, we yan jî agirdanga wê ye?

******

Ew Xanî yê dildade ye, meşreb ji rengê bade ye
Derdê wî, yarek sade ye, lew her zeîf û rengzer e.

ME'NA BÊJEYAN:
Dildade: Dil dayî, dil ji dest çûyî. (gönlünü vermiş aşık)
Meşreb: Vexwardek, qrekter, tebîet, rewş û rewişt. (huy, yaradılış, adet, gidişat)
Reng; Rewş, terz, wek. (reng, gibi)
Bade: Mey. (içki, şarab)
Derdê wî: Kulla dilê wî (onun derdi)
Sade: Safî û zelal. (sade)
Zeîf: Jar. (zayıf)
Lew: Lewra. (çünkü)
Rengzer: Rengê wî zer bûye, ku bi me'na mecazî yanê nexweş e. (saramik, hasta)

ME'NA HEMÎ:

Ew Xanî yê dil ji dest çûyî ye ku meşreb û xûyê wî wekî meyê ye, derdê wî jî, yarek letîf û sade ye (mucerred û bê heval û hemta ye), ku lewra jî,jar û zeîf û rengzer ma ye(yara wî letîf e ku ew jî zeîf e,yara wî nazenîne ku ew jî zerîn e)?

Xanî, di vê qesîda xwe ya pîroz û hêja da, bi terz û ûslûbekî wêjevanîyê herî bilind û belîxane, huner û sen'etê **Tecahûla 'arifê** (xwe nezan nîşan dayîna zanayê), bi kar anî ye, pirr Xweş û balkêş, teswîr û îfade kirî ye, ji durr û gewherên giranbiha tenzîm kirîye, ristî ye û hûna ye, di qalibê belaxet û fesahetê da ro kirî ye û rotî ye, neqişandîye û xemilandî ye, ji gerdena wêjeya kurdî ra, teqdîm û pêşkêş kirî ye, bûka wêje ya kurdî, pê xemilandî ye. Ku Xanî, wek Mela yê Cizîrî û 'Elî yê Herîrî û yên wekî wan, bi wî hunerê wêjeyî yê pirr bi rûmet û hêja, di meydana musabeqeya wêjevanîya Kurdistanî da, nîşan û teqdîrname yên dereca herî bilind heqq kirî ne, (Xweda dereca wan hemîyan âlî bike, me bide xatirê wan. Amîn!).

Bi rastî jî, wêjeya kilasîkîya kurdî û wêjevanên wek **Xanî** û **Mela** yê Cizîrî, laîq û sezawarê her cûrên teqdîrname û nîşana ne, medarê îftixar û şahnazîya wêje û wêjevana ne, kan û xizne yên durr û gewheran e.

Ger lu'luê mensûrê ji nezmê tu dixwazî
Wer guhde Mela yê, te bi şîrazê çi hacet
- Mela -

Yanê eger tu, li gewherên wezn û ristên mensûr digerrî,ewan divê û dixwazî, tu were guhê xwe bide Mela yê Cizîrî, çi îhtîyacîya te bi bajarê şîrazê heye ku tu herrî wir û li Hafizê şîrazî û edebîyata wî bigerrî, Mela besî te ye! Lê meleseî! Ev jî heye ku li ba keran ferq di navbera nergiz û kerbeşe da jî tuneye:

Qedrê gulan çi zanit, kerbeş divê kerê reş
Xerteb'etên di ebleh, çi nergiz û çi kerbeş
- Mela -

- SAQÎYÊ MEHWEŞ -
- EY DÎLA -

Ey dila ger te divêtin bibî daîm mesrûr
Di terebxaneyê dunya vexwe ava engûr

Perdeyê xefletê xewxayê cîhanê bidirîn
Ji meqamî ku bihîştî ji sedayê Tenbûr

Zemzema zemzemeya rahê Huseynî ji Hicaz
Vexwenit, Ke'be yê dil, ta bite beytîl me'mûr

Perdeyê zulmetê eşxalê cihanê bi dirrîn
Ji nezergahê cemalê Tu hîcabê bike dûr

Menzerê dîde yê canê Te mûnewwer nebitin
Nexlê "Mazaxe" ne kêşî Tu ji xal û xetê hûr

Gunehan ger nebûwa lezzet û zewqek haşa!
Faîlê ism ne dibû, tarik û taîb me'cûr.

Mey û me'şûq û hewesbazîyê dunyayê zuhûr
Ne bûwana, ne dibû îsmekî Allah ê xefûr

Min guneh tê bi gunahan ku di nêv baxê cîhan
Semerî xweştir ewin, bûn bi heramî meşhûr

Hinkî dewrê felekê saxirê meh dewrî diket
Meh û salan digirit herwe ji 'emrê me qusûr

Rabe ey saqiyê mehweş tu ji rexma felekê
Bide min badeî le'lî Tu ji cama fexîfûr

Şêxê cam er nefesî hemdemî dil ket bi mûrad
Li mûradê dilê murde dibîtin keşfê qubûr

Ye'nî ew xane yê gil nabite qabil qet'a
Ne bi çeşmê dilê nazir, ne bi rûyê menzûr

Îşqî bazî du terîqe, çi heqîqet çi mecaz
Şem'ê can dê bi qejîtin, çi bi nar û çi bi nûr

Şebê zûlmatê bi îmkanê dibit subhî numa
Afîtabê Ehedîyyet ji feleq tête zuhûr

Ser û mal û dilû canê me fidayê Te bitin
Bike qelbê me tu saqî ji şeraba xwe tehûr

Da bikem keşfê meqamatê 'ûlûwwê derecat
Ya bikem keşfê keramatê ji dara mensûr
.....

Ey dila ger te divêtin bibî daîm mesrûr
Di terebxaneyê dunya vexwe ava engûr (*)

Perdeyê xefletê xewxayê cîhanê bidirîn
Ji meqamî ku bihîştî ji sedayê Tenbûr

ME'NA BÊJEYAN:
Ey dila: Dilo! (ey gönül)
Ger Te divêtin: Eger Tu dixwazî. (eğer istiyorsan)
Daîm: Her tim. (devamlı)
Mesrûr: Kêf xweş. (sevinçli)
Terebxane: Reqisxane, cîyê lîstik û zewq û sefa ê. (dans, zevk ve sefa yeri)
Ava Engûr: Ava tirîyan, mey, bade (üzüm suyu, şarab)

(*) Ji boy zerûreta şî'rê, (zerûreta mûhafezekirina wezn û ahenga şî'rê) divê ku, di vê qesîdeyê da, van bêjeyan (Mesrûr, Engûr, Mestûr, Tenbûr, Me'mûr, Meşhûr, Fexfûr, Mensûr), dirêj bêne xwendin û bibin: "Menisûr û Enigûr û Mesitûr û Tenibûr û Meimûr û Meşihûr û Fexifûr û Menisûr." Hem jî, di vê ku kelîma **Kafûr** ê jî, Kaafûr bête xwendin. Ku di hunerê şî'rê da, bi angorî qaîde û qalibên fennê Erûzê, ev cûrên teserrûfatan rewa û zerûrîne.
Erûz: Bi me'na zûhûr û kifşbûne, ku bi angorî qaide û qalibên fenn û hunerê Erûzê, şî'r û helbesteyên rast û durust, ji yên şaş û çewt, di qetin û kifşe dibin, ku lewra jî, ji wî fennê ra fennê Erûzê (zuhûrê), hatîye gotin. Ku 'Alimê meşhûr Xelîlê kurrê Ehmed (...../786 m.) ê Seyda yê **Esmeî** û **Sîbeweyhî** yê), ewî îlmê Erûzê damezirandiye.

ME'NA HEMÎ:
Dilo! Eger tu dixwazî ku tu daîma bi neş'e û kêf xweş bî, tu di vî govendxaneya dunyayê da her tim ava tirîyan vexwe, daima mey û badeya me'rîfeta heqîqetê vexwe û pê mest û serxweş be, ji kull û derdên vê dunyayê reha û aza be. (lê bila ew mey û bade, ji cûrên wî mey û badeyê be ku Îbnil Farîdê derbare ê wî da wiha gotîye:

(شربنا على ذكر الحبيب مدامة سكرنا بها من قبل أن يخلق الكرم)

Yanê: Me, li ser bîranîna mehbûbê badekî wilo vexwarîye ku berîya çêbûyîna rezên tirîyên wê badeyê, em bi wî (Bada me'rîfeta Zatê heqq, serxweş bibûn).

******

Perdeyê xefletê xewxayê cîhanê .....

ME'NA BÊJEYAN:
Xeflet: Bê hay mayîn. (gafîl olmak)
Xewxa: Têkoşîn, pevçuyîn. (kavga)
Bi dirrîn: (Yırt)
Meqam: Cî, cîke, tempo û ahenga muzîq û sazbendîyê. (yer, müzik temposu)
Bihîştî: Meqam û tempoyekî muzîqêye. (Bir müzik makamıdır)
Seda : Deng,awaz. (ses, seda)
Tembûr: Destgahekî muzîqêye. (Bir müzik aleti, tambur)

ME'NA HEMÎ:
Tu perde û serpoşa xeflet û bêhişîtîya teqereqî û pevçûyîn û qirênên dunyayê, ji meqamê bihîştîyê ku ji seda tembûrê da ye, bi dirrîne û bide alî.
Yanê: Tu ji wan meqam û aheng û tempoyên bihîştîyên ku ji deng û awazên xweşên saz û muzîqê peyda dibin, tu ji wan meqaman, perde û hîcaba xeflet û teqereqîyên dunyayê hilîne û bi dirrîne. (Ku ew nebin mani'û astengên wî meqam û rewşa xweş). Tu di wî cennetê da bijî û dev ji tiştên berredayên din berde.
Bi vê minasebetê, ez dixwazim evî jî îşaret bikim ku di bêjeya

meqam û **perde û bihîştî** û **huseynî** û **hîcaz** û **zemzeme** yê da. sen'et û hunerê **tewrîyye**yê heye ku ew jî eve: "Ji kelîmekî ra me'nekî dûr û yekî nêzîk hebe û meqsed ew me'na wî ya dûr be. Her wekî ku ji van kelîmeyên borî, qesta me'nayên wanên dûr, me'nayên wanên muzîqî hatîye kirin. Ku Xanî, hem di dîwana xwe da,hem jî di Mem û Zîna xwe da evî sen'etê Tewrîyyeyê, bi rewşekî xarîqeyê şa'îrane, di pirr cîyanda bi kar anîye.
Xanî, geh bi serîhî, geh jî bi tewriyye behs û temasa pirr meqamên mûsîqî (wek meqamê Huseynî û Hîcazî û Dilnuwaz û Zengûle û Şebdîz û Gulrux û Nûresîde û Nazenîn û Nesîm û Nergiz û Lalerux û Gulîzar û Gulîstan û Sefa û Cama cem û Zêrrgule û Zemzeme û Bezm û yên din) jî kirîye, hem jî, behsa pirr alet û destgahên muzîq û sazbendîyê (wek Deff û Zurne û Qanûn û Neyy û Saz û Rûbab û Tembûr û Tebance û Zengil û Kemançe û Ûd û Gerrena û Naqûr û Tiblik û Çeng û Kos û Benn û wd.) jî, kirîye ku ew jî, vê rastîyê dide nîşandin ku Xanî, -wek sen'etê edebî-, di sen'etê muzîq û sazbendîyê da jî, xweyê me'lûma tekî fireh bûye.

******

Zemzema zemzemeya rahê Huseynî .....

ME'NA BÊJEYAN:
Zemzem: Ava zemzemê ku bîra wê avê, li ba Ke'bê, di nav mizgefta Mekkeyê da ye. (zemzem suyu)
Zemzeme: Deng û awaz, terennum. (avaz, seda)
Rah: Rê, rêke, terz. (yol ve tarz)
Huseynî: Meqamekî mûsîqî ye. (Huseyni denilen müzik makamı)
Vexwenit: Vexwe! (iç!)
Hîcaz: Herêma Hîcazê,meqamê hîcazî ku meqam û tempoyekî muziqê ye. (Hicaz mıntıkası Hicaz makamı)
Ke'be: Kiblegaha musulmanan, mala Xwedê. (Allahın evi olan Kabe)
Ke'be ê dil: Dilê ku wekî Ke'be yê, mala Xwedê ye, ku Pêxember di hedîsekî qudsî da dibêje: Xwedê gotîye ku: "Erd û Asîmanê min, min di xwe da nagire, lê dilê ebdê minê bawerker, min di

xwe da digire". (Kabe gibi gönül ki Allahın hakiki konağı orasıdır)
Beytul me'mûr: Mala şên û ava, ku hem ji Ke'ba li Mekkeyê ra tê gotin, hem jî dibêjin: ku li asîmanan jî, îbadetgahekî melaîketan heye ku ew jî beytul me'mura wan e. (mamur olan ev)

ME'NA HEMÎ:
Ey xweyê dil û 'aşiqê cemala heqîqî! Tu ava zemzemê ya deng û awazê rêka meqamê Huseynî, ji cîhet û meqamê Hîcazî da vexwe ku Ke'ba dilê Te bive mala şên û ava. Yanê: Tu guhên xwe bide meqamê awaz û sedayên Huseynî yên ku ji meqamê Hîcazî da ne,ji zewq û çeşnîya wê zemzeme û terennumê, ava zemzema heqîqetê vexwe ku dilê Te bibit wekî beytul me'mûrê, bibe tecelligaha Xweda û meqamê îşqa wîya heqîqî.

******

Perdeyê zulmetê.....

ME'NA BÊJEYAN:
Zulmet: Tarîtî. (karanlık)
Eşxal: (c.şuxul) Kar û bar, astengî û pabendî. (meşguliyet)
Cîhan: Dunya
Bi dirrîn: (yırt)
Nezergah: Cîhê nêrîn û mêze kirinê. (temaşegeh)
Cemal: Rindayî, xweşikî. (güzellik)
Hîcab: Perde

ME'NA HEMÎ:
Tu perda tarîtîya kar û barên dunyayê bi dirrîne, ji temaşegeha rindayê wê Hîcab û perdeyê dûr bigerîne, li cemala şox û şepalê mêze bike û neqş û nemûşên wê bibîne.

******

Menzerê dîde yê canê Te.....

ME'NA BÊJEYAN:
Menzer: Lê mêzek, temaşegah. (manzara)
Dîde: Çav. (göz)
Can: Rih. (ruh)
Mûnewwer: Ronahî bûyî, nûranî. (nurlu)
Ne bitin: Ne be. (olmazsa)
Nexil: Dara xurmê. (hurma aşğacı)
Mazaxe: Şaş ne bû, ne kuskusî. (kaymadı)
Ne kêşî: Nakişînî, dernaxî. (çıkaramazsın, seçemezsin)
Nexlê mazaxe: Dara xurmê, dara Sidretûl-Mûnteha ya ayeta ***"mazaxel beserû wema texa"*** yê.... Necm /17 (Necm suresinin 17. Ayetiyle ima edilen Sidretul-Munteha aşacı)

ME'NA HEMÎ:
Eger ku menzera çavê canê te ruhnî û nûranî nebe, Tu nexlê "mazaxe" yê, ji xal û xetên rûyê mehbûbê nikarî bikişînî û nikarî derînî, nikarî bibînî û temaşa wan bikî! Yanê: Çawan ku şeva mî'racê çavên Pêxember, pirr sirr û neş û nemûşên hûr û kûr û dûrên "alema lahûtî" dîtin û temaşe kirin û ne kuskusîn û şaş nebûn, eger ku Menzereya çavên canê te munewwer nebe, çavê canê Te, wî dara me'rîfetê, -dara xurme û Sidre ya heqîqetê ya ku ayeta "mazaxelbeserû" îşaretê bal wî va kirîye-, nikare ji xal û xetên hûr bikêşe û derîne, jê ber û fêkîyan hilîne. Bi kurtî: divê ku menzera çavê besîreta te munewwer bibe ku tu bi karibî bi wî çavê besîreta xwe, xal û xet û neqş û nemûşên wê cemala bê hemta û bê mîsal bibînî, çavên te şaş nebin û ne kuskusin; çawan ku çavên Hz. Muhammed jî, şeva mî'racê şaş ne bûn û ne kuskusîn, dara xurma sirrên wî alema lahûtî, bê şaşbûyîn û bê çewtî dît.
Xûlase: Hetta Tu li 'alemê wekî neynika tecellîya cemala îlahî mêze nekî, (hetta ew menzera 'alemê ji Te ra wila nûranî nebe û Tu ewî wilo nebînî), Tu nikarî bigihîjî heqîqeta ayetên wî ce mala mûtleq, nûranîtî û münewwerîtîya wî menzera çavê dil û canê te jî, girêdayê bi wî dîtîn û wî teleqqîyê va ye, dema ku Tu wer bibînî, wilo teleqqî bikî, ew menzere mûnewwer dibin ku Tu di wan da bi hêsayî neqş û nemûşên hûr û kûrên xalên rûyên mehbûba heqîqî dikarî bibînî û temaşe bikî.

******

Gunehan ger nebûwa lezzet û zewqek haşa!
Faîlê ism ne dibû, tarik û taîb me'cûr.

ME'NA BÊJEYAN:
Haşa : Ne wisa ye, ne xêr, kî gotiye ku wisaye? (öyle değil)
Ism: guneh. (günah, yasak olan)
Faîlê Ism : Kesê gunahker,gunehkar. (günah işliyen)
Tarik: Yê ku tiştekî terk dike. (terk eden)
Taîb: Kesê ku ji gunehan tewbe dike, tewbekar. (tövbe eden)
Me'cûr : Xweyî ecir, xweyî xêr. (mükafatlandırılan kimse)

ME'NA HEMÎ:
Eger ku zewq û lezzet di gunehanda tune bû ya, ne tu kesî guneh dikirin, ne jî tu kes bi terka gunehan, (bi tewbe kirina ji wan), xweyî sewab û xêrê dibû. Yanê: Ji ber ku dikirina gunehanda lezzet û zewq heye, ji wî lezzet û zewqê da jî guneh tên kirin, dema ku mirof terka wî zewq û lezzetê jî bike, xweyî xêr dibe, me'cûr dibe.

******

Mey û me'şûq û hewesbazîyê dunyayê zuhûr
Ne bûwana, ne dibû îsmekî Ellah ê xefûr

ME'NA BÊJEYAN:
Hewesbazî: Heweslîstin (zevk ve heves oyunları)
Dunyayê zuhûr: Dunya geşîtî û xweşîtîyê,dunya geş û xweş. (güzellik ve aydınlık dünyası, güzel ve parlak olan dünya)
Ne bûwana: Ne bûna. (olmasaydı)
Xefûr: Yê ku gunahan di bexşîne. (günahları bağışlayan)

ME'NA HEMÎ:
Eger mey û me'şûq û heweslîstinên dunyaya xweşik ne bûna, dê navekî Xwedê, "Xefûr" neba, navê wî ne dibû Xefûr.
Yanê: Kesên gunehkar, mezherên navê **Xwedayê** "xefûr"in. Ew

navê Xweda, dixwaze ku gunahkar hebin, hetta ku Xweda wan bi xefirîne û teheqquûqa wî navê xwe yê **Xefûr** bike, ku mûtesewwifê mezin Abdulkerîmê ceylî jî, wiha dibêje:
العاصي والمطيع أمام الحق سواء Gunehkar û îtaetkar, li hember Xwedê wek hev in, herdû jî mezherên sifatên Wî ne.

******

Min guneh tê bi gunahan ku di nêv baxê cîhan
Semerî xweştir ewin, bûn bi heramî meşhûr

ME'NA BÊJEYAN:
Min guneh tê: Gunehê min pê tê. (onlara acıyorum)
Di nêv baxê cîhan: Di nav bax û baxçeyên dunyayê da. (Dünyanın meyve bahçesi içinde)
Semer: Fêkî, ber. (meyva)
Xweştir: Pirr xweş. (en lezzetli)
Bi heramî: Bi qedexe bûyînî. (yasak olmakla)

ME'NA HEMÎ:
Gunê min, heyfa min bi gunehan tê ku di nav bax û baxçê dunê da, ew ber û fêkîyên herî bi lezzet û xweş in. Lê mixabin! ku bi heramîyê, bi qedexe bûyînîyê meşhûr bûne (her kes di bêje ku qedexene). Ev te'bîr û teswîra Xanî ya edebî (gunê min bi gunahan tê), te'bîr û teswîrekî gellek bilind û walaye, gellek xweşik û balaye,pirr felsefî û pirr bi me'naye.

******

Hinkî dewrê felekê saxirê meh dewrî diket
Meh û salan digirit herwe ji emrê me qusûr

ME'NA BÊJEYAN:
Hinkî: Çuqas ku, ji wî demê da ku (o kadar, o zamandan beri)
Dewr: Dewran, zeman, çerx, gerr .(felekin dönmesi felekin çerhi)
Felek: Cîyê gerra gerrokeyên asîmanan, gerdûn. (yörünge)
Çerxa felekê: Dolaba gerdûnê. (Felekin çarhı)
Saxir: Saxer,qedeh (içki bardağı)

Cam: (Kadeh)
Meh: Hîv (ay)
Dewrî diket: Digerrîne. (devr edîyor,dolaştırıyor)
Meh û salan: (Ay ve seneler)
Digirit: Digire. (tutuyor,alıyor)
Herwe: Her wisa,her wiha. (böylece)
Ji emrê me: Ji temenê me (ömrümüzden)
Qusûr: Kurtî, kurt bûyîn. (kısa olmak)

ME'NA HEMÎ:
Ji wî dema ku çerxa felekê qedeha Hîvê digerrîne, ji wî demê da, ew meh û salên temenê me kin dike, her meh û salek ku dewr dike, ewî ji emr û temenê me dibe. Ku Xanî, teşbîha dunyayê bi meyxanê, teşbîha Hîvê jî, bi qedeha meya meyxaneyê, teşbîha jîyanê jî, bi serxwşîtîya serxweşan dike. -Ku haya wan ji tu tiştî nîne û namîne-, we dibêje ku çerxa felekê ji roja ku hîva xwe, wek qedeha meyê dewr dike û digerîne, ji wê rojê da, meh û salên temenê me kurt dike, ku qet heaya me jî, jê namîne.

******

Rabe ey saqîyê mehweş tu ji rexma felekê
Bide min badeî le'lî Tu ji cama fexifûr

ME'NA BÊJEYAN:
Mehweş: Weke Hîvê. (ay gibi)
Rexim: Rikk û înad. (inat)
Ji rexma felekê: Ji 'eks û înadê çerxa felekê,ji rikê wêva. (felekin aksine ve inadına)
Bade : Mey. (içki)
Badeî le'lî: Bada ku rengê wî wekî yaqûtê sore. (kırmızı yakut gibi)
Fexfûr: Fexpûr, navê paşayê Çînê ye. (fex=pût, pûr=kurr, law). (çin padişahın adı)
Cama fexfûr: Cam û qedeha ku ji porselenê Çînê ye. (Çin porseleninden kadeh)

ME'NA HEMÎ:
Ey saqîyê mehweş! Tu ji kerema xwe! Ji rik û înadê wê feleka ku herroj temenê me kurt dike, rabe û qedehekî ji wê badeya rengyaqûtî, bi cama fexfûrî bide min, ku bi wî, temen û jîna me, rûh û canê me geş û xweş bibe, pak û temîz be. Çewan ku Melayê Cizîrî jî gotîye:

Camê îşqê pakê rûhanî tehûra batine
Yê nenoşî her we ma hetta ebed napakî rûh

Qedehek bade bi destê xwe li qelbê me birêj
Aşiqê soxîte, bê ateşî seyyale çi hezz

Ateşî seyyale: Agirê ron ku meqsed jê bade ye.
Hezz: Zewq û piş û par.
Tehûra batine: Paqijaya derûnîye.

******

Şêxê cam er nefesî hemdemî dil ket bi murad
Li muradê dilê murde dibîtin keşfê qûbûr

ME'NA BÊJEYAN:
Şêx: Pîr, murşidî kamil (şeyh, pir)
Şêxê cam: Pîrê cama meyê, pîrê sazbendî û muzîqê ku cam hem bi me'na qedehe hem jî navê meqamekî muzîqêye. (mey ve muzik piri)
Nefesî: Hewakî, ahengekî, feyzekî me'newî. (bir nefes,bir manzum söz)
Hemdem: Heval, hem nefes.(arkadaş)
Murad: Miraz. xwestek, meqsed. (istenilen ve arzu edilen)
Dilê murde : Dilê mirî. (ölü gönül)
Dibîtin : Dibin. (oluyorlar)
Keşf: Kifş, eşkera. (açığa çıkan)
Qûbûr: (c, qebr) Gorr, mezelê mirîyan. (mezarlar)
Keşfî qûbûr: Eşkera bûyîna rewşa mirîyan di qebrên wan da ku dibêjin ev haletê şuhûdî ji hinek mirûfên kamil ra çê dibit, rewşa mirîyan di gorrên wan da dibînin û keşif dikin (ölülerin halinden anlamak ve mezarlarındaki olup bitenlerinden haberdar olmak)

ME'NA HEMÎ:
Eger ku şêxê camê bi nefesekî ji Ney û meya xwe, bi angorî murada dilê mirî, bixe hevalê wî dilê mirî (bidê, jê ra lutf û îkram bike) dê ji mirazê dilê mirî ra (bi angorî wî mirazî) keşfa qebran bibe,di qebra wî dilê mirî da, keşfa halê wî dilî bibe û bête zanîn ku ka gelo çîye û çawa ye? Bi feyz û bereketa wî nefesî, çilo sax bûye û jîya ye? Her wekî ku pîrê aşıqan, Îbnîl Farîdê jî gotîye:

(ولو نَضَحُوا منها ثرى قبر ميِّت لعاد إليه الروحُ وانتعش الجسمُ)

Eger ku hinek ji wê badeyê, bi ser xwelîya gorra mirîyekî da bireşînin, dê rûhê wî mirîyê bizivire balê û bedena wî bi pilpite û sax bibe.
We yan jî, me'na wê helbestê wihaye: Eger şêxê camê,bi meqseda hînbûyîna halê dilê mirî, nefesekî hemdemê wî dilê mirî bike, dê bi wî nefesî, keşfa halê wî dilê bibe û sirrên wî jê ra eşkera be, keşfulqubûrî çêbe û bibîne, bizane ku ka halê wî çîye û çawane..

******

Yanê ew xane yê gil nabite qabil qet'a
Ne bi çeşmê dilê nazir, ne bi rûyê menzûr

ME'NA BÊJEYAN:
Xane yê gil: Xanîyê ji çamûrê, ku meqsed jê dil e, we yan qebra dil e ku bedena însane. (çamurdan ev)
Nabite qabil: mûsteîdd û amade nabe (kabil ve isti'datlı olamaz)
Qet'a: Bi tu awayî. (asla!)
Çeşm: Çav. (göz)
Nazir: Mêzeker, bîna. (bakan, gören)
Menzûr: Lêmêzek (bakılan)

ME'NA HEMÎ:
Yanê ew xanîyê ji çamûrê, bi tu tişt û bi tu awayî, qabil û amade nabe (ne bi çavê dilê bîna, ne jî, bi rûyê xweşik û zîba) belkî, ji wî ra nefes û înayeta pîrê camê lazime, ku bi wî nefes û înayeta xwe, ewî mûsteîdd û qabil bigerrîne,ku çara wî her ewe; her 'îşq û badeya îşqê ye.

******

Îşqî bazî du terîqe, çi heqîqet çi mecaz
Şem'ê can dê bi qejîtin, çi bi nar û çi bi nûr

ME'NA BÊJEYAN:
Îşqbazî: Evîndarîlîstin, evîndarî. (aşk oyunu,aşık olmak)
Du terîqe: Du rêye, bi du rêyane. (iki yoldur,iki yol ile dir.)
Çi heqîqet, çi mecaz: Çi îşqa heqîqî be, çi ya mecazî. (hakiki veya mecazi olan aşk)
şem'î can: Mûma rûh. (can ve ruh mumu)
Bi qejîtin: Bi qijile, bi helle. (kızaracak, eriyecek)
Nar: Agir. (ateş)
Nûr: Şewq û şemal û ronahî. (aydınlık)

ME'NA HEMÎ:
Dermanê derdên dil (derman û çara qabilbûyîn û tekamula maddî û me'newî), Îşq û evîndarî ye ku ew jî, bi du rê û bi du cûra ne: heqîqet û mecaz ('îşqa heqîqî û 'îşqa mecazî). Divê ku mûma canê 'aşiqê evîndar, yan bi agirê îşqa mecazî, we yan jî, bi pertewa nûra 'îşqa heqîqî bi helle û bi qijile, pak û paqij bibe ku qabilîyyeta wî ji teleqqîya esraran ra çê bibe.
Yanê: Dema ku mûma can, bi agir û pêta îşqê qijilî û hellîya, di wê dema pîroz da, bi wasîta wê 'îşqê, perdeya tarîtîyên îmkanê, ji ber roja Ehedîyyetê radibe, şefeq davêje, di her tiştî da, di her derî da, pertewa tecellîya Nûra Îlahî ji can û dil ra di xuyê û eşkera dibe, di saya wî da, xweyê wî dil û canî, digihîje heqîqetê (digihîje merteba tekamula meqamê el fena û fi-llah, wel beqa û bîllah'ê) ku di wî meqamê Rebbanî da, qelb û can dibin qabil û mûste'îdd ji boy teleqqî û îdraka sirrê Wehdeta mûtleq ku ji ezel hetta ebed her tiştî di xwe da girtîye.

Sirrê Wehdet ji ezel girtîye hetta bi ebed
Wahîdek ferde bi zatê xwe we nînin çu 'eded
Afîtabê Ehedîyyet di xwe da girtîye kewn
Ne ku 'ewrek heye lê girtîye çavê me remed
-Mela-

******

Şebê zûlmatê bi îmkanê dibit subhî numa
Afîtabê Ehedîyyet ji feleq tête zuhûr

ME'NA BÊJEYAN:
Şeb: şev (gece)
Zûlûmat: (c.zûlmet) Tarîtî, ku mebestê tarîtîya tunetîyê ye. (karanlık, yokoluşun karanlığı)
Îmkan: Dibeyî, tiştê ku dibe bibe û dibe nebe. (wek hemî masûwayê Xweda). (olabilme, oluşu mümkün olan)
Subhî numa: Siba dîyar bûyî. (belirlenen sabah)
Afîtab: Roj, pertew û nûra rojê. (güneş ve güneşin pertevi)
Ehedîyyet: Yekîtî, xuyabûna yekîtîya Zatê Xweda yê mûtleq, ku Wahidîyyet jî, xuyabûna yekîtîya wî Zatê Ehed di gel Sifatên Wî ye. (her bakımdan bir olmak, Zati Îlahiyyenin kayıtsız ve şartsız olan birliği ve tekliği ki sıfatlarıyla beraber Wahidiyyet adını alır.)
Feleq: Şefeq, şefeq avêtin. (şafak sökmek)

ME'NA HEMÎ:
şeva tarîtîya tunetîyê, bi mûmkînatan dibe wek sibeya rohnî û Afîtaba roja Ehedîyyetê, ji şefeqa wan da tecelli dibe û tê xuyanê. (dîyar dibe)

******

Ser û mal û dilû canê me fidayê Te bitin
Bike qelbê me tu saqî ji şeraba xwe tehûr

Da bikem keşfê meqamatê ûlûwwê derecat
Ya bikem keşfê keramatê ji dara mensûr

ME'NA BÊJEYAN:
Tehûr: Pak û paqij. (tertemiz)
Meqamat: (c.meqam) Cî, cîke, rewş û halên me'newî. (makamlar)
Ûlûww: Bilind. (yüksek, yüce)
Derecat: (c.derece). Nerdîwan û pêpelok (merdivenler)
Keramat: (c.keramet). Kiramet û qencî (kerametler)
Dara Mensûr: Dara ku Hellacê Mensûr (.....922 m.) pê da bi darda kirine. (Hellacı Mensurun asıldığı ağaç)

Mensûr: Hellacê Mensûr, ku sofî û feylesofekî pirr mezin bûye, ji boy bîr û bawerîya wîya felsefî û tesewwifî, ewî bi darda kirine, ku li ber wî dara î'damê jî, bîr û bawerîya xwe îfade kirîye û gotîye "enel heqq" = (ez Heqqim, ez Xweda me, ez tecellîya wî yekê bi tenêyê mûtleqim). (Hellaci Mensur ki büyük bir mütesevvıf ve filozof olup, inandığı Wahdetil-vucud felsefesi uğruna, dar ağacına götürülmüş, idamı sırasında inancını "enel-hakk" ifadesi ile dile getirerek idam edilmiştir)

ME'NA HEMÎ:
Ey saqî! Ser û can û mal û dilê min fidayê te bin! Bi qurbana te bin tu ji kerema xwe ji mey û şeraba heqîqetê, qelbê me paqij û tahir bike! Da ku ez bi wî badeya pak û paqij, meqam û dereceyên me'newîyên bilind, bi dest bixim û keşfa kerametan ji dara Hellacê Mensûr da bikim, me'na gotina wî ya **"enelheqq"**, sirr û hîkmetên wî, îdrak û fêm bikim.

******

Zahîda! Ger Te divêtin tu xwedê nasî bikî
Were ber saye yê şîmşadî qedan,qet meçe dûr

Bi ziyadî were qeydê şecerê wadîyê quds
Ku bizanî bi bihê sît ê "enellah"ê ji Tûr

ME'NA BÊJEYAN:
Zahîda: Ey zahidê zahir perest! (ey sofi!)
Saye: Sî, sîber. (gölge)
şîmşadî qedan: Yên ku bejn û balên wan wekî dara şîmşadê xweşikin. (şimşad boylular)
Bi zîyadî: Bi zêdetirî. (daha ziyadesiyle)
Qeyd: Qeyd kirin, bend bûyîn, girêdan. (bağlama, bağlı olma)
Şecer: Dar (ağaç)
Wadî: Newal. (dere)
Quds: Pîroz (kutsal)
Wadîyê quds: Newala pîroza çîyayê Tûrî sîna ku li wê derê Musa Pêxember bi Xwedê ra axivîye. (Musa peygamberin Allah ile konuştuğu Turi sina vadisi)
Bi bihê: Bi bihîzî, seh bikî (duyasın, işitesin)

Seda : Deng. (ses, seda)
Enellahû: Ez Xweda me. (ben Allah'ım)
Ji Tûr: Ji çîyayê Tûrî sîna ku ji wî da dengê Xwedê hate Mûsa û jê ra got ez Xweda me. (Musa Peygambere; Allahın Teala'dan **"ben Allah'ım"** diye seslendiği Turi Sina dağı.)

ME'NA HEMÎ:
Ey zahid! Eger te divê ku tu Xwedê nas bikî, tu were ber sîya bejna bejin şîmşadan, xwe nêzîkî wan bike. Qet ji wan dûr nekeve, bi taybetî, tu bi alîyê wî dara pîroz va were û nêzîk wî bi be, jê dûr neçe ku tu deng û sedayê **"enellah"ê,** ji çîyayê Tûrî Sînayê, bi bihîzî û tecellîya pertewa cemala heqq bibînî.

******

Ez lema şîfîte û walihê mehbûba ne em
Ku di nêv ayîneyê cebhetê wan min dîye nûr

Her dema netrikê xilxal binê her têne xuroş
Her dema Turre ji ber tayî qeseb tête sudûr

Ya ne kakul ji kenarê kulehê kec bi derîn
Ya xetê mişkîn bi der têt ji kenarê Kaafûr

Kafirê Îşqem eger ez ne demê îmanê her
Ya bi mîhrabê brûyan ne birim secde ji dûr

ME'NA BÊJEYAN:
Lema: Lewra, ji wî sebebê, ji wî egerê. (o sebebten)
Şîfîte: Pirr evîndar û meftûn. (tutkun, düşkün)
Walih: Şît û şeyda. (aklı gitmiş, şaşırmış olan)
Mehbûban: (c.mehbûb) Hezkirîyan. (sevgililer)
Ayîne: 'Eyne, neynik. (ayna)
Cebhet: Enî. (alın)

ME'NA HEMÎ:
Ez ji vî eger û sebebî bûme aşiq û şeydayê mehbûb û bedewan ku min di nava neynika enîya wanda nûra tecellîya Xweda dîtîye.

*****

Her dema netrikî...

Netrik: Nedrik, perr-perr, şirrik, xelek û pellik û polikên hûrikên hilalî. (küçük halka ve hilal şeklindeki yaprak madeniler)
Xilxal: Bazinê çîpan. (ayak bileklerine takılan bir nevi zinet halkası, halhal)
Netrikê xelxal: Şirrik û polikên xilxalan. (halhal halkaları)
Binê: Mêze bikî, binhêrî. (bakarsan)
Têne xuroş: Coş û xuroş dibin. (coşarlar)
Turre: Tûncik, perçem. (alnın üstündeki saç)
Qeseb: Berbend. (alına bağlanan ince bez parçası, alın bağı)
Sudûr: Derketin. (dışarı çımak)
Tête sudûr: Derdikeve. (dışarıya çıkar)
Kakul: Tuncik.
Kulehê keç: Kofîya xwar. (eğik kulah)
Biderîn: Derkevin. (dışarı çıksalar)
Xetê mişkîn: Xet û rêzikên wekî miskê. (misk gibi hatlar)
Bi dertêt: Dertê. (çıkıyor)
Ji kenarê Kafûr: Ji kenarê dêmên ku wekî kafûrê bi bîhn û zêrrîn û sipî ne. (kafur gibi hoş kokulu beyaz ve şeffaf yüzün kenarından)
Kafûr: (Beyaz ve yarı şeffaf güzel kokulu bir maddedir.)
Kafirê Îşqem: Ez di mezhebê îşqê da kafir im, kafir têm hesibandin. (aşkta kafir ve inançsızım)
Mîhrabê birûyan: Birûyên ku wekî mîhrabê mizgeftan kevanin (cami mihrabları gibi kavslı ve hilalli kaşlar)
Ji dûr: Ji dûr va. (uzaktan)

ME'NA HEMÎ:
Her gav û demên ku şirrik û xelekên bazin û xilxalan, coş û xuroş bibin, we yan ji ber tayên berşeqî û berbendan, qişt û kakûlên wê der kevin, we yan ji kenarên kofîya xwar, gulî û kezî derên derva, we yan jî, ji kenarên dêmên kafûrî, xal û xetên mişkîn derên. Ez di mezhebê 'îşqê da bê dîn û kafir têm hesibandin, eger ku ez di wan deman da, di mîhrabên brûyên wê da, ji dûrîva secde nebim û jê wê şox û şepalê ra serê xwe daneynim û ewê neperesim.

******

Waiza guh bide min da bibihê neqlê sehîh
Mushefa çehre yê xûbane kitêba mes'tûr
Defterê îşqê neda dest te mûellim ji ezel
Me'neya ayetê husnê li te lew ma mesitûr
Bê tekelluf duxwerim sondê bi Qur'an a şerîf
"Xanîy"a sûretê canane bi min sûretê Nûr

ME'NA BÊJEYAN:
Waîza: Ey pendgo! (ey vaiz!)
Guh bide min: (Bana kulak ver)
Da: (Taki)
Bibihê: Bibhîzî, seh bikî (işitesin)
Neqil: Gotin û xeber. (haber, rivayet)
Sahîh: Rast û durust. (doğru)
Neqlê sehîh: Xeber û gotinên rast. (doğru haber)
Mushef: Pirtûka rûpel rûpel nivîsandî. (sahife sahife yazılı kitab, Kur'an)
Çehre: Dêm. (yüz)
Xûban: Rind û bedewan. (güzeller)
Kitêb: Pirtûk. (kitab)
Mes'tûr: Rêz kirî, nîvîsandî. (satır satır yazılı)
Defterê îşqê: Deftera evîndarîyê. (aşk defteri)
Mûellim: Seyda, mamosta. (öğretmen)
Ayetê husnê: Belge û nîşanên rindîtî û bedewîtîyê. (güzellik belgeleri)
Ji ezel: (ezelden)
Li te: Li ber te. (yanında)
Lew: Lewra. (çünkü)
Ma: (kaldı)
Mestûr: Perde kirî, ser girtî. (örtülü, gizli)

ME'NA HEMÎ:
Ey waizê pendigo! Tu guhê xwe qenc bide min! Da ku tu Gotinên rast û durust bibhîzî ku Mushefa rûyên mehbûban kitêba pîroza rêzkirî ye, tu evî jî baş bizanbe ku Xweda ji ezel da deftera îşqê nedaye destê te (te ew defter nexwendîye), ji wîye jî ku ayet û

belgeyên rindayê li ber te veşartî man e, tu ewan nabînî û jê fêm nakî.

******

Bê tekelluf dixwerim .....

ME'NA HEMÎ:

Ey Xanî! Ez bê zehmet û bê tekelluf bi Qurana pîroz sond dixwim ku li ba min sûret û dêmên Mehbûban wekî sûretê nûrin, (çawan ku di sûretê nûr da behs û teswîra navê Xweda yê **Nûr** heye, wisan jî di sûretên dêmên te da tecellîya wî nûrî heye, ew di wî sûretê te yê pîrozda di çilwile û di xuyê).

- SAZÊ XWEŞ AWAZ -

Seydê pencahê serê zulfa şeha şehbazim Ez
Mestê cama îşweya şehnazê nazik nazim Ez

Remz û î'cazê di xûban bê îbaret medh dikem
Murşidê kamil Ez im Îrohe, sahib raz im ez

Vê heyata heyretê çi-bkem beqa nîne ji bo
Lew şehîdê xemzeya wê dîlberâ tennaz im ez

Derdimendek min divêtin hem nefes bit Xanî ya!
Ger me hemdestek hebitin sazê xweş awaz im ez

.....

Seydê pencahê serê zulfa şeha şehbazim Ez
Mestê cama îşweya şehnazê nazik nazim Ez

ME'NA BÊJEYAN:
Seyd: Nêçîr. (av)
Şeha: Şaha, Padişaha. (kıraliçe)
Şehbaz: Bazîyê bi quwwet û mezin. (şahin, çevik ve becerikli şahin kuşu)
Îşwe: Cilve û nazîyên dîlberan. (güzellerin naz ve edası)
Şehnaz: Ya ku nazî û delalîyên wê wekî yên şaha ne. (şaha mahsus değerli ve hoş nazlar sahibi olan güzel)
Naziknaz: Ewa kû nazî û delalîyên wê letîf û xweşikin (nazları nazik olan)

ME'NA HEMÎ:
Ez nêçîra pencê serê zulfê wê padîşaha şehbazim, Ez mestê cama meya nazî û delalî yên wê şehnaza nazik nazim.

******

Remz û î'cazê di xûban bê îbaret medh dikem
Murşidê kamil Ezim îrohe, sahib razim Ez

ME'NA BÊJEYAN:
Î'caz: Aciz kirin, mat kirin, gotin û kir û karên wekî mû'cîzan. (acze düşürmek, mucize derecesinde düzgün ve icazli söz söylemek)
Di: Daçeka pirratîyêye, edatê cem'ê ye. (çoğul edatıdır.)
Xûban: Rind û bedewan. (güzeller)
Îbaret: Peyîvandin. (ifade, söz)
Medh: Pesin. (övme)
Murşid: Rê nişan, pîr. (irşad eden)
Kamil: Gihîştî. (ermiş, olgun)
Îrohe: Îro. (bugün)
Sahib: Xweyî. (sahib)
Raz: Sirr, tiştên derûnî. (giz)

ME'NA HEMÎ:
Ez bê kelîme û bê peyvandin medh û sena û pesnê sirr û î'cazên rind û bedewan dikim. Ez îro murşidekî kamil im, xweyê me'newîyat û sirr û hîkmeta me.

******

Beydeya Ez tê ebes bû, aşîyana min qefes
Gerçî dil tê pirr hewes bû, bê perr û perwazim Ez

ME'NA BÊJEYAN:
Beyde, beyze: Hêk. (yumurta)
Beyzeya ez tê: Hêka kû ez têda me. (içinde bulunduğum yumurta)
Ebes: Berredayî, cilq (bozuk, çürük)
Aşiyan: Hêlîn, hêlûn (kuş yuvası,ikametgah)
Qefes: Qofcan (kafes)
Perr: Bask (kanat)
Perwaz: Firrîn (uçmak, uçuş)

ME'NA HEMÎ :
Ew hêka kû ez têda me (dunya) wek hêkekî beredayî û xirab bûyî ye, hêlûna min (bedena min cîyê min) jî, ji min ra wekî qefese, gerçî dilê min tê da pirr hewes bû, lê ez bê bask û bê firrînim. Di

vir da işaretê bal wî felsefa Eflatûn va heye kû dibêje: Rûh di qefesa bedenêda hebs bû ye. Ku Xanî di Memo Zîn a xwe da jî ewê felsefeyê wiha teswîr dike:

Ew bulbul eger çî pirr hewes bû
Zîndanê beden li wî qefes bû

Ew bulbulê can di mehbesê ten
Maye bi tenê mîsalê Bêjen (*)

Teyrê kû qefes ji ber vebûyî
Ew renge firrî wekî nebûyî
.....

******

Vê heyata heyretê çibkem beqa nîne ji bo
Lew şehîdê xemzeya wê dîlbera tennazim ez

ME'NA BÊJEYAN:
Heyat: Jîyan. (yaşam)
Heyret: Şaş bûn, mûheyyer bûn. (şaşkınlık)
Beqa: Mayîn, dewam. (kalış)
Ji bo: Ji bona wî. (ona, onun için)
Lew: Lewra, loma. (onun için)
Xemze: Awir, mêze kirina di binê çavra. (süzgün bakış)
Tennaz: Pirr bi henek û pirr tinaz. (çok şakacı)

ME'NA HEMÎ :
Ez çi bikim bi wî jîyana heyret engîza ku ji bo wî beqa tuneye, fanîye (ez wî navêm). Ku lewra jî,ez bûme şehîdê awirên çavên wê dîlbera pirr tinaz û henek xweş. (Min tercîha mirinê li ser wî jîyana beredayî kirîye)

(*) **Bêjen**: Pehliwanekî çîrokîyê şehnama Firdewsîye. Ku dijminê wî ewî girtine û avîtine hebsê.

******

Derdimendek min divêtin hem nefes bit 'Xanî ya!
Ger me hemdestek hebîti, sazê xweş awazim Ez

ME'NA BÊJEYAN:
Derdimendek: Kesekî bi derd û kul. (dertli)
Hemnefes: Heval. (arkadaş, musahib)
Hemdest: Hevalê ku dest dide meriv û alîkarîyê dike. (muttefik, destek veren)

ME'NA HEMÎ :
Ey Xanî! Ez divêm û arzû dikim ku yekê derdimend hevalê min be, lewra eger ku destekekî min hebe, ez sazekî xweş awaz im, (deng xweş im), dikarim ji pirr derd û kulan ra, bibim melhem û derman.

- HER DINALIM -

Her di nalim şev û rojan, meger ez Eyyûbim ez
Hêstiran her vedimalim, meger ez Ye'qûbim ez

Bigirin dest ji me bêrûn, kul û derdan ku yek in
Wer bi pêçin bi cefayê xwe, ku ez mektûbim ez

Hindekî xem hene daîm li min ew vêk dikevin
Ez nizanim ku bi çav wan çi qewî mehbûb im ez

Xem telebkarê meye, em xo telebkarê dîyar
Weh tilismê telebim ez, talib û metlûbim ez

'Eceb îqbalî ji bo min nihe "Xanî" ku li bal
Padîşahê xem û derdan wehe ez merxûbim ez

.....

Her di nalim şev û rojan, meger ez Eyyûbim ez
Hêstiran her vedimalim, meger ez Ye'qûbim ez

ME'NA BÊJEYAN:
Meger: Qeyê, dibe ku. (oysa ki, şu halde)
Eyyub: Eyyûb pêxemberê ku bi derd û îlletekî pirr xeddar giriftar bûye û sebrû şukur kirîye, bûye numûna sebr û tehemmulê. (sabır kahramanı hazreti Eyyüb peygamber, İshak peygamberin torunlarındandır.)
Ye'qûb: Pêxemberekî mezine, bavê Yûsuf pêxembere, lawê Îshaqe, maceraya wî û Yûsuf Pêxember di Qur'anê da derbas dibe, ku ji boy kurê xweyê Yûsuf pirr girîyaye hetta ku çavên wî sipî bûne, kor bûne. (Kur'an'da adı geçen peygamberlerden olup, Yusuf peygamberin babası ve İshak peygamberden İbrahim peygamberin torunudur ki, bir adı da İsraildir. Beni İsrailliler (yahudiler) ondan dolayı İsrailoğulları adını almışlar.)
Vedimalim: Paqij dikim. (siliyorum)

ME'NA HEMÎ:
"Ez wekî Eyyûb pêxember bi şev û bi roj, her tim dinalim, wek Ye'qûb pêxember jî her tim hêsiran ji çavên xwe dimalim, paqij dikim. Qeyê ez bûme Ye'qûb pêxember ku her wiha ji çavên xwe hêsiran dimalim, digirîm û dikalim.

******

Bigirin dest ji me bêrûn, kul û derdan ku yek in
Wer bi pêçin bi cefayê xwe, ku ez mektûb im ez

ME'NA BÊJEYAN:
Bêrûn, bîrûn: Derva. (dışarı)
Bigirin dest ji me bêrûn: Destê xwe ji me bi derva da bigirin, dest ji me bikşînin, dev ji me berdin. (elinizi bizden çekin, bizi rahat bırakın).
Kul: Birîn, rîş. (yara)
Derd: Nexweşî, keder (hastalık, illet, keder)
Ku yekin: Ku di heqqê me da, li ser me bûne yek, îttîfaq kirine. (bize karşı bir olmuşlar)
Wer: Were, wilo (gel, öylesine)

ME'NA HEMÎ:
Destê xwe ji me bikşînin, dev ji me berdin, li dermanê me negerin! Hemû kul û derd bi hevra li ser me bûne yek, ne mumkine ku em ji pencê wan xilas bin. Ya qenc ewe ku hûn bi ezîyyet û cefayên xwe, me wekî mektûb (wekî name) li hev bipêçin û bihêlin, (ku ez bi dil û can û leş û bedena xwe, mektûb û nameya 'îşq û evîna we me).

******

Hindekî xem hene daîm li min ew vêk dikevin
Ez nizanim ku bi çav wan çi qewî mehbûb im ez

ME'NA BÊJEYAN:
Hindekî: Çiqas, qederekî pirr. (ne kadar varsa)
Vêk dikevin: Li hev dicivin, digihîjin hev. (bir araya geliyorlar, toplanıyorlar)
Bi çav wan: Di çavê wanda. (onların gözlerinde)

Çi qewî: Çiqas bi hêz û quwwet. (ne kadar dayanıklı, ne kadar kuvvetli)

ME'NA HEMÎ:
Çiqas xem û keder hene, ew daîma li min dicivin û dighîjin hev. Ez nizanim ku di çavên wan da ez çiqas bi hêz û quwwet im, hezkirîyekî wanê çilo qewî me ku qet ji min naqetin, daîma li min tên hev, tim li min dicivin.

******

Xem telebkarê meye, em xo telebkarê dîyar
Weh tilismê teleb im û talib û metlûb im ez

ME'NA BÊJEYAN:
Telebkar: Xwestekar, ârzûmend. (istekli, arzulu)
Em xo: Em bixwe. (kendimiz)
Yar: Dost. (sevgili, dost)
Dîyar: Dîdar, ruxsar. (çehre, yüz)
Weh: Çi ecêbû xerîbe, beh-beh, we-wiha. (hayret, ne gariptir ki ve böyle)
Tilism, tilsim: Sirr. (herkesin bilip çözemediği gizli sir, definenin bulunmasına mani olan mevhum şey)
Taleb: Xwestin, xwestek. (isteme, istenme, istek)
Talib: Xwazmend, telebkar. (isteyen)
Metlûb: Tiştê ku tê xwestin, xweste. (istek, istenilen şey)

ME'NA HEMÎ:
Xem û keder telebkarê me ne, me dixwazin. Em bi xwe jî, xwestekarê dîdara yarê ne, ez tilsim û sirrê xwestinê me, pirr sosret û xerîb im, hem talib im, hem jî metlûb im, xem min dixwazim ez jî dîtina yarê.
Dibe jî ku **dîyar** cem'a "dar" ê be, bi me'na cîh û war û êwirgehên welat. Ku yanê; derd û xem li me digerin, em jî li welat û êwirgeh û warên welat digerin.

******

'Eceb îqbalî ji bo min nihe? "Xanî" ! Ku li bal
Padîşahê xemû derdan, wehe ez merxûbim ez

ME'NA BÊJEYAN:
'Eceb îqbalî: Êqbal û bextekî 'ecêb û enteresan. (hayret verici bir baht)
Nihe: Nîne, qeyê nîne. (değilmi)
Li bal: Li cem, li nik. (ininde, yanında)
Wehe: Wiha. (böyle)
Merxûb: Xwestî, daxwazbûyî, bi rexbet. (rağbet edilen, istenen)

ME'NA HEMÎ:
Ey Xanî! Gelo ev ji boy min êqbal û bextekî enterasan û 'ecêb nîne ku li nik padîşahê derd û xeman (li nik wê dost û yara mina ku padîsahê derd û xeman e), ez wiha bi rûmet û rexbet im ku, ewî min ji derd û xeman ra niqandîye, derd û xemên xwe kirîye nesîb û para min.
Belê! Ew êqbal û bext û tali'ekî herî 'ecêbe, nerxekî herî mezine ku ewî padişahê xem û derdan, me ji boy wan ra laîq û munasib dîtîye û niqandîye, mezherê wî îltifata xwe ya şahane gerrandîye.

- EY MUTRIBÊ DEMSAZ -

Hêdî li brîşim bide ey mutribê demsaz
Sed dil bi devin, beste û her yek bi dused naz

Ey badê seba pirr nehejîn turreyê dildar
Ûşşaqê bi nalîne ji murxûleyê şehnaz

Saqî! Bi gerrîn badeyê engûrê bi tenbûr
Cana! Bide min boseyekî her we bi dil xwaz

Rûhê min û sirra di ruxê yarê bi yek ra
Roja ezelî bûne bi dil hemdem û hemraz

Xanî te xelet zanî ku ew her ji xwe yek bûn
Xellaqê teeddud bi mezahir kire î'caz

.....

Hêdî li brîşim bide ey mutribê demsaz
Sed dil bi devin, beste û her yek bi dused naz.

ME'NA BÊJEYAN:
Hêdî: Hêdîka. (yavaş)
Brîşm, ebrîşim: Hevirmûş, evrîşim. (ipek)
Bide: Lêxe, lê bide. (vur, çal)
Mutrib: Mirtib, dengbêj, sazbend. (çalgıcı, tareb veren)
Demsaz: Hemdem, heval û hogir. (arkadaş, sırdaş)
Bi devin: Di devda ne. (ağzındalar)
Beste: Girêdayî. (bağlı)

ME'NA HEMÎ:
Ey sazbendê hemdem! Hêdî li têlên sazê xwe -yên ku ji ta û têlên hevirmûşên zulfên yarê ne- bide, hêdî bi jene, ku lewra bi sedan dil, bi hezaran nazî û nîyaz, di nav wan têlan da ne. Tu ji kerema xwe! hêdî bijene, ku tu ewan ne êşînî û rencîde nekî!

******

Ey badê seba pirr nehejîn turreyê dildar
Ûşşaqê bi nalîne ji murxûleyê şehnaz

ME'NA BÊJEYAN:
Badê seba: Bayê sibê. (sabah rüzgarı, sabah nesimi)
Mehejîn: (sallama)
Turre: Tuncik. (alındaki saç, perçem)
Dildar: Dilgirtok, ewa ku dila bi alîyê xwe va dikêşe. (kalbi hükmü altında tutan sevgili)
Ûşşaq: (c.'aşiq) Evindaran. (aşıklar)
Bi nalîne: (inleme ve inilti ile dir)
Murxûle: Tuncik, perçem. (kakül)
Şehnaz: Wekî Şahan bi nazî û delalî, rind û xweşik. (çok güzel ve nazlı olan)

ME'NA HEMÎ:
Ey bayê berbanga sibê! Tu perçem û tuncika dildarê pirr nehejîne, lewra ji wê tuncika şahnaz da pirr aşiq û evîndar bi nalîn û zarînin (dilên pirr aşiqan di nav wê tûncikê da veşartî ne)

******

Saqî! Bi gerrîn badeyê engûrê bi tenbûr
Cana! Bide min boseyekî her we bi dil xwaz

ME'NA BÊJEYAN:
Badeyê engûr: Meya tirîyan. (üzüm şarabı)
Cana: Ey ruh û canê min, ey mehbûba min. (benim canım sevgilim)
Boseyekî: Ramûsanekî. (Bir öpüş)
Her we: Her wiha, her wisa. (böylece)
Herwe: Badîhewa. (bedava)
Bi dil xwaz: Bi dil xwazî, bi arzûya xwe. (gönül arzusuyla)

ME'NA HEMÎ:
Ey saqîyê meygerr! Tu badeya engûrê, bi sazê tenbûrê ra bigerrîne. Ey canê min (mehbûba min a wekî canê min) ji kerema xwe! Tu jî, her wisa bi dilxwazî ramûsanekî bide min!

******

Rûhê min û sirra di ruxê yarê bi yek ra
Roja ezelî bûne bi dil hemdem û hemraz

ME'NA BÊJEYAN:
Sirr: Raz. (giz)
Rux: Rû, ruxsar. (yüz)
Sirra ruxê yarê: Sirr û razên rûyê dostê. (yarın yüzündeki sırlar)
Roja ezelî: Roja seretayî, bê serî û bê berî. (ezelden berî)
Bi dil, bedil: Bi dilê xwe, bi dil û can. (gönül rızasıyla, içten)
Hem dem: Hem nefes, heval. (arkadaş, can ciger)
Hem raz: Sirrdar, hevalê sirr û razên hev. (sırdaş, en yakın arkadaş)

ME'NA HEMÎ:
Rûhê min û razên rûyên mehbubê, ji roja ezelî da bi hevra bi dil û can bûne hem dem û hem raz. (Ji wî rojê da hetta îro bi hev ra bûne û ji hev cuda nebûne)

*****

Xanî te xelet zanî ku ew her ji xwe yek bûn
Xellaqê teeddud bi mezahir kire î'caz

ME'NA BÊJEYAN:
Xelet: Çewt, şaş. (yanlış)
Xellaq: Çêkrox. (yaratıcı)
Teeddud: Çendbûyîn, pirr bûyîn. (çoğalma)
Mezahir: (c.mezher) Xûyange. (mezherler, eşyanın görünen tarafarı, açığa vurdukları)
Î'caz: Mande kirin, mat kirin, îcad kirirna tiştên netewanayî, tiştên ku ji quwweta mirof nayîn, tiştên mu'cîze û xarîqe. (aciz bırakmak, mucizelilik olan şeyler)

ME'NA HEMÎ:
Ey Xanî! Te meselyê çewt teşxîs kirîye û bi şaşîtî zanîye ku tu

dibêjî: "Ruhê min û sirra rûyê yarê di ezelda bi hev ra hemdem û hemraz bûne", lewra ew her ji xwe yek tiştek bûne, dudutî û çendîtî tune bûye ku hetta hemdemîtî û hemrazîtî jî hebe, belkî yek tiştek bi tenê hebûye û heye, ku ew jî, ew wucûd û hebûna mûtleqa ezeliya bi tenê ye û hew! Ji wî bêtir tu tiştekî din tune ku hetta bi bibin hemdem û hemrazên hev jî. Xweda, çendîtî û teeddud a bi mezahiran (bi hemî cûrên alemê) kirîye î'caz, (wek mu'cîze gerrandiye) ku yek tiştekî bi tenê di pirr mezahiran da nîşan daye, ku her çiqas bi zahirî, çendîtî û teeddud dixuyê jî, lê di heqîqet da yekîtî û wehdet mewzûbehs e; yek tiştek bi tenê heye, di pirr xûyangeh û pirr neynikan da di xûyê, wek rojê, ku di pirr neynikan da pirr sûretên wî dixûyên, lê di heddê zatê xwe da yek tiştek e, yek rojek e, di pirr mezahiranda di çirûse û dixûyê. Çawan ku Melayê Cizîrî jî gotîye:

Yek e, yek tê, yek dimîne, ewwil û axir yek e
La cerem, nabî du bî, yê dê bimînit her hebû
- Mela -

La cerem: Bê guman, muheqqeq
Nabî du bî: Nabe ku du tişt be
Yê dê bimînit: Ew tiştê ku wê her bimîne
Her hebû: Ew her hebûye jî, tiştê ku ebedî be, ezelîye jî.

- DILÊ ŞEYDA -

Dîsan dilê şeyda ji nû da îxtîyar perwazî kir
Seydek dîye ber daye dû, meyl û firra şehbazî kir

Meyla wî mehza hîkmet e, seyda wî 'enqa sîret e
Teyrê wî bala hîmmet e, lewra teleb efrazî kir

'Enqa bi dest kes nakevit, damek divê ew dakevit
Nabit ku xafil rakevit yê qesdê seyda bazî kir

Seyyadîya min bû 'ebes, daîm li min teng bû qefes
Rahet benûm ez yek nefes, min lew bi efxan sazî kir

Saz û semaya suhbetê, govend û çerxa de'wetê
Fikrîme şekl û qametê, bîr têne mi-b awazî kir

Şeklê mecazî çendek e, seyda heqîqî werdek e
Teyxûnê qeyda lê veke behrê, me ber endazî kir

Zincîr dibê teyxûn bitin, cendek li pêşber xûn bitin
Şunqar ne dê mecnûn bitin, uskûf ji çavan bazî kir

Şunqare çav teyxûne dil, berdane dû çavên bi kil
Xanî! Ewan gêra xecil, lewra mecaz axazî kir

.....

Dîsan dilê şeyda ji nû, da îxtîyar, perwazî kir
Seydek dîye ber daye dû, meyl û firra şehbazî kir

ME'NA BÊJEYAN:
Ji nû: Ji nuhda, carekdin. (yeniden, bir daha)
Îxtîyar: Vayîn, wîstin. (talep ve irade)
Perwazî: Firrîn. (kanat açmak, uçmak)
Da îxtîyar, perwazî kir: Va û firrî. (uçmak istedi)
Seydek: Nêçîrek. (bir av)

Berdaye dû: berê xwe daye dû, bi dû wî ketîye, li dû wî diçe. (ona yönelmiş, arkasından koşuyor)
Şehbaz: Bazîyê şaha ne, şahê bazîyan. (şahinlerin kralı. üstün kaliteli şahin)

ME'NA HEMÎ:
Dîsan jî dilê dîn û serxweş, ji nûve xwest û firre (firrîn xwest) Nêçîrek dîye û daye pey wî, bi mêl û vayîna firrekî wek ya Şehbazan, bi du wî Nêçîrê ketîye.

******

Meyla wî mehza hîkmete, seyda wî 'enqa sîrete
Teyrê wî bala hîmmete, lewra teleb efrazî kir

ME'NA BÊJEYAN:
Mehd, Mehz: Sade, safî, bi tenê (ancak, yalınız, sadece, tek)
Hîkmet: Sirr û hîkmet, zanîna heqîqî (sır ve hikmet, gerçek bilgi, felsefe)
Seyda wî: Nêçîra wî. (onun avı)
'Enqa: Teyrê 'Enqa, balendeyekî efsanewîye. (anka kuşu, efsanevi bir kuştur)
Sîret: Rewş û sifet (bir kimsenin hali, hareketi, ahlaki, manevi yolu)
Teyr: Balende, perrende. (kuş)
Bala: Bilind. (yüksek)
Hîmmet: Meyl û vayina dil, xwestina dil. (kalp isteği ile gösterilen azim ve gayret)
Efraz: Bilind, li jor. (yüksek)
Efrazî: Bilindayî. (yükseklik)

ME'NA HEMÎ:
Meyl û vayîna wî, sirr û hîkmetekî cudayî û mûmtaz e. Nêçîra wî 'Enqa sifet e, (wek enqa yê ye tu kes nagihîjê û nikare bigre). Ew teyrê wî, (teyrê ku ew bi pey wî ketîye, dixwaze nêçîr bike.) pirr teyrekî hîmmetbilind e, Lewra ku ew jî telbe û daxwaza bilind firrînê dike (teyrê ku dil bi pey wî ketîye, pirr hîmmet bilind e, lewra dil jî telba bilindayê, bilind firrînê dike, bilind difirre).

******

'Enqa bi dest kes nakevit, damek divê ew dakevit
Nabit ku xafil rakevit, yê qesdê seyda bazî kir

ME'NA BÊJEYAN:
Nakevit: Nakeve. (elde edilemez)
Damek: Dafikek. (bir tuzak)
Divê: Lazime. (lazım, gerekli)
Dakevit: Bêdanîn. (kurmalı, sermeli)
Nabit: Nabe. (olmaz)
Xafil: Bêxeber. (dikkatsiz, haberi olmayan)
Ê, yê: Ew kesê ku. (o kimse ki)
Qesd: Qest, xwest û îrade. (kast etmek)
Bazî: Başok. (Bazi kuşu, çevik bir av kuşudur)
Qesdê seyda bazî: Qesta nêçîra teyrê Bazî. (Bazi kuşunun avlanma isteği)

ME'NA HEMÎ:
'Enqa bi destê kesî nakeve, divê ku dafikek bête danîn! Ew kesê qesta wî ewe ku nêçîra Bazî bike, divê ku ew bê dîqqet û xafil nebe, daîma bi dîqqet û hişyar be! Ku firsetê nerevîne.'

******

Seyyadîya min bû 'ebes, daîm li min teng bû qefes
Rahet nebûm ez yek nefes, min lew bi efxan sazî kir

ME'NA BÊJEYAN:
Seyyadî: Nêçîrvanî. (avcılık)
Qefes: (kafes)
'Ebes: Beredayî, bê fêde. (abes, faydasız, boş)
Efxan: Fîxan, hewarî û zarî. (fizar, ağlayıp inlemek)
Sazî: Saz zenî, dengdana wek sazê. (sazcılık, saz gibi çalmak)

ME'NA HEMÎ:
Nêçîrwanîya min beredayî çû, bê fayde bû, daîma qefes li min teng bû (min pirr zehmetî û îztîrab kişandin). Ez yek nefesek, yek

lehzek rihet û hêsa nebûm. Lewra min fîxan û fîzar kir, û dikim, karê min fîxan û fizar û ah û wah bûn. Min, bi fîxan û fîzarên xwe dengê sazan çêkir, fîxan û fîzarên min bûn wekî saz, wek saz nalîyam û zarîyam û dinalim û dizarim.

******

Saz û semaya suhbetê, govendû çerxa de'wetê
Fikrîme şeklû qametê, bîr têne mi-b awazî kir

ME'NA BÊJEYAN:
Sema: Cûrekî reqsû govendêye. (mevlevilerin zikir esnasındaki dönüşleri)
Suhbet: Bi hevra hevalîtîkirin û xweş peyvandin. (sevdiği kimselerle tatlı, tatlı sohbet etmek, konuşmak)
Çerx: Lihev zivirandin. (çark etmek, dolap gibi dönmek)
De'wet: Govend, reqs. (oyun, raks etmek)
Fikrîme: Lê fekirîm, min anî hişê xwe. (düşündüm, aklıma getirdim)
Şekil: Resm û rewş, çehre. (biçim, dış görünüş)
Qamet: Bejin, Endam. (boy, pos)
Bîr tîne: Têne bîra min. (aklıma gelir)
Min bi awazî kir: Min bi deng û seda kir. (beni yüksek sesli yaptı)

ME'NA HEMÎ:
Dema saz û semaya suhbetê, govend û çerx û fitlên de'wetê ku di wê demê da ez li bejnû bala yarê fekirîm, ew bejn û bal û Rewş û şekl û sîmayên wê hatin ber çavên min û di bîra min hatin, nalîn û fîxan ji min çûn. We yan ewan min bi fîxan û awaz kirin.

******

Şeklê mecazî cendeke seyda heqîqî werdeke
Teyxûnê qeyda lê veke behrê, me ber endazî kir
Zincîr dibê teyxûn bitin, cendek li pêş ber xûn bitin
Şunqar ne dê mecnûn bitin uskûf ji çavan bazî kir

ME'NA BÊJEYAN:

Şeklê mecazî: Sûretê ne heqîqî. (mecazi olan, hakiki olmayan suret)

Cendeke: Cesed û gewdeyê bi rûh û can e, wek wî ye. (gövde ve cansız maddi bedendir, onun gibidir)

Seyda heqîqî: Nêçîra heqîqî. (gerçek av)

Werdeke: Werdeka derya heqîqetê û me'rîfetê ye. (ördektir)

Lê: Li wê werdekê. (o ördeğe, o ördek için)

Qeyda lêvek e: Girêdayê lêv û sahil û kenarekî ye. (bir sahile ve bir kenare bağlıdır.)

Veke behrê: Tu veke û berde behrê, we yan Teyxûn wê qeydên xwe veke û xwe berde behrê. (çöz ve denize sal, veya o Tayxun kendisini çözüp denize dalar)

Teyxûn: Teyrekî nêçîrê ye, ji başokê mezintir e (doğan kuşu)

Qeyda lê veke: Qeyd û bendan lê veke ku ji wan derê û bi dû nêçîra werdekê bikeve û xwe berde behrê. (tayxunu salla ki ördekin arkasından denize dalsın).

Teyxûnê qeyda lê veke: Teyxûnê qeyda li werdekê veke. (tayhun ördeğe kayıtlarını çözer)

Berendazî: Avêtin, hilfirandin. (atmak, uçurtmak)

Berendazî: Berpêavêtin, ber bi wî firandin. (ona atmak ve ona uçurtmak)

Me berandazî kir: Me hilfirandinî kir, me wî Teyxûnê bi alîyê deryayê va hilfirand. (biz o kuşun denize doğru salıverilmesini sağladık, onu denize doğrü uçurttuk)

Zencîr divê teyxûn bitin: Divê ku Teyxûn bê zincîr kirin, bê bendkirin, bê girêdan. (Tayxun'un zincire vurulması ve bağlanması gerekir)

Cendek li pêş ber xûn bitin: Divê ku cendek li pêşber wî Teyxûnî xwîn bibin, cendek û goştê serjêkirî bidin ber wî, we yan ji wî ra, ji boy wî ra cendek bên serjêkirin û li pêşber wî bên danîn. (onun için cesedler kesilmeli ve onların eti Tayxun'un önüne konulmalı)

Teyxûnê qeyda lê veke behrê, me ber endazî kir: Me ewî Teyxûnê ku girêdayê lêv û kenarekî deryayê ye, vekir û bi alî deryayê da, li dû wê werdekê avêt û hilfirand, we yan tu wî Teyxûnê ku di qeyd û benda da ye, li dû wê werdekê veke deryayê (bendên wê veke û li pey wê werdekê bavê behrê) ku

me jî wisa kir: Ewî Teyxûnî vekir û bi alî behrê da hilfirand, li dû wê şand.

Şunqar ne dê mecnûn bitin: Ma qey şunqar jî şît û dîn nabe, nebû ye? (belê ew jî dîn bûye) ku uskûfê ji ser çavê xwe rakirî ye, ew jî 'elamet û nîşana wî qasî ye ku ew jî dîn dibe, dîn bû ye, divê ku ew jî bête zincîr kirin, bête girêdan. (sanki şenkar da deli olmamışmıdır ki gözlerinin örtüsünü kaldırıp açmıştır, hiç şüphe yoktur ki oda delirmiş, deliler gibi onu da zincire vurmak ve zencirle bağlamak gerekir)

Zincîr: Zincîl. (zencir)

Dibê: Lazime, bivênebêye. (gereklidir)

Bitin: Bibe, bive. (olmalı)

Çendek: Qederek, hinek. (bir miktar)

Pêşber: Pêşî, li ber. (ön)

Şunqar, şenqar: Teyrekî nêçîrêye, ji başok û teyxûnê mezintire û bi quwwettire.

Ne dê: Ne ku wê. (olmamalı)

Mecnûn: Şit û dîn. (deli)

Iskûf, uskûf: Çûrekî ji perdeyên serçavane. (bir nevi perdedir, gözlerin perdesi)

Baz: Vekirî. (açık)

Bazî kir: Hilda, rakir. (kaldırdı, açtı)

ME'NA HEMÎ:

Şekl û sûretê mecazî wek cendekê mirî ye, nêçîra heqîqî jî wek xamwerdeka kûvî ye, werdeka behra îşqa heqîqî ye, derya mehebbeta Îlahî ye.

Divê ku mirov Teyxûnê qelb û dilê xwe ji qeyd û bendên maddî veke û derîne, ji yara mecazî biqetîne, li pey wê werdeka pîroz, bi alîyê wê derya heqîqetê va bifirrîne û bişîne; ku ji xwe me jî wisa kir, lazim e ku mirov Teyxûnê dilê xwe bend û zincîl bike, girêbide, di binê qontrola xwe da bigire, hem jî lazim e ku mirov cendekekî jî li pêşberî wî bi xwîn bîne ku pê tehrîk bibe, şewq û îştîyaqa wî ji nêçîrê ra zêde bibe, bi dû werdekê bikeve (ji mecazê bi alîyê heqîqetê va herre) divê ku dema şenqarê jî perdê ji ser çavên xwe rakir (heqîqet dît) dîn û şeyda û efsene nebe, xwe şaş neke, qenc û baş bibîne û lê temaşe bike.

Xulase: Çawan ku nêçîrvan Teyxûn û şahînên xwe te'lîm û terbîye dikin, wan digirin, bend dikin, vedikin, goşt didin wan, xweyê dikin, hînî nêçîrê dikin, divê ku mirov jî wisan Teyxûnê dilê xwe û şahînên çavên xwe te'lîm û terbîye û dîsîplîn bike, tehrîk û teşfîqa wan ji nêçîrê ra bike, ji şekl û sûretên mecazî, ber bi nêçîra heqîqî hilfirrîne, bi dû wan çavên bi kil û rind û bedewên heqîqetê bixîne.

Lamea husn û cemalê dê ji îlmê bête 'eyn
Îşqê da jê hilbibit, kî dî heqîqet bê mecaz

- Mela -

Yanê: dê şemala husn û cemalê ji dereca îlmîl-yeqînê were bal dereca 'eynil-yeqînê va (ji merteba îdrakê bigihîje merteba şuhûdê) ku jê agirê îşqê hilbibe, vêkeve; kîye ku heqîqetê bê mecaz dîye? Tu kesekî bê mecaz heqîqet nedîye (bê mecazê bi heqîqet neresî= tu bê mecazê nagihîjî heqîqetê).

******

Şunqare çav, teyxûne dil, berdane dû çavên bi kil
"Xanî" ewan gêra xecil, lewra mecaz axazî kir

ME'NA BÊJEYAN:
Berdane: Berê xwe dane, we yan Xanî ewan berdane. (yüzlerini ona çevirmişler veya ona yönlendirmişler)
Çavên bi kil: Çavên yarê yên kilkirî. (yarın sürmeli gözleri)
Ewan gêra: Ewan çavên bi kil Xanî mehcûb kirin, şermoke gerandin. (onlar Xaniyi utandırdılar)
Xecil: Şermoke, şermezar. (çekingen, mahçup)
Axaz: destpêk (başlamak)
Mecaz axazî: Destpêkirina bi gotinên mecazî. (mecazi deyimler kullanmak, hakiki olmayan kelimeler kullanmakla başlamak)

ME'NA HEMÎ:
Meqsed ji şunqarê, çav, meqsed ji teyxûnê jî dile ku yanê me çav û dilê xwe berdane dû wan çavên bi khil û belekên mehbûbê, ku

nêçîra wan bikin; wan çavên bi khil û belekên ku pirr Xanî mehcûb û şermezar kirine, ku lewra ji peyvandina bi serîhî û vekirî fedî dike behsawan bi serihi nekiriye, belkî bi mecazî destpêkirîye û gotîye: nêçîr û teyrê 'enqa û werdek û teyxûn û şenqar, ku meqseda wî ya heqîqî ji nêçîr û werdekê, yara çav belek e, meqseda wî ji şunqar û teyxûnê jî, çav û dilê wî ye ew çav û bilêwiyê, ku bi pey çavên bi kil ketine -we yan Xanî ewan berdane dû wan çavên bi khil- ku ji wî ra nêçîra wan bikin...

- BAXÊ SORGULAN -

Ez çûme baxê sorgulan Wextê sehergahê bi xef
Min dî sedaya bulbulan Dagirtibûn her çar teref

Sewta hezar û qumrîyan, dengê rubab û muxennîyan
Teşbîhê bezma bengîyan, hevdengê hevbûn çeng û def

Manendê mest û serxweşan,. Ez çûme bezma mehweşan
Ebrû keman û çavreşan, cerg û dilê min kir hedef

Peygan di cergê dîlberî, ten bûye sendûqa berî
Seddeq ji husna wî perî, hêja li min bû kerb û gef

Hêja li min bû kerb û kîn, zahir xezeb, batin kenîn
Lê xemzeyek da min nihîn, 'eqlê me dîsan kir telef

Dîsan hebîba çav belek, îhsan di gel min kir gellek
Lewra digel zûlfên xelek, aloz me tînin qişt û lef

Xemrîy û qişt û zulf û xal, hemyan li ser ruxsarê al
Dîger hêbûn ceng û cîdal, lêk alîyan bûn sef bi sef

Sef sef medî wê kirye ceng, hindek hebeş hindek fireng
Vêk raperandin wek xedeng, dîger hebûn wan laf û leff (geff)

Diger hebûn de'wa û şerr, derbû li min tîpa teter
Jêk rakirin qelbû cîger, rihtin ji dil xwîna bikef

Rihtin gelek xûna dilan, şehmarê zulfê sermilan
Bê rehm û mesta qatilan, mey xwar ji fincana sedef

Wan meyxuran ebter kirin, bê quwwet û rengzer kirin
Wellah ji dil kher-kher kirin, "Xanî" bi sed ah û esef
(Xanî bese! Ah û esef)

.....

Ez çûme baxê sorgulan Wextê sehergahê bi xef
Min dî sedaya bulbulan Dagirtibûn her çar teref

ME'NA BÊJEYAN:
Wext: Dem. (zaman)
Sehergah: Berbanga sibê, dema şefeqê. (sabah erken, şafak vakti)
Bixef: Bi dizî. (gizlice)
Dagirtibûn: Tijî kiribûn. (doldurmuşlardı)
Teref: Alî, lay. (taraf, cihet)

ME'NA HEMÎ:
Ez di dema berbanga sibehê da, bi dizî çûme baxçeyê golên sor. Min dît (min sehkir) ku dengê bilbilan herçar terefên baxçe tijî kiribûn, di wîtandin, di xulxulandin.

******

Sewta hezar û qumrîyan, dengê rubab û mûxennîyan
Teşbîhê bezma bengîyan, hevdengê hev bûn çeng û def

ME'NA BÊJEYAN:
Sewt: Deng, seda. (ses)
Hezar: Bulbul. (bülbül)
Qumrî: Teyrekî dengxweşe. (kumru kuşu)
Rebab, Rubab: Aletekî sazbendiyê ye. (bir çalgı aletidir)
Mûxennî: Dengbêj, kilamgo. (şarkıcı). (Ji boy zerûreta wezna helbestê divê ku "mûxennî" xefîf bête xwendin- **muxnî**)
Bengî: Kesê serxweş û mest, aşiqê mest û serxweş. (mest ve sarhoş olmuş kimse, sevdalı kimse)
Hevdeng: Bi hevra dengdêr. (beraberce ses veren)
Çeng: Aletekî sazbendîyê ye. (bir çeşit çalgı aletidir)
Def: (davul, def)

ME'NA HEMÎ: Di wî baxçeyê da, dengê bulbul û qumrîyan, dengê rubab û dengbêj û sazbendan tev linav hev ketibûn. Wekî bezm û meclîsa bengîyan, çeng û def jî bi hev ra hevdeng bibûn, (bi hevra deng didan.)

******

Manendê mest û serxweşan. Ez çûme bezma mehweşan
Ebrû keman û çavreşan, cerg û dilê min kir hedef

ME'NA BÊJEYAN:
Manend: Wek, wekî, mîna. (benzer)
Mehweş: Wekî hîvê. (aya benzeyen, ay gibi)
Ebrû keman: Brû kevan. (kaşları yay gibi olan)

ME'NA HEMÎ:
Ez wekî mest û serxweşan çûme meclisa wan dîlberên ku wekî hîva çardeşevîne û brûyên wan jî wekî kevan in, çavên wan jî reşbelek in ku -dîlberekî ji wan dîlberan- kezeb û dilê min ji tîrên awirên wan çavên belekên xwe ra, kir hedef û bi wan tîran jendê.

******

Peygan di cergê dîlberî, ten bûye sendûqa berî
Seddeq ji husna wê perî, hêja li min bû kerb û gef

ME'NA BÊJEYAN:
Peygan: Sertîr. (okun ucundaki sivri demir)
Peygan di cergê dîlberî: Dîlberekî ku sertîrên wê di cîgerêdane "di ciger û kezeba min dane". (okları ciğerde olan bir dilber)
Berî: Li ber wê, li pêşberî wê. (önünde)
Seddeq: Peyvekî 'erebî ye, bi mana tesdîq kir, rast got, lê di zimanê kurdî da dema ku bê gotin: "Seddeq ji filan tiştîra" ew bi vî me'na yê ye: "aferin, bravo ji wî ra, kî ji wî çi axivîye; derheq wîda çi gotîye, raste". (seddeq arapça bir kelime olup, "doğru söyledi" anlamındadır, ancak kürtçede herhangi bir şeye "seddeq ji filan tiştîra" deyince "aferîn, bravo onu çok doğru teşhis ettin" anlamına gelmektedir)
Husn: Rindayî, bedewî. (güzellik)
Wê perî: Wê perîyê, wê rind û bedewa wek perîyan. (o peri güzeli)
Kerb: Hêrs, kîn. (öfke, kızgınlık)
Gef: Tehdîd, tirsandin. (korkutmak, tehdit etmek)

Ten: Beden. (gövde)
Sendûq: Sandoq. (sandık)

ME'NA HEMÎ:
Ew dîlbera ku sertîrên wê di kezeba min da ne, bedena min bûye wek sandiqa liber wê, seddeq jî rindayî û bedewîya wê rind û bedewa wek perîyan ra be! Ku hêj jî li min bi hêrse, hêjî li min gefan dixwe, min tehdît dike, (hêj dilê wê li min rihet ne bûye aferîn ji wê ra!)

******

Hêja li min bû kerb û kîn, zahir xezeb, batin kenîn
Lê xemzeyek da min nihîn, 'eqlê me dîsan kir telef

ME'NA BÊJEYAN:
Hêja: Hêjjî, hînjî, heta niha jî. (halen de, hala, şimdi de)
Zahir: Li ber çav, bi xuyayî. (açık, açıkta)
Xezeb: Xişim, xeydîn. (gazap, kızgınlık, öfke)
Batin: Bi dizî, ji bin va. (gizli, gizlice)
Lê: Lakin. (ancak, velakin, amma)
Xemze: Îşaret kirina bi çavan, nêrîna bin çav. (kaş ve gözle işaret, süzgün bakış)
Nihîn: Bi dizî, xef. (gizli)
Telef: Zayîkirin. (zayî etmek, yok etmek)
Eqlê me: Hişê me. (aklımız)

ME'NA HEMÎ:
Hêj jî, hêja jî li min kerb û kîn bû, bi zahirî bi hêrs û xezeb bû, ji bin va jî kenîn bû, (bi min dikenîya) lê îşweyekî (lenc û nazekî) bi dizî jî da min ku ewê pê 'eqlê min telef kir, hişê min ji serê min bir.

******

Dîsan hebîba çav belek, îhsan di gel min kir gellek
Lewra dîgel zulfên xelek aloz me tînin qişt û lef

ME'NA BÊJEYAN:
Îhsan: Qencî, başî û comerdî. (iyilik)
Digel min kir: Bi min ra kir. (benimle yaptı)
Aloz: Li hev pêçayî, gepiçandî, sext û şidîyayî, hişk girêdayî. (sıkı bağlı, muhkem)
Digel zulfên xelek: Bi zulfên xelek û kurîşk ra. (bükülmüş halkalı zülfler)
Qişt: Kakul û tûncik, piçûçik û xweşik. (kakül, küçücük, hoş)
Lef: Pêçayî, pêç, lihevlefandî, lêgeraw. (dolamak)
Lef: Tiştên wek şar û temezî û qemt û berbendên serê jinan. (başa dolanan süs takıları)

ME'NA HEMÎ:
Lê dîsan jî, mehbûb û hezkirîya mina çavbelek, bi min ra gellek qenci û îhsan kir: ku qişt û lefên wê, bi bisk û zulfên wê yên xelek ra, me aloz kirin, li hev pêçan û qewî û muhkem girêdan.

******

Xemrîy û qişt û zulf û xal, hemyan li ser ruxsarê al
Dîger hêbûn ceng û cîdal, lêk alîyan bûn sef bi sef

ME'NA BÊJEYAN:
Xemrî: Perçûke, cûrekî serpoşê rengşerabîyê mor e. (mor, şarap renkli örtü türü)
Hemyan: Tevan. (hepsi)
Ruxsar: Dêm, rû. (çehre, yüz)
Al: Sor. (kırmızı)
Dîger: Yek digelyekî, carekî din. (bir daha, birbiri ile)
Ceng û cidal: Şerr û şoreş û teqereqî. (harp ile kavga)
Lêk: Lihev, yekliyekî. (biribirine)
Alîya bûn: Piçikî bûn (dolanmışlardı)
Sef-bisef: Kom bi kom, rêz bi rêz. (saf-saf, dizi-dizi)

******

Sef sef medî wê kirye ceng, hindek hebeş hindek fireng
Vêk raperandin wek xedeng, dîger hebûn wan laf û leff (geff)

ME'NA BÊJEYAN:

Wê: Va ewê, ewê, ewê yarê (zemîra mêya ne). (işte o, dişi zamiridir)

Hindek: Hinek, qederek. (bir miktar)

Hebeş: Mirovên Hebeşistanê, yên reş. (Habeşistan halkı, habeş gibi siyah renkli olan)

Fireng: Romî, ewrûpayî, yên reng sipî. (avrupalı, ak olan)

Vêk: Hemî, hemû bihevra. (hep, hep birlikte)

Raperandin: Berdane hev, hilfirandine hev, rarûyên hev kirin. (kavga ettirdi, biribirine düşürdü)

Diger: Yekî bi yekîra, bihevdûra. (biri, birleri ile)

Laf û lef: Qal û qil, bi hevda ketin, bigir vekêş. (kavga, birbirine düşmek)

Laf û gef: Gotin û tehdîd. (kavga, tehdit)

ME'NA HEMÎ:

Me dît, ku ewê bedewê, hinek ji hebeşên reş û firengên sor û sipî (çavên reşbelek û bisk û birû û bijang û xalên reş, dêm û sûret û dev û lêv û çen û gerdena sor û sipî û cuwan û geş) sef bi sef kirîne cengê, hemîyan wekî tîr û rimên cengawer û rimbazan raperandîne hev, berdane hev, bi hevra, bi aşîqan ra di şerr û ceng û mucadele û bigirvekêşê da ne (ku diwê meydana cengê da, dil û canên gellek lawên bavan birîndar bûne, gellek jî li wan nava, li wan meydan û rava, bê sebeb û bê guneh, bê sûc û bê xeta hatine kuştin, şehîd bûne. Çawan ku **Îbnûl Farîdê** jî gotîye:

ما بَيْنَ مُعْتَرَكِ الأحداق والمُهَجِ أنا القَتيلُ بِلا إثْم ولا حَرَج

"Di meydana ceng û şerrên çavên reşbelek û rûh û canan da (çavên me'şûqan û canên aşiqan da) ez ew kuştîyê bê curm û bê guneh im."

Çavên di belek lê kilê subhanê kişandî,
wê çavbeleka mîn
'Eql û hiş û can û dil û dînê me revandî,
wer kir keleka min!

- Durre -
15/7/1998 - Köln

******

Digerhebûn de'wa û şerr, derbû li min tîpa teter
Jêk rakirin qelbû cîger, rihtin ji dil xwîna bikef

ME'NA BÊJEYAN:
Dîger: Yek digelyekî. (birbiri ile)
Derbûn: Derketin. (çıktılar)
Tîp: Miqdarekî leşker. (tim, mufreze)
Teter, tatar: Beşekî ji moxulan e, meşhûrê bi cerd û talana ne, ku divir da meqsed jê; biskû kakul û gulangên yarê ne ku wekî tataran ew jî dil û canên evîdaran talan dikin. (tatar halkı ki yağmacılıkla şöhret bulmuşlar, mecazî manada şuhların züluf ve kakuları anlamındadır.)
Tîpa teter: Leşkerê tatar. (tatar askerleri)
Jêk rakirin: Ji hev, ji binî da, ji binve rakirin. (kökten söktüler)
Qelb û cîger: Dil û kezeb. (kalp ile ciğer)
Rihtin: Rêtin. (aktılar)
Xûna bikef: Xûna ku kef dide. (köpüklenen kan)

******

Rihtin gelek xûna dilan-şehmarê zulfê sermilan
Bê rehm û mesta qatilan, meyxwar ji fîncana sedef

ME'NA BÊJEYAN:
Şehmar: Şahê maran (yılanların şahı, şahmaran)
Zulfên sermilan: Zulf û gezîyên daketine ser milan. (omuzlara inen züluf)
Bêrehm: Bê dilovanî. (merhametsiz)
Mesta qatilan: Ewa mesta xweyê zulfên ku mirovan dikujin. (katil züluflerin sahibi olan mest dilber)
Mey: Bade (şarap, bade)
Sedef: Qalikê candarekî deryayê ye ku jê têştên giran biha çê dibin. (bir nevi deniz böceklerin kabuğu ve ondan yapılan şeyler).

ME'NA HEMÎ:
Wan zulfû kezîyên ku wekî şahê maran e û xwe bi ser mîlan da berdane, xûna gelek dilan rijandine, pirr dil birindarkirine, pirr kes kujtine. Ewê dilbera bê merhemet û mest û serxweşa qatilan,

we yan ewa ku xweyê wan zulfên qatil in, ji fîncana sedef bade vexwarîye, (mest û serxweş bûye, haya wê jê tune ku zulfên wê yên wekî şahmaran biçend kesan vedane û xûna çend dilan rêtine)

******

Wan meyxuran ebter kirin, bê quwwet û rengzer kirin
Wellah" ji dil kher-kher kirin, "Xanî" bi sed ah û esef
(Xanî bese! Ah û esef)

ME'NA BÊJEYAN:

Ebter: Bê xêr û kêr û bêr, kurdûndayî, bê ûrt, berbad û perîşan. (hayırsız, verimsiz, nesilsiz, berbat ve perişan)
Bê quwwet: Bê hêz. (güçsüz)
Rengzer: Nexweş (ji ber ku mirovên nexweş rengên wan zer dibin). (rengi sarı, hasta)
Ji dil: Ji dilda, we yan bi rastî ji dil û can. (gönülden, yahutta ciddi olarak)
Kher-kher: Perçe perçe. (parça parça)
Sed: (yüz=100)
Esef: Xemxwarin. (kederlenmek)

ME'NA HEMÎ:

Ewan badexuran me berbad û perîşan kirin, wellahî! (Ez bi xwedê sond û qesem dikim), ku ewan me ji dil perçe perçe kirin (dilê me qet qet kirin, we yan: ji dil û can, bi rastî ewan em qet û perçe kirin) ku ji wî sedemî da Xanî pirr bi ah û esef e. We yan: Ey Xanî! Bese, ewqas ah û esef neke! tiştê bûye ji xwe bûye, fayda ah û esefan çîye ?

- ŞEHÎDÊ KERBELA -

(Ev çareka Xanî bi 'erebî û farisî û tirkî û kurdî ye ku ew jî delîla wî qasîye Xanî pisporê herçar zimanan jî bûye).

Leyse fî qelbî sîwake ya hebîbî kulle hal
Her demem xem hem demem şud der firaqet mah û sal
Ger benım kanım dilersen, çoktan olmuştur helal
Mest û ser xwoşem ji îşqê, min nema 'eql û kemal

Ente fikrî fî fûadî, Ente rûhî fîl cesed
Leşkerê xemhayê To, mulkê dilem wêranî kerd
Dade geldim aşk elinden isterim senden meded
Wan Tetaran kirne talan can û dîn û mulk û mal

Tale xemmî, zade hemmî, şa'e sirrî fîl mela
Teşneyê cama wîsalim çûn şehîdê Kerbela
Yoksa sen dîvane oldun, nice halin? Ey dila!
Yan ji nû ve îşveyek da min hebîna çav xezal

Bîttû mehcûren hebîbî! Leste mînnî alîmen
Murdem ez derdê firaqet, xafilî Ez halê men
Can û dılden arzi kıldım halımı canane ben
Erzî hala min Tu xafil, qet ne pîrsî erzî hal

Hel lena mîn nî'metîl weslî hebîbî mîn nesîb
Ûfîtadem ber deret bê çare, sergerde xerîb
Derdê men çok olduğunden ona yoktur hiç tebîb
Ey tebîbê min dewayê derdê 'Xanî' her wîsal

.....

Leyse fî qelbî sîwake ya hebîbî kulle hal
Her demem xem hem demem şud der firaqet mah û sal
Ger benım kanım dilersen, çoktan olmuştur helal
Mest û ser xwoşem ji îşqê, min nema 'eql û kemal

ME'NA BÊJEYAN:
Leyse: Nîne. (mevcud değildir)
Fî qelbî: Di dilê min da. (kalbimde)
Sîwake: Ji bilî Te. (senden başkası)
Ya hebîbî: Ey hezkirîya min. (ey sevgilim)
Kulle hal: Di her halî da. (her halukarda)
Her demem: Her dem ji min ra. (benim için her zaman)
Xem: Xemgînî. (hüzün,gam)
Şud: Bû. (oldu)
Der firaqet: Di qetandina ji Te da. (senden ayrılmaktan da)
Mah û sal: Meh û sal. (ay ve sene)
Ger benım kanım dilersen: Eger Tu xwîna min dixwazî .
Çoktan olmuştur helal: Ji pirr zemanî da ye ku ew ji Te ra helal bûye.

ME'NA HEMÎ:
Ey hezkirîya mina di her demî da, ji Te bêtir tu tişt di dilê min da tune, di her dem û her meh û salên qetandina ji te da, derd û kul û xem bûne hemdem û hevalên min. Eger Tu xwîna min dixwazî, (eger tu divê ku xwîna min birêjî) ji xwe ew zûda ji Te ra helal bûye, ez ji îşq û evîna Te serxweş û şeyda bûme; tu 'eql û kemal bi min ra ne maye.

******

Ente fikrî fî fûadî, Ente rûhî fîl cesed
Leşkerê xemhayê To, mulkê dilem wêranî kerd
Dade geldim aşk elinden isterim senden meded
Wan Tetaran kirne talan can û dîn û mulk û mal

ME'NA BÊJEYAN:
Ente Fikrî: Tu bîr û bawerî ya mınî. (sen fikrim ve düşüncemsin)
Fî fuadî: Di dilê min da. (Kalbimde)
Ente rûhî: Tu ruh û canê minî. (sen canımsın)
Fîl cesed: Di bedenê da. (bedenimde)
Leşkerê xemhayê To: Hêz û leşkerên xemên Te. (gam ve üzüntülerinin askerleri)
Mulkê dilem: Mulkê dilê min. (gönlümün mülkü)

Wêranî kerd: Xirab kir. (harab ve virane etti)
Dade geldim: Ez ji bo heyf û hewarê hatim. (Adalete ve intikam almaya geldim)
İşq elinden: Ji destê îşqê.
İsterım senden meded: Ez ji Te îmdadê dixwazim.
Van Tetaran: Van Tirkên ji nesla Tataran. (Bu tatar soyundan Türkler)
Kirne talan: Talan kirine. (yağma ve talan etmişler)
Can û dîn û mulk û mal: (can, din, mülk ve malı)

ME'NA HEMÎ:
Tu fikra dilê minî, rûhê bedena minî, hêz û leşkerên xemên Te Mulkê dilê min wêran kirin, ez ji destê îşqê hewar dikim, imdadê dixwazim! Evan Tataran can û dîn û mulk û malê min talan kirin!

Rostemê mazenderanê! Wer ji bona min hewar!
Leşkerê Tûranê mulkê can û dil kir tar û mar
- Durre -

******

Tale xemmî, zade hemmî, şa'e sirrî fîl mela
Teşneyê cama wîsalim çûn şehîdê Kerbela
Yoksa sen dîvane oldun, nice halin? Ey dila!
Yan ji nû ve îşveyek da min hebîna çav xezal

ME'NA BÊJEYAN:
Tale: Dirêj bû (uzadı)
Zade: Zêda bû, pirr bû. (fazlalaştı)
Hemm: Dil tengî. (hüzün ve keder)
Şa'e: Belav bû, eşkera bû. (yayıldı)
Sirrî: Razên min. (sırlarım ve gizlerim)
Fîl mela: Di meclis û civakan da. (halk arasında)
Teşne: Tî, Tih. (susamış)
Cama wisal: Qedeha wesletê, cama gihîştina yarê. (Yara kavuşma kadehi)
Çûn: Wekî. (gibi)

Kerbela: Navê bajar û herêmeke li başûra Bexdayê kû Hezretî Huseyn û hevalên wî li wê der şehîd bûne (Bağdat güneyinde, Hz. Hüseyin ve arkadaşlarının şehid düştükleri şehir, yer)
Yoksa sen dîvane oldun: Dibe kû Tu dîn bûyî dilo! Gello halê te çîye?
Îşveyek da min: Cîlwe û nazîyek da min. (bir naz ve cilve yaptı)
Hebîn: Pereste. (tapılan sevgili)
Çav xezal: Çev ask (ahu gözlü)

ME'NA HEMÎ:
Xemê min dirêj bûn, dil tengîyên min zêde bûn, sirr û razên min di nav xelqêda belabûn, ez wekî şehîdên Kerbelayê tîyê ava cama wisalê me, dilo qe halê te çîye? Dibe ku tu jî dîn û dîwane bûyî, yan jî; dibe ku dîlbera çav xezal ji nû ve îşweyek daye min?

Bîttû mehcûren hebîbî! Leste mînnî alîmen
Murdem ez derdê fîraqet, xafilî Ez halê men
Can û dılden arzi kıldım halımı canane ben
Erzî hala min Tu xafil, qet ne pîrsî erzî hal

ME'NA BÊJEYAN:
Bittû: Ez bûm. (ben oldum)
Mehcûren: Terk kirî, dûr mayî. (terkedilmiş olan)
Leste mînnî alîmen: Tu ji min agahdar nînî (benden haberin yok)
Murdem: Mirime. (ölmüşüm)
Ez derdê firaqet: Ji derdê qetandin û dûrbûyîna ji Te. (senden ayrılmanın derdinden)
Xafilî ez halê men: Tu ji rewşa min xeberdar nînî. (halimden gafilsin)
Can û dılden: Ji can û dil,bi ciddî
Arzî kıldım: Min erz kir,bi îhtîram jê re got.
Canane: Ji yarê re, ji mehbûbê re.
Ben: Min
Erzî halamin: Erz nama halê min, nama rewşa min.
'Erzî halim: Erznama min
Tu xafil: Tu hay jê nînî. (xafıl ve ilgisizsin)
Qet ne pirsî: Te qet pirs nekir. (hiç sormadın)

ME'NA HEMÎ :
Ey mehbûba min! Ez hatime terikandin, haya Te jî ji min tune, Ez mirime Tu ji halê min xafilî,min bi dil û can halê xwe 'erzê Te kir, Tu hay jê nemayî, Te qet guhê xwe jî nedayê.

******

Hel lena mîn nî'metîl weslî hebîbî mîn nesîb
Ûfîtadem ber deret bê çare, sergerde xerîb
Derdê men çok olduğunden ona yoktur hiç tebîb
Ey tebîbê min dewayê derdê 'Xanî' her wisal

ME'NA BÊJEYAN :
Hel lena: Gelo ji me ra. (acaba bizim için)
Mîn nî'metîl weslî: Ji nî'metê gihîştinê. (kavuşmak nimetinden)
Mîn: Ji (... den ... dan)
Nesîb: Piş û par. (nesib, pay)
Ûfîtadem: Ketime xwar. (düşmüşüm)
Berderet: Li ber derê Te. (kapında)
Sergerde: Serî lê gerîyayî. (başı dönmüş, muhayyer)
Derdimin çok olduğundan: (ji pirr bûyîna derdê min)
Ona yoktur: Ji wî re tuneye
Hiç tebîb: Tu doxtorek
Ey tebîbim: Ey doxtorê min. (ey doktorum)
Dewayê derdê 'Xanî': Dermanê derdê Xanî. (Xaninin derdinin dermanı)
Her wisal: Her gihîştina yarêye. (yalnız kavışmaktır)

ME'NA HEMÎ :
Gelo qet ji nî'metê wisalê ji me ra parek heye Yan na? Ez li ber derê Te xerîb û bê çare û serî lê gerîyayî ketime. Derdê min pirrin, doxtorî wan tune. Ey doxtorê min! Dermanê derdê Xanî, her wisale. (ev çendik û çend sale ku ji wî derdî dinale)

Felek kanê hevala min ku da çû, wan demên xweş ka?
Kuva çû çav xezala min, şepala dêm gula geş ka?

Çi bû? Ka war û zozanê welatê serhedê kanê?
Birîndarim ji 'Lozan'ê, gelo roja şeva reş ka?

Birîndarê xwe ra yarê, ji lêvan kewser û mey da
Ji Seydayê birîndarê me ra, ew par û ew peş ka?

- Durre -

- DILA ! -

Dila! Qet nîne meh'bûbek, ji te cuz'ek nebit lalî
Dilarama! Ne mec'zûbek heye sirra te jê xalî

Eger sirra di qelban e, weger Nûra di wechan e
Bi min yek reng û yek ta ne, di gel yek bûn li wî alî

Ji xeybê ew bi yek hatin, hemî cotin ne tek hatin
Wekî çavêt belek hatin, bi hev ket şahî û ta'lî

Eger çist e eger Nûr e, eger nêzîk, eger dûr e
Birîna aşiqan kûre, ji ser tîra kurrê Zalî

Ji ser tîra mucewher bû, çi awir bû, çi xencer bû
Ji bo min ra muqedder bû, dema puf kirne selsalî

Weger selsal û fennar im, tijî nûrim, tijî narim
Di batin şubhê xunkarim, bi zahir ketme vî şalî

Bi zahir şalê xweh zîba, gellek etles, gellek dîba
Gellek sîm û gellek şîba, me havêtin cîger nalî

Cîger nalî me havêtin, hemî yek yek hilavêtin
Gelo kî bit ku navêt in, hebînek çar û deh salî

Meger her min divê dîlber, du sed îlman bikim ezber
Ji xilxalan dibit ebter, Mela meqsûde xilxalî

Mela meqsûdê min xal e, ne mulk û menzel û male
Ne îlm ê qal e, Ê hal e, me hasil kir bi 'ebdalî

Me hasil kir bi xêzanî, bi muştaqî, bi heyranî
Wekî genca di wêranî, me peyda kir bi remmalî

Bi remmalî me peyda kir, dilê xemgîn me pê şa kir
Neqîyyîl-xed û îbra kir, wekî zêrra du sed salî

Neqîyyul-xed tilaya nin, berat û emr û ferman in
Bi tuxra û bi nîşan in, di dest uşşaqê delalî

.....

Dila! Qet nîne meh'bûbek, ji te cuz'ek nebit lalî
Dilarama! Ne mec'zûbek heye sirra te jê xalî

ME'NA BÊJEYAN:
Dila: Dilo, ey dil. (ey gönül)
A: Tîpa bang kirinê ye, herfa nîdayê ye. (çağrı harfidir.)
Qet nîne: Qet tune ye. (hiç yoktur)
Mehbûbek: Hezkirîyek. (bir sevgili)
Ji Te cuzek: Perçekî ji Te. (senden bir parça)
Nebit: Nebe. (olmazsa)
Lalî: Li alî, li alîyê wî. (onun yanında, onda)
Dilarama: Ey ewa ku dilan teskîn dike, rihet dike, hûzûrê didê. (ey gönül eşlendirici, huzur verici sevgili)
Meczûp: Ewê ku bi cezban dikeve, dîwane û şeydaye. (cezbeye düşen,meczub)
Sirr: Raz, tiştên bi dizî û me'newî. (giz)
Xalî: Vala (boş)
Sirra te jê xalî: Ku sirra te ji wî xalî be, têda tunebe. (senin sırrın onda olmazsa)

ME'NA HEMÎ:
Ey dil! Qet tu mehbûbek tuneye ku perçek ji te li ba wî nebe (li bal her bedew û rindekî, cuz'ekî ji te û ji îşqa te heye) Ey ewa ku aram û hûzûra dil bi te ye, tu meczûb û dîwanekî xali û valayê ji sirr û razên te tune ye, li ba herkesî, mûtleqa sirr û razekî te heye.

Xanî di vê qesîda xwe da: di hinek beytên wê da bi serîhî, di hinekan da jî bi tewerîye û îma û îşret, li dora felsefa Wehdetîl-wucûd û Wehdetîş-Şûhûdê, minawre dike û diçe û tê, ku di vê beytê da jî ewî îma dike û dibêje: Di her tiştî da, cuz'ekî ji Te heye, sirrê Tecellîya tu tiştî jî te xalî nîne, tu di herkesî da, di her tiştî da veşartîyî, ku Melayê Cizîrî jî, evê xûsûsê, wiha net îfade dike û dibêje:

Sirrê wehdet ji ezel girtîye hetta bi ebed
Wahidek ferde bi zatê xwe, we nîne çu eded

(Yanê: Ji wî Wahidê ferd bêtir, tu tiştekî ku bête jimarê tuneye, ew bi tenê heye)

Xanî, di Mem û Zîna xwe da jî, wiha dibêje :

Mûtleq Tu mûfîd û mûstefadî
Bê şûbhe mûrîd û hem mûradî
Gencî Tu di nêv tilismê 'âlem
Kenzî Tu 'îyan ji îsmê Adem
Şem'î, ne ji qismê nûr û narî
Şemsî, ji 'îyan Tu perdedarî

Yanê, bê şek û şûbhe Tu bi her awayî, mûfîd û mûstefadî (tu didî û ji Te tê îstîfade kirin), Mûrîd û mûradî (divê û tê vayîn)Tu kana di nav tilisma âlemê da yî, Tu xiznekî yî ku ji navê Adem da dîyar bûyî, Tu mûm û fenerî, lê ne ji Nûr û agirî, Tu rojî, lê ji dîyarbûyînê serperde bûyî, hatî veşartin. (Hem berçav û eşkerayî, hem jî bin perde û nexuyayî.
(هو الأول والآخر والظاهر والباطن) Ew, Ewwil û Axir û Zahir û Batin e./ el-Hedîd /3

(لا تدركه الأبصار وهو يدرك الأبصار) "Çav, ewî nabînin, lê Ew çavan dibîne"... En'am / 103

Sultanê 'âşiqan, **Îbnul-Farid** jî, vê xûsûsê wiha teswîr dike û dibêje: "Min, ewanên ku ji Adem ra secde birin, di xwe da, di xûyangeha xwe da dîtin û bê guman zanî ku ez Ademê secda xwe me (ez ji xwe ra secdê dibim, melek jî ez im, Adem jî ez im, sacid jî ez im mescûd jî ez im ku em hemî ji yek wucûdek in, ew jî ew e hew!)

وفيَّ شهدتُ الساجدين لمظهري فحقّقتُ أني كنت آدم سجدتي

******

Eger sirra di qelban e, we ger Nûra di wechan e
Bi min yek reng û yek ta ne, di gel yek bûn li wî alî

ME'NA BÊJEYAN:
Qelban: Dilan. (gönüller)
Wechan: Rûyan; (yüzler, çehreler)
Bi min: Bi angorî min, bi angorî fehm û bawerîya min. (bana göre)
Yek ta: Takî bi tenê. (Bir tek ferd)
Di gel yek bûn: Di gel yekî bûn, bi yekî ra bûn. (biri ile idiler, beraberce, bir şey idiler)
Li wî alî: Li wî alîyê, di binê perda xeybê da. (o tafarta,perde arkası)

ME'NA HEMÎ:
Bi bawerî û zanîna min, çi sirr û razên di dilan da, çi jî Nûr û Cemala di rûyan da -çi dibe bile bibe- hemî tişt, yek reng û rewşek in, yek tiştek in, yek takî bi tenê ne, ku di wî alî da (di alema lahûtî da) digel yekê bi tenê bûn e.

******

Ji xeybê ew bi yek hatin, hemî cotin ne tek hatin
Wekî çavêt belek hatin, bi hev ket şahî û talî

ME'NA BÊJEYAN:
Xeyb: Nedîtî, âlema ne ber çav. (gizli olan, görünmeyen)
Bi yek hatin: Bi yek terzekî, ji yek Xaliqekî da hatin. (bir tarzla bir yaradan dan geldiler)
Cot: Zo, Dudu-dudu. (çift, ikişer)
Tek: Kit, yek bi tenê. (tek)
Çavêt: Çavên. (di lehca Botan da **"êt"**, di şûna **"ên"** da, nîşana pirratîyê ye, 'elametê cem'ê ye.) (gözler)
Bi hev ket: Gihîştin hev, civîyan. (bir birine kavuştular)
Şahî û talî: Xweşî û nexweşî, tal û şirîn. (sevinçle acı)

ME'NA HEMÎ:
Ku ew hemî, ji xeybê da (ji âlema ne ber çavî da), bi yek terzek, ji yekê bi tenê hatine, hemî wekî çavên belek hatine, hemî zo ne, ne kit in, ku xweşî û nexweşî bi hev ketin û cot bûne. (Ku xulase: Nêr û mê, rind û ne rind, qencî û xirabî, hebûn û tunebûn, xêr û şerr, tarîtî û ronahîtî, şâhîtî û talîtî, her tişt dikainatê da, cot hatine çêkirin, eserê kitek in, neqş û nemûşên yekê bi tenê ne ku ew jî ewe, ew wucûda yekî bi tenêyê ezelî û ebedîye.)
(ومن كل شيء خلقنا زوجين Me her tiştî, cot xelq kirine. / Zarîyat 49)

******

Eger çist e eger Nûr e, eger nêzîk eger dûr e
Birîna aşiqan kûre, ji ser tîra kurrê Zalî

ME'NA BÊJEYAN:
Çist : Vemirî, şêlû. (sönük, karanlık)
Ser tîr: Serê tîrê. (okun ucu)
Kurrê Zalî: Ruostemê kurrê Zal, ku jê ra **Rostemê Destan** jî dibêjin, ji nijada kurdî ye, cengawerekî meşhûrê destana **Şahname ya Fîrdewsî** ye. (meşhur Zal oğlu Rüstem)

Rostemê Mazenderanê! Wer ji bona min, hewar!
Leşkerê Tûranê, mulkê can û dil kir tar û mar

- Durre -

ME'NA HEMÎ:
Eger tarîtî ye, eger rohnahî ye, eger nêzîkî, eger dûre -çi dibe bila bibe- ev rastî li meydanê ye ku birînên aşiqan birînên gellek kûr û xeddar in, ji ser tîr ên Rostemê kurrê Zalê dijwar in, yanê; di tarîtî û ronahîtîyê da, di her hal û her demî da, aşiq dil kull û birîndar in, bi ah û nalîn û fîzar in.

******

Ji ser tîra mûcewher bû, çi awir bû, çi xencer bû
Ji bo min ra mûqedder bû, dema puf kirne selsalî

ME'NA BÊJEYAN:
Ser tîra mûcewher: Ser tîra ku bi gewher hatîye neqişandin. (cevherle, elmas ile bezenmiş olan ok ucu)
Awir: Mêze kirina di bin çavan ra. (gözlerin keskin bakışı)
Xencer: Xincer. (ucu sivri iki tarafı keskin bıçak)
Ji bo min ra: (benim için)
Muqedder bû: Teqdîr bûye, di ezel da kifşe bûye. (tayin ve takdir edilmişti)
Dema puf kirne: (üfürdükleri zaman)
Selsal: Çamûra hişk bûyî. (kuru balçık)
Dema puf kirne selsal: Dema ku cesedê Adem ji çamûrê çê kirin û ruhê heyatê puf kirinê û Zindî bû. (Adem a.s. kurumuş balçıktan yaratılıp ona ruh ve can üfürdükleri zaman, ilk insanın yaratılış zamanı)

ME'NA HEMÎ:
Ew birîna min, ji ser tîrên mûcewher bû, ku ew ser tîr jî, çi awir bin, çi xencer bin, çi dibin bila bibin ferq nake, (meselkî kurda heye, dibêjin ku bavê te kuştin, çi suwaran kuşt, çi peyan) Ew birîna kûr û xeddar, ji min ra di dema ku Adem ji çamûrê çêkirin, mûqedder bûye, di wê demê da hatîye teqdîr kirin. (Xanî di vir da temayûla xwe ya ji bîr û bawerîya **Mezhebê Cebrîyye** ra îma dike)

******

We ger selsal û fennar im, tijî nûrim tijî narim
Di batin şubhê xunkarim, bi zahir ketme vî şalî

ME'NA BÊJEYAN:
Fennar: Fanos, Rohnîdak. (fener, meş'ala)
Tijî narim: Tijî agirim. (ateş doluyum)
Batin: Hundur, bin perde. (iç, dahili, gizli)
Zahir: Dîyar, eşkera. (aşikar)
Xunkar: Fermandar, padîşah. (hükümdar)
Vî şalî: Vî şalê ji qumaşê hirî, vî qalibê maddî. (bu şal, bu maddi beden)

ME'NA HEMÎ:
We eger ez selsal û fenerekî tijî nûr û narin (ji xwe wisa me jî) me'na wê ewe ku ez di batinê xwe da, padîşah û hukumdarim, bi zahirê xwe ketime vî şal û lîbasî, pêcîlvedar im. Yanê: Ez bi rewşa xweya derûnî û rûhanî, lahûtî û Yezdanî me, bi rewşa xwe ya maddî û cismanî jî, nasûtî û însanî me, lefz û me'na yek heqîqetekîm e.

Min gote durdane yê, ez ji te û tu ji me yê
Lew bi heqîqet yekin, mes'ele bê şubhe ma

- Mela -

******

Bi zahir şalê xweh zîba, gellek etles gellek dîba
Gellek sîm û gellek şîba, me havêtin, cîger nalî

ME'NA BÊJEYAN:
Xweh: Xwe. (kendi)
Zîba: Rind û xweşik. (güzel)
Etles: Qumaşekî raçandîyê ji hevirmûşê ye. (ipekten kumaş)
Dîba: Qumaşekî hevirmûşê rengîn e. (ipekten renkli bir kumaş)
Sîm: Zîv, tiştê bi zîv neqişandî. (gümüş, gümüşten yapılmış)
Şîba: (c.eşyeb) Sipî, tiştên sipî. (beyaz olan şeyler)
Havêtin: Avêtin. (attık)
Nalî: Nalîya. (inledi, fizar etti)

ME'NA HEMÎ:
Me şal û şapêkên xweyên ziba, qumaşên etles û dîba, sipî û xweşik û şîba hemî avêtine, dev jê berdane, ji cîger û kezzeba xwe dinalim, ji xeyrî mehbûbê dev ji hemî tiştî berdaye, ew bi tenê maye).

Hemden lîllahî Teala, welehul fedlul emîm
Min terik da şoxê dil keş, xan û man û zerr û sîm

Xadimê meyxane geştem, ber derê dostê mûqîm
Badenoşa me bi Bîsmillahî-rrehmanî-rrehîm

- Sîyahpoş -(Mûhammed Sîyahpoş ..../1246 h.)

******

Cîger nalî me havêtin, hemî yek yek hilavêtin
Gelo kî bit ku navêt in, hebînek çar û deh salî

ME'NA BÊJEYAN:
Hilavêtin: Bi jorda avîtin, rakirin. (atıp ondan kurtulduk)
Kî bit: Kî dibe? (kim oluyor ki)
Navêt in: Naxwazin. (arzulamıyorlar)
Hebînek: Mehbûbekî pereste. (tapılacak derecede bir sevgili)
Çar û deh salî: (ondört yaşında ki sevgili)

ME'NA HEMÎ:
Kezzeba me dinale, me ji xeyrê yarê dev ji hemî tiştan berdaye, hemî tiştan yek bi yek avêtine û pêsîra xwe ji her tiştî xilas kirîye, ma di dunyayê da kî heye ku mehbûbekî çarde salî naxwaze û navê, di rêya wê da dev ji hemî tiştan bernade? Ku em jî wilo nekin?

Di rêya durr û muradê me serî danî ye rê
Xud'tû fil behrî wela zewreqe wel behrû 'emîq
- Mela -

Di rêya mehbûba ku wekî durrên giranbiha ye, di rêya wê meqsed û mirazê da, me serê xwe danîye, (me di wî rêyê da serê xwe daye;) ez noqê wî deryayê bûme, lotîka min jî tune, derya jî deryakî pirr kûr û bê binî û bê payan e, (em di nav lem û pêlên wî da, di kûrayên wî da noqbûne û mane)

******

Meger hermin divê dîlber, du sed îlman bikim ezber
Ji xilxalan dibit ebter Mela meqsûde xilxalî

ME'NA BÊJEYAN:
Meger: Gelo, qeyê, her hal, wisa duxyê ku. (ancak, oysaki, şu halde)
Xilxal: Xelek û bazinê lingan. (halhal)
Xilxalî: Ewa bi xilxal, ew yara ling bi xilxal. (halhallı olan)

Her min divê: Ez her tim arzû dikim. (devamlı istiyorum)
Dibit: Dibe. (oluyor)
Ebter: Bê xêr û bereket, beter, xirabtir. (daha beter, daha kötü)
Meqsûd: Xwestek, xaye. (istek, dilek ve gaye)

ME'NA HEMÎ:
Ez dused îlman jî ezber bikim, bixwînim û bizanim, fayde nake û xêra wan tune, ji ber ku ez her dîlberê divêm û dixwazim, Mela (Xanî), ji xilxalan betertir dibe, bê fayde û bê fonksîyon dimîne. Di dilê Mela da, (di dilê min da) di fikr û bîr û bawerîya min da, ji xilxalîyê (ji mehbûba ling bi xal) bêtir, tu tiştekî din tune, her tişt di hember neqş û nemûş û xişr û zînetên mehbûbê da, berredayî û bê qîymet û bê rûmet in, bê nerx û biha ne, tu î'tibar pê nayê kirirn, ji wî ye jî, ku meqsûda Mela (armanca Xanî), ew yara ling bi xilxala şox û şepal e, ji bilî wê her tişt di çavên wî da xîyal e, Mela (Xanî) ji wî bêtir tiştek nafekire û tu tiştî nad e û nakirre.

Dibe ku me'na "Mela meqsûde xilxalî" wiha be jî: "**Me, la meqsûde xilxalî".....**
Yanê: Ji me ra xilxalekî ne meqsûd e, meqseda me ne xilxal e, belki meqseda me yara rû bi xala, ling bi xilxal e, ku bi angorî vî me'na û vî şirove yê, di navbera bêjeya "**Mela**" ya divê beytê da û "**Mela**" ya di beyta dû wê ra, cûrê **cinasa mûteşabih** û **mûrekkeb** heye, ku ew jî eve:"Du lefz, di xet û nîvîsa xwe da, wekî hev bin, lê yek ji wan mufred be, ya din jî mûrekkeb be, wekî "Mela" ya di vê beytê da, ku mûrekkebê ji "**me**" û "**la**" ya bi me'na "**na**"ye, "Mela" ya di beyta dawî da jî; ku mufred e (yek bêje yek e) û bi me'na mamosta û seyda ye.

******

Mela meqsûdê min xal e, ne mulk û menzel û mal e
Ne îlm ê qal e, ê hal e, me hasil kir bi 'ebdalî

ME'NA BÊJEYAN:
Xal: Nîşan. (benek,ben)
Menzel: Êwirge, qonax, qûnax. (konak)

Îlmê qal: Îlm û zanîna zahirî. (zahiri ilim)
Îlmê hal: Îlmê rewşî, tê gehîştina rûhanî û derûnî. (batınî ilim, manevi bilgi)
Ebdalî: Feqîrî û belengazî, rewşa me'newîya îşq û mehebbeta îlahî, haletê **el fena û fîllahê.** (fakirlik, sefillik, Masîvadan mucerred, Allah'ın aşkında musteşrik olma hali)

ME'NA HEMÎ:
Mela! Meqsed û xaya min xalê rûyê dîlbera şox û şepal e, meqseda min ne mulk û qonax û mal e, meqseda min îlmê hal e, îlmê îşqa heqîqîya bê mîsal e, ku min ewî îlmê pîroz, bi feqîrî û belengazî bi destê xwe xistîye.

******

Me hasil kir bi xizzanî, bi muştaqî, bi heyranî
Wekî genca di wêranî, me peyda kir bi remmalî

ME'NA BÊJEYAN:
Xêzanî: Feqîrîtî. (yoksulluk)
Muştaqî: Arzûmendîtî. daxwazî (arzulayarak,özliyerek)
Heyranî: Sergerdanî, lê şaş mayînî, kêcî. (hayran kalarak)
Genc: Xizne. (hazine)
Wêran: Xirabe, wêrane. (harabe)
Me peyda kir: Me bi dest xist. (elde ettik)
Remmalî: Remilbazî, îlmê remlê, lêgerîna li xizne û tiştên veşartî, bi rêzik û çixêzên li ser remlê, (li ser qûmê) (ku ew adet û bawerîyekî xurafî û efsanewî ye, lê Xanî ewî bi kar anîye, ji ber ku di hunerê edebî da, tiştên efsanewî û xurafewî jî, bi kar tên anîn.)

ME'NA HEMÎ:
Me wî 'îlmê hal -wek xiznekî ku di xiraban da veşartî ye- bi feqîrî û belengazî, bi heyranî û bi daxwazî, bi fal û tilism û remilbazî bi dest xist.

****

Bi remmalî me peyda kir, dilê xemgîn me pê şa kir
Neqîyyîl-xed û îbra kir, wekî zêrra du sed salî

ME'NA BÊJEYAN:
Neqî: Pak û paqij. (pak, temiz)
Xed: Rû. (yüz)
Neqîyyîl-xed: Rû paqij û pak. (yüzü pak ve temiz)
Îbra: Derxist temîzayê, pak kir. (cılalamak, parlatmak)
Du sed salî: (iki yüz yıllık, tarihi, antik)

ME'NA HEMÎ:
Me xizna wî îlmê hal, bi remilbazî peyda kir, (bi dest xwe xist) û dilê xemgîn pê şah kir, wekî zêrrê dused salîyê kevn û antîke, rûyî wî paqij û pak kir (cila kir û neqişand), va û heband.

******

Neqîyyûl-xed tîlaya nin, berat û emr û ferman in
Bi tuxra û bi nîşan in, di dest ûşşaqê dellalî

ME'NA BÊJEYAN:
Tila, tela: Zêrr. (altın)
Tilaya: Yê zêrr, zêrrîn, reng zêrr. (altın, altın yaldızlı)
Berat: Nîşan û belge. (nişan, rutbe ve imtiyaz belgesi)
Emr: Ferman. (buyruk)
Tuxra: Turra padîşahîtîyê. (padişah tuğrası, namı ve imzasını taşıyan özel mühür ve damgası)
Ûşşaq: (c.aşiq) Evîndar. (sevenler, aşıklar)
Delalî: Bi rûmet û ezîz, tellal jî, ewê ku tellalî dike, reklam dike. (aziz ve değerli, bir lafı iki edilmeyen, tallalda, tallallik yapandir)

ME'NA HEMÎ:
Ku ew zêrrên rû paqij û bi cîla nin, xweşik û cuwan in, berat û fermanên padîşahan in, tuxra û nîşan in, di destê 'aşiqên delalîda nin.(*)

(*) Ev qesîdeya Xanî ya pirr bi rûmet û pîroz, ji dest xetekî gellek kevn û tevlihev bi dest min ketibû, ez bi mehan pêva mam, min teshîh û durust kır, lê meel'esef! Herdû beytên wî yên dawî, wilo pirr tevlihev û haşifî bûn ku bi tu awayî nedihatin xwendin û pişkaftin, ez demekî pirr dirêj lê muheyyer mam, di dawî da ez mecbûr bûm ku bi angorê wezn û aheng û naveroka wî qesîda pîroz, du beytan bi hûnim û lê îlawe bikim; dema ku min xame da destê xwe û dest bi nivîsarê kir, feyz û bereketa wêjevanîya Xanî, dizgîna xameyê wilo ji destê min deranî ku di şûna du beytanda, donzde beyt hatin ristin.

Li destê aşiqê şeyda, Mela û suxte û seyda
Ku lê "Bezma elest" mey da, bi ke'sa gewherê alî
Bi ke'sa gewherê wala, ku lê neqşê xet û xala
Dikin keşfa sirr û hala, dilê ku-j "Masuwa" xalî
Dilê jê "Masuwa" dûr e, tecellî lê ji ser Tûr e
Şemal û agir û Nûr e, Celal û coş û xweş halî
Bi wî xweş halê serxoşî, celal û cezbe û coşî
Dibînin sirrê meynoşî, di nerxînin wî pertalî
Di nerxînin wî pîrozê, perreng û agir û kozê
Kulîlka cejn û newrozê, gula reng-reng û al-alî
Gula azadî daxwazî, li mil ala serefrazî
Li dil jê cîlwe û nazî, ji bulbul xulxul û nalî
Ji bulbul nalî yû zarî, li dil çika evîndarî
Ji sorgul cîlwe lê barî, ji rû perdê ku da alî
Ji wê xunça terr û taze, gula ku -b' cîlwe û naze
Wekî sazê pirr awaze, di nale her der û alî
Di nale âh û fixane, di kale, şîn û şîwane
Di male xwîn ji çavane, wekî min şêst û şeş salî
Wekî min kalê dil cane, serî çillê ji derdane
Ji gulzarê xwe dûr mane, bi hev ra ketne vî halî
Bi hevra nalî yû zarî dikin em ku-j sitemkarî
Wekî Ferhadê xunxawrî, Siyamend û Memê Alî
Memê Alanê dilsozê ku Zînê dît li newrozê
Ji ber wî agir û kozê li dil wek Xanî ku-d nalî

(Durre-1997 - Almanya)

Bi destûra pîrê wêjevanîya Kurdistanî, emê ewan donzde beytan bi temamî lê îlewe bikin û wî qesîdeya pîroz pê bi qedînin. Hîvîdarim ku ew mamostayê hêja ew Seydayê mezin, me bi bexşîne û evan polên me yên bê rûmet, di gelwan durr û gewherên xwe yên pirr bi qîymet da, bi pejirîne û bi nerxîne.)

Polên me eger ku lê nezer ke
Dê wan wekî zêrrê, mu'teber ke

Suxtê wî ne em ku bê newa ne
Muhtacê eta yê padîşa ne

Hîvî hene em ku bextîyar bin
Lutf û kerema wî jê bi par bin

Ew rehberê heqq e, em jî talibê heqq
"La tenher" e emrê şahê mûtleq

Miskîn hene talibê zekatê
Daxwazê dikin ewî xelatê

Durre

Bezma elest: Meclisa ku Xwedê, di ezel da tê da ji ruhan ra gotîye "Elestû bî Rebbîkum"; = Qey ez Xweda yê we nînim? Ruhan jî gotîye "belê" Tu Xweda yê me yî!
Ji ke'sa: ji qedeha
Âlî: Bilind û wala
Masuwa: Ji bil Xwedê her tişt, hemî âlem
Tûr: Çîyayê Tûrê Sîna, cîhî tecellîya Xwedê ji Mûsa pêxember ra
Pertal: Qumaş û pirtî
Perreng: Pîzota agir
Âl-alî: Reng reng û sor
Azadî daxwazî Daxwazî û vayîna azadî û serbestîyê
Sazê pirr awaz: Sazê ku deng û awazê wî pirr û gurr e
Şîn û şîwan: Me'tem û girîn, qêrîn û zarîn
Di male: Paqij dike, di malîne
Ji gulzarên xwe: Ji gulîstanên xwe; bulbul ji gulîstanê, Seyda yê dil kull jî, ji Kurdistanê
Sitemkarî: Zulm û bê dadî
Ferhad: Ferhadê aşiqê şirînê
Sîyamend: Sîahmedê Silê, aşiqê Xecê
Memê Alî: Memê Alanî, aşiqê Zîna Botanî

- 'ENQAYÊ BEQA - (*)

Beydayê fena gerçi benım rehguzerımdır
'Enqayê beqa hîmmetê hemrahê perımdır

Wehm eylemezem sehmê bela qewsê felekden
Atılsa, çu destımde tewekkul sîperımdır

Ben baxê Cîhan içre 'eceb nexlê belayem
Başımda bela berg û meşeqqet semerımdır

Saqî bana îmdadi kılıp, fatihê bab ol
Meyxane terîqimde ki evvel seferımdır.

Ben aşiqê dîdarê, ne hacet xemê dîwar
Cennet dexi ber perde yê qet'ê nezerımdır

Perwaneyê perr soxîteyê şem'ê qedîmim
Nîranê cehennem şererê bal û perrımdır

Alam û cefasîle xweşim ben rehê îşkin
Xanî! Bana bu yolde, qedem çeşmê serımdır

.....

Beydayê fena gerçi benım rehguzerımdır
Enqayê beqa hîmmetê hemrahê perımdir

ME'NA BÊJEYAN:

Beyzayê fena: Deşta ne bûyîn û tunetîyê. (yokluk çölü)
Rehguzer: Rê bihorek. (yol güzergahı,geçit)
'Enqa: Perendekî efsanewîye, dibêjin ku di pişta çîyayê'**Qaf** da ye. (efsanevi bir kuştur, Kaf dağlarında yaşadığını söylüyolar,ismi var cismi yoktur)
Beqa: Baqî mayîn, her heyîn. (baki kalmak)
Hîmmet: Vayîna bi dil û can, 'ezm û îrade. (gönülden arzulanan ciddi gayret,azm)
Hemrah: Hevalê rê, rêwî. (yoldaş)
Perr: Bask (kanat)

(*) Ev qesîdeya Xanî jî bi lehca Osmanî ye, (Bu kaside Osmanlı lehçesiyledir.)

ME'NA HEMÎ:
Her çiqas ku deşta tunebûyînê, rêboreka min e jî, (gerçî ez di wê ra derbas bûme û dê derbas bim jî,) lê baqî mayîna ku wekî teyrê Enqa ye, himmeta rêhevalê bask û Perrê can û dilê min e. Yanê: Her çuqas ku ez bi cîhetê xwe yê nasûtî (maddî, beşerî) tune û fanî me, yek ji rêwîyên deşta fenayê me, (tune û fanî me) lê Ez bi cihetê xwe yê lahûtî (îlahî) namîzed û numeyandeyê 'Enqayê beqa yê me, himmet û xwesteka derûnîya perr û baskê dil û canêmin ew Enqayê bê hemtaye, ew jîyan û her hebûnî û beqaye ebedîye. Baqî mayîna bi her hebûnîya Zatê Xweda ye, mertebe û meqamê 'elfenaû fîllah welbeqa û bîllah'ye.

******

Wehm eylemezem sehmê bela qewsê felekden
Atılsa, çu destimde tewekkul sîperımdır

ME'NA BÊJEYAN:
Wehm: Sîber, xîyal, tewehum. (kuruntu)
Eylemezem: Nakim,nayê hişê min. (edemem)
Sehmê Bela: Tîrê teşqele û musîbetê. (bela ve müsibet oku)
Qewsê Felekten: Ji kevanê çerxa felekê. (Felekın yayından)
Çu: Lewra. (çünkü)
Destimde: Di destê mın da. (elimde)
Tewekkul: Xwe sipartina Xwedê. (Allah a tevekkül etmek)
Sîper: Piştlêdek, parêzek. (arkasına saklanılacak şey, koruyan siper)

ME'NA HEMÎ:
Ez texmîn nakim (di hişê min ra derbas nabe) ku ji kevanê felekê da tîra belayê bê avêtin (û li min bikeve). Lewra di destê min da sîper û parêzeka tewekkulê heye.
(ومن يتوكّل على الله فهوَ حسبه Telaq / 3). (Bê guman ku, kî tewekkela xwe bide ser Xwedê, Ew kafîyê wîye).

******

Ben baxê Cîhan içre 'eceb nexlê belayem
Başımda bela berg û meşeqqet semerımdır

ME'NA BÊJEYAN:
Baxê cîhan: Bax û baxçê dunyayê. (Dünya bahçesi)
Îçre: Di navda di hundirda. (içinde)
'Eceb: Sosret, xerîb. (tuhaf acaib)
Nexil: Dara xurmê. (hurma aşacı)
Nexlê bela: Dara bela û afetê. (bela aşacı)
Başımda: 'Ser serê mın
Berg: Pel û belg. (yaprak)
Meşeqqet: Zor û zehmetî. (sıkıntı, meşakkat)
Semer: Ber. (meyve)

ME'NA HEMÎ:
Ez di nav bax û baxçeyê dunyayê da darekî belayê pirr sosret û 'ecêbım: bela û musîbet belg û pel seê mınin, zehmetî û meşeqqetî jî, ber û fêkîyên mın in.

******

Saqî bana îmdadi kılıp, fatıhê bab ol
Meyxane terîqimde kî evvel seferımdır

ME'NA BÊJEYAN:
Saqî: Meyger. (mey veren, içki sunan)
Îmdad: alîkarî, hewar hatin. (yardım)
Kılıp: Bike
Fatihê bab: Yê ku derî ve dike. (kapıyı açan)
Ol: Bibe
Meyxane terîqinde: Di rêya meyxanê da. (meyhane yolunda)
Kî: Ku, ko ji bo min ra. (ki benim için)
Evvel seferımdır: Rêwîtîya mina seretaî ye. (ilk yolculuğumdur)

ME'NA HEMÎ:
Ey saqî! Tu di hewarîya min were, derî lı min veke, ku di rêya meyxanê da Ev rêwîtîya mina seretaî ye, îhtîyacîya min bi alîkarîtî û rehberîtîya Te heye.

******

Ben aşiqê dîdarê, ne hacet xemê diwar
Cennet dexi ber perdeyê qet'ê nezerımdır

ME'NA BÊJEYAN:
Dîdar: Dîtina rûyê yarê, çehre. (yarın yüzünü görme)
Ne hacet xemi diwar: Îhtîyacî bal xem kirina dîwar-mîwaran va nîne, Ez ji xeyrê dîdara yarê di xem û endîşa tu tiştî da nînim, (Ez ne wek wî hevalê Mûsa Pêxemberim ku xema dîwar kirîye, ku çîroka wî di sûretê elkehfda derbas dibe). (Duvardan maksad: yar ve didarından başka her şeydir, Hz.Musa yoldaşının iki yetimin yıkılmak üzere olan duvarın tamir etmesi hikayesine de işareti vardır ki bu hikaye Kur'anı Kerimin elKehf süresinde özetlenmiştir)
Dexi: Jî (dahi)
Ber perde: Li ser perdê
Qet'ê nezer: Birrîna mêze kirinê, birrîna 'elaqe û peywendîyan. (alakayı kesmek, terketmek)

ME'NA HEMÎ:
Ez aşiqê dîdarê me, di xem û endîşa dîwarêda (di xema masîwayê yarê da) nînim, jixeyrî dîdara yarê, min 'elaqe û peywendîyên xwe ji her tiştî birrîye, jê qet'î nezer kirîye, ji wî bê tir Ez xem û endîşa dîwar, mîwaran,xan û manan nakim, hetta min ji bihîştê jî, qet'î nezer kirîye, ez ewî jî nafekirim, dı xema wî da jî, nînim.Ku bi kurtî: Min ji xeyrî dîdarê dev ji hemî tiştî berdaye, di dilê min da xem û endîşa wî bi tenê heye û maye, wek ku Melayê Cizîrî gotîye.

Mela her Wî bibîn, her Wî, Eger her wî bi nasî To
Huwel me'bûd û wel meşhûd û bel laxeyre fiddareyn

Dil yeke dê îşqê yek bit, 'aşiqan yek yarî bes!
Min ji baxê gul firoşan,yek gulek,yek tarî bes!

Melayê Cizîrê

******

Perwaneyê perr soxîte yê şem'ê qedîm im
Nîranê cehennem şererê bal û perrımdır

MENA BÊJEYAN:
Perwane: Perrperok. (kelebek)
Perr soxîte: Perrik şewitî. (kanadı yanmış)
Şem': Mûm, find, şu'le û şemal. (mum ışık)
Qedîm: Kenv, dema bê serî. (eski, eski zaman, başlangıçı olmayan)
Nîran: (c.nar): Agir. (ateş)
Cehennem: Dozex,
şerer : Pêt û pirûskên agir. (ateş kıvılcımı)
Bal û perr: Bask û perrik. (kanat)

ME'NA HEMÎ:
Ez Perperoka bask şewitîya agir û pêtê mûma kevnim, agirê dozexê Prûsk û Pîzotên perr û baskên minin (Prûskên ku ji ber perr û baskên min davêjin)

******

Alam û cefasîle xweşim ben rehê îşkin
Xanî! Bana bu yolde, qedem çeşmê serımdır

ME'NA BÊJEYAN:
Alam: (c.elem): Êş û jan. (elem ve acı)
Cefa : (eziyet, işkence, sıkıntı)
Xweşim: Kêf xweş û hêsa me. (memnunum,sıkıntım yoktur.)
Rehê îşqin : Rêya îşqê. (aşkın yolu)
Qedem: Ling, nig, pê. (ayak)
Çeşmê serım : Çavê serê min. (gözüm)

ME'NA HEMÎ:
Ez bi êş û elem û cefayên îşqa wê kêf xweş û memnûnim, Ey Xanî! di vî rêyê da (di rêya îşqê da) çavên serê min bûne lingên min (Ez li ser ser û çavên xwe di vî rêyê da dimeşim)

- ME DÎ NEQŞEK -

Me dî neqşek ji neqşê Neqşebendan
Vebû qeydê di min yek yek ji zendan

Kuşada dil ji bo min ra muyesser
Ne bû bê suhbeta sûret lewendan

Li min kurt bû rîya Ke'ba wisalê
Bi nûra tel'eta bala bulendan

Rezîl û ser xweşim wellahî waiz
Li min zayî' meke wan we'z û pendan

Mesed hêvî heye dîsa ji seyyad
Me aza ke ji qeydê qeyd û bendan

Ji ahoyan, me hoyan xwestin emma
Dilê min ma di gel mişkîn kemendan

Dilê Xanî eger çi genc û xane
Belê qet kes ne got Xanî bi çendan
.....

Me dî neqşek ji neqşê Neqşebendan (*)
Vebû qeydê di min yek yek ji zendan

ME'NA BÊJEYAN:
Me dî: Me dît. (gördük)
Neqşek: Nexşek, nîşanek, nemûşek. (bir nakış, bir belge)
Neqşebendan: Neqqaşan, nîgarendeyan, Nexşebendîyan, (kesên ku li ser rê û terîqa Behaeddîn Mûhemmedê Neqşebendî (.../1389 M.). yê Buxarayê ne (Nakşibendi tarikatından olanlar)
Qeydê di min: Bend û qeydê min(beni bağlayan ipler)
Zend: (bilek)

(*) Di nusxeki din da jî, ev misra' wihaye: 'Mi dî şêxek ji şêxê Neqşebendan.

ME'NA HEMÎ:
Me ji nexş û nemûş û nîşanên Neqqaş û Nexşebendîyan neqş û nîşanek dît ku bi wî, bend û qeydên millên min yek biyek vebûn (astengîyên min çûn, muşkîlatên min hell bûn, Ez gihîştim meqsed û mirazê xwe,bal sivik û aza bûm)

******

Kuşada dil ji bo min ra mûyesser
Ne bû bê suhbeta sûret lewendan

ME'NA BÊJEYAN:
Kuşad: Vebûn, înşirah. (açilma)
Muyesser: Li hev hatî. (müyesser olmak)
Suhbet: Hevalî, demsazî. (arkadaşlık, sohbet etmek)
Dil: (gönül)
Lewend: Şeng û qeşeng û delal û xweşik. (yakışıklı ve güzel eskiden Yeniçerilerin deniz askerlerine verilen bir unvandır.)
Sûret lewendan: Rû xweşik û şox û şengan. (güzel yüzlüler)

ME'NA HEMÎ:
Bê suhbet û hevalîya lewendan, ji min ra înşirah û vebûna dil mûyesser nebû. Lê bi suhbet û hevalîya wan sûret xweşikan, înşirah û vebûna dil, ji min ra qenc û xweş çêbûn.

******

Li min kurt bû rîya Ke'ba wisalê
Bi nûra tel'eta bala bulendan

ME'NA BÊJEYAN:
Li min kurt bû: Ji min ra kin bû. (bana, benim için kısaldı)
Ke'be: Çargoşek, Ke'ba şerîf, mala Xwedê, rûgaha musulmanan. (kabe, kıble)
Wisal: gihîştin,gihîştina dost û yaran (kavuşmak)
Ke'ba wisalê: Wisala ku wekî Ke'beyê pîroze, we yan cihê wislalê yê ku wekî Ke'beye. (Kabe gibi kutsal olan kavuşma)
Tel'et: Derketina rûyên xweşik ji binê perdê, xûyabûna wan. (çehre,yüz görünüş)
Bala bulendan: Bejin bilindan (boylu boslu olanlar)

ME'NA HAMÎ:
Ji nûr û ronahîya derketina rûyê bejin bilindan, rêya Ke'ba wîsalê, (ku wekî Ke'ba şerîf Pîroze) li ber min kurt bû, ji min ra kin û hêsa bû,ku ez bi wî rêyê, zû gihîştime balê, pê ji tarîtî ya firaqê xilas bûm.

******

Rezîl û ser xweşim wellahî waiz
Li min zayî' meke wan we'z û pendan

ME'NA BÊJEYAN:
Rezîl: Ruswa, bê şerm û fedî. (utanmaz,hayasız)
Zayî' meke: Beredayî serf neke. (boşuna harcama)
We'z û pend: Şîret û nesîhet. (öğüt ve nasihat)

ME'NA HEMÎ:
Ey Waizê pendîgo! Ez bi Xwedê sond dixum ku ez merifekî serxweş û ruswa me. Tu bereda-yî li min we'z û nesîhetan neke, lewra ew beredayî diçin, fayda wan ji min ra tune.

******

Me sed hêvî heye dîsa ji seyyad
Me aza ke ji qeydê qeyd û bendan
Ji ahoyan, me hoyan xwestin emma
Dilê min ma di gel mişkîn kemendan

ME'NA BÊJEYAN:
Seyyad: Nêçîrvan. (avcı)
Qeyd: Girêdan. (bağlamak)
Qeyd û bend: Kelepçe û bend. (kelepçe ve ipler)
Kemend: Fitrak, bendê nêçîrvanan, bisk û zulf'ên wekî kemendan. (kemend)
Aho: Xezal, ask. (ceylan)
Hoyan: (c.ho) ho, Hem bi me'na sebeb û wesîle û bihane ye, hem jî tîp û daçeka gazî kirin û bang û hewarê ye, bi me'na: "lo, lê, hey, hê" ye. (Yanê: Lo filankes, hevalno! Ez gazî we dikim, hey

hewar ji boy min werin!). (vesile, sebeb, bahane, ve hey anlamında çağrı harfıdır)
Ji ahoyan me hoyan xwestin: Me, ji nêçîrvanê ahoyan, we yan me ji ahoyan bi xwe, wesîleyên azadiyê. (îmdad û alîkariyê) xwestin, telbe kirin.
Emma: Lakin, lê, belê. (ama, velakin)
Mişkîn: Wek miskê bi bîm. (misk gibi kokulu)

ME'NA HEMÎ:
Ey waizê lem yetteîz! Ey bê hişê bê muxz! Tu dev ji wan pend û nesîhetên xwe yên bê fayde û berredayî berde, Tu bi wan nikarî tu tiştî bikî; em dîsan jî ji nêçîrvanê ahoyan pirr bi umîd û hîvî ne ku ew bikare me xilas bike, ew bikaribe dilê me ji qeyd û bendên mişkîn kemendan riah û aza bike. Ku ji boy wî azadî û xilasîyê, me pirr sebeb û wesîle xwestin (me serî li pirr wesîle û sebeb û çareyan xistin) lê dîsan jî dilê min digel mişkîn kemendan ma. (dilê min bi temamî ji wan neqetiya, bi wan va ma).
Îhtimale ku xulasa me'nayê wiha be jî: Her çuqas ku dilê min digel mişkîn kemendan maye, dilê min bi wan va ye (em dîl û girtiyê qeyd û bendên hewesên nefsanî û peywendîyên maddî ne,) lê dîsan jî, em ne bê umîd û bê hêvî ne, pirr hêvîyên me ji nêçîrvanê şareza, ji dermanzanê mereza (ji pîr û murşidê kamil)heye ku ew dilê me, ji wan kul û derdan, ji wan qeyd û bendan riha bike, me ji peywendiyên **Masûwa yê**, aza bike.

******

Dilê Xanî eger çî genc û xane
Belê qet kes ne got Xanî bi çendan

ME'NA BÊJEYAN:
Eger çî: Çendan ku. (her ne kadar ki)
Genc: Gencîne, kan. (hazine)
Xan: Cîyê kar. (han ve iş yerî)
Xanî: ey Xanî! we yan ew xan û xanî. (ey Xani Hazretleri veyahut o han ve hane)
Bi çendan: (kaçadır)

ME'NA HEMÎ:

Her çiqas ku dilê Xanî kana meanîya ne, xezîna durr û gewhera ne jî, belê, sed heyf û sed mixabin! Qet tu kes nayê wî kan û xezîneyê, pirsa biha û qîymeta wan durr û gewheran nake û nabêje ka gelo ew çine û biçine? (Lê bila dilê wî mamostayê mezin rehet û xweş be ! Ku -wê bê guman- rojekî dema pirsa wan gewheran û pirsa biha û qîymetên wan were...)

HILO !

Dilo! Rabe xwe kêf xweş ke, biçîn seyra gulistanê
Bese! carek tu xwe-b weş ke, Hilo! Da biçne seyranê

Gulîstan wekû sorgul tê, çimen misla ku sunbul tê
Hezar bulbul bi xulxul tê, di fesla mahê nîsanê

Di fesla çardeyê nîsan, me dî bû dîlberek dîsan
Bi dil meş'el çira îsan, me can da şubhê perwanê

Me can da dîlberek sade, letîf û şox û begzade
Ji qeydan kir me azade, nîhan xwendîme dîwanê

Nihanî xelwetek da min, ji le'lan şerbetek da min
-Bi dîn guh- şîretek da min, girim bende di fermanê

Ji fermanê kî haziq bit, û naxwazî munafiq bit
Divê her dem muwafiq bit, wekî şêxê di sen'anê

Wekî şêxê, dê hazir bit, li fermanê ku nazir bit
Bi emrê dostê kafir bit, bi sojit suhfê qur'anê

Disojim suhfê mektûbê, bi emrê yar û mehbûbê
Dema dil dim bi metlûbê, didem ez dîn û îmanê

Eger dîlber mecazî bit, ji rengê libsê xazî bit
Bila sofî ne razî bit, bi mîne ew di hirmanê

Binê: sofî qewî dîne, wekî xuffaşê miskîne
Li nik wî roj tureng nîne, xwe naspêrit direxşanê

Dilê wî kor ê e'ma ye, ji weslê dûrîda maye
Li ber wî derge dadaye, nehîşte bête dîwanê

Ez im serxweş ji wê camê, ez im ruswa di nêv âmê
Ez im 'enqa ketim damê, bi zulfa ser li xal danê

Bi zulfa hate serxalan, bi nefşa tîtik û alan
Dil û canê me 'ebdalan di bit dîsa di talanê

Di talanê ku sed ser çûn, hezaran genc û gewher çûn
Dilê sed pare ker-ker çûn, Tu "Xanî" beske efxanê

.....

Dilo! rabe xwe kêf xweş ke, biçîn seyra gulistanê
Bese! carek tu xwe-b weş ke, Hilo! Da biçne seyranê

ME'NA BÊJEYAN:
Dilo: Ey dil. (ey gönül)
Kêf: Neş'e. (keyif, sevinç)
Xwe kêf xweş ke: Kêfa xwe xweş bi ke. (keyfini hoş eyle, sevinçli ol)
Seyr: Temaşa. (seyretmek)
Gulîstan: Gulzar, cî û baxçe yê gulan. (gül bahçesi)
Bi carek: (Bir kere, bir sefer, hep, tamamiyle)
Bi weş: Bi quwwet, bi wec, bi hêz. (güçlü, kuvvetli)
Hilo: Ha ! Ka rabe! (haydi!)
Da: Ta. (ta ki)
Seyran: Geşt. (piknik)
Biçne: Biçin. (gitsek, gidelim)

ME'NA HEMÎ:
Ey dil! Rabe xwe kêf xweş bike, were em biçin temaşa baxçeyên gulan, bese wilo bê hêz be! Carek jî tu xwe bi hêz û wec ke, haydê rabe em biçin geşt û seyranê! (te çi wisa xwe pepûk û belengaz kirîye, te bi carekî dev ji xwe berdaye, hey mal xirabo ! Çi hatîye serê te, hêz bide xwe, rabe serxwe!)

******

Gulîstan wekû sorgul tê, çimen misla ku sunbul tê
Hezar bulbul bi xulxul tê, di fesla mahê nisanê

ME'NA BÊJEYAN:
Weh: 'Ecêb, wilo 'ecêb û sosret. (acaip, öyle acaip)
Weh ku sorgul tê: Pirr 'ecêb gulên sor têda ne, tijî gulên sor in ku merif jê 'ecêb dimîne. (Gulistan; öyle kırmızı güllerle dolmuş ve donatılmıştır ki)
Misla: Weka, mîna. (benzer)
Xulxul: Dengê xwendin û wîtewîta perrendeyan. (kuşların ötüş sesi)
Fesl: Beş, werze. (bölüm, mevsim)
Mah: Meh. (ay)

ME'NA HEMÎ;
Gulîstan, 'ecêb xemilîye û tijî gulên sor bûye, çimen jî, ji sunbulan bûye misal û numûne, tijî sunbul bûne.
Yanê: gulistan û çîmen tijî gul û sunbul bune û xemilîne, bi hezaran Bulbul jî, di mewsimê biharê da, di meha nîsanê da xulexul û wîte wîtên wan in, dixûnin.
Yanê:

Mewsim bihar bû, xullînê ava bû
Gul bûka bi xêlî, bulbul zava bû

- Durre -

******

Di fesla çardeyê nîsan, me dî bû dîlberek dîsan
Bi dil meş'el, çira îsan, me can da şubhê perwanê

ME'NA BÊJEYAN:
Dîlber: Şox û şepala ku li ber dila ye, dilan direvîne. (gönül alan, kalbi çeken güzel)
Meş'el: Qendîl, fanos. (fener)
Îsan: Vêxist û têda danî. (yaktı, içine koydu)
Be dil: Di dil da. (gönülde)
Şubhê perwanê: Wekî perperokê. (pervane gibi)

ME'NA HEMÎ:
Me di çardê meha Nîsanê da dîlberekî dîtî bû ku dîsan di dilê me da meş'el û çira danî, agirê îşqê têda vêxist, ku me jî canê xwe li

wî meş'ele yê, wekî perperokê, da. (canê me bû perwana wî agir û pêtê, wekî perperokan xwe avêtê)

******

Me can da dîlberek sade, letif û şox û begzade
Ji qeydan kir me azade, nîhan xwendîme dîwanê

ME'NA BÊJEYAN:
Sade: Safî, ne tevlihev. (saf, karışık olmayan)
Letîf: Nazik, xweşik, zelal, şeffaf, bi çavan nayê dîtin. (gözle görülemeyen, hoş ve nazik)
Şox: Delal û nazenîn. (nazlı, şîvelî, şen)
Begzade: Ji nesla beg û padîşahan. (bey soyundan, asilzade)
Ji qeydan bûme azade: Ji qeyd û bendan riha bûm. (kaytlardan azad oldum)
Ji qeydan kirme azade: Ewê me ji qeydan rihakir. (bizi kaytlar dan kurtardı)
Nîhan: Bi dizî. (gizli, gizlice)
Xwendîme: Me vexwendî, gazî me kir. (bizi davet etti)
Dîwan: Meclisa mezinan "huzûra mezinan". (büyüklerin meclisi, huzuru)
Nîhan xwendime diwanê: Bi dizî me dawetê dîwana xwe (meclis û huzûra xwe) kir. (gizlice, bizi divanına çağırdı)

******

Nîhanî xelwetek da min, ji le'lan şerbetek da min
-Bidin guh- şîretek da min, girim bende di fermanê

ME'NA BÊJEYAN:
Nihanî: Bi dizî. (gizlice)
Xelwet: Bi tenê mayîn. (tek başına kalmak, tenhaya çekilme)
Ji le'lan: Ji lêvên ku wekî yaqûtê sor û giran bihane. (çok kıymetli olan lail taşına benzeyen dudaklar)
Bidîn guh: Guh bidnê, we yan got: ku hûn guh bidinê. (kulak veriniz, dediki kulak veriniz)
Şîretek: nesîhetek, pendek. (bir nasihat)
Bende: girêdayî, dîl û hêsir, xizmetkar. (bağlı, köle, esir)
Ferman: emir. (emir, tebliğ, buyuruk)

ME'NA HEMÎ:
Dîlberê bi dizî, bi min ra xîlwet kir, em bi tenê man û me suhbetek kir, ji lêvên xweyên şirîn şerbetekî da min, (gotinên xweş gotin,) me gohên xwe dayê, weyan ji me ra got "hûn guhê xwe bidin min", li me şîret û nesîhet kirin û me kir bendeyê ferma xwe.

******

Ji fermanê kî haziq bit, û naxwazî munafiq bit
Divê her dem muwafiq bit, wekî şêxê di senanê

ME'NA BÊJEYAN:
Haziq: Karzan, mahir, pispor. (işinin ehli, mütehassıs)
Munafiq: Durû. (iki yüzlü)
Muwafiq: Wekhev, ne dij. (uygun, muvafeqet eden)
Şêxê Sen'anê: Şêxekî terîqê bûye, dilê wî ketîye keçekî êrmenî, keçika êrmenî jê ra gotîye: gere tu Qur'anê bi şewitînî, mey vexwî, bibî gavan û şivanê berazan, şêx jî ewan teklîfên wê qebûl kirîye, hemû tiştan wekî gotina wê kirîye, ku Melayê Cizîrî, derheqa wî macerayê da (maceraya şêx û ma'şûqa wîya êrmenî da) wiha dibêje:

Mey nenoşî Şêxê sen'anê xelet
Ew neçû nêv Êrmenistanê xelet
Mislê Mûsa wî tecellaya Te dî
Ê Te dî kanê xeta, kanê xelet

"Şêxê sen'anî, bi şaşî mey venexwarî ye, bi çewtî û şaşîtî neçûye Êrmenîstanê, belkî wekî Mûsa Pêxember (ku nûra cemala Xwedê, li çîyayê Tûrî Sîna dît) Ewî jî Nûra Cemala Te, dîtîye; yê ku te bibîne şaşîtî û çewtîtî ya wî li ku di mîne?" Ew ne çewt û şaş e.

(Sen'ani şeyhi, meşhur bir tarikat şeyhidir. Bir ermenî kıza aşık olur, onun direktif ve isteği ile de mey içer, Kur'an-ı yakar ve domuz çobanlığını kabul eder ki meşhur Melayi Cıziri divanında onun hakkında şöyle diyor: "şeyhi San'ani, yanlışlıkla ve hata yaparak mey içmemiştir, o da Musa Peygamber gibi, senin tecelli ve Cemalinin nurunu görmüş, seni göremenin hatası ve yanlışlığı olurmu? Tabiiki olmaz)

ME'NA HEMÎ:
Kesê ku ji fermanê xeberdar be û me'na û ehemmîyeta wî qenc bizane, durûtî û minafiqîtîyê jî nexwaze, neke, dê ew wekî şêxê Sen'anî, ji emr û fermana Te derneyê, muwafiqê wî emr û fermana Te ya pîroz be (çi dibe bila bibe, tiştên ku Te ferman kir, dê bê tereddud bike û fermanên Te bi cîh bîne) Çawan ku dîsan jî Melayî Cizîrî dibêje :

Ger bi kuştin, wer bi hîştin emr û fermana Te bit
Ehmedo ebdun reqîqun waqîfun beynel-ebîd

Eger emr û fermana Te bi kuştina me be, weyan bi hîştina me be, Tû qenc bizane ku Ehmedo (Melle Ehmedê Cizîrî)yek ji bende yên Te yên xalise, bi tû awayî ji fermana Te dernayê. Tu çi fermen bikî dê ew bi angorê wê fermana Te be, rîayeta wî bike.

******

Wekî şêxê, dê hazir bit, li fermanê ku nazir bit
Bi emrê dostê kafir bit, bi sojit suhfê qur'anê

ME'NA BÊJEYAN:
Dê: Bê guman. (muhakkak)
Hazir: amade. (hazır, muheyya)
Nazir: mêzeker. (bakacak olan, bakan)
Kafir: gawir. (kafir, inanmayan)
Bi sojit: bişewitîne. (onu yakacak)
Suhf, suhuf: (c. sehîfe): belg, pel, rûpel. (sayfa, yaprak)
Suhfê Qur'anê: pelên Qur'anê. (Kur'an'ın yaprakları)

ME'NA HEMÎ:
Eger ew nazirê emr û fermanê be (rî'ayeta wî bike), dê wekî şêxê Sen'anî amade û hazir be, bi emrê dost û yarê bibe kafir û belgên Qur'anê bişewitîne.

******

Disojim suhfê mektûbê, bi emrê yar û mehbûbê
Dema dil dim bi metlûbê, didem Ez dîn û îmanê

ME'NA BÊJEYAN:
Suhfên Mektûbê: Belgên wî yên ku hatine nivîsandin. (yazılmış olanın sayfaları)
Mahbûbê: Ya hezkirî. (sevilir olan, sevilen)
Dil dim: Dil bidim. (gönül versem)
Metlûbê: Ya ku daxwaze. (istenilen, arzulanan)

ME'NA HEMÎ:
Yanê: Dê ew bibêje: Ez bi emrê yar û mehbûba xwe, pelên wî Qur'anê ya nivîsandî, dişevitînim, ji ber ku dema Ez dilê xwe didim (yan bidim) wê yara ku miraz û metlûba mine, Ez wê demê, dîn û îmanê xwe (ol û bawerî ya xwe) jî, didim (teslîmê wê dikim, ev çawan emir dike, dê ez wilo bikim).

******

Eger dîlber mecazî bit, ji rengê libsê xazî bit
Bila sofî ne razî bit, bi mîne ew di hirmanê

ME'NA BÊJEYAN:
Mecazî: Ne heqîqî, xwazmanî. (mecazi, hakiki olmayan)
Libsê: Lîbas, cil. (elbise)
Xazî: Cûrekî qumaşê kitanê erzan e. (ketenden yapılan ucuz bir kumaş türü)
Hîrman: Bê parî, mehrûm bûyîn. (mahrum olmak)

ME'NA HEMÎ:
Eger cî ew dîlbera ku ez di fermana wê da me, dîlberekî mecazî be jî, bi cil û lîbasên kitanî û erzan be jî, (yanê, cilên wê ji qumaşê xazî be, we yan mînanî xazî bê qîmet û erzan be jî) dîsan jî, Ez hertiştên xwe dispêrêm wê, -sofî razî bibe nebe-, ez ji emr û fermana wê dîlberê dernayêm, (sofî çi dibêje bila bibêje, çi dike bila bike)

Ma qey çi zane Sofî ! Hov û nezane bê mux (*)
Şêxzade zêrre kofî, dêre ji qûtnî û çux ?

- Durre -

******

(*) Bê mux: bê mêjî, bê hişş

Binê: Sofî qewî dîne, wekî xuffaşê miskîne
Li nik wî roj tureng nîne, xwe naspêrit direxşanê

ME'NA BÊJEYAN:
Binê: Binhêre, mêzebike. (bak)
Qewî dîne: Zor dîne. (zır delidir)
Xuffaş: Parçîmk, balçîmok, şevrewîng, çekçekûle. (yarasa kuşu)
Xuffaşê miskîn: Parçîmka belengaz ku çavên wê li be rojê venabin û nikare ronahî ya wê bibîne, ji wî wetrê jî, tu reng û ronahîya rojê tunîne (tuneye). (zavallı yarasa, güneş karşısında gözleri açılamıyor, sanıyor ki güneşin hiçbir rengi yoktur)
Xwe naspêrit: Xwe nasipêre, xwe teslîm nake (kendini teslim etmiyor)
Direxşan: Tiştê bi ronî, tiştê dibiriqe (parlayan, parlak olan şey)

ME'NA HEMÎ:
Parçêmka (balçîmoka) belengaz, ne rojê dibîne, nejî xwe dispêre tiştên ku ronahî didin; Sofîyê dînik jî wekî xuffaşê ye, tiştên bi ronahî nabîne û xwe naspêr e ronahîyî (korefêmekî bê hişş û belengaz e)

******

Dilê wî kor û e'ma ye, ji weslê dûrîda maye
Li ber wî derge dadaye, nehîşte bête dîwanê

ME'NA BÊJEYAN:
E'ma: Ji herdû çavan kor (her iki gözünden kör)
Ji weslê: Ji gihîştinê, ji gihîştana yar û mirazê (yara kavuşmaktan)
Durî da: Ji dûr da (uzaklarda, uzakta)
Derge: Derî (kapı)
Dada ye: Kilît kirîye, girtîye. (kapalıdır, kilitlidir)
Nehîşte: Nehîştî ye. (bırakmamış, bırakmıyor)
Bête dîwanê: Were meclisê, were huzûrê. (divana gelebilsin)

ME'NA HEMÎ:
Dilê Sofî, besîreta wî, kore, tu tiştî nabîne, ji gihîştina yar û mirazê, ji gihîştina heqîqetê dûr maye, derî li ber hatîye dadan, nehîştî ye ku were meclis û huzûrê (ku were jî, kore, tiştek nabîne), çawan ku Mela jî gotî

ye. ***"Dê kor çike-j tewafê, ew nabînit berê reş"***. Dê kesê kor ji tewafa Ke'be yê çi bike, ev kevirê reş (heceril eswed)nabîne.

******

Ez im serxweş ji wê camê, ez im ruswa di nêv âmê
Ez im 'Enqa ketim damê, bi zulfa ser li xal danê

ME'NA BÊJEYAN:

Ruswa: Rezîl, riswa, ewê ku her tiştê wî derketîye meydanê. (rezil, kepaze)

Di nêv âmê: Di nav hemî xelkê da, li bal herkesî. (halk arasında, herkesin yanında)

'Enqa: Sîmurx, perrendekî efsanewî ye, îsmê wî heye, cismê wî tuneye, ku lewra nakeve tu de'fikan jî, di bêjin ku gewdeyê wî bi qasî gewdê sî teyran mezin e ku ji wî sedemê da jî, jê ra sîmurx (sî perrende) gotine. (İsmi olupda cismi olmayan ve ondan dolayı da hiçbir tuzağa düşmeyen otuz kuş büyüklüğünde efsanevi bir kuşun adıdır.)

Dam: Dafik, tell. (tuzak, ağ)

Bi zulfa ser li xal danê: Bi wê zulfa ku serê wî li dane yê xala ne, we yan bi wî zulfa ku serê wî, li xalê rûyê yarê dane. (ucu yanaktaki hal (ben) e dayanan zülf)

ME'NA HEMÎ:

Ez im ewê ku ji wê cama şeraba îşqê mest û serxweş bûme, ez im ku di nav âmê da ruswa bûme, ez im ew teyrê 'enqayê ku ketîye dafika wî zulfa ku serê xwe li ser xala rûyê mehbûbê hatîye, ku ez bi qesta daneyê xalan ketime dafikên biskên wan şepalan.

Bi qesda daneyê xala, ku dil ket dafika dala
Xeta, kêşa binê çala çenê, hêsîr e dê wey bê (*)
Ji jana derdê hicranê, dil û canem xilas nabî
Meger lê bête fermanê; ji lêvan kewser û mey bê (**)

- Durre -

(*) Bi qesta daneyên xalan, teyrê dilê me ket dafika zulfên wê yên ku wekî tûpên dala ne, (wek herfa dalê serê wan xwar û çingirr in) xetên ser rûyê yarê, dilê me kişande çala bin çenê, ku di wê çalê da hêsîr maye û dê tim wilo be jî, her tim di wî da dîl û hêsîr bimîne.

(**) Ji çîk û jana terkdayînê, dil û canê min xilas nabe, îlla ku yar emr û ferman bike: ku kewser û mey ji lêvên wêyên şirîn li wan, ji boy wan were, belkî bi wan şîfa bibin, ji çika hicranê xilasbin.

******

Bi zulfa hate serxalan, bi nefşa tîtik û alan
Dil û canê me 'ebdalan di bit dîsa di talanê

ME'NA BÊJEYAN:

Binefş: Cûrekî gula ne (menekşe). Bi mecazî: Yara ku wekî kulilka binefşê letîf û xweşik e.

Nefş: Belav, belavbûyî, perçe perçe bûyî. (dağılma, dağılmış olan)

Tîtik: Xweşik û rindik, gulî, kezî. (güzel ve çekici olan, saç lülesi, bukle)

Alan: Li hev alîn, yên reng sor û al, li hev alandin. (rengi al, kırmızı olan, birbirine dolanmış olan)

'Ebdal: Feqîr, belengaz, dilsaf. (safdil, bön)

Bi nefşa tîtik û alan: Bi belavbûyîna kezî û gulîyan, bi gulî û keziyên rindik û li hev alîyayî. (saç lülesinin dağılışı ve dağılmış saç lüleleri ile)

ME'NA HEMÎ:

Yara me dîsan jî, bi wî zulfa ku hatîye serxalan, bi belav bûyîn û li hev alandina gulî û kezîyan, dil û canê me belengaz û feqîran dibe talanê (talan dike).

We yan: Ewê yara ku bi çav û dêmên xwe, wekî binefşokê tîtik û sorikên rengîn û xweşik e, dil û canê me belengazan dîsan dibe talanê (talan dike, talan dibe)

******

Di talanê ku sed ser çûn, hezaran genc û gewher çûn
Dilê sed pare ker- ker çûn, Tu "Xanî" beske efxanê

ME'NA BÊJEYAN:

Sed ser: Bi sedan serî, pirr serî. (yüzlerce baş, çok baş)

Genc: Gencîne, xizne. (hazine, define)

Gewher: Cewher. (cevher, mücevher, inci)

Ker-ker: Perçe perçe. (parça parça)

Beske: Bese bike, dengê xwe bibirre. (yeter artık)

Efxan: Fîxan û fîzar. (ağlayıp sızlama, bağırıp çağırma)

ME'NA HEMÎ:

Di talanê da, bi sedan serî, bi hezaran xezîne û define, mal û mulk, cewher û pol û pere çûne, (hemî tişt çûne) dilên sed pare jî, pare-pare çûne. Xanî! Piştî van tiştan hemî, îdî bese ku Tu fixan û fîzar bikî (şerm û fedî ye, eyb û ar e ji Te ra ku Tu evqas dikalî û dinalî).

- HERO SEDCAR -

Hero sedcar ji îlfa wê, di bim keyfê li meyxanê
Vebîr min têt ku zulfa wê, dinalim Ez ji hîcranê

Di nalim lew gelî yaran ji çehvan xûn diçit baran
Ji sehma 'eqreb û maran wekî ew têne lêkdanê

Wekî ew têne ser balan bibînin nuqte û xalan
Bi nefş û xunçe û alan, di ser da mahê tabanê

Di ser da ew meha enwer, ji reyhan sunbulan da ser
Kirim sewda û hem ebter, ji min dil bir bi talanê

Ji min dil bir evê carê, ku min dî qameta yarê
Wekî selwa li cobarê, vemeşya hate eywanê

Vemeşya ya ew sifet horî, ji rengê sorgula jorî
Ruhê şirîn dikim gorî, ji bo xalê û nîşanê

Nîşan û sûretê re'na, didin ku li miskê sed te'na
JI Xanî lêne pirr me'na, wekî Ayatê Qur'anê
.....

Hero sedcar ji îlfa wê, di bim keyfê li meyxanê
Vebîr min têt ku zulfa wê, dinalim Ez ji hîcranê

ME'NA BÊJEYAN:
Îlf: Pêsebirhatin û bîhn derketin, hezkirin. (alışmak, alışkın olmak, sevmek)
Keyf: Neş'e, kêyfxweşî, zewq û sefa. (neşe, sevinç, sürur)
Ve bîr min têt: We di bîra min tê, dikeve bîra min (aklıma geliyor, hatırlayınca)
Hîcran: Terkdayîn, Jê dûrbûyîn, jê qetîn, xem û kederên jê dûr bûyînê. (uzaklaşma, ayrılık üzüntüsü)

ME'NA HEMÎ:
Hero sedcarî, ji ulfet û mehebbet û hevalî ya mina bi wê yarê ra. Ez li meyxanê kêf û zewq û sefayê dikim, bi neşe û kêfxweşî diçim meyxanê û wextê xwe bi xweşî lê di borînin, (mest û serxweş dibin ha ji tu tiştî namînin), lê dema ku zulf û kakulên wê tên bîra min (tên hişşê min). Ez ji derd û kederên dûr mayîna ji wan, dinalim û dikalim, agir û pêtên nav û dilê min gurr û geş dibin, çawan ku Melayê Cizîrî dibêje:

Tu dizanî bixwedê min tû xîyalî şeb û roz
bi xîyala xwe mudam min tu libalî şeb û roz
Mislê koyîn(*) te wisan nale ji miskîn dilî tên
Em nizanin Tu çira her we dinalî şeb û roz

******

Di nalim lew gelî yaran ji çahvan xûn diçit baran
Jı sehma 'eqreb û maran wekî ew têne lêkdanê

ME'NA BÊJEYAN:
Lew: Lewra, ji ber ku. (çünkü, o sebepten dolayı)
Gelî yaran: Ey gelî dostan. (ey tüm dostlar)
Baran: (yağmur)
Ji çavan xûn: (gözlerden kan)
Sehm: Tîr. (ok)
'Eqreb: Dûpişk. (Akrep)
Maran: (Yılanlar)
Wekî ew têne: Mîna ku ew tên. (sanki onlar geliyorlar)
Lêk danê: Lêxistinê. (vurmaya, sokmaya)

ME'NA HEMÎ:
Ey gelî dost û yaran! Ez ji vî sedemê dinalim û xwîn ji çavên min - wekî baran- tên xwarê: ku dûpişk û marên zulf û kakulên yarê, tîrên awirrên kevanên birûyên wê, ji boy pêvedan û lêdanê tên. (mar û dûpişkên wê tên bi me vedidin, tîrên wê jî li dil û canê me didin)

(*) Koyîn: Kohîn, perendeyek e ku tim wîte-wîta wî ye, dikale û dinale.

******

Wekî ew têne ser balan, bibînin nuqte û xalan
Bi nefş û xunçe û alan, di ser da mahê tabanê

ME'NA BÊJEYAN:
Wekî ew: Mîna ku ew. (sanki o)
Serbalan: Ser cîhên bilind. (yüksek, yüce yerler üstüne)
Bibînin: Ku bibînin, mêze bikin. (ki görsünler)
Nuqte: Xal. (nokta)
Binefş: Binefşok ku meqsed jê çavên yarê yên wekî kulîlka binefşokê ne. (Menekşe, yarın menekşe gibi gözleri)
Xunçe: Gula ne pişkivî, nû pişkivî, devê yarê. (açılmamış gül, yarın aşzı)
Alan: Gula alan, rengsor, dêm û lêvên yarê (kırmızı olan, yarin yanak ve dudakları)
Di serda: Di ser wan ra, li jorê wan. (onların üstünde, yukarısında)
Mahê taban: Hîva bi ronahî. (parlayan ay)

ME'NA HEMÎ:
Wisa dixuyê ku ew zulf û kakul têne ser cîhên jor (tên ser dêmên yarê) ku xal û nuqte û nîşanên rûyê yarê û binefşok û xunçe yên çav û dev û lêvên wê yên yaqûtî (wek yaqûtê rengsor) bibînin, ku di ser wan ra jî, li jorê wan jî, hîva bi ronîya çardeşevî ye (eniya wê ya wekî hîva çardeşevî ye)

******

Di ser da ew meha enwer, ji reyhan sunbulan da ser
Kirim sewda û hem ebter, ji min dil bir bi talanê

ME'NA BÊJEYAN:
Ew meha enwer: Ew hîva pirr bi nûr û ronahî. (o çok nurani ay)
Reyhan: Curekî gîhayê bîhn xweş e. (fesleyen denilen hoş kokulu bir ot, hoş ve güzel kokulu)
Sunbul: Cûrekî kulîlkane. (bir çiçek türüdür)
Da ser: (üstüne koydu)
Sewda: Pirr aşiq, bengî. (aşırı aşk tutkunu)
Ebter: Pirr bê xêr û bê khêr. (faydasız, yaramaz, beter)
Talan: (Yağma)

ME'NA HEMÎ:
Di jor da jî ew hîva pirr nûranî û xweşik bû, ku sunbulên kakul û tûncikên wekî reyhanan serê xwe danîbûn ser wî, li ser wî veketîbûn. ku ewan zulfan, min sewda û ebter kirin, dil û canê min ji min yaxma û talan birin.

******

Ji min dil bir evê carê, ku min dî qameta yarê
Wekî selwa li cobarê, vemeşya hate eywanê

ME'NA BÊJEYAN:
Evê carê: Vê cara han. (bu sefer)
Qamet: Bejn û bal. (boy bos)
Selwî: Dara serwî yê. (selvi ağacı)
Li cobarê: Li çem, li berdevê çem. (dere kenarında)
Vemeşya: Meşîya, we meşîya. (yürüdü)
Eywan: Hewş, poxan û salon, salona mezin, koşk û saray. (büyük salon, köşk ve saray)

ME'NA HEMÎ:
Vê carê, ewê yarê dilê min ji min bir, ku -bi wî bejna xwe ya wekî dara selwî û çinarê- bi aliyê min da meşiya, hate xwarê hate eywanê.

******

Vemeşya ya ew sifet horî, ji rengê sorgula jorî
Ruhê şirîn dikim gorî, ji bo xalê û nîşanê

ME'NA BÊJEYAN:
Cûrrî: Sorgula ji cûrên espehî. (cins gül)
Sorgula jorî: Gula sora jorîn, ya ku li cîhê jor e. (gula war û zozana), we yan gula ku qedr û rûmetê wê li jor e (bilind qîymet û giranbiha ye). (yüksekte olan kırmızı gül)
Ya: Ewa ku. (oki)
Dikim gorî: Bi qurbana wê dikim, fedayê wê dikim. (kurban ediyor, feda ediyorum)

ME'NA HEMÎ:
Ew yara ku bi reng û rewşa horîyên bihiştê bû, weka sorgula

zozanan bû, meşîya û hat ku ez canê xwe yê şirîn ji boy xal û nîşanên dêmên rûyê wê ra feda dikim, xwe bi gorîya wan dikim.

******

Nîşanên sûretê re'na, didin ku li miskê sed te'na
Ji Xanî lêne pirr me'na, wekî Ayatê Qur'anê (*)

ME'NA BÊJEYAN:
Sûret: Rû, çehre. (yüz)
Re'na: Letîf, nazik, xweşik. (güzel, şirin)
Te'n: Serzeniş, sitem. (yermek, iğnelemek)
Ji Xanî lêne pirr me'na: Xanî pirr me'na li wan nîşanan dixe, ewan pirr xweşik rave û şirove dike. (Xanî onlara çok güzel mana verir, onlara çeşitli tefsir ve yorumlar getirir)

ME'NA HEMÎ:
Ew neqş û nîşanên sûretê mehbûbê yên xweşik ku pirr te'n û serzenişan li miskê dixin, (dibêjin ku misk wekî me bîhnxweş, wekî me bi rûmet û keleş nîne û nabe,) ji Xanî da li wan neqş û xet û xalên, wekî Ayetên Qur'an'ê, pirr tefsîr û şirove û rave hene. (Xanî wan xet û xalan wekî Ayatên Qur'an'ê, pirr xweş, me'na û rave û şirove dike)

(*) Ev helbesta dawî, ne ji ristên Xanî ye, belkî min ewî hûnaye û qesîdeya Xanîya pîroz pê temam kirîye, hîvîdar im ku pîrê pîran, mamostayê mamostayan me bibexşîne! Evî polê me yê bê nerx û biha, bi wan gewherên xwe yên giranbiha ra bi nerxîne.

- Durre -

- SUBHEKÎ ZÛ -

Ez çûme derê meykedeyê subhekî zû,
min dî yekî esmer
Qamet bi mesel şubhê çinarê bû du keysû,
manendê du Ejder

Çînçîn dixuşîn zulfê li ser gulşenê ruxsar,
reh şubhetê şehmar
Kher - kher dimeşîn biskê li ser qewsê du ebrû,
manendê du şehperr

Mayîm mûtereqqib, meger ew mezherê î'caz,
carek bi dused naz
Halê me tefehhus khet û bêjit ku esîro!
Ez bo te me xemxwer

Min got te di wextê seherê ev çîye da min,
ey serwîqeda min!
Go ma tu nizanî çiye min da te feqîro!
E'teytûke kewser

Hetta veke lewhê sedef û xameyê yaqût,
nêzîkê bi lahût
Min seyrê kirin Sidre û Tûba qedê dil co,
nînin çu beraber

Hindî melek û horî, perî bêne temaşa,
haşa we ku haşa!
Kengê dibin ew laîqê nezzareyê ebrû
ey dil me ke bawer!

Barî ji derê meykedeyê min me ke bê par
ey seyyîdê mûxtar!
Saqî ku Tû yî "eşhedû bîllahî"di îro
"Xanî" bûye meyxwer

.....

Ez çûme derê meykedeyê subhekî zû,
min dî yekî esmer
Qamet bi mesel şubhê çinarê bû du keysû,
manendê du Ejder

ME'NA BÊJEYAN:
Meykede: Meyxane
Bi mesel: Bi mînak, mesela. (misal olarak)
Şubhê: Wekî, mînanî. (benzer)
Keysû: Khezî, gulî. (saç örgüsü)
Ejder: Ejderha, ejdîha, marekî çîrokî ye, ku dibêjin alav ji devê wî davêje. (ağzından lav çıkan efsanevi bir yılan)

ME'NA HEMÎ:
Ez di berbanga sibê zû da çûm derê meyxaneyê, min liwê yeka esmer dît ku bejn û bala wê wekî dara çinarê bû, herdû kheziyên wê jî, wek du marên ejder bûn. (ku bi can û dilên merif wek maran vedidan)

******

Çînçîn dixuşîn zulfê li ser gulşenê ruxsar,
reh şubhetê şehmar
Kher - kher dimeşîn biskê li ser qewsê du ebrû,
manendê du şehperr

ME'NA BÊJEYAN:
Çînçîn: Kurîşk-kurîşk (halka halka, büklüm büklüm)
Dixuşîn: Dixûşîkîn, dişûlikîn (kayıyorlardı)
Gulşen: Baxçeyê gulan, gulistan (gül bahçesi)
Reh: Rek, ta, tayîk (saçak) yanê: Tayikê biskan.
şubhetê: Mislê, mînanî (benzer, gibi)
şehmar: Şahê maran, şahmaran (efsanevi yılan şahı)
Kher kher: Perçe perçe, qet qet (parça parça)
Bisk : (zülf)
Qews: Kewan (yay)
Manend: Wekî, mînanî (benzer, gibi)
şehperr: Perrika herî dirêja di baskên perrendeyan da,şahê perrikan (kuş kanadının en uzun tüyü)

ME'NA HEMÎ:
Bisk û zülfên wê, lı ser rûyên wê yê ku wekî baxçeyê gulan e, kurîşk-kurîşk di şûlikîn, ku her takî wan biskan jî wekî şehmaran bûn; biskên wê perçe-perçe bibûn, diçûn û dihatin, ku di ser wan ra kevanên biroyên wê jî, wekî du şehperran bûn.

*****

Mayîm mûtereqqib, meger ew mezherê î'caz,
carek bi dused naz
Halê me tefehhus khet û bêjit ku esîro!
Ez bo te me xemxwer

ME'NA BÊJEYAN:
Mûtereqqib: Çavnêr, li hêvîyê, li benda wê. (muntazır bekleyen)
Meger: Belkî, dibe ku. (olabilirki)
Î'caz: Mande kirin, mat kirin, mu'cîze peydakirin. (başkalarını acze düşürecek ve mat edecek, harikalar ve mucizeler yaratacak)
Mezher : Xûyange, tecellîgah. (bir şeyin göründüğü izhar olunduğu yer)
Mezherê î'caz: Xûyangeha ku mirovan mande dike û mat dihêle, yara mu'cîzekar. (başkala rını mat edecek şekilde mucizelerin ve harikaların kendisinde tecelli ve zuhur ettiği yer)
Tefehhus: Lê gerîn, lê pirs kirin. (sormak, araştırmak)
Esîro: dîlo. (ey esir ve tutsak olan)
Xemxwer: Xemxwar. (gam eden, üzülen)

ME'NA HEMÎ:
Ez li bendê wê mezhera mu'cîzeyan mam, ku ew carekî -bi nazdarî- pirsa halê me bike û bibêje "Ey dîl û hêsîrê min ez di xema te da me (ez xema te dikim), gelo halê te çîye, tu çewanî?

*****

Min got te di wextê seherê ev çîye da min,
ey serwîqeda min!
Go ma tu nizanî çiye min da te feqîro!
E'teytûke kewser

ME'NA BÊJEYAN:
Serwîqed: Ewa ku bejna wê wekî dara serwî yê ye. (selvi boylu)
Ma: Qeyê? Qey? (acaba, meğer)
Feqîro: Belengazo. (ey fakir)
E'teytûke: Min daye te. (Ben sana verdim)
Kewser: (kevser suyu)

ME'NA HEMÎ:
Min got: "Ey bejin serwiya min! Ev çiye te di vê şefeqêda da daye min?" Got: "Belengazo ma qey tu nizanî ew çiye min daye te? Ew ava kewserê ye"

******

Hetta veke lewhê sedef û xameyê yaqût,
nêzîkê bi lahût
Min seyrê kirin Sidre û Tûba qedê dil co,
nînin çu beraber

ME'NA BÊJEYAN:
Lewhê sedef: Textê jı sedef, tabloya sedef (ku bi mecazî meqsed jê sing û berê yarê ye, we yan jî dêm û dev û diranên wê ye). (sedef levhası)
Xameyê yaqût: Yaqûtê xam, yaqûtê xav ku meqsed jê lêvên dildarê ye. (tabii yakut, yarın dudakları)
Lahût: Alema pîroza Îlahî. (ilahi ve kudsi alem)
Sidre û Tûba: Navê du darên xweşik û pîrozin, dara **Sidretûl-Mûntehayê** ya ku dibêjin li nik 'Erşê Xweda ye û dara tûbaya bihiştê. (sidre ve tuba aşacları)
Qedê dil co: Bejna dilxwaz, dilkeş, bejna ku dil ewî arzû dikin û ew jî dilan bi aliyê xwe va dikêşe. (gönül çeken letif ve çekici kamet)
Nînin: (yokturlar)
Çu beraber: Tu mînak, tu tişt wekî wan tunene (onların hiç benzeri yok)

ME'NA HEMÎ:
Min li bejn û bala wê ya -wek dara Sîdre û dara Tûbayê ya bê hemta- mêzekir, seyr û temaşa kirin da ku ew, wî lewheya sedef

û yaqûtê xam (çehre û dêm û dev ê lêvên xwe) yên ku nêzîkê 'alema Lahûtî ne (wek 'alema îlahî ya rûhanî letîf û pîrozin) veke û ez wan bibînim. (Wek ku Xwedê di şeva Mi'racê da, rûyê Xwe ji Mûhemmed Pêxember ra li nik Meqamê Sidretî-l Mûntahayê vekir û nîşanê wî da), lê belê, ne ku ez, belkî çiqas Melek û Hûrî û Perî hebin, ew laîq û sezawarê wî Meqamê pîroz (Meqamê dîtina cemala rûyê wê) nîn in. Ey dil ! Tu bawer neke ! ...

******

Hindî melek û horî, perî bêne temaşa,
haşa we ku haşa!
Kengê dibin ew laîqê nezzareyê ebrû
ey dil me ke bawer!
Barî ji derê meykedeyê min me ke bê par
ey seyyîdê mûxtar!
Saqî ku Tû yî "eşhedû bîllahî"di îro
"Xanî" bûye meyxwer

ME'NA BÊJEYAN :
Hindî: Çiqas, ewqas, pirr, gelek. (ne kadar çok)
Haşa we ku haşa: Na û na, nebûye û nabe. (olmaz da olmaz, asla ve asla)
Kengê: Çi zeman, çi wext. (ne vakit)
Nezzare: Temaşevan, ewê ku ji ciyekî bilind da, li tiştekî mêze dike. (temaşa eden)
Barî: Carekî; qe nebe. (bir kere,hiç olmazsa)
Ey seyyîdê mûxtar: Ey serok û serwerê hilbijar û aza. (ey seçkin ve zişan olan başkan)
Saqî: meyger (mey ve içki sunan)
Ku Tu yî: Madem ku Tu yî, ji boy ku Tu yî (madem sensin)
Eşhedubillah: Ez bi Xwedê bawerim ku. (Allah'a inanıyorum ki)
Di îro: (bugünde)
Meyxwer: Mey vexwar. (mey içen)

ME'NA HEMÎ:
Ey dil ! Tu bawer neke ! Ku Melek û Hûrî û Perî jî, bibin laîqê dîtina cemala rûyê wê û temaşa kirina burûyên wê ! -haşa sûmme haşa- Tu kes jî nikare bigihîje wî maqam û wî merteba ya bilind

û pîroz (hetta ku em jî bikaribin bighîjînê) divê em qenc fêhm bikin û bizanibin ku em ne laîqê wî meqamî ne !. Ey Seyyîdê Mûxtar, ey Serok û Serwerê me yê bijare, ey ew yara ku em laîqê dîtina cemala rûyê te nînin) qe ne be ! Tu min ji derê meyxwaneyê mehrûm û dûr neke ! Eşhedû billah (bê şek û gûmane) ku sebebê meyvexwarin a Xanî jî, ewe ku tu îro bûyî saqî, meygerr, eger tu saqî û meygerr nebûya yî, Xanî mey venedixwar û ne dibû meyxwer.

- HINAREK -

Ji le'lên diyarê E min mey vexwara
Bi dil dê bi bexşî bedexşan, Buxara

Mudamî di destê xeman da zebûnem
Mudamî dixum mey, bikim da mudara

Dema kir me xedra ewê gul'îzarê
Dibin bê tekelluf dilê min xida ra

Hinarî ji bo min der axoşê pirr durr
Hinarek di taze, hebîna dil ara

Ne yara te îro nezer da te "Xanî" !
Ne yaran te mane, ne rahet, ne yara
.....

Ji le'lên diyarê E min mey vexwara
Bi dil dê bi bexşî bedexşan, Buxara

ME'NA BÊJEYAN:
Ji le'lên diyarê: Ji lêvên yarê yê wekî le'l û yaqûtê. (le'l: kırmızı ve qıymetli bir süs taşı ve dudak)
Di: Di zimanê kurdî da nîşana pirratiyê û cem'ê ye. (Kürtçe dilinde çoğul edatıdır)
Bi dil: Ji dil, bi arzûya dilê xwe. (gönül arzusuyla)
Bi bexşî: Bi bexşandê, bidayê. (bağışlardım, verirdim)
Bedexşan: Herêmekî li Efxanistanê ye ku meşhûrê bi yaqûtê ye. (Afganistanda yakut ile şöhret bulan bir şehirdir.)
Buxara: (Özebkistanda bir şehirdir)

ME'NA HEMÎ:
Eger ku min ji lêvên yarê mey vexwara, dê minê ji dil û canê xwe bajarê Bedexşan û Buxarayê pêşkêşê wê bikira! (Yanê: Yaqûtên lêvên yarê, ji yaqûtên meşhûrên Bedexşanê bi rûmettir û giranbihatirin ku mirof Bedexşan û Buxarayê, pêşkêşî wan dike û di mizgînîya wan da dide)

******

Mudamî di destê xeman da zebûnem
Mudamî dixum mey, bikim da mudara

ME'NA BÊJEYAN:
Mudamî: Peyapey, hertim. (daima, her zaman)
Di destê xeman da: (gam ve kederlerin elinden)
Zebûnem: Jar û zeîf û bê hêzim. (zeîf ve güçsüzüm)
Mudamî dixum mey: Bi dewamî mey vedixum. (her zaman mey içerim)
Bikim da mudara: Da ku ez bi wî meyê îdare bikim. (idare edeyim diye)

ME'NA HEMÎ:
Ez her tim di destê xem û derdan da jar û zebûnim, her tim mey vedixum ku rewşê îdare bikim. Di nusxekî din da jî wiha hatîye: (Mudamî dixum, pê bikim da mudara) yanê: Ez her dem mudamî, meyekî, cûrekî meyê vedixum da ku ez bi wî, wezîyetê îdare bikim.)

******

Dema kir me xedra ewê gul'îzarê
Dibin bê tekelluf dilê min xida ra

ME'NA BÊJEYAN:
Xedir: Bê bextî, xaînî, peyman şikandin. (hıyanet, nankörlük, vefasızlık)
Gul'îzar: Dêm gul. (gül yanaklı, al yanaklı)
Bê tekelluf: Bê zorkêşayî, bi hêsayî. (tekellüfsız ve zahmetsiz)
Xida: Xurek, taştê. (gıda)
Ra: Ji bo. (için)

ME'NA HEMÎ:
Dema ku me bi wê gulizarê ra bê 'ehdî û bê bextî kir, bê gotin û tekelluf dilê min ji boy xurek û taştê ra dibin. (Dilê min ji boy xurekê xwe ra dibin û dixwin.)

******

Hinarî ji bo min der axoşê pirr durr
Hinarek di taze hebîna dil ara

ME'NA BÊJEYAN:
Hinarî: Şand. (yolladı)
Der axoşê pirr durr: Di paxila xwe ya tijî durr da. (dürr ve incı dolu kucağında)
Hinarek di taze: Hinarekî taze û nû. (Bir taze nar)
Hebîna dil ara: Mehbûba dil keş. (gönül çekici, tapılan yar)

ME'NA HEMÎ:
Yara dil keş, ji bo min ji paxila xwe ya ku tijî durr in, hinarekî taze şand. (memikên xwe yên wekî hinaran pêşkêşî me kir)

******

Ne yara te îro nezer da te "Xanî" !
Ne yaran te mane, ne rahet, ne yara

ME'NA BÊJEYAN:
Nezer da te: Li te nezer kir, li te mêze kir. (sana baktı)
Ne yaran te mane: Ne yarên te mane. (ne dostların kaldı)
Yara: Hêz û quwwet.(güç ve kuvvet)
Ne yara: Ne jî hêz û quwwet. (nede güç ve kuvvet)

ME'NA HEMÎ:
Ey Xanî! Ne îro yara te li te mêze kir, ne jî yar û dostên te mane, ne jî hêz û quwwet di te da maye. Xanî di vê qesîda xwe da, cûrên hunerê cinasê (wek cinasa tam û cinasa naqis) pirr bi kar anîye, wek **yara û yara,** ku ji cûrê cinasa tamm in, **vexwara** û **Buxara û hinar û hinarekî** û yên din jî, ku ji cûrên cinasa naqis in, ji xwe hemî şî'rên Xanî jî, bi cûrên hunerê edebî neqşandî û xemilandî ne, ku mirov bi hêsayî dikare derheq wan da wiha bibêje:

Şî'rên te Mela! neqş û nemûşên edebî ne
Fikrên te kela coşê evîna netewî ne

Zêr û zeber û pêş û ber û rêzê cemalê
Zêrrê zer û durr, gewher û nerxên hunerî ne

Temsîl û qîyas û hiss û tewrîyye û hids in
Tezmîn û cinas û Nessê xass û nitirî ne

Îma û îşarat û kînayat û rumûz in
Î'caz û kiramat û meqamat û wehî ne

- Durre -

-EY DIRÎXA!-

Ey dirîxa! Ma me tenha ez ji şemsa xawerê
Xan û man têk bûne zulmet, paşî wê dêm enwerê
Paşî lêvên wê venaxum mutleq ava Kewserê
Min nevê dunya bi carek, piştî wê sîmîn berê

Ger bizanim ez di heşrê da nebînim dîlberê
Cennetê dê pê çi kem? Pê wer bi kem xakisterê!

Sed texabun! Çu ji bal min ew hebîna çav belek
Ah û efxanê ji min daîm di çûn çerxa felek
Hem ji ber feryadê min aciz dibûn îns û melek
Mam di qeyda dax û derdan paşî wî zulfên xelek

Ger bizanim ez di heşrê da nebînim dîlberê
Cennetê dê pê çi kem? Pê wer bi kem xakisterê!

Hîcreta yarê bihatim şubhê findê şu'ledar
Ketme sêla îştîyaqê, ji-htiraqê bûme nar
Ez wucûdek bê wucûd im, suhtim têkve bûm xubar
Min nevê dunya bi carek piştî wê çavî xummar

Ger di hîna ez wefat kim, bête ser min Ezraîl
Mujdeya xuldê bidet min hem di wê geh Cibraîl
Xidr û Îlyas hem bibîtin her ji boy min ra delîl
Dê bibêjim min nevêtin xuld û kewser, Selsebîl

Ger bizanim ez di heşrê da nebînim dîlberê
Cennetê dê pê çi kem? Pê wer bi kem xakisterê!

Çerxê kec reftarî waweyla! Ku ez talan kirim
Ser bi gerdan bûm û lêkin zêde sergerdan kirim
Bê dil û şuxl û hewes, carek ku bê îz'an kirin
Zêde wê bê murwetê ev reng ku ez talan kirim

Ger bizanim ez di heşrê da nebînim dîlberê
Cennetê dê pê çi kem? Pê wer bi kem xakisterê!

Zînîhar! Ey dosîtan wextê dikim ez hîcretê
Wan du mîsraan kîtabet kin li belgê kaxetê
Da di dest min da senet bit ew di hîyna hezretê
Wesfê halê min bibêjin ew di wextê wesletê

Ger bizanim ez di heşrê da nebînim dîlberê
Cennetê dê pê çi kem? Pê wer bi kem xakisterê!

Xanîya ta key bibêjî: ev sual û ev cewab!
Ew ji wî sadir bûye ey bê edeb, ey bê hîcab!
Ew qedaya barîye, razî bibe ey mal xirab!
Belkî bîtin mûcibê narê ji bo te ew xitab

Ger bizanim ez di heşrê da nebînim dîlberê
Cennetê dê pê çi kem? Pê wer bi kem xakisterê!

.....

Ey dirîxa! Ma me tenha ez ji şemsa xawerê
Xan û man têk bûne zulmet, paşî wê dêm enwerê
Paşî lêvên wê venaxum mutleq ava Kewserê
Min nevê dunya bi carek, piştî wê sîmîn berê

ME'NA BÊJEYAN:
Ey dirîxa: Wa hesreta, wey mixabin! (eyvah, yazık!)
Tenha: Bi tenê û cuda. (yalnız)
şems. Roj. (güneş)
Xawer: Rojhilat, rojava. (doğu batı)
Xan û man: (ev ve muştemilatı)
Têk: Tev. (hepsi)
Zulmet: Tarîtî. (karanlık)
Paşî wê: Piştî wê (ondan sonra)
Dêm: Rû. (yüz, çehre)
Enwer: Pirr bi nûr, pirr rohnî. (çok nurlu, pek parlak)
Mutleq: Mutleqa, bi tu awayî. (asla)
Kewser: Navê av û kanîyekî Bihîştê ye. (cennet suyu)
Min nevê: Ez navêm, ez naxwazim. (ben istemem)
Bi carek: Qet'a, bi tu awayî. (asla, hiçbir zaman)
Sîmîn ber: Singzîvîn. (gümüş göğüslü, beyaz tenli)

ME'NA HEMÎ:
Way dirîx û hesret! Ez ji wê yara wekî roja xawerê cuda bû me, piştî wê dêm şemalê, xan û manê min tev tarî bûne û ma ne, ez di dû lêvên wê yên şirîn ra, ava kewserê jî naxwazim, di pey wê sîngzîvînê ra, ez dunyayê jî navêm û naxwazim.

******

Ger bizanim ez di heşrê da nebînim dîlberê
Cennetê dê pê çi kem? Pê wer bi kem xakisterê!

ME'NA BÊJEYAN:
Heşr: Lihevcivandin, lihevcivandina mexlûqatan di roja qîyametê da. (toplanmak, kıyametten sonra bütün insanların bir yerde toplanması)

Dê pê çi kem: Dê ez pê çi bikem (onu ne yapayım, bana lazım değil)
Pê wer bi kem: Pê bi reşînim. (serpeyim)
Xakister: Xwelî, arî. (kül, toprak)

ME'NA HEMÎ:
Eger ez bizanibim ku ez di heşrê da dîlberê nabînim, dê ezê bi cennetê çi bikim ji min ra ne lazim e, ezê arîyê bi ser da kim, bi ser da xwelîyê bireşînim! (ew xwelîser ji min ra ne lazime)

******

Sed texabun! Çû ji bal min ew hebîna çav belek
Ah û efxanê ji min daîm di çûn çerxa felek
Hem ji ber feryadê min aciz dibûn îns û melek
Mam di qeyda dax û derdan paşî wî zulfên xelek

ME'NA BÊJEYAN:
Sed texabun: Sed mixabin. (çok yazık)
Hebîn: Pereste, dosta ku tê perestin. (tapılacak yar)
Efxan: Fîxan (feryad)
Zulfê xelek: Zulfên xelek-xelek. (halkalı zülfler)
Zulfî xelek: Ewa ku zulfên wê bi xelek in, bi kurîşk in. (zülfleri halkalı olan yar)

ME'NA HEMÎ:
Sed mixabin! Ew yara çav belek ji bal min çû-ku ji wî sedemê da jî, ah û fîxanên min bi dewamî çûn çerxa felekê (çûn asîmanan), hem, ji ber feryad û fîxanên di min, însan û melaîket ji aciz dibûn, piştî wan zulfên xelek, piştî wê zulf bi xelekê, ez di qeyd û bendên dax û derdên wê da, muqeyyed û girêdayî mam.

******

Hîcreta yarê bihatim şubhê findê şu'ledar
Ketme sêla îştîyaqê, ji-htiraqê bûme nar
Ez wucûdek bê wucûd im, suhtim têkve bûm xubar
Min nevê dunya bi carek piştî wê çavî xummar

ME'NA BÊJEYAN:
Hîcret: Terkdayîn, terk kirin. (terketmek, bırakmak)
Bihatim: Hellandim, şewitandim. (beni yaktı, eritti)
Find: (Mûm)
Şu'ledar: Bi pêt û şemal. (ışıklayan, parlayan)
Sêl: Sêla qelîyê. (kavurma sacı)

Îştîyaq: Pirr arzû kirin, pirr xwestin. (çok arzulamak ve özlemek)
Ji îhtiraqê: Ji şewitandinê. (yanıp tutuşmaktan)
Wucûd: Cusse û beden, hebûn. (beden ve varlık)
Bê wucûdim: (yokum)
Suhtim: şewitîm. (yandım)
Têkve: Tev, bi temamî. (hepsi)
Xubar: Toz (kül)
Min nevê: Ez navêm, naxwazim. (istemem)
Çavê xummar: Çavê mest û serxweş. (mest ve serhoş olan göz)
Çavî xummar: Ewa ku çavên wê serxweş û mest in. (mest ve serhoş gözlü)

ME'NA HEMÎ:
Hîcreta yarê ez hellandim, ku wekî mûmê bi agir û pêt û şu'le me, ez ketime sêla îştîyaqê, (halê şewq û vayînê) ji pêt û şewata wî bûme agir, ez hebûnekî tuneyî me, şewitîme, toz û xwelî me, piştî wan çavên mest, piştî wê çav mestê, ez dunyayê bi carek navêm û naxwazim. (daxwaz û mirazê min her ewe hew!)

******

Ger di hîna ez wefat kim, bête ser min Ezraîl
Mujdeya xuldê bidet min hem di wê geh Cibraîl
Xidr û Îlyas hem bibîtin her ji boy min ra delîl
Dê bibêjim min nevêtin xuld û kewser, Selsebîl

ME'NA BÊJEYAN:
Hîna ez wefat kim: Dema ku ez bimirim. (öleğin zaman)
Ezraîl: Firişteyê ku ruhan distîne. (ruh alan melek)
Xuld: Herdem jîyan. (ebedi yaşam)
Hem di wê geh: Hem di wê demê da. (hem o anda)
Cibraîl: Firişteyê wehyê. (vahi meleği)
Xidr û Îlyas: Navê du pêxembera ne, dibêjin ku **Îlyas** di reşayêda, **Xidir** jî di deryayê da, di hewarîya mirofan tên (iki peygamber olup, güya **Hızır** deniz de, **İlyas** da kara da, insanın yardımına koşarlar)
Dê: Bê guman. (muhakkak)
Selsebîl: Av û çem û kanîyekî Bihiştêye. (cennette bir çeşme ve suyu)

ME'NA HEMÎ:
Eger di dema wefata min da, dema ku Ezraîl were ser min, Cibraîl mizgînîya jîyana ebedîya Bihiştê bide min, Xidr û Îlyas jî, bibin rêberê çûyîna mina Bihiştê, ezê di wê demê da bibêjim ku "ez ne jîyana cennetêya ebedî divêm, ne jî ava Selsebîla Bihiştê! (belkî ez wesleta yarê bi tenê divêm û hew!)

******

Çerxê kec reftarî waweyla! Ku ez talan kirim
Ser bi gerdan bûm û lêkin zêde sergerdan kirim
Bê dil û şuxl û hewes, carek ku bê îz'an kirin
Zêde wê bê murwetê ev reng ku ez talan kirim

ME'NA BÊJEYAN:
Çerx: Çerx û dolaba felekê. (çarhi felek)
Kec reftar: Xwar rewwişt, xwarmeş. (eğri yürüyen, ters dönen)
Waweyla: Wey li min! (eywah)
Ser bi gerdan bûm: Ser gerrîyayî bûm, serî li min hat gerrandin. (başı dönen şaskın oldum)
Şuxl : Kir û kar. (iş)
Hewes: Arzû, xwestek. (arzu, istek)
Bê murwet: Bê murûwwet, bê şexsîyet, ne merd (mürüvetsiz, namerd, kişiliksiz)
Ev reng: Bi vî rengî bi vî terzî. (böylece)

ME'NA HEMÎ:
Eywah! Wey li minê! Çerx û dolaba felekê ez talan kirim, ez jê sergerdan bûm û pirr jî bûm, ewê, ez bê dil û can û bê hewes, bê îdrak û îz'an kirim, ku ewê bê murwetê (çerxa felekê)bi vî awayî ez talan û perîşan kirim, (sitûxwar û belengaz kirim, destê min da ber rûyê min û ez dame ber dîwaran.)

******

Zînîhar! Ey dosîtan wextê dikim ez hîcretê
Wan du mîsraan kîtabet kin li belgê kaxetê
Da di dest min da senet bit ew di hîyna hezretê
Wesfê halê min bibêjin ew di wextê wesletê

ME'NA BÊJEYAN:
Zînîhar: Zînhar, diqqet bikin! Hay jê hebin! (sakın, dikkatli olun)
Ey dosîtan : (ey dostlar)
Hîcret: Koçberî. (göçetmek)
Misraan: Parçeyên helbestan. (mısralar)
Kîtabet kin: Bi nivîsin. (yazınız)
Hîna hezretê: Dema huzûrê, dema ku ez biçim huzûra Xwedê. (Hakkın huzuruna vardığım an)
Wesfê halê min: (durumumun vasfı)
Weslet: Gihîştin. (kavuşmak)

ME'NA HEMÎ:
Ey gelî dostên min! Ji kerema xwe dîqqet bikin, ji bîra nekin! Ku dema ez hîcret bikim, (bimirim) hûn van du misraan li rûpelekî kaxiz binivîsînin û bidin destê min, ku ew di destê min da bibin wek belge û wesîqe di huzûra Îlahîya pîroz da, ez ewan bigerrînim sened û belge ji 'erz kirina halê xwe ra, bi wan halê xwe erz bikim.

******

Xanîya ta key bibêjî ev sual û ev cewab!
Ew ji wî sadir bûye ey bê edeb, ey bê hîcab!
Ew qedaya barîye, razî bibe ey mal xirab!
Belkî bîtin mûcibê narê ji bo te ew xitab

ME'NA BÊJEYAN:
Xanîya: Ya Xanî. (ey Hani)
Ta key: Hetta kengê. (ne zamana kadar)
Sadir bûye: Derketîye. (çıkmış)
Bê hîcab: Bê perde, bê şerm. (perdesiz, hayasız)
Qeda: Qeza, qeder, sernivîs. (kader, ilahi hüküm)
Barî: Çêkrox, Xaliq (yaratıcı, yaratan)
Mal xirab: (ey evi yıkılası)
Bîtin: Bibe, bive. (olursa)
Mûcibê narê: Sebebê agirê, sebebê ketina agirê dozexê. (cehennem ateşini gerektiren neden)

ME'NA HEMÎ:

Ey Xanî! Dê tu hetta kengê van galegalan bikî û bi bibêjî! Hey bê edebo! Ew çi pirs û sual û cewab in tu dikî û dibê jî! Ew ji Wî sadir bûye, ew qeza û qedera Wî ye, tu pê razî bibe, dengê xwe dernexe, hey mal xirabê, mal xirab! Tu pirr pêda herrî dibe ku ew bibe sebebê ketina te ya agirê Dozexê, pirr pêda neçe, bi Qeza û Qedera Xwedê ya ezelî, razîbe û xwe kerr ke... wesselam!

- EY DIL -

Ey dil! eger bi neqdê can, cinsê giran bihayê zulf
Bigrî, bizan dê ku mecan! Cewherê can fedayê zulf

Xunçeyê tengî hewsele, dil ji rikan bi girt debî
Subhîgehan ku seh di ket lexlexe yê hewayê zulf

Meşqê diket wek kutuban Rûyê Nigar û Husnê xet
Bende hezar û tiflê dil, hatine ber Melayê zulf

'Aşiqê bê ceger meger sebrê ji can û dil di ket
Manîyê gencê meqsede. Heybetê ejdehayê zulf

Herserê mû bi sazekî, cîlwe diket bi nazekî
Aşiqê îşqîbazekî, bendî diket belayê zulf

Rom û fireng û hîndîyan, xal û nîşan û xemrîyan
Xencer û şîr û misrîyan, ceng e li ber lîwayê zulf

Tac û tomar û bin perran, le'l û guhar û gewheran
Serxoş û dîn û ebteran, reqse digel semayê zulf

Law û rewal û rîspîyan, mîr û wezîr û cundîyan
Serxoş û mest û bengîyan, derde ji macerayê zulf

Şêx û mirîd û salikan, şah û feqîr û malikan
Cust û çeleng û çapikan, dilket û bende payê zulf

Ef'a û mar û ejder e, misk û zebad û 'enber e
Nefxe yê rûhî perwer e, raîheyê hewayê zulf

Bê meyy û bê dewayekî, bê deff û çenk û nayekî
Dîn diketin Melaye kî, cezbe yê dil rubayê zulf

Mîr û mela û mahîran, çendî belîx û şaîran
"Xanî " û hindî haziran, dade! ji ber belayê zulf
(derde, ji destê tayê zulf)

.....

Ey dil! eger bi neqdê can, cinsê giran bihayê zulf
Bigrî, bizan dê ku mecan! Cewherê can fedayê zulf

ME'NA BÊJEYAN:

Neqd: Nerx, perê pêşin. (değer, akça, birşeyin bedelini peşinen ödemek)

Neqdê can: Nerx û sermayeyê can. (can sermayesi)

Cinsê giran biha: Cûreyê bihayê wî giran, pirr bi qiymet. (kıymet ve pahası çok olan cins, tür)

Zulf: Bisk, lûleyên porê ku bi ser rûyê jinan da tên. (yüzün iki yanından sarkan saç lülesi)

Dê: Bê guman, muheqqeq, bê şubhe. (kuşkusuz, şüphesiz)

Mecan: Badîhewa, bê pere. (bedava, avanta)

Cewher: gewher. (kıymetli taş, birşeyin özü)

Can feda: can bi qurban. (ona can feda)

Can fiza: Ewê ku can zêde dike, can dide merif, muferreh dike. (gönüle ferahlık veren, can arttıran)

ME'NA HEMÎ:

Ey dil! eger tu bi nerx û sermayeyê canê xwe, wan zulfên ku ji cûr û cinsên tiştên giranbiha ne, bigirî (bi destê xwe bixî, bi canê xwe bikirrî) tu qenc bizane ku ew gewherê canfizayê zul-fan, mecan in, bê pere ne. (te ewan badîhewa bi destên xwe xistine, can li ber wan ne tiştek e.)

******

Xunçeyê tengî hewsele, dil ji rikan bi girt debî
Subhîgehan ku seh di ket lexlexe yê hewayê zulf

ME'NA BÊJEYAN:

Xunçe: Gula ku hêj ne pişkivî ye, di kisikê xwe daye, nû dipîşkîve kîsikê gulê. (gonca, tomurcuk, henüz açmamış çiçeğin durumu)

Teng: Teng. (dar)

Hevsele: Nav, hundir. (kursak)

Xunçeyê tengê hewesele: Xunça ku hewsela wî teng e. (kursağı dar olan gunça)

Rik: Hesûdî, bi'ecandin, xwîkirin, çavnebarî. (buğz, nefret, kıskanmak)

Bi girt: Girtî, girte. (alınma, alıngan olmak)
Debî: Dibe (oluyor)
Subhîgehan: Dema sibehê (sabah vakti, sabahleyin)
Ku seh diket: Ku di bihîze, hiss dike (duyunca)
Lexlexe: Me´cûnekî bînxweş e, ku ji tevlihevkirina têştên bînxweş çê dikin, (güzel kokuların karışmasından meydana gelen bir nevi macun ve onun hoş kokusu)
Lexlexe: dengê -fîze fîz û guje- guja bayê, (rüzgar uğultusu)

ME'NA HEMÎ:
Yanê; di dema sibehê da, ku xunca tenghewsele, (gula nû pişkivî) dengê guje-guja bayê zulfê yarê seh dike, bîna wî ya ji bîna mîsk û 'enberê xweştir tê pozê wî, dilê wî xunçê, ji rikan (ji hesûdî û çavnebarîtîyê) tê girtin, aciz dibe, hêrs dibe, ji şerman, xwe vedişêre.
Yanê bi kurtî: Gula nû xunçe, ji şerm û hesûdî ya vî qasî ku çima wekî biskên yarê binxweş nabe, ji qalikê xwe, (ji kîsikê xwe,)dernayê û napişkive. (yanê gul ji ber şerm û fedîkirina ji zulfê yarê, ji xunça xwe dernayê)

******

Meşqê diket wek kutuban Rûyê Nigar û Husnê xet
Bende hezar û tiflê dil, hatine ber Melayê zulf

ME'NA BÊJEYAN:
Meşq: Antremana nivîsandinê (yazı yazma egzersizi)
Meşq: Numûna nivîsê, ku şagirt li ber wî -tekrar tekrar- di nivîsin ku rind hînê nivîsandinê bibin, nemûşê nivîsanê (yazı örneği, uzun uzun yazmak, hat antremanı)
Kutub: (c.kîtab) Kêtêban, pirtûkan, rûpelan (kitaplar)
Nigar: Yara rûxweşik, neqiş (güzelyüzlü sevgili, nakış)
Husnê xet: Rindaya xet, xetê rind (güzel hatt, hatt güzelliği)
Xet: Çixêz, nivîs (çizgi, yazı)
Bende: Girêdayî, dîl, kole (bağlanmış olan, köle, esir)
Tifil: Zarok (çocuk)
Mela: Mele, seyda, mamûsta (hoca, öğretmen)

ME'NA HEMÎ:
Yanê: Bi hezaran dîl û hêsir, bi hezaran dilên aşiqan ku wekî zarokên şagirt û suxtene, hatine cem Melayê zulfê (zulfên ku wekî, mela û mamûstayan dersa îşq û evînê didin) rûyê mehbûbê, neqş û xetên wî rûyê bedew -wek defter û kitêban- meşq dikin, li ber wî nûmûne û nemûşê xetên espehî, xwe hînê xetê rind dikin, meşqa wan dikin.

******

Aşiqê bê ceger meger sebrê ji can û dil di ket
Manîyê gencê meqsede, heybetê ejdehayê zulf

ME'NA BÊJEYAN:
Bê ceger, bê cîger: Bê kezeb, tirsonek (ciğersiz, korkak)
Meger: Di be ku, mumkine, belkî (meğer, herhal, belki)
Sebrê jê dike: Yanê dest jê dikşîne, terk dike (vazgeçiyor)
Manî: Yê men' dike, xwe dide ber, nahêle ku bibe (mani olan)
Meqsed: Tiştê ku mirov qesd dike, dixwaze (ku divirda dîdara yarê ye) (istenilen, arzulanan şey, ki burda yarin güzel yüzüdür)
Gencê meqsed: Xizna meqsedê, meqseda ku wekî xizne û kann e (maksat hazinesi)
Heybet: Tirs, tirsa digel hurmetê (hürmetle beraber korku hissini veren hal)
Ejdeha: Ejderha, marê bi tirs û dirêj (ejderha, uzun yılan)

ME'NA HEMÎ:
Di cîrok û efsanan da heye: ku xezîne sihir kirîne (sêr kirîne), tilisim kirîne, marên sêrê li ber in, hetta tilisma wan betal nebe, merif nikare xwe bighînê, ku Xanî jî, di vir da îşaretê bal wê baweriya efsanewî ya xurafî va dikę û dibêje: "Herhal, 'aşiqê bê kezeb û tirsonek, bi dil û can sebir dike we yan dev ji dil û canê xwe berdaye ku dil û canê xwe, bi alîyê wê xezîna sêrkirîya rûyê yarê va, şandîye, lê digere; ew rûyê ku wekî xezînekî sêrkirî û tilisim kirîye, zulfên wî, wekî mar û ejdîhayên xezînane, xwe li dora wî piçikandine, ku ji heybeta wan ejdîhayan mirov cesaret nake bi alîyê wî xezînê da herre, gelo aşiqê bê cîger evî cesaretê ji kî, ji kû hildaye? Pişteмêrê wî kî ye ?

Ehlê dunyayê, sera ser dijminê min bin " Mela"
Piştemêrê min " Elî " yê heyderê kerrarî bes!
- Melayê cizîrî -

Pişte mêrê min feqîrê bê heval û yar û war
Bejn û bal û xet û xal û îşweyên dildarî bes!
- Durre -

******

Herserê mû bi sazekî, cîlwe diket bi nazekî
'Aşiqê îşqîbazekî, bendî diket belayê zulf

ME'NA BÊJEYAN:
Herserê mû: Herserê mûyek (her bir kılın ucu)
Bi sazekî, li sazekî: Li karekî, li awakî, bi awakî. (bir iş, bir tertip ve düzen içinde, her telden bir saz bir awaz)
Cîlwe: Delalî, nazî, xweşik livîn (güzellere yakışır duruş ve davranış)
Îşqîbaz: Îşqlîstok, yê ku lîstikên îşqê dike (aşk oyunu yapan)
Îşqbaz: Yê ku îşq bi wî dilîze (aşk oyuncağı olan)
Aşiqê îşqê bazekî: Aşiqekî ku ew bi îşqê, we yan, îşq, bi wî dileyîze. (aşk ile oynayan veya aşk oyuncağı olmuş bir aşık)
Belayê zulf: Belavbûyîna zulf (zülfün dağılışı, dağılmış hali)
Belayê zulf: Zulfê teşqele û bela (bela olan zulf)

ME'NA HEMÎ:
Herserê mûyekî zulfê yarê, li sazekî dixim, heryek îş û karekî dike, heryek cîlwe û nazî û delalîyekî dike, belavbuyîna wî jî, her aşiqê ku listokên îşqê ye, bendê xwe dike, bi xwe va girêdide, -digel ku kar û fonksîyona belavbûyînê û tiştên ku ji hev belav in, ewe ku tiştan ji hev belav bikin, ne ew e ku bend bikin-, lê belavbûyîna zulfên yarê, ne wilo ye. Belkî ew 'aşiqê îşqibaz bi xwe va bend dikin û girê didin, bê lept û bê lepat dihêlin.

******

Rom û fireng û hîndîyan, xal û nîşan û xemrîyan
Xencer û şîr û misrîyan, ceng e li ber lîwayê zulf

ME'NA BÊJEYAN:
Xemr: Mey, bade (rakı, şarap)
Xemrî: Reng xemr, reng sor û mor, cûrekî ser poşên jinane, wekî şar û temezîyan. (şarap renkli, mor renkli, kadınların bir nevi süs serpoşu)
Şîr: şûr. (kılıç)
Misrî: Ji Misrê, malê Misrê, cûrekî şûr û mizraqane ku li welatê misrê têne çêkirin. (Mısır mamulü olan bir tür meşhur kılıç ve mızrak)
Lîwa: ala, ala cengê (bayrak, sancak)

ME'NA HEMÎ:
Xal û nîşan û xemrîyên ku rengên wan wekî rengên Romî û Fireng û Hîndîya ne, (sipî û sor û reş û mor in), digel şûr û xencer û misrî yên wê, (awirên çawên wê), tev bihev ra li ber (li bin) ala zulfan, di ceng û şerr da ne (heryek bi terzekî aşiqan dikujin, dilan birîndar dikin, canan yaxma û talan dikin)

******

Tac û tomar û bin perran, le'l û guhar û gewheran
Serxoş û dîn û ebteran, reqse digel semayê zulf

ME'NA BÊJEYAN:
Tac: taca serê jinan, ferayî. (kadın başındaki süs tacı)
Tomar; Tûmar: Lûle, pêçyak. (dürülüp yuvarlak yapılmış şey, bir süs türü)
Le'l: (kırmızı ve kıymetli bir taş)
Guhar: (küpe)
Binperr: Binpel, bin perrik, (pelikên zêrrîn û perrikên teyrê tawis ku pê tac û serpoşan dixemilînin) (tavus kuşu tüyünden süs)
Ebter: bê xêr û bêr, xirab û beter (berbat, beter)
Sema: çerx û govend (mevleviler gibi rakiss)

ME'NA HEMÎ:
Tac û tomar û binperr û le'lû guhar û xişrên yarê, aşiqên serxweş û dîn û ebter, hemî bi hev ra, bi govend û çerxên zulfan ra direqisin û di çerx û govendê dane (bihev ra diçerixin û direqisin)

******

Law û rewal û rîspîyan, mîr û wezîr û cindîyan
Serxoş û mest û bengîyan, derde ji macerayê zulf

ME'NA BÊJEYAN:
Law: Zarê lawîn, xweşik û cuwan (erkek çocuk, delikanlı)
Rewal: Xort (genc, toy)
Cindî: Pak û paqij, 'esîlzade, leşker (asker, efendi)
Rîspî: Kalên ku rûyê wan sipî bûne (yaşlı, aksakallı)
Bengî: 'Aşiqê şeyda (sevdalı aşık)
Derd: Derd û kul (dertli)
Macera: Serhatî, tiştên ku hatine serî û çûne (olup geçen şey, maceralı olaylar)

ME'NA HEMÎ:
Hemî xort û cuwan û rîspî û mîr û wezîr û kizîr û leşker û serwer û serxoş û mest û bengî, û efendî, herkes; ji macerayê zulfê yarê, bi derd û kul û keder in, derdmend û derbider in.

*****

Şêx û mirîd û salikan, şah û feqîr û malikan
Cust û çeleng û çapikan dilket û bende payê zulf

ME'NA BÊJEYAN:
Murîd: Ewê ku divê, sofîyê ku vayîna wî vayîna şêxê wîye, wek vayîna şêxê xwe divê û dike. (şeyhinin iradesine teslim olan)
Salîk: Rehrew, rehrewê terîqetê. (yolda giden yolcu, bir tarikata girmiş kimse)
Malik: Weyî, xweyê mulk û mal. (mal, mülk sahibi, zengin)
Çust: Çespan, cansivik. (çevik)
Çeleng: Bi îhtîşam û xweşik. (yakışıklı, ihtişamlı)
Çapik: Zû lebt û lebat, mahir. (çevik, mahir)
Dilket: Dil ketî, dilketîyê. (gönül düşmüş, gönül onu ister)
Bendepay: Ling bend kirî, nig girêdayî. (ayağı bağlı olan)
Dilket û bende payê zulf: Dil ketî û nig girêdayê zulfan. (gönlü zülfe düşmüş, eli ayağı bağlı kalmış olan)

ME'NA HEMÎ:
Dilê şêx û mirîd û salik û şah û geda û feqîr û dewletiyan, yê hemî ketî ye zulfên yarê, hemî bûne ling girêdayê wî zulfê (zulfan, dest û ling û dil û canê wan hemû yan bend kirî ye, bi xweva girêdaye)

****

Ef'a û mar û ejder e, misk û zebad û 'enber e
Nefxe yê rûhî perwer e, raîheyê hewayê zulf

ME'NA BÊJEYAN:
Ef'a: marê bi jahrî, merifkûj (öldürücü, zehirli yılan)
Ejder: Marekî dirêj e (uzun bir yılan)
Zebad: Maddekî bîhnxweş e, ji kîsikê pisîka bi navê **zebad** bi dest dikeve. (zebad denilen kedinin kuyruğu altındaki keseden çıkarılan bir hoş raihalı koku)
Nefxe: Puf kirin, puf û bayê bîhnxweş, bîhna xweş (üfürmek, koku, rüzgarın hafif esişi)
Ruhî perwer: perwerdkarê can (ruh besleyici)
Raîhe: Bîhn (koku)
Hewayê zulf: bayê zulf (zulf havası)

ME'NA HEMÎ:
Zulf, wekî efa û mar û ejdere, (bi dilan vedide), wek misk û zebad û enbere, bîna xweşa bayê wî, wek wî puf û pufkirina canperwer e (ku xwedê ji rûhê xwe pufê bedena Adem kirîye û, Adem pê candar bûye).

******

Bê meyy û bê dewayekî, bê deff û çeng û nayekî
Dîn diketin Melaye kî, cezbe yê dil rubayê zulf

ME'NA BÊJEYAN:
Bêdewayekî: bê dermanekî ku mirov serxweş dike (bir ilaç ve uyuşturucu olmadan)
Melayekî: Mela û seydakî ku Xanî jî melayek e. (bir hocayı, bir muderrisi)
Cezbe: Berbixwekişandin û ricifandin, ricfa îşqê. (aşk cezbesi,

kendinden geçen bir hale gelme, meczubiyet)
Dilruba: Yê ku dilan direvîne, bi alîyê xwe ve dikişîne. (gönlü kaçıran, cezbeden)

ME'NA HEMÎ:
Ricf û cezbeyên bisk û zulfên dilruba, bê meyy û benc û afyon, bê def û tiblik û neyy û saz, (bê alet û maddeyên ji xweçûyîn û dînbûyînê), melleyekî dîn dikin. (Xanî jî dîn dikin) Tu kes ji pencê wî benc û afyonê xilas nabe, -melle jî daxil-, herkes, dîn û şeyda yê wî bûye.

******

Mîr û mela û mahîran, çendî belîx û şaîran
"Xanî" û hindî haziran, dade! Ji ber belayê zulf
(derde, ji destê tayê zulf)

ME'NA BÊJEYAN:
Mahîr: Hunermendê ku pirr tişt ji destan tê (becerikli, hünerli)
Çendî: Gelek (birçok)
Belîx: Yê ku meramê xwe bi angorê xwestina halê û rewşa meqamê, îfade dike, di cîh da dibê je (meramını yerinde ve makamına uygun olarak anlatmaya muktedir olan, belagatli kimse)
Dade: Bi dade, bi gazin û gazî ye, bi ah û hewar e (şikayetçi, el-aman diyen, adalet isteyen)
Derde: Bi derde, derdê wî heye (dertli ve kederlidir)

ME'NA HEMÎ:
Mela û mîr û paşa û zana û hunermend û edîb û şaîr û belîx û, "Xanî" û cemaeta hazir, çiqas hene, herkes ji wan, ji destê bela û derdê ta û bendên zulfên yarê, el-eman, hey hewar dibêjin û dinalin.

Rostemê mazenderanê wer ji bona min hewar!
Leşkerê tûranê mulkê can û dil kir tar û mar

- Durre-

- AXÎRET FIROŞÎN -

Da zenn ne birîn ku em xemûşîn
Em beste dehan û dil xuroşîn

Genca me di dil, guher tijîne
Her çendî îyan xezef firoşîn

Şahîn û bi xef, bi libsî dîba
Zahir ji xwe em pelasî poşîn

Mucmer sifete me cism û can, ûd
Dil aeteşe,daîma bi coşîn

Meyxane bihişte, Hûre Saqî
Kewser Mey e,lew Me bade noşîn

Bê hûdene lafê lew ku Xanî
Dunya kirr û axîret firoşî
.....

Da zenn ne birîn ku em xemûşîn
Em beste dehan û dil xuroşîn

ME'NA BÊJEYAN:
Da : Dê,ha! Hûn hîşyar bin. (dikkat edin,uyanın)
Zenn: Pindar, guman. (tahmin, zan)
Ne birîn : Ne bin. (Götürmeyin)
Xemûş : Xamûş,bê deng. (sessiz)
Beste dehan: Dev girêdayî. (ağzı bağlı sessiz,sedasız)
Dilrxuroş: Dil coş û xuroş. (çok şamatalı)

ME'NA HEMÎ:
Dîqqet bikin! Bila kes vê texmînê neke ku em bê dengin; em devgirêdayîyê dil bi coş û xuroşin.

******

Genca me di dil, guher tijîne
Her çendî îyan xezef firoşîn

ME'NA BÊJEYAN:
Genc: Gencîne,Xezîne. (hazine)
Guher: Gewher. (mücevher, kıymetli cevher)
Her çendî: Her çuqas. (her ne kadar)
Îyan: Eşkera. (aşikar)
Xezef: Qafik. (çanak,çömlek)

ME'NA HEMÎ:
Her çuqas ku li ber çavan em qafik firoşin, lê xezîna me di dilê me daye, veşartîye û tijî gewherin (em li ber çavan feqîr û xizanin, lê bi dizî zengînin, xweyê gewherên giran bihanin)

******

Şahîn û bi xef, bi libsî dîba
Zahir ji xwe em pelasî poşîn

ME'NA BÊJEYAN:
Şahîn: Em Şahin, padîşahin. (Biz şahız)
Bi xef: Bi dizî. (gizlice, ma'nen)
Libsê dîba: Çek û potên hevirmûş. (ipekli elbise)
Pelas: Pirt û kirt,cilên kevnên kêm biha. (değeri az eski elbise)
Poş: Poşan, li xwe kir. (giyen)
Pelasî poş: Yê ku cil û libasên kevn li xwe dike. (eski elbiseler giyen)
Zahir: Bi eşkerayî. (açıkça)
Ji xwe: (zaten)

ME'NA HEMÎ:
Em bi dizî (di alema me'nwî da) padişah in, wekî wan bi cil û qumaşên hevirmûş in, lê bi zahirî (liber çavan) em pelaspoş in (bi cil û lîbasên kevn û bê biha û naxoş in)

******

Mucmer sifete me cism û can ûd
Dil aeteşe,daîma bi coşîn

ME'NA BÊJEYAN:
Mucmer: Agirdank. (mangal)
Sifet: Reng û rewş,wesif. (hal keyfiyet)
Cisim: Cusse, beden. (vucut,beden)
Can: (ruh)
Ûd: Êzing,darên şewatê, buxûr. (odun,kokulu buhur)
Dil ateşe: Dil agire. (gönül ateştir)
Daîma bi coşîn: Her tim bi coş û xuroşin, bi kel û kelijandinin. (daima coşkuluyuz)

ME'NA HEMÎ:
Bedena me bi reng û rewşa agirdangêye, ruh û canê me jî, wek Êzingên şewatê ne, dilê me jî, tijî agire,em daîma bi coş û xuroşin, di kelin û di kelijin.

******

Meyxane bihişte, Hûre Saqî
Kewser Mey e, lew Me bade noşîn

ME'NA BÊJEYAN:
Bihişt: Behişt. (cennet)
Hûr: Çavbelekên xweşik. (cennet hurileri)
Saqî: Meyger. (içki sunan)
Kewser: Ava bihiştê. (cennet suyu ve ırmağı)
Lew: Lewra ku, ji bo wî. (onun için)
Me: (biz)
Badenoş: Meyvexwar (mey içen)

ME'NA HEMÎ:
Meyxane wekî cennetêye,Saqîyên Meya we jî wek horîyan e, ava Kewserê je meye, ku lewra jî em mey vexurin, em meyê vedixun.

******

Bê hûdene lafê lew ku Xanî
Dunya kirr û axîret firoşîn

ME'NA BÊJEYAN:

Bê Hûde: Bê me'na û beredayî (anlamsız ve faydasız)
Laf: Gotinê beredayî, guzaf (boş sözler)
Dunya kirr: Cîhan xirîdar (Dünyayı satın alan)
Axîret: Dunya din,dunya ji para (öbür dünya)
Axîret firoş: (ahireti satan)

ME'NA HEMÎ:
Xanî! Laf û gotin û qîl û qal, beredayî û bê faydene,ev rastîyeke ku em dunya kirr û axîret firoşin (Wesselam...!)

-ZAHIDÊ XELWET NIŞÎN-

Zahidê xelwet nişîn pabestê kerdarê xwe ye
Tacirê rehlet guzîn derbendê dînarê xwe ye
Aşiqê dîlber hebîn dil dayê dildarê xwe ye
Vî zemanî herkesek bê şubhe xemxwarê xwe ye

Bê 'emel tu-j kes meke hîvî 'eta û himmetê
Bê xered nakeşîtin qet kes ji bo kes zehmetê
Kes nehîn qet hilgirit barê te ew bê ucretê
Gerçî Îsa bit ku wî fikra ker û barê xwe ye

Hoşîyar bî! Da nekî umrê xwe bê hasil telef
Lew ku naket fayde mal û genc û ewlad û xelef
Maceraya "Xidr" û dîwarî yetîmê bû selef
Vî zemanî herkesek mi'marê dîwarê xwe ye

Ca nezerke îbretê pêla ku waqi' bit sewaş
Ger ne bîtin îltifat û mûçe û debr û meaş
Cundîyî rimbazî faris nadetin canê belaş
Saeta serbazîyê hîvî ji serdarî xwe ye

Xanîya zayi' me ke weqtê xwe ey nadan! ebes
Bê teleb nabî ji weslê behremend ey bul-hewes!
Sanî'ê Mûtleq ku nînin îhtiyacek wî bi kes
Lutf û îhsana Wî jî derheq telebkarê xwe ye
.....

Zahidê xelwet nişîn pabestê kerdarê xwe ye
Tacirê rehlet guzîn derbendê dînarê xwe ye
Aşiqê dîlber hebîn dil dayê dildarê xwe ye
Vî zemanî herkesek bê şubhe xemxwarê xwe ye

ME'NA BÊJEYAN:
Zahid: Ewê ku ji zewq û hewesên dunyayê dev berdaye, xwe bi îbadet û sofîtîyê va girêdaye. (dünyadan el ve ayağını çeken, kendini ibadete veren sofu)

Xilwetnişîn: Munzewî, ewê ku ketîye koşeyekî bi tenê têda dijî û îbadet dike, peywendîyên xwe ji mirovan qutkirîye. (Halvette oturan, munzevi halde yaşayan)
Pabest: Linggirêdayî, girêdayî. (ayağı bağlı olan)
Kerdar: Kir û kar û 'emel. (iş)
Tacir: Bazirganvan. (tüccar)
Rehletguzîn: Gerrvan, gerroke, gerrxwaz. (seyahat seçen ve seven)
Dînar: Zêr, pere (altın, para; mecazi anlamda mal ve mülk)
Derbend: Di bendan da, pê girêdayî (bağlılık içinde olan)
Dildayê dildarê xwe: Yanê dilê xwe daye û dide wê yara xwe ya ku dil bi alîyê wê va ye, girêdayê bi wê va ye. (dîlberine gönül vermiştir)
Dîlber hebîn: Yarperest. (dilbere tapan)

ME'NA HEMÎ:.
Zahidê xilwetnişîn, girêdayê kar û bar û îbadetê xwe ye, tacirê gerroke jî girêdayê bi pere û sermayeyê xwe va ye, li pey wî ye, evîndarê dîlberperest jî dildayê dilber û dildara xwe ye. Ku bi kurtî: Vî zemanî herkesek -bê şik û şubhe- xemxwarê xwe ye, ji boy xwe xem û endîşe dike.

****

Bê 'emel tu-j kes meke hîvî 'eta û himmetê
Bê xered nakeşîtin qet kes ji bo kes zehmetê
Kes nehîn qet hilgirit barê te ew bê ucretê
Gerçî Îsa bit ku wî fikra ker û barê xwe ye

ME'NA BÊJEYAN:
Bê 'emel: Bê hîvîdarîya tiştek, bê kar û xebat. (bir şeyi ummaksızın, çalışma olmadan)
'Eta: Bexş û dayîn (vermek, bahşetmek)
Hîmmet: Dildarî, 'ezm û îrada bi dil û can. (Bütün kuvvetiyle yöneliş, gayret ve gönül isteği)
Bê xerez: Bê xaye û meqsed. (gayesiz ve maksatsız)
Nakeşîtin: Nakşînin. (çekmezler)
Hilgirit: Hilgire, bide pişta xwe. (yüklense, sırtlansa)
Wî fikra ker û barê xwe ye: Fikr û mûlaheza wî, kerê wî û barê

wî ye, ew jî mûlaheza ker û barê xwe dike (onun düşüncesi de eşeği ve yüküdür, o da kendi işini düşünür)

ME'NA HEMÎ:
Bê hîvîkirina tiştekî, bê kir û har tu ji tu kesî tu dayîn û tu himmetî umîd û hîvî neke, tu kes ji te ra bê biha û bê ucret tu zehmetî nakişîne û xwe naêşîne, kes bê ucret barê te hilnagire, herkes li dû karê xwe ye, mînak û mîsala wî jî eve ku fikra Îsa jî ker û barê wî bûye, ew jî li dû karê xwe çûye.

******

Hoşîyar bî! Da ne kî ûmrê xwe bê hasil telef
Lew ku naket fayde mal û genc û ewlad û xelef
Maceraya "Xidr" û dîwarî yetîmî bû selef
Vî zemanî herkesek mi'marê dîwarê xwe ye

ME'NA BÊJEYAN:
Hoşîyar bî: Tu hîşyar be, nexape! (uyanık ol, kendine gel)
Bê hasil: Bê netîce û bê kar û menfîet (karşılıksız ve kârsız bir şekilde)
Telef: Zayî bûyî (zayi olmak, yok olmak)
Genc: Xezîne, xizne (define)
Xelef: Yê ku di pey merif ra dibe canişînê merif (halef)
Macera: Serhatî, hîkaye, çîrok (macera)
Xizr û dîwarî yetîm: Xizr û ew yetîmên ku Xizir dîwarê wan çêkir. (Hızır ve yetimler)
Bû selef: Borî û çû. (geçti, dönemi bitti)

ME'NA HEMÎ:
Hay jê bimîne, hîşyar be! Ûmrê xwe badîhewa, bê netîce telef neke, li hîvîya tu kes û tu tiştî nemîne, ku lewra mal û ewlad û serwet û xezîne û dost û heval û canişîn bê fayde nin, ji xeyrî kir û karên merif fayda tu tiştî ji merif ra tuneye, tu kes bê heqq û bê ucret jî ji merif ra tu tiştî nake, gerçî Xizir dîwarê êtîman bê ucret ji wan ra çêkiribe jî, lê ev borî û çûye, îdî niha kes bê menfeet ji mirov ra tu tiştekî nake, vî zemanî, vî demî herkesek dîwarê xwe çêdike, herkesek li dû kara xwe ye (divê ku kurd jî hişê xwe bînin serê xwe li dû kar û barê azadîya xwe bin, bese ku îdî ji xelkê ra

(ji tirk û ereb û eceman ra) bin, ji wan ra bixebitin û kar bikin)

Mûsa Pêxember û Mirovekî zana (bi te'bîra Xanî, Xizir), bi hev ra hevalî dikin, diçin gundekî ku kes wan nahewîne, xwe didin ber dîwarekî xirabe yê li ber hilşandinê, hetta sibê dimînin, di sibê da hevalê Mûsa, wî dîwarê xirabe te'mîr dike, Mûsa Pêxember dixeyîde, dibêje ku gundîyan me xweyî nekirin tu jî dîwarê wan çêdikî. Li ser vî, hevalê wî dibêje îdî bese ev bû sê car ku tu li kirên min îtîraz dikî, bê sebir dimînî, îdî ez û tu ji hev diqetin; hîkmetê te'mîrkirina min ji wî dîwarê ra jî ev e ku di binê wî da xizna mirovekî qenc veşartîye, du êtîmên wî jî hene, ku eger ew dîwar ji niha da hilşe, dê xelk ji xwe ra wê xezîna wan paymal bikin, min ji boy riza Xweda, ewî dîwarê wan çêkir ku heta ew êtîmên wî mezin bibin û xizna xwe derînin. (el-Kehf/65-83)

Ku Xanî divê helbesta xwe da îşaretê bal wê macerayê va dike û dibêje ku ew jî îdî borîye û dewra wî jî çûye.

Derbareyê Xizir da pirr rîwayetên bê esl û astar, pirr çîrrok û texmîn û şirove hene, ku hemî jî îsraîlîyat û xurafe ne. Di bawerîya min da, rastî û heqîqet ev e: "Xizir bêjekî 'erebî ye bi me'na hêşîn e, ku rengê hêşîn û hêşînayî jî, remz û nîşana jîn û jîyan û azadî û hêsayîyê ye, senbola xweşîtî û rihetî û dilşadîyê ye, ku bi angorî wî, Xizir ne şexsekî mûeyyen û cuz'î ye, belkî me'na û mefhûmekî kullî û giştî ye ku ew jî ev e: "Çara bê çaran, hewara bê hewaran", ku ev me'na û mefhûmê giştî û kullî, hem şamilê wî şexsê alim û fazilê -ku hevalî û rêberîtîya Mûsa pêxember kirîye- tê, hem jî ji hemî destegîr û alîkaran ra, ji hemî çarê û hewaran ra jî Xizir tê gotin, ku ev mefhûmê kullî, di her dem û dewran da, di her cuz'îyan da, heye, di zumnê wan da teheqquq dike; nemirîtî û herjîyanîtîya wî jî, ew dewam û teheqquqa wî ya di zimnê wan cuz'îyyatên wî da ye.

Di ferhenga Osmanîyan da, di nav tirkan da, ji roja şeşê meha Gulanê ra, roja **Xidirelez** tê gotin, ku Xidirelez tehrîfê ji **Xizirîlyasê** ye, Xizirîlyas jî, tehrîfa **Xidril-ye'sê** ye, ku **Xidir** bi me'na perde û penageh e, **ye's** jî bi me'na bê hîvîtî û bê umîdî ye, ku herdû li ser hev bi me'na çara bê hîvîtî û bê çaretîyê ye, ku bi

angorî wê şîrovekirina borî, me'na **Xizir** jî ew e.
Netîce; Xizir ne şexsîyetekî mûeyyenê cuz'î ye, belkî me'na û mefhûmekî ûmûmî û kullî ye: Çara bê çara ye, hewara bê hewara ye, wekî din qîl û qal in, gote got û galegal in, wesselam!.

******

Ca nezerke îbretê pêla ku waqi' bit sewaş
Ger ne bîtin îltifat û mûçe û debr û meaş
Cundîyî rimbazî faris nadetin canê belaş
Saeta serbazîyê hîvî ji serdarê xwe ye

ME'NA BÊJEYAN:
Ca nezer ke îbretê: Ca bi îbret mêze bike, ders û îbret bigire (ibretle bak, ders al)
Pêl: Dem, gav (zaman, süre)
Sewaş: Ceng û şerr (savaş)
Mûçe: Nesîb, par (pay, hisse)
Debr: Meîşet û pêjî, (Maişet)
Cundî: Leşker (asker)
Rimbaz: Rimlîst, cengawer (Rim ve mizrakla oynayan, savaşçı)
Faris: Suwar (atlı)
Belaş: Badîhewa (bedeva)
Saeta serbazîyê: Dema bi serîlîstinê, dema cengê ku meriv tê da bi serê xwe dilîze (savaşta kendi kellesiyle oynama)
Serdar: Serok (komutan)

ME'NA HEMÎ:
Ca tu bi îbret mêze bike û jê ders hilde ku di dema cengê da, eger mûlaheza îltîfat û par û debr û meaşê nebe, suwarên cengawer ên Farîsî, canê xwe badîhewa nadin, belkî di wê demê da ew ji serdarê xwe hîvî û umîdekî dikin ku canê xwe didin.

******

Xanîya zayi' me ke weqtê xwe ey nadan! 'Ebes
Bê teleb nabî ji weslê behremend ey bul-hewes!
Sanî'ê Mûtleq ku nînin îhtiyacek wî bi kes
Lutf û îhsana Wî jî derheq telebkarê xwe ye

ME'NA BÊJEYAN:
Nadan: Nezan (bilgisiz)
'Ebes: Berredayî, bê fêde (faydasız)
Bê teleb: Bê daxwazî, bê xwestin (istemeden)
Ji weslê: Ji gîhîştina mehbûbê, (yara kavuşmaktan)
Sanî'ê mûtleq: Çêkiroxê aza, bê qeyd û şert (Mutlak yaratıcı)
Telebkar: Xwestekar (isteyen)

ME'NA HEMÎ:
Ey Xanî! Tu wextê xwe zayî neke! Nezano! tu zemanê xwe berredayî neborîne! Pirr bi heweso! Tu evî rastîyê jî qenc bizane ku tu bê teleb, bê xwestin û arzû, bê cehd û xebat nikarî bigihîjî mehbûbê, di vî rastîyê da jî, rind bifikire ku ew saniê mûtleq (Xweda)yê, ku îhtîyacîya Wî bi tu kesî nîne, lutf û îhsana wî jî, derheq telebkarê wî da ye. (derheq wan kesan da ye ku li dû wî ne û ji wî tiştan dixwazin, yanê bi kurtî : îhsan û îltîfatên wî jî derheq dost û yar û xêrxwazên wî da ne)

EY SEYYIDÊ 'ALEM !

Ey Seyyîdê alem senedê Nûra hîdayet
Hêvî dikin em pirr ji te ey sedrê rîsalet
Pêşwayê şefî'an tu ku der rozê qîyamet
Mehrûmî nekî metu ji dîwana şefaet
Qed kane lekel-fedl û lekel-cûd û kesîra
Ûrsîlte îlel-xelqî beşîren we nezîra

Taha tu resûlê melîkê mulkê kerîm î
Teşrîfê bi ne'leynê xwe ser Erşê ezîm î
Der behrê cemalê tu tenê durra yetîm î
Ehsentirî ez Yûsufî, û Siddîq û Helîm î
Ey na'tê te ! Ez ferşê heta 'erşê şehîra
Ûrsîlte îlel-xelqî beşîren we nezîra

Nûra ku ji şemsa ezelî dabû zuhûrê
Cîlva ewwelî jêda tu bû, hatî sudûrê
Alem hemî rohnî bû ku paşê ji wî Nûrê
Berqek ji tecalla wî bû Mûsa dî li Tûrê
Adem tune bû hêj, Tu hebû "celle qedîra"
Ûrsîlte île-l xelqî beşîren we Nezîra(*)

.....

Ey Seyyîdê alem senedê Nûra hîdayet
Bê hedd hene bo me guneh û curm û qebahet
Hêvî dikin em pirr ji te ey sedrê rîsalet
Pêşwayê şefî'an tu ku der rozê qîyamet
Qed kane lekel-fedl û lekel-cûd û kesîra
Ûrsîlte îlel-xelqî beşîren we nezîra

ME'NA BÊJEYAN:
Seyyîdê 'Alem: Mezin û serokê Cîhanê
Sened: Belge, palge (dayanak, vesika)

(*) Di bîra min tê ku bavê min ê rehmetî ! Vê qesîda Xanî dixwend û pirr dirêj bû jî. Lê mixabin ev qeder jê di bîra min da maye, ku şeşika dawî jî ku ne ya Xanî ye, min hûna ye û lê zêde anî ye. -Durre-

Nûra hîdayet: Nûra hîdayeta bal rêya rast. (hidayet yolunun nuru)
Pêşwa: Rehber, delîl, serwer (önder)
Rîsalet: Pêxemberîtî (Peygamberlık)
Sedr: Sing, otorîte, pêşîya meclisê, cihê ku reîs lê rûtinê, qora pêşîn pêşwa û ezinê meclîsê (meclisin önü, en muteber yeri)
Şefa'et: Mehder, mehderî (bağışlamak için niyaz etmek)
Şefî': Mehderkar, şefa'etkar (şefaet eden)
Beşîr: Mujdevan, yê ku mizgînîyê dide (müjdeleyen)
Nezîr: Yê ku mirov ji tiştên tehlîke xeberdar dike, merif hişyar dike (uyaran, ilerdeki hesap için korkutan)
Ûrsîlte: Tu hatî şandin (gönderilmişsin)
Île-l xelqî: Bi bal xelqê va (halklara)
Fedl: Bilindayî, mezinayî, fezl û îhsan (yücelik, büyüklük)
Cûd: Comerdî (eli açık olmak)
Kesîr: Pirr (çok)

ME'NA HEMÎ:
Ey Seyyîd û Serwerê 'alemê, sened û rêberê hîdayeta bal rîya heqq, ey Pêşewayê şefa'etkaran di roja Qîyemetê da ! Em ji te pirr vî hêvîyê dikin ku Tu me ji defter û dîwana şefa'eta Xwe mehrûm nekî ! (Me di wî defter û dîwanê da qeyd bikî û bihesibîne !).
Ey ewê ku medh û sanayê te (behsa qencî û rindayên te) ji 'erdê heta asîman, heta 'erşê Xweda, nav û deng daye, Tu ji herkesî ra beşîr û nezîr hatiye şandin ! (Tu rehmet û hêvî 'alemêyî !).

******

Taha tu resûlê melîkê mulkê kerîm î
Teşrîfê bi ne'leynê xwe ser Erşê ezîm î
Der behrê cemalê tu tenê durra yetîm î
Ehsentirî ez Yûsif û Siddîq û Helîm î
Ey na'tê te ! Ez ferşê heta 'erşê şehîra
Ûrsîlte île-l xelqî beşîren we nezîra

ME'NA BÊJEYAN:
Taha: Yek ji navê Hz. Muhemmed e (Peygamber efendimizin bir ismidir)
Melîk: Xweyê mulk û teserrufê (Mülk ve tasarruf sahibi)
Kerîm: Pîroz, bi rûmet (deşerli)
Ne'leyn: Herdû pêlav (çift ayakkabı)
Der behrê cemalê: Di derya spehîtîyê da (güzellik denizinde)
Durra yetîm: Durr û încîya bê hemta (emsalsız inci)
Ehsentirî ez Yûsuf: Tu ji Yûsif Pêxember bedewtir û rindtir î (Sen Yusuf'tan daha güzelsin)
Siddîq: Rast û durust (doşru ve sadakatlı)
Helîm: Pirr bi hîlm û bîhnfire (halim, yumuşak huylu)
Hûsnû hîlm: Rindî û nermî, xweşikî û bêhn frehî
Ne't: Wesif, sîfe
Ferş: Zemîn, erd
'Erş: Sema, asîman, text, textê kamîranî û selteneta Xweda (hemû 'alemê)

ME'NA HEMÎ:
Ey Taha (ey Hz. Mûhemmed) ! Tu qasidê padîşahê mulkê cîhanê yê pîroz î, Te bi herdû pêlavên xwe teşrîfê ser 'Erşê seltenet û kamîranîya Zatê Îlahî kirîye, Tu di derya spehiti û bedewîtîyê da durrekî bi tenê yê bê hemta yî, Tu ji Yûsuf Pêxember jî spehîtir û xweşiktir î, Tu rast û durust û helîm û bîhnfireh î, bê guman ! Ku wesfê Te, ji 'erdê heta asîman nav daye û meşhûr bûye ! Tu ji hemî kesan ra Beşîr û Nezîr hatî şandin.

******

Nûra ku ji şemsa ezelî dabû zuhûrê
Cîlwa ewwelî jêda tu bû, hatî sudûrê
Alem hemî rohnî bû ku paşê ji wî Nûrê
Berqek ji tecalla wî bû Mûsa dî li Tûrê
Adem tune bû hêj, Tu hebû "celle qedîra"
Ûrsîlte île-l xelqî beşîren we Nezîra(*)

ME'NA BÊJEYAN:
Şemsa ezelî: Roja wûcûda mûtleqa pîroza ezelî
Zuhûr: Dîyar bûn, eşkera bûn
Cîlwa ewwelî: Tecellîya seretayî
Sudûr: Peydabûyîn,
Tûr: Çîyayê Tûrê Sîna yê ku Xwedê li ser wî ji Mûsa Pêxembera ra tecellî bûye.
Celle qedîra: Xwedê pirr mezin û tewana ye, her tiştî dişî û kar e (Allah yücedır, ve her şeye qadır dır)

ME'NA HEMÎ:
Tu cîlwa seretaî ya nûra Xweda yî, Tu beriya Adem Pêxember hebûyî, agirê ku li Tûra Sînayê Mûsa çirûska wî dît, ew jî cîlwe û tecelîyekî ji wî nûra te bû ye ! Tu ji hemû xelqan ra, ji hemî 'alemê ra beşîr û nežîr hatî şandin !

(*) Ev şeşeka dawî ji gufteyên Durre ne, ne yê Xanî ye

- MEDHÎYE Û MERSÎYE -

(PESINNAME Û ŞÎNNAME)

(Der bareyê Mûhemmed begê BAZÎDê da)

Kanê Mûhemmed beg gelo? Ka Padîşahê Serhedan?
Îro ji dil bigrîn dilo! ka Padîşahê Serhedan?

Îro bi bînin îbretê, axa û xelqê hêşetê
Kanê xwedanê xîretê, ka Padîşahê Serhedan?

Mîrê di nêv mîran bi nav, eşheb suwarê rim zirav
Bala bilindê perr belav, ka Padîşahê Serhedan?

Kî dî we reng zatek şerîf, erkan û ezmanek letîf
Alem didest wî bû zeîf, ka Padîşahê Serhedan?

Koma Dimil bû sê hezar, sed Mîrekan vêkra du car
Jêk rakirin,kir tar û mar, ka Padîşahê Serhedan?

Senceq ji ser qemmê birrî, Bitlîsîya wan jê kirî
Xanê Dimil kher bû, çirrî, ka padişahê Serhedan?

Kanê ezîzê Misrîyan, kanê 'edûwwê Wanîyan
Kan hevrikê Mehmûdîyan, ka Padîşahê Serhedan?

Kanê emîrê namîdar, serhed nişînê xundekar
Paşan ji bo pêşkêş hinar, ka Padîşahê serhedan?

Kanê emîrê zî funûn, ka 'aqilê teb'et cunûn
Alem li ber wî bûn zebûn, ka padîşahê Serhedan?

Çend mîr û hakim rakirin, çend xan û sultan da kirin
Kom û heşem ber Ba kirin, ka padişahê Serhedan?

Ew hakimê pirr nav û deng, hem teb'etê Teymûrê leng
De'wa dikir biçye Frenk, ka Padîşahê Serhedan?

Pêla ku wî dîwan di girt, xelqê edeb erkan di girt
Heybet ji wan dîwan di girt, ka Padîşahê Serhedan?

Wextê bi ser hespê diket, şeş caniban rev pê di ket
Heybet bi ser xelqê di ket, ka Padîşahê Serhedan?

Daîm 'edalet pêşe bû, xayet deqîq endîşe bû
Nazik tebîet şîşe bû, ka Padîşahê Serhadan?

Dîwan û 'edl û dadîgîr, îz'an pirr û roşen zemîr
Hetta xweşîn nakin ji bîr, ka Padîşahê Serhedan?

Dîwan û eywan şanişîn, ew sedr û hewzê nazenîn
Man şubhê firdewsê berîn, ka Padîşahê Serhedan?

Ferşên di dîba û herîr, îstebreqên wî bê nezîr
Bê îxtîyar mayîn ji bîr, ka Padîşahê Serhedan?

Ev xalîyên ermûşê qezz, wernagirin kes şubhê xezz
Xalî bûyîn meydan û rez, ka Padîşahê Serhedan?

Rez bû mîsala cennetê, eywan ji sun'a qudretê
Kes nîne tê ket suhbetê, ka padşahê Serhedan?

Elmas û le'l û gewheran, Tomar û tac û bin perran
Hedd nîne bêxme defteran, ka Padîşahê Serhedan?

Ew şehnişîn û hewz û av, nêçîrgehê pirr seyd û rav
Nabit bibêjim ez bi nav, ka Padîşahê Serhedan?

Şahînşehê gerden firaz, aza kirin Teyhûn û qaz
Terxan kirin Teyxûn û Baz, ka Padîşahê Serhedan?

Mîrê Me wa nabit suwar, têr bûya ew naçit şikar
Teyxûn û Terlan man li xwar, ka Padîşahê serhedan?

Serdarîya koma gelek naket suwarê çav belek
Çavet spî bin ey Felek! Ka Padîşahê Serhedan?

Taq û Rewaq û menzeran,koşk û kelat û xeyberan
Wan cumle nîşan Heyderan, ka Padîşahê Serhedan?

Ew cumle, wî îcad kirin, her çend qewî bunyad kirin
Çerxê, hejand berbad kirin, ka Padîşahê Serhedan?

Xwahê Kelatan bê zefer, dijmin ji ber wî bê meferr
Wê çûye nêva ax û ber, ka Padîşahê Serhedan?

Dunya di borîtin bi dor, ûmrê 'ezîz nadin bi zor
Dewlet di bên: Naçîte gor, ka Padîşahê Serhedan?

Yareb hebit ocax qedîm, emmên di wî xweş bin emîm
Bilxasse ew durra yetîm, ka Padîşahê Serhedan?

Durdanyê gewher sedef, ew ma ji wî neslê xelef
Ya Reb nekî wan zû telef, ka Padîşahê Serhedan?

Xanî! Tu jî, destan hilîn, Her çend ku zêde dil kulîn
Îro ji mîrê sailîn, ka Padîşahê Serhedan?

******

Em jî di bên : Xanî mîsal, kanê hem û dost û heval
Ka tac û text û mulk û mal, ka Padîşahê Serhedan

Ka mîrek û xan û xwe dan, ka çadir û konê vedan
Zozanê Qardox û Medan, ka Padîşahê Serhedan?

Kanê welat, kanê welat, ser kanîya avul heyat
Ka Xizrê azadî ne hat, ka Padîşahê Serhedan?

.....

Kanê Mûhemmed beg gelo? Ka Padîşahê Serhedan?
Îro ji dil bigrîn dilo! Ka Padîşahê Serhedan?

Îro bi bînin îbretê, axa û xelqê hêşetê
Kanê xwedanê xîretê, ka Padîşahê Serhedan?

Mîrê di nêv mîran bi nav, eşheb suwarê rim zirav
Bala bilindê perr belav, ka Padîşahê Serhedan?

Kî, dî we reng zatek şerîf,erkan û ezmanek letîf
Alem didest wî bû zeîf, ka Padîşahê Serhedan?

Koma Dimil bû sê hezar, sed Mîrekan vêkra du car
Jêk rakirin,kir tar û mar, ka Padîşahê Serhedan?

Senceq ji ser qemmê birrî, Bitlîsîya wan jê kirî
Xanê Dimil ker bû, çirrî, ka padişahê Serhedan?

Kanê ezîzê Misrîyan, kanê edûwwê Wanîyan
Kan hevrikê Mahmûdîyan, ka Padîşahê Serhedan?

Kanê emîrê namîdar, serhed nişînê xundekar
Paşan ji bo pêşkêş hinar, ka Padîşahê serhedan?

ME'NA BÊJEYAN:
Ka, kanê: Ka li kuye (hani nerede)
Serhed: Tixûb, sînor
Padîşahê serhedan: (Serhet diyarları Padişahı)
Ji dil: Bi dil û can, ji hundirê xwe da (içten)
Dilo: Ey dil (ey gönül)
Îbret: Tiştê ku merif jê ders û îbret digire (ibret alınacak şey)
Hêşet: Meîyyet, şûrkêş û piştevan û hemnişîn û berbîn û dost û xizm û xizmetkar. (Mahiyetindeki ve beraberindeki olanlar)
Eşheb: Hespê bozê jîr (boz renkli at)
Rim: (mızrak)
Bala: Bejin (kamet boy)
Bulend: Bilind (yüksek)
Perr belav: Bask belav bûyî, bi tirs û xof û heybet (ihtişamlı)

We reng: Bi vî rengî,wihakî (böylece,öylece)
Zatek şerîf: Şexsîyetekî pîroz (bir şerefli şahsiyet)
Mirek: Mîr,reîs (emir,başkan)
Erkan: (c.Rukn) Hîm, perçe (temel, organlar)
Ezman: Zar û ziman (dil)
Erkan û ezmanek letîf: Xweyê beden û zar û zimanekî letîf û xweş (dili ve diğer vucud organları, letif ve zarif olan)
Koma Dimil: Koma 'eşîra Dumilan, dumbilan (dumilan aşireti topluluğu)
Sed mîrekan: Bi sedan mîrek û fermandarên wan (yüzlerce yöneticileri)
Jêk rakirin: Ji hev bela-wela kirin (dağıttılar,tarumar ettiler, öyle anlaşılıyorki Bazîdlî Mehmed beg ile Dimilan aşireti bey ve hanları arasında üç defa savaş çıkmıştır,her defasında da Mehmed bey, onları bozguna uğratıp tar u mar etmîştir.)
Senceq: Direfş, dawer, ala leşkerî (sancak)
Qemme: Qimme (iki tarafı keskin, ucu sivri olan bıçak)
Senceq ji ser Qemmê birrî: Qimma wî, senceqê ji ser wan birrî, senceqa wan bi qimma xwe birrî, ji serê wan da anî xwarê. Bidlîsîyan jî jê rakir. (Kaması başlarındaki Sancaşı kesti, Bitlis mamulu olan özel serpoşlarınıda kaldırdı,yırtıp attı.)
Bidlîsî: Malê bajarê Bidlîsê (Bitlis mamulu)
Xanê dimil: Xan nişîna Dimilî (Dimbilî) ku girêdayê bi hukûmeta Tewrêza Îranê va bûye. (İran ın Tebriz hukumetine bağlı Dimilan hanlığı)
Ezîzê Misrîyan: Ewê ku wek ezîz û mezinê Misrîyan 'ezîz û mezin bûye(Mısırlıların azizi gibi oaln)
'Edûwwê Wanîyan: Dijminê hêzê Wanîyan (Vanlıların düşmanı)
Hevrik: Dij (muhalıf, karşı olan)
Hevrikê Mehmûdîyan: Dij û Muxalifê Mehmûdîyên Ferman bi destên Kela Xwoşabê ku Navbera wan û Mehmed begê tune bûye û dijê hev bûne. (Bazidli Mehmed beg ile araları bozuk olan Van ın doğusundaki Xoşab Kalesi Mahmudileri)
Serhed nişîn: Rûniştîyê serhedê (serhedde ikamet eden)
Xundekar: Ferman bi dest, Hukumdar (hükümdar)
Paşa ji bo bexşîş Hinar: Yê ku Padîşahan ji bo wî, pêşkêş û xerac û bexşîş di şandin (Padişahların kendisine bahşiş gönderdikleri ve harac verdikleri kişi)

******

Kanê emîrê zî funûn, ka aqilê teb'et cunûn
Alem li ber wî bûn zebûn, ka padîşahê Serhedan?

Çend mîr û hakim rakirin, çend xan û sultan da kirin
Kom û heşem ber Ba kirin, ka padişahê Serhedan?

Ew hakimê pirr nav û deng, hem teb'etê Teymûrê leng
De'wa dikir biçye Frenk, ka Padîşahê Serhedan?

Pêla ku wî dîwan di girt, xelqê edeb erkan di girt
Heybet ji wan dîwan di girt, ka Padîşahê Serhedan?

Wextê bi ser hespê diket, şeş caniban rev pê di ket
Heybet bi ser xelqê di ket, ka Padîşahê Serhedan?

Daîm 'edalet pêşe bû, xayet deqîq endîşe bû
Nazik tebîet şîşe bû, ka Padîşahê Serhadan?

Dîwan û 'edl û dadîgîr, îz'an pirr û roşen zemîr
Hetta xweşîn nakin ji bîr, ka Padîşahê Serhedan?

Dîwan û eywan şanişîn, ew sedr û hewzê nazenîn
Man şubhê firdewsê berîn, ka Padîşahê Serhedan?

Ferşên di dîba û herîr, îstebreqên wî bê nezîr
Bê îxtîyar mayîn ji bîr, ka Padîşahê Serhedan?

ME'NA BÊJE Û BIWÊJAN:
Zî funûn: Xweyê cûrên şarezatî û zanistîyê (fen ve sanatlar sahıbi)
Teb'et cunûn: Xû dîn (deli huylu)
Zebûn: Jar û lawaz (zayıf)
Çend: (nice)
Da kirin: Berjêr anîn (aşağı indirdiler, alçalttılar)
Kom: (cemaatler)
Heşem: (mahiyet ve etraf)
Ber Ba kirin: Berba û Perişan kır (berbad ve perişan etti)

Hem teb'etê Teymûrê leng: Hem xûyê Teymûrê leng (huyu ve tabiatı Cengiz han torunu Topal Timur (1336-1405 M.) e benzeyen)
De'wa dikir biçye Frenk: De'wa dikir ku hetta Frengistanê, hetta Ewrûpayê here (Frengistana gitmeği, istila etmeği istiyen)
Pêla ku wî dîwan digirt: Dema ku ewî meclis digirt,civat dikir (Divan tuttuğu zaman)
Xelqê edeb erkan di girt: Xelqê bi edeb cîyên xwe digirtin, bi rêz û bi terbîye rûdiniştin. (halk yerini alıp edeble otururlardı.)
Heybet: Tirs, (korku ve azamet)
Bi ser hespê di ket: Ku li hespê xwe suwar dibû (atına bindiğinde)
Şeş caniban rev pê di ket: rev bi şeş alîyan di ket: Rast û çep û Pêş û paş û jêr û jor (altı taraftan kaçışmalar olurdu)
'Edalet pêşe: Dadîkar (adaletli)
Xayet deqîq endîşe bû: Pirr hûr û zirav bîr bû (çok ince düşünceli idi)
Nazik: Nazenîn (nazik,kibar)
Tebîet şîşe: Siroşt şûşe (cam tabiatlı, parlak)
Dîwan û 'edl û dadigîr: (Divanı ve adaleti tutan, adaleti tahakkuk ettiren)
Îz'an pirr û roşenzemîr: Fikr û îz'ana wî pirr bû, ronî derûn bû (çok iz'anlı, aydın vicdanlı)
Hetta xweşîn: Hetta ku em sax bin (yaşadığımız müddetçe)
Nakin ji bîr: Ji bîra nakin (unutamayız)
Eywan û şanişîn: (Salon ve şah tahtı)
Sedr: Sekû
Man şubhê Firdewsê berîn: Wekî bihişta pirr bi rûmet û wala, jê da man (yüce cennet makamları gibi olan o değerler, ondan geri kaldılar)
Ferş: Raxistok: (sergi,mefruşat)
Dîba: Cûrekî qumaşê ji hevirmûşê qalinde (bir nev'i kıymetli kalın ipek kumaş)
Herîr: Hevirmûş (ipek)
Îstebreq: Dîbaya qalind,hevirmûşê zêrr kêş (altın yaldızlı bir nev'i ipek kumaşı)
Bê nezîr: Bê mînak (emsalsız)
Bê îxtîyar mayîn ji bîr: Bê şî ji bîr bûne, (elimizde olmayarak unutulup kalmışlar)

******

Ev xalîyên ermûşê qezz, wernagirin kes şubhê xezz
Xalî bûyîn meydan û rez, ka Padîşahê Serhedan?

Rez bû mîsala cennetê, eywan ji sun'a qudretê
Kes nîne tê ket suhbetê, ka padşahê Serhedan?

Elmas û le'l û gewheran, Tomar û tac û bin perran
Hedd nîne bêxme defteran, ka Padîşahê Serhedan?

Ew şehnişîn û hewz û av, nêçîrgehê pirr seyd û rav
Nabit bibêjim ez bi nav, ka Padîşahê Serhedan?

Şahînşehê gerden firaz, aza kirin Teyhûn û qaz
Terxan kirin Teyxûn û Baz, ka Padîşahê Serhedan?

Mîrê Me wa nabit suwar, têr bûye ew naçit şikar
Teyxûn û Terlan man li xwar, ka Padîşahê serhedan?

Serdarîya koma gelek naket suwarê çav belek
Çavet spî bin ey Felek! Ka Padîşahê Serhedan?

Taq û Rewaq û menzeran, koşk û kelat û xeyberan
Wan cumle nîşan heyderan, ka Padîşahê Serhedan?

Ew cumle,wî îcad kirin, her çend qewî bunyad kirin
Çerxê,hejand berbad kirin, ka Padîşahê Serhedan?

Xwahê Kelatan bê zefer, ijmin ji ber wî bê meferr
Wê çûye nêva ax û ber, a Padîşahê Serhedan?

ME'NA BÊJE Û BIWÊJAN:
Xalî: Xalîçe. (halı)
Qezz: Kurmik û toximê hevirmûş. (ipek böceği, ipek kozası)

Xezz: Cûrekî hevirmûşê wekî pûrta kêvrûşkan nermik e. (tavşan tüyü gibi bir nevi ipek)
Wernagerit: Kes idî, ne wan qumaşê hevirmûş, ne jî wan xalîyan, wernagirin, bi kar naynin. (Artık o kiymetli ipek elbiseler ve halıları kullanmaz oldular)
Rez: Baxê tirîya (üzüm bahçesi)
Mîsala cennetê: Wekî bihîştê (cennet gibi)
Sun'a qudretê : Kirê qudreta Xwedê (Allah'ın kudretının sanatı)
Kes nîne têket suhbetê: Kes nîne ku di wanda suhbet bike (onlarda sohbet edecek olan yok)
Le'l: Kevirekî sorê pirr bi qîmete (kiymetli kırmızı bir madeni taştır)
Tomar: Lûle, lihevpêç, (burma)
Bin perr: Binpel û binperrikê ku ji pelikên me'denî, we yan ji perrikên teyrê tawis in, ji boy zînet û xemlê li ser serpoş û tac û efseran tînin, bi wan dineqişînin. (madeni yapraklardan veya tavus kuşu tüylerinden süs)
Hed nîne bixme defteran: Hedd û hesabê wan nîne ku heya ez bi karibim bixim defteran (hed ve hesablari yoktur ki defterlere sığdırayım)
Şehnişîn: Cîyên rûniştandina şah û padîşahan (şahlara mahsus oturak, koltuk, taht)
Nêçîrgeh: (avlama yeri)
Seyd: Nêçîr kirin (avlamak)
Rav: Nêçîr, seyra nêçîrvanîyê (av, avcilik keyfi)
Şahînşeh: Şahê şaha (şahlar şahı)
Gerden firaz: Gerden bilind (yüksek gerdenli)
Teyhûn: Teyhû, teyrekî xweşik e. (bir güzel kuş)
Terxan kirin: serbest berdan (serbest ettiler)
Teyxûn û Baz: şahîn û Bazî (şahin ile doğan kuşu)
Va: Vanê (işte)
Têr bûye: (doymuş)
Naçit şikar: Naçe nêçîrê (ava gitmiyor)
Terlan: Cûrekî teyrê nêçîrêyê bi quwwet û mezine (bir nev'i kuvvetli av kuşu)

Man li xwar: Mane li jêr, bê xweyê mane (aşağıda sahibsız kalmışlar)

Serdarîya koma gelek, naket suwarê çav belek: ev gelek dem e, muddetekî dirêj e ku ew çelenk suwarê çav belek, seroktîya kom û cemaatan nake. (uzun bir süreden beri o sürmeli gözlü suvari toplulukların başkanlığını artık yapmıyor)

Çavet sipî bit ey felek: Ey feleka xaîn, çavên te sipî bin, kor bibin! (gözün kor ola felek)

Taq: Kember, avayên bi kember, konwarî (kemer, kavs, kemberli bina)

Rewaq: Poxan,(salon)

Menzer: Berçavîk (manzara)

Koşk: (kasır)

Kelat: Kele, qeleyên dor bi sûr (kaleler)

Xeyber: Qeleyên wek qela Xeyberêya cuhûyan ku di sala (626 M.) da, Musulmanan hêrîşê ser wî kirin û girtin (hayber kalesi gibi sağlam kaleler)

Wan cumle: Ew tev (onların hepsi)

Nîşan heyderan: Nîşanê heyderanî, yên ku nîşanên wan wekî yên Heyder in (yê Hz. Alî nin) (Haydar olan Hz. Ali'nin nişanini taşıyan, Onun fethettiği Hayber kalesine benzeyen)

Ew cumle wî îcad kirin: Çerxa felekê, hemû wan Taq û Rewaq û koşk û xeyberanên ku ewî îcad kirin, pirr bi quwwet çê kirin hejand û berbad kirin. (her ne kadar O bütün bunları çok saşlam bir şekilde yaptıysada, çarhı felek hepsini sarstı ve berbat etti.)

Xwahê kelatan bê zefer: Kesên ku xweyên kelane di hember wî da bê zefer mane, dijminê wî ji ber wî bê meferr (bê cîyên revê) mane; ew zata çûye nav xwelî û keviran (ketîye gorê) (kaleler sahibinin onun karşısında başarısız kaldıkları ve düşmanın ondan kaçacak yer bulamadıkları o kahraman, (Mehmed beg) işte şimdi taş ve toprağın altına girdi.

******

Dunya di borîtin bi dor, ûmrê ezîz nadin bi zor
Dewlet di bên: Naçîte gor, ka Padîşahê Serhedan?

Yareb hebit ocax qedîm, 'emmên di wî, xweşbin 'emîm
Bilxasse ew durra yetîm, ka Padîşahê Serhedan?

Durdaneyê gewher sedef, ew ma ji wî neslê xelef
Ya Reb nekî wan zû telef, ka Padîşahê Serhedan?

Xanî! Tu jî, destan hilîn, her çend ku zêde dil kulîn
Îro ji mîrê sailîn, ka Padîşahê Serhedan?
.....

Em jî di bên : Xanî mîsal, kanê hem û dost û heval
Ka tac û text û mulk û mal, ka Padîşahê Serhedan

Ka mîrek û xan û xwe dan,ka çadir û konê vedan
Zozanê Qardox û Medan, ka Padîşahê Serhedan?

Kanê welat, kanê welat,ser kanîya avul heyat
Ka Xizrê azadî ne hat, ka Padîşahê Serhedan?(*)

ME'NA BÊJE Û BIWÊJAN:
Dunya di borîtin bi dor: Dunya bi dor e, ne bi zor e, temenê ezîz û giranbiha jî, bi zor nadin. (ew jî bi dor e ne bi zor e) dê bê guman Mehmed beg jî bimire û mal û serweta wî jê bimîne, gotinekî pêşîyan heye, dibêjin ku: Dewlet û serweta merif, bi merif ra naçe gorê. (Dünya sırayladır, zorla değildir, hiç kimse zorla aziz ve kıymetli olan ömrü ve hayatı veremez. Bir ata sözüdür diyorlar ki "devlet ve zenginlik insanla mezara gitmez. Mehmet bey de bu kurala tabidir.")
Ocax: tifîk, tendûr, kuçik (bi mecazî: Xan û malbat)
Yareb hebit ocax qedîm: Ya Rebbî! Ocax û malbata wî daîmî be (ocağı kadim olsun)
'Emmên di wî: Apên di wî (amcaları)
Xweşbin: Sax bin (yaşasınlar)
'Emîm: Tev, hemî (hepsi)

Bîlxasse: Bi taybetî (özellikle)
Ew durra yetîm: Ew durrê yektayê bi tenê (o benzersiz inci)
Durdaneyê gewher sedef: Ew lawê Mehmed begê ku wekî libikên încîyanê di qutîka gewheran da ne (o sedefi gevher olan inci danesi, Mehmed begın oğlu)
Ew ma ji wî neslê xelef: Ji nesla Mehmed begê,ew lawê wîyê wekî libikên încîyan, canişîn maye. (sülaleden, Mehmed beğin yerine, geride inci danesi gibi oğlu kalmıştır.)
Yareb nekî wan zû telef: Ya rabbî Tu wan ap û lawê wî, zû ne kujî (Ey Rabbim sen onları erkenden öldürme.)
Destan hilîn: Destê xwe hilde û dûa bike. (ellerini kaldırıp dua et)
Herçend: Her çiqas (her ne kadar)
Zêde dil kulîn: Pirr dil bi kulin jî (gönlümüz çok yaralıdırda)
Îro ji mîrê sailîn: Em îro ji mîrê mezin (ji Xwedê) di xwazin ku rehmeta xwe li Mehmed begê bi ke, 'emrê kurrê wî û apên wî dirêj bike... Amîn! (Em jî ji Xwedê nîyaz dikin ku ew rûhê Xanî şa bike, meqamê wî e'la bike, me jî ji cewr û zulma dijminan aza bike... Amîn!) (Bugün Allah tan dileğimiz şudurki; O Mehmed beye rahmet, sulalesine de uzun ömürler versin)

(*) Ev hersê helbeste, ji gufteyên **Durre** ne

FERHENGOKA DÎWANA EHMEDÊ XANÎ

(A)

Acnî (agnî): Di baweriyên Hindûîyên kevin da, navê Xwedayê agir e. Ku Cînna 'ereban jî, ji wî ye. Kurdên serhedê jî, ji Cinnan ra dibêjin "Ecinî". Ji xwe di bawriya Îslamê da jî, **Cin**: cûrekî mexlûqên bin perdeyên ji agir in. (tebîet agir in). Ku hinek kesan jî gotine; Cinnên Suleyman Pêxember jî, "cûnikî" yên pispor û jêhatî bûne (cûnikî qebîlekî kurdaye). Dibe ku wilo be jî!

Ahoramezda: Xaliqê mezin ê zana, ku **Ahora** bi me'na xaliqê rûh û heyatê, kiyan û jiyanê ye, **Mezda** (mehzada) jî, bi me'na mezin û zana ye. (meh- mezin, zeda, zana) Ku li nik Zerdeştiyan Ahoramezda, Mûcidê heyatê ye, ne berçave, bi tenê ye, bê hemta û mezin û zana ye, xaliqê mûtleqê teva ye.

'Alem: Cîhan, hemî kaînat (bütün dünya, herşey)

'Alemî esxer: Cîhana herî piçûk, însan (en küçük alem. insan)

'Alemî ekber: 'Alema herî mezin, kaînat (en büyük dünya, kainat

'Amel: Kir û kar, xebat. (İş, iş yapmak, çalışmak)

'Amelê salih: Kir û karên bi kêr û bêrên ferdî û civakî (Yararlı iş, ferde ve topluma yararlı olan hertürlü iş ve davranışlar)

Angor, ligor, angore: Nîsbet, bi angorî wî (göre, diğerlerine göre)

Anî: Navê bajarekî kevnê kurd û filla ye, li devê çemê **Arpaçayê**, li Tixûbê **Qers** û **Erîvanê** ye, demekî dirêj di destê hukûmeta **Benî Şeddadîya** kurdî (951-1075 m.) da bûye;

Textipayê Bagratîyanê sulala Sisêyanê Ermenistanê bûye. Niha, xirabeyê wê, cîhekî tûrîstîkî ye, nêzîkê gundê **'Elemê** ya **Dîgorê** ye.

Arî: 'Esîl, 'esîlzade

Ariyanî, Hindû-ewrûpayî: (li Kurdê mêzekin.)

'Erş: Ban, Text (Tavan, Taht)

'Erşê Xweda: Textê Seltenet û Hukûmranîya Xweda; hemî Kaînat, ('alema xeyb û şehadetê, mulk û melekutê, madde û me'na yê). Ku hemî li ser hev, mezher û tecellîgaha navên Wî yên **Ez-Zahir**, **El-Batin**, **El-ewwel** û **El-Axir** e, 'Erşê Selteneta Wî ya pîroz jî ew e. "وكان عرشه على الماء" Yanê: Di destpêkê da textê selteneta Wî, li ser avê, li ser madda ewwelîn, li ser madda **Ethîr**, li ser **Heyûla** yê bû; "سقف الجنة عرش الرحمن" = Banê Bihiştê, 'Erşê Xweda yê dilovan e, banê 'alema xeybê, 'Erşê seltetneta wî ye,; ku bi kurtî

hemî cûrên 'alemê li ser hev 'Erşê Xweda ye. (Arş: Zahir, Batin, Evvel, Ahir isimlerinin halita ve karışığıdır, Allahın görünen ve görünmeyen, ilk ve son olan isimlerinin karışığı ve hep birden olanıdır, mecmuasidir.)

B:

Bakîre: Dûşîze, xama, keçîn (kiz- el sürülmemiş)

Bakûre: Nûber, ber û, fêkiyê nû, nûrûste (turfanda)

Bazî: Lîstin, lîstek, teyrê bazî (oyun, bazî kuşu)

Belaxet: Hunerê xweş peyvandinê, duristaxaftinê; peyvandin û axiftina bi angorî îcaba halê, di Cîhê wî da (tam yerinde, icap ettiği gibi, düzgün ve güzel söz söyleme sanatı)

Belîx: Yê xewş bêj û xweşpeyv, xweyê belaxetê (Beleğatlı)

Belîxane: Bi belixî, bi xweşpeyvî, xweşgoyî (Beliğcesine düzgün ve fesih olarak)

Bê 'hemdî: Bê xwestin, bê vayîn, bê şî, bê îrade (isteksiz ve irdesiz)

Beşeriyyet: Suroşt û xilqet û fitreta însan (İnsan tabiatı ve fıtratı-yaradılışı)

Beynelmîlel: Di nav hemî milletanda (uluslararasi, international)

Beyyînat: (c. beyyîne) Delîl û belge yên îyanî, eşkera (açık delil ve burhanlar)

Bezm: Meclisa suhbet û îş û noşê, 'îşq û mehebbetê (sohbet, yiyip içmek yeri)

Bezma Elest: Meclisa Rûhaniya Ezelî, ku Xwedê tê da ji rûhan ra gotiye: "ألست بربّكم" = elestû bi Rabbikum" Ma qey ez Rebbê we nînin?- ku Ruhan jî "gotine Belê Tu Rebbê me yî" "قالوا بلى" (Allah ezelde ruhlara "Ben Rabbiniz değilmiyim? diye sorduğunda, Ruhlar "Bela" -evet- "Rabbimizsiniz" diye cevap verdikleri meclis dır ki O'na "Bezm-i elest" diye tabir edilir ve ona "Qalu bela" anı da denir.

Bisk: (Zulf)

Brahman: Bêjeyekî sensikrîtî ye, di 1485.da, ketiye nav zimanê Îngîlîzî, bi me'na "ew heyîyê mûtleqê wala û pîroz" e. Ku alim û feylesofên **"ûpanîşadê"** (yên edebîyata felsefa **wîda** yê), ewî (Brahmanê), di **Brahma** bi me'na Xaliq da, teswîr dikin, Brahma yê jî, yek ji hîmên salûs a (sisêka) **Brahma, Vîşno, Şîva** yê ya pîroz, dibînin û wilo bawerdikin.

Bi angorî baweriya Hindûizmê: Xweda alemê ji Zatê xwe peyda kiriye, mûhafeze dike, paşê jî helak dike; mehû dike, ku Xweda hem xaliq e, (Brehma ye), hem hafîz e, (Fîşno ye) hem jî mûhlîk

e, (Sîva ye), -wek 'eqîda teslîsê ya dînê Îsa- ku mirov dikare bibêje: ew kopya û teqlî da wî teslîsa Hindûîzmê ye. (Hinduizme göre; Allah yaratıcı sîfatı ile "Brahma" dır. Koruyucu sifatı ile **Vişno** dir, yokedici sıfatî ile de **Sîva** dır, ki bu üçlü de birdir, Allah'tır. Hiristiyanlarda da, "Baba oğul ve kudsal Ruh" diye benzer bir üçlüyü, Allah kabul etmişler, vahdet de (birlikte) teslis (üçleme), teslisde de, vahdet vardır demişler. Ki İslama göre bu da batıl bir inaçtır)

Bûdîzm, Bûzîzim: Dîn û mezheb û felsefa Bûda, Bûza (zana û feylesofê Hindî) ye.

Di tarîxa bîr û bawerî û 'îlm û felsefê da, qirna şeşa (6) ya beriya mîladê, qirnekî pirr girîng û bi taybetî ye, ku di wî qirnê da, beşeriyyet ji merhela zarotiyê derbasê bal merheleya xortîtî û tekamulê va bûye; di Hindistanê da, **Mahawîra** (599-527 bm.), damezroxê mezhebê Cînîye, û damezroxê mezhebê Bûdîzmê (**Bûda Gaûtama** 563-483 bm.), di Kurdistan û Îranê da jî, **Zerdeşt** (Zaratûstra-660-683-5 Bm.), di nav Cuhûyan da jî, **Eş'îya**, di Ewrupayê da (Yûnanistan) jî, Puthagoras (588-503 bm.) û **Hêraklleitas** (540-480 bm.) diyar bûne.

Di dema zûhûra Bûdîzmê da, ew hersî rewşên î'tîqadî û felsefî di Hindistanê da hakim bûn:

1- Bawerîya ku mirov bi merasim û ayînên dînî, bi teqdîma qurbanan, dikare te'mîna merxûb û metlûbê (pesende û dilxwazê xwe) bike, bigihije daxwazê.

2- Mûlaheze û tefekkur, bawerîya bi mûweqetîyye ta 'alemê û ezelîyyet û ebedîyyeta **Atman û Brahmanê.** (Rûhê mûtleq û mewcûdê wala).

3- Şekk û tereddûd û înkarî. Ku Bûdîzm di wî demê da, wek mezhebekî îslahî, wek felsefekî exlaqî dertê holê; bi angorê dîtina **Bûda** (Bûza) heyat û jiyan zencîreya cefakêşê û êş û elema ne, divê! ku însan, bi zuhd û teqwayê, bi terka enanîyyet û masûwayê, bi devberdana ji hewesên maddî û nefsanî, bi kir û karên durust, xwe ji tenasuxa ruh (ji zivirrandina wî ya bal bedenekî din va) xilas bike, **Nîrvana** bibe (bikeve Nîrvanayê), bikeve haletê zivirrandina dawiya bal Brahma (bal Xweda) va û

bi Brehman ra bibe yek û bigihîje wî dereceya fanîbûyîn û baqîmayîna mûtleq (ku bi te'bîra tesewwufa Îslamê, navê wî haletê rûhanî, **El-fenaû fil-lah wel-beqaû billah** e), bi zimanê Hindûîzmê jî navê wî, **Întilaq** e. Ku yanê; di demekî herî kurt da, rûh ji huzn û elemên heyat û wucûda maddî, riha dibe û digihîje heyat û jiyana me'newîya daîmî...

Bûdîzimê, gellek ji bawerî û merasim û ayînên Hindûîyên kevnên xurafî, red dike, dîn û felsefekî îctîmaî û reformîst e; di Çîn û Hind-Çîn û Japonya û Qora û Tîbet û Nîpalî da belav bûye, ji hemî dîn û mezheban pirrtir tabi' û peyrewên wî hene.

C :

Cedel: Devjenî, tekoşîn, demeteqî (mücadele etmek, diyalektik)

Cîhad: Cehd û xebat, hewildayîn û têkoşîn- Ku eger mecbûrîyet hebe, cenga çekdarî jî daxil- Cehd û xebat û hewl û têkoşîna ji boy bi destxistin û parêstina mafên însanî -bi taybetî- ji boy azadî û serxwebûnê. (Çabalamak, vargücüyle çalışıp cehd etmek, hakkı ve özgürlüğü hertürlü çarelere –gerekirse silahli mücadelede dahil- başvurarak vargücüyle çalışıp çabalamaktır.)

Cîn (Jen): -Bi me'na derûnpakî û diltemîzî û însanîyet û fezîlet û mehebbet e ye- navê rê û rewişta **Konfuçyûs** e.

Cînîye (Jenîzm, Jaînîzm): Mezheb û ekola feylesofê Hîndî **Mehawîra** (595-527 bm.) ye. Ku Mehawîra li hemberî hewesên nefsanî derketîye, gotîye ku "gîlhîştina bal seadeta rûhî (gihiştina **Nirvana** yê) bi van hersî gewherên nefîs in: "Î'tîqada durust, me'rîfeta heqîqî, rewişta bê kêmasî û pak". **Mehawîra** jî wekî **Bûza**, emîrekî (Prensekî) Hindîyê jîr û jêhatî bû ye, ku herdûyan jî, terka selteneta malbata xwe kirine, bûne Rahib, piştî muddettekî jî, te'lîmatên nû anîne. Wilo dimînin hev ku mirov dibê qeyê te'lîmatên herdûyan, yên yek şexsekîye; Herdû jî, li himberê nîzama ferqa di navbera sinifanda, (nîzama Kasta Hindistanê) û gelek ayînên Rûhbanî yên **Wîda** yê bûne, ferqa di navbera wan da, ev bûye: ku te'lîmatên **Mehawîra,** ji yên **Bûda** hişktir bûne, Mehawîra zêde rahib û nasik bûye. Mehawîra gotîye: ku "xilasî, ne bi ayîn û Qurbana ne, ne jî bi îbadetên pûtperestîne, belkî, bi kir û karên qenc û baş in; divê ku mirov tu cenaweran jî nekuje, zor û te'dayî lê neke, goştên wan nexwe; li tu heşerat û kêzikan jî, ezîyetê neke".

Cisim: Cusse, madde (beden)

Cismanî: Maddî, bedenî (madde ile ilgili)

Cuda: Ciya, Ciyaî, (ayrı, farklı)

Cuz': Perçe (parça)

Cuzî: Parçê piçûçik, ferdekî ji efradên kulliyê (başkasının cüz'ü ve bir küllinin bir ferdi, azıcık olan)

Cûdî: Cûtî, gûtî, gotî (li kurdê mêze bikin !) Çiyayê Cûdî yê ku şeş km. ji **Şirnexê** wê da ye (li rojhilata başûra Şirnexê ye)

Elcûdî: Elcûtî, elgûtî, ewê ku 'aîdê Gûtîyane ('aidê gelê Gûtîye),

cîwar û çiyayê Gûtî (gelê Gûtî, ku pêşiyên Kurda bûne, li der û dorê 2800-2300 berya mîladê, li herêma Zencîre ya Çîyayê **Zagros**ê jiyan e, dewlet û Împaratorîyyet damezirandin e. Ku herêma Zencîra Çiyayê Zagrosê welatê netewî yê wan bûye).
Ku **el-Cûdî**, bi wî me'na û mefhûmê, şamilê hemî çîyayên bilindên herêma **Zagros**ê, tê; her wekî ku **Erarat** jî -bi me'na **ara hilat,** agir hilat, agir raht, Çiyayê **Agir avêj,** volkanîk, we yan jî, çiyayê agir raht bûyî, agir vemirî, volkanîkîyê vemirî- şamilê hemî çîyayên volkanîkên vemiriyên herêma **Zagros**ê tê. Ku bi vî î'tîbarê jî, di navbera te'bira Tewratê (Erarat) û te'bîra Qur'anê (El-Cûdî) da, tu tezad û dijhevitî û mûxalefet namîne û tune ye; herdû te'bîr, yek tiştekî -bi du î'tîbaran- îfade dikin, ku ew jî, çiyayê gelê Gotîyê agir avêje, we yan, agir vemirîyê volkanîke. (yek ji Çiyayên Zincîreya Zagrosê ye). Qur'anê, wî **Erarata** ku di Tewratê da derbas dibe, bi **El Cûdî** -ya ku bi me'na cî û çiyayê gelê Gotîye- îfade û şirove kirîye; di cîhek din da jî herêma El-Cûdîyê, mûbarek û pîroz hesibandîye, (El-Mû'mînûn/26).
Ku bi vî î'tîbarê jî, Kurdistan bi nessa **Qur'anê**, bi gotina **Xwedê**· ciyekî mûbarek û pîroz e, mûbarek hatiye çêkirin û nerxandin.

Welat hûbba xwe îman e, Mûhemmed Mûstefa gotî
Şewat jê da : dil û can e, mûbarek tê, Xweda gotî

- Durre -

Ji xwe, bi angorî vê rîwayetê jî: "Çemê Firatê yek ji çemên Cennetê ye", Kurdistan cennet û bihişte jîl; yanê : Cennet û bihîşta ku Adem Pêxember -tê da bûye û jê jêda hatîye avêtin- ew bûye û ew bi xwe ye.

Ey weten ! Ez bi te kim ! Cenetê e'layî me yî !
Sed xweli em li xwe kin ! Ger li te em nebne xweyî

- Durre -

Ç :
Çeleng: şeng, xweşik, (yakışıklı, ihtişamlı, çevik)

D :

Derece: Pele, rutbe, (yukarıya çıkacak basamak, dairenin 360 bölümünden herbiri)

Derûn: Hundur, nav, daxil, 'alema melekût (iç taraf, dahil)

Derûnî: Hundurî, ji hundir, ji dil, nefsanî (içtan, gönülden)

Desatîr: Navê kitêba pîroza "**Mehabad pêxember e**" (Îran eski büyük peygamberlerinden Mehabad peygamberin kutsal kitabınîn adıdır.)

Destûr: (dustûr) qanûn, emir,îzin (kanun, izin)

Deymûmiyyet: Dewamîtî, timîtî (devamlılık, daimiyet)

Dirr: Şerrûd, bed, beter (azgın, kavgacı, yırtıcı)

Dirrik: Kelem û strîyên tûj û girift, (Büğürtlen)

Dîn: Ol, kêş, ayîn.

Dîn: xerîze û fitret û siroştekî muşterek e di navbera hemî cins û cûrên însanan da, bawerî û îtaet e, nîzam û qanûn e, rewş û rewişta însanî û exlaqî ye; bi angorê bawerîya Qur'anê: dînê Îslamê dînekî cîhanşumûl e, dînê hemî alemê ye, ne yê muslumanan bitenê ye, hetta ne yê însanan bitenê ye jî, belkî yê hemî cûrên alemê ye, siroşt û fitret e, qîst û 'edalet e, weset û rehmet e, ne îfart û tefrît e, ne jî zor û zehmet e, 'eql û îlm û hîkmet e, nîzam û qanûna kewnî û tekwînî ye; ku lewra jî dînê hemî 'alemê ye. Di vê xusûsê da, tişta herî muhimm û girîng jî ev e ku : em qenc bizanin û rind fêm bikin ku em ne ji boy dîn in, (dîn ne barê pişta me ye), belkî dîn ji boy me ye, ji boy xizmet û seadet û bextîyarbûyîna me ye. (din yaratıcı kuvvet ve kudrete boyun eğmektir, bütün insanlarîn müşterek garizesi, yaradılışı ve fıtratıdır. Hakk ve adalettir, ifrat ve tefrit uçlardan, aşırılıklardan uzak bir vasat ve doğru istikamettir, akıl ve ilim yoludur, akla ve ilme uymayan, ters düşen herhangi bir şeyle ilgisi yoktur. Ondan dolayıdır ve o nedenledir ki Îslam dini evrenseldir, bütün kainatı kucaklar, herkesin ve her devrin dinidir, yalnız müslümanların ve hatta yalnız insanların dini değildir, belki bütün alemlerin dinidir ve bütün alemlere rahmettir. Bugüm müslüman geçinenlerin anlattıkları ve anladıkları gibi, kof ve içi boşaltılmış ayinler, merasimler ve alışkanlıklar mecmuası değildir. Önemlisi de şudur ki, din bizim içindir, bizim hizmetimiz içindir. Biz onun için

değiliz. Doğrusu, bu çok önemli bir husustur. Bunu çok iyice kavramalî ve bilmeliyiz, aksi halde din fonksiyonsuz bir unsur ve zararlı bir tabu haline gelir ki bu itibarla da, kardan ziyade zararî olur. Toplumu kemirir, geri bırakır. Oysaki dinin asıl fonksiyonu topluma hizmettir.

Kısacası: Din hayat ve yaşam içindir, yaşam din için değildir. Îslam dini heyat ve heyatte olanlarîn dinidir, ölülerin dini değildir.)

Dîyalektîk: Huner û sen'etê peyvandinê, peyvandina bi ûslûb û terzê cedelîyê ku pê li heqîqetê tê gerrandin, pê heqîqet dertê meydanê (karşılıklı konuşmada tartışmak suretiyle, hakikati arama ve ortaya çıkarma sanatıdır, **Hegel**'in felsefesinde ise, düşüncenin değişerek gelişimi anlamınadır. **Zenon** felsefesinde ise, karşılıklı konuşmak suretiyle sonuç çıkarmayı ifade etmektedir.)

Durif, dirif, dirov: Nîşan, nîşana ku tiştekî ji tiştê dinê diqetîne ('alametî farika, damga, mark)

Dunyewî: Tiştên dunyayê, tiştên ku peywendiyên wan bi dunyayê va hene (dünya ile ilgili, dünyaya ait)

E:

'Edem: Tuneyî, tunetî (yokluk, olmamak)

Ehrîmen, Ehrumen: Rêber û mûsebbibê neqencîyê, mûmessîlê şerr û tarîtîyê, Îblîs.

Ekol: (Ecole): Mekteb û medresa fikrîye, terz û meslek û suxteyên ustadekî (fikir üzerinde işleyen bir nevi mekteb, bir ustadın talebeleri, mesleği, tarzı)

'Eks, 'Ekis: Dij û zidd, ji para vegerandina dengan û nûrê (aksis-seda)

'Ekisbûyîn, ekiskirin: Ji para zivirrîna deng û ronahîyê. Wek 'eksa sûretê tiştekî ji neynikê da (ses ve ışığın parlak bir cisim üzerinden geri gelmesi, aksetmesi, aksi-seda)

Ekwan: (c.kewn) Bûyîn, heyîn, bûyî, heyî (oluş varlık, varolma, kainat)

'Elewî: Alewî, alavî, diyanet û mezhebê 'elewî. Her çiqas ku 'elewî, bi me'na "kesên li ser mezhebê elewî û mezhebê Elî-îlahî û qizilbaş û çarekan" tê bi kar anîn, lê di heqîqet da, 'elewî ji kelîma **Alavê** ya kurdî ye, bi me'na lav û pêta agir e. ku Tirkan jî, navê Alevîtî yê ji wî girtine.

'Elewîtî: Yek ji dîyanet û bîr û bawerîyên herî kevn û qedîmên Kurdistanê ye, serê wî digihîje mîtraîzmê (dîyanet û bawerîya mîtra), ku mîtra, di zarava pehlewî da, "**mihr**" a zarava persî ye û bi me'na roj e.

Di Mîtraîzmê da, mîtra (mihir) sembol û nîşana Xweda û îlahê nûrê ye. Ku di heqîqet da : tu peywendîyên elewîtîyê, ne şî'îyan va, bi Çarek ên bi me'na şeîyên îmamîyye (şeîyên ku xelîfetî ya Hz. 'Elî û yanzdeh xelîfeyên dinên ku ji nesla 'Elî û Hesen û Hüseyîn in, qebul dikin, xelîfetî ya Hz. 'Ûmer û Ebubekir û Osman jî qebul nakin), va, tuneye. Lê mixabin! sîyaseta barbar û faşîstên Tirkên osmanî û şîeyên Sefewîyên Îranî û kemalîstên xûnxwar û gemar, -çawan ku her tiştî berova jî û berbat û perîşan kirine, wisan jî- 'Elewîtî û şî'îtî û çarekîtî û qizilbaşîtî yê jî, tehrîf û texyîr û teşwîş, kirine, bi angorî siyaseta xwe ya gennî û gemar rengdêr û zengarî kirine, bi angorî kêf û hewes û politika xwe ya çewt û şaş bi rê va birine.

Ku ji xwe, ji sedî nod û nehên (%99) 'elewîyên Tirkîya yên îro, ne

'elewîyên heqîqî ne; ne mîtraî ne, ne şîî ne, ne jî îmamî ne, belkî kemalîstên bê mêjî ne, lîstokên wê rejîma faşîsta bê dîn û bê bawerî ne, haya wan ji wan jî nîne; gerçî di nav wan da, zîrek û hişyar û zana û aşînayên heqîqetê jî hene, rastî yê jî dizanin. Lê melesef! ew jî bê deng û bê seda, bê sahib û bê xwedî mane. (Meselekî Kurdan heye, dibêje ku: "hem ji Dêrê bûye, hem jî ji Mizgeftê!", ku ew jî, hem ji 'Elewîtî ya heqîqî, hem jî ji mezhebê şî'î û Caferî û Îmamî, dûr û cûda ne; di pencên Kemalîstên gemar da, di destên Pîr û kurêçên xwe yên sextekar û yobaz da, bê çare û bê hewar, belengaz û stûxwar mane. Wek pirrên ji Kurdên sunnî jî, ku di destên Şêx û Seyyîd û Se-îtên xwe yên yobaz û sextekar da, belengaz û bê hiş û xizan û nezan mane.

'Elî Îlahî: 'Ehlê heqq, yek ji mezheb û bîr û bawerî yên dînên Sensikrîtî yên kevnên Kurdistanê ye, ku peyrewên wî, ji xwe ra dibêjin : "'Ehlê heqq". Yanê: mirovên Xwedê (yezdanî), jê ra "Kakaî" jî dibêjin, bawerê bi "Hûlûlê" ne; dibêjin ku Xweda ketîye pirr sûretan (di pirr sûretan da hulûl kirîye), li pey hev di heft sûretan da xûya bûye, heta ku di dawîda ketîye bedena Hz. **'Elî**, di sûretê wî da xûya bûye.

Hemî kitêbên pîrozên Ehlê heqq û Kakaî yan (wek **Çihar melek** û **Dewreyê Behlûl** û **Defterê Pîr Dîwerî** û yên din)bi zimanê Kurdî ne. Mezhebê 'Ehlê heqq û Kakaîzmê, di rojava û başûra Kurdistanê. (Kirmanşah û Pawe û Horaman û Kerkûk) ê da, belav bûne. Îro jî di rewacê da ne; mirov bi hesayî dikare bibêje: Ku mezhebê 'Ehlê Heqq, serkanîya bîr û bawerî û mezhebê 'Elewî yên Kurdistanê û yên Anedolê yên îro ye; di pirr qaliban ra, di pirr destan ra derbas bûye, hatîye gûheztin û tehrîf kirin, ketîye şekl û sûretên îro, bi gemarî ya Kemalîzmê lewitî ye û berbat bûye.

'En'enewî: Ji pêşîyanda, ji bav û kalanda, (klasiki)

Esma: (c.îsîm) Nav (isimler)

Esna: (c. sennî) Navber, di nav da (ara, aralık, an, zaman)

Ezcumle: Ji nav tevî, ji hemî, hinek ji tevî, ji hemîyan hinek (bu cümleden)

Ê

Êzdî: (Îzedî, ezdî, yezdanî), tabî û peyrewên dînê Îzid, dînê Yezdan in. (Li Yezdan û Zerdeştê mêze bikin), Kurd û Kurdîstanî yên heqîqî ne, **mishefa** reş û **cîlwe** jî, kitêbên wan ên pîrozin, perestegah û me'beda wana pîroz jî **Laleş** e (li Laleşê mêze bikin). Lê me'lesef ! pirrên nivîskarên musulmanan bi çewtî, weyan bi qestî, dibêjin ku: Êzdî peyrew û tabîyê **Yezîdê** kurê **Mûawîye** ne, ji wî da ye jî ku ji wan ra Yezîdî tê gotin. Ku ew şaşîtîyekî gelek bê însaf e, tehrîfekî pirr çewt û mezin e, pirr gemar e; kir û karên dijminan e, tehrîfatên wan qeşmer û xaînan e, bûxz û kîna wana ji Kurd û Kurdistanî ya ra ne (qehra Xwedê li wan be!).

Gelek ji lêkolînvan û zanyaran jî gotine: ku serkanîya dînê Êzdîyan **manaîzm** e, hinekan jî gotine ku: **Mîtraîzm** e. Ku ew jî ne rast e. Lê ev rastî heye : ku merkeza **Mîtraîzm** û **Alavîzm** û **Zerdeştîzm** û **Êzdîzm** û **Manaîzm** û **Kakaîzmê**, herêma çîyayê Zaxrosê (Kurdistanê) bûye, heta niha jî, mînakên wan dîn û mezheb û bawerîyên kevnên sensikrîtî, di Kurdistanê da hene û, dewam dikin; ku herêma Şêxan û Şengalê, navenda Êzdîyan e; Kerkûk û der û dorên wî, Kirmanşah û Pawe û Horaman jî, navenda Kakaîyan û **'Elî Îlahîyan** e; di ayîn û bîr û bawerîyên Êzdîyan da reng û rewş û resm û şeklên wan dîn û bawerîyan hemî jî dixûyên. Çawan ku têda gelek ayîn û teqlîd û mînakên terîqetên îslamî û dînî 'Îsewî û Cuhûyan jî dixûyên. Lê rewş û reng û duruf û nîşanên **dînê Zerdeşt**, ji hemîyan zêdetir têda dixûyên, qenctir û baştir dîyar dibin; ku mirov dikare bibêje: "Êzdîtî (dînê Êzdîyan) -di gel wan hemî tehrîfat û texyîratên ku têda hatine kirin-, dewama dînê Zerdeşt e, we yan dînê Zerdeşt tekamula wî ye. Ku lewra, Êzdîtî dînekî herî kevnê Kurdistanê ye, tewhîdî ye", Êzd (Îzîd), Yezdan dihebînin, nûra tecellîya wî di rojê da dibînin, xwe ji şerr û ne qencî û tarîtî yê, -ji mûmessilê wan ku îblîs e-, diparêzin û direvin, bi qencî û xirabî behsa wî nakin, navê wî û tiştên wek navê wî naynin ser zimane xwe; **Tawûsê melek** jî, bi me'na firişteyê Yezdan e, ku Tawus, ji "**Theos**" a Yunanî ye, bi me'na Rebb û Îlah e, Ahora mezda (Yezdan), Tawûsê Melek berî ya hertiştî çêkirîye. Ku di felsefa Wahdetil-wucûd û felsefa antîka Yûnanî da jî, navê wî mexlûqê seretayî, **'eqlê ewwel** û **'eqlê feyyaz** e.

F :

Felsefe (philosophy): Ji du bêjeyên Yûnanî ye. "Philo = dostî û evîn, sophy = zanîn û me'rîfet", ku li ser hev bi me'na dostî û evîndarîya merîfet û hîkmetê ye, îbaretê ji lêgerîn û lêkolîn û me'rîfeta tiştan e, ya esl û jêderê wan e, têgîhiştin û zanîna bersîvên **çira** û **çawa** û **çima** yên tiştan e, îhtimama bi menşe' û sebebên wan e. Felsefe ji serîda, bi terzekî giştî, bi du cûra ne:

a) Felsefa ûla, (felsefa lahûtî) felsefa wucûda mûtleq. Ku li nik **îbnû Sîna** yê, felsefa lahûtî perçekî ji wî felsefa mûtleqe.

b) Felsefa duwemîn = felsefa tebîî, felsefa tefsîr û şîrova kewn û kaînatê ku însan jî daxilê têda ye.

Bi angorî mewzu'û menşe û feylesofan jî, bi gelek nav û nîşanên cûr be cûr navdêr û beşdar dibe: Wek felsefa dînî û exlaqî û îctîmaî, felsefa Sensikrîtî û şerqî û Xerbî, felsefa Konfuçyus û Eflatûn û Plotîn ê Misrî û y.d. (ji kerema xwe li van maddeyan mêze bikin). Bi kurtî, mirov dikare bibêje: ku felsefe nezerîyye, ye behs û lêkolîn e, 'îlim jî, pratîka menfî'etdîtina ji netîceyên wî ne.

Felsefa Eflaton:

Eflaton (Platon- 427-347 b.m): Yek ji feylesofên Yunanî yê herî mezin e, şagirtê Sokrat (470-347 b.m) e û Seydayê Eristo (Aristo, Aristotales- 384-322 b.m) ye.

Felsefa Eflaton (Eflatonizm, Platonizm) felsefekî rûhanî yê mûtleqê mîsalî ye, Eflaton navê **Nezerîya mîsalan** (nezerîya numûneyên heqîqetê) lê danîye; ku li nik Eflaton: mîsal jî, mahîyeta mucerred (tişta qaîmê bi zatê xwe yê rûtê ji maddê) îfade dike. Xûlasa me'na wî nezerîya mîsalîyye jî ev e: "Heqîqet îbaretê ji mîsal û numûne yên ezelî ye. Madde (alema maddî) xuyangeh û mezherên în'îkasî yê wan mîsalan e, ku yanê: sûretên wan mîsal û numûne yên ezelî, (sûretên wan heqîqetan), di maddeyê da -wekî sûretên tiştan di neynikan da- dîyar bûne (madde mezherê 'eksa sûretên wan heqîqeta ne, yan wan mîsal û numûneyan e). Ku peywendîyên **Hubb** û **Cemalê** jî, bi wî nezerîya mîsalan ra heye, Eflaton dibêje : ku Cemal (spehîtî, xweşiktî) mîsalekî mûtleqê ezelî ye; rûhê însanan ewî ji jîyanekî borîyê berîya jîyana xwe ya ser zemînê, yad dike (di bîra wî tê),

mêla xwe bi alîyê wî va dide, dibe aşiqê wî; bi wasita hubbê, bi rîya hezkirinê, li wî mîsala ezelî digere, bi pey wî dikeve. ku li bal Eflaton hubb û hezkirina dunyewî, îşqa cemala cesedî, în'îkasa (ekisbûyîna sûretê) wî hubba mîsalî û rûhanî ya mûtleqa ezelî û ebedî ye; divê ku aşiq ji Hubba cesedî, bilindê bal wî Hubba rûhî va, bal Hubba Cemala mîsalî va -ku ji pîrozîtî û xeyrê ye- bibe; daxwaz û armanca wî ya nihaî ew be.

Eflaton bi şî'rê ra jî, ji van çar cîhetan da, 'elaqedar bûye:

1) Şî'r wehy û îlham e, ji quwwetekî îlahîda ye.

2) Remz û îma û qalib û perdeyên hinek me'na yên xeffên tessewwûfî ye.

3) Mûhakat û teqlîda tebîetê ye, mûhakata mîsalekî îlahîyê kamil e.

4) Rewş û rengekî terbîyê ye.

Eflaton dibêje ku "Nefs di qefesa cesedê da heps bûye. Hewil dide ku ji wî qefesê da aza yê bal menşe û jêderê îlahî va be, ku ev jî yek ji remzîyatên wî ne.

Eflatonîya nû (Neoplatonîsm): Felsefa nû, Felsefa medresa Îskenderîyye ya Misrê, ku re'y û fikrên felsefa Eflatonî û tesewwufa şerqî -bi taybetî tesewwufa Misrê-, gîhandîye hev û lihev anîye, di navbera wan da aşîtî damezirandîye.

Feylesofê Misrîyê mezin **Eflotîn** (Plotin-203-264 m.), yek ji serok û rêberê Neoplatonismê ye. Ku di cara ewwel da, karîye di felsefê da hedd û feslekî tam di navbera **El-ewwel** (Xweda) û tiştên din da, dayne û bi temamî ji hevdû biqetîne; gihîştîye vî fikr û bawerîyê ku bilindayî û tenzîlhekî mûtleq, ji wî Wahidê Ewwel ra (ji Mûbdî û Mûcidê seretayî ra) heye.

Neoplatonismê, di edebîyata Ewrupayê da rolekî pirr mezin lîstîye, 'eql û dîn li hev anîye; hem di navbera wan da, hem jî di navbera Xêr û Heqîqetê da, di navbera rewişta exlaqî û 'eqlê mûdrik da, însicam çêkirîye. Yek ji muhumterînê nezerîyeyên wî jî ev e, ku gotîye: "Kewn û kaînat bi çêbûnekî rûhî çêbûye, ji jêderekî rûhî ye. Hem jî gotîye : ku Hewwassên beşerî, quwwetên mûdrîke yên însan, (dîtin û bihîstin û zeqkirin û sehkirin û bîhnkirin), keşfa cewherê beşerî nakin (nikarin bikin). Belkî, mezahirên wî keşif dikin, yanê: hawass nagihîjin bal heqeîqeta însan, heqîqeta wî derk nakin, belkî mezahirên wî (xûyangehên

wî) derk û keşif dikin. (dikarin ku ewî derk û keşif bikin).
Bi kurtî: **Eflaton** feylesofekî herî mezin e, şexsîyetekî mîsalî û îddealîst û rûhanî û lahûtî bûye; herçiqas ku felsefa wî ya nezerîya mîsalan (nezerîya numûneyên mûcerredên ezelî) fikr û nezerîyekî mûxleq û girift û mû'emma ye jî, lê dîsan jî qedirbilind û pîroz e; dê beşerîyyet (însanîyyet), îlel-ebed minnetdar û spasdarê wî rûhê mezin be! (pirr spas ji wî rûhê mezin ra !).

Felsefa Tawîye:
Tawîye (Tawizm): felsefa rîya tebîî, rê û nîzama tebîya hurrîyet û azadîya Însanîyyetê, felsefa feylesofê Çînîyê mezin **Lao Tzu** (604-517 bm) ye. Ku **Taw** bi me'na rê, (rê ya tebîetê) ye; **Lao Tzu** Taw ê bi me'na meb'de û destpêk (meb'de yê mûtleq û bê hemtayê wucudê, meb'de û destpêka çalakıyên li hev hatin û dijhevhatinên pozîtîf û negatîfên **Yang** û **Yîn** ên kewnê) jî, bikar anîye. Yanê **Taw**, bi wî mefhûmî, di wî mefhumê da jî, hatîye îstî'mal kirin.
Lê Taw a **Lao Tzu,** ne ew Tawa bilind û pîroz a dîna ye. Lewra **Lao Tzu**, -bi 'eksa bawerîya dînên semawî- dibêje ku : "Taw", mebde' û menşeyê **Yîn** û **Yang** ê (hebûn û tunebûnê) ye ; lê ew mebde, tu tiştî nake; belkî di kir û karên otomotîkîyên tiştan da (Yîn û Yenê da) tecelli dibe. Yanê : Wezîfe û fonksîyona wî, ne kirin e, (kirin nîne), belkî, wezîfa wî, "**Wu wei**" ye, tecellî bûyîna wîya di kir û karên otomatîkiyên yên tiştan da ye."
Lao Tzu, hemdemê feylesofê Çînîyê mezin **Konfuçyus** (551-479 bm.) bûye, lê Lao Tzu kal bûye, Konfuçyos jî xort û cuwan bûye; di navbera wan da mucadele û hempeyvînekî hişk û dijwar jî derbas bûye. Lao Tzu teşwîqa heyat û jîyanekî sade û tebîî kirîye, gotîye ku : "rîayetkirina qanûnên siroştî, nîzama tebîî şert e. Ku ew nîzam, nîzama her tiştîye, di her tiştanda, di her mecrayan da, di dar û beran da, di stêrk û seyyaran da, di felek û asîmanan da, mûcessem bûye; Taw jî ew nîzama tebîî ye, seadet û bextîyarî jî ew e û bi wî ye, ne bi fend û fûndên me'rîfet û îlm û zanînê ye. Ku bi kurtî: Felsefa **Lao Tzu**, -bi 'eksa felsefa Konfuçyus-, qaîde û prensîpên xwe yên xassên bi heyata însanîyyetê, di tebîetê da, di şumûla nîzama kewnî da, dibîne, di wehdeta kewnê da lê

digere û teleb dike; ne ku di komela însan û civaka însanîyetê da.
Lao Tzu, pirr li ser esasên metafîzîkîyên tebîetê disekine û te'kîd û te'yîd a wan dike.
Felsefa Tawîye, felsefekî çînîyê qedîm û bingehîye. Herçiqas ku **felsefa Zen, nîzama Zazen**, (zen: teemmul, lêmêzekirin û mûtalee kirina kûr, **Zazen**: Nizama zen) rewş û şeklekî ji şeklên Bûdîzm ê ye jî, lê te'sîr û para Tawîye yê jî, pirr tê da heye. (Felsefa Zen, ji alîyê **-Budhidharma-** mamostayê Çînîyê yekemîn, yê hîndîyê 28 mîn da, -di sala 520 mîladê da derbasê- Çînê bûye, ji Çînê jî derbasê Japonya bûye, ku cîyê wî yê bingehî Japonya ye. Di salên dawî da, derbasê rojavayê jî bûye. Ku mirov dikare bibêje: Zen, Xullasa Hîndûîzm û Tawîzm û Konfuçyuzmê, di reng û rewşekî japonî da ye).
Feqr: Feqîrîtî, xizanî, bê darayî. (fakirlik, yoksulluk)
Ferd: Yek bi tenê (tek, bir)
Ferdî: Yekayîtî (tek şey, ferd ile ilgili)
Fewqel-ade: Di ser adetê ra (adet üstü, olağanüstü)
Fewqe-ttebî'et: Di ser tebîet û siroştê ra (tabiatüstü)
Feylesofane: Wek feylesof û zanyaran (filozofça)
Feyz: Rêj, rijîn, herikîn (akış, taşma, bolluk, bereket) (li ferhengoka tesewwûfê mêze bikin)
Feyyaz: Pirr bi feyz û bereket (çok feyizli ve bereketli)
Feyyazê mûtleq: Xweyê feyza bê payan, Xweda (Mutlak ve sonsuz feyz veren Allah)
Fexxar: Çamûra hişkbûyî, pijîyayî, cêr û kûp û kasik û kodikên ku ji çamûr ra pijandîne (balçıktan yapılan, çanak çömlekler)
Fexxar: Pirr bi fexr û pirr qurre (çok övünen, kibirli)
Fitret: Reçele, siroşt, surûşt (yaradılış, hilkat)
Fitrî: Reçeleyî, siroştî (doğuştan)

G :
Girift: Linavhevketî, (birbirine girmiş olan)
Gor: Angor, angorî, (bi gora wî, bi angorî wî, bi nisbet wî, îzafî) (göre, ona göre)
Gotî, Gûtî, Cûtî, Cûdî: (li Kurdê mêzebikin)

H :

'Hadis: Peydak, (sonradan olan şey)

'Heds, Hids: Bi xwe za, zû întiqal, ji nişkeva, zû têgihîştin, zûtêgihîştina encamê, ji destpêkan, (süratle idrak etmek)

'Hedîs: Peyv û gotin, gotinên Pêxember (söz, Peygamberimizin sözleri)

'Hedîsa qudsî: Gotina pîroz, ew gotina ku Pêxember li ser zimanê Xwedê dibêje, me'na wî ji Xwedê da ye, bêjeyên wî ji Pêxember da ye. (manası Allah'a, lafzı peygambere ait olan hadisler)

'Hessas: Pirr bi hest û hiss (çok duyarlı)

'Heqîqet: Rastî, wucûda heqq, wucûda Xweda (gerçek, ilahi varlık)

'Heyret: Matî, sergerdanî, kêcî (ne yapacağını bilmemek, şaşkınlık)

'Heyûla (hyle): Madda bingehîya hebûnê, cuz-î layetecezza', cewherî ferd, quwwet û qabîliyyeta hilgirtina şekl û sûretan ku hebûna wî ya bilfi'l, bi wan e

'Hîcab: Mûhafeze, mûhafezekirin, perde, perdevegirtin, xwegirtina ji namehreman (korunma, örtü, örtünme, namahremlerden korunma)

'Hîcab bi du cûra ne:

1- Hîcaba dînî û tesrî'î,

2- Hîcaba îctîma'î.

'Hîcaba dînî: (bi angorî dînê Îslamê): "xwe parastin û mûhafezekirina jinên nemehrem, ji tikilatî û îxtîlata bi nemehremên wan ra ye ; vegirtina ber û pêsîrên wan, meşandin û hereket kirinên wan, wekî yên bi 'îffet û bi heya ne, ku ji yên bê 'îffet û bê heya kifşe bibin, bên qetandin, neyên tahl kirin û êşandin, neyên aciz kirin, rencîde nebin!"

Yanê bi kurtî : emrê Qur'anê, emrê bi vegirtina ber û pêsîrên jinan bi çar û laçikên serên wan e, emrê bi ne nîşandayîna xeml û xişrên wan ên veşartî ye (wekî xilxalan), ne yên ku veşartina wan ne mecbûrî ne (wekî bazin û gustîlan); ku ji xwe, vegirtina rû û destên jinan ne mecbûrî ye, vegirtina ser û porên wan jî, adetekî mûstehebe, ku bûye rewş û sembolekî îslamî.

'Hicaba îctîma'î jî: bi angorî xelk û milletan e; her milletekî bi angorî ûrf û adet û îqlîmên xwe, xwe vedigirin. Mesela : bi angorî ûrf û

adetên Kurdistanê : **Keçên kurd,** serên xwe venagirin, kezî û gulîyên xwe dihûnin, bi ser millên xwe da berdidin, carnan jî, li dora serê xwe qemtên rengbireng girêdidin; hertim gulîyên wanên hûnayî bi ser mil û pişten wan da berdayî ne; **bûk** jî, ser bi xêlî ne, **jinên bi mêr** jî, ser bi laçik û çarik in, bi kofî û ferayî ne; **jinên bî jî**, bê kofî ne; di demên me'tem û şînan da jî, jin li serê xwe reş girêdidin, xwe reş dikin. Ku ev cûrê vegirtina jin û keç û bûkên kurdan bi vî awayî, ji cûrên **hîcaba îctîma'î** ye, **hîcaba teşrî'î** jî -her wekî ku me li jor îzah kir-, "mûhafeze kirina ji têkilatî û îxtîlata bi nemehremên wan ra ye, rî'ayet kirina rewşa 'îffet û namûs û heya û şerefê ye; ne ketina binê çarşevêye" ku ketina binê çarşevê, ne 'adetê kurdan e, ne jî, 'adetê Pêxember û 'esra se'adetê bûye...; belkî di 'Erebistanê da vegirtina ser û ber û pêsîr û pelegoşkan bi ser poşên 'erebîyên xususî, adetekî 'en'enewî yê 'herêmî bûye; ku dînê îslamê jî, ewî adetî redd nekiriye û mûstehebb dêra ye; vegirtina ber û pêsîrên jinan bi wan serpoşên 'en'enewî emr kiriye, bi kurtî: emrê bi hijabê, ne emrekî wûcûbîye. Belkî, emrekî îstîhbabî ye, edeb û nîşanekî dînîy e.

Hindûîzim: Dîn û felsefa Hindê ye, îbaretê ji teqlîd û rewş û ûrf û adet û îbadet û ayîn û baweriyên ku di dûvedirêjaya tarîxê da, tetewwur kirine û bi mûrûra zemanê bûne dîn û felsefe û qanûn û ûslûba jiyana Hindistaniyan e. Ku damezrox û katip û şairên wan, ne mûeyyen in, tekamûl û îslah û dewamên hev in, serwet û mîrasekî herî zengîn û rengîn e. Numûne û mîsal û timsalên berjewendîyên rûhê însan temsîl dikin; mewzû' û armanca wî, behs û lêkolîna heyat û jîyana însan û kewn û alemê ye. Ku bi kûrtî: Behs û lêkolîna tebîetê heyata beşerê û kewn û wucûdê, menşe û sebebên elem û îztirab û zehmetîyan, rê û çareyên xilasî û rehabûyîna ji wan, gihiştina bextîyarî û seadetê, esasê felsefa Hindê teşkîl dike. Rewş û reng û nîşan û durufên metafizîkîyên ku di her merhaleyên tetewwura wîda di xûyên jî, dîqqeta mirov dikşîn in. (Li Întîlaq û Nîrvana yê mêze bikin !).

Hindûîzm, di van merheleyan ra derbas bûye û hatîye :

1- Merhela nivîsên pîroz =vedas (ku ji dema koçberîtîya gelê arî ji asya navîn bal Hindistanê va-1500 bm- destpêdike)

2- Merhela kitêbên destan û çîrokan (wek mehabharta û Ramanya)

3- Merhala sûtra (tefsîr û şîroveyên felsefî -bi şeklekî mûntezem- ji 'alem û ji tebî'etê însan ra –400bm.-)

4- Merhela şerhên mezin (ji sedeyê 6 em, heta sedeyên 15yem)
5- Merhela 'esra (sedeya) pêşva çûyînê (19.m), ku 'alîm û feylesofên wek **Mohandas Gandî** (1869-1948m.) û **Taxor** (1861-1941) û **Ramkreşna** û **Fîfî Kanamda** û yên wekî wan, ji mûtefekkir û feylesofên wê merhela pêşvaçûyînê ne.
Yek ji taybetîyên Hindûîzmê jî ewe ku serkanîtîya felsefa wehdetîl-wucûda tesewwufî, teşkîl dike.
Kitêba wîya pîroz jî "Vîda-Veda" ye, mûhîmterînê eqîde û baweriyên Hindoîzim û Vêdayê jî ev çar tişt in:

1- Karma (qanûna ceza û mûkafatê),
2- Tensux (întiqala rûhan ji bedenekî bal bedenekî din va),
3- Întilaq: (rehabûyîna ji 'elaqe û peywendiyan, yekbûyîna bi Brahman ra, fanîbûyîna di wucûda Xaliqê Mûtleq da ku di Bûdîzmê da jî navê wî, **Nîrvana** ye. Di felsefa tesewwufa Îslamê da jî, **El-Fenaûfîllah wel-Beqaû bîllah e**),
4- Wehdetul-Wucûd. (yekîtiya hebûnê, yekhebûnî, baweriya bi yekîtiya Brahman û kewna maddî; ku serkaniya Wehdetîl-Wucûda tesewwufî jî, ew e).
Hiss: Têgihîştin, (hissetmek)
Ho: Sebeb, bûne, behane, wesîle (neden)
Ho: Lo, hey, herf û tîpa gazîkirina nêra ye, her wekî ku "hê" jî, ya mêya ye (çağrı ve ünlem alametidir,)
Hodrî meydan (Xodrî medydan): Bêje û îdyûmekî Kurdî ye, bi me'na "Ho derê meydanê", we yan bi me'na "bi xwe derê meydanê" ye, (haydi meydana çık, kendin ve bizzat meydana çık anlamınadır)
Hucre: Malik, cîge, beşa cîgeya debistana seretayîya medreseyên Kurdistanê, şane, xaniyê zindoyî, bineretî (Kurdistan medreselerinin ilkokul seviyesindeki bölümü, en küçük canlı varlık)
Hûmanîst: Însanî, (insancıl)
Hûrî-Mîtanî: Horî, Xûrî (li Kurdê mêzekin)
Hûwe: Ew, (o)
El-Huwe: Ewê ku ew e, Xweda (O ki, Allah)
Hûwwîyyet: Kesayetî, Ewiyyet, Ewetî, (mahiyet, kimlik)
Hûweyda: Eşkera. (Aşikar)

Î :

Îbda': Çêkirin û peydakirina ji ber xwe da, bê nemûş û bê numûne (nümunesiz icat)

Îddealîst: Yê ku bawerê bi felsefa îddealîzmê (felsefa fikr û me'newiyatê) ye. (idealizme inanan, ideal ve mefkure sahibi, maneviyatçı)

Îdrak: Têgihîştin, (anlamak)

Îfade: Bêjî, gotin (anlatmak)

Îfrat: Jiheddborîn, pirr pêşvaçûyîn, dijê tefrîtê (aşırı gitmek, tefritin zıddı)

Îfrat û tefrît: Zêde û kêm, pirr zêde û pirr kêm kirin, pirr pêşva çûyîn û pirr paşvamayîn, pirr ji pêra û pirr ji para çûyîn (bir şeyde çok ileri ve geri gitmek)

Îhtimam: Pirr mûhîmgirtin, pirr pêdaketin (özenmek, fazla dikkat ve gayret etmek)

Îhtiram: Rûmet, rûmetkirin, rûmetmendî (hurmet ve tazim olunma)

Îhtiras: Pirr bi arzûbûyîn (aşırı istek sahibi olmak)

Îktisab: Karkirin, bidestxistin (kazanmak, tahsil etmek)

Îlahî: Xwedayî (Allah ile alakalı)

Îllet: Çirratî, çimatî, sebeb. (neden, temel esas)

Îlham: Xweza, avêtina dil û hiş (kalbe ve akla aktarmak)

Îlhaq: Pêvadayîn, (ilave etmek, eklemek)

Îlliyet: Sebebîyyet, rewşa sebeb û musebbeban (sebep olma halı ve keyfîyetî)

Îma: Hîma, Dirke (gizli işaret)

Îmkaniyet: Îmkanbûyîn, dibe bibe û dibe nebetî (mümkün olabilme)

Înfisal: Jêbûyîn, jêqutbûn (ayrılma, irtibatı kesilmiş olma)

Înhîraf: Ji rê derbûn, rê şaşbûyînî (sapma, bozulma)

Înkîşaf: Keşifbûn, diyarbûn, nuşw û nûma (açılma, meydana çıkma, ilerleme)

Înqîyad: Rambûyîn, serîdanîn (boyun eğmek)

Însanîyyet: Merivtî, mirovayîtî, rewşa xilqeta însan (insanlık)

Însîcam: Lihevbûn, bi tertîb û muntezem û duristbûn (düzgün olma)

Întilaq: Rehabûn, çûyîn, azabûn (li Hindûîzmê mêzebikin)
Îrade: Wîst, wîn, (istek, dilemek)
Îrtical, îrticalî: Kelejen, kelejenî, ji ber xwe gotin (hazır cevaplılık, düşünmeden ve birden bire söz söyleмek)
Îsra: Rêwîtî û rêwîtîkirina bi şev, bi şev li rê çûn û li rê birin (gece seferi yapmak ve yaptırmak)
Îsra û Mî'raca Pêxember: Rêwîtî û seyr û sûlûk û bilindaya me'newiya îlmî û fikrî û 'eqlî û qelbî û derûniya Hz. Muhemmed. Ku Xwedê di şeva 27 meha Recebê da, ewî rêwîtî û seyr û sulûka bi taybetî û cudaîya herî pîroz û wala, bi wî zatê pakê Mûhemmedî dayekirin, ewî gerrandiye mezherê wî îlm û îrfan û înayeta xwe ya pîroz, bilindê bal meqamê mûqeddesê huzûra xwe ya me'newî va, bal 'Erşê kamîraniya xwe ya la mûtenahî va kirîye. (Ji 'alema Nasûtî, bilindê bal 'alema lahûtî kirî ye, sirr û hîkmetên wehdanîyyet û wehdetê, pê da ye zanîn, agahdarê ji sirr û hîkmetên Wehdetîl-wucûdê kirî ye.
Yanê: Îsra û Mî'raca Pêxember; rêwîtî û li rê meşandin û bilindkirin û bilindbûyîna wî ya me'newiya pîroz e; ku ew zatê pak bi merdîwanên 'eql û fikr û hiş û îdraka xwe, bi bal meqam û merteba herî bilind û pîroza îlmî û şuhûdî va bilind bûye, gîhîştiye sirrê wehdetê (sirrê Wehdetîl-Wucûdê).
(Îsra ve Mi'rac; Peygamber efendimizin Yüce Allah'ın manevi huzuruna yücelerek Wahdetul-vücud (varlığın-birliği) sırrına erişerek, ezelden ebede olan kainatın çeşitli sırr ve hikmetlerine bir hamlede vakıf olması ve kavraması mucizesidir.)
Bi te'birekî din: Pêxember (a.s.) bi merdîwanê 'eql û hişê xwe, di yek anekî pirr kurt da, bilindê bal meqamê îdraka wehdetîl-wucûd û wehdetiş-şuhûdê va bûye. Ku Hz. Mûhemmed bi çavê besîreta xwe (çavê 'eql û qelbê xwe) di wî meqamê me'newiyê pîroz da, temaşa esrarên kewn û wucûdê kirîye, di ber çavên 'eqlû hiş û îdraka wî ra -wek perda sînemakî me'newî-, hemî sefheyên kitêba kewn û kaînatê ('alema maddî û me'newî) derbas bûne, lê seyr û temaşe û mêze kirîye, bi taybetî, li rûpelên dewra Pêxemberan, bi diqqet û îtîna temaşe kiriye; di wê sefheya me'newiya temsîlî da, bi hevalên xwe yên de'w û dozê ra roportaj û mûlaqat û suhbet kiriye, ji wan ders û îbret girtiye. Hem jî di wî dema pîroz da, jê ra rewş û

sûret û mîsalên pirr heqîqet û mahîyetên xeybî -wek cennet û cehennem û neîm û 'ezab û ehl û musteheqên wan-, bi taybetî, mahiyetên mûcerrede yên 'eqlanî û rûhanî û lahûtî temsîl û teswîr bûne; sirr û hîkmet û neqş û nemûşên alema mulk û melekûtê, ji qelb û 'eqlê wî ra tecellî û dîyar bûne. Ku ew, dema ji wî 'alemê, ji wî halê îstixraqî û şuhûdiyê pîroz, (ji wî rêwîtî û seyr û sulûka manewiya tesewwurê û temsîlî), ziviriye bal halê xwe yê normal û tebî'î, ewan durr û gewherên walayên wî me'rîfet û îdrak û teleqqî û tecelliya bê hemta û pîroz, di sûretên mîsalên teşbîhî û temsîlî da, di nûmayendegaha dewra seadetê da, ji durrnas û gewherşinasên cîhanî ra pêşkêşkiriye.

Bi vî munasebetê, ez dixwazim îşaretê bal vê heqîqet û rastîyê va jî bikim: ku me'lesef! Ji berê da heta îro, pirrên musulmanan: "Mî'raca Pêxember bi bilindaya maddî, bi hevrazçûyîn û bilindbûyîna cesedî bal tebeqeyên asîmanan va, bal 'Erşê Xweda va (ku dibêjin: ew 'Erşê Xweda di ser hemî tebeqeyên asîmanan ra ye) tefkîr û teswîr kirine û dikin, bi pîvanên maddî pîvane û dipîvin". Ku di bawriya min da, ev teswîr û tefkîr, teqdîr û pîvanekî herî çewt û şaş e. Lewra Xweda (Wucûda Mûtleqa Pîroza Ezelî û Ebedî û Sermedî), bê mekan û bê zeman û bê cîh û war e, ber û jêr û jor jê ra tune; hemî kaînat, hemî 'alem 'Erşê (textê) Selteneta Wî ye; 'Erşê Wî yê mezin, 'eql û qelbê beşerê ye, bilindaya bal Wî va jî, rewşekî me'newî û 'eqlî û fikrî û şûhûdî ye. Ku bi kurtî; Mî'raca Pêxember jî, îdraka wî heqîqetî ye, zanîna wî sirrî ye, gihîştina wî meqamê me'newî ye; ku di vî hedîsê xwe da jî gotiye: ("الصلاة معراج المؤمن" = Limêj Mî'raca kesê bawerkere), îşaretê bal vî heqîqeta alî va kirîye. "Yanê, mû'min, bi limêjê, di limêjê da, bilindê bal meqemê huzûra îlahî dibe", ku Pêxember jî bilindî bal wî meqamê va bûye; di yek anekî şûhûdî da, îdraka sirrên 'alema lahûtî û xeybî kiriye, gihîştîye wî dereca îlmî û şuhûdîya herî bilind û wala; ku ew mertebe û dereca bilind heta îro jî, bi destê tu kesî neketiye, tu kes wek Wî, waqifê esrarên Wehdetê nebûye û nabe jî; ferqa di navbera mî'raca wî û mî'raca mû'minan da jî ewe.

Xulase: Di Îsra û Mî'racê da, me'nekî cudaîyê pirr bilind -pirr

mezintirê ji wî me'na ku pirrên musulmanan teswîr dikin- heye; ku ew jî ev e: "Di dema Mî'racê da, di wî ana qudsî da, di rûhê pakê Mûhemmedîyê pirr bi quwwet da, (di 'eqlê kûrbînê Hz. Mûhemmed da), sirrê wehdetîl-wucûdê, sirrê wehdeta mûtleq, -bi walatir û balatirê dereca tekûzî û tekamulê- tecellî bûye; hemî kewn û wucûd, di wî rûh û eqlê Wî yê mezin û pîroz da, kom bûye, civiyaye, diyar bûye û xûyaye. Ku ji ezel heta ebed, li hemî rûpelên kewn û hebûnê mêzekiriye, Cemal û Kemala Wî dîtiye, fêm û îdrak kiriye. Ku ji bilî wê quwweta serdestê tebîetê, serdestê siroşta însanî, tu quwwet nikare bigihîje wî meqamê, wî bilindaya me'newîya mezin û pîroz. Ku ji xwe, mu'cîza herî mezin jî, di wirda ye; ne di bilindayî û seyaheta maddî û astronomîkîya bedenî, da ye. Lê me'lesef! Ekserê musulmanan wilo fêm dikin û wilo difekirin, wilo bawer dikin! Ku ew bîr û baweriya wan a wilokî jî, hem layiq û munasibê tenzîha Îlahî nîne, hem jî bi 'eqlîyyet û mentiqa îlmîya Îslamî ra na meşe.

Tu-j Melê Botî bipirs! Esrarê 'işqê heldiket
Vê mû'emmayê çi zanit sed Mela û mûste'îd!

- Mela -

Îstismar: Kedmijî (sömürmek)
Îstixraq: Xerqbûn, têda wundabûyîn, ji xwe çûyîn, haletê fanîbûyîna ji xwe, baqîmayîna bi Xweda, noqbûyîna di derya îşqa ilahî da, gihîştina mertebe û meqamê "Elfenaû fillah wel-beqaû billah'ê"
Îşraq: Ronîkirin, întiqala me'rîfet û zanînê -ji nefsa kullî da bal nefsa cuz'î va- bê wasite, feyz û rêja me'rîfetê bi ser nefsê da ji alema lahûtî da, bê cehd û teleb; feyza Îlahiya manewî. (Işıklandırmak, parlatmak, görünmeyen alemin nurundan akla ve zihne sirayet eden marifet ve bilgi aydınlığı ve onun aktarması ki, işrakiyye felsefesinin temeli de onun üzerine kurulmuştur)
Îştîqaq: Jê şeqbûn, jê perçebûn (türemek)
Îştiyaq: Pirr şewq û arzû (fazla istek)
Î'tibarkirin: Ferzkirin, wilokî hesibandin (farzetmek)
Î'tibarî: Angoreyî, îzafî (göre)

Îtmî'nan: Dilrehetbûyînî, emînbûyîn (mutmain olmak)
Îttîhad: Yekbûyînî, yekbûnî, yekîtî (birleşmek)
Î'tîqad: Bawerî, bawerkirin, (inanmak, inanç)
Î'tiqadî: Tiştê girêdayê bi baweriyê va (itikad ile ilgili olan)
Îtham: Gunehbarî, tawanbarî (suçlamak)
Îtlaq: Berdan, rehakirin (salıverme)
Îtmî'nan: Bawerî û îtîmadî, emîn bûyîn, baweriya bi dil û can, bi qerar û yeqîn.
Îttîfaq: Bihevrabûyîn, gotinyekkirirn, (beraberlik, antlaşmak)
Îttîham: Hîştina di binê tûhmet û tawanberîtîyê da (suçlamak, tühmet altında bırakmak)
Îttîsal: Pêvegirtin, gihîştin (ulaşmak, bitişmek)
Îxtisas: Pisporî (uzman olmak)
Îxtiyarî: Bi îrada xwe, bi arzûya xwe (istek ve arzusu ile)
Cûz-î îxtiyarî: Îxtîyarîya piçûçik, îxtîyarîya însanan ku cuz-û perçeyê îxtîyarîya kullî ye. (bir parçacık olan ihtiyar, kulli iredenin parçacığı)
Îztirab: Şelejan, êş û jan (acı, elem)

K:

Kahin: Yê ku ji xeybê xeberdide (gaybten haber veren)

Kaînat: Hemî tiştên çêbûyî, hemî alem (yaratıklar, alemler)

Kakaî: (kakaîzm) -wek alawîtî û Êzdîtî ya bi rewşa rast û durust-yek ji dînên kevnên Xwedaperestîyên arîyanîyên îctîma'î ye; ku niha jî pirr etba' û rehrewên **Kakaî** û **Pîrsimaîlî** ('Elî-îlahîtî)yê, li başûra û rojhilata Kurdistanê, li Kerkûk û Pawe û Horamanê hene. Ku hîmê wan dînên sensikrîtî, li ser bawerîya yek Xwedatê û yek Xaliqîtîyê bûne; gotine ku: "Xweda (Xaliqê Mûtleq) kaînatê bi destê hinek melekan (firişteyan) sewq û îdare dike" ku navê serokê wan firişteyan, li bal **Êzdîyan**, **Tawûsê Melek** e, li ba **Kakaîyan Pîr Binyamîn** e, li ba **Alawîyan** jî, **Pîr Sultan** e, (li alawîyê binhêrin)

Kakul: Tuncik, (perçem, alnın üzerine sarkıtılan saç)

Kasît: Kasî, Kaşî, Kasayî, Koş, Koşî (li Kurdê mêzekin)

Kast: Kêm, (noksan)

Kast, qast (Caste): Sinif û taîfe yên, ku ji nîzama "**Varna**" (tesnîfkirina bi angorî qabîlîyet û jêhatînîyên kesan) peyda bûne. ("Varna" dan doğmakta olan toplumsal tabaka ve sınıf).

Ku di Hindistanê da, -bi rêz û tertîb- ev çar sinif û tebeqe hene :

1- Tebeqa rêberên dîn, (Brahmana), 2- Ya cengaweran (Kshatriya), 3- Ya hunermend û tucar û sen'etkaran (Vaishya) 4- Ya karker û koleyan (Shûdra). Ku ev herçar jî, arîyanî ne, Hindistanîyên esîl û heqîqî (zencîyên Hindê-Antcastes), qewirandîne, di çîya û daristanan da, dûrê dagirkerên tûranî û arîyanîyan dijîn, ku ev qedera xwar û berovajîya Hindistanê, wekî ya **Kurdistanî** ye; ku dagirkerên wê jî, bi xweyên wê yê heqîqî ra (bi kurdan ra), 'eynê mûameleyê kirine û dikin; ewan ji cî û warên wan kirine û diqewirînin (wek gelîyê Zîlan û deşta Herranê ku Tirk û tatarên tûranîyan tê da bi cîh kirine). Ku bi yek gotinekî: "mirov dikare tûyê rûyê wî qedera qirêj bike!".

Kehanet: Pêşbînî, pêşîbînîtî, xeberdana ji xeybê (gaybden haber vermek)

Kemal: Gihîştayî, gihîştîbûn (olgunluk, olgunlaşma)

Kemîyyet: Çendîtî, çiqasîtî, miqdar (nicelik)

Kewn û kaînat: Bûyîn û bûyakan (var olma ve varlıklar)
Keyfîyet: Çawanî, çiloyîtî (nitelik)
Kêl: Kêlik, kevirê lîstoka "kêl ji kêlê", ku kevirên piçûk davêjin kevirên mezin û lê didin û wan kêlikan Werdigerrînin.
Du kêlan bikevirekî werdigerîn e: yanê bi tiştekî du tiştan dike. Wek ku di lîstoka kêl ji kêlê da, bi avêtina yek kevirekî du kêl tên werdigerrandin. (Meşhur oyunda olduğu gibi, bir taşla iki taşı deviryor demektır).
Kînayet: Peyvandin û bêje û gotina bi m'enakî xwazmanî, bi qurf û şirove, nevekirî, ne serîh (dolayısı ile, üstü örtülü) ku eger me'na kînaî ya xwazmanî, pirr xef be, we yan pirr kûr û dûr be, "**remz**" û "**telwîh**" e, eger ew m'ena xwazmanî zêde xef û dûr nebe, "**îma** û **îşaret**" e. Yanê bi kurtî, ferqa di navbera **kînaye** û **îma** û **îşaret** û **telwîhê** da, ew e.
Klasîk: 'En'enewî, tiştên her dem bi rûmet, berhem û hunerê ku ji pêşîyan da maye û her bi rûmet e. (Geleneksel değerini uzun zaman süresi içinde kaybetmeyen eser, muteber).
Konfuçyus: (551-478-79 b.m.) Feylesofê Çînê yê mezin, damezroxê mezheb û ekola Konfuçyuîzmê, ku îbaretê ji de'wet û te'lîmat û îrşada bal rêya heqq û îlm û îrfanê ya piratîkî va ye. Ku ew jî yanê: Konfuçyus, wek hekîmekî ji hukemeyan, wek feylefosekî ji feylesofan bûye, ne ku wekî pêxember û rahiban bûye. Behsa wehy û îlham û telaqqîyên ji asîmanan ne kirîye. Belkî xulasa mezhebê wî : Zanîn û xwendin û te'lîm û pratîk bûye, de'wet û îrşada bal heyata îctîma'î û malbatî û exlaqî yên însanî û bilind bûye; bi kurtî, hekîm û edîb û alim û fazil bûye; ders û te'lîmatên wî -wekî yên Sokrat-, zarkî û şîfahî bûne; bi suxte û şagirtên xwe ra axivîye û ewan hînkirîye, çûne nav xelkê û te'lîm û îrşad kirine, ji boyeran netîce deranîye, îlham hildaye û pêş va çûye (pragmatîk bûye).
Konfuçyus, bersiva vê pirsê: "teheqquqa xêr û seadetê, qencî û bextiyarîtiyê çawan mumkine?" Wiha daye: "tişta ku beşerê digerrîne dike însanîyên ferd û yekta, **jen** e, (qencîtî û xweşwîsîtiya qelbê însan e, pakderûnîtiya wî ye)". Ku ew jî, yanê : Rêya Konfuçyus, rêya "Jen" e, rêya însaniyetê ye, fezîlet û îhsan e, Konfuçyus dewam dike û dibêje ku "delîl û rêberê kir û karên

însan (piratîka însan) jî, **jen** bi xwe ye. Lê di jiyana rojeviya însan da, îhtiyacê bal van delîl û rêberên mûeyyen va heye :

1- Ûrf û adet û adabên civakê (Lî),

2- Li hev xweyîbûyînên malbatî, peywendiyên lêzimîtî û eqrebatiyê, îhtiram û hezkirina kur û dê û bav û bira, ya xizm û eqreban ji hevdura, (Hsiau)

3- Îstiqamet û durustî, îxlas û semîmîyet (Yî). Ku **"Lî"** û **"Hsiau"** û **"Yî"**, xesaîs û taybetiyên şexsîyeta wala û bilind e, tetwîra însanîyyetê, temsîla fezîletê dikin. Ku ji şexsiyetên wilokî jî, civak û komelakî mûntezem û mûkemmel hasil dibe, ji wî jî hukm û nîzamekî 'adil û qenc peyda dibe, ew jî netîca bextiyariya giştî, seadeta ûmûmî dide. (Ku se'adeta herî mezin jî hurriyet û azadî ye)

Konfuçyuîzm û **Tawîzm** û **Budîzm** di Çînê da dewam dikin, lê ku Bûdîzm pêşvatir diçe, **Han yû** (768-824 m.) li himberî wî dertê û dibêje: ku "**Lao Tzu** û **Bûza**, çavên xwe ji nîzama vî alemê û welat girtine û ketine pey Metafîzîkê, ji durustkirin û îslaha 'eqil behs dikin", divê ku beriya her tiştî, çalakiyên însanî, li ser bingehê hûbb û hezkirina giştiya tebîetê însanî bin, ewî esas bigrin. Ku **Han yû** bi vî awahî jî, tovê Konfuçyuîzma nû direşîne, di pey wî ra jî, **"Ou Yang Hsiu"** (1007-1072 m.) Ewî şu'ûr û endîşeyê, di cîh da dibîne û dibêje ku: "feylesofên Çînîyên netewî, ji feylesofên biyanî (wek Bûda) balatir û walatir in, divê ku em felsefeyên wan feylesofên Çînî, di himber Bûdîzmê da xurt bikin." Ku di wê navberê da, **"Cho tun-i"** (1017-1073 m.), hîmê **Konfuçyuîzma** nû datîne, pirr felsefan dicivîne, şerh dike, li ser bingehekî Metafîzîkiyê şamilê hemî kewn û wucûdê datîne û ava dike, şuroveyên nû ji wan ra tîne, Felsefa **Tawîzmê** ya ku bi rewş û durufekî negatîf dixûya, bi rewşekî pozîtîf şirovedike, durufekî mûsbet lê dixîne. Ku li ser wî hîmê jî, **"Chang hao"** (1032-1085 m.) û **"Chag-i"** (1033-1107 m.) jî, heykelê wî felsefa nû dadimezirînin, dineqişînin û dinitirînin, ku bi vî awahî jî, **Neokonfuçyuîzim,** di qalib û duruf û rewş û rengên felsefa mîsalî û waqiî da, hetta şoreş û serhildana Çînê di himber Îngîltereyê da; yanê: hetta cenga afyonê (1840-1842 m.) dewam

dike, jê fikr û felsefa Çînî ya nû dertê meydanê. Hetta ku fikr û felsefa **"Mao tse tung"** (1894-1976 m.) ya hemdemî ya Materyalist, di Çînê da hakim dibe. Ku Maoîzm jî, her cuqas di binê tesîra Marksizm û Lênînîzmê da pirr maye jî, lê ji felsefeyên kilasîkî jî pirr dûr neketiye, reng û rewşên wan di xwe da girtiye û mûhafeze kiriye. Ku mirov dikare bibêje : "Mao, ji xammaddeya Marks û Lênin, bi motîvekî Çînî, me'mûlekî bi taybetî întac kiriye. We yan maddekî Çînîyê nû, bi reng û motîvên Marks û Lênin pêşkêş kiriye, we yan jî, mehlûlên laboratuara Çînî, di qalibê Marksîzmê da rokiriye, rewş û rengê Lêninizmê dayê" we bi yek kelîmekî : Çînînîzm e, wesselam !

Kurd: Jîr û jêhatî, qehreman, gelê kürd, milletê kurd ku yek ji gelên 'esîl û kevnareyê Mezopotamya, koma Zaxrosîye, ji nijada gelên Hindû-Ewrûpayî (Arî-Aryanî), beşa Îranî ye.
Ewên ku di kûrayên tarîxê da bi navê **Gotî, Cûtî, Kartî,** li herêma (mentîqa) Zagrosê, nêzîkî 3 hezar sal beriya Mîladê (dema ji dayîkbûyîna Hz. Îsa) xuya bûne, di sala 2649 Bz. **Sumer** û **Akkadan** kirine binê destê xwe û lê fermandarî kirine. Nêzîkî 25 qral û hukumdar jê rabûne û Împaratoriya **Gotî** damezirandine; di dema qiralê wanê dawîyê da ku bi navê **Trîgan** bûye, di sala 2574 bm. da, kişiyane herêma çiyayê Zaxrosê, di sala 1800 bm. da, bi **kasîtan** ra jî, şerr û cengên pirr mezin û girîng kirine;
Ewên ku bi navê **Kasît, Kasayî, Koş, Kasî,** di 1800 bm. da ji herêma kirmanşahê heta nêzîkî Babîlê hatine, li Loristanê bi hemnijadê xwe yên Farisan ra cînar bûne û bi hevdû ra rind derbaskirine;

Ewên ku bi navê **Lolo, Lûlû, Lolobûm, Lûlûbî,** li Zamoa (herêma der û dorê Silêmanîyê û Şarezûrê) bûne û bi Gotiyan ra bûne yek û heta Kerkûkê hukumran bûne;
Ewên ku bi navê **Xûrî, Hûrî-Mîtanî,** di navbera sala 1500-1300 Bz. li Xûr û Waşûkaniyê (Riha û Serekaniyê-Ceylanpinarê) Qiralîyeta Hûrî-Mîtanî damezirandine, tixûbê dewleta wan heta Filîstîn û der û dorê deryaça Wanê û Ormiyê çûye. (qralîyeta Hûrî, di sala 1300 Bz. da, ketiye nav Împaratoriya Hîtîtan, Qraliyeta Mîtanî jî, di 1275 Bz. da, bi Asûriyan ra bûye yek);

Ewên ku bi navê **Xaldî-Ûrarto** di 900-840 bm. da, li **Arzaşkûn** û **Tûşbayê** (Wanê) dewleta Ûrarto damezirandine û ji Ormî û Rewandûzê heta çemê Firatê di binê fermandariîtiya wan da bûye û di sala 600 ê bm. da ketine binê fermandarîtiya Mediyan;
Ewên ku bi navê **Sûbarî-Sûbarto** bûne, bi Asûriyan ra pirr şerr û cengên giran kirine, heta ku textîpayê dewleta Asûrî (Nînewa) di sala 612 ê bm. da, ketiye destê Medîyan; Asûrî ji navberê rabûne û li cîhê Sûbariyan jî, **Nayrî** xuya bûne, ku ew jî mil û qebîlekî Sûbariyan e, li der û dorên Hekarî û şemdînan aferînekên (eserên) wan hatine dîtn û keşif bûne;
Ewên ku bi navê **Qardo-Qardox** bûne, dîrokvanê namîdarê Yûnanî (Ksenephon), di sala 401-400 bm. rastê wan hatiye û di kitêba xwe ya bi navê "Vegerîna Deh Hezaran" da, ji wan û cengaweriya wan behs kiriye, ku ew jî bermayê Gotiyan bûne;
Ewên ku navê wan **Med-Mad-Madî** bûne, ku di sala 713 ê bm. da, çend 'eşîr û qebîlên Kurdan hevgirtine û bûne yek û hîmê dewleta Medî, li Aqbetanê (Hemedanê) danîne, ku paşê di sala 700 ê bm. da, bûye dewlet û Împaratoriya **Medî** jê hatiye damezirandin û di sala 612 ê bm. da jî, qralê wan ê namîdar Kiyaksar (Kiwaksar) Nînewa ya textîpayê Asûrîyan ji wan girtiye û dawî li dewleta Asûrî aniye; di sala 550 bm. da, (di dema Qiraliyeta Astiyak da,) nebîyê Astîyak –ku ji Mandana-Mandena keça Astiyak û prensê Axemenî, (Kambujiya, Kambizê yekemîn) bû ye, ku navê wî jî Korûş (Cyrûs) bûye-, hêrîş anîye ser kalê xwe yê Astiyak, textîpayê wî jê standiye û **Medya** û **Persiyayê** kiriye yek û bûye qralê Med û Persê û bi vî awayî jî dawî li Împaratoriya Medî hatiye. Dayoko, Keykûbadê Kurd, Keykawusê Nemir (Nemird, Nemrûd) Keyxosro (Keyxosrewê Humayûn) Keyluhrasp, Keyşîtasp (Kuştasp), Keyerdeşêr (Behmen), Hûmaya Keça Behmen (Çehrezad), Kiyaksar (Kiwaksar-Dara), Astiyak (Bavê Mandena Dayika Korûş-Cyrûs), ji fermandar û qiralên Medîyanên namîdar bûne. Ku Keyşitasp ola Zerdeşt Pêxember qebûlkiriye û dînê Zerdeşt bûye dînê fermîyê dewleta Medî.
Ev hemî (**Gotî, Cûtî, Kartî, Kasî, Kasayî, Lolûbî-Lolo, Sûbarî, Nayrî, Hûrî-Mîtanî, Xaldî-Ûrarto, Qardo-Qardoxî, Medî-Madî**) navên pêşiyên Kurdan e, ku bi zimanên gelên bîyanî li wan hatine

danîn, navê çiyayê **Cûdî** jî, ji navê Gûtî hatiye girtin, di zimanê 'erebî da ku tîpa **"G"** tune, di cîhê wê da tîpa **"C"** bi kar hatiye. **"T"** jî bûye **"D"**, Cûdî jê çêbûye. Çiyayê Cûdî, (yanê çiyayê Gotiyan) yek ji belgeyên dîroka Kurd û Kurdistanê ya berçavî ye. Ji xwe **Qardox**. **Qartî**, **Kûrtî** û **Kurd** yek tiştek in. Ku ev nav hemî bi zimanên biyaniyan li Kurdan hatine danîn. Ji ber wî, em bi hêsayî dikarin bibêjin: ku vana hemî, navên gelê Kurd in. Asûrî û Aramîyan, ji wan ra: Gotî, Kûrtî, Qartî, Qardo, Qardoqa, Qardan, Qardaq gotine; Rom û Yûnaniyan jî, Qardosûy, Qardohûy, Qardax, Qardokay, Ermeniyan jî; Qardoîn, Kûrçîh, Kerxî, Korxî, 'Ereban jî, Kurdî, Kardoyî, Baqarda, Qertawiye, Cûdî, Cûrdî gotine. Di **kitêba Mûqeddes** da jî, ji wan ra **Nahara-Aram** hatiye gotin, her wekî ku ji Lolobiyan ra jî, Nûllû, Lûlûbûn, Lolobî, ji Medan ra jî, Mîyad, Mad, Amad, Mîd, Med hatiye gotin. Çawan ku gelê Qorayê (Korea), ji Tirkan ra dibêjin: Toygî, Japoniyan jî dibêjin Torkoçîn, Çîniyan jî dibêjin: Tûkiyû, wisan jî gelên bîyanî, wan navên borî, li gelê Kurd danîne, ku bê guman ew gelên bi wan navan di dîrokê da cîh girtine, pêşiyên gelê Kurd in û gelê Kurd bi xwe ne; şêr û pilingên war û zozanên Kurdistanê yên dîrokî bûne. Ku Kurdistan jî navê welatê wan bûye, bi nêzîkayî (teqrîben) "ji Ehwazê, heta Sêwazê (Zara û Qoçgîrî), ji Hemrînê heta Qafqasê ye". Lê sed mixabin! Îro di navbera Tirk û 'Ereb û Farisan da perçe perçe bûye.

Kull: Gişt, tev, hemî (hep, hepsi)

Kullî: Giştî (kul ile ilgili, umumi. Genel)

L:

Lolo: Daçeka gazîkirina nêran e, ku ji mêyan ra jî, **lê-lê** tê gotin, Lûlû, Lolobûn, Lûlûbî (li Kurdê mêzekin)

Luxet: Ferheng, zar û ziman (sözlük)

Luxewî: Zimanvanî, bêjeyî (lugat ile ilgili)

M:

Ma fewqe-ttebî'et: Tiştê di ser tebîetê ra (tabiat üstü olan).

Mahîyyet: Çûnyetî, çawayîtî, bi çi awayîtî ya tiştan, heqîqete wan

Ma la nîhayet, mala yetenaha: Tiştê ku bê payan e, yê ku dawîya wî nayê. (sonsuz olan).

Ma la yûtaq: Tiştê ku nayê quwwetê (gücün ve kuvvetin yetmediği şey).

Manaî, Manayî: Beşekî gelê Arîyanî yê kevnareye (li der û dorê 723-710 bm.) da, li herêma rojhilata bakûra Ûrmîye yê xûya bûye. (Urmiye gölünün güney doğusunda görünen eski bir Aryani halk gurubudur).

Manî: (216/277 m.) Damezroxê mezhebê Manewî ye, neqqaş û nîgarendekî herî namîdar e, ku mezhebê wî jî mezhebekî eklektîkî bûye; ji hemî dîn û mezheban girtîye. (Manai mezhebinin kurucusu, meşhur neqqaş).

Masûwa, masîwa: Ji xeyrê wî, ji bilî Xwedê her tişt (ondan gayrısı, Allahtan başka herşey)

Mebde': Destpêk, despêke, hîm, serkanî (başlangıç, prensip, kaynak, kök)

Mebde yê Mûtleq: Destpêka negirêdayê bi tu qeyd û mercan va, aza (Kayıtsız şartsız olan başlangıç, illet)

Mecal: Buwar, biwar, cîyê gerr û lepatê, firset (davranma yeri, firsat ve imkan)

Mecan: Mift, badî hewa, bê bedel (bedelsiz)

Mecla: Tecellîgeh, xûyangeh, neynik (ayna, mirat)

Mecra: Avrewk, rewange, cihok, rêya avê (kanal, su yolu)

Mecaz: Xwaze, xwazman (bêjeya ku ne bi me'na xwe ya heqîqî ye)

Mecazî: Xwazmanî, ne heqîqî

Med: Dirêjbûn, dirêjbûna pêlên behrê, dijê cezrê ye, mad, madî, maday (li Kurdê mêzekin)

Mehabad: Navê bajarekî Kurdistana rojhilat e, ku di 21.01.1946 da, Qazî Mûhemmed têda Cumhûrîyeta Kurdistanê damezirandîye û ew digel hevalên wî, di 31.03.1947 da hatiye bi dardakirin şehîd bûye. (Doğu Kurdistanında bir kent olup, 1946 da Kazi Muhammed başkanlığında Kurdistan Cumhuriyeti kurulmuştur ki nihayet Kazi Muhammed ve arkadaşları, 31.03.1947 de idam edilmişlerdir)

Mehabad: Pêxemberekî gelê Arîyanî yê herî kevn û mezin e, ku wek **Geyomers** û **Hoşeng** û **Tehmores** û **Cemşîd** û **Ferîdûn** û **Keyxosrew** û gellekên wek wan, pêxemberên gelên Arî bûne; ku navê kitêba pîroza Mehabad Pêxember jî, **Desatîr** e. (Ariyanilerin çok eski büyük peygamberlerinden birinin adîdîr. Onun kutsal kitabının adı da Desatirdir. Ve onun gibi birçok Ariyani Peygamberler mevcuddurlar, fakat isimleri Kur'an'da zikir edilmemiştir. Zaten Kur'an da diyor ki "biz Peygamberlerden bazılarının kıssasını sana anlattık, bazılarının da anlatmadık." (Xafir/78)

Mehrem: Bi dizî, tiştê ku ji bîyanîyan tê veşartin, tê paraztin, xism û eqrebayên nêzîk (gizli, müsade olunmayan)

Mehz: Safî, xalis (sırf, has, safi)

Mehzen: Bi tenê (ancak, yalnız, sadece)

Me'lûm: Zaniryak

Me'newî: Mebestî, ne maddî (maddi olmayan, mücerret)

Me'newîyat, ma'newîyat: (c.me'newîye) Quwweta me'newî, tiştên me'newî (manevi kuvvet, manaya ait olanlar)

Menfî: Neyî, neyînî (olumsuz, negatif)

Me'rîfet: Zanyarî (bilme)

Merxûb: Pesen, dilxwa (arzu edilen)

Mesder: Rader, Jêder (çıkış yeri, kaynak)

Meşreb: Avxwarge, xûy, adet (tarz)

Meta': Kel û pel, malê ticaret û bazirganîyê (eşya, ticaret malı)

Metelok: Gotinê pêşîyan (atasözleri)

Meteryalîst: Maddî, yê bawerê bi maddeyê, bawerê felsefa meteryalîzmê (maddeci, herşeyi maddeye bağlayan, meteryalizm felsefesine inanan)

Meqam: Cîh, Cihê seknê, êwirge, mertebe (durulacak yer, rütbeli yer)

Me'qûlat: (c. me'qûl)Tiştên ku dikevin 'eql û hişş, tiştên ku derka wan bi 'eql û hişş tên kirin (akıla girenler, akılla bilinenler)

Meqûlatên eşere: Deh cûrên tiştan ku yek ji wan cewher e, nehên din jî 'Erez in, ew jî ew in: kem, keyf, eyn, meta, wez', îzafet (nîsbet), mulk, fîil, înfîal (*çendîtî, çawatî, li kêderîtî, çi demîtî, rewş û wezîyet, angorîtî, xweyîtî, kirin, li xwe girtin*). (felsefede on kategoriler)

Meqûle: Cûr, cûrê ku hatîye gotin, bûye mewzû' (takım, çeşit, kategorî)
Mevzû-î behs: Mijara behsê (bahis konusu)
Mewcûdat: (c.mewcûd) Tiştên heyî (var olan herşey, kainat)
Meya me'rîfetê: Badeya me'newîya zanîna heqîqetê (marifet badesi)
Mezc: Li nav hev xistin, li nav hev kirin (biribirine katma, karıştırma)
Mezdek: Kurê Bamdad, di dawîya qirna (5.m)da li Nîşabûrê hatîye dunê, şoreşgerekî fitneengîz bûye, terefdar û reformîstê mezhebê Manî bûye, di dema Qubadê yekemînê Sasanî (486-531 m.) da, li der û dorê (526 m.) da hatîye îdam kirin (Mani mezhebinin tarafdarlarından olup, kadın da dahil herşey toplumda müşterektir diye ileri sürdüğü görüşünden dolayı birçok karmaşalara sebebiyet vermiştir ki Kisra Enoşirvan onu idam ettiriyor ve yeniden toplumu Zerdeşt dinine yönlendiriyor, Zerdeşt dinini yeniden canlandırıyor.)
Mûnawere, Minawre: Lebt û lipat, çûyîn û hatina li dor tiştek, ji boy tiştek (manevra)
Mîsra': Baskê derî, baskê şî'rê, perçekî ji du perçeyên wî (bir manzumenin herbir satırı, bir beytin bir kanadı)
Mîsal: Mînak, numûne (örnek)
Mîr: Fermanbidest, hukûmdar (amir)
Mîrî: Fermî (resmî)
Mî'rac: Pêpelûk, pêlêk, nerdîwan, mertebe û meqamê me'newî yê bilind û pîroz (merdiven, yüksek makam, huzüri ilahiyeye yükseliş)
Mirov: Merif, însan (adam, insan)
Mûbid, mûbed, mewbed, mûbez, mewbid: Zana, serokê dînê Zerdeştî, xweyê me'beda agir (Zerdeştilerin dini lideri)
Mûcerred: Tenya, rût, bi tenê, bi serê xwe (yalnız, tek, saf)
Mû'cîze: Xarîqûl-'ade, tiştê ku ji adetê der e, ne adetî ye, lê ne mehal e jî, belkî tiştekî mumkînê 'ecêb û xerîb û zor û zehmet e, tiştekî 'ecêbê wilo ye ku mirov jê mat û mande dimîne, ku ew tiştê 'ecêbê heyretengîz, eger ji sêrbazan sadir bibe, sihr û sêrbazî ye, eger ji welîyan sadir bibe, Kiramet e, eger ji pêxemberan jî sadir bibe, mu'cize ye; ku dereca herî mezin û pîroz jî ew e.

Yanê: mû'cîze Xarîqû-ttebî'et nînin, (ji nîzam û qanûnên tebîî, ji Sunnetellahên Tekwînî, der nînin, ne mehal in) lê Xarîqû-l-'adetin (ji 'adetê der in), wek ku Îsa pêxember: "Koran bîna kirîye, nexweşan sax kirîye, mirîyan bi can kirîye." Yanê: çavên qelbên kor (çavên besîretê), bi nûra bawerî û yeqînê vekirîye, bîna kirîye, rûhê îlm û me'rîfet û îmanê bexşê wan (kesên ku ji rûhê îlm û îman û me'rîfetê bê par mane) kirîye, nexweş û mirîyên me'newî, sax kirîye, perrende û teyrikên wî rûhê me'newî, de'wetê bal wî leş û bedena wana maddîya me'lûl û fersûde kirîye û bi wî rûhê pîroz, ewan şîfayab kirîye. ku ev jî tiştekî mumkîn e, lê pirr zor e herkes nikare ewî bi cîh bîne.

Yanê bi kurtî: de'wet û te'lîmatên pêxemberan, heyat û jîyan in, rûh û can in, ku kor û nexweş û me'lûl û mirîyên exlaqî, pê bîna dibin, şîfa dibin, sax dibin, digihîjin heyat û jîyana me'newîya ebedî; çawan ku Qur'an jî di Sûretê El-Enfal, Ayeta 24 an da wiha dibêje:

(يا أيها الذين آمنوا استجيبوا لله وللرسول إذا دعاكم لما يحييكم) (Ey ewên bawerker! Dema ku Xwedê û Pêxember, we de'wet kirin bal tiştên ku we sax dikin, hûn bersîva wan bidin, bi xibera wan bikin, li dû wan herrin, wî de'wet wan ku heyat û jîyan e qebûl bikin) û de'wet û te'lîmata Hz. Mûhemmed, bi heyat û jîyanê teswîr û îfade dike; ji wî jî tê femkirin ku ew saxkirina Îsa ya mirîyan jî, heyat dayîna me'newî ye..Şifakirina derdên derûnîye.

Bi angorî 'eqîda Îslamê: "Mu'cîze jî -herwekî hemî ûmûrên xeybîye-" bi delîlên qet'îyî-ssubût û qet'î-yû-ddelalet û qet'î-yûl-mûrad, îsbat dibin; ku wek înkarîya wan mu'cîzeyên sabitên bi vî rewşî, îsnada mû'cîze yên nesabitbûyî jî bal pêxemberan va kufr e, divê ku di vî xusûsê da (di xusûsa îsnad û îsbat û înkarê da) mirov pirr bi dîqqet be; tiştên ku bi delîlên qet'î îsbat nebûbin, neyên îsnadkirin bal Pêxemberan va. (Wek ku pirrên dilsaf û dilsadeyan dibêjin ku: "bedena Hz. Pêxember hemî Nûr bûye, wek şûşa billor bê sî bûye" hem jî dibêjin ku: "dema Pêxember ji dîya xwe da bûye, 'ewran ewî hildane, birine û gocî kirine û...". Pirr tiştên dinên bê esl û bê astarên wekî wan). Ku Qur'an redda wan dike, bi serîhî (vekirî) dibêje ku: "Pêxember jî beşer e,

însanekî wek hemî însanan e, jê ra wehîy hatîye" û bes! Ku ji xwe wisa jî bûye. Kesên ku Pêxember nedîtibûn, nû dihatin bal Pêxember, dipirsîn: ku ji nav cemaetê, Pêxember kîjan e? Eger ku bi rastî, bedena wî wekî şûşa billor ba, bê sî ba, wekî însanên din neba, dê ji yê dinan kifşe biba, ne hewceyê bal vê pirsê va ba: ku kanê Pêxember kîjan e?

Divê ku mirov vê heqîqetê jî rind fêm bike: ku mumkînbûyîna tiştan tiştek e, bûyîna wan jî tiştekî din e; Xwedê qadir e, dikare ku hinek tiştan çêke û bike, lê nekirîye. Yanê bi kurtî: karîn û kirin ji hev cuda ne. çawan ku **melê meşhûr** jî gotîye: "Xwedê dikare evî çîyayî bi ket û korîgan û ka û ceh ke, kerê min pê têr ke, lê nekirîye û nake...".

Mûfredat: (c. mûfred) Yekoyekên tiştan, yekyekên ji komekî (bir bütünü meydana getiren şeylerin herbiri)

Mûhakat: Teqlîd, wekîtî kirin (bir kimseyi, bir şeyi taklit etmek, ona benzetmek)

Mûhal: Mehal, bê îmkan, tiştê ne mumkîn (imkansız, mümkün olmayan)

Mûhasebe: Pê ra hesab dîtin, hesab pirskirin (hesaplaşmak, hesap görmek)

Mûhawere: Peyvandin, mijûlayî (görüşerek konuşma)

Mûhtewa: Naverok (içindeki, içerik)

Mûhtîra: Bîranînek, bîrdarînek (hatırlatmak veya hatırlamak için yazılan tezkere)

Mûkteseb: Derdest, bi destketî, wergiraw (elde edilen, kazanılan)

Mûlaheze: Lêfikirandin, û mutalekirin, têbînî, têbînekî (düşünce, iyice düşünmek, tetkik etmek)

Mûmarese: Pêdaketin, pêdaketina ji boy zanîn û hînbûyînê ji boy mahirbûyînê (uğraşarak maharet kazanış)

Mûmkînat: tiştên mumkîn, tiştên dibeyî (mümkün olan herşey)

Mûraqebe: Jêwar, qontrolkirin (inceleyip vaziyeti anlamak)

Mûrûr: Derbas bûn, borîn, çûyîn (geçmek, gitmek)

Mûrûrî zeman: Derbasbûyîna demê (zamanın geçmesi, zamanaşımı)

Mûsbet: Erînî, erêyî, bi hawe (pozitif, olumlu)

Mûstesna: Awerte, awertekirî, yê qetandî (müstesna)

Mûtefekkîr: Kesê ku difikire, xweyî fikre (düşünen)

Mûtleq: Berela, reha, azad, ne girêdayî, bê merc û, bê qeyd û bend (kayıtsız şartsız)
Mûtmeîn: Emîn, dilrihet (içi rahat, şüphesi kalmamış, emin olan)
Mûqeddîme: Pêşek, pêşekî, pêşgotin (önsöz, önce gelen)
Mûqeyyed: Girêdayî, bendkirî (bağlanmış olan)
Mûwafiq: Lêhatî, di cîh da, ne dij (uygun, denk)
Mûxalif: Hemrik, dij (uymayan, zıt olan)
Mûzmer: Tê da veşartî (saklı, içinde saklı)
Mûzmerîyyet: Tê da veşartinî, di navdayî (gizlilik ve saklılık hali)

N:

Nebat: Rowele, roweke, rehêle, rehik (bitki)

Nebatat: (c. nebat)Rowekegan, rehêleyan (bitkiler)

Nerxandin: Nerx lêdan (değerlendirmek, fiyatlandırmak)

Nesep: Nijad, rekez (sülale)

Netîce: Duwayîk, zayeke, zuwe (sonuç, netice)

Netrik: Polik û pellikên hilalî, mangîleyên lerzane, şirrik (kadınların zinet takısı olan Hilali yapraklar)

Nezerîyye: Dîmane (görüş, düşünce, Doğruluğu ispat edilmemiş ilmi görüş)

Nezerîyyat: (c. nezerîyye) (nezeriyeler, görüşler)

Nîhan: Veşartî (gizli, saklı)

Nîrvana: Di Bûdîzmê da, Nîrvana ewe ku rûh ji elem û cefayên heyatê, ji tenasuxê (ji zivirandina bal bedenekî din va) riha be, xilas bibe, bi Brahman ra bibe yek (bighîje Xweda, di wucûda wî da fanî be, bi wî baqî bibe), întilaq (li Bûdîzm û întilaqê mêze bikin), (ruhun ermesi, yaşam sıkıntılarından, tenasuhtan kurtulup, Brahman ile bir olma haleti)

Nîsbet: Angor, angoreyîtî, munasebet, peywendî (ona göre, göreyi)

Nisbî: Angorî, bi angorî tiştên din (göreyi, diğerlerine göre)

Nittirandin: Pirr xweşik neqişandin, xemilandin (süslemek)

Niqandin: Ji xwe ra girtin, bijartin (kendisine ayırmak, seçmek)

Numûd: dîyar, xûyabûyî (görünen)

Numûne: Mînak (örnek)

Numûnedar: Mînakdêr, numûnevan (örnek sahibi, örnek teşkil eden)

Numûnexane: Cihê numûneyan (müze, sergi yeri)

P: Pej: Reh û rêşî, çiqil, hej, şax, şitil (saçak, çırpı, dal)

Q:

Qab: Qeder, miqdar, navbera koşê kevan û pêgirtoka wî (yayın kabzası ile köşesi arasındaki mesafe)

Qabî qewseyn: Miqdarê du kevanan, bi qederê du kevanan, kevanê wucûb û îmkanê (iki yay uzaklığı mesafesi, vucup ve imkan arasında bir makam, iki yay gibi yanyana gelen ve bitişen vucup ve imkan makamları arasındaki çizgi, hattı-fasile, en yakın mesafe ve miktar)

Qalûbela: Gotin belê, gotin erê (li bezma elest mêze bikin)

Qanûnên tekwînîyye: Qanûnên fîtrî, siroştî, sûnnetellah (tekvin ve yaratmakla ilgili kanun ve kurallar, fıtri ve tabii kanunlar.

Qanûnên teşrîîyye: Qanûnên damezirandî, yên wez'î (şeriat kanunları, yürütme kanunları)

Qardo: Qardox, Qardoxî, Baqarda (li Kurdê mêzekin)

Qedem: Ling, nig (ayak)

Qedîm: Kevn, herhebûyî (eski, ezeli olan)

Qîdem: Kevnîtî, bê berî, bê ewwil (evveli bulunmamak, ezeli olmak)

Qişt: Tûncik, ber'eniya piçûçik û xweşik (küçücük kakul)

Qizilbaş: Sersor, terefdar û peyrewên şah Îsmailê Sefewîyê Erdebêlî (.../1524 m.) yê ku damezroxê malbat û xanedana Sefewîyên Îranê bûye; Ku Şah Îsmaîl, di (1502 m.) bûye Şahê Îranê. (Dibêjin ku ew ji nesla Mûsa Kazimê kurê Ca'ferê Sadiq e), di cenga Çaldiranê ya meşhûra sala 1514 yê mîladê da, Yavuz Selîmê Osmanîyê barbar, ewî mexlub kirîye, welatê wî talan kirîye, texte wî jê standîye.

R:

Rabîte: Girêdek, ew tiştê ku bi wî girêdayîn çê dibe (bağlayan, bağlılık)

Rabîta terîqetê: Yek ji adet û ayînên terîqetê ye, îbaretê ji mûtleq girêdana mirîdan bi şêxê wan va ye; mûrîd di her fikr û kir û karên xwe da bi şêxê xwe va girêdayî ye, wekî wî dike, wekî wî difekire. (ku di bawerîya min da ev rewş û adet û teqlîd, mûxalif û dijê tewhîda Îslamê ye. Cûrekî pûtperestiyê ye. Bi navê tesewwufê ketiye nav tewhîda Îslamê û qirêj kiriye; lewra di tewhîda Îslamê da, girêdana bi xeyrê Xweda va qedexe ye, Dînê Îslamê, ji wan gemarrî û qirêjayan pak û paqij e, di dînê Îslamê da: divê ku ji xeyrê Xwedê tu tiştek, tu kes neyê mulahezekirin, ji tu kesî tu alîkarîyên manewî neyên telebkirin; Mirov serê xwe her ji Wî bi tenê ra dayne, her bi Wî va be, her ji Wî bi tenê alîkaritiyê bixwaze, Ewî binase, Ewî bibîne, Ewî mûlaheze bike û bess! Ku te'lîm û fermanên Qur'anê jî, di wî îstîqametê da ne: إيّاك نعبد وإيّاك نستعين"/ الفاتحة "Em her ji Te bi tenê ra, îbadet dikin û her ji Te bi tenê alîkarîtîyê dixwazin." (Sûre yê Fatîhe/5).

Melayê Cizîrî jî wiha dibêje :

Mela her Wî bibîn her Wî, eger her Wî dinasî tu
Huwel-Me'bûd û wel-Meşhûd û bel-laxeyre fiddareyn.

"Ey mela eger tu bi her awayî ewî (Xwedê) nazdikî, ewî bi xwedayî dizanî û fêmdikî, tu her ewî bibîne, her ewî mûlaheze bike; ji ber ku ji wî bêtir di herd û êwirgeh û avayan da (di dunya û axiretêda)tu tişt tune, her ew heye, ew bi tenê peresteye, di hemû tiştanda ew dixuyê, ewe û hew!.."

Rebb: Xweyî, xwedan, terbîyeker, Xweda yê xweyîker (sahib, malik, besleyen, yetiştiren, Cenabı Hakk)

Rebbanî: (Rebbanîyye): Îlahî,xwedayî, tiştê ku peywendîyê wî bi xwedava heye, bi cenabê heqq va 'elqedare, (Cenab-ı Hakk ile ilgili)

Rebbaniyûn: Ew kesên ku xwe bi temamî dane Xweda, xwe bi wî va girêdane (kendisini tamamen Cenabı Hakka vermiş olanlar)

Rehwan: Xweşikmeş, hespê rehwan, hespê xweş meş (rahvan at)
Remz: Îma û îşaretê pirr xeff (gizli işaret) (li kinayetê mêzebikin)
Resmî: Mîrî, fermî
Re'y: Fikr û dîtin, bîr û bawerî, î'tîqad û qenaet (fikir, görüş)
Rîayet: Bi cîh anîn û pêkanîna hukm û fermanan, parastina wan, mûhafezekirin, îhtîram (iyi karşılamak, uymak)
Rîza: Xuşnûdî, pesendî (Razı olmak beğenmek)

Rîzayê îlahî: Razîbûyîn û vayîna Xweda, tiştê ku Xwedê jê razî ye û divê, ku hemî tişt û karên qenc û baş riyên îlahîne, azadî û serxwebûna mirov û mîlletan jî, ji hemî tiştên qenc û baş, qenctir û baştir e, riza Xweda ya herî mezin û pîroz jî ewe û di wî da ye. (İlahi beğeni ki her türlü yararlı işler ve iyiliklerdir, kişilerin ve milletlerin özgürlük ve istiklalleri ve bu yoldaki çabalari da, rızayı ilahiyenın en kutsalıdır)

Rûh: Can, cewherekî mûcerede, letîfekî îlahaîyê pîroze, ji 'alema emre, ٨٥- إسراء/ قل الروح من أمر ربّي cîlwa îrada îlahîye, quwwet û qanûna candarî û heyatê ye, meqanîzma şu'ûr û hereketa îxtiyarî û lept û lepatê ye, qanûnekî xweyî şu'ûr e, sirr û mû'emmakî hûr û kûr û dûr e, elektrîk û ceryana santralekî îlahî ye, ku di ampûlên bedenên maddîyê însanî û heywanî da tecellî bûye, xeleka tetewwûr a zencîreya xîlqetê ya dawî ye: Tecelî û feyza wucûd û hebûna heqqa mûtleq, mexlûqê seretayî ('eqlê ewel, 'eqlê kull), nefsa kull (kîyana hemî), Heyûla û sûret, madde û mûddet, terkîb û kîsret, xurek û nûtfet (sperm û beyze), 'eleqet û mûdxet (xûn pare û goşt pare), tekûzî û tekamul, nefxa heyatê, mexlûqekî nûh: (rûh û bedena însanî) ١٢-١٣-١٤ المؤمنون / (فتبارك الله أحسن الخالقين ....) ku bi kurtî, mirov dikare bibeje: "rûh, qûmanda û qûmandakirina televîzyona bedena maddî ya amade bûyîyê ji jîyanê ra ye. Cîlwa îrada îlahî ye, fermana wî ya tekwînî ye, nefxa (puf kirina) wî ya me'newî ye ٩ – السجدة / (ونفخ فيه من روحه ....) " (li nefsê û felsefê meyze bikin!)
Rûhanî: Alema rûhan, tiştê ku peywendîyên wî bi rûhan va ye, me'newî (ruh alemi le ilgili şey)
Rûhûlquds: Can û kîyanê pak û pîroz û hilbijare. Yek ji navên **Cîbraîl** e jî (seçilmiş olan kutsal ruh)

S:

Sensikrîtî (dînê senskîtî), senkirîstî: Dîn û mezheb û bawerîyên kevnên arîyanîyên Kurdistanî (wek Mitraî û Alawîtî û Êzdîtî û Kakaîtî û 'Elîîlahîtîyê) ku tev li ser hev -wekî baqekî ji gulên rengînên cûrbecûr- yek baqekî ye, ji çend cûrên çend gulan çêbûye; her gulekî ji wan bi serê xwe gulek e, digel gulên din bi cîh bûye, baqekî gulan ji wan tevan teşkîl bûye.

Sensikrîtî, Sansikrîstî (synsrektism): Luxetekî dînîyê ebedîyê qedîm e. Serek û serkanîya luxetên Hindî ye, luxetên Hindî jî yek ji şu'beyên (ji beşên) luxetên Hind û Ewrupî ye; Sensikrîtî ji beşa Hindû û Îranî ye, ji beşa Hind û Ewrupîya Asyaî ye. Dînên Kurdistanên kevn hemî Sensikrîtî ne; mirov dikare ji hemî dînên Zagrosîyên (Kurdistanîyên) kevin ra -li ser hev- bibêje Sensikrîtî, dîyaneta (Sensikrîtî), ku -wek baqekî gulên rengbireng- li ser hev yek tiştek in, yek baqeke.

Sermedî: Hertimî, daîmî (sürekli, ebedi)

Sermedîyyet: Herheyîtî, tim û tim heyyîtî (süreklilik ve her an varolma)

Sernuwuşt, sernuwişt: Sernivîs, serhatî, qedera Xweda, teqdîra ezelî (yazı başlığı, başyazı, kader, alın yazısı)

Sûbarî: Sûbarto, (li Kurdê mêze bikin)

Sîh, Sîx (Sîhîzim): Mezhebekî reformîst e, di qirna 15. dan da, li **Pencabê**, ji alîyê Papaz **Nanak** (1469/...m.) da, dijê te'lîmat û ayînên îfratiyên Hindûîzmê hatîye damezirandin, dijî rejm û nîzama **Kasta** ya Hindistanê (nîzama ferqa di navbera sinifên însanan da) bûye, wek îslah û reformekî dîn û siyasî derketiye holê; armanca wî, rakirina teessub û xurafeyan, te'sîskirina wekhevîtî û biratî û 'edalet û însaniyetê bûye. Yanê Mezheb û fikrekî alemşumûl e.

Ş:

Şax: Leq, çil, pej (dal,fidan)

Şa: şad, şadan (sevinçli)

Şah: padişah (padişah, qiral)

Şahane: Tiştê ku sezawar û laîqê şahan e (şahlara mahsus olan çok güzel ve değerli)

Şahradibe: Bi kêf û neş'e radibe (sevinçli ve neşeli kalkar)

Şahradibe: Wekî şahan radibe, wek şahan hêz dide xwe û radibe (şahlar gibi kalkar)

Hespê wî Şah rabûye: Pîkolî dike, şîhe-şîh û hirre-hirra wî ye, rabûye ser her dû lingên xwe yên paşîn, wekî hespên şah û qiralan xwe ji bezandin û hêrîş kirinê ra amade kirîye. (Atı şaha kalkmış)

Şeklî: Bi dîtina li ber çavî, zahirî (dış görünüşe dair)

Şerî'et: Rê, rêke, rêya Xwedê û pêxember, qanûna ilahî (yol, Allah'ın doğru yolu, ilahi kanunlar)

Şewq: Pirr arzûkirin, Îştiyaq, arzûmendî, vayîn (çok istek, şiddetli arzu)

Şî'e, şe'î: Tabi' û terefdarên Hz. 'Elî, Peyrewên mezhebê Ce'ferî (Caferê Sadiq-699?-765 m.), ku dibêjin: di pey Pêxember ra, xelîfetî (canişînî) heqqê Hz. 'Elî ye, bi neheqê ketiye destê Hz. Ebûbekir û Hz. Ûmer û Hz. Osman; ku cûrekî wan divê xusûsê da, pirr îfrat dikin: ji Hz. Ûmer û Hz. Aîşeyê ra gotinên ne munasib rewa dibînin, galegalên ne qenc dikin; di zarava kurdî da ji wan cûrê şîî'yên Îmamîye ra, **Çarek** dibêjin, (yanê ewên ku ji çar xelîfe yan yekî bi tenê (Hz. 'Elî) qebûl dikin), ji wan ra **Îsnaeşerîyye** (donzdeyî) jî, tê gotin. Ku bi angorê baweriya wan, donzde (12) Îmam hene, ew jî evana nin: "Hz. 'Elî, Hz. Hesen, Hz. Huseyn, Zeynel'abîdîn, Mûhemmed Baqir, Caferê Sadiq, Mûsa Kazim, 'Elî Er-Riza, Mûhemmed El-Cewwad, 'Elî El-Hadî, Hesen El-'Eskerî, Mûhemmed El-Mehdî yê kurrê wî (muhdîyê mûntezer)." Ku di 873 m. da xef bûye; dibêjin ku "Dê ew diaxirîya zemanda derê û dunyayê tijî 'edalet bike." Millekî din jî, ji mezhebê şîîyên Îmamîyye, **Îsmaîlîyye** ne ku ew gurûha Îsmaîliyye jî dibêjin; ku "di pey Caferê Sadiq ra Îmamiyyetî heqê kurrê wî yê Îsmail e, ne yê kurrê wî yê Mûsa Kazim e" ji Îsmaîliyye yan ra **Seb'îyye** jî tê

gotin. Ji ber ku dibêjin : îmamê sabi' (yê heftemîn) îsmaîl e.
Îsma'îliyye yên Fatimiyye jî, dibêjin ku : lazime Îmam, ji Hz. 'Elî û Hz. Fatime yê be". Ku ji wan ra **Batinîyye** jî tê gotin. Ji ber ku ew dibêjin: "ji Wehyê ra, ji Qur'an'ê ra, me'nekî batin û xefê bi dizî heye, ku meqseda heqîqî jî ew e". **Nûseyrî** û **Durzî** (terefdarên Mûhemmedê kurrê Nuseyr û 'Ebdullah Mûhemmedê Derezî (1019 m.) jî, ji beşên wan in. **Qûrmutî** (terefdarên Hemdanê Qûrmit) jî, ji Batinîyyan in û pirr şerrûd û mûfrit in,ku ji van bêtir gelek gurûhên şîîyanên din jî henin.
Şînto (shintaw): Dînê Japonyayê resmî yê qedîm e; hîmê wî li ser teqdîs û hurmeta rûhên mirîyan (rûhên bav û kalan)û qûwwetên tebî'îyye ye. Peresteyê wanê herî mezin "Ematîraso" ye, ku mûmessil û sembola rojê ye; Şîntoî bawer dikin ku **Mîkado** (qral û hukûmdarê wan) ne însanekî wekî wan e, belkî wekî rojê, wekî hîvê, wekî çîyayê **Fûcî** (Fujî) yê, muqeddes û pîroz e. Herdû kitêbên wan ên pîroz (Kûgîkî û Nîhûngî) jî, wilo dinivîsin. Heta îro jî, bawer dikin ku **Hîrohîto** yê împaratorê wan, nebîyê 124. ê **Amatîraso** yê Xweda yê rojê ye
Şîntoî, ji çîya û deşt û newalên welatê xwe ra îbadet dikin, wekî Xweda jê hezdikin û ewan diperêsin.
Şînto, ji du bêjeyên bi zimanê Çînî ye; Şin=Rûhên xêr û qenc, Taw=Rê, quwweta pîroza fe'aal, ku li ser hev bi zimanê Çînî bi me'na "rê ya bal rûhên xêr û qenc" va ye.
Şirk: Heval û hembeş çêkirin (ortak koşmak, ortak kabul etmek, özellikle Allah'a ortak kabul etmek)
Şubhet: Misil, wek (benzer,benzerlik)
Şubhe: Tereddud, ne yeqînî, dudilî, dilxişûşî (şubheli olmak)
Şûhûdî: Dîtî, têgehîştî, keşîfbûyî, peywendê bi şûhûdê va (keşif ve görmeye dair, görülebilir olana ait)
Şûhûd: Dîtin, dîtina derûnî, dîtina eqlî û qelbî, têgîhîştina menewî (müşahade etme, akıl ve kalp gözüyle görme)
Şûtrî: Pellikên hîlalîyên (hîvokîyên) serpoşên jinan, şirrik. (kadın serpoşlarının hilalli saçakları ve madeni zinetleri).

T:

Talî: Li dû, di dereca dawîda, ne li pêşî, pirr ne mûhîm (ikinci derecede olan, tabi)

Teberra, ʿeberrî: Dest jê kişandin, dev jê berdan (vazgeçmek)

Te'bîr: Gotin, bêjî, beyankirin, (beyan etmek, ifade etmek)

Tecellî, tecella: Xuyabûn, xuyabûyîn, xuyanî (görünme)

Tecellîgah: Xûyange, diyarge (görünme yeri)

Te'dad: Hejmartin, hejmare (saymak, sayılar haline getirmek)

Te'eyyûn: Eşkera bûn, li ber çavayî, (aşikar olmak)

Te'eyyûnat: Derketinên ber çavan (belli olmalar, meydana çıkmalar)

Tefrîq: Ji hev qetandin, (ayırmak)

Tefsîr: Ravekirin, (izah etmek)

Tehlîl: Şêkirin, şîkirin, ji hev qetandin, ji hev deranîn (araştırma, analiz)

Tehwîl: Anîna ji rewş û halekî bal rewş û halekî din va (bir halden başka bir hale getirmek)

Tekwîn: Çêkirin, peydakirin, (yaratmak, meydana getirmek, icat etmek)

Tekwînî: Çêkroxî, yê ku peywendî yên wî bi tekwînê ra heye. (tekvine, yaratmaya dair)

Tekwînîyye: Qanûnên tebîʿî, qanûnên siroştî, (tabiat kanunları)

Telmût, Telmûd: Navê kitêba pîroza dînê cuhûyan e, ku piştî Tewrat'ê hatîye amade kirin û bi du beşane:

a- Mîşna,

b- Gamara (tefsîra Mîşna yê) û du nusxeyên wî hene, 1-Telmûta Filîstînê, 2- Telmûta Babîlê.(ku nusxa mezin jî ewe) Telmûtê, ji fikr û te'lîmatên dînê Zerdeşt pirr îlham hildaye, jê îstifade kirîye.

Telxîs: Xulasekirin (özetlemek)

Telwîh: Telmîh û îma, îşaretkirina bi şirove, (li kinayetê mêze bikin) (dolaylı ve oldukça kapalı söz söylemek)

Temkîn: Bi cîhkirin, bi hêzkirin, bi quwwetkirin, sabitdêran, ling bi cîhkirin (iktidar, muktedir ve sabit kılmak)

Temrîn: Nermkirin, hînkirin, te'lîmkirin (yumuşak etme, idman ettirmek, egzersiz)

Temsîl: Beyankirina bi mîsalan, mîsal anîn, mînakdayîn (bir şeyin

misalını vermek, yapmak ve birşeyi temsil etmek)
Tenasux: Beden guhestina rûh û can, întiqala ruh ji bedenekî bal bedenekî din va (ruhların bir bedenden başka bedene intikal etmesi). (li Hîndûîzmê mêze bikin!).
Tenzîm: Bi rêzkirin, bi ahengkirin (sıraya koymak, dizmek)
Teqarûb: Nêzîkhevî, hevnêzik bûn (birbirine yakın olmak)
Teqerrub: Nêzik bûn, nêzikbûyîn (yakınlaşmak, yaklaşmak)
Teqlîd: Wekeyîtî, wekîtî, mînakîtî kirin, xwe sipartin û qebûlkirina fikr û mezhebekî (benzetmeye ve benzemeye çalışmak, başkasının görüşünü benimsemek, onun gibi olmaya çalışmak)
Teqrîr: Qenc îfadekirin, rind beyankirin, (iyi ifade etmek, anlatmak)
Teqwa: Parêzgarî, xweparêzî, xwe parêztin, parêzgarîya ji gunahan (günahlardan kendini korumak)
Teqwîm: Duristkirin, xweşik çêkirin, zeman kifşkirin, salname (düzeltme, kıvamına koyma, takvim)
Teqyîm: Nerxandin, (fiyatlandırmak)
Tertîb: Rêz, rêzkirin (dizme, sıralama)
Terîq: Rê, rêye (yol)
Terîqet: Rê û mesleka tesewwufêya bi taybetî (Tasavvuf yolu)
Te'rîf: Danasîn, danaskirin, dazanîn (belirtmek, tanıtmak)
Terkîb: Di gelhevkirin, li hev suwarkirin, li hev dêran, awêtekirin (birkaç şeyin beraber olması, edilmesi, bir araya getirilmesi)
Te'rîz: Di ber ra avêtin, îmakirin (bir şeyi imalı ve kapalı ifade temek)
Teserra: Xwe şakirin, çûyîna li pey zewq û hewesan (keyflendirmek, zewk pêşine düşmek)
Tesewwur: Bi sûretbûyîna tiştekî di zîhn û hissê da (bir şeyin zihinde şekillenmesi)
Teshîh: Rastkirin (düzeltmek)
Teslîs: Sisê kirin, bawerîya bi sê ûqnûman (yek sisê ye, sisê jî yek e) ku bi angorî bawerîya îsewîyan, **Xweda** û **Îsa** û **Rûhul Qudus** yek tiştek in. (üçleme, hristiyanlara göre: Allah üç şeyin birleşmiş olmasından ibarettir, bazılarına göre de, üçü Allah'tır ki bu da Hinduizm'in birnevi kopyasıdır.)

Tesxîr: Ram kirin, berdest kirin (zapt etmek, ele geçirmek).
Teswîb: Erêkirin, rastdîtin, (uygun ve doğru bulmak)
Teswîr: Sewirandin, bi sûret kirin, resim kirin, (tasvir etmek, şekillendirmek)
Teswîr dike: Şekl û sûret didê, neqş û sûretê wî çêdike, disewwirîne (suretlendirir, şekillendirir)
Teswîrî: Bi teswîr, temsîlî (tesvir ile ilgili, tasvire dair)
Teşbîh: Wekîkirin (benzetmek)
Teşrî': Rê danîn, rê vekirin, qanûnçêkirin. (yolu açık ve vazıh kılmak, kanun vaz' ve tenfiz eylemek)
Teşwîq: Davayînî, daxwazandinî, şewqdêran, da arzû kirin, (şevklendirme, isteklendirme)
Tetewwûr: Çûyîna ji tewr û halet û rewşekî bal rewş û haletekî din va, gav bi gav pêşva çûyîn. Merhele-merhele pêşketin. (bir hal ve durumdan başkasına geçmek ve ilerleme)
Tetmîn: Dil rehetkirirn, serwextkirin, (ikna etmek, rahatlandırmak, emin etmek)
Texdîr : tevizandin (uyuşturmak)
Tewbîx : Lome kirin (azarlamak)
Texennî: Dengbêjî, stiran (şarkı söylemek)
Tewatur: Li peyhevhatin, (biribiri ardına gelmek, zahir olmak)
Tewsiye: Rastfêrî (öğütleme)
Teyy: Li hev pêçan, kumkirin, lûrkirin (dürmek)
Tezad: Dijhevî (birbirine zıt olması)
Tezahur: Eşkera bûn, xuyabûn (belirme, meydana çıkma)
Tezkiye: Pakkirin, paqijkirin, temîzkirin, (pak ve temiz etmek)
Tezkiyeî nefs: Temîzkirina derûnî, temîzkirin û pakkirina ji qusûr û kêmasiyan, (nefsi temiz tutmak)
Tilisim, tilsim: Sirr û raz, quwweta manewî, afsûn, efsûn (herkesin bilip çözemediği gizli şey, fevkalade kuvvet ve tesire sahip olan manevi şey, definenin bulunmasına mani olan mevhum şey)
Tomar, tûmar: Pêçîde, pêçîyakewe, defter (dürülüp yuvarlak yapılan şey, dosya, defter)

Û:

Ûmm: Dê, dayîk (Anne)

Ûmmî: Dayîkî, yê ku wek hêj nûh ji dayîka xwe da bûye; xwendin û nivîsarê nizane -we yan rind nizane-, sade tebî'et û pakderûn. Ku di dema Mûhemmed pêxember (a.s) da, 'ekserê qebîla Kureyşîyan (Kureyşî: qebîla Hz. Mûhemmed ku ji 'erebên mûste'rebe-asîmîlebûyî- bûne, bi eslê xwe ne ereb bûne, lê di nav erebanda mane, 'helîyane û bûne 'ereb), ûmmî bûne; Hz. Mûhemmed jî ûmmî bûye, lê nezan nebûye, ûrf û adet û adabên exlaqî û civakî yên demê (kultura demê), qisse û macerayên pêxemberên borî, qenc hînbûye û baş zanîbûye; di seferên xwe yên bazirganîda, pirr tiştên civakî û kulturî, bi devkî û bi riwayet û bi ditîn û bihîstin û sehkirinê hînbûye. Ku ji xwe, ekserê metoda hînbûn û zanîna wê demê, şifahî û pratîkî bûye.

Hz. Mûhemmed, bi mehan, bi salan, di cihên tenha û sakin (wek şikefta **Herra** yê) da , li ser çare û metod û pîlanên îslahî, fekirîye û mûhakeme kiriye; hetta ku temenê wî yê mûbarek bûye çil sal, 'eql û fikr û mêjûyê wî, rûh û qelbê wî yê pak, şuûra wî ya derûnî, gihîştîye û tekamûl kiriye. Ku di pey ra, bûye mezherê 'îlm û irfana herî wala û bala, herî bilind û pîroz; bûye mezherê wehyê (îlhama derûnî. î'lama îlahîya pîroz). Ku dereca 'îlm û îrfanîya herî durust û mutekamil jî, ew e (li wehyê mêze bikin). Ku di qeneata min da: tefsîr û şîrove kirina ûmmîtîya Hz.Mûhemmed bi derûnpakîtî û sroştpakîtîyê, çêtir û laîqtir û mûnasiptirê şanê wî şexsîyyeta alîcenab û wala û bala ye. Lê me'lesef! 'Eql û îdraka pirrên rehrew û dilxwaz û senaxwanên wî zatî alî, di çavên wan da ye.

Ûns: Aşînayî (alışma, ünsiyet)

Ûqnûm: Bineret, esas, ûnsûr (asıl)

(**Eqanîmê erbe'e**) Çarbineret, çar ûnsûr = Av, ax, hewa, agir (dört asıl, ana madde: su, toprak, hava, ateş)

Ûslûb: şîwaz (ifade ve anlatım tarzı, tarz, yol, biçim)

Ûrarto: Orarto, Ararto (li Kurdê mêzebikin)

Ûxra: Ya din, ya ku paşê tê, ya di dawîyê da (başka, sonra, son)

Ûxrewî: Tiştên axretê, tiştên alema dawîyê (öbür dünyaya dair, ahiret ile ilgili)

W:

Waqiî: Yê bûyî, heqîqî, (olmuş ve var olan, bilfiil mevcut olan)

Wehy: Dilxurpîyan, avêtina dil, dakirina di 'eql û hiş da, agahdarîya derûnî, peyxam, îlham, dazanîna îrfana xwezaî.

Wehya Îlahî: Peyxam û îlham û xurpîyana Xwedaî, agahdarî û têgihîştandin û dazanîna ku ji teref Xweda da ji pêxemberan ra tê, ji dil û 'eql û hişên wan ra tê îlqa kirin. Bi te'bîrekî din: "Wehy, bawerîya ku ew dazanîn û îlham û îrfan û peyxam,ji feyyazê mûtleq daye, ji Xweda ye; îrfan û îlham û dazanîneke Îlahî ye". Ku ew îlham û îrfana pîroz, carnan -di hinek dem û haletên îstîxraqî, û îşraqî da- di neynik û dûrbîna 'eql û besîretê da, bi deng û sûret û mîsalan temessul û tesewwur dibe, dixuyê, tê dîtin û bîhîstin. (Wek ku Hz. Muhemmed, di hinek caran da, mûmessilê wî 'eqlê kull, wî îlmê Îlahîyê pîroz, (**Cibraîl**) di sûretê Dehîyye yê hevalê xwe da didît).

Eger te'bîr û temsîl di cîyê xwe da be, "wehy Xewna bi hîşyarî ye, dîtina xewna heqîqetê di haletê yeqzetê (halêtê hîşyarîyê) da ye; di haletê ji xweçûyîn û rûtbûyîna ji lîbasê **Nasûtî** (ji cilê maddî), gihîştina bal pîrozgeha **Lahûtî** va ye. Têgehîştina wî îrfana wala ye", ku dema hezetî Mûhemmed ji wî haletê îstîxraqîyê pîroz da bi xwe va dihat, vedigerriya bal haletê xwe yê tebî'î, bal Nasûtiya xwe va, wan têgehîştin û teleqqîyên pîroz- wek ku dîtibû, wek ku bihîstibû, derk kiribû- digot û dixwend û dida nivîsandin, dida ezber kirin. Ku ew haletê îstîxraqî û derûnî, ew teleqqîya pîroz, carnan ji hinek mutefekkir û mutesewwifên gihîştîra jî, çêdibe. Lê dereca wî ya herî mezin û kamil û wala, ewa xassê bi pêxembera ne. Ku di bawerîya her bawerkeran da jî, dereca wî ya herî walatir û balatir jî, xassê bi pêxemberên wan e, ji pêxemberên wan ra bûye.

Felsefa Îşraqî û îrfanî jî, îfadekirin û şirovekirina wî haletê bi taybetîyê derûnî, bi terzekî îlmî û felsefî û şûhûdî ye; bi felsefa Wehdetîl-Wucûd û Wehdeti-ş-şuhûdê jî, ew haletê işraqî û îrfanî, (wehy û îlham, wehdet û heqîqet), çêtir û hêsatir tên fêm kirin û îdrak kirin.

"Xwedê, me ji mezherîyyet û têgehîştina wî îlm û îrfanê mehrûm û bê par neke!... Amîn".

Wecd: Îşq û mehebbet û evîndarî. (şiddetli aşk)
Weraset: Wiraset, warisbûyînî, mîrasdêrî, rekemaî (miras da hak sahibi olmak, mirasçılık)
Were': Zêdeparêzgarî, pirr xweparastin, parastina ji hemî qedexe û neqencîyan. (takvanın ileri derecesi, bütün günahlardan çekinme haletî)
Wîcdan: Qûwweta me'newîya ku tiştên qenc û xirab ji hev diqetîne, hiss û îdraka derûnî, qelbî û rûhanî (iyiyi kötüden ayıran manevi his ve derûni kuvvet)
Wîcdanî: Yê ku derka wan bi wijdanê bi wê, quwweta me'newî tê kirin (vicdana dair, vicdan ile idrak olunan şey)
Vîda (Vedas): kitêbên pîrozên Hîndê yên herî qedîm (1500bm.) ku çar beşên bingehî dixweda digirin:
1- Rigveda-Veda agirî-(temcîdat û te'lîmat)
2- Samaveda-Veda rojê- (Stran û terennûmatên Qurbanan)
3- Yajûrveda-Veda hewayê
4- Eserva Veda- kitêba feqîran- (ness û maddeyên efsûnî û sihrî)
Vedanta: Xatîma Veda yê(dawîya Vedayê) ku çend perçeyên ji "Ûpanîshad"ê ne. **Ûpanishad** jî, nessên 180. mûhawere û guftûgoyên îlmî û felsefî ne. Ku di navbera salên (800-500bm.)da hatine te'lif kirin û îlhaqê Veda yê kirine û bûne hîmên bingehîyên fikra felsefîya hîndî.

X:

Xaldî, kaldi: (li "Kurd" ê mêze bikin) ("Kürd'e" bakın)

Xass: Taybet, taybetî, ne xam (özel, kaliteli)

Xaznak: Fennek, qurnas, ji binva (kurnaz kimse)

Xerîze: Remek, xîlqet, tebîet, xûy, bingeh, fitret (yaratılış, yaratılıştan olan)

Xewf û rica: Tirs û hêvî (korku ile ümit)

Xûrî, mîtanî: (Li "Kurd" ê mêzebikin) ("Kürd'e" bakın)

Y:

Yedek: Soxme, kurtikê jinan ku bi ser dêrîyên xwe da vedigirin (yelek, bir nevi kadın giysisidir)

Yêdek: Yekî din, bedel (yedek)

Yelmûm: Çoleçira, şoleçira, mûma pirr bi şu'le û şemal (kuvvetli mum, meş'ale, avcı meşalesi, çöl feneri)

Yezdan: Îzid, Îzed, Xweda, Xaliq, Allah, Ahoramezda..

Z:

Zahîre: Diyarde (görünen şey)

Zerdeşt: (660-583/5.b.z.) Zerduşt, Zerdheşt, Zeradeşt,(Zoroaster-Zaratustra) Lawê Pûrşesp (Pûreşsp) ê lawê Bîtiresp e, navê dîya wî jî, DOĞDÛ (Doghdûma) bû ye, li bajarê Meraxa yê (ku li rojhilata deryaça Ûrmîyeyê ye) hatîye dunyayê, (dibêjin ku: ji sulala **Menûçehr** û **Ferîdûn** e), yek ji Pêxemberên Arîyan ên herî mezin û namîdar e, feylesof jî bûye (wek ku **Mehabad** û **Geyûmers** û **Hoşeng** û **Tehmûres** û **Cemşîd** û **Ferîdûn** û **Menûçehr** û **Keyxosrew** û **Cîefram** û gellekên wekî wan jî, hem pêxember bûne, hem jî hukumdar) Zerdeşt pêxember di cenga navbera Îran û Tûranê da, di me'bedxaneya BELXÊ da, di gel heyştê (80) kahin û rahib û mûbedên (abidên) hevalên xwe, şehîd bûye (cenawerên Tûranîyan, ewan hemîyan bi wehşetekî mezin kuştine).

Dînê Zerdeşt (a.s), (Zoroastranism) bi kurtî, 'îbaretê ji: "Pindarê nîk, guftarê nîk, Kirdarê nîk" (fekirandina qenc, peyvandina qenc û kar û barên qenc û baş) û vî bîr û bawerîyê ye: "Xweda (Ahoramezda), XÊR û qencîya mûtleqa ezelî ye, nûr û rohnayî ye, Mûlaheza îmkana hebûna dijê xwe kirîye, ku ji wê fikr û mûlahezeya Wî, **Ehremen** (Îblîs) peyda bûye, temsîl û terefdarîtîya tarîtî û şerrê kiriye, bûye mumessilê wan û dij û muxalifê **Yezdan**, di navbera wan da mûcadele û tekoşînî dest pê kirîye û dewam dike, hetta ku di dawîya dawî da, **Xêr** bi ser dikeve, serr jî mexlûb dibe. ku wê demê jî seadeta ebedî teheqqûq dike. Zerdeşt Pêxember di yek ji Gatên (fesl û beşên) kitêba xweya pîroz "**Awesta**" da jî, wiha mûnacat dike û dibêje: "Ey Yezdanê pîroz! Em cilwe û çirûskekî ji pertewa Nûra Te ya ezelî û ebedî ne". Ku ew jî felsefa bawerîya wî ya tewhîdî telxîs dike.

Di dînê Zerdeşt da 'ezabê Cehennemê, cezayê gunehan jî, mûweqqet e û bi angorê guneha ne, ne ebedîye; gunahê herî mezin jî, îstismara însana û keda wan, tecawuza heqê wan e, yanê bi kurtî: Dînê Zerdeşt hem dînekî exlaqî û felsefî ye, hem jî tebî'î û siroştî ye. Ehemmîyetekî pirr mezin daye madde û tebîetê û nîzam û qanûnên tebî'î. Ku di dînê wî da, nîzam û ahenga alemê

nîşan û burhana xêr û cemal û kemala mûtleq e, delîl û îsbata hebûna pîroza Ahoramezda (Yezdan=Xweda) ye. Ku Qur'an jî, bi wî delîl û burhanê (bi nîzam û ahenga alemê) îsbata Ûlûhîyyet û Wehdanîyetê dike, ji qanûnên tebîî ra "Sunnetellah= adetên Xweda", ji dînê Îslamêra jî dînê fitret û xilqetê dibêje. Ku yanê: Qanûnên teşrîî (şerîeta Îlahî, wehya semawî) teqrîr û tefsîrên qanûnên tebîî ne, kopya û teswîrên wî ne, fermana bi îtaetkirin û rîayetkirina ehkamên wan qanûnên tebîî û wan Sunnetellahên tekwînî ne.

Lê meelesef, sed mixabin! Pirr nivîskarên yobaz û mûteessib, pirr dîndarên sextekar û hişk, hem evî heqîqetê fehm nekirine û naxwazin ku fêm jî bikin, hem jî derheq Wî pêxember û feylesofê mezin (Zerdeşt) da, pirr bê hurmetî û bê edebî, pirr çewtî û xeta yên mezin kirine û hêjî dikin; pirr kesan jî, -bi nezanî, we yan bi zanatî û dijminî- dînê Zerdeşt çewt û şaş teswîr û teqrîr kirine; Dînê Zerdeşt û **Manaîzm** û **Mezdekîzmê** tevîhev kirin û dikin, di yek qalibek da ro dikin, bi yek rewşek beyan û îfade dikin.ku di bawerîya min da, ev jî xeta û şasîyekî herî mezin e, bê însafîtî û kîndarîtî ye, nezanîtî û tevlihevîtîye; ji ber ku: Manî (216-277 m.) damezroxê mezhebê Manewîye, mezhebê xwe ji dînê Zerdeşt û Îsa, ji felsefa Yûnan û Mîtra û fikr û bîr û bawerîyên cûr be cûrên din, kom kirîye û li hev anîye û pêşkêş kirîye. Ku pirr kes jî dibêjin: dînê Ezdîyan jî, ji wî da hatîye, lê di bawerîye min da ew jî çewtî û şaşîtîyekî dine. Lewra dînê êzdî, yek ji dînê Kurdistanê yê herî dîrokî û qedîm e...

Manî, neqqaş û nîgarendekî meşhûr e, bi taybetî di neqş û teswîrên Cinn û Perî û melaîket û şeytanan da, pirr hunermendekî mezin bûye. Bi tehrîka mezdekîyan, Behramê yekemînê Sasanî, ewî îdam kirîye (277 m.)

Mezdek jî, ji etba û terefdarên mezhebê Manî bûye, di qirna 5. an da, di Îranê da şoreş û tevlihevîtîyekî pirr mezin kirîye, gotîye: -jin jî daxil-, divê ku her tişt (mal û mulk û serwet) di navbera însanan da muşterek be", hetta ku **Kisra Enoşirwan**, ewî îdam kirîye û dînê Zerdeşt ji nû ve îhya û îcra kirîye. Ku di heqîqet da, 'elaqe û peywendîyên **Mazdaîzm** û **Manaîzmê**, bi tu awayî bi dînê Zerdeşt va tune. Ev qeder heye ku ewan, dînê Zerdeştê -ku

hîmê wî li ser tewhîda heqîqî bûye-, tehrîf û teşwîh kirine.
Bi kurtî: "Hemî dînên semawî, -wek bîyek- xelekên cûr be cûrên zincîlekî pîroz in, form û reform û tekamûl û teqlîd û kopyayên hevin. إنّ الدين عند الله الاسلام = Bi rastî dîn li nik Xweda îslame, rambûyîn û aşîtîye) ku bê gûmân, dînê Zerdeşt jî yek ji xelekên girîngê wî zincîla semewî ya pîroz e".
Zewq: Çîj (tatma, lezzet alma, hoşa gitme)
Zîrve: Lotke, pope (doruk, birşeyîn en yüksek noktası)
Zûmn: Nav, hundir (iç taraf, dolaylı anlatılan)
Zuhd: Devberdan û destkişandina ji dunê, ji zewq û hewesên nefsanî (nefsanî zevk ve arzulardan kendini çekerek ibadete vermek)
Zûmnî: Di binra, di navra, bi îma û îşaret (gizli, açık olmayan).

FERHENGOKA TESEWWÛFÊ

(A)

'Alem: Hemî xelq, (ji xeyrî Xweda her tişt, ku belge û nîşanên wucûda mûtleqa ezelî ne), sîya tecellîya wî ya duwemîn. bi te'bîrekî din: Alem tecellîya wucûda heqq e, ku di sûretên mûmkînatan da xûya bûye; ew sûretên mûmkînatan, bi navê Alemê, Masûwa yê, Es-Sûwa yê, El-xeyrê, Navdêr bûne. Yanê: nîsbeta wucûda heqq, bi alî mûmkînatan va hatîye danîn, mûmkînat dîyar bûne. Ku ji xeyrî wî nisbetê, ji mûmkînatan ra tu wucûd û hebûnekî din tune; yek wucûdekî bi tenê heye ku ew jî wucûda heqq e, eynî zatê wî ye; mûmkînat sabitên li ser tunetîya xwe ya bingehî ne, sûretên wan di îlmê heqq da cîh girtîne, şuûnên Zatî ne. Yanê; Alem sûretê heqq e, heqq jî hûwîyyet û rûhê alemê ye. Ku teeyyûnatên (dîyarbûyênên) wî wucûda Wahidê heqq jî, ehkamên navê Wî yê **Ez-Zahir** in. Navê Wî yê Ez-Zahir jî, neynik û meclayê navê Wî yê **El-Batin** e. tecellîya Wî navê Wî yê Ez-Zahir jî, navê Wî yê **Nûr** e.

Cûrên alemê:

a) 'Alema Ceberût: Alema esma û sifatên Îlahî (nav û nîşanên Xweda),

b) 'Alema Emir, Alema Melekût, Alema Xeybê: Alema rûh û rûhanîyan, ku rasterast, bê wasite û bê muddet, bi emr û fermana heqq peyda bûne, (ku lewra jî 'alema emr e),

c) 'Alema xelq û tekwînê (çêkirin û îcadê), Alema mulk, Alema şehadetê ('alema berçavbûyînê): 'Alema cism û cismanîyan, Alema maddîya ku piştî alema emir, bi madde û bi muddet çê bûye, bi sebeban peyda bûye.

(B)

Best û qebz: Du haletên qelbîyên dijên hev in, ku best, haletê vebûn û firehbûn û hîvî û rica û fereh û aşînatîyê ye, qebz jî, rewş û haletê girtin û tengbûyîna qelbî û derûnî ye, endîşe û tirs û xewf e.

El-beytul-Mûqedddes, El-Beytul-Mûherrem: Mala pîroz, dilê pak û paqij, dilê însanê kamil ku ji bilî heqqê, ji xeyrê Xwedê, ji her tiştî ra qedexe ye.

(C)

Celal: Mezinatî, mezintî, Îzzet û 'Ezemeta Zatê Xweda ku ew Îzzet û Ezemeta wî, bûye perda mahîyyeta Wî; ne mûmkine ew bête keşif kirin, bête zanîn.

Cemal: Rindayî, xweşikayî, spehîtî; tecellîya Xweda bi wechê xwe da ji Zatê xwe da ra. ku ji wî cemalê ra jî celal heye, ew jî qehharîyeta Wîya ji her tiştî ra ye. Ku tu tişt namîne heta ku wî jî bibîne, ku ew jî bilindaya cemalê yê; nêzîk bûyîna wî cemalê, wî tecellîya wîya pîroz ji me ra jî, dîyarbûyîna wîya di her tiştîda ye, xûyabûyîna wîya di hemî sûretên kewn û wûcûdêda ye.

Cem': Kom, kombûyîn, li ser hev, tev bi hev ra, ku rewş û haletê şûhûda heqqê, bê xelqê ye.

Cem'ul-Cem': Îdrak û şuhûda xelqê qaimê bi heqqê, ku jêra: **El-Ferq û be'del-cem'î** (ji hev cudabûyîna di pey di gel hevbûyînê ra) jî, tê gotin. **El-fetqû be'der-retqî** tezahura cûrên alemê, tecellîya nav û nîşanên Xweda.

Cezbe: Cezb û celb û nêzîkbûyîna bal heqq bi înayeta heqq, nêzîkbûyîna 'ebdê bal heqqê va, bi înayeta Îlahî; ew înayeta Îlahîya ku hemî esbab û wesîleyên zerûrîyên ji boy gihîştina heqqê ra, amade kirîye.

(D)

Durrî: Wek durr û încîyan şeffaf û nûranî

(E)

E: (Elif) Nîşan û îşaretê Zatê bi tenê yê heqqê mûtleq e. ku ew zatê mûtleq, di ezelîl-azalê da (di berîya her berîyan da), ewwilê hemî tişta ye, Qeyyûm û Rebb û Xweda ye.

Eddurretul-Beyza (Durra sipî): Eqlê ewwel. lewra Pêxember gotîye: "ewwelê tiştê ku Xwedê çêkirîye durrekî sipî bûye."

Ehed: Zatê ku ji her alî da, bi her awayî yekê bi tenê ye, bê mûlaheze û îtîbara navû nîşan û peywendî û angorîya ne. Ku **Wahid** jî, ew Zatê digel mûlaheza wesf û sifatan e.

Ehedîyyet: Mûlaheze û îtîbara Zatê Mûtleq, digel terk û îsqata mûlaheze û îtîbarkirina her tiştî. (yekîtîya Mûtleq)

Ehwal (c.hal): Halet û rewş, halet û keyfîyet û terzên derûnî û şuhûdî yên me'newî.

'Eyanên-Sabîte (El-'eyanû-ssabîte): Sûrêtên heqîqetên tiştan di îlm û Zatê Xweda yê ezelî da, ku ji wan ra **Şuûnên Zatîyye** jî, tê gotin. Yanê: '**eyanên sabîte û şuûnên zatîyye,** yek tiştek in, navên sûretên mahîyetên mûmkînatan e, ku di xezîna îlmê ezelî da- wek dara xurmê di dendikê dara xurmê da- veşartîne.

Esmaên Zatîye, Eîmmetîl-Esma: Nav û nîşanên Zatê Îlahîyye yên di dereca ewwel da, ku heft -7- in : (Heyat=jîn) û (Îlîm=zanîn) û (Îrade=vayîn) û (Qudret=şîn) û (Sem'=bihîstin) û (Beser=dîtin) û (Kelam=peyvandin).

El-anûddaîm: Dema daîmî, herheyî. ku îbaretê ji dirêjbûn û dewam kirina **Zatê Îlahî** ye; Ezel di Ebedê da ye, herdû bi hev ra jî, di dema hazir da ne ku bi kurtî: di wî da, ezel û ebed û dema hazir (dema niha) dibin yek. Ku ew jî **Sermed** e, dewam û medd e, hîmê bingehîyê zemanê jî li ser wî ye, ew sînor û hedd e.

El-Hederat û sselase (sê hezret): Hezretul-wucûb, hezretul-îmkan, hezretul-cem'î beynehûma (hezreta ku cem'a di navbera wucûb û îmkanê da dike= Zatê Xweda yê wacib, bi masûwayê

Wî ra, herdû bi hev ra, li ser hev), ku heqîqetên kewnîyye (hemî kaînat), li ser esmayên Îlahîyye ne (bi wan in, ew in), Esmaên Îlahîyye jî, li ser Şuûnên zatîyye ne. Yanê: kewn û kaînat, sîya esma a ne, tecellîyya nava ne, sûret û wîneyên wan in. Esma jî, sî û tecellîya şuûnên Îlahî ne. ku ew jî E'yanên sabîteyên di kenza mexfîya (di xezîna veşartîya) îlm û Zatê Îlahî da ne- wek dara xurmê ku di dendikê xwe da veşartîye-.

Ewwelu-tteeyyunat (Seretayî yê xûyabûyînan): Zanîna Xweda bi Xweda, zanîna Zatê Xweda bi Zatê Xweda. ku ji wî zanînê da, mexlûqê Wî yê ewwil ('eqlê ewwel, 'Erş,...) peyda bûye.

Emr: Ferman, fermana îlahîya ezelî, emrê "kun" (bık e) ku emr û fermanekî fî'lî û pratîkîye, hemî 'alem pê çêbûye, jê derketîye, feyza îrada kullîye. Bi gotinik din: emrê "kun", sûretê îrada kullîye, pratîka îcadîye.

Emrê tekwînî: Qanûn û nîzama kewn û bûyînê (îcad û peydakirinê), 'adetên Xwedayên tekwînî, qanûnên tebî'î.

'Alema emr: tiştên ku raste-rast, bê sebeb û wasîte, bê madde û bê middet, ji Xwedada, ji feyz û tecelîya wî da peyda bûne, (wek 'eql û rûh) û 'alema melekût û 'alema xeyb jî, jêra tê gotin. **'Alema Xalqq** jî, navê wan tişta ne ku bi wasite û sebeban peyda bûne û dibin, bi made û bi middetin ('alema mulk û şehadet).

(F):

Feqr: Feqîrîtî û xizanî, bê darayî, bê mal û mulk û serwet

Ferqa di navbera ehwal û meqaman da: Ewe ku "Hal ne daîmî ye, tê û diçe, lê meqam sabît û daîmî ye" ehwal ku dewam dikin dibin meqam

Fetq: Ji hev pejiqandin, ji hevbûyîn, tefsîla madda mûtleq bi sûretên wî yên new'îyye (cûrbecûr), dîyarbûyîna hemî tiştên ku di hezreta wahidîyyetê da veşartîne. Ku **Retiq** jî, îcmala wî wehdanîyyeta mûtleqe.

Fûrûzul-'Îbadat Mebadî û n-Nîhayat: 'Îbadetên ferz û zerûrî, destpêkên tiştên dawîne, destpêkên hinek netîce û armanca ne. Ku meqsed ji îbadetan jî ew netîce û armanc in, îbadet wesîle ne.

Feyz: Rijan, rijîn, leyî çûyîn, herikîn, jêderbûn, peydabûn. Ku bi angorî felsefa **Eflaton** (Platon): Xweda berîya her tiştî, **Nefsa** kullî (nefsa gişti) çêkirî ye, ew nefsa kullî jî bûye mesder û jêderê hemî hereket û lebt û lipat û livan û jiyanên alemê (her tişt ji wî rijîyaye, ji wî herikîye) ku bîr û bawerîya **Eflotînê Misrî** jî, îzah û te'yîda wî dike, di wê îstîqametê da ye, temayul û fikr û bîr û bawerîya **Elkindî û Farabî û Îbnî-Erabî** û pirrên mûtesewwufên wehdetîl wucûdê jî, bi wî alîyê da ne;

'Alimên cem'îyeta îxwanîssefa yê jî, îzaha wî wiha kirine û gotine: "Xweda berîya her tiştî, ji nûra wehdanîyyeta xwe, cewherekî mûcerred (ku jêra 'Eqlê feaal tê gotin), çêkirîye û sûretên hemî mewcûdatan (hemî tiştên heyî), di wîda (di îstî'dad û qabilîyyetên wî da)bi cîh kirîye, ji wî 'Eqlê feaal ('Eqlê kullî)jî, **Nefsa kullîye** feyz bûye, ji nefsa kullîye jî, cismê kullî (wucûda maddî)û **Heyûla** feyz bûne, di dereca pêncan da jî, qûwwetên tebîî feyz bûne. Ku îdî 'eqlê feaal sikinîye û **cismê kullîyê mûtleq** feyz bûye, **felek** (cismê şeffafê ku dor li hemî alemê girtîye, mûhîtê alemê ye) feyz bûye. di pey wî ra jî **'Enasir** (av û ax û hewa û agir) feyz bûne. ku di dawî da jî, mûwelledat (cismên cuz'î, zayende û perçeyên alemê) feyz bûne, çêbûne, peyda bûne" ku li nik îxwanissefaîyan, **"nefs"**, cewherekî mûcerredê rûhanî ye, semawî ye, zanayê bîlqûwwe ye, fea'alê bîtteb'e.

nefsên cuzîyye jî, ji wî **nefsa kullîye** da ne, çirûsk û pirûskên wî ne. Piştî ku ew nefsên cuzîyye terka bedenê dikin (piştî ku beden dimire), hinek ji wan, di kêf û zewq û sefayêda, hinek jî di elem û êş û cefayêda sax dimînin û dijîn.

Eflaton dibêje: ku ji-her tiştê ra -heta ji 'enasir û nebatat û stêrk û felekan ra jî-, nefs heye, hem jî dibêje ku alema heqîqî alema mîsal û numûneyan e, ev alema maddî teqlîd û sûretên wan mîsalên me'newî ne. Lê **Arîsto** dibêje: ku Yek 'alemek bi tenê heye; Ev jî ew alema me ye û hew!

Feyz û bereket: Rijandina me'newî û bexşîş û înayet.

(H)

Heba: Ew maddeya ku Xweda sûretên alemê di Wî da vekirîye. Ew 'Enqayê ku jê ra, **Heyûla** tê gotin.

Heqîqetul-Esma': Teeyûnat û nîsbetên (angorîyên) Zatê Îlahî, wesf û sifet û rewşên ku cûrên alemê bi wan ji hev diqetin. Yanê: hemî cûrên alemê, îsm û nav û nîşanên Xweda ne.

Heqîqetul-heqaîq: Rastîya rastîyan, Zatê Ehedîyyeyê ku hemî heqîqetan di xwe da girtîye, di xwe da komkirîye. Ku jê ra **Hezretul-cem'** û Hezretul-Wucûd jî tête gotin.

Heqîqeta Mûhemmedîye: Tecellîya Zatê Îlahîya Seretayî, 'Eql û Rûhê ewwel;

Girtî yek qebzek ji Nûra xwe Xweda,
Gotî wî kûnî hebîbî Ehmeda
(Melayê Batê)

(Ku di bawerîya min da, fikra Heqîqeta Mûhemmedî -wek heqîqeta îsewî- îfrat û fantezîyekî tesewwûfî ye, teswîrî û îxtiraî ye; 'eleqa wî bi bawerîya dînê Îslamê va nîye -Durre-)

---

١ ــ **لَوْلِینْ** : جَمْعا «لَوْلي» ویان جمعا «لُوْلي» ی یه : بمعنی حَیْرَتُ و مُشَوّش بُویین ، مَسْتُ و سرخوشُ و جان سفْكُ و و کیفْ خَوش بُویین .
مِنْ **سَیرْكْ لیکی** کر : من تماشا لیَه کي کرْ . . .
٢ ــ **آگوبْ** ئو **جوزِفْ** : یعقوب و یوسف بیغمبر .

«وانْ جُمْلَه أنـــا الحَق گُو ، منْ واحد مُطـــلَقْ گُو»

لی ، صُوفی بی لَقْ لَقْ گُو ، مرْ داری روُ چَقْچَقْ ، گُو :[1]

«زنْديقـــه أنا الحَقْ گُو» ، منْ ژی را کُو أحْمَقْ گُو :

کیفْجالُ و رَقُ و بَقْ گُو ، بی مَنْطِق سَرْ رَقْ گُو :

«ساقی بخَوه أزْ گرْتمْ ، جامَكْ مَیا نُوشین دا»

منْ نُوشی یُو سَرْ خَوشْ بُومْ ، فی الحَال مُشَوَّشْ بُومْ

بی لَپْتُ و لفُ و مَشْ بُومْ ، بی طـــاقَهْ و بی وَشْ بُومْ

وكْ بُلْبُلی بی هَشْ بُومْ ، کُوژْ بینا گُلی کَشْ بُومْ

شاهْ مات وي مَامْ کَشْ بُومْ ، سَرْدَف کُو کَتمْ ، رَشْ بُومْ

«أز چارُ و نَهـوُشَشْ بُومْ ، من تکیَه بیالینْ دا»[2]

---

١ ــ يانی : صوفیی لَقلَقگوی ، رُو چَقْچَقْ ، گوت کو کي أنا الحق گویه (کی «أنا الحق بیژه) أو زندیقهَ «ژ دین درکَتیی یه» ، من ژ وي صوفیي را گوت : کیفجالُ وَ رَقُ و بَقی أحْمَقي بی منطقُ تو سر هشك ، تو چاوان وَلُو دبیژي ، تو چه فیم دکي کو لسَرْ فيَ گوتینا مَنْ ، ساقي أز گرتمْ ، بِرَمْ بال خوه تو جامَکيَ مَیا خوش گُوار دا من . . . .

«شربنا على ذكر الحبيب مدامةً سكرنا بها منْ قبل أن يُخلَق الكرم»

ابن الفارض

٢ ـ يانی : أز «دُطَوْ» بُوم ، طَویامْ کُو بآنگوري حسابی أبجدي : «٤»= د ، «٩»=ط ، «٦»=و ، کُو لسَر هَف دبه : دُطَوْ .

«درّة»

هِنْ كـــانْ كـــو لِوانْ رشَق تيـــرين فَـلَكى داكـــرْ
هِنْ مـــانَ كُـو ژوي پَـشْـق . فَرْمـــانْ گُو شَهِينْ شـــاكِرْ
خُوبـانْ كُو مَـيَـا عَشْق دا وانْ خَوشُ و رَعْـــنـــاكرْ
«وان ســـــــادَه رُخـــــانْ مَشْق عَشْق كُـو تَمَنّاكِرْ
خَطّاطِى ژ حُسْنِ ألخَطْ سَرْ مَـشْـقَـكي زِيرِّين دا»

قَلبِ مَـه كـــو ژى زنْـگـرْ دا جَـزبَـه لـمَـجْـزُوبـان
أنـــسُ و مَلَكُ و جِنْ پـــرّ هـنـــاتِنْ لِشَه خُوبـــان
چَنْد سَجْدَه كِي مِنْ لِى كِرْوى شُوخـــا ژ لُو لُوبان
«مـــا سَـجْـدَه تـنِى مِنْ بِرْ بَرْ صُورَت مَحْـبُـوبان
أبلِيسِ نَه بِرْ سَـجْـدَه لَوْ مـــايَـه دِنـفـرِيـن دا»

دُو هَاتمَه «هَوْلِيرى» . پـرْسى كُومَه كِرْ أوْ شـــاه !
كُوتِنْ چُويَه «خَزْ خيـرى» .مِنْ كُوتْ كُو چه بُو ، أيْ واهْ !
گُوتِنْ كُـو وى چافْ سيـرى «لالَشْ» گرى يَه دَرْ گـاهْ
«أز چُـــومَه دَرِى دِيـــرِى مِنْ دِيـــتى كُو رُوحُ الـــلّه
تَكْرارِى مُصَوَّرْ بُو حَتـــــا د نهـــــا لِيْن دا»

«تَذهیبِ زَرْ أفـشـان کرْ سَرْ لَوْحی کتَابا عشقْ»
تَرکیبِ بـأمْکان کرْ کمْیـا وي گُلابا عشْقْ[۲]
تَشـریبِ لحَمـیْانْ کرْ سـاقي وي ژینْ آبا عشقْ
تَرتیـبِ بفَرْمـانْ کرْ پشْتي وي شَرابـا عشْق
«رَسْمـا أزَلی کـیـشـا نَقـشی خَوه نَوالین دا»[۳]

زَرّان گُو «أَلیْف ، با» کرْ ، دا هَفْ ژ وي گیـتـا کرْ
ژی بیـژَه نُو پرْ سـا کرْ ، پرْ سـان تـژي مَعْنی کرْ
تَرکیبـا هـفُـوکا کـرْ ، پـرْ تُـوکـا خَـوه ژی دا کـرْ
«دیبـاجَه کُو أنْـشـا کرْ ، فهْرسـتَه کُو أمـلا کرْ
جـلْدکْ ژ عَناصرْ بَسْت ، نَفْخَـکْ د سَـفالین دا»

یَک یَک کُو خَلَک داتنْ زَنْـجـیـرَه ئی أمکانی
عَزمـانُ و فَلَک هـاتنْ چَرْخُ و گَرُّ ودَورانی
ژیـدا کُو گَلَک مـاتنْ أیْروُ ژی لحَیْـرانی
«أطفـال مَلَکْ هاتن ، وَسْتـانَه دَبسْتـانی
لاعلـمَ لـنـا گُوتن «أبْجَد» بخَوه تَلْـقـین دا»

---

۲ ـ یاني خودی ، کمْیـا یا آقا عشقی ، بهَمي ممکناتان را ترکیب کر ، عـشقي د هَمي زرّاتین کـائناتي دا (کـو هیـژ صـورتین وان د علمی أزلي دا بون) بجيْ کرْ ، د بَي وي را بفرمانا خوه یا أزلي ، ژ خزینا علمی خوه ، صَوَرتَین همي جورین عَالَمی دَراني ، نقشُ و نموشی عالمی بخـشیشُ و پیشکیش کر (عالمی أیجاد کرْ) . ـ

ژ کَرَما خوه لشرحا دیوانی میزه بکنْ !

۳ ـ نُو آنینْ دا (خ)

ـ پِينْچَكْ «مُخَمَّسْ» ـ

«نَـقّـاشِ أَزَلْ رُوژا سَرْ لَوْحَه ئِى رَنْـگِـينْ دا»[1]
مَخـــلُوق خَوه بِى أَوَّلْ كُوْژ خَوه بِخَوه زانِينْ دا
لِى نـــــاف هِشّ أَوَّلْ ، عَرْشُ و رُحى كُلّينْ دا
لَوْحُ و قَلَمُ و رُوپَلْ ، يَكْ بُو ، ژِنُو تَكْوِيـــــنْ دا
«پَرْ گـــارِ دِ دَسْتـــا بُو سَرْ صَفْحَه كـــو تزيين دا»

---

١ ـ يانى : دَما كـو خَودى روپلُ و سَرْنفيسا عـالمى يا سره طائي نفيسى ، پيدا كـر ، دما كـو مخلوقى وي ى أوّل كو عقلى أوّله ، (ژى را عرشُ و لوحُ و قلمُ و رُوحى كلي ژي ، طى گوتين) ژ تجليـا وي يا أوّل (كـو زانينا ذات وي بذات وي يه) پَيْـدا بُو ، أوي نقّاش أزَل د وي دَمي دا روپـلا أوّلا كتيبا عشقى بآفا زيْر نـفـيسي ژُ نَقشاند (عشقى د وى دَما أزلي دا پيدا كر) .

يانى : تجلّيا وي يا أوّل زانينا ذات وي ژ ذات وي را ، عـشقُ و أفيندارى يا ذات وي ژ حـسنُ و جـمـالا ذات وي را بويَه كـو ژ وي مَعلومّيتُ و مـحـبوبيّتا ذات وي ژ ذات وي را ، ژ وي تجلي يا وي يا أوّل دا ، مـخلوق وي يى أوّل (عـقلى أوّل . . .) چى بُو يه ، د پَـسْى وي را ژي خَـودى ، عالمى وها چى كرِي يَه :ـ خزينا ذات خوه (ژ آرشيفا علمى خوه يى أزلي ـ ، رسمُ و فوتوغرافين صُورَتينْ مـاهيَّتين طشتـان دَرانى يه ، هَمي جـورين عـالمى كـو تجلّي يا وي يا دوومينه ، ژ وي عقلى أوّل دا ، بترتيب آني يَه ، بى مقابلُ و بى كار و بى أجرت ، وكْ بَخْـشيشَه كي إلهي عرضُ و پيشكيش كرِي يَه كو بكوُرْتي : مآلى فلسفا وَحدة ألوجودى ژي ، عبارَت ژ وي يه .

ـ پِـيْـنجَـكُ و هَـفْـتَـك ـ
«مُخَمَّس و مُسَبَّـع»[1]

---

۱ ـ أف بَشْ عِبارَتِ ژِ چَنْد قصيده بِين «خاني» ئُو قصيده كي «سياه پوشَه» كُو مه تخميسُ و تسبيع كِرِ نَه (كِرِنَه پِينْجَكُ و هَفْتَكْ).

ـ أي سيدي عالم ! ـ

أيْ سيّدى عالَمْ سَنَدى نُورا هدايَة
پيشْواى شَفيعْانْ كُو تُو دَرْ رُوز قيامَة
هيڤي دكْن أمْ ڤي ژتَهْ أيْ صدْر رسالَة
مَحْرُومى نَه كي مَه تُو ژ ديْوانَا شَفاعة
قَدْ كانَ لَكَ الفَضْلُ لكَ الجُودُ كَثيرا
أُرْسِلْتَ إلى الخَلْق بَشيراً ونَزيراً
طاها ! تُو رَسُولى مَلكَ مُلْك كَريمى
تَشْريف بنَعْلَيْن خوه سَرْ عَرْش عَظيمى
دَرْ بَحْرى جَمالى تُو تَنى دُرّاً يَتيمى
أحْسَنْترى أزْ يُوسفُ و صديقُ و حَليمى
أيْ نَعْت تَه أزْ فَرْش حَتا عَرْش شَهيرا
أُرْسِلْتَ إلى الخَلْق بَشيراً ونَزيراً

نُورا كُو ژ شَمْسا أزَلي دا بُو ظُهُورى
جْلوا أوَلي بُو . تُو كُو ژى هاتي صدورى
عالَمْ هَمي رُونِي بُو كُو پاشى ژ وي نُورى
بَرْقَكْ ژ تَجَلّى وي بُو . مُوسَى دي لطُورى
آدَمْ تُو نَه بُو هيْژْ ، تُو هَه بُو «جَلّ قَديرا»
أُرْسِلْتَ إلى الخَلْق بَشيراً ونَزيراً [1]

---

١ ــ أف شَشكا دا وي ، هم نه ژ گفته يين خاني يه ، بلكي مه رستي يه ئو لى آني يه ، هم ژي ، فانطه زي يه كي تصوّفي يى شعري يه .

دُنْيـــــا دبُوريتنْ بدُوْر ، عُمـــــرِى عَزيْز نادنْ بزوُرْ
دَوْلَتْ دبيْن : ناچيـتَه گُورْ ،كَانْ پادِ شَاهِى سَرْحَدَانْ؟
يارَبْ هَبتْ أو جَاخْ قَديمْ ، عَمّى د وى خَوْش بنْ عَميمْ
بأَلخَاصّه آو دُرّاَ يَتـــيْـــم ، كَانْ پادِ شَاهِى سَرْحَدَانْ؟
دُرْدانَه ئِى گَوْهَرْ صَدَفْ ، أوْ مَا ژوِي نَســـلى خَلَفْ
يارَبْ نَه كي وانْ زُو تَلَفْ ، كَانْ پادِ شَاهِى سَرْحَدَانْ؟
«خانِي» تُو ژِى دَسْتَانْ هلِيْن ، هَرْ چَنْد كُوزيدَه دلْ كُلِينْ
أيرُوُژ مِيـــرِى ســـائلين ! كَانْ پادِ شَاهِى سَرْحَدَانْ؟

«أمْ ژِي دِين خانِي مِثال ، كـانِى حَمُو دُوستُ و هَفالْ ،[1]
كـا تَاجُ و تَختُ و مُلكُ و مـالْ ، كَـا پادِ شَاهِى سَرْحَدَانْ؟
كا مِيركُ و خانُ و خَوه دانْ ، كـا چَادرُ و كُونْين فَه دأن ،
زُوزان «قـارْدُوخُ و مَدان» ، كَـا پادِ شَـاهِى سَـرْحَـدَانْ؟
كـانِى وَلاتْ ، كـانِى وَلات ، سَرْ كـانِيـا آفُ أَلْخَيـأت
كـا خِضْـرِى آزادِي نَه هَات ، كَـا پادِ شَاهِى سَرْحَدَانْ؟»

---

١ ــ أف هرسي بيت نه ژ گُفته يين خاني نه ، يـيْن مَه نَه .
«دُرّه»

أُف خَالِيـــــيْن أُرْمُوش قَزّ ، وَرْنَاكرْن كَسْ شُبْه خَزّ
خَالِي بُو يِيْن مَيْدَانْ و رَزّ ، كَانْ پـاد شَاهِى سَرْحَدَانْ؟
رَزْبُو مِثـــــالا جَـنَّـتِى ، أَيْوَانْ ژ صُنْعـــــا قُدْرَتِى
كَسْ نِينَه طِى كَتْ صُحبَتِى ، كَانْ پاد شَاهِى سَرْحَدَانْ؟
أَلْمـــاسْ و لَعْلْ و گَوْهَرَانْ ، طُومـــارْ و تَاجْ بِنْ پَـرَّانْ
حَدْ نِينَه بِيْخـــمَه دَفْتَرَان ، كَانْ پاد شَاهِى سَرْحَدَانْ؟
أَوْ شَهَنْشِينْ و حَوْضْ و آفْ ، نِيچِيْرگَهِى پرّ صَيْدْو رَاف
نَابت بِبـــيـــرِمْ أَزْ بنَافْ ، كَانْ پاد شَاهِى سَرْحَدَانْ؟
شَاهِيْن شَهِى گَرْدَنْ فِرَازْ ، آزَا كرِن تَيْهُونْ و قَازْ
تَـرْخَـانْ كرِنْ تَيْغُونْ و بَازْ ، كَانْ پاد شَاهِى سَرْحَدَانْ؟
مِيـــــرِى مَه وا نَابتْ سُوَارْ ، تِيْرِبُوِيَه أَوْ نَـاچتْ شِكَـارْ
تَيْغُونْ و تَرْلَانْ مَانْ لِخـوَارْ ، كَانْ پاد شَاهِى سَرْحَدَانْ؟
سَرْ دَارِيـا كُومـــــا گَلَكْ نَاكَتْ سُوَارِى چَافْ بَلَكْ
چَافَت سِپِى بِنْ أَي فَلَـكْ ! كَانْ پـاد شَاهِى سَرْحَدَانْ؟
طَاقْ و رَوَاقْ و مَنْظَرَانْ ، كُوشْكْ و كَـلاتْ و خَيْـبَرَان
وانْ جُمْلَه نِيشَـانْ حَيْدَرَانْ ، كَانْ پاد شَاهِى سَرْحَدَانْ؟
أَوْ جُمْلَه ، وِي أِيجَـادْ كَـرِنْ ، هَرْ چَنْد قَوِى بُنْيَـادْ كرِنْ
چَرْخِى هَوَانْد بَرْبَـادْ كرِنْ ، كَانْ پـاد شَاهِى سَرْحَدَانْ؟
خَـوَاهِى كَـلاتَـأْن بِـي ظَـفَرْ ، دُژْمِنْ ژ بَر وِي بِي مَـفَـرّ
وِى چُوِيَه نِيـــفَـــا آخْ و بَر ، كَانْ پاد شَاهِى سَرْحَدَانْ؟

کـــان اُمیـــری نَامدارْ ، سَرْحَدْنیـــشـن خُونْدکـــارْ
پاشَانْ ژ بُو پیْشکیشْ هنَارْ ،کَانْ پاد شَاهی سَرْحَدَانْ؟
کان اُمیری ذُو فُـنُـوْن ، کانْ عَـاقـل طَـبْـعَـةْ جُـنُـونْ
عَالَمْ لبَرْوي بُون زَیُونْ ، کَانْ پـــاد شَاهی سَرْحَدَانْ؟
چَنْد میرُ و حَاکمْ راکـرنْ ، چَنْدْ خَانُ و سُلطَانْ داکرنْ
کُومُ و حَشَمْ بَرْبَاکرنْ ، کَانْ پـــاد شَاهی سَرْحَدَانْ؟
اُوْ حَاکمِ پرّ نَاف و دَنْگ ، هَمْ طَبْعَتی تَیْمُورلَنْگ
دَعْوی د کر بچْیَه فرَنـــگ ،کَانْ پـاد شَاهی سَرْحَدَانْ؟
پـیلا کوُوي دیوانْ دگرْت ، خَلقی أدَبْ أرْکان دگرْت
هَیْبَتْ ژ وانْ دیوانْ دگرْت ،کَانْ پاد شَاهی سَرْحَدَانْ؟
وَختی بسَرْ هَسْپی دکَتْ ، شَشْ جَانبَانْ رَفْ پی دکَتْ
هَیْبَتْ بسَرْ خَلـقی دکَتْ ، کَانْ پـاد شَاهی سَرْحَدَانْ؟
دائـمْ عـدَالَـتْ پـیشَـه بُـو ، غَـایَتْ دَقَـیْـق أنْدیشَه بُو
نَازِگْ طَـبـیـعَـة شـیشَه بُو ، کَانْ پاد شَاهی سَرْحَدَانْ؟
دیوانُ و عَدْلُ و دادی گیْر ، أزْعَـانْ پرُّو رُوشَنْ ضَمیـرْ
حَتَّی خَوشینْ نَاکنْ ژ بیـرْ ، کَانْ پاد شَاهی سَرْحَدَانْ؟
دیـــوانُ و أیـــوانْ شَانشین ، أوْ صَدْرُ و حَوْض نَازَنینْ
مَانْ شُبْه فرْدَوس بَرِیْن ، کَانْ پـــاد شَاهی سَرْحَدَانْ؟
فَرشین د دیبـــائُو و حَریرْ ، أسْتَبْرَقین وي بي نَظیـــرْ
بي أخـتـیـار مَایینْ ژ بیـرْ ، کَانْ پاد شَاهی سَرْحَدَانْ؟

ـ مَرْثِيَـــه = (شينْ نَامَه) ـ

ـ دَرْحَقِي مُحمّد بگِي حاكمِي بازِيدى ـ

كـــانى مُحَمَّد بَـگْ گلُو ، كَانْ پاد شَاهى سَرْحَدَانْ؟
أيـروُ ژ دلْ بگْريـنْ دلُو ، كَانْ پـاد شَاهى سَرْحَدَانْ؟
أيرو بِبِـينِنْ عِـبْـرَتِـى ، آغَـانُـو خَـلْـقِـى هِـيـشَتِى
كَانِى خَودانِى غِيـــرَتِى ، كَانْ پاد شَاهى سَرْحَدَانْ؟
مِيـرِى دنْيِف مِيـرانْ بنَاف ، أشْهَب سُوارى رمْ زراف
بَالا بـلـنْدى پَـرّ بَـلافْ ، كَـانْ پاد شَـاهى سَرْحَدَانْ؟
كِي دِى وَه رَنْگ ذاتَكْ شَرِيفْ ، أركَانُ و أزْمانَـك لَطِيف
عَالَم ددسْت وي بُو ضَعِيف ، كَانْ پاد شَاهى سَرْحَدَانْ؟
كُومَا دمِلْ بُو سِى هَزارْ ، صَدّ مِيرَه كـان ڤِيكْرَا دُو جَارْ
ژِيكْ راكِرِينْ ، كـرْ تَارُومَارْ ،كَانْ پاد شَاهى سَرْحَدَانْ؟
سَـنْـجَـقْ ژ سَـرْ قَمـى بـرّي ، بدْلِيسِيا وانْ ژى كرى
خَان دمِلْ كَرْبُو ، چرِي ، كَانْ پـاد شَاهى سَرْحَدَانْ؟
كَـان عَـزِيـز مِـصرِي يـانْ ، كَـانـى عَـدُوّى وانِي يَانْ
كَان هَفْرِكِى **مَحْـمُودِي** يان ،كَانْ پاد شَاهى سَرْحَدَانْ؟

جـا نَظَرْ كـه عِبْرَتِي پِـيـلا كـو واقِعْ بِتْ سَوْاش
گـرْنه بِيتنْ إلْـتِـفَـاتُ و مُـوچَـه وُدَبْـرُ و مَـعَـاش
جُنْدِيي رِمْبَازِي فـــــارِسْ نادَه تِنْ جَانِي بَلاشْ
سَاعَتَا سَر بَازِيـي هِيـــــــــڤِي ژ سَرّ دارِ خَوه يَه

«خَانِيا» ضَايِعْ مه كَـه وَقْتِي خَوه أَىْ نَادَانْ عَبَسْ!
بِي طَلَبْ نَابِي ژ وَصْلِى بَهْرَمَنْدْ أَىْ بُولْهَوَسْ
صَانِعِ مُطْلَقْ كُـو نِينْ إِحْتِيـــــاجَكْ وِي بِكَسْ
لُطْـفُ و إِحْسَانَـا وِي ژِي دَرْ حَقْ طَلَبْكَارِ خَوه يَه

❀

ـ زاهدِ خَلوَتنِشْين ـ

زاهـدِ خَـلـْـوَتـنِشْين پـابـسـت كَرْدار خَوه يَه
تـــاجر رَحْلـــتْگُزِيْن دَرْبَنْد ديـــنـــار خَوه يَه
عـــــاشِقِ ديـلْبَرْ حَبِيْن دلْ دَايِ دلْ دار خَوه يَه
ڤِي زَمـــانِي هَرْكَسَكْ بِى شُبْهَه غَمْخـــوارِ خَوه يَه

بي عَمَلْ تُوْ ژ كَسْ مَه كَهْ هيـــڤي عَطاءُ و همّت
بي غَرَضْ نَاكَشيـــتنْ قَطّ كَسْ ژ بُو كَسْ زَحـــمَت
كَسْ نـــه هِنْ قَطّ هِلْگِرتْ بـــارِ تَهْ أُوْ بـــي أُجْرَت
كَرْ چه **عِيـــسى** بِتْ كُو وِي فِكرا كَرُ و بارِ خَوه يَه

هُوشِيْار بِي ! دَا نَه كِي عُمْرِ خَوه بِي حَاصِلْ تَلَفْ
لَوْ كُـــو نَاكَتْ فَايْـدَه مَالُ وُ گَنْجُ و أُولادُ و خَلَفْ
مَاجَرايَا **خِضْرُ** و دِيـوارِ يَتِيـــــــــمى بُو سَلَفْ
ڤِي زَمَانِي هَرَكَسَكْ مِعْمَارِ دِيوارِ خـــــوه يَه [1]

---

١ ــ خانى دڤى بيتى دا ، بكُورِي إيما دكه كو لازمه إيدي گل كرد ژي ، معمارِ ديوارِ خوه بَه ، ژ خوه رابه ، ژ خوه را بِخَه بتَه «ولاتِ خوه آزاءُ و آڤا بِكَه» . «دُرّه»

شِيخُ و مُرِيدُ و سَالكانْ ، شَاهُ و فَقِيـــرُ و مـــالكانْ
چُسْتُ و چَـلَنْـگُ و چـاپُـكان ، دلْ كَـتَـه بَـنْدَه پـايِى زُلْف
أَفْعـــــاءُ و مـــــارو أُژْدَرَه ، مِسْكُ و زَبادُ و عَنْبَرَهَ
نَفْحَه ئِى رُوحـــي پَـــرْ وَره ، رائحَه ئِى هَواي زُلـــفْ
بِى مَيّىُ و بِى دَوا يَه كِي ، بِى دَفُّ و چَنْگُ و نـــايَه كِي
ديـــــنْ دكَتِنْ مَلا يَه كِي ، جَزْبَه ئِى دِلْ رُبـــــايِى زُلْف
مِيـــرُ و مَلا ئُـو مـــاهِرانْ ، چَنْدِي بَلِيغُ و شـــاعِران
«خانِي» ئُو هِنْدِي حاضِرانْ ، دَرْدَه ژِ دَسْت دَ وايِى زُلْف[1]

١ ـ دادَه ژِ دَستْ بَلاي زُلفْ (خ) .

ـ أيْ دِلْ ـ

أيْ دِلْ أگَرْ بنَقْد جـــانْ ، جنْسی گرانْ بهـــايی زُلْف
بگْری ، بزانْ گرْتي مَجَانْ ، جَوْهَری جانْ فدايی زُلْف
غُـنْـچَـه ئی تَـنْـگی حَـوْصَـلَه ، دلْ ژ رکانْ بکَرْ دبـی
صُبْحی گهـانْ کُـو سَهْ دکَتْ لَخْلَخَه ئی هَوايی زُلْف
تکْرارُ و تِمْ مَشْقی دکَتْ رُويی نگـــــارُ و حُسْنِ خَطْ
بَنْـدَهْ هَـزارُ و طـفْـلِ دلْ هـاتـنَـه بَرْ مَـلايـی زُلْف
عَاشِقِ بی جيگَرْ مگَرْ صَبْری ژ جـــــانُ و دلْ دکَتْ
مَـانـعـی گَنْـجی مـقْصَدَه هَـيْـبَـتی أژدّها يی زُلْف
هَرْ سَری مُو لســـــازَه کي ، جلْوَه دکَتْ بنازَه کي
عـــــاشِقِ عشـق بـازَه کي ، بَنْدی دکَتْ بَلاي زُلْف
رومُ و فرَنْگُ و هِنْديـيـأن ، خالُ و نيشـانُ و خَمْري يانْ
خَنْجَرُ و شيـــــرُ و مصْري يان جَنْگه لبَرْ لوا يی زُلْف
تاجُ و طُومارُ و بـنْ پَرَانْ ، لَـعْـلُ و گُـوهَارُ وگَـوْهَرانْ
سَرْخُوشُ و دينُ و أبْتَران ، رَقْصَه د گَلْ سَمـايی زُلْف
لاوُ و رَوالُ و ريسپـيـيـأن ، ميرُ و وَزيـرُ و جُـنـدي يان
سَرْخَوشُ و مَستُ و بَنْگي يانْ ، دَرْدَه ژ مـا جَرايی زُلْف

«خـــانيـــا» تا كَيْ ببيـــزِي أوْ سؤالُ أوْ جَوابْ
أوْ ژِوِي صَادرْ بُويـه أيْ بِي أدَبْ ، أيْ بِي حِجَابْ !
أوْ قَضَايـــا بـــارِي يَه ، راضِي بِهَ أيْ مَالْ خرابْ !
حَمـــدْ ببيـــژَه تُوْژ خَودِى را ، گَرْبكَه تَه أو كَبَابْ
«كَرْ بزانم أزْ دِ حَشْرِى دا نَبيـــــنمْ ديـــــلْبَرِى
جَنَتِى دِى پِى چه كَمْ ، پِى وَرْ بكـــمْ خَاكسْتَرِى»

گَرْ دِ حِینا أَزْ وَفـــأت بِمْ ، بیـــتَه سَرْمِنْ عَزْرائیلْ
مُژْدَه یـا خُلـدی بدَتْ مِنْ هَم دِ وي گَهْ جِبْرائیـلْ
خِضْرُ و أَلْیـــاسْ هَمْ بِبیـــتْن هَرْ ژ بُو مِنْ را دِلیلْ
دی بـبـیـــژمْ مِنْ نَفیـــتنْ خُلْدُ و کَوْثَرْ ، سَلْسَبیلْ
«کَـرْ بـزانـم أَزْ دِ حَـشْـری دا نَـبـینـمْ دیـلْـبَـری
جَنَّتی دی پی چه کَمْ ، پی وَرْ بِکَمْ خَاکِسْتَری»

چَرْخی کَجْ رَفـتـــاري واوَیْلاه ! کُـو أَزْ تَالانْ کِرِمْ
سَرْ بگَرْدان بُومْ و لیـــکِنْ زِیـــدَه سَرْگَردانْ کِرِمْ
بی دِلُ و شُولُ و هَوَسْ جَارَكْ کُو بي أَزعـــانْ کِرِمْ
زِیـــــدَه فی بی مُرْوَتی أَفْ رَنْگ کُو أَزْ تَالان کِرِمْ
«کَـرْ بـزانـم أَزْ دِ حَـشْـری دا نَـبـینـمْ دیـلْـبَـری
جَنَّتی دی پی چه کَمْ ، پی وَرْ بِکَمْ خَاکِسْتَری»

زِینـهـارْ ! أَيْ دُوسـتَـان وَقْـت دکـمْ أَز هـجْـرَتـی
قَانْ دُو مِصْراعـــانْ کتـــابَه کِنْ لِبَلْگی کـــاغَتی
دا دِدَسْت مِن دا سَنَدْ بِنْ أُو د حِیـــنـــا حَضْرَتی
وَصْف حَال من بِبِیـــــــژتْ أُو د وَخْتی وُصْلَتی
«کَـرْ بـزانـم أَزْ دِ حَـشْـری دا نَـبـینـمْ دیـلْـبَـری
جَنَّتی دی پی چه کَمْ ، پی وَرْ بِکَمْ خَاکِسْتَری»

ـ أيْ دريغـــا ـ

أيْ دريغـــا ! مامَه تَنْهـــا أزْ ژ شَمْســـا خاوَرى
خانُ و مان تيك بُونَهْ ظُلْمَهْ پاشى وى ديم أنْوَرى
پاشى ليـــــڤىْ د وى ڤناخُومْ مُطْلَقْ آڤا كَوْثَرى
منْ نَه ڤى دُنْيـــــا بجارَك پاشى وى سمينْ بَرى
«كَرْ بزانم أزْ د حَشْرى دا نَبيـــــنمْ ديـــــلْبَرى
جَنَّتى دى پى چه كَمْ ، پى وَرْ بكَمْ خاكسْتَرى»

صَدْ تَغَابُن ! چُو ژبالْ منْ أو حَبيـــبـــا چاڤْ بَلَكْ
آهُ و أفْغـــــــان ژ منْ دائمْ د چُونْ چَرخا فَلَكْ
هَمْ ژ فَريـــــاد د منْ عَاجزْ د بُونْ أنْسُ و مَلَكْ
مامْ د قَيْدا داغُ و دَرْدانْ پـــــاشى وى زُلْفى خَلَكْ
«كَرْ بزانم أزْ د حَشْرى دا نَبيـــــنمْ ديـــــلْبَرى
جَـنَّـتى دى پى چه كَمْ ، پى وَرْ بكَمْ خاكسْتَرى»

هجْرَتـــا يـــارى بهاتمْ ، شُبْه فنْدى شُعْلَه دارْ
كَـتْـمَـه سيـلا أفْـتـراقى ، ژ أحـتـراقى بُـو مَـه نارْ
أزْ وُجُودكْ بي وُجُودمْ ، صُوهْتمْ تيْكفَه بُومْ غُبـــارْ
منْ نَڤى دُنْيـــا بجَارَكْ پَاشى وي چَهْڤى د خُمـــارْ
«كَرْ بزانم أزْ د حَشْرى دا نَبيـــــنمْ ديـــــلْبَرى
جَنَّتى دى پى چه كَمْ ، پى وَرْ بكَمْ خاكسْتَرى»

ـ هِنارکْ ـ

ژِلَغْلِيْن دِيارِي أَمِنْ مَيْ فَه خُوارا
بِدْل دِی بِبَخْشِي بَدَخْشَان ، بُخَارا

مُدامِي دِ دسَت غَمَان دا زَبُونَم
مُدامِي دِخُومْ مَيْ ، بِكِمْ دا مُدارا

دَمَا كِرْمَه غَدْرا أوِی گُلْعزاري
دِبِنْ بِی تَكَلُّفْ دِل مِنْ غِدا را

هِنارِي ژِبُو مِنْ دَرْآغُوشِ پِرّ دُرّ
هِنَارکْ دِتَازَه حَبِيبَا دْل آرا

نَه يارا تَه أِيرُو نَظَرْ دا تَه «خَانِي»
نَه ياران ته مانَه ، نه راحَتْ ، نَه يارا [1]

---

١ ــ يارا : هيزُ و قُوَّت .

مِنْ سَيْرِ كِرِنْ سِدْرَهُ و طُوبَى قَدِ دِلْ جُو ،
نِـينِـنْ چُـو بَـرابَـرْ

هِنْدِي مَلَكُ و حُورِي ، پَرِى بِينَه تَمـاشـا ،
حـاشـا فَه كُـو حـاشـا !

كَنـكِى دِ بِـنْ أَوْ لائِـقِ نَـظّـارَه ئِـي أَبـرُو ،
أَيْ دِلْ مَه كَـه بـاوَرْ

بـارِي ژِ دَرِى مَيْكَدَه ئِي مِنْ مَه كَه بِى پـارْ ،
أَىْ سَيِّدِ مُخْتـارُ

سـاقِي كُـو تُوي أَشْهَدُ بِاللّه د أِيـرُو ،
«خانِـي» بُويَـه مَيْخَـورْ

ـ صُبْحَه كِي زُو ـ

أَزْ چُومَه دَرِى مَيْكَدَه ئِى صُبْحَه كِي زُو ،
مِنْ دِي يَـكِي أَسْـمَـرْ

قـامَة بِمِثْلْ شُبْه چـنـارى ئُـو دُو كَـيْسـوُ ،
مـانَـنْـد دُو أَژْ دَرْ

چِينْ چِينْ دِخوُشِينْ زُلْفى لِسَرْ گُلْشَنِ رُخسارْ ،
رَهْ ، شُـبْـهَـة شَـهْـمارْ

كَـرْ كَـرْ دِمَشِينْ بِسْكِى لِسَرْ قَوْسِ دُو أَبْروُ ،
مانَـنْـد دُو شَـهْـپَـرْ

مـايِيمْ مُتَرَقِّب مگرْ أَوْ مَظْهَرِ أَعْجـازْ ،
جـارِكْ بَدُوصَدْ نـازْ

حـالِى مَه تَفَحُصّ كَتُ و بِيـرْتْ كُـو أَسِيـرُو !
أَزْ بُـو تَـه مَـه غَـم خَـورْ

مِنْ كُـو : تَه دِ وَخْتِى سَحَرِى أَف چه يَه دا مِنْ ،
أَىْ سَرْ وِى قَدا مِنْ !

گُو : مـا تُو نِزانِى چه يَه مِنْ دا تَه فَقِيـرُو !
أَعْطَـيـتُـكَ كَـوْثَـرْ

حَتّى فَه كَه لَوْحِ صَدَفُ و خـامَه ئِـي ياقُوتْ ،
نِـيـزِيك بِـلا هُـوتْ

ـ هَرو صَدْ جَارْ ـ

هَرُو صَدْ جَارْ ژ اَلْفَا وی ، دبمْ کَیْفی لمَیْخَانی
فَه بیـــرْ منْ طیْت ژ زُلْفَا وی ، دنَا لِمْ اَزْ ژ هجـــرانی
دنَا لِمْ لَوْ گَلی یَارانْ ، ژ چَهْقَانْ خُونْ د چیْت بَاران
ژ سَهْمَا عَقْرَبُ و مَارانْ ، وکِي اَوْ طیـــنَه لیـــکْدانی
وکِي اَوْ طیـــنَه سَرْ بَالانْ ، ببیـــنن نُقْطـــه ئُو خَالان
بنَفْشُ و غُنْچَه یی آلان ، د سَرْدا مَاه تَا بَا نی
د سَرْدا اَوْ مَهـَا اَنْوَرْ ، ژ رَیْحَانْ سُنبُـلان دا سَرْ
کرِمْ سَوْدائُو هَمْ اَبْتَرْ ، ژ منْ دلْ برْ بتَالانی
ژ منْ دلْ برْ اَفی جَاری ، کُو منْ دي قَامَتَا یَاری
وکِي سَلْوی لجوُباری ، فَه مَشْیَا هَاتَـه اَیْوانی
فَه مَشْیَا یـــا صِفَهَ حُوري ، ژ رَنْگی صُورْ گُلا جُوري
رُحی شیـــرِیْن دکمْ گـــوُري ، ژ بُو خَالی ئُو نیـــشَانی
«ژ بُو خَالی رُوي رَعْنَا ، ددنْ کُـو لْمسْـکی صَدْ طَعْنَا
ژ «خـــانِي» لی نَه پرّ مَعْنَا ، وکِی آیَاتی قُـــرآنی»[1]

---

۱ ـ اَف هلبسته یا داویـــی ، نه ژ کُفْتَه یین «خاني» یه ، بآنگوری آهنگو رَوْشا قصیده یی ، منْ هُونایه ئُو لی علاوه کري یَه ، ژ بر کو قصیده نُقصان بُو ، بی اَذْنا «خاني» ، مه اَف علاوَه کرو اَمضا خَاني آکَیتي . هیڤي دارم کو اَو ماموستای دلو ڤان شاگردی خوه ی نه زان ، ببَخْشینه . «دُره»

بِـنِـی صُـوفِی قَـوِي دِينَـه ، وكِی خَـفّـاش مِسْـكِينَـه
لِنكْ وِي رُوزْ تُو رَنْگ نِينَه ، خَوه ناسْپِيرِتْ وِي رَخْشانِی
دِلِی وِي كُـورَه ، أَعْـمَـايَه ، ژ وَصْلِی دُورِي دا ، مَايَـه
لِـبَـرْ وِي دَرْگَـهْ دادايَـه ، نَهِـيْشـتَـه بِـيـتَـه دِيـوانِی
أَزِمْ سَرْخَوْش ژ وِی جَامِی ، أَزِمْ سَوْدا دنِيـــفْ عَامِی
أَزِمْ عَـنْـقَـا كَـتِـمْ دامِـی ، بِـزُلْـفِ سَـرْ لِـخَـالْ دانِـی
بِـزُلْفَـا هـاتَـه سَـرْ خَـالانْ ، بِـنَـفْـشَـا طِيطكُ وَ آلانْ
دلْ وُ جِـانِی مَه عَـبْـدالانْ ، دِبِـتْ دِيـسـا دِ تَـا لانِی
دِ تَا لانِ كُو صَدْ سَرْ چُوْن ، هَزارانْ گَنْجُ وَ گَوْهَرْ چُوْن
دِلِی صَدْ پَارَه كَرْكَرْ چُون ، تُو «خـانِي» بَسْ كَه أَفْغَانِی

ـ هلـُـو! ـ

ـ دلـُـو رابَـه ـ

دِ لُو رابَه خَوه دِل خَوْش کَـه ، هلوُ ! دا بچْنَه سَيْرانی
وَرَه جَارَكْ تُو خَوهْ بوَشْ کَه ، بچِيْن سَيْرا گُلسْتَانی
گُلسْتَان وَهْ کُو صُورگُل طی ، چيمَنْ مثْلا کوُ سُنْبُل طی
هـَزارْ بُـلْـبُـلْ بـغُـلْـغُـل طـی ، دِ فَصْلا مَاهِی نيسانی
دفَصْلا جَادُوي نيـــسَانْ ، مَه دي بُو ديلبَرَكْ ديســـان
بَدلْ مَشْعَل ، ْ چرا أيســـانْ ، مَه جَان دا شُبـهی پَرْوانی
مَه جَانْ دا ديلْـبَرَك سَادَه ، لَطيفُ و شـُوخُ و بَـگْـزادَه
ژ قَـيْـدانْ کـرْمَـه آزادَه ، نـيـهَـان خَـوْنـديـمَـه ديوانی
نيـــــهَاني خَلْوَتَكْ دا منْ ، ژ لَعْلان شَـرَبَـتَـكْ دا منْ
بـوَصْـلِ صُـحْـبَـتَـكْ دا مـنْ ، کـرِمْ بَـنْـدَه دِ فَرْمَانی
دفَرْمَانی کـي صَادقْ بتْ ثُونَا خـــوازی مُنَافقْ بتْ
دِ فی هـَرْ دَمْ مُـوافـق بـتْ وکـي شيـخی دِ صَـنْعَانی
وَکي شيـخی کُـو حَاضرْ بتْ ، لفَرمَانی کُو ناظرْ بتْ
بأمْری دُوسْت کـــافرْ بتْ ، د صُوِرْتْ صُحْف قُرآنی
دِ صُوِرْمْ صُحْف مکْتُوبَه ، بـأمـــــــر يَارُ و مَحْبُوبَه
دَمـــا دلْ بـمْ بـمطْـلـوبَـه ، ددمْ أزْ ديـنُ و أيـمَـانی
أگَرْ ديلبَرْ مَجـــازي بت ، ْ ژ رَنْگی لبْسی غـــازی بتْ
بـلا صُـوفی نَـه راضـی بـت ، ْ بـمينَـه أوْ دِ حـرْمَـانی

ـ نَقشِ کَفشِرینْ ـ

«دا ظَنْ نَه بِرِینْ کُو اَمْ خَمُوشِینْ
اَمْ بَسْتَه دَهانُ و دِلّ خُرُوشِینْ»

«گَنْجامَه دِ دِلْ ، گُهَرْ تِرِي نَه
هَرْ چَنْد عِیانْ خَزَف فِرُوشِینْ»

«شاهِینْ کُو بِخَفْ بِلِبس دِیبَا
ظاهِرْ ژِ خَوه اَمْ پَلاسِي پُوشِینْ»

«مِجْمَرْ صِفَتَه مَه جِسْمُ و جَانْ عُودْ»
دِلْ ، آتَشَه ، دائِما بِجُوشِینْ»

«مَیْخانَه بِهِشْتَه ، حُورَه ساقِي
کَوْثَرْ مَیَه ، لَوْقَه بادَه نُوشِینْ»

«بِی هُودَه یَه لاف ، لَوْ گُو «خانِي»
دُنْیا کِرُّ و آخِرَت فِرُوشِینْ»

ـ مَه دِي نَقْشَكْ ـ

مَه دِي نَقْشَكْ ژ نَقْشى نَقْشبَنْدانْ
ڤَه بُو قَيْد دمِنْ يَكْ يَكْ ژ زَنْدان
كُشَادا دلْ ژ بُو مِنْ را مُيَسَّرْ
نَه بُو بى صُحْبَتَا صُورَتْ لَوَنْدانْ
لِمِنْ كُرْت بُو ريا كَعْبا وصَالى
ژ نُورا طَلْعَتَا بَالا بُلَنْدان
رَذِيلُ و سَرْخَوشْ وَاللّه واعظ
لِمِنْ ضَايِعْ مَه كَه قَانْ وَعْظُ و پَنْدانْ
مَه صَدْ هِيڤي هَيَه ديسا ژ صَيّادْ
مَه آزا كَه ژ قَيْد قَيْدُ و بَنْدانْ
ژ آهُويَان مَهْ هُويَان خَوَسْتَنْ أمَّا
دل مِنْ مَا دگَلْ مِشْكِيْن كَمَنْدانْ
هَه چِي پِيلَكْ د عَشْق دا عَمَلْ كِرْ
دبِيتَنْ عَاقِبَهْ شَادانُ وُ خَنْدانْ
دِل «خَانِي» أگَرْ چه گَنْجُ و خَانَه
بَلِى قَطْ كَسْ نَه گُوت «خَانِي» بِچَنْدانْ؟

ـ عَنْقائی بَقا ـ

بَیْدایی فَنا گَرْچه بَنمْ رَهْگُزَرمْ درْ
عَنْقائی بَقا هِمَّت هَمْراه پَرّمْ درْ

وَهْم اَیْلَمَزَمْ سَهْم بَلا قَوْس فَلَکْ دَنْ
اَتلَسَه ، چُو دَسْتمْ دَه تَوکُلْ سِپَرمْ درْ

بَنْ بَاغِ جِهَانْ اَیْچرَه عَجَبْ نَخْل بَلایَمْ
باشمْ دَه بَلا بَرْگُ و مَشّقَتْ ثَمَرمْ درْ

ساقِي ! بَانَا اَمْداد قُلُپْ ، فاتِح بابْ اُوْل
مَیْخَانَه طَرِیقمْ دَه کَه اَوَّل سَفَرمْ درْ

بَنْ عاشِق دیداری ، نَه حَاجَتْ غَم دیوارْ
جَنَّةْ دَخِي بَرْ پَرْدَه ئی قَطْعِ نَظَرمْ درْ

پَرْ وانَه ئی پَرّ سُوخْتَه ئی شَمْعِ قَدیمَمْ
نیران جَهَنَّمْ شَرَری بالُ و پَرّمْ درْ

آلامُ و جَفاسِیلَه خُوشَمْ بَنْ رَهی عَشْقَنْ
«خانِي» ! بَانَا بُویُوَل دَه قَدَمْ چَشْمِ سَرمْ درْ

❀

بوي خوش حال سرخوشي ، جلال و جزبه ئو جوشي
د بينن سرّ مئی نوشي ، د نرخينن وی پرتالي
د نرخينن وی پرُوزی ، پرنگ و اگر و کوزی
کُلیلکا جشن و نوروزی ، گُلا رنگارنگ و آلالي
گُلا آزادي داخوازي ، لمل آلا سرفرازي
لدل ژی جلوه ژنازي ، ژ بُلبُل غلغل و نالي
ژ بُلبُل نالي يُو زاري ، لدل چيکا اُفيندازي
ژ صُورگُل جلوه لی باري ، ژ رُو پرْدی کُو دا آلي
ژ وی غُنچا طرُ وتازه ، کُو ژی پرّ جلوه ئو نازه
وکي ساز پرّ آوازه ، دنالّه هرْ درُ و آلي
د نَاله ، آهُ و فيغانه ، د کالّه ، شين و شيوانه
د مالّه خوين ژ جافانه ، وکی منْ شيست و هفتْ سالي
وکی منْ کالی دلْ جانه ، سَری چيل ژ درْدانه
ژ گُلزارين خوه دُورمانه ، بهفرا کتّنه في حالي
بهفرا نالي يُو زاري دکن اُمْ کوْ ژ ستمْکاري
وکی **فرهاد** خُونْ خواري ، **سيامنْد** و مَم آلي
مَمی آلان دلْ سُوز کُو **زين** ديتْ لنوْرُوز
ژ برْوی آگرُ و کُوز لدلْ وکْ «خانی» کُودْ نالي

1997

❀

مَلا مَقْصُود مِنْ خَالَهْ ، نَه ملْكُ و مَنْزَلُ و مَالَه
نَه علْم قَالَه ، يِ حَالَه ، مَه حَاصِلْ كِرْ بِأَبْدالِي
مَه حَاصِلْ كِرْ بِخِيزَانِي ، بِمُشْتَاقِي بِحَيْرَانِي
وكِي گَنْجَا دِورَانِي ، مَه پَيْدَاكِرْ بِرَمَّالِي
بِرَمَّالِي مَه پَيْدَاكِرْ ، دِلِي غَمگِينْ مَه بِي شَاكِرْ
نَقِيُّ الخَدُ وُإِبْرَا كِرْ ، وكِي زِيرَا دُوصَدْسَالِي
نَقِيُّ الْخَدْ طَلايَانِنْ ، بَرَاتُ وُأَمْرُ فَرْمَانِنْ
بِطُغْرَاءُ وبِنِيشَانِنْ ، دِ دَسْت عُشَّاقِ دَلَالِي

«لِدَسْت عَاشِقِ شَيْدا ، مَلاتُو سُخْتَه وُ سَيْدا[1]
كُو لِي «بَزْمَا ألَسْتْ» مَيْ دا بِكَأْسَا گَوْهَرِي عَالِي
بِكَأْسَا گَوْهَرِ والا ، كُو زِي نَقْشِ خَطْ وُخَالا
دِكِنْ كَشْفَا سِرُّ وحَالا دِلِي كُوزْ «مَاسُوا» خَالِي
دِلِي زِي «مَاسُوا» دُورَه ، تَجَلِّي لِي زِ سَرْ طُورَه
شَمَالُ وُآگِرُ وُنُورَه ، جَلالُ وُجُوشُ وُخَوْشِ حَالِي

---

١ ـ زِفْر پِيدا : أف دونزده بَيْتِينْ داوي ، يِنْ مه نَه ، هيڤيدارم كو سيداى خاني ، مه ببخشينه و بزيرُ و گوهرين خوه را ، أڤان پُولين مه يِن بي نرخ زِى ، گران بها بگرينَه .
(دُرّه)

ـ دلا ـ

دلا! قَطْ نِينَه مَحبُوبَكْ ژ تَه جُزْئَكْ نَه بتْ لا لي
دلْ آراما! نَه مَجْزُوبَكْ هَيَه سرا تَه ژی خَالي
اگَرْ سرا د قلَبَانَه وگَرْ نُورا د وَجْهَانَه
بمنْ يَك رَنْكُ و يَكْ طَانَه ، د گَل يَكْ بُون لوِي آلي
ژ غَيْب اُوْ بيكْ هَاتنْ ، هَمی جُوتنْ نَه تَكْ هَاتنْ
وكی جافيْت بَلَكْ هَاتنْ ، بهَفْ كَتْ شَاهيُ و طَالي
اگَرْ چسْتَه ، اگَرْ نُورَه ، اگَر نيزيْك اگَرْ دُورَه
برينا عَاشقَان كُورَه ژ سَرْتيرا كُری زَالي
ژ سَرْتيرا مُجَوْهَرْبُو ، چه آورْبُو چه خَنْجَرْبُو
ژ بُو منْ را مُقَدَّرْ بُو ، دَمَا پُفْ كرْنَه صَلْصَالي
وگَرْ صَلْصَالُ و فَنَارمْ ، تژی نُورمْ ، تژی نَارم
د بَاطن شُبْه خُنْكَارمْ ، بظَاهرْ كَتْمه في شَالي
بظَاهرْ شَالِ خَوْه زيبا ، گَلَكْ اَطْلَسْ گَلَكْ ديبا
گَلَكْ سيمْ وُ گَلَكْ شيبا ، مَه هَافيتنْ ، جيگَرْ نَالي
جيگَرْ نَالي ، مَه هَافيتنْ ، هَمی يَكْ يَكْ هلافيتنْ
گَلُو كی بتْ كُو نَافيتنْ ، حَبيبَكْ چَاردَهْ سَالي
مَه گرْ هَرْ منْ د فی ديلَبَرْ ، دُوصَدْ علْمَانْ بكمْ اَزبَرْ
ژ خلْخَالانْ دبيْت اَبَترْ مَلا مَقْصُودَه خلْخَالي

هَلْ لَنَا مِنْ نِعْمَةِ الْوَصلِ حبيبي مِنْ نَصِيْب
أُوفتَادَمْ بَرْ دَرَتْ ، بِي چَارَه ، سَرْ گَرْدَه غَرِيبْ
دَرْدِمِنْ چُوْق أُولْدغَنْدَان أُونا يُوْقترْ هَيْچ طَبِيْب
أيْ طَبِيب مِنْ دَوَاي دَرْدِ«خَانِي» هَرْ وِ صَالْ

❀

ـ شَهيد كَرْبَلا ـ

لَيْس في قَلبي سِواكَ يا حَبيبي كُلَّ حَال
هَرْ دَمَمْ غَمّ هَمْدَمَمْ شُدْ دَرْ فِراقَتْ مَاهُ وسَال
گَرْبَنِم قانِمْ دِيلَرْسَن چُوقْ دَن أُولمُوشْتَرْ حَلالْ
مَسْتُ و سَرخُوشَمْ ژِ عِشقِي ، مِنْ نَه مَا عَقلُ و كَمالْ

أَنْتَ فِكْري في فُؤادي ، أَنْتَ رُوحي في ٱلجَسَدْ
لَشْكَرى غَمْهايْ تُو مُلْك دِلَمْ وِيران كَرْد
دادَه گَلْدِمْ عِشْق ٱلْنَدَنْ ، أَيسْتَرَمْ سَنْدَنْ مَدَدْ
قَانْ تَتارانْ كِرْنَه تَالانْ جَانُ و دِينُ و مُلْكُ و مَالْ

طالَ غَمّي ، زادَ هَمّي ، شاعَ سِرّي في ٱلمَلا
تَشْنَه ئى جَامَا وصَالَمْ چُونْ شَهيد كَرْبَلا
يُوقَسَه سَنْ ديوانَه أُولدنْ ! نيجَه حَالنْ أَيْ دلا !
يَانْ ژِ نُوقَه عِشْوَه يَكْ دا مِنْ حَبيبا چَافْ خَزَالْ

بِتُّ مَهْجُوراً حَبيبي ، لَسْتَ مِنّي عَالماً
مُرْدَمْ أَزْ دَرْد فِراقَتْ ، غَافِلي أَزْ حَالي مَنْ
جَانُ و دِلْ دَنْ عَرْض قِلْدِمْ حَالمي جَانَانَه بَنْ
عَرْض حَالا مِنْ تو غَافِلْ ، قَطْ نَه پِرْسِى عَرْض حَالْ

ـ بَـاغِي صُـورْ گُـلاْن ـ

أَزْ چُـومَـه بَاغِـى صُـورْگُـلاْنْ وَخْـت سَـحَرگَـاهِـي بِـخَفْ
مِنْ دِي صَـداى بُـلْـبِـلاْنْ داگَـرْتَـبُـونْ هَـرْچِـار طَـرَفْ
صَـوْتَـا هَـزَارُو قُـمـرِي يَاْنْ ، دَنْـگَرُبَـابُ و مُـغَـنِـي يَـاْنْ
تَشْبِيـه بَزْمَـا بَنْگى يَاْنْ ، هَفْ دَنْگ هَـفْ بُون چَنگُو دَفْ
مَـا نَـنْـدِى مَسْتُ و سَرخَوشَاْنْ ، أَزْ چُـومَـه بَـزْمَـا مَـهْ وَشَـاْنْ
أَبْـرُو كَـمَـاْنُ و چَـاْف رَشَـاْنْ ، جَـرْگُـو دِل مِنْ كَـرْ هَـدَفْ
پَـيْـگَاْن دِ جَرْگُـو دِل بَـرِي ، تَـنْ بُـوِيَـه صَـنْدُوقَـا بَـرِي
صَدَّقْ ژ حُـسنا ڤِي پَـرِي ! هَـيـژا لَمِنْ كَـرْ كَـرْبُ و گَـفْ
هيژا لِمِنْ بُو كَرْبُ و كِيْن ، ظَـاهِرْ غَـضَـبْ ، بَـاطِـن كَـنِـيْـنْ
لِى غَـمْـزَه يَـكْ دا مِنْ نَـهِـيْـن ، عَـقْـلِ مَـه دِيـسَانْ كَـرْ تَلَفْ
دِيسَانْ حَبِـيبا چَـافْ بَـلَـكْ ، أَحْسَـانْ دَگَـلْ مِـنْ كَـرْ گَلَكْ
لَـورا دَگَـلْ زُلْـفِـيْنْ خَـلَـكْ ، أَلْـوْز مَه طِـيـنِـنْ قِـشْتُ و لَفْ
خَمْرِيِ و قِشْتُ و زُلْفُ و خَال ، حَمْيَاْن لِسَرْ رُخْسَـــار آلْ
دِيـگَرْ هَـبُـون جَنْـگُ و جِـدال ، لِـيـكْ آلِيَا بُوْن صَفْ بِصَفْ
صَفْ صَفْ مَه دِي وِى كَرِيَه جَنْگ ، هِنْدَكْ حَبَشْ ، هِنْدَكْ فِرَنْگ
قِـيـكْـرا بِرَانْـدِنْ وَكْ خَـدَنْـگ ، دِيگَرْ هَـبُـون وَانْ لَافُ و لَفْ
دِيگَـرْ هَبُـونْ دَعْـوا تُـو شَـرّ ، دَرْبُـونْ لِـمِنْ تِـيـپَـا تَـتَـرْ
ژِيـكْ رَاكَـرْن قَـلْبُ و جِيگَرْ ، رِهْـتِـن ژ دِلْ خُـونَا بِكَفْ
رِهْـتِـنْ ژ دِلْ خُـونَـا دِلاْن ، شَـهْـمَـارِى زُلْـفَ سَـرْمَـلاْنْ
بِي رَحْمُ و مَسْتَا قَاتِلاْنْ ، مَيْ خَـوَارْ ژ فِينجَـانَا صَدَفْ
وَانْ مَيْ خُـورَانْ أَبْـتَـر كَـرِيْـن ، بِي قُـوَّتُ و رَنْـگْ زَرْ كَـرِيْـن
وَأَلْـلَـه ژ دِلْ كَـرْكَـرْكِرِين «خَـانِي» بِـصَـد آهُ وَأَسَـفْ

ـ دلـی شَیْـدا ـ

دِیسَان دلی شَیْدا ژ نُو ، دا أخـتیـارْ ، پَـرْوازي کرْ
صَیْدَکْ دي یَهْ و بَرْ دایَه دوُ ، مَیْلُ و فِرا شَهْبا زِي کرْ
مَیْلا وِي مَحْـضَا حِکمَه تَه ، صَیْدا وی عَنْقا سیرَه تَه
طَیْری وی بَالا همَّه تَه ، لَوْرا طَلَبْ أفْرازي کرْ
عَنْقَا بِدَسْت کَسْ نـاکَفتْ ، دامَکْ دفـی أوْ داکَفتْ
نَابتْ کُـو غَافِلْ راکَفتْ ، أی قَصْد صَیْدا بَازي کرْ
صَیّادِّي یـا مِنْ بُو عَبَسْ ، دائِیـمْ لمنْ طَنْگ بُو قَفَسْ
راحَتْ نَه بُوْم أزْ یکْ نَفَسْ ، مِنْ لَوْ بأفْغَانْ سَازي کرْ
سَازُ و سَمَایا صُحْبَتی ، گُوڤَـنْـد وُ چَـرْخا دَعْوَتی
فکْري مَه شکْلُ و قامَه تی ، بِیرْ طِینَه مَهْ بآوازي کرْ
شکْلِ مَجَازي جـنْـدکَه ، صَیْدا حَقِیـقي وَرْدکَه
تَیْغُونی قَیْدا لی قَه کَه[1] ، بَحْری ، مَه بَرْ أنْدازي کرْ
زَنْجِیرْ دبی تَیغُون بتْن ، جَنْدَکْ لِپیشْبَرْ خُوْن بتن[2]
شُنْقَارْ نَه دی مَجْنُون بتن ، أسْکُوف ژ چَافـان بَازي کرْ
شُنْقـارَه چَافْ ، تَیْغُونَه دلْ ، بَرْ دا نَه دُو چَافِینْ بکلْ
«خـانِي» أوانْ گِیـرا خَجِلْ ، لَوْ را مَجَاز آغَازي کرْ

---

١ ــ لِیفَکَه (خ) .

٢ ــ چَـنْـدَک (خ) .

ـ أيْ مُطْرِبِ دَمْ سازْ ـ

هيـدي لأبْـريشـمْ بـدَه أيْ مُـطـرِب دَمْـسـأز
صَدْ دلْ بـدَ فْنْ بَـسْتَـه ئُـو هـرْيَـكْ بدوُ صَدْ نـأز
أيْ بادِ صبَـا پـرّ مَـه هـزِيـنْ طُـرّه ئـى د لـدارْ
عُـشـّاق بنالـيـنَه ژ مُـرْغُـولَـه ئى شَـهْنَـاز[1]
سـاقـى بـگـرِينْ بادَه ئى أنْـگُـور بـطـنْبُـورْ
جـانا بدَه منْ بُوسَه يَـكى هَرْوَه بدلْ خـوأز
رُوحِ مِـنُ و سِـرّا د رُخى يـاري بـيَـكْ را
روُژا أزَلى بُو نَه بدلْ هَمْ دَمُ و هَمْ رازْ
«خـانِي» تَه غَلْط زانِي ، كُـوْ أو هَرْ ژ خَوه يَكْ بُون
خـلاَّق ، تَـعَـدّدُ بـمَـظاهِـرْ كِـرَه أعْـجَـازْ

١ــ مُرْغُولَه : زُلفُ و بِسكينْ كُرِيشْكُ و خَلَكْ .

ـ هَرْ دِنَالِمْ ـ

هَرْ دِنَالِمْ شَبْ و رُوژانْ ، مگَرْ اَزْ اَیُوبِمْ اَزْ
هِیـــــــــسْترانْ هَرْ قَه دمَالِم ، مگَرْ اَزْ یَعْقُوبِمْ اَزْ
بِگِرِنْ دَسْت ژِمَه بِیـرُونْ ، کُلُ و دَرْدانْ کُـو یَـکِنْ
وَربِیـــــــچِیْن بِجفَایِ خـــوه کُـو اَزْ مکْتُوبِمْ اَزْ
هِنْدکِی غَمْ هَیَه دائِیم لِمَنْ أو قِیْك دکَفِنْ
اَزْ نزانِمْ کُـو بِجـافْ وانْ چِـه قَـوِي مَحْـبُـوبِمْ اَزْ
غَمْ طَلَبْکـــارِی مَه یَه ، اُمْ خَوْه طَلَبْکـــارِی دِیـــارْ
وَهْ طِلِسْمِي طَلَـــبِـــم کُو طَالـبُ و مَطْـلُـوبِمْ اَزْ
عَجَبْ اَقـــبَالِی ژِبُو مِن نِهَه «خـــانِي» کُـو لِبَالْ
پادِشـــــاهِی غَمُ و دَرْدانْ وَهَه اَزْ مَـرْغُـوبِـمْ اَزْ

❀

ـ سازِي خَوْش آوازِمْ أَزْ ـ

صَـيْـدِ چَـنْـگَالِ [1] سَرِ زُلْـفَا شَـهَا شَهْـبَـازِمْ أَزْ
مَسْـتِ جَامَـــا عِشْـوِيا شَـهنَازِ نَازِكْ نَازِمِ أَزْ
رَمْزُوأَعْـجَـــازِ دِخُوبَانِ بِي عِبَارَتْ مَدْحِ دِكْـمْ
مُرْشِـدِ كَامِـلْ أَزِمْ أَيـرُوهَـه صَـاحِـبْ رَازِمْ أَزْ
بَيْضِـه يَا أَزْ طِي عَبَسِ بُـو ، آشِيـيـانَا مِنْ قَـفَـسْ
گَـرْچِـه دِلْ طِـي پِرّ هَـوَسْ بُوُ ، بِي پَرُوُ پَرْوَازِمْ أَزْ
فِي حَـيَـــاتَا حَيْـرَتِ چِـهْ بِكَـمْ بَقَـا نِينَه ژُبُـو
لَوْ شَـــهِـيـــدِ غَمْزِه يَا وِي دِيلْبَـرَا طَنَّـازِمْ أَزْ

دَرْدمَنْدَكْ مِنْ دِفْـيـتِنْ هَـمْ نَـفَسْ بِتْ «خَـانِـيـا»
گَـرْمَه هَـمْ دَسْـتَكْ هَبِـيـتِـن سَازِي خَوْش آوَازِمْ أَزْ

❀

---

۱ ــ پنجاهی (خ)

هَرْ دَما نَترِكِ خَلْخالْ بنی هَرْ طینَه خُروش
هَرْ دَما طُرّه ژ بَر طائی قَصَبْ طِیتَه صُدُور
یا نَه کاکُل ژ کناری کُلَهی کَجْ بِدَرِینْ
یا خَط مِشْکینْ بِدَرْتِیتْ ژ کناری کآفُورْ
کافِرِ عِشْقَمْ اگَرْ اَزْنَه دَمی اِیمانی هَرْ
یا بِمحراب بُرویان نَه بِرِمْ سَجْدَه ژ دُورْ
واعِظا ! گُه بِدَه مِنْ دا بِبهی نَقلِ صَحیح
مصحَفا چَهْرَه ئی خُوبانَه کِتیبا مَسطُورْ
دَفْتَرِی عَشْقی نَه دا دَسْت تَه مُعَلّمْ ژ اَزَلْ
مَعْنَیا آیتی حُسْنی لِتَه لَو ما مَستُورْ
بی تکلُّفْ دِخَورِمْ سُونْدی بِقُرآنا شَریف
«خانیَا»صُورَتی جانا نَه بِمِنْ سُورَتی نُورْ

رابَه أيْ ساقِيي مَهْوَشْ تُو ژ رَغْما فَلَكى
بدَه مِنْ باده ئى لَعْلي تُو ژ جاما فَغفُورْ
شَيْخِ جامْ أرْ نَفَسي هَمْدَمى دلْ كَتْ بمُرادْ
لمُرادى دلى مُرْدَه د بتِنْ كَشْف قُبُورْ
يَعْنِى أوْ خانَه ئي گلْ نا بتَه قابلْ قَطعا
نَه بچَشْم دلى ناظرْ ، نَه بروُي مَنظُورْ
عِشْقِ بازي دُو طريقه ، چه حَقيقَةْ چه مَجاز
شَمْعِ جان دى بقَژيتنْ چه بنارُ و چه بنُورْ
شَبى ظُلْماتى بأمْكانى د بتْ صُبحِ نُومـــا
آفيتابى أحَديَّتْ ژ فَلَقْ طيتَه ظُهُورْ
سَرُ و مالُ و دلُ و جانى مَه فدايى تَه بتنْ
بكَه قَلبِ مَه تُو ساقى ! ژ شَرابا خَوه طَهُورْ
دا بكَمْ كَسْبِ مَقامات عُلُوِّى دَرَجأت
يا بكَمْ كَشْف كَرامـــات ژ دارا مَنصُورْ
زاهِدا گَرْتَه د ڤيتْن تُو خَودى ناسى بكي
وَرَه بَرْ سايَه ئى شَمْشادي قَدانْ ، قَطْ مَه چَه دُورْ
بزيادى وَرَه قَيْدى شَجَرى وادي ى قُدْس
كُو بزاني ببهى صيت «أنا اللّهُ» ژ طُورْ
أرْ لَمَا شيفتَه ئُو والهى مَحْبُوبانَه ثَمْ
كُو دنيفْ آينَه ئى جَبْهَت وان مِنْ ديَه نُورْ

ـ سَاقِي ی مَهْوَش ـ

أيْ دِ لا گَـرْتَـه دِ ڤِـيـتِـن بِـبی دائِـم مَـسـرورْ
د طَـرَب خَـانَـه ئِـي دُنـيـا ڤَـه خَـوه آڤَـا أنـگُـورْ
پَـنْـبه ئِی غَـفْـلَـتی غَـوْغَـائی جـهَـانـی بـدرّيْن
ژ مَـقـامی كُو بَـهـشْـتـی ژ صَـدايـی طَـنـبُـورْ
زَمْـزَمـا زَمْـزَمَـيـا راهِـی حُـسَـيـنـي ژ حـجَـاز
ڤَـه خَـونتْ ،كَـعْـبَـي دلْ تا بِـتَـه بَـيْـت الْمَعمُوْر
پَـرْدَه ئِي ظُـلْـمَـت أشْـغَـال جـهـانـی بـدرّيـن
ژ نَـظَـر گـاهِی جَمـالی تُـو حِجـابِی بِـكَـه دُوْر
مَـنْـظَـر دِيـده ئِي جـانـی تَـه مُـنَـوَّر نَـه بـتـنْ
نَخـل «مازاغَ» نَـكِيشي تُـو ژ خالُ و خَـطِـی هُورْ
گُـنَـهـانْ گَـرْنَـه بُـوانْ لَـذَّتُ و ذَوقَـكْ حَـاشـا !
فَـاعِـل أثْـمْ نَـه د بُـو ، تارِكُ و تائِـب مَـأجُـورْ
مَـيُ و مَعـشُـوقُ و هَـوسْ بازِيـي دُنـيـا ی زُهُـورْ
نَـه بُـووانا ، نَـه د بُـو إسـمَـكِی اللّه غَـفُـورْ
مِـنْ گُـنَـهْ طِی بِگُـنـاهأنْ كُو دنـيـفْ بـاغِ جهانْ
ثَـمَـرِي خَـوْشتر أڤَـنْ ، بُـون بِـحَـرامِـی مَـشهُورْ
هِـنْـكِی دَوْرِی فَـلَـكی سـاغِـر مَـهْ دَوْر دكَـتْ
مَـهُ وسـالانْ دِگـرِتْ هَـرْوَه ژ عَـمْرِی مَـه قُـصُـورْ

---

١ ـ پَرْدَه ئی (خ)

أوْ رُونَه ، يانْ گُلْبَرْك آلْ ، آلآلَه ، يانْ ديمَا بخَال
قَنْديل نُورا ذُو الجَلالْ ، مرْآتَه ، يانَا مَظْهَره
ديم شُوشَه نُورا حَوْ د نافْ ، دَفْ غُنْچيَا شيرِيْن گُلافْ
رُخْ صُورگُلا رَنْگينْ خُنَافْ ، خَال مسكَه ، نيشَان عَنْبَره
ليفْن گَلُو؟ ياقُوت جَان ، يا قُوتَه ، ياقُوت رَوَانْ
يانْ قُوتيَا دُرْجَا درانْ ، يانْ حَوْضَا آقَا كَوْثَره
يَا رَبْ ! خَطِى رَيْحَانيَه ، سَرْ سُورة قُرآنيَه
يَانْ خَاتَمَا سُلْطَانيَه ، مرْآتَه ، يَانَه مَنْظَره
خَالِنْ گَلُو؟ يَا فُلْفُلِنْ؟ أوْ عَارضِنْ يَانْ صُورْگُلِنْ
أمْ عَاشقِنْ يَانْ بُلْبُلِنْ ، ذكْرى وي وَرْدا أحْمَره
أوْ گَرْدَنَا شبْه شَمَالْ ، سَرْ چَشْمَه يَا آقَا زَلال
قَارورَه يا خَمْرا حَلال ، يانْ شيشَه يَه ، يان شكَره
يارب قَدا زيبايَه أفْ ، يان كَعَبَه يا عيسايَه أفْ
يان مَسْجدُ الأقْصايَه أفْ ، يان «سدْرَه» ، يانَه عَرْعَرَه
يَارَب ! دل ديوانَه يَه ، يَا عَالمِ فَرْزانَه يَه
يانْ بُلْبُل ويرانَه يَه ، يانْ عُودَه ، يَانَه مَجْمَرَه
أو «خَاني» يى دلْ دادَه يَه ، مَشْرَبْ ژ رَنْگى بادَه يَه
دَرْدى وي يارك سادَه يَه ، لَوْ هَرْ ضَعيف وُ رَنْگ زَرَه

ـ تَخْت دِيلْبَري ـ

أِيـرُو لتَخْت دِيلْبَـرِي ، يارَبْ ! چه شـرِيْن أسـمَره
ژِى نا بـتـنْ مِنْ دِلْـبـرِّي ، أو ديـلْـبَـرَه يا دِلْـبَـره
دِلْ گُور يـا جَانَانَه أفْ ، هَمْ ديـنُ و هَمْ أيمـانَه أفْ
هَمْ لُطفُ هَمْ أحْسَانَه أفْ ، هَمْ لاوُو هَمْ كَردَنْ زَره
كَاكُلْ ژِبَرْ تَاجِى بزَرّ ، طَاطَا وكِى پَرّ طِيـــــتَه دَرْ
سَرْ عَسْكَرِى تِيپَا تَتَرْ ، سَرْ دارَه ، يَانَه سَرْ وَره
زُلْفِنْ گَلُو پِرّ پِيـــــچُ و خَمْ ، يـــا سُنْبُلا بَاغِى أرَمْ
زَنْجِيـرَه ، يا سَرْ تَـا قَـدَمْ رَشْـمَـارَه ، يانَـا أرْدَره
يارَبْ حَبِيـــبَا رَنْكَ فَلَقْ ، جُورِى تَتَقْ داگرْت شَفَقْ
يـا بَلْگُ و نَتْرِكْ يـا وَرَقْ ، يـا قشْتَه ، يـا نَه چَنْبَرَهَ
أوْ طُرَّه ، يا كِيْسُونَه أوْ ، زَنجِيـنَه يان هـنْـدُونَـه أوْ
شُتْرِيـنَه ، يا شَبْبُونَه أوْ ، يـا تُوخ شـــــاهِى سَنْجَره
أبْرُونَه ، يا جُوتَكْ هلالْ ، هنْدوُنَه ، يا نِيـشَانُ و خَالْ
كَـيْـسُـونَـه ، يا حَضـرَتْ بـلالْ ، مَـشْـغُول أَللّه أكْبَره
چَافِـنْ گَلُو ! يـا سَرْ خَوشنْ ، يا كَافرنْ ، يـا دلْ رَشنْ
بِيـــمَارنْ أوْ ، يا نَه خَوشنْ ، يا نَرْگسَه ، جـادُوكَـرَه
رُخُســـارَه يا رَبْ ! يا قَمَرْ ، كُفـــتَارَه يا رَبْ ! يا گُهَرْ
أوْ قَـنْـدَه يارَبْ ! يا شكَرْ ، أوْ شُهَـــدهْ ، يا نَـه خَبَره

ـ مِیرِی مَجلِـس ـ

مِیـرِی مَجْلِسْ نَه کَنِتْ ، مُطْرِبی گُویا چِـه بِکَتْ
غُـنْـچَـه خَـنْـدانْ نَـه بِتنْ ، بُلبُلی شَیدا چِـه بِکَتْ
نَـیْـنِکا حُسْنِ بُـتـــانْ لازِمَه صـاحِبْ نَـظَـرکْ
کَسی بِینا کُـو نَه بِتْ ، دیلْبَرِی زِیبـــا چِه بِکَتْ
بِی کَرَمْ نا چِیتَـه تِیـپا عَـدُوانْ مَـرْدی شَـجِیْـع
تِیـغی آهَـنْ چِیتَـه ، بِی دَسْـتی تَـوانا چِـه بِکَتْ
طَالِبِ عِلْمُ و کَمـالی نَـه بِتـنْ قـابِلی فَـیْض
حِکْـمَـتُ و تَـرْبِـیَّـه ئی عَالِـمی دا نا چِـه بِکَتْ
قَـلْبی «خـانِي» صَدَفـا گَوْهَری عِرْفـانَـه وَلی
مَتْنِي خوانَکْ کُو نَـه بِتْ ، صَاحِبِ مَعْنَا چِـه بِکَتْ

ـ آفَـرِيْن بُـو تَـه ـ
ـ پـَرِي يا حُورِي سِرِ شْت ـ

عِشْوَه يَكْ دا مَه سَحَرْ وِى پَرِي يـا حُورِي سِر شْتْ
شَـفَقى بَـرْق جَمـالى دلُو جانْ صُوهتُ و پـرِشْت
مَـه نَـه زانـى كُو مَـلَكْ ، يانَـه بَـشَرْ ، يا پَـرِي بُـو
يَـد بَـيْضا وكُو مُـوساي لـقَـتْـلى قَـه دمِـشْت
كَـعْـبـةُ اللّـه جَمـالى مَـه دكـرْ چـيـنَـه طَـوافْ
خَـيْـبَـرى هـاتـنَـه منْ خالُ و خَطُ و چَنْبَر وُقشْت
عِـلْـمِ أسْـمـا مَـه ژِبَـرْ كرْد دَبَـسْـتـانَ صـفـات
طَـالِب ذاتـى مَـه ، لَـوْ منْ شَـمِرانْـد بـاغِ بَـهِشْت
آدَمـى كـامِـل أزِمْ ، بُـويـي مَـه مَسْجُـود مَـلَـكْ
مُـدَّعى گَرْنَه بـتِـنْ سَـجْدَه بـمِنْ ها سَر خِشْت !
«خانيـا» دى هَـه بـتِـنْ بـي هُـنَـرانْ لافُ و گُـزافْ
آفَـرِيْـن بَرْتَـه ! كُو أفْ شِيـوَه ژِبُو كَس تَه نَه هِشْت

«هُنَرى عشـــقى تَه دا مَه هُنَرْ آمـــوزي جهـــانْ !
دَرى مَيْـخـانى گهـا مَه كُـو ژِ مزْگَفْتُ و كَنِشْت»

«دُرَّه»

ـ سَرْوا مَه ـ

سَرْوا مَه بِصَدْ رَنْكُ و هَزارْ عِشْوَه ئُو مَشْ هاتْ
عاشِقْ كِرنْ اَحْيا ، لِرَقِيبانْ كُو نَه خَوشْ هاتْ
سُنْبُلْ كَمِلانْدِنْ ، گُلُ و لالَه خَمِلانْدِنْ
رَيْحانْ شَتِلانْدِنْ ، لِرَخانْ[1] تازَه بِنَفْش هاتْ
تَنْ دَرْفَه نَه بُو قَطْ نَه د دا بَخْتَى كُشادَكْ
رُو دا مَه شُكُرْ ! كَعْبَئِى طالِعْ مَه دُوشَش هاتْ
پِيدانَه فِرَنْگِى[2] ئُو نِيلُو هاتَنَه رُومِي
شُكْرانَه ، نِيهانَه ژ عَرْبْ هَمْ ژ حَبَشْ هاتْ
رَشْتُو زِى خَوه نُو بارَه ، مَگَرْ كُوشَه د خَوازِن
تِيرا كُوشَه ئِى داتَه ، هَدَفْ گِرتُ و بِكَشْ هاتْ
يانْ هاتُ و بِنِيفا دِلِي كَتْ قَطْ نَه د وَسْطا
لَوْرا كُو ژ بَرْ قَوْسِى مَه دِى زِيدَه بِوَشْ هاتْ
«خانِى» بَسَه بِى عارِي ! چِرا زِيدَه ئِى سالان
اِيسالَه ژ خَوهْ طالِع وُ بَخْتَى نَه بِرَشْ هاتْ

---

۱ ــ لِرُخان

۲ ــ فِرَنْكان و نِيلُو . (خ)

ـ عَرْشِ مُعَـلاَّ ـ

أيْ آيِـنـه ئِـى دلْ بِـجَـمـالاتَـه مُـجَـلاّ
صَـدْ صَـفْـحَـه بِـيَـكْ زَرَّه ژ نُـورا تَـه مُـطَـلاّ
إنْسانْ ، تَـه ژِ بـُو عَـالَـم كُـبْـرى كـرَه نُـسْـخَـه
لَوْ مُـضْـغَـيَـكـى[1] ژى تُـو دكِي عَـرْشِ مُـعَـلاّ
وَحْـدَتْ ، بِـحَـسَـبْ كـثْـرَت أعْـيـان مَـظَـاهِـرْ
هـرْسُـو بِـصِـفـاتَـانْ دكَـتِـنْ كَـشْـف تَـجَـلاّ
لَـوْ مُـخـتَـلِـفُ الْقَـولُ وَعَـمْـلَ بُـونَـه خَـلاَئِـقْ
كـافِـرْ ژ صَـنَـمْ بُـونَـه بِـنـاف تَـه تَـسَـلاّ
سِـرّاً خَـوه نِـهـانِـي تَـه كُـودا «أحـمَـد خَـانِي»
أزْ غَـيْـرِي بَـرِي شُـد ، بَـه تُـو آوَرْدِي تَـولاّ

١ ــ مُضغه : جوم ، لوقمه ، جومه كى گوشت . كو دفردا مَبَستى دله ، إشارتى بال في حديثاقدسي فا يه : «لايسعني أرضي ولا سمائي بل يسعني قلب عبدَي المؤمن» .

ياني : أرض و عزمانى مِنْ ، مِن د خودا ناگره ، لِى دلى عبدى مِنى باوركرْ من دخوه دا دگره .

ـ أيْ واحِدِ پِنْهَانْ ـ

أيْ واحِدِ پِنْهَانْ كُو ژ ذات تَه نَه پَيْدا
أڤْ كَوْنُ و مكَانْ ، أرْضُ و سَما كُمّبَدِ خَضْرىٰ
أرْواحُ و عُقُولْ ، أنْفُسُ و أعْراضُ و جَواهِرْ
حَالِيْنُ و مُصَوَّرْ ، نَه مَحَلٌّ و نَه هَيُولا
لَوحُ و قَلَمُ و كُرْسِيُ و عَرْش ، أنْجُمُ و أفْلاكْ
هَمْ آگرُ و هَمْ آخُ و هَوا ، جُملَه ئِى أشْيَا
صَدْ قَافِلَه مَوْجُودُ و پَيِاپَيْ مُتَواتِرْ
هَرْ لَحْظَه ژ صَحْرايِ عَدَمْ طِيْن بتَمَنّا
هِنْ ، نَقْدِ فَنَايِ د گُوهُورن بِبَقَاي
هِنْ ، نَقْد وُجُودا خَوهْ دكِنْ بِي بَدَلْ أفْنَا
هَرْيَكْ بِوُجُودا خَوهْ ، وُجُودا تَه د خوازْن
بِالْجُمْلَه خَريدارِ جَمَالا تَه نَه حَقَّا
لَوَشُبْهَةِ پِيرا بِهَوَسْ طَالِبِ يُوسُف
دوُرْ هَاطِي يَه «خَانِي» كَلَفَارِيسِى د دَسْتَا[1]
أوْرِي بِمَتَاعِى خَوهْ ، قُماشِي تَه د خوازْت
«سُبْحانَكَ لَنْ تُؤيِسَ مِنْ رَوْحِكَ عَبْدا»

---

١ ــ دبيژن دما كو لمصرى يوسف بيغمبر ژ بوي فروطانى در طين بازارا كُولَه يان ، پيرَه ژنَه كي مصري ، كَلَفَا «گلُوكا» ريسى خوه دگره دستى خوه ئو طى كو يَوسف پَيغَمبَر ، ژ خوه را بوي كَلَفَا ريسى خوه بِكرَه . . .

أيـرُو كُو مه پـرْسِي كرْ ، هـنـدي مَـه نَـظَـرلي كرْ
مِنْ سَيْـرَكْ لـيـيكى كـرْ ، لَوْرا مَه دلُ و دِيْن دا[١]
مِـنْ دِي هَـمَـه يَـكْ پَـرْتَـو سـاري د مَـظاهـرْ دا
مُمكِنْ هَـمَـه ژى پْـرَنُـور ، أمَّـا نَـه د تَـمْـكِـينْ دا
أوْبُـو كُو زَكِيـــخـــائي أيـديني د يُـوسـف دا
مَـجْـنُـون د لَـيـلْى ئى ، فَـرْهـاد د شِـيـرِيْـن دا
مِصـبَـاحِ أبَـدْ مِـنْ دِي أيـرُوهَـه د قَـنْـديـلِ
گَـنْـجـا أزَلِي مَـرْكُـوز مِن دِي د گِلُ و طِـيْـن دا
جَـانا ژ جَـمـــالا تـه أزْ دى چـه بـبـمْ صَـابـرْ
شَيْخـانُ و أولُو الْعَزْمـان جَانى خـوَه د كـالِيْن دا
شاهِـدْ بِي تُـو أيْ زاهِـدْ ! مَحبُـوب پَـرَسْـتـمْ أزْ
بـي شـــاهِـدُ و مَيْ نابِـمْ ، شِيخِ مَه أوْآيين دا[٢]
مَـعْـزورَه أگَـرْ صُوفي بتْ مُـنْـكرى مَحـبُـوبـان
كُورْ دى چـه تَـصوُرّ كَـتْ سِـرّا كُو د دُورْ بِـيْـن دا
جـانِي ژ تَـه أىْ «خـانِي» جـانا كـو بخـوازِيْـتـن
«خـا» نُقطه لِبنْ دانِي ، في الحـال د مزگِين دا[٣]

---

١ ـ لَوْ مَامَه د لوُلِيْن دا (خ)
٢ ـ شَحْنَه د دَواوين دا «خ».
٣ ـ د هِيلين دَا (خ)

ـ نَقّاش أزَل ـ

نـــقّـاشِ أزَلْ رُوزَا ســـرْلـــوْحـــهَ ئِ رَنْگـــينْ دا
پَـرْگـال د دَسْـتَـانْ بُـو ، سَرْصَـفْـحَه كوُ تَـزْيِـينْ دا
تَـذْهِـيـبِ زَرَفْشـــان كرْ سَـرْلَـوْحِ كتـــابا عـشْـق
رَسْـمَـا أزَلِي كَـيـشـا ، نَـقْـشِـي خـوَه نَـوالْين دا[1]
دِيبـــاجَه كُوانْشـــا كرْ ، فـهْـرِسْـتَـه كُـو أمْـلا كرْ
جَلْـدَكْ ژ عَناصِرْ بَسْـت ، نَـفْـخَكْ د سَـفَـالينْ دا
أطْـفـــالِ مَلَـكْ هَـاتـنْ ، وَسْـتـانَـه دَبَـسْـتـانى
لا عَلِمَ لَنا گُـوتـنْ ، أبْـجَـدْ بـخـــوَه تَـلـقِـينْ دا
وانْ سَـادَه رُخانْ مَـشْـقَـى عـشْـقـى كُو تَـمَـنّـا كـرْ
خَـطّـاطَ ژ حُـسْـنِ الْـخَـطِ سَـرْمَـشْـقِـكِي زِيـرِيْن دا
ما سَـجْـدَه تَـنَـى مِنْ بـرْ بَـرْ صُـورَتَـى مَحبوُبـان
أبْلِيـــسى نَـه بـر سَـجْـدَه لَوْ مـــايَه د نَـفْـرِين دا
أز چُـومَـه دَرِى دِيـرِى من ديـتى كُـو رُوحِ اللّـه
تَـكْـرَارِي مُـصَـوَّرْ بُـو حَـتّـا د نَـهَـالـيـن دا
وانْ جُـمـلَـه «أنا الحقّ» گُـو ، مـن واحد مُـطْـلَـق كُو
سَـاقِي بـخـوَه أز گـرْتـمْ جَـامَـكْ مَي نُـوشـــيـن دا
مِنْ نُوشِي ئوُ سَرْخَوَش بُوَمْ ، فِي الحـــالَ مُشَوَّش بُوم
أزْ چَـارُو نَـهُ و شَـشْ بُـومْ ، مِـنْ تَـكْـيَـه بِـبَـالِـين دا

---

١ ـ نُو آنِينْ دا (خ)

ديوانا أحْمَدِي خاني

(١٦٥٠ - ١٧٠٧/٩)

بلگـه كي تاريخي ١٠١
بـژي آزادي ١٠٢
أطيب الذكرى ١٠٣
قدس معبدي (كردستان) ١٠٦
گـلُ و بلبل ١٠٩
دل جوان ١١١
شيره كي رابو ١١٣
دل ١١٥
چلنكسوارا كياكسار ١١٨
صلاح الدينى أيوبي ١١٩
گلا باغى جهان ١٢٠
هنك علماء وفيلسوف ١٢٢
بلالش ١٢٤
داوي ١٢٥

كُـلُ و گِـلّ

سعدی شیرازی ٧٤

دنگـی کردستانی ٧٥

برزاني ی من ٧٧

فلکا بی بخت ٧٨

شیخی شهید (شیخ سعید) ٨٠

شِینْناما ملا مصطفی برزاني ٨٢

بودی نا بودم ٨٤

سرّی أسرارست ٨٦

سحری هاروت ٨٨

هـپـسي ده طاتلی ٨٩

بـلبـلِ دیوانه ٩٠

شیخلغن مفهوقو ٩١

شواهق کردستان ٩٣

باخرة الدلتا (في مصر لقيانا) ٩٥

أسـری ٩٧

عليّ الرضـا ٩٩

معصوم ١٠٠

عنقای بـقـا ٣٣
مـه دي نـقـشك ٣٤
نقـشی كـفـرين ٣٥
دلو رابـه (هـلـو !) ٣٦
هـرو صد جار ٣٨
صبحكی زو ٣٩
هـنـارك ٤١
أي دريـغـا ٤٢
أي دل ٤٥
زاهدِ خلوت نشين ٤٧
مـرثـيـه (شين نامه) ٤٩
أي سيد عالم ٥٣

پـنجـك و هـفـتـك

پـنـجكا نقاش أزل ٥٦
نقش گـفـرين ٦٣
چـه بـكـت ٦٦
هفتكا درّه ئو سياه پـوش ٦٩

ـ فِهْرِسْت ـ

هَلبسته : **روپل**

نقاش أزل ١١
أي واحد پنهان ١٣
عرش معلاّ ١٤
سروا مه ١٥
آفرين بو ته (پري يا حوري سرشت) ١٦
ميرى مجلس ١٧
تختى ديلبري ١٨
ساقي ى مهوش ٢٠
سازى خوش آوازم أز ٢٣
هر دنالم ٢٤
أي مطربى دم ساز ٢٥
دلى شيدا ٢٦
باغى صور گلان ٢٧
شهيدى كربلا ٢٨
دلا ! ٣٠

د ديروكا كارێن وێژه يا كُردي دا ، أف جارا أوَّله كُو أفْ كارى پيروزْ پێك هاطي يه : ديوانا خاني بر هَف بُويه ، هاطي يه چاپْ كرنْ ـ لـحَمُو وێـژَه قَانێن جهانى ، بطايـبَتى لگَلى كُردستانى ، پيـرُوْز بَه !ـ

دِيـوانـا أَحْمَـدِى خانِـي

بَرْهَف كِرنُ و ليكُولينُ و سَراسْت كِرنا

عبـد الـرحـمـن دُرّه

بسم الله الرحمن الرحيم

ديوانا أحْمَدِى خانى

(١٦٥٠ - ١٧٠٧/٩)

بَرْهَف كِرِنُ و لِيكُولينُ و سَراسْت كِرِنا

عبد الرحمن دُرّه

Her dinalim şev û rojan, meger ez Eyyûb im ez
Hêstiran her vedimalim, meger ez Ye'qûb im ez

Bigirin dest ji me bêrûn, kul û derdan ku yek in
Wer bipêçin bi cefayê xwe, ku ez mektûb im ez

Hindekî xem hene daîm li min ev vêk dikevin
Ez nizanim ku bi çav wan çi qewî mehbûb im ez

Xem telebkarê me ye, em xo telebkarê diyar
Wek tilismê teleb im ez, talib û metlûb im ez

'Eceb îqbalî ji bo min nihe "Xanî" ku li bal
Padîşahê xem û derdan wehe ez merxûb im ez

Her dinalim şev û rojan, meger ez Eyyûb im ez
Hêstiran her vedimalim, meger ez Ye'qûb im ez

ISBN 975-93030-0-0
9 789759 303006
KESKESOR edebiyat